


RIZA ÇOLPAN

XIDÊ NAXIRVAN
Û
TEVKUŞTINA DÊRSIM



Weşanên Dersim

Institut kurde de Paris

Institut Kurde de Paris

Weşanên Dersim

Weşanên Dersim : 1
Çapa Yekem : Çıriya Paşin 1994

Adres:

Rıza Çolpan
33 Villiers Str.
Merrylands 2160
Sydney/AUSTRALIA

Institut Kurde de Paris

LIV. KL. 3716
13/11/2017
911 COL X10

RIZA ÇOLPAN

**XIDÊ NAXIRVAN
Û
TEVKUŞTINA DÊRSIM**



Weşanên Dersim

Institut kurde de Paris .

" AGADARÎ "

Xwendevanê delal,
mın ev pirtûka xwe li gor hın tipên zumanê Tırki nıvısand.
Mın kulık nekır ser i a Kurdi. Jı ber ku pıraniya Kurdên
me bı zumanê Tırki û latini dıxwinın. Hındê hın kovar û
rojnameyên me ji usa dınıvısın. Lı aliya dın de, mın hın
peyvên ku li nav gel de pırr nayên şuxulandın, an ji pey-
vên politik, li nav xalbend'an de, ango nav parentêzan de
wergerand zumanê Tırki, ku jı bona we hêsa bıbe. Lı milê
dın de, li hındirê çirokê de qal û behsa hın ziyaretan têtê
kırın, ez dıxwazım wan ziyaretan ji bı qenci li we bıdım
naskırın. Çawa ku diwarê Bamasûr li gundê Moxındiyê'
daye, Çoribori ji li gundê Golanê, li mala İmam Husênê
Golani'daye. İmam Husênê bırayê Hesen Çawış. Coşik
Bawa li paş gundê Coşikê de, li ser tapeki bılınd daye.
Ziyareta Seycêfır li navbera gundê Şowag û Kûpıkê de, li
paş taxa "Korta Reş" li binê "Deşta Sûlavê" daye. Tırba
Husên Cewahir -ew xortê hevalê Deniz Gezmiş û Mahir
Çayan- li nav ew ziyeretê daye. Ziyareta Qoriyê ji, disa li
navbera gundê Kûpıkê û gundê Dewrêş Weliyan'daye,
ciyeki bılınd û hember çıyayê Dızgûn Bawa'de bûye zıya-
retek bı taybeti. Ziyareta Avdılmûsa ji, li paş gundê Kû-
pıkê, li binê çıyayê Curnıkan de, sed metro li dûri mala
Bay Seyid'daye; kevirêki bı qule. Mırov li aliki de dıkeve
ew qulê, li aliya dın de ji derdıkeve. Ew ziyaret bı taybeti
jı bona çora heywanan, ango nexwaşıya heywanan her
gıring dihat hesabandın. Bı taybeti wexta ku dewar û
pezên gundan nexwaş dıketın, dıgotın "Çora Avdılmûsa
ketiye nav dêwêr û pêz, divê em pez û dewarên xwe bıbın
ser ziyareta Avdılmûsa". Ango ew ji ziyaretek werge bû.
Lê ez pırr tıştan li derheqa Avdılmûsa de nızanım, divê
xwendevan mın bıborın. Hêvi dıkım dirokzanên Kurd, li
derheqa ew kesi de ji gelê xwe ronak bıkın û wi ji li gelê

xwe bîdîn naskîrîn. Ziyareta kaniya Çıxmê ji, çawa ku mîn lî rûpelên pîrtûkê de ji daye diyarkîrîn, ew kaniya bî taybetî jî bona pûs û mîja ser ronahiya çavan bûbû ziyaretgehak bî taybetî. Lî nav gundiye gundê Bîlan de, navê ew kaniyê "Kaniya Mesil Bawa" dihat navkîrîn. Ango gunîştvanên gundê Bîlan, jî ew kaniyê ra "Kaniya Mesil Bawa" diçotîn. Lî ser ew kaniyê de kevîreki mezûn û gîrs hebû. Lî ser ew kevîr de gelek nîvis hatîbûn nîvisandîn. Gor ku diçotîn, ew nîvis bî zîmanê Ermenî bû û diroka ew gund û ew erdî dida naskîrîn.

Ziyareta Kule ji, bî taybetî jî bona jinên tomîre-kîsîrew jinên ku zarokên xwe nedîbûn, jî bona ew tîşt bû, balam nexwaşên dîn ji diçûn ser ew ziyaretê. Lê ku ez xelît bir naynûm, ew ziyaret jî lî gundê "Qûrçîkê" de bû. Ew gund jî, gundekî eşîra Xeraniyan bû. Ango gundê mala Bakîl Axa ê Xeraniyan.

Lî milê dîn de, mîn pêşgotîna Tosînê Reşît û profesora Sehidê Îbo lî gor zarav û nîvisandîna wan nîvisand, qet peyvîkek pêşgotîna wan neguhart.

Jî bona Husên Doxan jî, ez hêvî dikûm kesên xîsmên wî û talîbên wî lî mîn nexeyidîn. Lî derheqa Husên Doxan de, heval A. TAŞ lî pîrtûka xwe a "Pasîlî silah Kemalîzm" de -Kemalîzm a çek a bî jeng- qenc qal û hehsa Husên Doxan dîke. Ez bî xwe jî Husên Doxan baş nasdikûm. Jî ber ku bavê mîn û sê mamên mîn lî hindîrê xaniyê wan de hatîne cihanê. Seyîd Sîlêman, anga bavê Husên Doxan û bavê mîn, hemsalê hevbûn û lî malekîde mezûn bûbûn. Kalîkê mîn piştî gundê Kûpîkê diçe dibe colegê Seyîd Bertalê Kalîkê Husên Doxan. Heya roja îro jî, qeyda mîn û malbata mîn lî ser gundê Lodekan de tete xuyakîrîn; lê ez lî Kûpîkê de hatîme cihan.

Lî sala 1946' an de, hukma Romê jî bona sîrgûnên Kurd, efûyek gelepêr derxîst û Husên Doxan lî tev diya xwe û

bavê xwe, dageriyan welêt, gundê Lodekan. Lî ew salê de bavê wi Seyid Silêman mîr, çû rama Xwedê. Ez lî ew demê de, tev zarokên malbata wan diçim dibistana gundê Şilkê. Wexta ku Seyid Husên hate gundê Kûpîkê, lî mala kurê Bavo ê Kekê, Kekê de, lî mala Avdîlah ê Şariwanê de, lingên wi şoştin, ew ava lingên wi, mîn ji mîna şerbeteki vexwar; hûn ji mîna ava Kewser. Jî bona peywendiyê wi ên dewleta Tirk ji, hemû Kurdperwer qenc dîzanin.

Rıza ÇOLPAN

Institut kurde de Paris

" PÊŞGOTINA NIVISKAR "

Xwendevanê delal,

gor ku dayika mîna kal û dîlovan dîgot, rojbûyina mîn sedî-sed ne pêdane. Rawêja mîn ewe ku, ez ya lî meha Îlonê, 1936'an de hatime cihan, yan jî disa lî Îlona sala 1937'an de. Disa lî gor gotin û rawêja- tahmin-dayika mîn, ez lî sala 1938'an de, lî ser lîngan ketime û mîn destpêka meşa lî ser lîngan kîriye. Lê ez bawerim, ez lî Îlona 1936-an de hatime cihan. Lê hukma Romê ez kîrime zarokeki 1938'an û ez werge tomar-kayit-kîrime. Ku bîdîn temaşekîrîn, bîbêjî " aha ferma, jî mera dîbêjî, we zarok kuştine. Me ku zarok kuştine, ma çîto ev zarokana lî ew salan de nehatine kuştin". Bî taybetî hukma Romê, lî piştî ew tevkuştinê de, hemû zarok lî ser ew salên bî xwîn de nîvîsandîbûn. Hata, tomara bîrayê mînê ku, heşt sal lî mîn piçûktire, ew jî kîrîbûn sala 1938. Dûra bavê mînê belengaz ew rewşa da dadigeha Romê serrast kîr.

Ango ez lî nav xwîn rîjandî û barbarîya hukma Tîrk de hatime ev cihan. Qeza mîn Mêzgîr, gundê mîn jî nav Kûpîke û ez endamekî eşîra Îzolanîm. Kalîkê mîn hatiye lî ew gundî de cîwar bûye.

Lî sala 1946'an de, mîn destpêka xwendîna zumanê Tîrkî kîr. Lî sala 1951'de, ez bûm terki welat, ketim metropolên Tîrkiyê. Wek bajarê Edene û Istenbol. 16-10-1959'an de ez bûm leşkerê Romê, mîn sê sal jî dijîm ra leşkerî jî kîr. Leşkerê behrê. 22-12-1962'de çûm lî Qîbrîsê jî keçîkek esl Kurd ra zewicîyam. 28-2-1965' an de, ez lî tev du keçîk û kewanîya xwe disa dagerîyan Istenbolê. Dûra ketim nav sempatîzanên Partîya Karkerên Tîrkiyê û kesên çep. Mîn lî karxanê de karker rêzkîrîn, kîrîn endamê Sendîqatê. Ez bûm xortekî bîzav û Sosyalist. Îcar jîyana mîn kete xeterê

û ez bêt havil mam, mın sê zarok û bermaliya xwe lı şuva hiştın û dı roja 21-1- 1970'de mın xwe gihand kişwera Awistûralya, bajarê Sydney. Lı sala 1974'an de, mın "Komela Karkerên Tırkiyê" da damezirandin. Lı Awistûralya de, ez bûm ew kesê yekem û mın karkerên Tırk û yên Kurd bı hevra rêzkırın. Lı sala 1977'an de ez lı Tırkan veqetiyan, ketım nav kar û berên Netewi û Kurdperweri, mın Kurd rêzkırın. Lı 29-1-1979'an de, mın " Komela Kurdên Awistûralya " sazır. Disa lı sala 1986'an de, mın Kurdên bajarê Melbourne'yê rêzkırın û "Komela Kurdên Viktoriya" sazır. Lê ku ez nemırım, ez hemû jiyan, ser-pêhati û kar û berên xwe binivisim û bıgihêjinim xwendevanên Kurd û welatparêzên Kurd.

Xwendevanê hêja,

ev pirtûka ku lı dest tedaye, ev xebatek mına dûr û dirêje. Çend sal beri mın destpêka nivisandına ev karpêka xwe kırıbû; lê sed mixabın, ku hın kêmasi hebûn. Lı gor birû-baweriya mın kêmasiya mezin zıman bû. Em bibêjin, nebêjin, em lı bın bandûra zımanê biyaniyan de mane. Ji ber ku me lı welatê bav û kalanên xwe de, zımanê dayika xwe nexwendıye; me dibistanên zımanê dayik û bavanên xwe neditine. Bı taybeti em Kurdên Kurdıstana Bakûr lı bın bandûra zımanê Tırkan de felat nebûne. Lı destpêka demazrandına komara Mıstefa Kemal vırde ji, zımanê me bı fermi-resmi-hatiye qedexekırın. Me av vexwariye, avê ji mera gotiye" ez Tırkım " me nan xwariye, nan ji mera gotiye "ez Tırkım" me hewa helmijın kırıye, hewa ji mera gotiye "ez Tırkım". Ango me çı lı Tırkiyê de ditiye, hemû tıştan ji mera gotiye "ez Tırkım, tu ji Tırki". Me destpêka xwendinê kır, icar mamoste ji mera got "tu Tırki". Me pirtûk xwendine, pirtûkan ji mera gotine "tu tırki, hûn Tırkın". Xet û boyaxên ser qaxızan ji mera hatine zıman, gotine "hûn ne Kurdın, hûn Tırkın, Tırkên xasın". Ango lı nav bêtar û atmosferek werge de em mezin bûn û me lı

nav zılmek werge de perwerde xwe a xwendinê stand. Ji bona ew ji, em li aliya zimanê dayika xwe de, bêst xwendin û bêst perwerde mane.

Belê, li zikê rewşek werge de, me çavên xwe li ev cihana Xwedê de vekirin. Lê hezar cari li Xwedê şikir be ku, me xwe wenda nekir, me zimanê dayika xwe ji xwe birnekir.

Ez bi xwe li welateki wek kişwera Awistûralya de raste xwendin û nivisandina Kurdi hatim. Min xwendin û nivisandina Kurdi, li sala 1978'an de dit. Li ew salê de ez bûm nasê kovara Roja Nû, dengê Komkar û Rîzgariya Kurdistan. Cara yekem min li rûpelên ew rojname û kovaran de xwendin û nivisandina Kurdi dit. Ez bi xwe bi xwe fêre elifba Kurdi û tipên kurdi bûm. Qet kesek ji nebû mamosteyê minê xwendin û nivisandinê. Min li nav gelek kêmasiyan de xwendina zimanê dayika xwe hinkir. Li vir 7-8 sal beri, zimanê minê Kurdi niv Kurdi û niv Tirkî bû. Ji ber ku, ez li 13 salina xwe de li welêt de derketibûn, li bajarên Tirk û biyaniyan de dijiyam. Ango çî dixwazim ji wera bibêjim, min li nav gelek kêmasiyan de destpêka nivisandina ev karpêka xwe kiribû. Ango li sala 1985'an de.

Kêmasiya duwem ji, hin agadari kêma bûn. Lewra min malbata Xîdê naxirvan li piştî sala 1950'de wenda kiribû, ji minra hin agadari pêwîst bûn. Wek navê gundê wan û gelek tiştên din.

Xwendevanê xoşewist,
ev çiroka min, çawa ku heval Tosinê Reşit ji li pêşgotina xwe de dibêje, ne tenê çirok û serpêhatiya malbata Xîdê naxirvan û tevkuştina Dêrsime, her usa ji li rûpelên ev karpêka min de, gelek tiştên diroki, adet, tore, rabûn, rûniştandin, gotin û metelokên bav û kalan, birûbaweriyên

Kurdên Dêrsım -xesma Kurdên qeza Mêzgirê, herêma Newala Karê û Çarsancaqê- ji li rûpelên ev pirtûkê de hatine nivîsandin û min ew tîştana yek û yek biranine û pêşkêşe we kirine. Qet tîştekek bi xem û xeyali va nehatiye nivîsandin. Çirokek û jiyanekek bi rastiye. Min bi çavên xwe va ji gelek tîşt ditine, ez bûme nasê jiyana malbata Xîdê naxirvan, li tev kurê wi Ali ê piçûk çûme ber berx, kar û golikan. Rojên meyên şahî û şîni, ti û birçî bi hevra derbaz bûne. Cenderman û Serbexo ê gund çawa Xîdê piçûk şandine leşkeriye, ew zarokê çardeh salîni kurê Kurd, ew zivîstana berf û pûk, heya roja iroin li ber çavên minde wenda nebûne. Ew qirin û gazina Xîdê û Xecê hin li guhên min de, li mêjo ê min de dengvedan didin. Ew goştê Mîşk û gûyê kuçikan qet li bira min de naçin. Bi kurtasi li zîkê ev pirtûkê de çirok û dirok, keneşopiyan bav û kalan, adet û tore, birûbaweriyên Dêrsımiyan, xesma hin çirokên seyîdên derewçin û kedxwar, ketine zîkên hevûdu û qet li hev neqediyane.

Xwendevanê berêz,

her çi qas ku min gelek kêmasî serast kirine ji, ez bawrîm dişa ji kêmasiyên min li rûpelên ev karpêkê de hene. Bibe ku kêmasiya hin navan û metaryalan. Kêmasiya peyv, hevok, verêş-îmla-bihok hwd. Lê divê ji bona evana ji tu min bîborîni û ev rewşa jiyana me a bîndestî, bêt dibistan û bêt mamosteyî bîni ber çavan û werge rexne li nivîskarê ev karpêkê bîki.

" TÊBÎNÎ "

Xwendevanên birêz,
ev pirtûka min li sala 1993'yan de, li aliya çapxana nav " DÎLAN " de, li welêt hate çapkirin, lê balam navê çapkirinê, çapkirin bû. Bî rasti ew hevalan kareki nebaş kiribûn, pirtûk bî kopi kiribûn pirtûk, ku hemû nivisên rûpelên pirtûkê nedihatın xwendin, pirtûk rezil kiribûn. Ji bona ev ji, êdî ez bêt havil mam ku carek dîm ev karpêka xwe çap bikim û bigihijinim destê xwendevanên Kurd. Ez hêvi dikim hûn ev karpêka min bicibinim û bî dil û can bixwin.

Lî hêviya Kurdistanek Aza û Serbixwe, Kurdistanek xudan dewlet û dezgeh, dibistan û zaningeh; cihanek bêt şer û aşitîyek bî rasti.

Rıza ÇOLPAN

RIZÊ DÊRSİMÎ Û ÇIROKA WÎ

Rizê Dêrsımı ez zûda nas dıkım. Gundyê kurdi ji zılm û zora dijmin bûye fîrar û gîhiştîye Awstralya serê dînyayê, karkereki pîr tîşt ber çavê xwe diti, bindestya netewî û cîvaki têgîhiştî, xebata siyasîda qal bûyî, dîkeve nava edebiyata me.

Berê bî helbestê xwe, lê niha ji bî çiroka "Xîdê naxîrvan û tevkuştîna Dêrsım".

Salêd şarîstanyêye dirêj, jiyana lî bajarê mezîne pêşketi, bandûra mezin ser xeysetê Rizê Dêrsımı ne hiştîne. Wîra lî hev hatiyê camêrî, dîlpakî û xerîbdostya gundiye Kurd bîparêze. Hema bî wê dîlpakyê ji ev çirok hatye nîvisarê.

Eva pertûka derheqa şorişa Dêrsımê gîlî dîke, gava cewrêd Atatürk, yanê Mîstê kor, çawa Dêrsımya jêra digot, bî hovîtya nebinayî êriş dibirne ser gund û bajarê Dêrsımê, xuna bî hezara jin, zar, kal û pîrê am û tam dirêtin. Bî xwe ev pertûka nîvisara Nûrî Dêrsımı bir tîne, lê eger nîvisara Nûrî Dêrsımı nihêrina serokeki şorişêye, ku haj her tîştî heye, çiroka Rizê Dêrsımı nihêrina gundyê kurde, ew ji jî dûraya sala.

Pertûka Rizê Dêrsımı dîke wê valayê tîji bîke, ku iro nav edebiyata kurdîda, bî taybetî nava edebiyata kurmançiya jorin heye. Ew jiyana gundyê Dêrsımê bî her alî tîne ber çawa. Eger Dêrsım berê seva te welatekî dîr û nenas bûya ji, pet xandîna vê pertûkêra dîbe pareke hebûna te, tu dîbi evindarê wê.

Çiyayêd Tûjîk Bawa, Dîzgûn Bawa, Koyser, Hamik, Zel, Aşîl Bawa, çemêd Mîzûr, Xarçîk, Fîrat û Mûrad hesîna Kurdistanê nav dilê teda hê gurr dîkin.

Pertûk bî taybetî zılm û zora Tîrkê faşî tîne ber çawa. Lê derheqa wê zılm û zorêda xudanê pîrtûkê bî devê xelkê, yanê ji rûpela kovar, rojname û pertûka pê nehesyaye.

Çı bîndestya netewi be, çı ji ya cıvaki be, ewi gişk ber çavê xwe ditye, lı ser çermê xwe texmin kırye. Lema ji nıvisara wi bêqelpe, jı kûraya dıl tê. Lema ji xwendevan bawarya xwe jı wi tine, dıkeve tefekurya nigara, bîndestya gelê kurd dılê wi dışewıtine, pêwıstya xebata siasi bona wi ronı dıbe.

Rıza sala 1937'an, lı lı aliya Dêrsımê jı diya xwe bûye. Bavê wi tevi zarokê xweye mayın Rıza lı şıkeftê serê çiya vedışêre, weki jı xezewa tırkê harbûyi bıfıltine. Sala 1946'an ewi dıbine dıbıstana Tırka, dıbıstana dıjın, çawa ew bı xwe dıbêje. Lê rewşa malê yê abori imkanê nade wi dıbıstanê tamamke û ew sala 1951'i terkeseri welêt dıbe. Sê sala lı bajarê Adanayê paletyê dıke, paşê dıçe İstenbolê, peyra sê sala wi dıbine eskeryê, dûra dıçe Qıbrosê. Lı Qıbrosê ew tevi keçeke eslê xwe kurd dızewıce. Sala 1965'an ew vedıgere İstenbolê, dıkeve karxanê û pêra jı bı dılgermi lı refê sindikada ci dıgire.

Dırêjaya van sala ew lı ku bûye, çı bıkira, pertûk tümê pêrabûye.

Sala 1970'i Rızê Dêrsımı bê havıl dımine û berê xwe dıde Awstralyayê. Lı sala 1974'a ew dıbe pêşekarê avakırına "Komela Karkerên Tırkiyê". Dûra hışê wiên netewi têne serê wi, şovıniya tırkên çep dıbine û lı tırkan vedıqete, lı sala 1978'a de, destpêka xebata netewi û kurdperweryê dıke. Dı roja 29-1-1979'an de "KOMELA KURDÊN AWSTRALYA"ava dıke, lı ew welatê dûr de, disa dıbe pêşekarê ew xebata kurdperweri.

Pertûka Rızê Dêrsımı çiroke, lê bı pır tışt jı sinorê çirokê derdıkeve. Eva ne mêmûarın, lê pır tışt ser bınaşa biraninan hatıne nıvisarê, ne nıvisara dırokyêye, lê hınek pêkhatınê dırokyê tine ber çava. Ew lı vê pertûkêda usa jı gelek melumetyêd netewnasyê-entografıya-û ceografıyê dıbının. Eva derdê dılê mıroveki welatperwere, ku lı şarıstanyê agrê dıl hê gurr bûye û idi nıkare tapke, nıkare wi derdê dılê xweda xweyke, dıde der. Ew jı kela dılê wi tê û

sinorada nayê bendkırinê. Eva destena jina Dêrsimêye, demeke dirokiye lape dijwarde. Vıra edet û xeyset, rabûnrûniştandin, dirok û efsenetyê Dêrsimêne, ku ji alyê lawê wêyi şirhelal, bî zarê gundyê wê hatine nivisarê.

Pey xwendina pertûkêra mirov tirê bî xwe Dêrsimê qesıdye, xanyê gundyaye nımız bûye mêvan, bî heryê serê xwe şuştıye, lı beravê mêze kırıye, nanê hışk niv cehe, niv garıs xarye.

Belê, Rızê Dêrsımı cara duweme bî pirtûka tam peyayi meydana edebiyata kurdi dıbe. Em wıra xêr û xweşyê bıxwazın. Hêvidarın pertûkê wiyê dın lı rojêñ tê bıbinın.

TOSINÊ REŞIT

Erêvan.



PIRTÛKA LAYIQ

Lı nava edebiyata meya pırqurneda nıvisara vekıri kême. Şairên meyê mezin sazırına helbestan gıhandine dereceke bıınd. Vê nivqurneda lı erata meydana edebiyata meda nıvisara vekıri ji bû edet.

Wexta mın nasya xwe da pirtûka Rıza ê Çolpan ez hatım ser vê fıkrê, ku nıviskareki merifet ew nıvisiye. Ev pirtûkê de derdê me, dew û dora Kurdistanê tên xanê. Bı nexş û awazên heri baş têne ber çavên mirov. Bihna Kurdistanê lı rûpelên ev pirtûkê de bin dıde. Çıyayên kurdistanê, geli û gedûkên wê, çem û kelek, gul û sosın, deşt û beyar têne ber çavê xwendevana.

Qurna 16-a parvekirina Kurdistanê lı ser Roma reş û Farızistanê bûne neynasiya dew û dora welêt bona Serxwebûnê û Azadiyê. Bı seri Xıdo ê gavan û neferên mala wi ew teli tengasi têne ber çevê mın, ku bûne para gelê Kurd. Gelê me, ku bı hezaran sal ser axa xwe maye nıha bı destê zalumên Tırk, Ereb û Farıs'an tê zêrandinê. Pirtûkêda ciki heri ferz dıgre zulmkariya Roma reş.

Bextê Kurdistanê'yê diroki lê naki. Ew bındesta xelqê neçê. Dewleta Tırk bı hezaran delq û dolavan gelê me dıxapand, ber radıkirine diji bera, eşir radıkirine pêşberi hev û bı saya serê wê ji karê xweyi qırêj pêşda dıbir. Gelek caran ji Roma reş bı deh hezaran leşkerê xweva êrişi ser Kurdistanê dıkir, keç û lawê wê, cıwan, ahıl, pır dıbûne cangoriê welatê xwe. Bedilhewa nine, ku Meleka jına Xıdê dıbêje " Xwedê o te em kırın şıvan, gavan, qûlan ra qûl bes nine, te serda ji ev êşa çavan da mın". Bı zarê avê jına Kurd em tev ji wisa bêjın.

Pirtûkêda ciki ferz xudan daye şerê, ku lı Dêrsımê qewımiye. Mıstefa Kemal tevi sereskerê xwe dadıkute lı ser vi bajari bı hêzan kesê am û tam qır dıke. Serda ji bı mıxaneti serokên eşiretên Kurda dıkuje.

Wexta dadgerê Mistê Kor fermana dardakırına Hesên Xêyri derdixine, cellat Hesên Xêyri dibe ber dara sê-pê, Hesên Xêyri dıke qırin, dıbêje " Ey şehidên kurdistanê, baskên xwe ji mınra ji vekın, ez ji tême cem we". Roja iro dıvê her Kurdeki welatperest ew çewtiyên bıhuri bine ber çavan û gor ew tevger bıke û ji bona doza welêt bı dılsozi û dılpacki xebat bıke.

Pirtûkê de mesele, kılam, metelokên gelê me pırr zefın. Ew lı ali xudanê kîtêbê dıkın, ku her cumlekê wi, her nexşeki tebyetê baş tine ber çavên xwendevana.

Rıza ê Çolpan pirtûkeki baş, xwaş nıvisiye. Ez gumanın ewe rabûna me lı derheqa dew û doza Kurd û kurdistanê dıha dewleti bıke.

PROFESOR SEHİDÊ İBO.

Ew ferzaneyê Kurdistan dı roja 18-1-1991'i de, bı destê hın kesên bêbext û tari de, lı nexwaşxana Erivanê de hate cangori kırin. Şehidê İbo, bıjıkeki zarokan bû. Ew bı zanebûn û bıaqılıya xwe va zû bûbû profesoreki nav û deng. Lı sazûmana Sovyeta kevn de, bı temamiya welatên Sovyet de, çar profesorên nav û deng, zanayên nexwaşiya zarokan hebûn, yek ji lı wan çaran de, cangoriyê gewre Şehidê İBO bû. Lı bıli ev, dı sala 1979'an de, lı bajarê New York ê, lı cıvınek navnetewi de, Seyidê İBO ji hatıbû bıjartın, ketıbû nav zanıstkarên bıjıjkên cıhan. Ango lı ser beşa nexwaşiya zarokan. Lı ser beşa nexwaşiya zarokan, pirtûkên Seyidê İBO lı zanıngêhên bıjışki de, xwendevanan ra dıbın ders û rê lı xwendevanan temaşe dıkın. Lı bıli ew pirtûkên wiên fêrzana i, her usa ji gelek pirtûkên wiên Kurdi, çırok û romanên wi ji hatıne çapkırın û pêşkêşe gelê Kurd bûne. Bıla ew hêjayê gelê Kurd lı nav nûr de raze, Xwedê rama xwe lı wi ewladê Kurd ke. Gelê Kurd wi hêjayê xwe çucaran bırnake.

Zeman bîhar bû, êdi sêla sor û germ, mina ağır ketîbû
 binê erda xêr û bêr. Berf lî ser çiya û tûman, deşt û kaş-
 an, çal û kortên Kurdistan'ê, lî herêma Dêrsım, qeza
 Xozatê, lî bin tava Roja Zeri, germ û tindayin de dîheliya
 û dîbû av, her dîherikiya. Helandına berfên lî ser çiyayê
 Tûjik Bawa û Silbûs, Dızgûn Bawa û Aşıl Bawa, Zel,
 Koyser, Bûyer, Mızûr û yên dın de dîherikiyan, hêdi-hêdi
 dîbûn cok. Ew avên cokan dîghiştın hev dîbûn Newal.
 Avên newalan dadîketın nav deşt, çal û kortan de dîbûn
 lehi, lesar, erd dîqelişandın û dîkırın geli -vadi-. Wexta ku
 ew lehi û lesarana bî pêlên mezın va dîghiştın gelhev
 dîbûn mina behr û deryan, rengê wan avan weka rengê
 xulava beravan û marên gewr dîhatın xuyakırın û bî wî
 rengi va her dîherikiyan û xwe dîghandın ava çemê Mı-
 zûr, Xarçık, Mûrad û Fıratê, lî ser singê erdê Kurdistan
 de derbaz dîbûn, dîçûn xwe dîghandın ser erdê Ereban û
 dîketın delava-körfez-Basra ê.

Belê, lî aliya dın de, lî dêmşala bîharê de kar û bar ên
 jıyanek nû destpêdıkır. Lî wê salê de ji, hemû gundiye
 Kurdistan jı bona cotên bîharê xwe û kar-berên xwe
 amade dîkırın. Jın, keç û bûkan pembû dijendın, hêri a
 miyan, mû ê bızınan şedıkırın, dûra ew mû û hêri bî teşi-
 yan, pembû ji bî dolavan dırıstın. Risên hêriyan dîkırın
 xaliçe, balgif'ên rengin û cacım, astır, heqibên hespan,
 torbe'ên şıvanan, bendsamiyên nıran, ango jı bona girêda-
 yına ga'an, gore, lepik, saq û hwd. Mû ji dîkırın weris,
 bendên jı bona girêdayına heywanan, konên zozanan,
 çalên jı bona avranên aşan, barê kehıran, parastına zadan
 û hwd. Pembû ji, disa Keç û bûkan bî kevanan dijendın,
 dûra ew pembû lî ser simek heri zırav de bî qenci badıdan
 dîkırın pelte, ew peltana lî serhev lod dîkırın, dûra jı bî

dolavan dırıstın dıkırın dezi; dezi ji lı ser lıng û joni, dest û enışkên xwe de dıkırın kaş, dûra ew kaşana bı cûreki taybeti va lı hev dıpêçan dıkırın wek luqeki ser baniyan, diavıtın ser pıştên xwe û dıbirın dıdan cılagvanan, ji xwera û zar, zêçên xwera dıkırın kıras, derpe û kurtık, rûyê doşeg û lıhêf'an hwd. Xortên gundan û şıvanên pez û dewaran ji, bı risên rengin va ji xwera qaning çêdıkırın, bı wan qaningan va, lı nav xwe de dıketın lecê, gelo ki bı bêtır hêze û sevkane. Xortan çermê hewanên kevn dıbirıyan, dıkırın zıkê qaningên xwe, bı qaningan va dıdûran, ku wexta kevir avıtınê de, dıvê qaning bıkın şeçe-şeçe, deng derxinın, ku gur û heywanên hov bıtırsın û lı pêz û dêwêr dūr bısekınn. Lı wê heyamê de, bırbûbaweriyek bı taybeti lı nav Kurdên Dêrsım de hebû, ew ji ev bû: Dıgotın " gur gotiye şeşar fısa mîne, fıfıng fırra mîne, qaning fırsa mîne". Jın û keçan benên qaningan bı taybeti çar koşe dımûnandın, dıdan xortan, ku dılê xortan şabıkın, bıla ew ji, lı pez û dewaran qenc bınhêrın. Bı rasti lı wı zemani de kar û suxureên jınên Kurdan pırr zêde bûn. Ji bona ew ji mezınan dıgotın" jınên Kurd her tım lı Rojhılata Navın de ciheki heri gırıng standıne. Ew bı kar û berên xwe va, aqıl û hunerên xwe va, ar û namûsên xwe va, her tım bûne minak. Ew qet nebûne wek hın jınên Rojhılata Navın".

Rewşa gelê Kurd her xırab bû. Lı wı zemani de, tazi û bırcıbûn, nexwaşı, kuştın û lédan bûbû babeta rojev a gelê Kurd. Dıjınan lı her aliki va gelê Kurd dıêşand û dıkuşt, Kurdıstan talan dıkır. Gundi û rêçber, pale, hejar û belengazên Kurdıstan her bırcı û pêrışan bûn. Wana lı malên xwe de ji bona nemırınê pırr caran pariyek nanê ceh û garıs, gılgıl û lazût ji nedıdıttın. Bı taybeti ew rewşa lı herêma Dêrsım de her xırab bû. Ji lewra Dêrsım lı aliya

hukma Romê de hatibû dorvebirin. Ango Dêrsım ketibû hındirê çeper û ablûka dijmin, rê û dirb lı rûniştvanên Dêrsım ra hatibûn qutkirin û dadan.

Lı aliki bêbextiya dijmin û talankariya dijmin, lı aliya dın de ji xızani, belengazi û birçibûnê piştta gelê Dêrsım şikandibû, rewşa aboriyê her xırab bû. Lı malên gundiyan Kurdistan de ne tenê rewşa birçibûnê hebû, her usa ji gelê Kurd lı malên xwe de qalibek sawûn ji nedıdit. Lı bili ev rewşan, hemû kes û gundiyan Kurdistan lı nav sıpi û rışkan de mabûn. Wan hejar û belengazan, êvar-êvar piştı şiv xwarinê, wexta ku dıketın nav nivin û binê lihêfên xwe, hemûyan bı tırsa rışk û sıpiyan, nûtık û kêçan xwe tazi û rût dıkirin, kinc û kolên xwe ji, bı taybeti lı dûrê doşeg û nivinên xwe, ya dadıanin ser erdê û ya ji, bı dûrê nivinên xwe de dadıaniyan ser kursiyeki, bı qenci dınıxımandın, dûra ji bı zıkên birçi dıketın binê lihêfên xwe vedileziyan û dıketın xewê. Lı rojên berav şoştinê de ji, jinên Kurdan bı taybeti jı bona sıpi û rışkan, kêç û nûtıkan hemû cıl û corên xwe û çarşefên lihêfan, rûyê doşegan dıkirin hındirê sitilên avan, sitil ji dadıanin ser sê kevirên kuçık, êzing û yan ji tepık dıkirin binê sitılan û ağır ji lı binê sitılan de dadıdan, dûra ji hınek xaliya ağır komdıkirin, bı hêringan va dadıwıtın û ew xaliya dıkirin nav ava sitılan, kinc, kol, rûyê doşeg û çarşefên lihêfan tev hemû paç-maçên qılêr bı ço û ya ji dareki va dıdewısandın nav ava sitılan, bı seatan ew kincana dıkelandın û ha dıkelandın. Êdi ew kinc û kol, çı ku lı nav ava sitılan de hebûn dıkirin xule-xul û dıkelıyan, xulava sitılan káf dıdan û ew kef lı ser sitılan de dıherıkiyan û dırijıyan, dadıketın ser ağır, xurri û tıfafa ağır dıtemırandın. Jı bona ev ji, her tım lıgel sitilên beravan de kesek bı taybeti dıma. Wi kesi ji, ya bı dareki mina ço zexm û qewin û ya ji, bı rotek piçûk va, ew kinc, kol û hemû tiştên ku lı hındirê sitılan de hebûn, ewana radıkirin, dıhêjand, dûra ji disa dıdewısand nav ava xulav, ta ku sıpi, rışk, nûtık û hemû hêkên

wan lı nav ew ava germ û kelox de bımırın. Pışti ew kar û berên usa de, rotek zexm û qewim dıkırın nav qulpên sitılan, du kesan ew sitılana lı ser ağır radıkırın, dıbırın ber çirtık û cokên avan, cem avên cem û newalan de dadının ser erdê, dûra ew kincana yek bı yek lı sitılan de derdixıstın dıdan ser kevirêki pan û dûz, bı şûnik û têpûçan va dıdan ber têpûçan, dıkutan û ha dıkutan. Dûra ji bı ava zelal û paqij va ew kincana lı xulava ağır, ron, ronak dıkırın û dıbırın lı ser kevir, dar û çeperên dorbera zevi û bostanan de radixıstın binê tova rojê, zıwa dıkırın. Ji bona seri şoştınên xwe û zarokên xwe ji, wana axa kil a reng zer, lı şûna sawûnê de bıkar dıanin û ew axa kil dıkırın şûna sawûnê. Ew axa kil û reng zer, bı taybeti lı zıkê tırên, aş û newalan de dıhat dıtın. Ji bona wê kilê ji, gundiyeên hejar û belengaz tevr û bêr, merr û kulbeên xwe dıgirtın û dıçûn ew axa taybeti û reng zer dıkolan dıkırın çalan, lı kehr û qantıran bardıkırın û dıbırın malên xwe de dıkırın hındırê pêteg û ambaran de hıldıanin, ku ji bona roja beravê bı kar binın û bı wê axa kil va serê xwe bışon. Ango ew axa kil û reng zer, sawûna gelê Kurd bû. Yê ku kehr û qantırên xwe tunebûn, wana ji, ew axa kil dıkırın çalan, çal ji dıavıtın ser pıştên xwe û werge dıkışandın malên xwe. Rojên berav şoştınê de ji, bı rasti ji bona jinên Kurdan rewş gelekı zor û dıjwar dıbû. Wexta ku jınan destpêka seri şoştına xwe û zarokên xwe dıkırın, ew axa kil dıkırın nav avê, av şûli dıbû, dûra ji ew ava lı ser serê xwe de berdıdan û werge serên xwe, yê zarokên xwe bı wı şıkli va dışoştın, xwe mısdıdan, qilêra bedenên xwe paqij dıkırın. Lê divê mirov bêt guman bıbêje, ew kar û berên usa lı dewra kevneyariya mirovi de, ji gelê Kurd ra mirat mabû. Dıjmanan nehiştıbûn ku, gelê Kurd ji lı nav kar û berên kevneyari de derkeve, bıbe gelekı şareza û xudan hacetên nû û nûjen, bıbe gelekı şarweri. Dıjmanan lı sedsal û qurneyên bıhuri de, Kurdıstan dagır kırıbûn, iro ji Kurdıstan lı nav Tırk Ereb û Farıs'an de

perçe bûye. Bı taybeti lı qurna bistan de, Emperyalên cihan, Kurdistan kırım mêtingeh û lı nav çar dewletan de parvekırın. Nehıştın ku gelê Kurd ji rabe ser piyan, dewletek xwe damezrine, bıgihêje azadiya xwe, welatê xwe şên û geş bıke, bıbe mina hemû gelên azad û pêşveçûyi, pêşve bıçe, tama sistemek demoqratik tam bıke, lı bın ling û destan de felat bıbe, heqê xweyê mirovî û çarenûsi bistine.

Belê, avên çem û newalan mina xulava zıkê sitilên beravan dıhatın xuyakırın û dıherkiyan, dıkırın xurrexurr; dar, kevır û êzingên hışk, qılşık û xezamên daran dıdan ber xwe û dıbırın. Ew avana dıbûn mina behr, derya û dengızan, lı nav axa Kurdistan de derbaz dıbûn, dıçûn xwe dıgıhandın behran. Carna ji lı demên bıharê de, baran bêtır zêde dıbariya berf lı ser çiya û kaşan de dıhelıya dıbû lehi û lesar, wan lehi û lesaran xwe dıgıhandın nav gundan û zeviyên gundiyan, mal û çandiniyên gundiyan xesereyên mezın dıdıtın, dewar û pez, carna ji zarokên pıçûk dıhatın xenıqandın, lı nav wan lehi û lesaran de wenda dıbûn. Ew realita gelê Kurd bû. Dıjminan nedıxwastın ku rewşa gelê Kurd were guhartın. Dıxwastın ku Kurd her tım lı rewşek xızani de buminın, ku serên xwe ranekın. Lê bı rasti dıjmin ne tenê dewlet û karbidestên wek Tırk, Erebe û Faris'ın, her usa ji, ew avên çem û newalan ji, pırr caran mina dıjminên gelê Kurd, geleki xesereyên mezın dıgıhêjandın gelê Kurd, wan avan ji kar û berên dıjminan pêk dıanin.

Dawiya meha Adarê, destpêka Avrıl'ê, ango Nisanê, wext berbanga sıbê bû. Dikên sıbê êdi bang dıkırın; şev ji

geleki sar û bahoz, bageri derbaz dîbû. Qire-qira dikan nedîhîşt ku mîrov xew bîke, hêsa bîbe, te dîgot "qiyamet lî esman de daketiye jêr ser erdê".

Belê, lî wi zemani de bangkırına dikan jî gelê Kurd ra kar û berên seatan bîkar dianin. Bangkırına dikan, zıngılên seatên iroin dianin cih. Jî ber ku, lî wi zemani de, hejar û belengazên Kurdistan, qet lî malên xwe de seat-meat nedîdîtin û pîraniya gel seat jî nasnedikırın. Tenê dewlemend, mir û axayên Kurd xudan seat bûn. Wan lî berikên xwe de seatên ziv û zêr, lî tev olqên zêrin dîgerandın, lî gel temaşe dikırın, xwe qure dîdan xuyakırın, te dîgot cihan bî destên wan va hatiye afırandın. Lî berikên wan de ew zincirê seatên ziv û zêrin, lî lıngên wan de iskarpin û sol-mes hebûn. Hejar û kedkarên Kurd bêt seat, bêt mal û milk bûn. Lî wan dewlemend, mir û axan dînhêriyan bîjûya wan dîçû ew seat, şıkl û şemaê mir, axa û dewlemendan, bî dîlda berxwe diketın, axin jî kûrahi a dilê wan, kezew û pişikên wan de derdiket. Marqe a seatên wan Nacar bûn, Omega bûn, Tisot û Hislon bûn. Lî destên wan de jî, tızbiên Kûka û Keribar hebûn. Wana ew tızbiana dikırın nav tılıên xwe, libên wan yek bî yek dikırşandın, libên tızbiyan dikırın şeqe-şeq û deng derdixıstın, wana jî bî wan dangan kêfa xwe dianin û dîlxwaş dîbûn.

Esman sayî û şın bû, stêr lî esman de dîburuqıyan, şewq dîdan cihanê. Ba û bahozê lî wê şeva sayî û sar de berfêr ser çıyan û kaşan, deşt û kendelan qemırandıbûn û berf bûbû êrxûç, te dîgot berf bûye kevir, hesın û pola, hışk bûye, cemed gırtiye. Xêncı berfê, avên kaniyan, çem û newalan lî tev cok û çirtıkên cokên avan gıştı qemıriyabûn, av nedıherıkiyan. Rûnıştvanên gundê Torût'ê, ên gom û mezıre'yên dın, hemû Kurdên Dêrsım sıbe zû lî

xewê de rabûbûn serxwe, jî bona kar û berên dayin standinê, lî rîyan ketibûn. Hin kes bî peya, hin kes jî bî sîwari lî ser wê berfa êrxûç û qemirai de dimeşîyan dîçûn gund û bajaran, nêçira kewan. Jîn û mêrên gundiyan lî berbanga sibê de çûbûn ketibûn axur û hevşan, kadin û kozên pez û dewaran, binê dewar û pezên xwe dimuştin, axur paqij dîkîrîn, kadinan de ka û giya derdixîstîn, koz û hevşan de bîzîn, mi, kar û berx berdîdan der, ga, hesp, -qantîr, çêlek û kehrên xwe timar dîkîrîn, mîsdîdan, zivîl û rêxên pez û dewaran dîkîrîn sepetan, sepet tîji zivîl dîkîrîn û diavîtin ser piştên xwe, ew rêx, zivîl û pişqulên mi û bîzînan diavîtin ser sergoyan, vala dîkîrîn.

Belê, bî rasti jiyana gelê Kurd wêrge bû. Gelê Kurd lî demên payizê de ew rêx, puşqul û zivîlana bî bahrê kehr, hesp, qantîr û xîjagan va dîkîşandînan nav zeviyên xwe. Bî taybetî ew zeviyên ku bêt av, beroj û beji bûn, lî ser erda wan zevîyan de belav dîkîrîn. Çendek dûra jî cotkaran hevcar dîdan paş ga'an cot diajotîn, erdên zevîyan bî qenci werdîgerandînan, xasîl dîkîrîn, dûra jî genim û çewder diajotîn. Carna jî, jî bona ceh û garîs, nûk û nisk, fik û kuşne, ew zivîla lî destpêka bîharê de, lî ser berfê radixîstîn û belav dîkîrîn. Bî wi şiklî va berf dîheliya, zivîl lî ser berfê de nerm dîbû, tev ava berfê lî axa zevîyan de dîhat mitîn, axa zevîyan bêtîr xurt dîbûn. Bî rasti piştî paqijkîrîna binê dewar û pezan, timarkîrîna ga, çêlek, kehr, hesp û qantîran, gundî zef dîwestîyan. Kîşandîna sepetên zivîl, miştîn û paqijkîrîna axur, hevşe û kadinan zor û zamet bû, şivan û gavan bêzar dîbûn. Lî alîki de miştîna axur, hevşe û kadinan, toz û gemariya wan, lî aliya dîn de, bêhna rêx û mîza dewaran, zîriçên mîrişkan, toz û qîrêjiya çîlo, ka û giya, mîrov difetîsand, qalîxa serê mîrov radîkîr.

Şivan, gavan, xwediên pez, dewaran dıçûn lı kadinên xwe de ka, giya û kês dianin dıkırın afırên ga û çêlekan, ên kehr, hesp û qantıran, werge zıkên heywanên xwe têr dıkırın. Heywanên wek mi, bızın, golık, kar û berxan ji, ew bı cûdai berdıdan der. Bı taybeti mi û berx dıbirın hındirê malên xwe, lı ser sekû û bınê diwarên malê de, ka û giya, an ji çılo ê darên Mazi radıxıstın û mi û berx, carna ji bızınên xwe berdıdan ser wan alıfan. Zıkên heywanên xwe bı wi şıklı va têr dıkırın. Xwediyê malan bı xwe ji, tev zar û zêçên xwe lı dorbera xonça-sıfre-xurnı a sıbê -lı herêma Dêrsım de, ji taştê re xurnı dibêjin- kom dibûn û destpêka xwarına girmiyê, ango şorbê dıkırın. Ki lı ser erd, ki ji lı ser kursiyeki de rûdınışt, nanê ceh, garıs, gılgıl, ku nanê genım û çewder bıditana, nanê genım û çewder ji dıpişartın û dıkırın hındirê legana girmiyê û bı kevçiyên darık va destpêka girmı xwarına xwe dıkırın. Lı aliki malxweên malan lı tev zar û zêçan lı dorbera xonçe de xwarına xwe dıxwarın, lı aliya dın de ji, mi û bızın, kar û berx ji, lı bınê diwaran û lı ser sekûyan de, ka, giya û çılo dıxwarın. Bı rastı pırr caran ji bızın, mi, kar û berxan xwarınên lı ber xwe cidıhiştın, dıçûn lı dorbera xonçe de, nıška ve serê xwe lı nav zarok û neferên ku lı dorbera xonçe de kumbûbûn, dırêje nav legana girmiyê dıkırın û dev û pozên xweên bı çılmi û gılêški, ka û giya va, ew xwarına zar, zêçan, bav û dayıkan heram û qırêj dibû. Lı demên werge de, malxwe'ên malan hêrs dıketın lı şûna xwe de radıbûn, ew heywanana dıdan ber çoan, dıkutan û ha dıkutan. Ango bı wê rewşa dewar, pez û tevgera wan heywanên bêt súc, bêt gune û bêt zıman, malxwe'ên malan û neferên malan pırr eciz dibûn. Lı aliki gundiyeın belengaz lı ser sıfreyên xwarınan de dibûn pasewan û parêzvan, lı aliya dın de ji, miz û puşqulên wan heywanan, erdên hındır malan şıl dıkırın û erd dibû herri û çamûr. Pıştı paqıjkırın û muştına miz, puşqulên wan heywanan de ji, erdên hındır malan çal û kort dibûn

mırov nedıkarıbû ku, lı ser erda hındırê mala xwe de rûne. Lewra şûnên dûz û qenc lı hındırê malên gundiyan de nedıman. Jı bona ev dijwariyê ji, hemû gundiyan palas û kurtan, astır û kulav lı ser erdê de radıxıstın, werge rûdınıştın û hêsa dıbûn. Hın jınan ji, paç-maç berhev dıkırın û ew paçana dıkırın nav caweki, an ji purtiyekı zexm û qewın, mina doşegan dıdûran û lı ber diwar û stûnan, ser sekû û textan de radıxıstın, ku lı ser wan rûn-ın, pıšta xwe bıdın stûn û diwaran, werge hêsa bıbın.

Lı xani û malên Kurdan de, bı taybeti demên zıvıstan û bıharê de, rewş werge xırab û dijwar bû. Lı aliki ew qırêj û gemariya pez û dewaran, lı milê dın de ji, dılopên berf û baranan, jıyan her xırab dıkır û xew nedıket çavên gundiyên Kurdistan. Lı demên zıvıstanê de, berf lı ser banıyan, ango lı ser pıšta xaniyan de dıheliya, lı axa pıšta ew xaniyan de dadıket jêr û dıbû dılop. Daketına wan dılopên baran û berfê ji, erd şıl dıkır, çamûr û herri a erdê her dıpjıqand, der û dor rezil dıkır. jınan legan, beroş û huskure dıdan ber ew dılopan, ku ava dılopan hemû erda hındır şıl, çal û kort neke.

Pışti rakırına bênderan, nêzıka payizê, gundiyên Kurdistan, tevr û bêr, serad û bêjıngên xwe dıgirtın dıçûn ji bona çılpravkırına-siwax- xaniyên xwe, xali a bı taybeti dıkolan û bı serad û bêjıngan va dadıwitın, dûra ji bı bêran dıkırın çalan, lı kehr û qantıran bardıkırın dıbırın lı ser pıştên xaniyên xwe de vala dıkırın. Pışti ew kar, vêca ji ew xaliya bı bêran vedıdan, navina xaliyê vala dıkırın, dıkırın mina sûrên hewzan, pıstra ji, bı beroş û sıtılan va, av dıkışandın, gelek ka ji dıavıtın ser wê xaliyê navhev dıxıstın, dûra ji destpêka herrikırınê dıkırın. Xortên cıwan û mêr bı bêran va êdi dıketın nav ew herriyê, herri bı qenci hasıl dıkırın, dûra ji seri û biniyê xaniyên xwe çılprav dıkırın. Pışti çılpravkırınê tışteki ji xwê lı ser herri a şıl de belav dıkırın. Ka jı bona neqelışandın û hevırtına herriyê, xwê ji, jı bona dılop nekırına xaniyan bı kar

dıanin. Dıgotın"xwê şûna çimento û qûmê distine". Gundiye Kurdîstan her sal ew kar dıkırın û ew zameta dıkışandin.

Meha Adarê êdi derbaz bûbû, destpêka meha Avrîlê, ango Nisanê bû. Hemû gundiye Kurdîstan cot diajotin. Cejna"Newroz"ji, li pırr cihên Kurdîstan de hatibû pirozkırın. Lê sed mixabın ku, Kurdên herêma Dêrsım û dorbera Dêrsım, pirozkırına cejna"Newroz"ê ji xwe birakırıbûn, wana bı cûreki dın"Newroz"piroz dıkr. Kal û pırên Dêrsım, bı taybeti li meha Adarê de, ji bona roja heftê Adarê, roja nehê Adarê, roja hıvdeh ê Adarê roji dıgirtın, dıgotın"êdi sêla sor û germ ketiye binê erdê, zıvıstana sar û serma, ba û bahoz, berf û pûk naminın, dıçın, sal tê guhartın, jiyan bervı germiyê dıçe, jindeyên Xwedê destpêka jiyanek nû dıkın, bıhar bervı havinê dimeşe, dewar û pez li axur û hevşan de derdıkevın, kesên xudan keriyên pezan, keriyên xwe dıbın ser çıyan û zozanan, şır, dew, rûn, pêni her zêde dıbın, Gul û kulilk, Sosın û Bınevş, Nêrgız û Belgizar, Beybûn û Reyhan tev hemû çiçegên rengın vedıbın, cotên bıharê tene ajotin, rêçberên Kurdîstan destpêka ajotına çandiniyan dıkın, giyayên mêrg û xavan, deşt û zozanan, genım, çewder, ceh, garıs, nûk, kûşne, nisk û lazût bejn dirêj dıbın, kesên bêt erd û ax dıçın bajaran paletiyê dıkın, zar û zêçên xwe ra kinc û kolan dıkırın, doliwa xwe a salê peyda dıkın" hwd.

Belê, li demsalên bıharê de, hemû gundi û rêçberên Kurdîstan, ên ku xudan erd û ax bûn, çandiniyên xweyên bıharê diajotin, çandiniyên wan hêşın dıbûn, bejn dıdan. Bejna wan çandiniyan li ber baê hinik û kêmhêz de, mina pêlên behr û deryan dıhatın xuyakırın û ew pêşdariyê dilê



mırov şadıkır. Mırov nedıxwast ku lı nav ew pêşdariyê de derkeve.

Kurdên Dêrsım "Newroz" ji pıroz nedıkıřın, navê Newroz'ê lı zarokên xwe dıkıřın, balam cejna xwe a Netewi birkırıbûn, ew cejna bı şıkleki dın û motifên Oli va pıroz dıkıřın, roji dıgirtın, ew roji ji, şerteki Oli dıhesıbandın. Jı xwe ra dıgotın "em İslamın" balam şert û şürtên İslami ji nedıanın cıh. Wana roji a Remezan ji nedıgirtın nedıçûn mızgeftan û hec, avdest girtın û nımêj kırın nedızanıbûn. Dgotın "nımêja me hatiye kırın, avdesta me ji hatiye girtın, em çüyına hec ji napejırının". Lê her çıqas ku hukma Romê jı bona ev birûbaweriyên Elewiyan hewl daye ku cıvaka Elewi-xesma Kurdên Elewi-şert û şürtên İslami bınnın cıh, balam qet kêr nekırıye, ew rewşa bı taybeti lı herêma Dêrsım û lı gelek bajarên Kurdıstan de, wek Erzurum, Erzıngan, Çapaxçur, Qers, Xarpit, Meraş, Meletıye û Adıyaman'ê de hatiye parastın. Çıto ku wana şert û şürtên Ola İslami neanına cıh, her usa wana pırozkıřına cejna xwe a Netewi ji, jı xwe birkırıbûn, agırê "Newroz" danedıdan, mıtołoji û naveroka cejna xwe nedızanıbûn. Lewra avakırına dıbıstanan lı Kurdıstan de nemabû, gel bêt xwendın, perwerde û zanyarı lı tarıyêde mabû. Yên ku dıroka xwe û hêjayıyên gelê xwe dızanıyan, "Newroz" bırnekırıbûn, ew ji lı hukma Romê dıtırkıyan, qet dengeki wan dernedıket, mesele û rewş jı gelra dengnedıkıřın.

Rojek sayı û germ, xweş û tav bû. Rêwanên gund û bajarın çübûn rê'ên xwe, hemû kesan taşte û xurnıya xwe xwarıbûn. Gundıyan zıkên pez û dewarên xwe têr kırıbûn. Kal û pırên gundê Torût'ê derketıbûn pêşıya derıyan, lı bıne diwar û sıvıngan de rûnıştıbûn, pıştıa xwe dabûn diwaran, xwe germ dıkıřın, hewa ê xweşık helmjın dıkıřın, lı ser erdê de daxme dıleyızıtın û hedûra xwe dıanın.

Lı wi zemani de daxmeyên gelê Kurd erd bû. Kesên ku dıxwastın daxme bileyızın, wana bı darıkeki va, an ji bı kevirêki va, şanzdeh xet lı ser erdê de xêz dıkışandın û ji xwe ra daxme çêdıkırın, bı darıkên şıkesti va, an ji bı kevirên pıçûk va dileyıztın. Gundiyên gundê Torût'ê ji, lı wê rojê de werge dıkırın û hedûr û kêfa xwe bı wê leyiztoka daxmê va dıanin. Xortên gund ji derketıbûn ser pıšta xaniyan lı nav xwe de kaw û gow dileyıztın. Qirin û hawariya xortan dengvedan dıda çiya û zımagê hember gund.

Lı wi zemani de leyiztokên zarok û xortên Kurd û Kurdistan, ne weka leyiztokên zarok û xortên welatên Ewrûpi, welatên pêşveçûyi û şareza bûn. Zarok û xortên Kurd û Kurdistan qet leyiztokên nûjen nedıtıbûn. Leyiztokên wanên heri nûjen tenê kaw bûn. Kaw ji, ji bona zarok û xortên Kurd û Kurdistan, mına zêrên zer hêja bûn. Kawên kujan zarok, an ji xortê Kurd zêde bûn, wi kesi xwe lı nav heval û hogirên xwe de, xwe dewlemend dıhesband û xwe zor qure dıkır û ji hevalên xwera bı taybeti usa dıgot "kuro lı mın bınhêre, bı sedan kawên mın hene, ma ên te çend tene û çıqasın ?". Bılı leyiztoka kawan, çelik, dıdarûdê, xalojın, çavgırtık û xwe veşortık ji hebûn. Gow ji bı taybeti bı paç û rısanva çêdıkırın û lı ser pıšta xaniyan de bı kefên destên xwe de dıdan lotıkandın û hejmar dıhêjmartın, kê ku zêde hêjmart û gow lı dest xwe de nerevand û lı ser erdê de lı xwe durnexist, wi kesi ew leyiztoka qezenc dıkır û ew kesa pısporê wê leyiztokê dıhat hesabandın. Veşartok û çavgırtık ji, lı axur û kadinan de, lı malan de, çelik û dedarûdê lı derva ser rıyan û lı ser pıšta xaniyan de, xalojın ji bı çoan, lı ser berfê de dıhat leyiztandın.

Mêr, kal û pirên gundê Torût'ê, lı pêş deri, bınê sıvıngan û diwaran de werge rûniştıbûn lı nav xwe de ketıbûn hındırê leca leyiztoka daxmê, lı hev dıxeyidiyan û hesûdi dıkırın. Keseki qet nedıxwast ku bınkeve û leyiztokê wenda bıke. Kê ku weda dıkır û bındiket, ew bı dılda berxwe diket, hêrsa xwe radıkır. Bı taybeti lı gund de çend kes hebûn, ku wana qet wendakırın nedıpejırandın, bıketın jı xwera dıkırın mesela xesiyetek heri mezın, carna ji şer û pevçûn derdıxıstın. Jınên malên hev nêzik ji, lı mala Eli ê Hamê de kombûbûn, lı nav xwe de qal û behsa mêrên xwe û derd û kulên xwe dıkırın, gılı û gazincên xwe jı hevûdura dıgotın. Hınekan teşi dırıstın, lı ber diwêr û pencıran de dısekınıyan û lı der dınhêriyan. Hınekan ji gore, lepık, doxın û keji çêdıkırın. Çendekan ji qulên kincên xwe pine dıkırın, dûrın dıdûran. Keçıkên gund ji lı mala Reşo ê Senemê de kombûbûn lı nav xwe de ketıbûn hındırê gotûbêjan û galegotan. Kê qal û behsa lehengên bêtırs, kê qal û behsa sevkanên ku lı şer û cengan de mêrxwasyên mezın dabûn temaşekırın û ketıbûn dirok, kê ji gotın û negotınên nebaş, zem û dema keşan dıkır. Pışti ew gotûbêjan, guftûgoan û galegotan de, keçıkek nav Xwaskar lı şûna xwe de rabû û rojev a wê atmosferê guhêrand, gılı û gazincên xwe usa ani zıman:

- Gelên hevalan êdi ev galegotana û gotûbêjên usa besın ez bala we hemûyan dıqşınım, hûn hemû qenc bınhêrın sala isal çawa derbaz bû û dıbe ji. Lı destpêka meha Çıriya paşın û heya roja iro lı gundê mede qet jınek dıxwaskan nebû, zarok newelıdın. Mırov dıbêje mêr û jınên gundê me ew hemû hışk û estewr bûne. Salên bıhuri de gelek jınên gundê me dıxwaskan dıbûn, em bı têra dılên xwe lı ser wan jınên dıxwaskan de sê şevan dıleyıztın, dıreqısiyan, dılşa dıbûn. Lê hûn lı isal bınhêrın û mêze bıkın, payız û zıvıstan derbaz bûn, heya roja iro qet jıneki zarokek neani cıhan. Çıqas ku ez dızanım û dıbınım, tenê çend jınên gund lı zarokan de nefsnexwaşın, ez bawerım

ew ji li meha Gulanê de duxwaskan bin û zarok bîwelîdîn, dê û bavên wan dîlşa bîbîn. Lê çawa ku hûn ji qenc dîzannîn, li wê demê de, kar û suxre her zêde dibîn. Lî aliki çinandîna kaxa nav zewiyân, çinandîna giyayên zozan, mêrg û xavan, lî aliya dîn de ji, kîlandîna dewan, çêkirîna toraq û pêneran, nihêrandîna dewar û pezan mirovan zor diwestine û mirov nîkaribe, ku bîçe wan şevan û li jinên duxwaskan bîpê û bînhêre, bîreqise û bîleyize. kêf bîke û dîlşa bîbe, got û dengê xwe bîrand.

Belê, ew adet, tore û kevneşopiyên gelê Kurd bûn. Kurdên Dêrsîn ew kevneşopiyê xweyên bav û kalan birnekirîbûn ew sîpartinên bav û kalikên xwe diparastin. Wexta ku jinîkek li zarokan de duxwaskan dibû, zarok diwelîdiya der û cinar ji bona arikariyê diçûn mala wê jîna ku duxwaskan bûye, zarok aniye cihan. Lî wê malê de komdîbûn, ji jinîka nexwaş ra "xwaş derbaz be, em li Xwedê xwaşî û qenciya te dixwazîn, çavên te ronî bin zarokeki te hate cihan" diçûn. Xêncî jinîka nexwaş, her usa ji, ew pêşniyaz ji hemû neferên malê û mêrê jinîkê ra ji dihatin gotin.

Lî herêma Dêrsim de, keç û xortên Kurd bî taybetî li hêviya wan rojên duxwaskaniya jinan de dîman. Lî rojên werge de, keç û xortên gundiyan, ji bona sê şevan, piştî ku roj diçû ava, li mixurba êvarê de kînc û kolên xweên rengin li xwe dikirîn, xwe dixemilandin û diçûn mala ew jîna ku duxwaskan bûye, li wê jinîkê dipan, xîzmet û azeta wê malê bî awaki hevkarî û bî hevra dikirîn, dûra ji govend diçûn, diçûn qîsîyan û dileyîztin, kîlamên xweşik distirandin, qeşmeriyên cûre-cûre temaşê a wê jinîka duxwaskan, mivanên wê malê û hemû neferên malê dikirîn. Xort û keçan li nav wan kar û berên dîlşabûnê de, carna ji navber didan govend û stranên, despêka leyîztokên bî

kenok û qeşmeriyan dıkırın. Hın keç û xort lı nav xwe de çavgirtık, veşartok dileyiztın. Hınekan ji dev, rûyên xwe bı teniya pıxêrîga ağır, an ji bı teniya sêla nan patinê va reş dıkırın, dibûn mina mıroveki reşık, ango zengi. Hın xortan ji, bı hêriyê ji xwera rih çêdıkırın û xwe dıkırın dılqê kaleki rih sıpi, bı wi şıklı va qeşmeriyên xweşik didan temaşekırın, hemû kes lı wan dıkeniyan û kêfxwaş dibûn. Armanca wan leyiztok û qeşmeriyan ew bû, ku jınıka duxwaskan, kesên dorbera wê û neferên malê kêfxwaş bıbın û hedûra wan binın, ku ew ji nekevın xewê.

Xêncı ev adet û toran, wexta ku jınıkek dıket ber bırıyan, duxwaskan dibû, lı destpêkê de gazi pındepireki û jınên gund dıkırın. Ku pındepir û jınên gund bên û hemû bı hevra lı wê jınıkê ra arikari bıkın, bûk û jınên cıwan kar û berên pındepiriyê fêr bıbın, lı pêşerojen de kar û berên pındepiriyê ew binın cih.

Hemû jınên gund, lı tev pındepirê lı dorbera ew jınıka duxwaskan de komdibûn, ta ku jınık lı wi gitê mezın felat bıbe û pıtık nemire. Çawa ku pıtık dıhat cıhan, pındepirê bı baldari hevalçûka jınıkê jêdıkır û tasek xwê ji dıani, ew xwê a bı destan va lı ser bedena wi, wê pıtık de dıpijqand û belav dıkır, xwê canê wi pıtiki, pıtıka belengaz dışewı-tand û pıtık dıkır qire-qir dıgırıya, ha dıgırıya. Pıştra ji hınek xalı dıkır ser sêla nanpatinê, ew xalıya piçek dıqewı-rand, dûra ji ew xalıya lı ser paçeki de radıxıst û pıtık dıkır nav wê xalıyê û wi paçi, werge pıtık gırêdıda, dınxı-mand û dıbir lı kêleka nivin û doşega dayıka pıtık de dadıani ser bêjıngeki, an ji seradeki, keleyê xwe ji lı wi pıtiki dıbrıya û dadıgerıya ciheki dın, lı wê rûdınışt û hêsa dibû.

Lı wi zemani de lı hemû gundên Kurdistan'ê û lı he-rêma Dêrsım de qet pındepirên ılmı û bıjıjk tunebûn. Ew karên bıjıjk û pıdepiran, jınên Kurdan bı xwe dıanın cih. Wan jınan ji, lı rojên werge de, ya ew jınık û pıtık lı wi gitê gırıng de felat dıkırın û yan ji bı karên kevneyari û

nezani va ew herdu canana dıkuştın û jı wê cûra mırınêra ji "fermana Xwedê" dıgotın. Jı bona hemû celeb nexwaşyan, kul û birinan ji, her usa rewş werge bû. Ne bijjkek hebû û ne ji dermaneki zanısti. Êdi her tışt mabû lı ba Xwedê û destê Xwedê. Xwedê ji, jı bona wi geli her tışt bû. Ew lı mêjoê kesên Kurd de felatkareki mezın, xudan ram, xudan meramet, dost û yarê hejar û belengazan bû. Ew lı rojên tengasi de ligel hejar, belengaz û dılpakan de bû. Dostê Îslaman, dijminê xeyri Îslam, kafır û mınafıqan bû. Bı rasti ji ew baweriyên wısa lı nav gelê Kurd de zor gıran û zor qewın bûn û lê bêt guman ew rewş heya roja iro ji xwe lı nav gelê Kurd de dıparêzine.

Pışti qedandına kar û berên pındepirê, kesek dıçû mızgın dıda mêrê jınıka duxwaskan, jı mêrik ra "çavên te ronı bı, keçek, an ji kureki te hate cıhan, ez diyariya mızgina xwe dıxwazım" dıgot. Bavê zarok ji, lı gor rewşa aboriya mala xwe, qasa hêza xwe diyariyek dıda wi kesi. - Pışti roja yekem de, hemû jınên wi gundi, jı bona wê jınıka duxwaskan û neferên wê malbatê, xwarınên cûre-cûre, xwarınên zor xwaşık dıpatın, çêdıkırın û dıbırın mala jınıka duxwaskan. Minak : Wek Sıra kutai, Keşke, Zerfet, Xaşıl, Herire, Qawût, Nanê tawê û hwd çêdıkırın, dıbırın. Ew adet û tore ji, jı bona armanceki bû. Ew armanc ji ev bû: Lı wê malê de jınıkek duxwaskan bûye, nexwaşe nıkarıbe kareki bıke, nıkarıbe rabe serxwe jı zar û zêçên xwera û neferên malê ra naneki, an ji xwarıneki çêbıke û bıpêje, xwin wenda kırıye, dıvê jınık xwarınên bıhêz û qenc bıxwe, hêza xwe bıstine, neferên wê malê bırcı nemın, hevceyê kesi nebın û hwd.

Lı nav wan sê şevên şahı û dilani de, bı taybeti tenê jın û keçên gund dıçûn ligel wê jınıka duxwaskan de dıman û lı wê jınıkê çavdêri dıkırın û dıpan. Çûyına mêran ne keys bû, ew eyıb dıhat hesabandın. Keç û xort ji, hum jı bona şahı û dilaniyê dıçûn, hum ji, jı jınıkê û malbata jınıkê ra dıbûn arıkar, xızmet û azeta wê malbatê dıkırın.

Belê, keçên gundê Torût'ê rûniştîbûn lı nav xwe de ketîbûn zîkê mitalayên werge, gengeşiya hezkiriyên xwe û henekan. Lı nav xwe de dixaftın û dîkırın teqe-teq dîkeniyan, hezkiriyên xwe jı hevûdura eşkere dîkırın.

Lı gundê Torût'ê de miroveki heri hejar, balam xudan ar û namûs hebû. Lê miroveki dest teng, bêt ax û bêt mîlk bû. Neheqiyek mezın hatîbû serê wi, meri û meristanan pişti mırına bavê wi de, hemû erd û axa wi dagirkirîbûn, lı ser navê xwe de jı tapû derxistîbûn, ew kesa bêt ax û bêt mîlk hiştîbûn, bêbextiyek mezın anîbûn seri wi kesê bêkes. Navê wi hejarê Kurd Xıdır bû, jı wira "Xidê Naxırvan" dîgotın. Jı ber ku wi lı gund de naxırvani dîkır, pez û dewarên gund dîbır dîçêrand. Jı bona wi karê wi jı, gundiyan navê wi danîbûn "Xidê Naxırvan". Xid lı darê cihan de xudan xwişkeki bû. Navê xwişka Xidê, Xeycan bû. Xeycan keçek azew û bedew ligel birayê xwe de bû. Xidê û Xeycanê lı zarokatiya xwe de, dê û bavên xwe wenda kirîbûn, sêwi mabûn. Pişra Xid bı keçek meriyê xwera zewici bû û bûbû xudan du kuran. Navê jına Xidê, Melek bû. Navê kurên Xidê, ê yeki, disa navê bavê Xıdır, ê piçûk jı, nav Hesên bû. Kurê mezın heft-heşt salni, ê piçûk jı lı dergûşêde bû. Ango lı navbera du biran de ewqas sal hebûn. Lewra çend zarok lı ber Melekê çûbûn, lewma ewqas sal ketîbûn navbera wan herdu biran. Xid û jına wi Melek, lı eşira Bextiyaran, meriyên hevbûn. Melek'a jına Xidê xudan dê û bav, xudan sê biran û xwişkeki bû. Bav, dê û birayên Melek'ê zûva mala xwe barkirîbûn çûbûn lı gundeki bajarê Xarpit'ê de ciwar bûbûn. Du birayên wê'ên mezın, bı taybeti lı demên havinê de, carna dîçûn lı karên kelpiçan û çêkırına avayiyân de, carna jı lı karxwaneyên acûran de dîxebitiyan û jı bavê xwera dîbûn arîkar û dolıwa malê peyda dîkırın. Birayê

piçûk Aliekber ji dîçû dibistanê dîxwend. Aliekber kureki bîaqıl, jir û jêhat bû. Ew her sal li dema betlane a salê, ango betlana dibistanê de, li tev du birayên xwe dîçû kar dîkir û xerclîxa xwe a dibistanê derdîxist, ji xwera pirtûk, lînûsk, pênuş, kinc û kol dîkiriya û ji bavê xwera werqas nedîbû bar, serda ji dîrav dîda bavê xwe. Aliekber li dibistanê de, ji bona bîaqılbûna xwe, jir, jêhati û xweş-mêriya xwe, pîrr ketîbû çavê mamoste ê xwe û midûrê dibistanê. Bî taybeti mamoste Aliekber zef hezdîkir. Wi dîxwast ku şagirtê wi Aliekber dibistana ewlin bî serfirazi kuta bîke û bîçe dibistanên bîlind û zanîngehan de bîxwîne, li pêşerojan de bîbe miroveki zana, pîspor û qedîrbîlind, li nav gel de bête hezkîrîn. Mamoste bî xwe ji Kurd bû. Hum ji Kurdeki pêşverû û Niştumanperwer bû. Wi li dibistanên Tîrkan de xwendîbû, balam wi qet hisên xweyên Netewî û Kurdperwerî ji xwe birnekirîbû, Kurdperwerîya xwe qenc parastîbû û bî bêtîr ew li doza gelê xwe va hatîbû girêdayîn. Ew baş tégîhiştîbû û wi qenc ji dîzanîbû ku, Kurdistan bî bêt şiyarbûn, bêt zanai, bêt perwerde û bêt xwendin, bêt rêzani û pîspori, bêt birûbawerî û bêt tevger Rîzgar nabe, li bîn ling û destan de naye felatkîrîn. Ji bona ev rewşê ji, wîna hewl dîda ku, xortên mîna Aliekber bîelmine, perwerde bîke wana bîde xwendin, rewşa welat û cihanê li wan bîde zanin, wana serwext û şiyar bîke, bîke şervanên xwendinê û şervanên doza Kurdistan.

Pîrr caran mamoste li piştî şiv xwarinê de dîçû mala Aliekber, ji wîra arikarî dîkir, ku ew bêtîr bîxwîne, fêre bûyer û meselan be, cihanê qenc nasbîke, bîbe xortekî serwext, ronakbîr û rewşenbîr. Mamoste ew kara ji xwera kirîbû sereta û armanc, bêt westan dîxebîtiya.

Bavê Aliekber ji kalekî herî maqûl û kamîl bû. Wi ji li kûçeyên Xarpît'ê de barkêşî dîkir û carna ji dîçû gundan mişagti dîkir, giya û das dîçîniya, kêlandî dîkişand dolîwa mala xwe peda dîkir, ku hewceyê kesekî nebe. Bî taybetî li

demên zivistan de, ew sibe-sibe li xew de zû radîbû, se-
merê xwe ê barkêşi diavit ser pişta xwe, benek ji dîkir
destê xwe û diçû bajêr li kar dîgeriya û dîxebîtiya, kalê
hejar û belengaz gelekî ji diwestiya.

Diya Aliekber ji, jîmek herî jîr û jêhat bû. Ew her tîm
yar û hevparê mêrê xwe bû, jîmek biaqil û berpîrsiyarê
malê bû. Wê li hevşe ê mala xwe de, du çêlek û du mî ji
xwe ra xwedî dîkir, şîrê wan heywanan didoşa dîkir mast
ew masta ji, sibe-sibe dida mêrê xwe û dişand sûka Xar-
pît'ê, ku bîfroşe, jî mesrefa malê ra çend qurîşan derxine.
Mêrê wê ji ew masta dîgirt dîbir li firotxana-dîkan-Husên
efendiyê eşîra Pilvankî, dîfirot Husên efendî ê Pilvankî.
Husên efendî ê Pilvankî ji, bî rasti miroveki welatparêz,
dîlsoz, mêreki herî çeleng û sîpehî bû. Li dilê wîda ji agirê
welatparêziyê gurr bûbu.

Aliekber carna ji, bî taybetî li demên betlana dîbistanê
de diçû gundê Torût'ê û mala xalanê xwe. Ew bî zêdeî li
mala zava û xwişka xwe Melek'ê de duma. Wî xwişk, bûra
û xarziyên xwe pîrr hezdîkir. Melek û Xîdê ji werqas li wî
hezdîkîrîn, jî wîra dîbûn heyran, qurban. Jî ber ku ew
bîra û bûra ê piçûk bû, diçû dîbistanê, dîxwend, hîm ji ew
kureki herî biaqil, jîr û jêhat bû. Bî taybetî Melekê pîrr
dîxwast, ku kurên wê ji mîna xalê xwe biaqil, jîr û jêhat
bîn, ew ji li pêşerojan de bîçîne dîbistanan bîxwînin û
bîbîn kesên zana, pîspor û qedîrbîlînd. Aliekber ji, ew
hisên xwişka xwe qenc dîzambû. Jî bona ew ji, ew her tîm
jî xarzi ê xwe Xîdê piçûk ra mijûl dîbû, li tev wî rûdînişt û
şîret li wî dîkir. Aliekber jîyana gund ji baş hezdîkir. Wî
pîrr caran dîxwast ku li tev zava û xarziyê xwe va bîçe ber
naxîra pêz û dêwêr û diçû ji. Wî rewşa gundiyên Kur-
dîstan zef xîrab dîdit. Nezani, hejar û belengazî li nav gelê
Kurd de her bîlînd bû. Gundiyên Kurdîstan li nav xîzani-

yê de, lı bın dest û bandûra dijminan de dijiyan, destengi û neçari dikişandin. Lı aliki zılm, zor û sitemkariya dijminan, lı aliya dın de ji kedxwari, neheqi, birûbaweriyên Oli, ewên bêt bingehin ghiştibûn derecek heri bılınd. Ji bona ew sitemkariyan, ji bona ew hurafa û birûbaweriyên bêt bingehin, mamoste ê Aliekber, pırr caran lı tev Aliekber rûdinişt lı ser rewşa Kurdistan, lı ser zılm, zor û sitemkariya dijminan, lı ser ew birûbaweriyên bêt bingehin, ji Aliekber ra dixişt, şiretên qenc lı şagirtê xwe dıkir. Ew mamoste ji Aliekber ra usa dıgot:

- Aliekber, bınhêre kurê mın, navê mın û te navê Ereban. Navê te Aliekber, ango navê hezreti Ali. Navê me Kurdan, sedi nod neh, navê Erebane Nızam Hesên, Husên, Mihamed, Cafer, Kazım, Zeynel, Omer, Osman, Bekır, Mıstefa û hwd. Navê jinên me disa bûna Eyşe, Fadime, Emine û nızam çı û çı. Bı kurtasi em ji Ereban zêtir bûne Ereban. Me riya xwe wenda kırıye, me esl û qewmê xwe birkırıye, lı du birûbaweriyaya Ereban, lı du Tırk û Faris'an ketine. Bı taybeti me hezreti Eli ji mera kırıne Xwedê, ew kırıne afrandêre-yaratıcı-ev cihanê. Gelo tu dızani hezreti Eli lı jiyana xwe de çıqas Kurd kuştine?. Hezreti Eli, bı şûrê xwe ê nav"Zulfıqar"va bı hezaran serê Kurdan, ango serê bav, bapir û kalikên meyên berê jêkırıye, bı zora şûrê xwe, Ola İslam lı Kurdan daye peji-randin û Kurd lı bın şûrde bûne İslam.

Pışti mırına Mihamed de ji, hesûdi û dubendi kete nav Ola İslam. Ew dubendiya ji, dubendiya paldank'a Xelifetiye bû. Serokên dewleta İslam bın dijên hev, lı nav wan de şer derketın, xwin hate rijandin. Ew gelên ku bûbûn İslam ji, ew ji bûn aligirê wan dubendiyan, xwina wan ji hate rijandin, bı sedhezaran telef bûn, hatın kuştın. Ew dubendiya Xelife'ên Ereban, dubendiyên Ola İslam kete nav gelê me ji. Gelê Kurd ji bû aligirê wan dubendiyên İslami û Xelife'ên İslam. Bı gotinek dın, gelê Kurd ji bû aligirê Eli, Mihamed, Omer, Osman, Ebûbekır, Mawiye û Yezit;

lı şeran de hatın kuştın. Lı dewra Xelife Harûni Reşit de
 ji, mesebên Îslami derketın. Lê gotın ku lı cih da be, lı
 nav Ola İslam de, cara yekemin Partiyek siyasi, hate da-
 mezrandın, İmami Henefî bı zorê kırım serokê wê Partiyê.
 Pışti Partiya yekemin, Partia Şafî i, Maliki, Hembeli ji
 hatine demazrandın. Alagirên hezreti Eli ji, jı xwera Parti-
 ya Caferi sazırın û kurê Zeynel Abidin, Caferi Sadıq jı
 xwera kırım serok. Bı damezrandına ev Partiyen de, duben-
 diyên Ola İslam her zêde bûn, Kurdan ji lı nav wan
 dubendiyen de cihên xwe girtın û bûn hevparê dubendiyên
 Ereban û Xelifeyên Ola İslami. Lı zikê zeman de, jı wan
 çar Partiyen re "Sunni" jı Partiya İmami Caferi ra ji "Şii"-
 alıgıran ra ji "Ehlibeyt" gotın. Jı bona ew dubendiyên Ola
 İslam, bı taybeti lı dewra İmparatoriya dewleta Osmanlı
 de, bı qesti Kurd kırım dijminê hevûdu. Kurdan jı bona
 wan mesebên Ola İslam û Ereban, xwina hevûdu rijandın,
 bûn dijên hev bı deh hezaran kes hatın kuştın, bıran
 xwina hevûdu rijandın, dilê dijminan dan şakırın. Heya
 roja iro ji, lı gelek cihên Kurdistan de ew dubendiyana
 berdewamın. Sedemê ey dubendi, xwin rijandın ji, axa,
 mir, şêx û seyidên me, ewên derewçin, hevparê dijminan
 û kedxwarên mezının. Ew jı bona berjewendiyên xwe bûne
 hevparê dijminan, ew lı tev dijminan kar dıkın, ew qet
 naxwazın ku gelê Kurd ji şiyar bıbe, dijminê xwe bıbine,
 dost û dijminê xwe nasbike û lı hev cûda bıke. Lı ser doza
 xwe a evrar-kutsal-serwext û agadar bıbe. Ew qet nax-
 wazın coleg û murûden wan bıxwinın, hişyare pırsan û
 pırsgirekên xwe û gelên xwe bıbın. Lı doza Kurdistan
 xwedi derkevın. Bawerke kurê mın, bı rasti, ew ku ev bê-
 bextiyen û derewan jı gelê xwera nekın, ew ku jı dijminan
 ra nebın heval û hevpar, ew ku lı pêş Rızgarbûna Kurdis-
 tan de nebın asteng, gelê me zû şiyar dibe, welatê me
 Kurdistan ji, lı bin dest, ling û bandûra dijminan de felat
 dibe, gelê me ji dibe mina hemû gelên şareza-uygar-şar-
 weri-medeni-û lı ev cihan de şûna xwe dıgire. Lawê mın,

diroka me pırr kûr û kevne, her dewlemende. Gelê Kurd sîtûna "Mezopotamyayêye". Bav û kalikên me gelek tiştên heri qenc pêşkêşe ev cihan kirine. Lê sed heyf û sed mîxabın ku li piştî derketina Ola Îslam û barbariyên artêşên Ola Îslam de, ew tiştên ku em li ev cihanê de didan naskirîn, bî taybeti wek diroka me, zuman û çanda me hemû betal kirin, şêlandin, şewitandin, welatê me talan kirin kurê min. Ola Îslam bî ev ji nema, em kirin xulamê mileteki wek Tirkên xwînxwar, Tirkên Gurgewr, Faris'an. Ereben qûmîstanan, ewên har û hov hatin Rojhûlata Navin, em kirin ev rewşê...

Li meha Adar û Avrîl'ê de, li pırr cihên Kurdistan de, berf geleki tê xuyakirin. Bî taybeti li cihên bîlind de, li ser çiya, tap û kendalan, tırr û baxirên asi de, berf belek-belek dibe, mina rengê reş û sîpi tê xuyakirin. Li destpêka biharê de, xesma baran hêj bêtir zêde dibare, lehi û lesar hiltên, baran û tava rojê berfê dihelinin. Cihên ku berf tava rojê nabine û nayên helandin, li binê siya çiyên de, an ji li cihên heri bîlind de dîminin, ew ji, li rojên sayî, bî tava rojê de, her diburuqin û mirov nikaribe ku li wan cihên berf bînhêre. Lewra tirijên rojê xwe didin ser berfê, berf li hember çavê mirov dibe mina hêliyeki, ango neynîkeki. Wexta ku mirov ji li wan cihên berfê dînhêre, çavên mirovan diêşin, histêr li çavên mirov de dibarin.

Li demsala biharê de, li binê tûm û kaşan, quntera çiyên de, derên nîzm û li şûnên ku berf têne helandin, li ser deşt û dûzan de, giya hêşin dibin, Gul û Sosin, Bînevş û Belgîzar, Nêrgîz û Reyhan, Beybûn û kulilkên rengin, çiçegên cûre-cûre, pelên xwe'ên rengin, zer, sîpi, sor, pembe û çeqır vedikin, wan deşt û kaşan, tap, tûm û kortan, çiya, kendal û baxîran dixemlinin. Bî taybeti nêrgîzên rengin li ser kevîrên ase û bîlind de, bî rengên xweyên

xweşik va, pêşdariyeke bêt salıxdan dıdın Kurdistanê. Cihan lı nav bihna wan çiçegan de dımıne, mırov mest û sermest dıbe. Lı aliya dın de ji, çırpozên ceh û genıman, çewder û nıskan, giyayên mêrg û xavan, gaz, tat û zozanan hêdi-hêdi bejn bıınd dıbın. Lı ber ba'ên hınk de dıhêjun, mina pêlên behr û deryan vırde, wırde dıçın û tén. Ew hêjandına wan şınaiyan dilê mırov şên û cıwan dıke. Lı wan demên bıharê û lı destpêka havınê de gelê Kurd -ku dijminê bêbext mecal bıdexwe lı zıkê bıhiştê de dıhesıbine, dijminê xwe û hemû derd û kulên xwe, jı xwe bırdıke.

Wext nivê meha Gulanê, hewa ji geleki germ derbaz dıbû. Rengê ceh'an êdi hatıbû guhartın. Jınên Kurdan sıbê de zû rabûbûn destpêka kar û berên xwe dıkırin. Dew dıkan, lı pez û dewarên xwe dınhêriyan, xwarın dıdan heywanên xwe, lı benda şıvanan de mabûn, ku şıvan hewl bıdın, zû lı xew rabın, pêz û dêwêr bıbın bıçêrinın. Balam şıvan bı hêsai lı xewê de ranedıbûn, jı cıwanan ra xew her şırin bû. Mezinên malan şıvan bı zorê lı xewê de radıkırin, ku bışının ber pêz û dêwêr, balam şıvanan nedıxwastın ku lı şûna xwe de rabın serxwe. Dıgotın"hewa hina tariye, wext zûye, bısekının cihan ronahıbe, dûra". Lewra lı wı zemani de, seat û salname qet lı Kurdistanê de nedıhatın dıtın. Seatên gelê Kurd dengê dıkan, salname ji hıv bû. Wexta ku lı berbanga sıbê de dıkan bang dıkir û qire-qire wan dıhat bıhistın, dıgotın"êdi dema sıbê destpêkır, divê em zû rabın, lez bıkın, bıçın kar û berên xwe, pez û dewarên xwe bınhêrin, xwarın, vexwarınê bıdın pêz û dêwêr".

Salname û hejmartına mehan ji hıv bû. Wexta ku hıv lı destpêka muxurba êvarê de, lı aliya Rojavê de mina devê

dasa çandîniyan dihat xuyakırın, disa dıgotın"êdi ev meha ji derbaz bû, meha me a nû destpêdike".

Bı taybeti lı herêma Dêrsım û lı gelek cihên Kurdistan de, gelê Kurd, wexta ku lı muxurba êvarê de lı aliya Rojavê de hiva nû derdiket û weka devê dasê dihat xuyakırın, wexta ku sibe-sibe roj hildihat, gundiye Dêrsım derdiketin der, diçûn ber ava kani û çirtikên cokên avan, lı hember rojê dest û rûyên xwe dısoştın, lı rojê dınhêriyan, mistên destên xwe vedıkırın, sılaweta xwe dianin. Kesên ku lıgel hev bûn keleyên xwe lı hevûdu dibiriyan, zarok diçûn destên mezınên xwe maç dikırın, mezınan ji çavên wan. Dûra disa lı ser lıngan dısekıniyan, dest û mılên xwe vedıkırın, çı nêt û fêlên ku lı dilên wan de hebûn, lı hiv û rojê daxwaz dikırın. Dıgotın"ya hiva Zeri û roja Zeri, hûn ji mera werın ramê, me lı ev hejari, belengazi, desttengiyê de felat bıkın, çavên dijminên me kor, dilê me û dilê dostên me ji şabıkın". Xêncı ev gotınan disa gelek tiştên dın ji dıgotın. Ev birûbaweriyên usa lı nav gelê Dêrsım de zef qewin bûn. Lê ew ji bêt guman lı Ola wanên kevn de dihat. Ew birûbaweriyên Ola"Zerdeşt û Êzidi"bûn. Gelê Kurd her çıqas ku Ola İslam bı zora şûr û kuştınê de pejırandıbû û bûbû İslam ji, lê disa ji ew adet, tore û kevnêşopiye Ola xwe a kevn, ên bav û kalikên xweyên ağırperest birnekırıbûn; wana ew birûbaweriyên bav û kalên xwe kırıbûn ser Ola İslam, werge diparastın û dimeşandın. Heya roja iro ji, gelê Kurd wan adet, tore û kevnêşopiye Ola" Zerdeşt û Êzidi"dimeşine.

Demsal havin, şevê heri germ û fetisok bû. Disa dikan destpêka qire-qirê kırıbûn, diqiriyan û ha diqiriyan. Herkes lı xewa xwe a kûrda bû. Jına Xıdê naxırvan Melek, bı qirin û gazina kurê xwe ê piçûk û dengê dikan de, bı tırs û xofek mezın va hılfiriya serxwe û yekser çû ser hêlaneka

kurê xwe Hesenê piçûk, pêsira kêrasê xwe vekır berên xwe anin der, serê çîçikê xwe xwast ku bıke devê Hesen, Hesen bımêjine, nişka ve temarên çavên Melekê kırın pite-pıt, mecal lı Melekê bırandı. Melekê bı desteki va çîçikê xwe kıre devê Hesen, bı destê xwe ê dın va ji, destpêka mıstandına çavên xwe kır. Lê wê her çiqas ku çavên xwe mıstandıda, werqas ji êşa çavên wê zêde dıbûn. Te dıgot"çavên wê bı isota tûj va tıji kırine". Ew qas diêşıyan, jan dıdan ku, mecal lı Melekê de nedıhiştın, Melekê nedıkarıbû ku lı şûna xwe de bısekıne. Jan û êşa çavan hêz lı joniyan Melekê de şıkandıbûn. Bı wê rewşê va ji, wê lı aliki kurê xwe dımêjand, lı aliya dın de ji, dıkir ahx û ahx dıgiriya, gazi Xwedê dıkir, dıgot"Xwedê o tu jı mııra were ramê, mı lı ev êşê felat bıke". Lê ew bêt havıl bû, qet çu keseki giri, qırın û gazincên Melekê nedıbihıst.

Lı ber ahx û ahx, of û ofa Melekê mêrê wê Xıd lı xewa kûr de hişyar bû. Xıd çıto ku qırın, giri û axına jına xwe dıt û bıhist, lı nav nivinê de, deng lı jına xwe kır û jı jına xwe Melekê ra:

- Keçê çı hate serê te? Lı te çı qewımı? Ma te xêre çıra tu usa dıgiri û dıki ahx û of?. Lı herêma Dêrsım de, mêr jı jinên xwera keçê, an ji qizê, jin ji, jı mêrên xwera lalaw dıgotın. Pırr kê m jin û mêr navê hevûdu hıldıdan. Nav hıldan eyib dıhat hesabandı. Lı pêy pırsa Xıdê, icar Melekê:

- Welleh ez ji nızanı m lı mı çı qewımı, çı hate serê mı, ev êşa çı êşe. Tıştê ku ez dıkarıbım jı tera bıbêjum ew ji ev e ku ez lı ser qırın û gazına Hesen de hişyar bım û rabım serxwe hatım vıra, ku ez Hesen bı mêjinım, zıkê wi têr bıkı m û dengê wi bıbırınım û disa ez wi bıkı m xewê, nişka ve hemû ranên, ango temarên çavên mı kırın pite-pıt, hêz û mecal lı mı de bırandı, teqat lı joniyan mı de neman, jan xwe dıde dıl, kezew, pışik û fırsıka mı. Bawer ke, ez dıbêjum naha ronahiya çavên mı têne der. Lê ez ji nızanı m ku, ev jan û êşa lı ku tên, lı mı çı qewımı û çı hate

serê mîn. Jî bona rewşa Melekê, Xîdê usa bersiv da jûna xwe û got:

- Delala mîn, evina dilê mîn, tu qet metirse, evqas meke qirin û gazin, megire; ez hêvi dikim ev êşa çavên te bî fermana Xwedê, pişti çend hûrdeman de, -dakika-wê bête sekinandî û tu hêsa bibî. Ez bawer nakim ku ew nexwaşiya çavan were te bibine, berxwe mekeve û xwe kip bigire.

Melekê qet tewat nedikir û dengê Xîdê jî nedibihist. Lî şûna xwe de nedikaribû ku bisekine. Lî nav malê de dimeşiya, dihat û diçû. Dûra dageriya ser mêrê xwe, jî mêrê xwe tîka kir û usa got:

- Tu bî kerema xwe lî van çavên mîn binhêre, gelo nebe ku toz-moz, simên bijeng-mijeng û porên mîn bîkevî çavên mîn ? Weki dî qet tişteki dî naye bira mîn, ku ez jî tera bibêjum. Neynîk-meynîka me jî tune ku, ez bî xwe lî çavên xwe binhêrîm, te nekîm zametan û hevparê ev derd û kulên xwe. Lî pey gotinê icar Xîdê:

- Lê lê mal avê û mal xêrê, ev çî gotimî tu dibêji?. Ez çawa lî vê tariyê de lî çavên te binhêrîm. Lî ev zulmata Xwedê de mîrov bî qenci hevûdu nabine, tu dibêji were lî çavên mîn binhêre. Ma çito ez lî çavên te binhêrîm û tişteki bîbinîm ? Ronahiya rojê jî, hina destpênêkiriye, tu bî xwe jî dibîni rewşê, hewa hina gelekî tariye, mala me jî mîna şikeftêk çiya ê Cûdi ye. Lê naha ez rabîm çirê vêxînim, lî şewq û melûlî a çirê de jî qet tişteki mîna simên bijeng û poran, toz-moz nayên dîtin. Jî ber ku ronahiya çirê kême, tu bî xwe jî, tev hendîk dîzani. Ez dibêjum tu piçekî xwe kip bigire, diranên xwe bigivîşe, pişti seateki felan, ronahiya rojê destpêdîke, wê çawê ez bî qenci lî çavên delaliya xwe binhêrîm, gelo çî lî çavên teda hene, an jî çî lî çavên te qewimiye.

Çavên Melekê wer diêşîyan ku, dev û zîman jî lî Melekê nedîgerîyan. Wê tenê dikîr ahx û ahx, dîgîriya û dîgot"ax a Xwedê lî serê mîn be, vê êşê ez kuştîm, çavên mîn

kor kır. Tırşa mın ewe ku ev êş ronahiya çavên mın birijine, mın lı tariyê de bihêline û mın bıke ber lep û destan".

Lı aliki ahx û ahxa Melekê bû, lı aliya dın de ji, Hesenê piçûk çıçikên diya xwe nedumit, berê diya xwe lı devê xwe de derdixist. Serê xwe lı vırde-wırde dıbir û dıgiriya, dıkir qirin û gazin, mırov dıgot naha can dıde, dımire, dıteqî û dıfetise. Jı bona ew rewşê Melek bı dileki keser û şıkesti, bı hêrs û xışmek mezın va qiriya ser kurê xwe û jı kurê xwera usa got :

- Kurê mın, tu lı mın çı dıxwazi û çı hêvi diki? Xenim û qotık xwaro, bêt mıraz. Ma tu çıra evqas dıgiri? Kuro lı te çı bû? Tu ne şirê berên mın dımêji û ne ji bı hêjandınê haş dıbi. Ma ev derdê êşa çavan jı mınra bes nebû, serda ji ev qirin û gazina te hate serê mın?. Lı dawiyê de Melek bêt havıl ma û bı wê çav êşiya xwe va, kurê xwe lı hêlanekê de derxist, pêçeka paçan dani jêr û destpêka vekırına pêçekê kır. Wê hum pêçeka kurê xwe vedıkir, hum ji, jı xwe bı xwera qıse dıkir. Dúra ew disa lı ser giri û qirina Hesen va, pêçeka Hesen hêjand, hêrsket û usa got:

- Kurê minê delal êdi bese ev girandına te, qirin û gazina te hişên serê mın wenda kırın, hadê ez qurban, sebır bıke ez pêçeka te vekım, binê te paqij bıkı, zıkê te têkı. Kuro heşên mın dıçın, ez nıkarıbım lı ser çokan de bısekınum, êdi ev giri bese.

Melekê Hesen lı nav pêçeka paçan û xaliyê de nıxımandıbû. Wê bı lez û bez pêçek vekır, Hesen lı nav xaliyê de ani der, dit ku Hesen xali hemû şıl kırıye û xali bûye heri û gemar. Hemû çêq û tılorên Hesen lı nav pisaiyê de mane. Melekê bı paçeki paqij va çêq û tılorên kurê xwe bı qenci paqij kır, nûva ew kır nav pêçekê, nıxımand, bı qenci girêda; dúra kire hembêza xwe mêjand û deng lı Hesen temırand û Hesen pêva çü kete xewa kûr.

Lı Kurdistanê de, zarokên hejar û belengazan hemû lı nav xaliyê de dihatın niximandın, lı nav rewşa aboriyek xızan de mezın dıbin. Jı ber ku gel hejar û belengaz mabû. Zarokên Kurdan ew tıştên ku lı welatên Kapitalist û pêşveçûyi de, lı sûk û firotxanan de dihatın ditın û firotın, nediditın. Dayikên Kurdistan wan tıştan lı xewn û xeyalên xwe de neditıbın.

Wexta ku jinên Kurdan lı xwe dihesiyan, ku ew lı zarokan de nefsnexwaşın, diçûn lı binê tırran, newal û kendalan de, ew xaliya ku mina qûmê ye, ew xaliya yan bı bêjingekeki û yan ji bı seradekeki va, bı qenci dadıwıtın, dıkırın çalan, bı pışt, bı kehr û qantıran va dıkışandın malên xwe û dıkırın pêteg û ambaran, heya ku ew lı zarokan de duxwaskan dıbûn, zarok diwelıdıyan, lı wi giti felat dıbûn. Ew xaliya lı pışti duxwaskaniya jınan de, jı bona zarokan, şûna paçên nûjen, ewên ku lı welatên Kapitalistan de, lı sûk, firotxane û dermanxanan de têne fırotan, distine. Lewra hejarên Kurd û Kurdistan paç ji nediditın ku kincên xweyên kevn pine bıkın; ew paçên nû û nûjen lı ku bıdıditana, bı çı û çito bıkıriyana?.

Jinên Kurdan wexta ku lı zarokan de duxwaskan dıbûn, zarok diwelıdıyan, jı bona pıtıkên xwe ew xaliya dıkırın hindirê selıkekeki-bı taybeti sêla nan patinê-bı qenci diqewırandın, dûra ji wê xaliyê lı ser paçeki zexm û qewın de radıxıstın, jı bona çend hûrdeman werge dıdann sekınanđın, ta ku ew xaliya tışteki çêr-germ dıbû, dûra ji wana ew zarokên xwe dıkırın nav wê xaliya çêr-germ dıniximandın, dıkırın pêçek; dûra ji ew pêçekê yan dıkırın hêlanekekeki û yan ji dıkırın dergûşeki, dumêjandın û zıkên zarokên xwe têr dıkırın û zarokan dıkırın xewê. Bı wi şıklıva ji karên xwe diqedandın û dadıgerıyann ser kar û berên xweyên dın.

Zarokên Kurdan lı nav xaliyê de mezın dıbûn, lı ser erdan dıketın xewê û radızıyan. Bı taybeti hejar û belengazên Kurdistan zarokên xwe lı ser erdê û hêlanekan de

dıkırın xewê. Jı lewra nedıkarıbûn jı zarokên xwera dergûşan bıkirin û an jı çêbıkın. Ew lı nav du stunan de, yan jı lı nav cısır û kêhranê xaniyan de, bı weris û şırıtın va, hêlanekan çêdıkırın, zarokên xwe werge haş dıkırın û werge dıkırın xewê. Dergûş çêkırın jı bona malbatên hejar û belengazan, her bıha û zamet bû. Jı ber ku diravên wan tune bû ku ew textan bıkirin, bıdın nacaran û jı zarokên xwera dergûşan çêbıkın, an jı dergûşên çêkırı û amade bıkirin.

Melekê ohxek kûr kışand û got, ohxx lı Xwedê şıkır, ev bêt mıraza êdı kete xewa kûr pêva çû, ez jı lı bela a qırın û gazına wi felat bûm, balam êşa çavên mın natın temırandın, gelo ez çı xaliyê lı serê xwe kım?.

Ronahiya sibê jı êdı destpêkırıbû, Xıdê mezın jı lı nav nivinê de palda bû, hım jına xwe guhdar dıkır, hım jı, jı bona êşa çavên wê berxwe dıket. Dûra Xıd hêdı hêdı rabû serxwe, kincên xwe lı xwe kır ku bıçe dest û rûyê xwe bışo, Melekê deng lı Xıdê kır û usa got :

- Lo-lo mal ava, vê êşa çavan ez kuştım, aqıl lı serê mın de nehişt, berê ku tu bıçi dest û rûyê xwe bışoy, bı kerema xwe lı van çavên mın bınhêre, gelo lı van çavên mın çı bûn, çı qewımın?. Ev êş û jan lı ku tên?.

Xıdê rewşa jına xwe lı ronahiya sibê de bı çavên xwe va dit. Jı bona ew jı, lı şuva wegeriya çû lı pêş Melekê de jıniyên xwe da ser erdê, xûz bû, jı Melekê ra:

- De tu berê xwe bıde aliya ronahiya pencırê, ez bı qenci lı çavên te bınhêrım got.

Melekê berê xwe da aliya ronahiya pencırê, lı pêş mêrê xwe de rûnişt" de tu bı kerema xwe bınhêre"got, dûra jı Xıdê bı tiliyên du destên xwe va, bıjengên çavên Melekê, ên jêr û ên jor pêgırt, çavên Melekê vekır û bı balkêşi lı çavên jına xwe nihêriya, lê qet tışteş lı çavên Melekê de

nedit. Piştra bî hemû hêza kûrahiya dilê xwe va, pênc, şeş caran pife çavên jina xwe kîr û jî jina xwera usa got :

- Melek, evina dilê min, tu qet metirse, bawerke çu tiştek li çavên teda tune, tu bî kerema xwe heweki xwe kip bigire, hêdi-hêdi rabe jî mera xurniya me amade bike, naha gundi gazi me dîkin, divê em êdi rabîn derkevîn der, biçin ber naxîra pêz û dêwêr. Melekê:

- Ma tu çîra deng li kurê xwe naki? Heya vê seatê ew li xewa kûrde binojîn bû, biçe tu wi hişyar ke. Bêt derew mîrov ku deng li wi neke, ew dîkaribe bist û çar seat li xewê de bumine. De tu li wi mijûl be, jî xewê rake, ez jî li ev rewşê de hewl bîdim, jî wera xurnî û taşte a we amade bikim..

Piştî ev gotinên Melekê de, Xîd çû ba nivîna kurê xwe bî dengeki nîzm û zelal va, gazi kurê xwe kîr " ez qurbana canê te, kurê min, êdi li xewê de rabe, em dereng ketin. Biçe bî lez dest û rûyê xwe bişo, were em xurniya xwe bikin û biçin ber pêz, naha hemû gundi li hiviya medene".

Xîdê piçûk bî dileki sar û keser va, li binê lihêf û nivînê de rabû serxwe, kincên xwe li xwe kîr, derket der çu ber çirtîka coka avê, dest û rûyê xwe bî qenci şoşt û disa dageriya mal, çu li tev bavê xwe taşte a xwe xwar û li tev bavê xwe va derketin der, xwe gihandin naxîra pêz û dêwêr.

Gundiyan niv seat berê pez û dewarên xwe derxistibûn der, li hiviya naxîrvan de mabûn. Li nav wê teşqelê de, Xîdê li axur de mî, bîzî û çêleka xwe li xwe bîrkiribû. Bî lez û bez dageriya mal, ew heywanên xwe li axur de derxistin û disa xwe gihand kurê xwe û naxîra pêz, dêwêr û naxîra pêz bervî gaza hember gund meşandin.

Lı destpêka biharê, heya dema payizê, kar û berên gundiyan Kurdistan gelekî zefîn. Cot ajotîn, çinandinê kax û giyan, ceh û genuman, gerandinê bênderan û safikirina wan berhemên salê gelekî dijwar û nengewze. -çetin-Bı taybetî meha Gulanê, mehek a herî girînge. Cotkar dîçin cotên xwe diajon, keç û bûk dîçin sîpîngan, gîzêran, xilokan dîkolîn tinîn der, dîkîn çal û torban dîkîşîn mal, dîşon, paqîj dîkîn dîxwîn. Zarokên gundiyan dîçin berx, kar û golîkan û dîbîn şivanê berx, kar û golîkan. Wan heywanan dîbîn dîçêrinîn. Ew şivan û gavanên wan berx, kar û golîkan bî taybetî lı meha Gulanê de rojê amade dîkîn. Lı wê rojê ra " Roja Şarîkê Şivan " dîbêjîn. Lı wê roja taybetî de, hemû şivanên berx, kar, golîkan bî darîkan va bûkeki çêdîkîn. Kînc û kolan lı wê bûka darîk dîkîn, fes û gulîk dîdîn serê bûkê bî valeyên reng kesk û sor zer, sîpî û çeçer, şîn û pembe va dîxemîlîn. Dûra çend şivan wê bûkê bî destan radîkîn û mal bî mal dîgerînin. Kewanî û malxwe'ên malan rûn, mast, dew, ard, hêk û sawar dîdîn wan şivanan. Pîştî rêketîna şivanan de ji, bî elb, beroş û huskeran va, avê davên ser wan şivanan û bûka bî darîk. Ji wê bûka darîk ra ji " Bûka baranê " dîbêjîn. Pîştî ew gerandin û komkirina wan tîştan de ji, şivan dadîgerîn cem hemû hevalên xweyên şivan, wan tîştan radeste-teslim-keçên şivan dîkîn û ew keçana ji destpêdîkîn xwarînen wek Sirakut, Zerfet, Keşke, Xaşîl, Herîre û hwd çêdîkîn. Bı taybetî wî karî lı nêzîka rîyan de amade dîkîn. Bı astîr, cacîman va sîfran radîxînin, ku rêwanên rîyan ji bîbîn mîvanê wan lı tev wan rûnîn û wan xwarînan bîxwîn. Ew ji lı Xwedê daxwaz bîkîn, ku Xwedê ram û barana xwe lı wextê de bîbarîne, zada gel zêde, jîyanê ji qenc bîke.

Belê, ew birûbawerîyek bû, her sal lı meha Gulanê de, şivanên berx, kar û golîkan, ew adet û tora bav û kalan bî wî rengî va dîanîn cîh. Av dîavîtin bûka bî darîk, bûk û ew şivanana şîl dîkîrîn; sedem ji dîgotîn "Xwedê ram û

barana xwe li ser me kê m neke, li wextê de barana xwe bîbarine, çandiniyên gel qenc bîke, ti û birçitiyê li gel temaş neke, zîkê gel têr, jiyana gel ji baş bîke".

Lî meha Avrîl û Gulanê de, li Kurdîstanê de jîyanek nû û bî taybetî destpêdike. Hemû erdê Kurdîstanê li nav hezaran celeb Gul û Sosin û çiçegên rengin de dîmine, dibe mîna bîhişt, ango cenet. Hemû jîndarên Xweza-tebiatê-ên ku li Kurdîstanê de dijîn, ewana dîkevî nav dem û hewakî herî xweşik. Mîrovên kal û pîr xwe cîwan dîhesîbînî, mar li binê kevîr û qulên xwe de derdîkevî, li binê tava rojê de, li ser xalî û qûman de, li binê tîrr û kaşan de xwe germ dîkî, çermên bedenên xwe dîguhêrînin. Rovî derdîkevî dîziya mîrişkan, mîrişkên gundîyan nêçîr dîkî û dîxwî. Kew li binê guniyên gaz û tatan de, li binê kevîr û qunterên çîyan û kaşan, zînar û baxîran de, qîrîk û çîvîk li ser dar û sîncan, kevok û qîjîk li binê sîvingên banî û xanîyan de, hulî, sîsorek û legleg jî, li ser baxîr, şûnên bîlînd û ase, kevîrên mezîn de, dîksîlêman û çîvîkên darkutîk jî, bî nîkîlên xwe va daran qul dîkî, li hîndîrê çurnên daran de hêlînên xwe çêdîkî, hêkan dîkî û pîştra kurt dîbî, dîkevî pûnê, li ser hêkên xwe de dîsekînî û çêlîkên xwe tînin der. Pepûg li ser çîya, kaş, gaz û tatan de dîlorîne, dîke"pep û pep". Ew jî mîna gelê Kurd derd û kulên xwe tîne zîman, dîstrîne û dîxwaze ku derd û kulên xwe bî wê lorandî û pep û pep va bîrbîke.

Teyra pepûg li nav gelê Kurd de, şûnekâ bî taybetî dîstîne. Çîroka teyra nav pepûg, bav û dayîkên gelê Kurd jî zarokên xwera mîna çîrok û serpêhatiyên lehengan deng dîkî û şîretan li zarokên xwe dîkî, ku zarok ew çîrokê bîrnekî, qedra dê û bav xwe, xwîşk û bîrayên xwe bîzînin. Bîzînanî ku" Dêmarî û Zîrdebav " çîye.

Bav û dayîkên Kurdan, ew çîroka teyra pepûg, jî zarokên xwera usa deng dîkî. Dîgotî" mêr û jînek herî hejar û reben hebûne. Ew herdû rebenana xudan keç û kurekî bûne Nuxurî keçîk, lawîk jî li xwîşka xwe piçûktîr

bûye. Ango ew jin û mêt xudan ew du zarokan bûne. Rojek dı rojan de jina wi mêtikê hejar û diya wan herdu zarokên reben nexwaş dıkeve lı zikê çend rojan de dimire dıçe, dıgihêje rama Xwedê. Ew mêtikê hejar bêt jin, ew herdu zarokana ji, bı dê sêwi duminın. Pışti gelek zeman de, der û cinar lı mala wi mêtikê hejar de komdibın û ji mêtik ra dibêjin" dıvê êdi tu ji xwera jinek şirhelal bıtini û bızewıcı. Jı tera jinek dıvêt. Ku, ew jı wan herdu sêwiyan re bıbe dayik, jı van zarokan ra naneki bıpêje, xwarneki çêbike, ser û kolên te û van zarokan bıšo û paqij bike, ev rewşa usa nabe, em dibêjin tu bızewıcı". Lı ser ew xwastek û pêşneyara gundiyan, mêtik wê pêşneyarê dipejirine û dibêje" ê başe hûn dızanın; hûn ku kê jı mınra mınasib dıbinın, bawerkın ez nabêjim na". Pışti çend rojan, gundi dıçın jı wi gundiyan xwera keçıkeki dıxwazın, qelınd-melındê bavê keçikê ji dıdın û keçikê jı mêtik ra tinın. Mar marê jı dıbirın û mêtik dızewıcının. Ew jinıka lı destpêkê de gelekı baş lı wan herdu sêwiyan dınhêre, her daxwazıyan wan lı gor hêza xwe tine şünê, lı wanra dıbe dayik. Naxwaze ku ew zarokana diya xwe binın bira xwe. Lê pışti zemaneki kurt de, ew jinıka tê guhartın, dıbe dêmariyek nebaş. Mına navê xwe, dıbe mareki reş û bı jehr, dıxwaze ku wan zarokan bı jehra xwe va bıkuje. Ango dıbe dıjınê wan herdu sêwiyan reben. Her roj tade lı wan zarokan dıke û lı wan dıxine, dıkute, wana ti û birçi dıhêline, xwarınê nade zarokan, her tışt lı wan belengazan vedışêrine, neheqıyan mezın lı zarokan dıke û tırs û xofek mezın dıke zikê wan zarokan. Ew herdu reben û sêwiyan Xwedê, bı tırsa wê bêt ramê qet tışteki ji, jı bavê xwera nabêjin, bédeng duminın, roj bı roj jar û sıst dıbin. Heyam bıhar, wext, wexta kereng, gızêr, xilok û sıpıngan bûye. Rojeki canê wê dêmariya bêbext kereng xwastiye û çaleki kevn û bı qul daye wan herdu zarokan û jı wan belengazan ra" dıvê hûn bıçın jı mın û bavê xwera kerengan berhev bıkın binın. Ku hûn vala dagerın mal, bı navê

Xwedê ez we bikujum, serê we jêkım" gotiye. Lı ser wê fermana dêmariya bêbext, ew herdu zarokên belengaz, radıbın rêdikevın dıçın, lı ser gaz û tatan, kaş û kortan lı kerengan dıgerın, ku jı dêmariya xwera kerengan berhev bıkın. Keçık çal dıde bırayê xwe, kêrê ji ew dıgire û destpêka bırandına kerengan dıke. Ew kerengan dıbıre dıde bırayê xwe, bıra jı wan kerengan dıgire dıke çalê ser pıšta xwe û lı dû xwişka xwe de dımeşe. Lê sed mıxabın ku lawık hayjı qula çal û ketandına kerengan nabe. Bı wi şıkli va hemû kereng lı qula wi çalê kevn de dıkevın, qet kerengek lı çal de namine. Pışti demek dırêj de, keçık jı bırayê xwera dıbêje" bırayê delal, ez bawerım mê gelek kereng berhev kırın, êdı bese, em gelekı jı westiyane, çêtıre em piçekı rûnın, vêsa xwe bıgırın hêsabın dûra jı em bıçın mal, dereng nekevın, lewra dêmariya me, wê ew me bıkuje". Bırayê keçıkê nabêje"na"û lı bıne dareki de rûdının. Çıto ku rûdının, keçık lı cihê xwe de ecêb dımine. Jı ber ku lı çalê kerengan de, kerengan nabine. Dınhêre ku çal valaye, qet kerengek lı çal de nemaye. Lı nav wê rewşê de keçık hêrs dıkeve, bı xışm êrış dıde ser bırayê xwe û jı bırayê xwe pırs dıke, dıbêje" kuro mal şewıtiyo, te çawa ewqas kereng xwarın? Te werqas kereng kırın kudera xwe? Naha ku em bıçın mal, ma em çı bersivê bıdın wê dêmariya xwe a har û hov? Wê ew me bıkuje". Jı bona ew axaftına keçıkê, icar bıra:

- Xwişka mına delal, bawerke mın qet yek kerengek jı nexwariye, ez lı ser navê Xwedê jı tera sond dıxwım bı serê dıya mın be ku, mın kerengek nexwariye, ma tu çıra mın tawankar derdıxını? Ez lı te tıka dıkım, tu jı mınra usa meaxıfe. Lê keçık qet guhdare bırayê xwe nake, bêtırık-inat-dıke û dıbêje" hemû kereng xenima te bıın, kuro te nexwar, ma kê ew kerengana xwarın? Tu bı xwe jı dızani, ku mın kereng jêdıkırın, te jı ew kerengana dıgırtın dıkır çal. Lê ku te ew kerengana nexwarın, ma cın û pêriyan xwarın? Ew kerengana lı kuva çın? Kuro tu mın ecêbmıyı

dihêlini, hêrsa mın radıki, naha ez nızanım ku çı xaliyê li serê xwe kim". Lawikê belengaz çı dıke, çı dibêje, lê xwişka wi qet guhdare wi nake, bı rık" te xwar û te xwar " dibêje. Lı ser rık, hêrs û gotinên xwişka xwe, icar lawık diyax nake, destpêka giri dıke û jı xwişka xwera usa dibêje :

- Başê xwişka mına delal, ez nıkarıbım lı te bıdım bawer-kırın. Lewra ez jı tera çı dibêjum, tu bawer naki Ez dibêjum" mın kereng nexwarıne " tu dibêji" te xwariye". De fermo, kêr lı destê tedaye. Bı rasti tu ku lı mın bawer naki, bı kerema xwe rabe zikê mın bıqelışine, lı hındirê fırsık û loqleyên mın de bınhêre, gelo bı rasti mın kereng xwarıne, yan jı nexwarıne, tu bı çavên xwe va bıbini û bawer bıke. Lı ser wê pêşneyara ew lawikê bêt gune, xwişka wi lı şûna xwe de radıbe, qet lı çal jı nanhêre, yekser bı kêrê zikê bırayê xwe dıqelışine, fırsık û hemû loqleên bırayê xwe tine der, lı hındirê fırsık û loqlean dınhêre, ku qet kerengek jı, lı hındirê fırsık û loqleên liwık de tune. Heya ku lı xwe dıhese, aqıl tê sêri jı, bıra dımire, dıçe rama Xwedê. Ew keçıka lı ber tırsa dêmariya xwe, bı wi şikli va bırayê xwe dıkuje û dıbe qetilkarê bırayê xwe. Dûra lı çal dınhêre, ku çı bıbine, çal lı çend ciyan de qul bûye, kereng jı lı wan qulan de ketine, lawikê belengaz jı hayji ketına kerengan nebûye. Çıto ku keçık têgihişte ew meselê dıbe, lı wê deme de aqıl tê serê keçikê û keçık destpêka giri dıke, lı xwe dıxine, porê xwe dırûçikine, ahx û ahx dibê û gazi Xwedê dıke. Dibêje" ya Xwedê, rebê ev cihan û alemê, jı mınra riyeki bıbine, ez çawa bıkıım? Çı xaliyê lı serê xwe kim? Mın bırayê xwe bı destên xwe va kuşt, tu mın bıbine û bıbıhise, jı ev rewş û xema mınra havıl û riyeki bıbine, ez lı te tıka dıkım, tu lı mın were ramê, mın lı ev xemê felat bıke. Daxwaziya mın lı te ewe ku, tu mın bıki teyrek bı per û qanat, ez bıfırıkım û derkevım ser gaz û tatan, bı ev dilê xwe ê xemgin û şewat va bıgırım, bılorinım, bıgazinım, bıbêm" bıra/ mın

tu kuşti çıra/ bîbêm pepo/ bîbêm keko/bîbêm kê kuşt/
 bîbêm mîn kuşt/ bîbêm kê şoşt/ bîbêm mîn şoşt û ez xema
 dilê xwe her tum usa binim zuman. Bîla ev cihan û mirovên
 cihan ji mîn bîbîhisin, mîn ji bona tîrsa dêmariya xwe çî
 aniyê serê bîrayê xwe". Lî ser wê dîwakîrîn, giri-gazinca
 keçîkê, Xwedê dengê keçîkê dîbihise, dîwa keçîkê ji dîpeji-
 rine û keçîkê dîke teyr û ew teyra ji dîfîrîke, derdîkeve ser
 gaz û tatan, çîya û kaşan, bî taybetî lî demsala bîharê de
 dîke pep û pep, dîgire û dîlorine, axina dilê xwe tîne zi-
 man. Gelê Kurd lî nav xwe de ji wê teyrîkê ra, teyra"Pe-
 pûg"dîbêje û lî derheqa wê teyrîkê de, ev çîrok û mitolo-
 jiyê ji zarokên xwera dîbêje û deng dîke.

Xort û zarokên Kurd û Kurdistan, her sal lî dema bî-
 harê de, hêlin û hêkên kewan dîgerîn, hêlinên wan heywa-
 nan hîldîşînîn, hêkên wan tînn mal, mîna hêkên mîrîşkan
 dîkîn nav rûn dîqewîrînîn, dîpêjîn û dîxwîn. Dûra kew
 kurrt dîbîn lî ser hêkên xwe rûdînn çêlîkan tînn der. Lî
 wê demêde de, disa xort û zarokên Kurdan lî çêlekewan
 dîgerîn. Wexta ku ew çêlekewan dîbînîn lî dû wan heywa-
 nên piçûk û bedew dîkevin, wan lî hev belev dîkîn, dîpeki-
 nîn, bî rev û bez wan heywanan dîwestînn û hînekan
 pêdîgîrîn û wan çêlekewên piçûk dîkîn hîndîrê qefesan
 kedi dîkîn. Pîştî kedîbûn û mezînbûna wan de, êdî ew
 dîbîn kew. Nêçîrvan bî taybetî kewên xwe yênn Mari, ango
 kewên mê, dîkîn qefesan û derdîkevin ser çîya, tûm û
 kaşan. Lî ser wan çîya, tûm û kaşan de, ji xwera star-
 gehan çêdîkîn, xwe lî wan stargehan de vedîerînîn, qefesa
 kewên xwe ji, yan lî guliyê dareki de dardadîkîn, yan ji
 datînn ser kevîreki bîlînd, dorbera qefesan ji, bî çîlo ê
 daran û hej-mejan va dînxîmînn û êdî lî hîviya qeb-qe-
 bandîna kewên xwe de dîmînn. Wexta ku kew ji lî tariyê
 de dîmine, êdî destpêka qeb-qebandînn û xwendîna xwe

dike û kewên kovi bı dengê xwe va, lı dorbera xwe de kom dike. Bı sedan kewên kovi lı dorbera kewa veşarti de, lı ser erdê dihêwirin û kom dibın, lı kewa veşarti û dengê kewa veşarti dıgerın. Lı wê demê de, nêçirvan lı stargeha xwe de, lûla tıfinga xwe dıguhêrina ser wan kewên kovi û maşe a tıfingê dıqşine, agir dike û hemû qırşûnên saçme berdide ser kewan, belav dike û êdi çıqas ku kew hatın kuştın. Dûra ji nêçirvan lı stargeha xwe de derdıkeve û dıçe wan kewên kuşti kom dike, dike heqib, yan ji torbeyê xwe, bı dileki şa û kêf va dadıgere mala xwe.

Zarokên Dêrsım bı taybeti bûbûn dijminê kewan û qırıka reşbelek. Jı bona kewê dıgotın" lı şerê Kərbela ê de, İmam Husên lı ber Yezıt reviyaye, çûye xwe lı curnê dara Sıpındar, ango curnê dara Qewax de xwe veşartiye û Yezıt tev leşkerên xwe lı Husên geriyaye, balaç çıqas hewl daye, Husên neditiye. Lı wê navbera gerê de, kew derketiye ser kevirêki, bı dengêki bılınd va destpêka xwendinê û qeb-qebandına xwe kırıye, gotiye" Qeb-qeb û qeb-qeb". Lı ser wê qeb-qeb gotına kewê, dara Qewax hatiye bira Yezıt û leşkerên wı, icar çûne Husên lı curnê dara Qewax de ditine û anine cangori kırime". Jı bona ew derewê ji, gelek kesên Dêrsım bawer dıkırin û tev zar û zêçên xwe bûbûn dijmine kewan.

Jı bona qırıka reşbelek ji dıgotın" ezbeni Xwedê tala rojeki gazi qırıkê kırıye û jı qırıkê ra usa gotiye" naha ez dermaneki dıdime te, dıvê tu vi dermani bıgırı, bıbi bıdi hemû qûlên mın, bıla qûlên mın vi dermani bıgırın lı canê xwera bıkın û lı mırınê felat bıbın, nemırın. Lewra ev dermana, dermanê nemırınê ye. Qırıkê ji ew dermana gırıtiye anıye lı canê xwera kırıye, nedaye qûlên Xwedê, jı qûlên Xwedê ra ew bêbextiya kırıye. Jı bona ev ji, şıkanđına hêkên qırıkê, hışandına hêlina qırıkê, kuştına çêlıkên qırıkê helala".

Belê, zarokên Dêrsım jı bona ew derewa bêt doçık, her sal lı dema hêlin çêkırina qırıkan dıpan û derdıketın ser

daran, hêlinên wan heywanan hıldışandin, hêkên wan dışikandin û çêlikên wan ji hemû dıkuştin û goştên wan diavıtın ber kûçikan û werge dilê xwe hêsa dıkirin.

Bı rasti lı nav gelê Kurd de gelek derew belav bûbûn, gelek Kurd hatıbûn xapandin, baweri lı ne tıştên rast anibûn. Lı nav wan birûbaweriyên nerast de, yek ji ev çiroka qırıkê û dermanê Xwedê, ew ê nemurînê bû. Wana bı ronahiya çavên xwe va ji dıditın, ku bı taybeti lı demên zıvıstanan de, ew heywanên bêt gune û bêt zıman, lı nav berf û pûkan de, lı nav ba û bahozan de, bı serman dıqemirıyan, bı hezaran dımırın, telef dıbûn, qıra wan dıhat. Lê sed mıxabın ku, ew hejar û belengazên Kurdan lı tariyan de mabûn, zû-zû dıhatın xapandin, baweri lı tıştên nerast dıanin.

Lı dawıya meha Gulan'ê de, êdi lı gelek cihên Kurdistan de ceh zer, genım ji bejn dirêj dıbın, fırigên xwe vedıkn, lı ber baê hınk û badar de radışın, vırde-wırde dıçın tên. Ew raşandin, vırde-wırde hatın û çüyına wan ceh, genım û hemû çandınıyan, lı ber çavên mırov mina pêlên derya û dengızan tên xuyakırın. Çarna hewayê badar û baran sapê genıman dışekine, lı erdê va dıqemıtine, xesereyên mezin dıde çandınıyan. Disa lı wê demê de jin û keçên Kurdistan dıkevın nav zevi û çandınıyên xwe, destpêka giya çımandınê û kaxan dıkın. Ki lı nav deşt û dızan de, ki lı ser çiya û zozanan, kaş û tûman de, ki lı nav xavên dorbera zeviyên xwe de giya, kereng, guhrız, laflafok, ango pêçek û her cûre giyan dıçıne. Hın kes ji, giyayên mêrgan bı kêlandıyan va dıçının, wan giyan dıkın rêsi badıdın, lı bıne tava rojê de hışk dıkın; pıştra dıkışının malên xwe, dıkın kadinan, lı kadinan de lod dıkın, ku lı zıvıstanê de bıdın pez û dewarên xwe.

Jinên Kurdan lı nav zeviyên xwe de, ango lı nav ceh û genım'an de, kaxê dıkın; wan giya û kaxan dıkın çalan dıkışınun ser bänderan, lı binê tavê de radixinın, hışk dıkın û dûra ji lı tev hemû cûre giyan, kereng- merengan va dıkın nav hev, tevhev dixinın û gamê dıdın ser wan giyan; dûra ji ga'an tinın, wê gamê dıdın paş ga'an lı ser wan giyan de dıgerinın, hûr dıkın, dıkın kês. Pışti wan karan de, bı darbêran va wê malaxma giya komdıkın û bı çal û xaşıyan va dıkışınun dıkın kadinan, ji bona zıvıstanê, ku dewar û pezên xwera bıkın alıf.

Ew giyayên ku lı nav ceh û genım'an de dırızın û têne ditın, bı tevahiya wan giyan ra "Kax"tête gotın. Keç û jinên Kurdan, lı wextê de dıkevın nav çandniyên xwe çandniyên xwe lı wan giyan dıparêzın. Lewra ew giyana xesereyên mezin dıgihêjinın çandniyan. Çımandına wan giyan ji, bı rasti jin û keçan dıwestine. Keç û jinên Kurdan wan giyayên xeseri, pışti gelek zametan de lı nav çandniyên xwe de derdixinın, dıçının, berhev dıkın, ku çandniyên wan lı wan giyayên bı xeseri bên parastın. Ji ber ku, ew giyayên bı xesere, nahêlinın, ku çandni mezin û bejn dırêj bıbın, bıgihın. Lı herêma Dêrsım de, ew giyayê ku xesera heri mezin dıde çandniyan, ji wi giyayi ra "Gırnûg" dıbêjin. Xêncı gırnûg, hın cûre giyayên dın û cılbık ji hene, ku ew ji xeserên mezin dıdın çandniyan. Wexta ku keç û jinên Kurdan wan kaxan lı nav zeviyên xwe de dıçının, hemû pêşên fıstan, pêştemal û porên wan lı nav berrê wan gırnûgan de dımının, berrên wan gırnûgan mina benişt lı kinc û kolên jınan va dıqemite, sınc û dıriyên wan, canê jin û keçan dıêşine; ew êş û jan ji, keç û jınan dıxeyidine, çımandına wan mırov bêzar dıke.

Mêr û jinên gundê Torût'ê, ew hemû pişti şandin û serastkirina pez û dêwêr de derketibûn der, çûbûn çınandina kax û giyan. Lî gund de xêncî zarokên hûr, kal û piran, qet kesek nedihat ditin. Te dîgot lî gund de qet kesek tune. Lî nav wê bêdengiyê û firêqetiyê de, Meleka jîna Xîdê naxîrvan, lî tev zeyîya xwe Xecê lî mal de rûniştibûn. Xecê teşî dîrist, Melek jî, lî ber êşa çavan dîgiriya û dînalîya. Êşa çavan jan dîda dîl û kezewa Melekê. Melekê nedîkarîbû ku lî ser lîngan û piyan bîsekîne, lî şûna xwe de rûne. Ew lî ber êşa çavên xwe hêrs dîket, gîlî û gazincên xwe lî Xwedê dîkir, dîgot" ya Xwedê'ê ev cihanê, ev êşa çavên mîn bîrrîne, mîn mîna berê qenc bîke, mal şewîtiyo, ma mîn lî te, lî ziyaretan, Pir, Rayber û mîrşûdan çîkir?. Ma çîra te û wan va êşa çavan, xem û xîzaniya ev cihanê dan mîn û malbata mîn? Ma tu dîxwazî mîn bîkuji? Te ev tazi, bîrçîbûn û hejariya ku daye me, ma ev jî mera bes nine? Te em kîrîn naxîrvan, te em kîrîn şîvan û gavan, te em kîrîn xulamê qûlan, ma dîsa jî tu lî ev kar û kîretên xwe têr nebûyi? Ma te ev jîyana xîzani, rojeki têr, rojeki bîrçî, zîk vala î jî, jî mera zêde dit.? Serda jî, te ev êş û jana çavan da mîn, ku tu çavên mîn jî kor bîki.

Melek kewaniya malê bû, Xeca zeyî karê kewantiyê nedîkir. Jî ber ku ew adetek bîngehîn bû lî nav gelê Kurd de. Kîjan jîna lî malê de mezîn bû, ew dibû kewaniya malê û bîpîrsiyarê malê. Jî bona ew jî, lî mala Xîdê de kewaniya jîna Xîdê Melek bû. Melek lî hîndîrê malê de dîçû-dîhat; lewra êşa çavan Melek dîşand û mecal nedîda Melekê, ku Melek karekî bîke. Roj jî gelekî bîlînd bûbû, tava rojê cihan germ dîkir. Melekê heya wê demê dewê xwe nekîlandîbû. Xeca zeyî jî, lî berbanga sîbê de rabûbû serxwe, ketîbû nav kar û berê malê. Wê pêş derî, axur û hevşewîştîbû, her der paqîj kîrîbû, dageriyabû cem bûka xwe, ku jî bûka xwera arîkari bîke. Melekê çawa ku Xec lî gel xwe dit, hêdi-hêdi lî şûna xwe de rabû, çû lî bînê sepetê de dîzîka meşka xwe derxîst, devê meşkê vekîr, bî balkêşî



mast kire meşkê, devê meşkê girêda, kêri kire qula lolewiyan, dûra wê meşka dew bir lı sêpiyê de dardakır û destpêka kılândina dewê xwe kır; balam êşa çavan lı Melekê zor dıkır, hêz lı Melekê de nema bû; wê bı zar û zor dew dıka. Pışti lı dû çend hûrdeman de, Melekê devê meşka dew vekır lı dew nihêriya, gelo dew bûye, yan na. Wê dit ku êdi dew bûye, rûn lı ser dew ketiye, gilover-gilover bûye. Melekê devê meşkê girêda û meşk lı sêpiyê de derxıst bir hındır, kêri lı lolewiyan de ani der, du-sê car kêri lı meşkê xıst- ew baweriyek jinên Dêrsım bû- û parzûn da ser devê dizikê, dewê xwe bı qenci dakır, rûn lı nav dew de derxıst, bı destan gıvışt û dûra rûnê xwe bir kır kûzeki piçûk dewısand nav rûnê rojên bihuri. Dûra ji bona nefêrên malê hınek dew cûda kır û ê mayi ji kire dizikê û dizik ji da ser ağır, ew dewa keland kire toraq; toraq ji kire parzûneki lı mixê stuna xêni de dardakır, ku şujuya toraqê dabe û ew ava şuju lı nav toraqê de nemine.

Lı mala Xidê naxırvan de mıqıl-k-tencik-felan nedihat ditın. Jı bona ev ji kewaniya malê Melekê dizik dıda şuxulandı. Jı bona avê beroşek, ji bona berav şoştinê ji, lı mala wan de sitilek wana piçûk, ji bona xwarın patinê ji dizik'ek wan hebû.

Dizikên xwarın patinê, kûzên avê û kûzên rûn, sersum, ango kûpê mezin û her cûre kûz, kûp, evana hemû bı herriyek taybeti va dıhatın çêkırın. Ew hacet û meteryalana lı roja iroin de bûne xemilok û tıştên entika. Lı hın cihên Kurdistan de heya roja iro ji, ew kûz, kûp, dizik, xılık û hacetên werge tene ditın. Ew meteryalana bı taybeti ji bona avê, rûn veşartinê û gelek tıştên dın, ji bona gelê Kurd zor pêwıstın. Jı lewra heya roja iro ji, lı gelek gundên Kurdistan de şewq, eletirik tunenin, serdab û sarıncok-dolavên qemirê, cemedê-pırr nayên ditın.

Melekê dew kilandin, kar û berên hindir qedand û dageriya ku biçe pêşiya dêri paqij bike, dit ku Xeca zeyiya wê ew kara kiriye, balam hin cih bi qenci nemıştiye. Xwast ku saqolê, yan ji avlêkê bigire der-merên ku bi qenci paqij nebûne bumale, Xeca zeyi xwe gihand bûka xwe, nehîşt ew wi kari bike, got" min ev derena miştibûn balam hin cih çal û kortin, mirov nikaribe bi qenci paqij bike. Tu bi kerema xwe saqolê bide min, ez vi kari bikim, lewra tu nexwaşi, rewşa te ne rewşe". Lî ser daxwaziya Xecê, Melekê saqol da zeyiya xwe û çû lî ser kevireki de rûnişt, lî ber tava rojê de xwast ku bedena xwe germ ke. Lî dorbera xwe mêze kir, qet kesek nedit. Gund wek gundeki wêran û vala dihat xuyakirin. Te digot hemû gundi terki welat bûne, an ji hatine kuştin. Lewra hemû gundi çûbûn kar û berên çandiniyên xwe. Hesenê piçûk ji, lî hêlaneka xwe de ketibû xewa kûr, hindirê malê ji firêqet bû. Xêncî dengê teyr û tûran, qet dengê lî gundê Torût'ê de dernediket. Xecê ji miştina hemû cihên nepaqij qedandibû, toz û gemari ji avitibû ser sergo, êdi wê ji dixwast ku biçe ligel bûka xwe piçeki rûne vêsa xwe bistine, nişka ve lî aliya rojavê de dengêki mina dengê top û tîfingan kire gume-gum, mirov digot hemû top û tankên Roma Reş, lî tev leşkerên barbar, har û hov hatine herêma Dêrsim, dixwazî ku qol bavêjin ser gelê Dêrsim. Lî ser wan dengê top û tîfingan, Melek lî şûna xwe de mina gowek bi laztik hîlfiriya serxwe, bi tirs û xofek mezî va, ji zeyiya xwe Xecê ra usa got" keçê lez bike, wê saqol û avlêkê-gezê-lî wê cihbihêline, bavêje ser erdê, bazde em xwe bigihêjinî hindir neyên kuştin".

Melek û Xecê xwe şaş kiribûn; herduyan bi hevra, bi lez û bez, bi tirs û xof, xwe avitî hindirê malê. Bi tirsan dilerziyan, diricîfiyan, te digot lî nav berf û qemirê de derketine. Bi taybetî Melekê xwe şaş kiribû, nedizaniyê ku çî bike. Lî nav wê tirs û xofê de, yekser xwe gihand cem hêlaneka kurê xwe Hesen; xarbû lî kurê xwe nihêriya; dit

ku Hesên lı xewek kûrdaye, deng jê dernakeve. Îcar wê kurê xwe cihîşt bı lez û bez bazda pêşiya dêri, rotek mezin û stûr lı pêşiya derê hevşe ê pêz û dêwêr de girt û disa bı lez û bez bazda dageriya hındirê malê; deriyê der bı hêz dada, zornaxa deri tanda kire qula diwêr û deri kilt kır, ew rota mezin û stûr ji da paş dêri, bı qenci şûn kır û dageriya çû lı ber agirê pıxêrigê de, tev Xeca zeyiya xwe rûnişt.

Melekê êdi êşa çawan, kar û berên malê, xem û kulên cihanê, lı xwe birkırıbû, ketıbû nav xewn û mitalan, tırs û xofan; bı xwe bı xwera dıgot " gelo naha Xidê mêrê min û kurê min Xidê piçûk, ewana lı ku ne? Ew naha lı ber dewar û pêz de çı dıkın û çı hate serê wan? Gelo ew naha lı kijan cihi de naxıra pêz û dêwêr dıçêrinın? Wana iro naxır bırıye kuderê? Hemû kesên gundiyan ji, lı derva ber çınandına giya û kaxanın, gelo ew naha çawa bûn? Nebe ku leşkerên Roma Reş, lı ser fermana Mistê Kor êriş bike were qol bavêje ser tevgera Dêrsım?. Jı bona wan xewn, xeyal û biraninan, Melek bêt heq ji nebû. Lewra çend heftan berê Melekê ji mına hemû Kurdên Dêrsım, bihistı-bû ku, Mistê Kor, ango Mistefa Kemal, dıxwaze ku êrişek bêt mirovi bavêje ser Dêrsım. Dıgotın wi lı meclisê de gotiye ku" Dêrsım û pırsa Kurdên Dêrsım êdi bûye kû-nêrek heri xetere, divê ev kûnêra êdi were teqandın, serê kûnêrê were jêkırın. Ku dewlet usa neke, wê ew bibe xeterek heri mezin, lı serê dewleta me bibe bela".

Bêt şık û bêt guman, Mistefa Kemal dijminê gelê Kurd bû û her usa ji ew miroveki xwinmij û xwinrij, dijminê hejar û belengazan bû. Wi bêbexti lı destpêka deamez-randına Komara Tırkiyê, heya roja mırına xwe û hukum-dariya xwe de, bı deh hezaran Kurd kuşt, xwina gelê

Kurd rijand, wi xwinmji erdê Kurdîstan bı xwina gelê Kurd va sor kîr, bı xwina Kurdan erdê Kurdîstanê avda. Wi ew erdê evrar-kutsal-û pîroz jî gelê Kurd ra kîr do-jeh, -cehenem-jiyan jî gelê Kurd ra kîr jehr û axû, kuştin û lêdan.

Mîstefa Kemal, pişti demazrandina Komara xwe û li destpêka "Serok Komariya" xwe de, di sala 1920'an de, wi tev serleşkerê xwe Topal Osmanê Laz, ewê har û hov, dijminê gelê Kurd, êrişek mezûn dabûn ser herêma Qoçkiri'yê, bı deh hezaran zar û zêç, keç û bûk, kal û pir û xort kuştibûn. Pişti tevkuştin Qoçkiri'yê, Mîstefa Kemal li tevkuştina şerê Şêx Said'ê nemir û çiyayê Agirê de, disa bı deh hezaran gelê Kurd kuşt, lê disa jî li xwina gelê Kurd têr nebûbû. Wi dixwast ku gelê Kurd û navê welatê gelê Kurd "KURDISTAN" li cihanê de rake. Leşkerên Mîstefa Kemal li tevkuştina şerê Qoçkiri, Şêx Said, çiyayê Agirê de, bı deh hezaran zarokên Kurd mîna dewar û pezan serjêkiribûn, bı hezaran Kurd kiribûn xan û aşan deri li ser wan hezaran dada bûn, agir dabûn ber mîna êzîngan hemû şewitandibûn. Gelê Kurd ew zîlm, sîtemkari û barbariya ne tene li dewra Mîstefa Kemal de ditibû, her usa jî, li hemû hukumdariya dewleta Osmanli da jî ditibû. Bı taybeti li dewra padişahê Osmanli Avdîlhamit de, gelê Kurd gelek zîlm, zor, kuştin û lêdan, tazi û birçibûn li destê wi xwinmji de dit. Avdîlhamit yek carekî de heftsed hezar Kurd li ser erdê bav û kalan rakir şand Rojava Tirkîyê û navçe a Tirkîyê. Pîraniya wan hejar û belengazên Kurd, li rîyan de, bı ti û birçi, li binê sar û serman de, li bin lêdan, zîlm û zora leşkerên hov de hatin kuştin. Dirok evana hemû dîmîvîsîne û gelê Kurd wan zîlm, zor û neheqîyan qet birnake.

Li hîndirê diroka cihan de, gelê Kurd gelek zîlm û zor, kuştin û lêdan, tazi û birçibûn, neheqîyên herî mezûn li derheqa zordestiya Împaratora Roma, Bizans, Rûs û Erebb û Farîs'an de dîtîye. Bı taybeti kîjan dewletên zordest li

ser erdê Kurdistan de derbaz bûne, bî artêşên leşkeri û barbaran va, êriş dane ser gelê Kurd, bî hezaran zar, zêç, kal, pir, jîn, keç û kesên bêt gune kuştine, Kurdistan şêlandine, talan kîrîne.

Lı dû zılm, zor, kuştin û sitemkariya Roma, Bizans û Erebb, lı qurna 16'an de, Împaratoriya Osmanli, wexta hukumdariya Padişah Yawûz Sultan Selim û Şahê İran'ê Şah İsmail de, Kurdistan bû du perçe. Wan herdu dewletên Feodal û xwinxwar, Kurdistan lı nav xwe de parvekirin, kîrin du perçe. Kurdistan nêzika çarsed sal lı nav du Împaratoran de ma, lê disa ji gelê Kurd lı nav wan çarsed salên bîhuri de, qet lı hember wan dewletên xwinmij û xwinxwaran de, serê xwe xar nekır, bî mêrani û mêrxwasi şerkır, namûsa xwe û welatê xwe parast.

Lı hındirê diroka cihan de, gelê Kurd lı aliya gelek dewletan de hatiye xapandin. Bı taybeti lı aliya Tırk, Erebb û Faris'an de. Pışti xurandina dewleta Osmanli, lı heyama Mıstefa Kemal de, icar disa gelê Kurd bı dılpa-kıya xwe va hate xapandin; bêbextiyên bîhuri neani bira xwe û aqlê xwe, çu dersek lı bûyer û xapandinên bîhuri de dernexist; her tum xwast ku ew bıbe dılsozê cihan, jêra bıbêjın" welleh gelê Kurd, geleki heri dılsoz û dırıste". Bı çav gırti lı sond û peyv û axaftına Mıstefa Kemal û dewleta wi zalımı bawer kır û tırba xwe bı destê xw va kola û kete gora tari.

Mıstefa Kemal pışti Komcivina bajarê Samsûn'ê, -ku ew bajara, bajareki Behra Reşê û pıraniya rûniştvanên Behra Reş ra ji"Laz" dıbêjın- bı lez û bez dageriya çu Kurdistan, bajarê Erzurum'ê. Wi lı bajarê Erzurum'ê de gazi axa, mir, şêx û seyidên Kurdan kır; lı tev wan rûnişt û Komcivinek çekır. Lı wê Komcivinê de gengeşiyên pırsa dewleta Osmanli û Xilafetê bûn. Lı wê Komcivin û gengeşiyên wê Komcivinêde, Mıstefa Kemal dilê rêberên gelê Kurd stand, lı wê peyman nıvisand, destnıvisa xwe ji avıt bıne peymanê; dûra serokên Kurdan ji mina wi destnıvisên

xwe avitîn binê peymanê û kar qedandîn. Mîstefa Kemal pişti Komcivîna Erzurumê, îcar dageriya bajarê Sêvazê û li wê ji disa li tev axa, mir, şêx û seyidên Kurd Komcivînek mezîn çêkîr, li tev wan rûnişt, disa wi li tev wan rêberên Kurd gengeşiyên dewleta Osmanî û Xîlafetê kir, li wê ji eynî soza biratiyê û soza Îslam biratiyê da rêberên Kurd, soza alîkariyê li wan stand û peymanî Komcivîna bajarê Sêvazê ji nivîsandîn. Disa hemûyan destnîvîsên xwe ji avitîn binê peymanê, ku li pişti serketîna û avakirînek dewletek nû, a gelê Tirk de, Mîstefa Kemal û dewleta wi a nû, wê azadiya gelê Kurd ji bîdîna gelê Kurd; Kurd ji bîgihêjîna heqê xweyên mirovî û çarenûsi. Mîstefa Kemal li wan du bajarên Kurdistan û du Komcivînan de, ji serok û rêberên gelê Kurd ra waha gotibû:

- Geli heval û biran, xîlafet, dinê Îslamî û dewleta Îslamî li tengasiyek herî mezîndaye; divê gelê Kurd ji, hûn serok û rêberên gelê Kurd û Kurdistan, ji birayê xweyên Îslam ra arikariyê bikin, hêzên leşkerî bîdîna me, em bi hevra ew kafîr û gawîrên ku hatîna ev welatê me ê evrar kesîbandîna, zêft kirîna, li ser ev erdê evrar, erdê Îslamî de rûniştîna derxînin. Pişti wê rojê ez û hemû hevalên min em soza biratiyê didîna we û ji werî li ser navê Xwedê sond dîxwîna, ku pişti serketîna dewleta xîlafet û Osmanî hûn ji bîgihêjîna azadiya xwe, felat bîdîna. Hûn ji dewletek xwe sazîkîna. Hûn bi xwe ji dibîna, ku Ola Îslam û dewleta Îslam li rewşek herî dijwar û xîrabdaye. Divê iro em bi hevra li hember kafîr û gawîran şerî bikin. Ev kara ne tenê deyne me Tirkane; ev her usa deyne we û deynê hemû Îslam bîrane ji. Em ji we arikariya biratiyê dîxwîna. Çawa ku hûn ji dîzanîna, Emperyalan welatê me Îslaman dagîrkîrîna. Bî rastî ev ji, ji bona me gelên Îslam şerî mekîna. Ez bawer dikîna şan û şerefa gelê Kurd ji, vê rewşê napejîrîna. Lewra em baş dîzanîna ku gelê Kurd, gelekî dîlsoz û dîrîste; gelekî şervan, mêrxwas û lehenge".

Belê, Mistefa Kemal werge gotibû, werge sond xwaribû, soz dabû serok û rêberên gelê Kurd. Lê gelo dawî çawa bû? Lê hezar mixabîn ku gelê Kurd, serok û rêberên gelê Kurd bî sond û peyvên şirin va hatibûn xapandin. Piştî bêbextiya Mistefa Kemal û bêbextiya hevalên wi, piştî ewqas zîlm, zor, kuştin û sitemkariya dewleta wi a Tirk de, bav, dayik û bapirên gelê Kurd, ewên ku ew bêbextiya û ew heyama ditibûn, ewên ku li wan şerande nehatibûn kuştin, felat bûbûn, jî zarokên xwera, der û cinarên xwera jî neslê cıwanan ra, ew nihêrinên xwe, biraninên xwe usa berdewam dikirin û dixaftin:

- Leşkerên Yewnan xwe gihandibûn nêzîka Anqarê, ketibûn hındirê qeza Polatliyê, bervî Anqarê dihatin. Wana leşkerên Tirk dabûn pêş xwe, mina çêlekewan dipekan-din, qirdikirin dikuştin. Lê wexta ku gelê Kurd bî sond û gotinên şirin û bî derewên bêt doçik va hate xapandin û hêzên leşkerî û aborî da hukma Tirk, wan lehengên Kurd leşkerên Yewnan û Fransîz dan pêşiya xwe, mina kevrosk û çêlekewan pekandin, lingên wan li ser erdê Tirk de birrandin. Bî taybetî leheng û gernasên Kurd, hemû leşkerên Yewnan dan pêş xwe birin İzmir'ê, li Behr a Ege'ê de xeniqandin. Mêrxwasi, şervani û lehengiya xort û mêrên Kurd, li hember Yewnan û Fransîz de bûbû destan û stran, ketibû ser zar û zımanan nedîçû û ew naçe jî. Wê dirok wan camêrî, şervani û lehengiya gelê Kurd binivisîne.

Axa, mir, şêx û seyidên Kurd jî bona demazrandina Komara Tirk, jî bona serketin û serfiraziya Mistefa Kemal ewqas arikarî kiribûn, bûbûn sedemê serketina wi û damezrandina Komara wi a nû. Lê li dawiyê de Mistefa Kemal û Komara wi a nû çî da gelê Kurd, çî anî serê wan kesan?. Gelo padaşa-mükafat-wan çî bû? Padaşa wan serokan dardakirin, ê gelê wan jî tevkuştin, şêlandin, xwin û talan bû. Piştî 1925'an de, dadigehên dewleta Mistefa Kemal, dadigehên nav" Serxwebûn" Serok û rêberên

Kurd, ewên ku li tev Mîstefa Kemal rûniştibûn, li tev wi xwaribûn, vexwaribûn, peyman nivisandibûn, hemû li ser fermana Mîstefa Kemal, hatin dardakirin, hatin kuştin û cangori bûn.

23 ê meha Avrîl'ê, ango Nisana 1920'an de, li bajarê Anqarê Mîstefa Kemal meclisa xwe nû komkir. Li wê rojê de meclisa Tirk hate demazrandin û hate aşîkar kirin. Lewra Mîstefa Kemal û hevalên wi li dîji dewleta Osmanî, sistema Feodalizmê û padişahiye derketibûn, dixwastin ku sazûmanek Komarî saz bikin. Ji bona wê xwastekê jî, ew ghiştibûn armancên xwe û serketibûn. Li roja damezrandina Komarê de, Mîstefa Kemal hatibû bijartin, bûbû "Serokkomar" "padişah Vatetî ji reviyabû çûbû Ewrûpa.

Mîstefa Kemal bî aqildarî, bî dek û dolavan va gelê Kurd xapand. Wi karê xwe bî destê axa, mir, şêx û seyîdên Kurdan, bî Ehrîmanî-şeytanî- û canbazî va anî şûnê, ghiştî armanca xwe. Li roja damezrandina meclisa Tirk de, heftê du (72) axa, mir, şêx û seyîdên Kurd jî ketin meclisê bûn Newêrgerên -Parlamenterên- meclisa nû û bêtir bûn hevalê Mîstefa Kemal. Mîstefa Kemal û hevalên wi, wana bî hêza gelê Kurd, Laz û Ernawûta'an va Emperyal li welatên xwe derxistin avitîn der; dûra jî bî arikariya hin dewletên Ewrûpê'î, ewên Emperyal, xesma bî arikariya Sovyet, arikariya Lenin, artêşên nû saz kirin. Êdî ew dewleta nû bû xudan top, tank, helikopter û firokên leşkerî. Sazgehên nû hatin damezrandin. Mîstefa Kemal dewleta xwe a nû li cihanê da pejirandin û naskirin. Wi li nûva jî cihanê ra peywendî girêda û karê xwe meşand.

Belê, dewleta Tirk a nû li cihanê de cihê xwe girt û hate naskirin. Mîstefa Kemal jî li şûna padişah de bû "Serokkomar". Li dorbera wi de heftê du serokên Kurd jî kombûn. Lê bî rasti padişah çûbû, padişahi nû hatibû, qet ferqek tunebû. Ew heftê du Newêrgerên Kurd jî, bî dengê gelê Kurd va nehatibûn bijartin û bî aliya gelê Kurd va nehatibûn şandin. Gelê Kurd ew kesana nekiribûn Ne-

wêrger û neşandibûn meclisa dijmin. Ew kesana xwe bi xwe û li ser ferman û tili dirêjkirina Mistefa Kemal va çûbûn ketibûn wê meclisê, bûbûn hevalê dijmin. Jî ber ku wana maf û berjewendiyên xwe kiribûn pêş doza welêt. Pîraniya wana zumanê Tırki ji nedızanibûn, destnıvisên xwe bi tiliyên xwe va dax dikirin. Ew her roj nedıçûn meclisê de ji rûnedımiştın. Ew li malên xwe de, çayxane û meyxanan de zemanê xwe derbaz dikirin; serê mehê ji dıçûn diravên xwe distandın û disa dadıgeriyan malên xwe. Jî ber ku li meclisê de çı dıhat gotın wana fêmnedıkir û tēnedıgihiştın axaftınên bi zımanê Tırki, agadar û serwest nedıbûn, li şûna xwe de rûdımiştın, icar xew diket serê wan, pêva dıçûn, diketin xew.

Lı sala 1923'de, wan Newêrgerên Kurdistan, ewên bêbext û yarên dijminan, jı Konferansa Lozan'ê ra, namek bi heftê du destnıvisi ji, jı serokê Konferansê ra û jı hemû nûnêrên dewletan ra şandıbûn. Lı wê namê de gotıbûn ku " em rêber û serokên Kurdistan, bi navê gelê xwe, jı hemû nûnêrên ew dewletên ku li Konferansê de beşdar bûne, dıdın diyarkirin û zanin, ku em Kurdistan'ek" Aza û Serbıxwe" naxwazın. Gelê Kurd li dıji ev xwastek, bıryar û tıştên usaye. Gelê Kurd û Tırk bırayê hevın; ev herdu gel li hındırê yek dewleteki de mina du bıran dıjin; qet heqê çu keseki ji tune ku, van herdu bıran li serhev cêke li hev cûda bıke, qedera ev herdu gel bıran bıguhêrine".

Ew nama wan heftê du Newêrgerên Kurdistan li Konferansê de hate xwendın û gotınên wan ji hatın pejırandın, Kurdistan bû çar perçe û li nav çar dewletan de hate parvekirin, bû welateki bındest, koloni û mêtıngêhê sê nijad û çar dewletên xwinmuj. Ew peyman jı werge kete dıroka cıhan û dıroka gelê Kurd. Lı pey wê peymanê de, dilê Kurdperwerên Kurdistan reş, dilê dijminan ji, şa û geş bû.

Roj û mehe derbaz dıbûn dıçûn. Ew Newêrgerên Kurdistan, ewên bêbext û doz fıroş li hındırê meclisa Tırk û

kûçeyên Anqarê de, mina mêşên gemaran vırde-wırde dıçûn û dıhatın. Kêf-kêfa wan bû. Ewana lı dorbera Mıstefa Kemal de mina berdestan dızıvırıyan, dıçûn û dıhatın. " Ferman ke paşa ê mın ferman ke" dıgotın. Hemû bûbûn xulamê Mıstefa Kemal û xulamê dewleta Tırk. Bı taybeti kesên mina Diyap Axa û kesên dın.

Rojek dı rojan de, çend Newêrgerên Kurd xwastın ku pırsa Kurdistan bıkın babeta rojev a Meclisê. Ewên ku nûva lı xwe hesiyabûn. Daxwaziya wan ewbû ku, lı ser pırs û rewşa Kurdistan bıaxıfın, lı ramana Mıstefa Kemal û ramana hemû Newêrgerên Tırk û Kurd guhdar bıkın, gelo ew çı dıbêjın û çawa lı rewşa Kurdistan dınhêrın. Jı lewra Mıstefa Kemal û hemû hevalên wi, lı beri şerê Rızgariya Tıkiyê de, soz dabûn serok û rêberên Kurd û Kurdistan, ku pışti serketinê, gelê Kurd jı bıgihêje azadiya xwe û qedera xwe bı xwe tayin bıke, bıbe xudan heqê xweyê çarenûsi. Lê wexta ku wan Newêrgerên Kurdistan xwastın ku pırsa Kurdistan bıkın rojev a meclisê, Mıstefa Kemal û hemû hevalên wi, lı dıji wê pırsê û pêşneyarê derketın, gotın" çucaran ev tıšta nabe". Bı taybeti Mıstefa Kemal hêrs ket, bû agir û bızût, mina miroveki har û hov êriş da ser wan Newêrgerên Kurdistan, bı dengeki bılınd va usa got:

- Kuro hûn çı dıbêjın û çı dıxwazın? Em hemû İslam bırane. Ev welat û ev dewlet ji, yek perçeye, qet nabe du perçe. Lı devê bavê keseki de ji neketiye ku, ew ji Tırkiyê perçe bıke. Ez û hemû hevalên mın, em qet peyv û pêşneyarên usa, axaftın û daxwaziyên usa naxwazın bıbıhısın û guhdar bıkın. Tırkiye jı bona gelê Tırke; welatê Tırkane. Xêncı gelê Tırk, hemû kes û etnikên ku lı vi welati de dıjin, ewana ji, xulamê gelê Tırk'ın. Ez bawer dıkım hemû kesan ez bıhistım û tégıhiştım ez çı dıbêjum".

Lı nav wan heftê du Newêrgerên Kurd de, bêt guman hın kesên dılpak û dılsoz ji hebûn, balam sed mıxabın ku ew hatıbûn xapandın. Bı taybeti kesên wek Hesên Xêyri.

Wi li Mîstefa Kemal pîrr bawer dîkir. Lewra ew bî xwe ji mina Mîstefa Kemal serbazeki dewleta Romê bû. Wi li pişti hêrketin û harbûyina Mîstefa Kemal de, heqê axaftinê li serokê meclisê stand û rabû serxwe, jî Newêrgerên Kurdan ra usa got:

- Bînhêrîn geli biran û hevalên birêz, Mîstefa Kemal Paşa rast dibêje û gotinên wi hemû li şûnêdane, hemû rastin. Ez bawerim çu kesek naxwaze ku Tîrkiye perçe bibe. Em Kurd ji naxwazîn. Lewra em Îslam birane; em dikaribîn bî hevra bixebitîn, welatê xwe pêşva bîbîn, welatê xwe şên û geş bîkîn. Çiye ew pîrs û veqetandin? Em naxwazîn li birayê xweyên Tîrk veqetîn, ev jî bona me ne pêwîste..

Ew axaftina Hesên Xêyri li Mîstefa Kemal gelekî xweş hat. Jî bone ew jî, Mîstefa Kemal li şûna xwe de rabû çû cem Hesên Xêyri, pê destê wi girt, bî kip givişt, herdu aliyên gepên wi jî maçkir, dest li piştê Hesên Xêyri xist û jî Hesên Xêyri'ra usa got:

- Hesên beg, bî rasti tu miroveki pîrr dîlsozi, te dilê min û gelek hevalan zef şakir, ez bî dîlda jî tera spas dîkîm. Tu qenc guhên xwe li ser minde. Ez dîxwazîm tu sîbe kîncên xweyên Netewî li xwekî, bî wan kîncên Netewa Kurd va werî meclisê, ez û hemû kes jî, te bî wan kîncên Kurdi va bîbinîm.

Hesên Xêyri werge jî kir û ew fermana Mîstefa Kemal anî şûnê. Rojtîra dîn wi kîncên Netewî li xwekir, bî kîncên Netewa Kurd va çû ket hindirê meclisa Tîrk, xwe li Mîstefa Kemal û li hemû hevalbendên wi, li hemû Newêrgerên meclisê, da temaşekîrîm. Lê sed mîxabîn ku, pişti serihîldana Şêx Said de, dadigeha "Serxwebûn" Hesên Xêyri jî tawanbar -sûcdar-hesiband û gazi wi kir û ifade a wi jî girt.

Dadgerê Tîrk li Hesên Xêyri pîrsiya:

- Hesên efendi, ma te çîra kîncên Netewa Kurd li xwe kir tu çûy meclisê? Kuro ma ew meclisa, meclisa we Kurdan

bû, ku te werge xwe xemiland û tu çûy keti hındirê wê meclisê?.

Lı ser pırsa Dadger, Hesên Xêyri bersiva xwe usa da:

- Beg efendi, Mıstefa Kemal Paşa werge lı mın xwast û werge amojgari - tavsıye - kır, mın ji ew xwastek û amojgariya wi ani şûnê, qet nêtek mına xırab ji tunebû, bawer bıkın, felan-bêvan, lê dadger qet guh neda bersivên Hesên Xêyri û ew gotinên Hesên Xêyri tu dırav ji nekır, wi havilek ji nedit. Ew ji mına hemû rêberên tevgera Şêx Said, bıırın bıne sêpiyê, benê bı rûn kırın gewriyê, cellat kursi lı bıne lıngên wida ji kışand, ew ji lı darda hate hêjandın û xenıqiya mır, cangori bû, çû kete nav refên cangoriyên Kurdistan. Lê wexta ku Hesên Xêyri bıırın bıne sêpiyê, ben kırın xırıkê, Hesên Xêyri bı dengeki bılınd va qiriya, usa got:

- Ey cangoriyên Kurdistan, hûn baskên xwe ji mınra vekın, iro ez ji tême ba we, dıvê hûn mın bıborinin, bıbaxşının, felan-bêvan, lê Hesên Xêyri pırr dereng mabû.

Pışti rakırına pırsa Kurdistan lı meclisê de, ewqas qewımandınên bûyeran, kuştın û dardakırına serok û welatevinên Kurdistan de, hınek serok û rêberên Kurdistan lı xwe hesıyan, serê wan lı dara tırba wan ket, lê sed mıxabın ku, êdı çu havilek û çu riyek ji lı pêş wan de nemabû, kar lı kar derbaz bûbû, çûbû.

Meleka çavêş, nexwaş û belengaz, ew bêbexti, kuştın û zılma Roma Reş pırr bıhistıbû. Ji bona ew ji tırsa wê her zêde dıbû. Wê wexta ku ew dengê top û tıfıngan bıhist, hêz lı joniyên wêde nema. Bı wê rewşê va ji, wê ew kar û berên der û hındır, deri dadan û kar-marên dın bı zorê anin şûnê û dûra çû ba Xeca zeyiya xwe, lı ber pıxêriga ağır de rûnişt û herduyan bı hevra destpêka giri û gazıkırına Xwedê kırın. Melek û Xec hım dıgiriyan, hım ji dılo-

randın û distiriyân. Giri û lorandına wan Hesenê piçûk ji lı xewê de hişyar kır. Vêca Hesen ji destpêka giri kır û sê deng ketın nav-hev. Te dıgot rewşa zılma Roma Reş lı Hesen ji eyan û beyan bûye. Wi dengê xwe her bılınd dıkır û xwe lı hêlanekê de dıgıvışt, dıxwast ku xwe vırde-wırde bavêje, lı hêlanekê de derekeve der, an ji diya wi, wi zû veke û şılıka binê wi paqij bıke û dûra ji bıke hambêza xwe, wi bımêjine.

Melekê dit ku Hesen haş nabe, qirin û girina wi her zêde dıbe, icar diyax nekır, lı şûna xwe de rabû çû Hesen lı hêlanekê de ani der, bı paçeki kevn va çêq-mêq û nav-seqên wi û tilorên wi paqij kır, carek dın ew disa pêça kır hambêza xwe, mêjand haş kır, dûra pêçeka Hesen da ser sekûyê, lı wê dageriya bı lez û bez çû deri vekır, derket pêşiya dêri, ku guh bıde wan dengê top û tıfingan, gelo çı bû, çı nebû, ki lı derva heye, ki tune, gundi çı dıkın, çı nakın, ki mır, ki ma.

Melekê lı derva, bı qenci lı kuçeyên gund û lı dorbera gund nihêriya, lê ji bona rama Xwedê wê ne kesek lı derva dit, ne ji dengek lı aliya keseki de bihist. Lı dilê xwe de xwast ku bıçe mala cinareki, balam Xeca zeyi hate bira wê, nexwast ku zeyiya xwe tenê cihbihêline û bıçe maleki. Bı kûrahi hênijiya û disa dageriya cem Xeca zeyiya xwe, lı şûna xwe de rûnişt, disa kete nav tırs û xofê, xem û xeyal û teşqelan. Tırsek mezın kete zık, ji bona mêrê xwe û kurê xwe xemgin bû, bı xwe bı xwera, gelo" ew çıbûn, çı hate serê wan?" got.

Xidê naxırvan lı tev kurê xweyê mezın Xidê piçûk lı ber naxıra pêz û dêwêr de bû. Wi û kurê xwe pez û dewar lı pawana-mera-gund de dıçêrandın. Naxıra pêz û dêwêr lı nav giyayên hêşın û nefelên xweşik de dıçêriyan, zıkên xwe têr dıkırın. Bav û kur ji, lı herdu aliyên naxıra pêz-dêwêr,

lî ser kevîreki bîlînd de rûniştîbûn lî naxîra pêz û dêwêr dînhêriyan, ku gur-mur, dîz-mîz nekevî nav naxîra pêz; pêz-dêwêr telef nekî, nedîzî. Lewra lî Kurdîstanê de gur jî pîrr bûn, dîz jî hebûn. Dîz hebûn, jî ber ku dijmin gel kirîbû nav dorvebirînek herî bed û bêt mîrovî. Rê û dîrb lî gel hatîbûn qutkîrî. Gel tî û birçî mabû, jî birçîbûnê ra û mîrîm-mayînê ra şer dîkîr.

Belê, bî taybetî, lî demên zîvîstanan de, lî ser kaş û çîyayên Kurdîstan de, gur'ên har û birçî geleki zêde dîbîm. Lî şevên tari, mij berf û pûkan de, dadîkevî nav gund û mezran, êriş dîdîm ser kûçîkên gundîyan. Jî ber ku, lî demên zîvîstanan de hemû dewar û pez lî axur û goman de dîminî; gur nîkarîbî lî pêz û dêwêr tişteki bîkî, zîkên xweên birçî têr bîkî. Pîrr caran lî wan şevên tari de, lî nav gur û kûçîkan de şerên mezîm derdîkevî. Lî wan şeran de gelek kûçîkên Kurdan lî alîya gurên har û birçî de telef dîbî, têne kuştî. Zurbeyên gurên birçî wan kûçîkan dîxenîqînî, dîkujî, goştên wan dîxwî û zîkên xweyên birçî têr dîkî.

Bî rastî jî tîrsa guran lî dilê hemû şîvan û gavanên Kurdan de, geleki zêdeye. Şîvanên Kurdîstan her tîm bî çar çavan lî dewar û pezên xwe dîhêrî û dîpên. Lê hezar mîxabî ku, dijminê dewar, pez û hemû hebûnên gelê Kurd, ne tenê ew gurên har û birçî û çar lingî; her usa jî, gurên har, hov, ewên du ling jî her zêdene. Gur û hîrçên du ling her roj, her sal û her dem zar û zêçên gelê Kurd bî barbarî dîkujî, laşên wan jî teyr û tûran ra, hîrç û guran ra dîkî xwarî. Ango gur-hîrçên du ling, hezar carî jî gur û hîrçên çar ling zêdetîr bêbextî, harî, hovî, dijminê mîrovatîyê, wîjdanên wan qet tune ew bêt ramî.

Xîdê naxîrvan lî ser kêvîr de rûniştîbû, lî çar alîyên naxîra pêz û dêwêr dînhêriya, sehi-kontrol-dîkîr, kîlama Bêhrîvanê dîstîrand. Pez û dewar jî dijêriyan, zîkên xwe têr dîkîrî. Pîraniya miyan zîkên xwe têr kirîbûn, serên

xwe ji kirbûn bin zikên hevûdu, werge dumeşyan dîçûn li bin siya daran de mexel dibûn, dikayîyan. Xîdê ji li wan dînhêriya û dîstrand. Pîştî kutabûna kîlamê de rabû ser lîngan, bî dengeki bîlînd va gazi kurê xwe kir û usa ji kurê xwera got:

- Kurê minê bîaqîl û delal, çavên xwe çar veke, qenc li dêwêr û pêz binhêre, mehêline pez û dewar li hev belav bibe; lewra li van deman de gur her zêdene; divê em pez û dewarê gel ji guran û dîzan bîparêzîn, guran nekîn nav naxîra pêz û dêwêr, mîqatî dîzan bin.

Pîştî ev şîreta bavê, Xîdê piçûk usa bersiv da bavê xwe:

- Tu qet metirse û xem meke Apo, ez kurê teme, bawer ke ez qet nahêlîm çu teyrek ji li ser naxîra pêz û dêwêr de bîfire, bîla dilê te hêsa bibe. -Lî gelek cihên Dêrsîm de, zarok ji bavê xwera" Apo " dibêjin-

Xîdê naxîrvan wexta ku ew bersiva kurê xwe bihist, ge-
leki dilşa û kêfxweş bû. Dûra disa li ser kêvir de rûnişt, -
kete nav xem, xeyal û mîtalan, jan û êşên jîyanê û cihanê,
werge li şûna xwe de noqîn bû ma.

Xîdê naxîrvan navê xwe pîrr hezdîkîr, navê xwe pîrr
dîevinand. Wi xwe bî xwera û kesên dînra, şîrovekirîna
navê xwe usa vedîkîr û usa dîgot:

- Navê min, navê" Xîzîr eley selame " jî bona ev e ku,
min navê kurê xwe daniye Xîdîr. Ez qurbana navê wi bîm.
Ev nava, naveki zor girane, evrar û pîroze. Xîzîr her tîm
li ser kelek, keşti û lotkan daye-kayîk-ew li her derê de
hazîr û nazîre; ew her tîm jî bona arîkari kirîna hejar û
belengazan de amadeye; ew hêviya hemû hejar û belengazên
ev cihanê ye, ew felatkare, ew xudan rame, ew
mezîne, ew her tîşte...

Belê, Xîd û Xîdan werge dîgotîn, werge ji dibêjin. Lê
Xîdê belengaz qet nedîani bîra xwe, heke ku bî rasti Xîzîr-
-mîzîr hebana, diviyabû ku, Xîzîr jî hejar û belengazên
cihan ra arîkari bîkirîna, destên xwe dirêje wan bîkirîna,
Xîdê reben ji bîdîtana, ew jî li hejar û belengaziyê û dest-

tengiyê de derxistana, Xîd û hejarên cihan ji li wan zamet û jiyana xızaniyê de felat bîbana, ew ji mina mirovan bijiyana. Lewra hejar û belengazên mina Xîdê zêdetır, qet keseki werqas gazi Xızır û Xwedê nedikir û nakin ji. Xîd û Xîdan qet nedianin bira xwe û naynin ji, ma çira ew kesên ku werqas gazi Xızır û Xwedê dîkin, li nav jiyaneke xızani û neçari de dijîn? Ma çira hemû gelên bîndest, çerm reşkên cihan li Afriqa, li Emrika, her roj bi sedan, carna bi hezaran, li bî destên kedxwaran, mêtinkaran de têne kuştin? Ma çira Xızır û Xwedê li wan zîlm û zorên neheqî, kuştin û lêdan û êşkencan dînhêrin, dengên xwe dernaxinin, bêdeng dîminin? Xîdê bi çavên xwe va ditîbû, bi guhên xwe va ji bîhistîbû, ku gelê Kurd, li hîndirê dirokê de, bi sed hezaran hatîbû kuştin. Dîjminên xwînxwar û barbar gelek zîlm, zor û sîtemkariyên ne mirovi anîbûn serê gelê Kurd. Wana bêbextiyên mezûn li gelê Kurd kirîbûn. Ma çira Xızır û Xwedê li hember werqas neheqiyên barbarî de, li hember werqas kuştina zar û zêçên bêt gune de dengê xwe dernexistîbûn? Ma çira wana çavên xwe kor, guhên xwe ji kerr kirîbûn? Ma çira qet keseki ew bêdengiya Xızır û Xwedê pîrs nedikir?

Belê, ev baweriyên usa li nav Xîd û Memên Kurdan de her riçal dabûn û mêjoên wan li baweriyên werge va hatîbûn tîjikirin, derewên mezûn dewîsandîbûn hîndirê serên wan. Xîd û Meman, Elo û Huso, Fat û Xecan ew pîrsên jorin qet nedianin bira xwe û qet li xwe pîrs nedikirin.

Birûbaweriyên hejar û belengazên Kurd ewbûn ku, ki ku li ev cihan de kar û berên qenc bike û bine cih, wê ew kesa pîştî mirîna xwe de yekser diçe bîhiştê-cennet-î kêleka pêxember Mihemed de rûdine, çil hûri û melek ji li dorhêla wi kesi de dîzîvîrin, dîçin, tînen dîreqîsîn; şerava Goze pêşkêşe wi kesê dîlpak û dîlsoz dîkin, dîlê wi şa, ruhê wi ji şad dîkin. Lê ki ku li ev cihanê de ji kar û berên nebaş bike, mirovan bîkuje, zar û zêçan serjêbike, keda hejar û belengazan bîkuje, dîziyê bike û tîştên heram

bixwe, wê ew kesa ji, li pişti mırına xwe, li axretê, ew cihana rast de, li sitila qetranê de bikele, li agirê dogeh de bişewite û ceza xwe bîbine û bîkşine. Lî gor ew birûbaweriyê hemû kesên zalım û xwinxwar, serdest û kedxwarên cihan, wê ew li dogeh'ê de bijin, li sitila qetranê de bêne kelandın û şewitandın, hejar û belengaz ji, li bîhişt'ê de, li gel pêxamber Mihamed, tev hûri û melekan de bijin. Bavan jî zarokên xwera, şêx û seyid'an ji, jî mirûdên xwera usa dıgotın:

- Ev cihan, cihanek derewçine, mina xaneki, an jî mina otelekiye; mirov lê dibe mivan, têda radize hêsa dibe, rojtira dın derdıkeve dıçe. Jiyana ev cihan usaye. Lê balam tenê cihan û jiyanek rast heye, ew jî ne ev cihane. Cihan û jiyana rast axirete. Dıvê mirov li axirtê bawer bike û jî bona axireta xwe kar bike. Jî ber ku Xwedê jî qûlên xwera usa gotiye û usa şiret li me kiriye. Lê ku em bêne kuştın, zılm û zorê bîbinın, tazi û bıçi bîminın, dıvê çî tê serê me bıla bê, evana hemû bı fermana Xwedê, bı fermana Xızır û Şahê Merdan va dıbin û têne cih. Mana tışt, kıret û serpehatiyên usa ewe ku, Xwedê li ser eniya mirov û gelan de werge nıvisandiye. Em kesek qet nıkarıbın fermana Xwedê, Rebê alemê bıguhêrinın, li dıji fermana Xwedê dekevın. Bılı van tıştan, dıvê mirov zanıbe, Xwedê hejar û belengaz, hejar û belengaz afırandiye anıye cihan, axa, mir û kesê dewlemend ji, disa axa, mir û dewlemend afırandiye, anıye cihan. Ev zagona Xwedê ye, ki ku dıji ferman û zagonên Xwedê derkeve, ew mirova, miroveki kafıre, mınafıqe û aqıl bodleye, qetla wi kesi jı helale.

Xıdê naxırvan jı werge bawer dıkır. Lewra ew cıvata ku Xıd li nav de dıjiya, wê cıvatê werge dıgot, werge bawer dıkır; baweriya tevahiya gel werge bû. Wan baweriyên bêt bıngehın jı gelek xesere dıgıhandın Tevgera Rızgarıya Kurdıstan û doza Kurdıstan. Dıjınan jı li ew baweriyên werge de kêr dıditın.

Xîd lî ser kêvir de dirêj bûbû, enîşka milê xweyê çepê ji dabû ser kêvir, serê xwe ji dabû ser kefa destê xwe, bî destê xwe ê rastê va ji, çò ê xwe girtîbû kirîbû destê xwe û ew çò ê xwe radikir lî kêvir dixîst, kêvir dikir teqe-teq deng derdixîst. Xîdê kevîr jî xwera kirîbû def, çò ji kirîbû kutek, meqameki awazi derdixîst. Jî ber ku hedûra Xîdê nedihat, xew ketîbû ser Xîdê; dixwast ku jî bona çend hûrdeman serê xwe dayne, piçeki bikeve xewê. Lî xwe qenc hesiya û dit ku xewa xwe zêde tê, vêca gazi kurê xwe kir, bî dengeki nîzm û milayim va, jî kurê xwera usa got:

- Lawê minê delal û bîaqil, tu lî dêwêr û pêz qenc bin-hêre, kambax û mêrata xewê zef ketiye serê min, ez dixwazim heweki lî ser ev kevîri de paldim, serê xwe daynim dirêj bîbim, piçeki bikevim xewê, çavên xwe germ bikim, dûra tu gazi min bike, lî xewê de min hişyar ke. Eman ez qurbana canê tebim, tu pêz û dêwêr nebi ku lihev belav biki. Te ez bihistim û ez guhdar kirim lawê min?. Xîdê piçûk bersiva bavê xwe usa da:

- Serseran Apo, tu qet xem meke, bikeve xewê, canê te çî wext dixwaze, tu lî wê wextê de rabe, an jî ez te hişyar bikim. Ango êdi bî xwasteka te.

Dîlê Xîdê gelekî şa bû. Wî çò ê xwe dani ser kêvir, tûrîkê nanê xwe ji da ser çò, serê xwe dani ser tûrîk û lî ser kêleka xwe a çepê de palda, şevqeyê xwe ji daxîst ser çavên xwe, ku şevqe rûyê wî lî bin tava rojê de bîparêzine, jî wîra bibe sih. Piştî du-sê hûrdeman de Xîdê çavên xwe dada, ku êdi piçeki bikeve xewê, nîşka ve dengeki kîre gume-gum, te digot" çiya û erd dihêjin, tofanê destpêkîriye". Xîd bî wan dangan va hîlfîriya serxwe, şevqeyê xwe lî ser serê xwe de serast kir, çò ê xwe kîre destê xwe û lî ser kêvir de bazda jêr, bî lez û bez lî dêwêr û pêz nihêriya; dit ku hemû naxira pêz û dêwêr bî wan dengên top û tîfîngan va lî hev belav bûne, vîrde-wîrde bazdîdî, mîrov

dîbêje" gurên har û birçi ketine nav naxîra pêz û dêwêr" Xîdê piçûk ji, li dorbera naxîra pêz û dêwêr de dîke qirin, gazin û hawar, ku pêz û dêwêr kombîke, bine ba hev.

Belê, leşkerên Roma Reş li leşgergehê xweyên Xarpitê de derketibûn, bervî Dêrsim dimeşîyan. Lê serdarê artêşa Tirk, hukumata Tirk û hemû çapemeniyên-basî-Tirk dîgotin" leşker derketiye tetbîqatan dîke". Balam ew derewek mezin bû. Hukma Romê xwe jî bona şer amade dîkir û bervî Dêrsim dîçû.

Xozat li Xarpitê piçeki nêzik bû. Jî bona ew ji dengê top û tîfîngan qenc dihat bihistin. Li wê rojê de ew dengana ne tenê li herêmên Xozatê de hatibûn bihistin, ew her usa jî, li aliya Pêrtêg, Çimişgezêk û Mêzgîrê de ji hatibûn bihistin û dengvedan dabûn. Firokvanên Tirk, firok û helikopterên xwe diajotin ser Dêrsim, li ser gundan de gelekî nîzm dîfîrîkiyan, bombe li ser hîm ciyan de berdîdan, gel dîkuştin. Li wê wextê de, keça Mîstefa Kemal a zîrza Sabiha Gokçen jî li tev firokevanên dewleta xwe de bû. Ew jîna yekem bû ku li nav gelê Tirk de bûbû firokevan. Mîstefa Kemal ew jî xwera kiribû ewlad. Ew jîna ji mîna zîrde bavê xwe, bî taybetî bûbû dijminê gelê Kurd. Mîstefa Kemal li wê aliyê va, ew jî lûl kiribû, serê wê jî şostîbû kiribû dijminê gelê Kurd. Jî bona ew jî, wê bêbextê li hemû firokevanan zêdetir êriş dîda ser gelê Kurd, bombe li ser Dêrsim de dîbarand, zar û zêç dîkuşt, gund û mezîre dîşewitand. Hukma Tirk jî wan kîret û barbariyên xwera dîgot" leşker tetbîqatan dîke, bî talim terbiyan va xwe dîcêribîne". Li hember ewqas barbariyan disa jî çu kesekî bawer nedîkir, ku artêşa Tirk bî mirî-resmî-êrişek barbarî va qol bavêje ser Dêrsim. Lewra tevgera Dêrsim gelekî xurt bû, hukma Romê jî, li tevgera Dêrsim zef dîtîrsiya.

Êdi dema nivrojê û wexta xwarin fîravînê bû. Tava rojê ji geleki germ bû, tin dîda mirov. Herdu Xîdan ji pez û dewar komkîrîbûn li dora naxîra pêz-dêwêr de dihatin û diçûn. Bî taybetî Xîdê mezîna ketîbû nav teşqelan dihiçîriya, guh dîda wan dengê top û tîfîngan, balam qet manek nedîda wan dengan û bî çavên xwe va ji tiştê nedîdit. Noqîn bûbû, ketîbû nav xem û xeyalan. Dûra vecîniçiya ser xwe, serê xwe rakir, mîsta destê xwe ji da pêş çavên xwe û li rojê nihêriya û serê xwe serast kir û li siya bejna xwe mêzekir, dûra bî dengê zelal va gazi kurê xwe kir û ji kurê xwera usa got:

- Lawê minê delal, zûke êdi em pêz û dêwêr bîbin nêzîka gund; lewra çî dibe, çî nabe. Dûra wext ji êdi li nivrojê derbaz bûye. Tu ji li bejna siya xwe binhêre. Mîna li siya xwe nihêriya û pîva. Siya mîna li sê lîngan zêtîr dirêj bûye. Ez dibêm çêtîre em naxîra pêz û dêwêr bîbin binê gund. Tu li wêderê pêz û dêwêr binhêre ji bona çend hûrdeman, ez ji biçim gund, li gundiyan pîrs bikim, gelo ev çî dengîna hubîkîm, dûra ji herîm mal li diya te binhêrim ela ew çîto bû. Lewra çavên wê pîr diêşîyan, ew geleki ji bêkêf bû.

Xîdê piçûk berî ku bersivê bide bavê xwe, wî ji li rojê nihêriya, dûra xwe bî qenci tik kir, bî lîngan siya xwe pîva, pişt ra berê xwe guhart ser bavê xwe, ji bavê xwera usa got:

- Başê Apo, tu çawa dixwazi em werge bikim. Bî rasti ez ji geleki xema diya xwe dikim, heweki ji birçî bûme. Çêtîre tu biçê him diya mîna bîbine, gelo rewşê wê çawa bû, him ji huke ew dengana çîne. Jî xwe birmeke, jî mîna nan-manê teze bine.

Herdu Xîdan bî lez û bez pez-dewar berhev kirin, dan pêşîya xwe li rê xistin, berî gund ajotin. Wexta ku naxîra pêz û dêwêr gihandin binê pozîkê Torût'ê, Xîdê mezîna ji kurê xwera usa got:

- Kurê min, ev çî geleki qence. Jî bona pêz çêre ji başê. Naha tu li vîra ber naxîrê bisekîne, çavên xwe çar veke,

pez-dewarên gel qenc bînhêre. Nebi ku tu bitîrsi, qet metirse, ez biçim gund lî gundiyan pîrs bîkîm, gelo ew dengana, dengên çî bûn, hubîkîm û disa dagerîm bê m ba kurê xwe. Bibe ku disa eşîrên me lî nav xwe de ketine nav şer û pevçûnan. Ango çî dibe, çî nabe, pîrs bîkîm çêtîr dibe. Lewra mî n gelek caran bî çavên xwe va dîtîye. Lî nav eşîra me Bextiyaran û Pilvankîyan de, lî nav Demenan û Ariyan de, lî nav Şadiyan û İzolan de, lî nav gelek eşîrên dî n de şerên çekdari çêdîbûn, gelek kes dîhatî n kuştî n, xwî n dîhat rîjandî n. Pîrr caran eşîrên me dij mî nê xweyên biyani jî xwe bîrdîkîrî n, bîrdîkî n jî. Sedemê wan şer û pevçûnan jî, erd û sinor, ava zevî û bostanan, keç revandî n û tîştên herî erzan, felan-bîvan bûn. Axa û mirên me lî qonaxên xwe de rûdî nîştî n, ferman dîdan xulam, şivan, gavan û berdestên xwe, wan hejar û belengazên Kurd jî, hevûdu dîkuştî n, xwîna hevûdu dîrîjandî n. Lî wan şeran de ew kesên bê t gune û bê t sûc dîhatî n kuştî n, dîmîrî n. Çendek lî dû wan şeran de derbaz dîbû, nedîbû, îcar gazi şêx, seyîdên xudan ocax û mîr, axayên qedîr bîlînd û gîrambar dîkîrî n, ew dîhatî n, dîketî n navbera wan eşîrên şerkîr, mîslet pêkdîanî n û lî wan civî n û mîsletan de serokên eşîran lîhev dîhatî n, wana rûyê hevûdu jî maç dîkîrî n, disa jî hevra dîbûn dost û yar, dîbûn kirîv û mîsaîb-zavabîra- xudanên kuştîyan jî dîbûn dij mî nê n hevûdu û lî kuştîna hevûdu dîpiyan, ku çawa xwî n, qesas û tola xwe bîstî nî n. Tu bî xwe jî dîbî nî kurê mî n; êdî aqlê te jî dîgîhêje van tîştan. Yê n ku lî wan pevçûn û şeran de dîhatî n kuştî n, jîyana xwe wenda dîkîrî n, hemû bî valaî dîçûn, dîbûn qurbana mîr û axan. Lê dûra çî dîbû? Dûra jî zar û zêçên wan kesan sêwî, jî nê n wan jî hemû bî dîman, dîketî n nav rewşek herî xîrab. Tî û bîrçî dîman, kesekî qet jî wanra arîkari nedîkîr. Ew jî lî ber wê rewşa bîrçîbûn û xîzaniyê de, lî gundên xwe dûr dîketî n, warê bav û kalên xwe dîterîkandî n, dîçûn dîketî n bajarên dij mî nî n; lî wan bajaran de dîbûn paqîjvanên kûçan û avdestxanan, der-

gevanên avayîyan, barkêşên sûk û stringehan. Pîrr caran wan belengazan ew karana ji nedîditin, li kûçan û parkan de radîzan, bi birçîyan û nexwaşîyan va dîmîrîn. Yê ku nedîçûn bajaran, ew ji bêt heq û bêt dirav dibûn berdestên mir û axan. Hin mir û axan ji, bi wan jinên bi dileyiztî, namûsa wan qirêj dîkîrîn. Her waha kurê min, ez dirêj nekîm, iro ew dengê top û tîfîngan, ew şerana anîn bira min. Ez bêtir li şerê navbera eşîran ditîrsim. Dirêj nekîm kurê min, divê ez biçim, bêm, tu ji muqati pêz-dêwêr be, bû ez qurban?

Xîdê piçûk heya dawiyê bavê xwe guhdar kir, dûra ji bavê xwera usa got:

- Başe Apo başe, êdi tu biçe, qet xem meke, lê zû were.

Xîdê bav"erê-erê"got û bi bez û rev li rêket berida aliya gund. Xîdê piçûk carek dîn bejna xwe tik kir li siya xwe nihêriya, lê bejna siya wi hinek dirêj bûbû. Lewra li wi zemani de li Kurdîstanê seat-meat nedîhatin ditin. Seatên gelê Kurd siya wan û dengê dikan bû. Xîdê piçûk ji wext werge pêdan-tespît-dîkîr. Li demên havînê de pêdandina wextê bi taybetî siya mîrov bû. Dengê dikan ji seatên hemû demsalên Xwedê bûn. Li demên bihar û havînê de, siya mîrov ku kî dibû, roj dîhat dîket dûşa serserê mîrov, li wê hengavê ra" nivroje" dîgotin. Dûra wexta ku sih dirêj dibû icar dîgotin" nivroj derbaz bû, roj bervî ava dîçe".

Xîdê piçûk çito ku pîvandina siya xwe qedand, bi dengê bilînd va gazi bavê xwe kir; got"Apo min ji xwe bir-kîr, ku ji tera bibêjim, tu bi kerema xwe ji minra seriyek pîvaz bine. Ji ber ku ev nanê ku tûrik de maye gelekî hişk bûye, naye xwarin, li gewriya mîrov de naçe jêr. Heke ku nanê genim bana, ew nerm û xweş dibû, dîhat xwarin, pîvaz-mîvaz ne pêwîst bû, min nedîxwast ji. Balam ev nanê niv ceh û niv garîse. Ev nanê kambax ji mîna qûtê mîrîşkan û qûma ber çeman û behrane. Tu ji minra pîvazeki bine, ez pîvazê ji xwera bîkîm qatix". Xîdê bav" bû

bû kurê mın"got û bı lez bervı gund çû; lı pıştı çend hûr-
deman de xwe gihand gund, ku çı bıbine, gund ten-
ha-issız-bûye, qet kesek lı derva naye dıtın, gund firêqete,
xêncı dengê kûçikan çu dengek naye bihistın. Jı bona wê
rewşê xofa dilê Xidê bêtır zêde bû. Wi yekser berê xwe da
aliya mala Reşo, çû lı pêşiya dêri de sekını. Dıt ku pêşiya
dêri de gelek çarix hene. Xıd têghişt ku lı mala Reşo de
gelek mivan hene. Wi ji deri tanda û kete hındır ku çı
bıbine, pıraniya gundiyan hemû lı wê komb ûne, mezın lı
alíkide rûniştine lı nav xwe de ketine nav gotûbêjan û
gengeşıyan dıpeyvın, jın û xort û zarok ji lı wan guhdar
dıkın, hındırê malê lı nav dıyê cıxaran de maye, kesek
dêri venake ku hewa ê paqıj bıkeve hındır. Çawa ku Xıd
kete hındır, hemû kes rabûn ser lıngan, Xıdê sılav da
hemûyan û sılava Xıdê hate ragırtın. Dûra şında rûniştinê
lı Xıdê temaşekırın, Xıdê jı malxweê malê û hemû kesan
ra spas kıır, beri ku lı şûna xwe de rûne, jı hemû kesan ra
usa got:

- Ez lı we tıka dıkım, hûn mın gunekar mekın, keremkın
rûnın ela, dûra ez dıxwazım çend pırsan lı we pırskım.

Hemû kes dısa lı şûnên xwe de rûniştın, lı hıviya pırsên
Xıdê de man. Xıdê destûr lı hemû kesan xwast û waha lı
gundiyan pırsiya:

- Geli xwişk û biran, ev çıye hûn hemû gundi evqas lı
vıra kombûne? Gelo ev xêre? İro ew çı dengê top û tıfın-
gan bûn dıhatın? Ma we kesi hukır ew çı deng bûn?.

Hemû kesan dıxwast ku rûsıpiyek bersıva pırsên Xıdê
bıde, lê Xıdê ev fersend û dor neda keseki, axaftına xwe
usa berdewam kıır:

- Geli biran iro me pez-dewar bıribû nêzıka çiyê, lı bıne
quntera çiyê de dıçêrand. Hewa ji iro geleki xweşe. Kêfa
mın dıhat lı nav şınaiya vê demê û pêşdariya Xweza de
-tabiat- ez derketıbûm ser kevıreki, mın lı pêşdariya
Xweza dınhêriya, bêhna Gul, Sosın û çiçegan ji ez mest
dıkırım. Dûra xewa mın hat, mın xwast ku piçeki serê xwe

daynum, çavên xwe germ bıkım, nişka ve wan dengan ez vecınıqandım serxwe, rabûm ku çı bıbinım, hemû pez û dewar lı hev belev bûne, kurê mın Xıdır dıke qırın û hawar, lı dora pêz û dêwêr de dıçe tê û dıgire. Ez rabûm çûm arikariya kurê xwe, me pez-dewar komkır ajot ani binê gund. Naha pez-dewar lı beroja binê gund de dıçêrın, ez ji hatım ku lı we pırs bıkımew dengana dengên çı bûn? Gelo ew lı kijan aliyê de dıhatın? Bı rasti ez dıxwazım lı ser wan dengan serwext û agadar bıbım. Dıvê hûn bı kerema xwe mın agadar bıkın.



Lı nav gelê Kurd de, adet û kevneşopiyên bav û kalan gelekın. Yek jı wan kevneşopiyên gırıng ev bû: Ki ku lı derva bê, dêri veke bıkeve hındır malê, dıvê hemû neferên wê malê -piçûk be, mezın de- bêt şert û merc lı şûna xwe de rabın ser lıngan, cih bıdın wi kesi, bıdın rûniştın, dûra ji ew bı xwe rûnın, rewş-demên wi kesi pırs bıkın û wê karguzariya xwe bıqedinım. Lê wexta ku kesek lı şûna xwe de ranebana, ew keşa dıhat naletkırın, lı nav gelde miroveki bêt şerm û bêt edew dıhat naskırın û hesabandın. Ev adetên usa perçeyên çanda gelê Kurd bûn. Gıramiya mirovatiyê dıda temaşekırın û xuyakırın. Jı bona ev adetê, lı nav gelê Kurd de usa tê gotın" Seriyeki zêrın hate derde, dıvê kûna bı gû rabe lı berda". Jı bona ev adet û gotinê, usa şirovekırına ev qeidê dıkırın: Dıgotın" Serê mirov padişahê bedena mirove, hemû gewher lı serê mirovdaye. Wexta ku seriyeki gewher û zêrın lı derva tê dıkeve hındır, dıvê hemû kes kûnên xweyên bı gû û qırêj lı ber wi serê gewher û zêrın de rakın. Lewra her tışt lı serê mirovdaye. Seri û mêjoê sêri ku nebe, mirov mina heywane, Xwedê nenase. Serê mirov gotiye" Xwedê heye". Mana ev

ewe ku, Xwedê li serê mirov daye divê mirov li ber seri de rabe, giramiye bide serê mirov û mirovan.

Malxweê malê Reşo cih temaşe Xidê kîr"fermo kek Xidîr, de keremke tu rûne, dûra ez jî birayê xwera bibêjûm ew dengana, dengên çî bûn"got û Xid da rûniştin. Xidê jî Reşora spas kîr û usa got:

- Kek Reşo bawerke wexta mîna rûniştandinê qet tune. - Lewra ew kurê minê reben tenê li ber naxîra pêz- dêwêre; çî dibe, çî nabe, gur hene, diz hene, felan. Çêtire hûn jî mînra tîştêkî bibêjûm, mîn agadar bîkîm, ez jî zû dagerum ber naxîra pêz û dêwêr, ba kurê xwe.

Reşo dit ku bî rasti Xid gelekî lez dîke ku biçe, gelekî jî xemgîne berxwe dîkeve, êdî nexwast ku Xidê bî zorê bide sekinandin, bî kurtasi jî Xidê ra usa got:

- Bîrayê delal, bawerke, bî navê Xwedê em jî qenc nîzayî, ku ew dengana li kuderê de tîn û ew dengana jî bona çîne. Du roj berê ez li Xozatê bûm. Ez çûbûm ku jî malê ra hîn hûr-mûran bîkîm. Berî ku ez bîçûm firotxanê--dîkanê-dayîn-standînê bîkîm, ez çûm çayxanê de rûniştim, xwediyê çayxanê jî mînra çayek anî, mîn çay vedîxwar, ez li dorbera xwe dînhêriyam. Li alîya mîna çepê de çend kes li dorbera xonçêkî de-masekîde-rûniştibûn, li nav xwe de ketibûn hîndîrê gotûbêjan, guftûgoan, gengeşîya mesela Kurdistan dîkîrîm, mîn jî guhên xwe dabû ser wan ew guhdar dîkîrîm. Lê bêt derew hemû axaftin û gengeşîyên wan bî tevahî li ser mesela Dêrsûm û Kurdistan bû. Ew ketibûn nav ew meselê dîpeyivîyan, hayjî mîn nebûn, mîn jî li wan dînhêriya û guhên xwe dîda ser wan. Jî wan yekî waha dîgot:

- Çend roj berê ez li mala Şahan Axa bûm. Şahan Axa dîgot ku" me li Anqarê nûçeyên nû standîne, bibe ku li

heyamek nêzık de artêşên dewleta Romê êriş bide ser gelê me, qol bavêje ser Dêrsım. Ev nûçana, ew Kurdperwerên ku li meclisa Tırkan de Newêrgerın, ew kesên ku li sazgehên dewleta Romê de dixebıtın, kar dıkın, ewana hemû jı mera van nûçan dışının. Lı gor nûçeyên ku Newêrgerên Kurdistan jı mera şandine, lı gor gotinên hın Kurdperwerên Kurdistan, Mıstefa Kemal û hemû hevalbendên wi pırsa me Dêrsımıyan kırine nav rojev a babetên meclisê û meclisê bıryar jı standiye. Gor ku dıbêjın, hukma Romê êrişek mezın bavêje ser Dêrsım, pırsa Dêrsım jı lı holê rake; rewşa me Dêrsımıyan jı bıke mina rewşa tevkuştına Qoçkiri'yê, tevkuştına şerê Şêx Said û çiya' yê Agır. Çawa ku tê zanin, Mıstefa Kemal, tev hemû hevalên xwe, bı dek û dolavan va gelê Kurd xapand; dūra jı bı sedhezaran gelê me telef kır, kuşt, qıra gelê me ani. Xêncı ewqas kuştın, wi Kurd bêtır kırın dijminê hevûdu, dubendiyên dijminatıyê kire nav gelê Kurd. Wan dubendiyan lı nav gelê me de şûnek heri giring standiye, heya roja iro jı ew dubendiyan berdewamın. Bı taybefi Mıstefa Kemal û dewleta wi peywendiyên eşiri û peywendiyên Oli lı nav gelê Kurd de her gurr dıkın, gelê me dıxapının. Kurdên Sunni dıkın dijminê Kurdên Elewi, Kurdên Elewi jı dıkın dijminê Kurdên Sunni. Ev kar û fels, dek û dolavên usa lı heyama padişahê Osmanlı "Yawûz Sultan Selim" de destpêkırıye, heya roja iro jı ew bêbextiya berdewam dıke. Lê divê mirov destên xwe lı ser wıdanê xwe de, lê ku eşira Xormek, Lolan nebana dostên dijmin, ango ew eşirana ku nebana heval û xulamê dewleta Roma Reş, lı paşva pêşmergeyên Şêx Said nexıstana, ew bêbextiya ku neanina serê bırayên xwe, bıra kuji nebana Mıstefa Kemal û dewleta wi qet nedigihıştın armancên xwe û ew çucaran sernediketın. Bı rasti ew ne keys bû. Lê mıxabın ku, lı şerê Şêx Said efendi de, Kurdên Elewi bın leyiztokên dewleta Romê hatın xapandın û şaşitiyên mezın kırın. Lı tev dijminê bêbext û xwinmıj, bı hezaran bırayên xwe kuştın.

Bılı evana, wan kesan dıgotın, Şahan Axa gotiye ku, gelek Kurdperwerên Kurdistan jı mera her tum naman rêdıkın, nûçan dışının, ew lı nameyên xwe de jı mera dıbêjn"lı xwe û tevgera Dêrsım mıqait bın. Lewra Mıstefa Kemal û hukumata wi dıxwazın ku pırsa Dêrsım êdı dawı bının, çareser bıkın. Lê ku gelê Dêrsım lı diji dewletê her tum usa derkeve, dij derketına xwe berdewam bıke, wê ew qet lı hıstêrên çavên Dêrsımıyan nenhêrın, hemûyan bıkujın û Kurdan bı kuştınê bının rê. Xêncı ev, dewleta Romê waliyek ji şandıye Xarpitê, dıbêjn ew waliya mıroveki zor bêbext, qurnaz, Ehrimaneki-Şeytan-bêt namûs û bêt wıcdane. Ew dıçe nav Kurdên Elewi, jı Kurdên Elewi ra dıbêje"Mıstefa Kemal bı xwe ji Elewiye, ew Elewiyan zef hezdıke". Gazi Elewiyan dıke lı qonaxa xwe de Cem û cıvatan gırêdıde, lı tev Elewiyan zıkır dıke. Jı Elewiyan ra dıbêje"hemû kesên Sunni, bı taybeti ew kesên meseba İmam Şafı i hemû kafırın, qetla wan helale". Dıçe nav Kurdên Sunni, jı Kurdên Sunni ra dıbêje"Elewi ne İslamın, ew kafır û mınafıqın. Kı ku deh Elewiyan bıkuje ew kesa bêt pırs dıçe lı bıhışt'ê de-Cennet-rûdıne". Ango dubendiyên gemarın dıke nav gelê Kurd. Hukma Romê çarsed sal berê ev dubendiya kırıye nav gelê me, iro jı bı bêtır û taybeti wan dubendiyan gurr dıke, dıxwaze ku, lı nav gelê Kurd de dijminatıyê her zêde bıke. Lê lı nav cıvata gelê Kurd de jı gelek nezan, gelek bodle û xêşım hene, zû-zû têne xapandın, dıbın leyıztokên dijminan". Xêncı ev tıştên ku mın lı wan kesan bıhist û jı wera got, disa wan kesan dıgotın ku, Şahan Axa gotiye "me jı bona pırs û doza Kurdistan gelek caran hewl da ku, em hemû serokên eşırên Kurdistan werın ba hev, lıhev bışêwırın weka bıran, lı kêmasıyên hevûdu mêzenekın, hêzên xwe bıkın yek, lı hember dijminan de bıbın mına yek can û yek beden, ku em serkevın, bıbın xudan dewlet û xudan erdê bav-kalên xwe. Lê hezar mıxabın ku ev xwastek û daxwaziya me nehat cih, bú xem û xeyal. Serokên gelek eşıran

ji bona berjewendiyên xwe û dubendiyên Ol û meseban dûrva sekîniyan, nehatin ba hev. Hinek tenê bî serê xwe man, gotin"ji mera çî doza Kurd û Kurdistan, em hemû Îslam birane, çî Kurd, çî Tirk" hinekan gotin"em naxwazîn ji Kurdên Elewî ra bîbîn yek, peywendi girêdîn. Ji ber ku ew ne Îslamîn, şertên Îslamî naynîn cih, ev ji, ji mera guneye". Hinek ji yekser bûn hevalbendê dijminan lî tev dijminan kar kîrîn. Dijminan ji bî hêsa î gelê Kurd nêçîr kîr, bî sed hezaran Kurd kuştîn. Emperyalên cihan ji bûn hevalê dijminên me, Kurdistan perçe kîrîn, kîrîn çar perçe. Çar dewletan Kurdistan lî nav xwe de parvekîrîn. Kurd bûn xulamê Tirk, Ereb û Faris'an. Lê mixabe ku disa serok û rêberên gelê Kurd, lî werqas bûyer û qewmandînan, lî werqas kuştîn û lêdanan de qet dersên bî erênî dernexîstîn, disa bî tundi xwe lî dijminan va girêdan, yan ji lî malên xwe de rûniştîn" Marê ku min geznake, bîla hezar salî bîji" gotin.

Xîdê naxîrvan pez û dewar lî xwe bîrkîrîbû, lî tev hemû kesian Reşo guhdar dîkîr. Wî ji lî tev hemû rî sîpiyan"belê-belê kek Reşo rast dîbêje" dîgot. Lî wê navberê de Mîzûrê Bextiyar"mîn bî xwe ji ev tîştana lî devê Şahan Axa bîhîstîne. Wî pîrr caran ev tîştana wek şîretên bîratî, jî şêx, mîr û seyîdên me Kurdan ra gotîye, lê sed heyfe ku, qet kesekî guhdarê Şahan Axa û Seyît Rîza nekîrîne. Lî dawîyê de ji gelê me xeseriyên mezîn dîtiye, bî sed hezaran hatiye kuştîn"got û sekîniya.

Lî piştî ewqas axaftîn, gotûbêj û gengeşiyên pîrsa Kurdistan de, Xîdê naxîrvan lî malxweê malê û rî sîpiyên ku lî mala Reşo de rûniştîbûn, lî wan destûr xwast ku, ew jî çend peyvan bîpeyive, dilê xwe piçeki hêsa bîke. Hemûyan bî hevra"serseran kek Xîdîr, fermo, tu çî dîxwazî bîbêjî, destûr a Xwedê ye" gotin. Xîdê naxîrvan xwe lî şûna xwe de piçeki zîvirand û bî şermokî usa destpêka axaftîna xwe kîr û got:

- Geli bîran, mezın û ri sıpiyên hêja, hûn dîbêjun ku, me ev nûçana û gef xwarına dijmin bîhistine, ma çira hûn hemû lî şûna xwe de rûniştine û qet tiştêki nakin? Ma çira tevgerêk we tune? Bî rasti ev jî mera şermek mezine, kêmasiyek zor girînge. Dîvê hûn tiştêki bîkin, lî havîlekî bîgerin û bîbinin. Bîbe ku sîbe leşkerên Roma Reş êriş bîde ser Dêrsım, lê gelo dîvê lî wê demê de em çî bîkin?. Hukma Romê berî lî aliya Sêvaz'de, ango lî Qoçkiri yê destpêka kuştina gelê me kîr. Dûra şerê Şêx Said efendi û şerê çiya ê Agirê va gihişt armanca xwe, koka gelê me anî. Lî wan şer û tevkuştinan de ne pêwîste ku ez jî wera bîbêjun, hûn hemû jî lî mîn bêtîr dîzanin. Lî heyama wan tevkuştinan de, pîraniya serok û rêberên eşîrên me Kurdan bêt alî mabûn. Nîzam dîgotin" şerê Şêx Said û şerê Îhsan Nûri, şerê me Elewîyan û şerê Tîrkan nîne. Ev şera, şerê Kurdên Sunnî û şerê Tîrkane û gelek tiştên dîn". Naha ez dîxwazım lî we hemûyan pîrs bîkım, gelo Kurdên Sunnî jî kurd nînin? Em û Kurdên Sunnî bîrayên hev nînin? Esl û koka me yek nîne? Navê me û wan yek nîne? Ew jî mîna me ev zımanî napeyivın û deng nakın? Ew jî hevparê ev bextê me ê bîndestî nînin? Ew jî mîna me hejar, belengaz, tazi, bîrçî û rût, hesreta pariyek nanê paqij, jîyanek qenc û bêt tîrs, bêt kuştın de nînin ? Ew jî mîna me xudan eynî çand, zıman, zargotın, dîrok, awaz, adet, tore û kevneşopiyên bav û kalan nînin ? Ma dijmin wexta ku bî deh hezaran gelê me lî bajarê Sêvazê, herêma Qoçkiri yê de kuştın, qet gotın ku evana Elewîne, ne Kurdın? Ma Şêx Said efendi û Îhsan Nûri, ew Kurdên Elewî bûn? Ew tevgerana, tevgerên Elewîyan bûn? Ew sed hezarên ku bî şûr û tîfingên hukma Romê va hatın kuştın, lî tev zar û zêçan, ma ew kesana, zar û zêçana hemû Kurd nebûn? Ew xwişk, bîra, zar û zêçên me Kurdan nebûn? Hûn bî xwe jî dîbinin ku, wexta ku dijmin me dîkuje, qet lî Ol û mesebên me nanhêre. Jî bona dijmin sûcê me Kurdan hemû yeke. Ew jî Kurd bûyına me gelê Kurde. Çî

Elewi, çı Sunni, qet ferq tune. Bav û kalikên me bı valai
 usa negotine"Çermê Beraz nabe Post, dijmin nabe dost".
 Lı pışti hatına Tırkan de, ev meteloka lı nav gelê Kurd de
 hatiye guhartın, bûye"Çermê Beraz nabe Post, Roma Reş
 nabe dost". Lı gor birûbaweriya mın, ev metelok û gotına
 bav-kalan raste, lı şûnêdaye. Dijmın, dijmine nabe dost.
 Em hemû Kurd xudanê dijminê hevparın. Divê em zanıbın
 dijmin qet lı çirokên usa û gotinên usa nanhêre û nabêje
 ev sunniye, ew Elewiye. Gelên xudan dijmin, jı dijminên
 xwera"dijminên me"dibêjın. Tırk û Erebe û Faris ji, jı
 mera"Kurd Kurdın, dijminê mene" dibêjın. Ango dijmin
 bın ji, ew ji mina me mirovın, usa lı şol û meselan dibêrın.
 Lê divê mirov bı rasti bibêje. Dijminên me, lı me bêtir
 xudan cêribandinanin. Lı aliya dek û dolavan va, lı aliya
 rêzani de-politik- ew geleki ji pısporın. Lewra dewlet û
 sazgehên wan, dibistan û zaningehên wan hene. Ew lı wan
 sazgeh û dibistanan de tên elumandın. Em bibêjın, nebêjın
 ew lı pırr aliyan va lı me pêşvatırın, Ehrimaniyê qenc
 dızanın, hostayê gelek tıştanin, xaponekın, ew me bı hêsayi
 dixapının. Ango çı dixwazım jı werı bibêjım, divê em
 zanıbın ku dijmin, dijmine; em çavên xwe çar vekın, bı
 derewên dijminan neyên xapandın û nebin leyiztokên
 dijminan. Hûn mın bıborının; bı rasti qet baweriya mın lı
 şol, mesele û kar-berên hın rêberên me Kurdan nayê. Lê
 çı hêkmeta Xwedê ye, ez ji nızanım. Lo lı nav hemû gelên
 cihan de ji Ol û mesebên cûre-cûre, birûbaweriyên hev
 cûda hene, ma çıra ew gelana jı hevûdura nabêjın nızam-
 "ev Katolike, ew Ortodokse, Pırotestane, ev Xaçparêze, ew
 Cuihye, Bûdiste"felan-bêvan. Naha hûn ecêb buminın,
 bibêjın"Xidê ev navana lı ku hınkırın". Lı nav demek
 xêrdabe, Bay Seyid Weyis qal û behsa van navan kırıbû.
 Hûn lı qısûrên mın mêze mekın, ez lı ser wan Ol meseban
 qet tışteki ji nızanım, balam ez evqas bıhistinên xwe jı
 werı dibêjım. Hın kes dibêjın, bı taybeti lı welatên Ew-
 rûpa de, ev tışt û şerana tunın. Jı ber ku ew gelana zana

û serwextin, ew çav hıkkırine, aqlê wan dıŝuxule, ew mesele û ŝolan dızanın. Beri her tıŝt ew gelana lı esl û koka xwe dınhêrin. Ku esl û koka wan, çand û zumanê wan, dirok, zargotin û wêje a wan, hemû kevneŝopiyên wan ku yeke, ew gelana her tım lı hember dijminên xwe de yekın, mina yek bedenın. Jı bona Ol û meseban hevûdu nakujın. Jı bona wana ew heyama zûva derbaz bûye. Ew dızanın ku, lı beri derketına Ol û meseban de, ew yek nijadbûne û bırayên hevın. Ma çıra em van tıŝtana naynın ber çavên xwe û mina wan gelan nakın? Geli bıran ez dıxwazım hûn mın bıboxŝının, lewra mın axaftına xwe geleki ji dirêj kır, serê we êŝand. Lê ez lı we tıka dıkım, mebêjın"Xıd miroveki nexwendıye, nezane, ŝıvanê pez û dêwêre, naxırvane"felan-bêvan. Bawerbın ev tıŝtana hemû lı kûrahiya dilê mın de derketın. Çı gotine bav û kalên me? Gotine ku" Tu lı ew kesê ku dıaxıfe lı wi mêzemeke, ew ê ku wi dıde axaftın, lı wi mêzeke, wi bine bira xwe". Ango mesela mın ji usaye, hûn ji usa lı mın bınhêrin. Mın ev tıŝtana jı bona gıringiya rewŝa me Kurdan gotın. Lê ez pesna xwe nakım, balam ez bawerım ev gotinên mın hemû rastın û jı bona me gelê Kurd ji gıringın.

Xıdê naxırvan axaftına xwe kuta kır, lı ŝûna xwe de bédeng rawestiya, lı hıviya raya kesên dorbera xwe de ma. Beri hemû kesan malxweê malê Reŝo hemû gotinên Xıdê rastand-tastik-û usa got:

- Belê-belê kek Xıdır, lo tu her û her bıji, gotinên te hemû rastın û lı ŝûna xwedane. Her tıŝt eşkere lı ber çavane. Weka neynıkeki lı pêŝ meda sekıniye; kesên ne kor ji, xwe lı ew neynıkê de qenc dıbinın. Çawa ku te ji got, em Kurd hemû yek nijadın, guliyên darekine. Qet xeletek lı gotinên teda nebûn û tunenin ji. Em hêvi dıkın ku, êdi iro ŝuva serok û rêberên me Kurdan lı xwe bıhesın, tevahiya gelê Kurd van tıŝtan fêr bıbe. Dıvê êdi mir û axayên Kurd, gelê Kurd van ŝaŝıtiyan bıbinın, xwe serast bıkın; lı hember dijminan de dıvê bıbın yek devek û yek kulmek.

Lı gor birûbaweriya mın a şexsi ji, em Kurd hemû bırane. Sazgeha bıratiyê ji, sazgehek heri gıringe. Dıvê bıra lı hevûdu hezbıkın. Jı bona hın pırsegırekên piçûk û pûç hevûdu neêşının. Lı hember neyarên xwe de, dıvê bıra bıbın yek, bı hevra ço'ên xwe rakın. Helbet lı nav bıran de ji ramanên hevcûda dıbın, lê dıvê bıbın ji. Ev jı bona pêşve çüyına jıyanê ji zor gıringe. Bav û kalan çı gotine? gotine" bı guleki va bıhar nay". Rasti jı ev e. Gul û çi-çegên cûr bı cûre jıyanê û cıhanê dıxemılının, rengên wanên rengın, cıhanê rengın dıke, xweşik dıke. Jı bona ev, dıvê em jı hevra nebêjın"tu Sunniyi, ez Elewime, ew Sunniye, ew Elewiye"felan bêvan. Bı rasti ray û gotınên usa, raman û felsên usa jı mera şerme. Dıvê em lı hevûdu usa nenhêrın û gotınên usa nekın, lı felsên bêt erêni dûr bıse-kinın. Gotın, fels û kıretên usa dilê dıjınan şa, kar û berên wanên jı bona kuştın me Kurdan ji hêsa dıke. İro em lı qurna bistan de dıjın. Gelên cıhan geleki pêşva çüne. Gelê me ji, heya roja iro lı nav xwe de ev dubendiya eşiri, Oli û meseban ranekırıye. Em lı şûna xwe de dıhêjmırın û em hevûdu dıxwın. Em bûne neyarên hev û leyiztokên dıjınan. Pêwist bû me lı beri hemû gelên cıhan, lı nav xwe de ew dubendiyên bêt erêni û kevneyar rakırana, em bıbana geleki şareza û şarweri-uygar-medeni-. Jı ber ku em geleki dirokine. Diroka me zef kevne. Koka diroka me dıgihêje hezaran salan. Em lı Rojhılata Navin de beri Tırk, Ereb û Farıs'an de hebûn. Ango em dimatıyên-yerli-erdê Rojhılata Navin'ın. Gelê Kurd bı hezaran sal beri İslamiyê û Ereb'an lı ser erdê Mezopotamya de dıjiya. Lı wan heyaman de, gelê Kurd ji, mina hemû gelan cûre-cûre Ol dıpejırand. Balam pıraniya gelê Kurd"Zerdeşt" bû. Dûra"Êzıdixan"derket gelek Kurd bûn" Êzıdi"hınekan Ola Cuhıyan pejırandın bûn Mûsewi, hınek bûn Xaçparêz, lê disa jı ew bı nıjada xwe va Kurd bûn, nedıgotın"em Yahûdın, em Romine". Lı destpêka Ola İslam de, barbar artêşên Ola İslam, Kurd bı zora şûr, kuştın û lêdanê kırdın

İslam. Dûra pıraniya gelê me bû İslam û em Kurd ji ketin nav dubendiya Ola İslam û em ji bûn aligirê henik rêzaniyên İslami. Bı gotinek kın, Kurd ji bûn aligirên Xelifan û dubendiyên nav wan. Jı bona rêzaniya Xelifan, wana ji hevûdu kuştın, xwastın ku ew bıbın şêr û pilingên İslam û Xelifeên İslam. Selahaddini Eyûbi minakek zor giringe. Wi malxırabi hebûna Kurd û Kurdistan, jı bona Ola İslam girt radeste-teslim-Ereb'an kır, da Mısırê. İro em bıbêjın, nebêjın, lı Rojhılata Navin de pıraniya gelê Kurd İslame û gelê Kurd lı bınê bandûra çar dewletên İslami de mina noker-köle-û xulaman dıji û bêt dewlet û sazgehye. Ev nezani, xeşimi û hev kuştına me ji, bêt derew bı destên dijminan va pêkhatiye, jı Ola İslam va ji girêdayiye.

Dûyê cıxaran hındirê xêni lı nav mijê de hiştıbû, gewriya Reşo ji ziwa bûbû av dıxwast. Jı bona ew Reşo navber da axaftın xwe, tasek av jı jına xwe xwast; jına wi ji rabû çû meşrefa avê girt da ber devê kûzê avê-cerê avê-meşref tıji av kır, dageriya pêş mêrê xwe, destê xwe ê çepê da ser singê xwe, bı destê xwe ê rastê va ji, meşrefa avê dirêje mêrê xwe kır"fermo"got û werge lı şûna xwe de sekini. Reşo meşrefa avê lı dest jına xwe de girt û meşref kire nav lêvên xwe, yek bihneki de serxwe de kır qedand, dûra ji, jı jına xwera"spas"got û bı destê xwe va simbêlên xwe ziwa kır, dûra axaftına xwe usa domand:

- Belê, lı wi zamanê bıhuri de, lı nav eşirên me Kurdan de ji, jı bona erd, sinor û av-mavan, şer û pevcûn dıbûn, kes mes dıhatın kuştın, bıbindar dıbûn, felan-bêvan. Lê lı bingeha wan şer û pevcûnan de, berjewendiya mir, axan û kesên dewlwmend radızıya. Sedem ji mir, axa û kesên dewlemend û xudan nıfûs bûn. Mafê wan kesan lı wan şeran de hebû. Kesên meyên zana van tıştan qenc dızanın. Naha em ev meselê bıdine aliyeki. Lê çıqas ku ez dızanım, çıqas ku mın lı hın kesan bıhistiye, lı wan heyaman de, ango lı beri İslamiyê de, gelê Kurd jı bona Ol'an û ramanên hev cûda werqas şer nekiriye, werqas hevûdu nekuş-

tiye. Ev bırakuji, ew şerên Ol û meseban, lı pışti derketına Mihamed û Ola wi a İslami de destpêkiriye. Lı destpêka Ola İslami de mesheb tunebûn. Tenê desthelatek navendi, diktatoriyek İslami hebû. Sazûmanek mina "Qıraliyet" bû. Mihamed, Eli, Omer, Osman, Ebûbekır, evana hemû bêt meseb bûn. Ango hemû lı hındırê partiyeki de bûn, lı hember wan dijberi û berberiyek lı wê demê de tunebû. Bı taybeti şerê meseban lı heyama Xelife Harûni Reşit vırde destpêkiriye. Ango partiyên rêzani-siyasi, politik-ı dewra wi û pışti dewra wi de sazûne. Sazbûna wan partiyen ji, dijberiyên mezın kırıye nav Ola İslam, şerê wan partiyen çêbûne, gel hatine kuştın. Lê sed mıxabın ku, ji wan partiyen ra "Parti" negotine, qulpeki Oli lı wanra kırıne, gotine "Meseb". Jı serokên wan partiyen ra ji, gotine "İmam". Her serokeki ji, ji bona partiya xwe rêbazek, destûrek nıvisandiye, lı destûr û rêbaza xwe de, gor berjeweniya xwe û partiya xwe, şırovekırına Ola İslam kırıye, lı derheqa Mihamed û pırtûka wi a nav "Quran" de Rave- tefsir-nıvisandiye, Mihamed û Quran ji lı gor mafê xwe kıtan -tahlil-kırıye û şer lı nav gelan de her zêde kırıye. Ew roj, ev roj şerê mesebên İslami lı nav gelên İslam de berdewame. Herwaha ez babetê neguhêrinım, dagerım ser meselê. Beri Ola İslam de-gor ku mezın û zanaên me dibêjın-pıraniya gelê Kurd Zerdeşt bû. Gelê Kurd birûbaweriyên xwe lı Ola Zerdeşt dıanin. Ola Zerdeşt, Olek heri kevne, Ola bav û kalıkên meye. Heya roja iro ji, kesên ku birûbaweriyên xwe lı Ola Zerdeşt tinin, ew hene. Gor ku dibêjın hınek lı Hindıstanê de, hınek ji lı İranê de, hınek ji lı Ermenıstan û Gurcıstanê de dijın. Ew kesên ku lı Ermenıstan û Gurcıstanê de dijın, ew Kurdên "Êzidi" ne. Lê yên ku lı İran û Hindıstanê de dijın ew Kurd ninım, balam Ola wan Zerdeşt'e. Ew ji mina hemû gelan xudan Ol û pêxamberın. Lê sed mıxabe ku em lı ser wê Ol'a xwe a kevn pırr tıştan nızanın. Ev tıştên ku naha ez ji werı dibêjım, ew ji mın lı devê çend kesên zana de bıbıstine.

Herwaha ez axaftına xwe dirêj nekim; çawa ku min li destpêka axaftına xwe de ji got, Ola Îslami bî zora şûr, bî zîlm û zorê va li gelê me dane pejirandin. Piştî kuştina sed hezaran cangoriyên Kurd, êdi gelê Kurd bêt havil maye, bî bêt dîli Ola Îslami pejirandiye, iro ji bûye fanatikê Ola Îslam, bî tundi li Ola Îslam va hatiye girêdan, mina benîşt pêva qemitiye. Lê divê li derketina Ola Îslam da be û divê li dewra Împaratoriya Osmanli çê be, hemû tiştên ku li ser Ola Zerdeşt û Êzidi de hatine nivîsin, ew li tev hemû meteryal û karpêk'ên-eser-dirok, çand û wêje a gelê Kurd, bî destên Tirk û Ereban va hatine şewitandin, li holê de hatine rakirin. Armanca wan ew bû ku, ew gelê Kurd li Rojhilata Navin de rakin, navê gelê Kurd betal bikin, li hebûna gelê Kurd xwedi derkevin, bîbêjin"ev hebûn û hêjayên mene". Çand û zargotina gelê Kurd bîdizin, ser erd û bin erdê gelê Kurd talan bikin, bişêlinin, tar û mar bikin. Bî rasti dijminan jî bona ew daxwaziyan xwe ji, geleki pêşva çûne, rê girtine.

Gewriya Reşo bêtir zîwa bûbû, êdi nedixwast ku bîaxife. Jî bona ev jî dawîya axaftina xwe ani û li şûna xwe de rawestiya, li hiviya axaftina hîm kesên din de ma. Balam qet keseki dengê xwe dernexist. Jî bona çend hûrdeman bêdengiyek keçe nav hemûyan û qet keseki nedixwast ku bîaxife. Piştî heyamek kurt de, yekî li Reşo pîrsiya û got:

- Kek Reşo, tiştên ku min bîhistine, dibêjin hinek Kurd hene, ew baweriyên xwe li Yezit tinin. Lê ku ez xelî nînim, te jî qal û behsa Yezit kir, gelo ew raste? Lê ku raste, bî navê Xwedê naleh li wan û Yezit be, lo ma çawa Kurd baweriyên xwe li Yezit binin?. Na-na ev nabe, nabe kek Reşo. Jî bona ew dijberî û reaksiyona wî kesî, Reşo disa destûra axaftinê li civatê xwast û destpêka axaftinê kir û usa got:

- Bînhêre bîrayê hêja, ev tiştê ku tu dibêji, ew ne rastin, hemû derewin. Ki ku li ev gotinan bawer bike, ew li nav

xelîti û şaşitiyandaye. Ew kes û gelên ku birûbaweriyên xwe li Ola Zerdeşt tinn, ew Xelifeyê Îslam Mawiye û kurê wi Yezit qet heznakîn. Ew dijminê Ola Îslam û Xelifeyên Îslamîn, baweriyên xwe li Ola Îslam naynîn. Çawa ku min berê ji got, Ola Zerdeşt, Ol'ek pîrr kevne. Ola Êzidi ji li pey Ola Zerdeşt derketiye, ew ji Ol'ek heri kevne, Ola gelê Kurde, pêxamberê Ola Êzidi ji "Êzidixan" e. Ew Yezit'ê ku tu dibêji, ew Xelifeyê Îslam bû. Ango qet peywendiyê Xelife Yezit, jî Ola Êzidi ra tune. Xelife Yezit kesê duhuniye. Li dirokê de, ew li tevkuştina "Kerbela" de têtê naskirîn. Xelife Yezit bî esl û koka xwe va ji Erebe. Wexta ku em Kurd ji bûn Îslam, li zikê zeman de, em ji ketin nav dubendiya Ola Îslam, em ji bûn aligirê dubendiyan, em ji bûn hevparê şerê seltanat û hukumdariya Xelifeyên Îslami. Gelek jî me Kurdan bûn aligirê Hezreti Eli û zarokên wi. Xelife Mawiye û kurê wi Yezit neheqiyên mezûn li Eli û zarokên wi kirin. Ew li mêj de dijminê hev bûn. Malbata kalikê Yezit Ebûsufyan û malbata Eli-Mihamed gelek kes li hevûdu kuştibûn. Bî taybeti apê Eli, Hamza bî destê malbata Ebûsufyan va hatibû kuştin. Ango ew dijminê hevên bêdawi bûn. Ji bona ew dijmintiya wan herdu malbatan û şerê Xelifetiyê, Kurdên meyên aligirên Eli, Mawiye û Yezit qet heznakîn. Ango ev çirokana gelekî ji dirêjin. Ez van tiştan pîrr dirêj nekim keko, ez bawerim tu Ola Êzidi û Xelife Yezit li nav hev dixini. Min jî bona ev meselê çend caran li Alişer efendi û toxtor Beytar Nûri efendiyê Dêrsîmi pîrs kir û wana ev tiştana jî minra gotin, ez serwext kirim. Çawa ku hûn ji dizanin, ew herdu kesana, kesên zor zanane, li pîrr aliyên va pîsporin, kesên Ronakbir û Rewşenbirin, kesên xwendine. Alişer efendi bî xwe çend caran ji çûye Ûrîzistanê hatiye. Alişer û toxtor Nûri digotin "gelek Kurdên meyên Êzidi li Ermenistanê û Gurcistanê de dijîn. Wana ew Ola xwe a bav û kalan, heya roja iro jî, jî xwe birnekirine. Ola Êzidi berdewamkirina Ola Zerdeştê. Êzidixan hinek tişt guhartine,

balam lı esasiyên Ola Zerdeşt de qet derneketiye. Lı derketına Ola İslam de wan bırayên me berxwe dan, Ola İslam nepejırandın, Ola xwe bernedan, birûbaweriyên xwe neterikandın. Pışti ku pıraniya me Kurdan bûn İslam, icar me destpêkır ew bırayên xwe kuştın. Bı taybeti lı şerê cihan a yekemin de, ew Kurdên ku bûbûn leşkerê Roma Reş, jı wan ra dıgotın "Sıwariyên Hamidi, Alayiyên Hamidi" wana lı tevkuştına Ermeniyân de, qıra wan bırayên me anin. Jı ber ku, ew ne İslam bûn. Roma Reş ew Kurdana tız û fit dıkırın, berdıdan ser wan bırayên me, wana ji ew bırayên xwe dıkuştın. Jı bona wê bêbexti û neheqiya bıran, wan bırayên me ji, erdê bav û kalên xwe terikandın, revıyan çûn ketın wan welatan de ciwar bûn. Bı taybeti Kurd bırayê meyên Sunni lı tev wan leşkerên mêjo şoşti de, bı hezaran ew bırayên xwe kuştın. Ew ji bûn hevparê "Alayiyên Hamidi" û hevparê bêbextiya Roma Reş.

Xidê naxırvan lı şûna xwe de mina hemû kesan Reşo guhdar dıkır, lê dilê wi lı nav tırs û xofek mezin dabû. Jı bona ev ji, ew lı şûna xwe de, xwe vırde-wırde dıbir, - diani. Lı aliki Xidê qısweta kurê xwe û pêz dêwêr dıkır, dıxwast ku rabe bıçe, lı aliya dın de ji, destê Xidê lı gıftûgoan, gengeşi û dılovaniya-muhabetşirin nedıbû. Wi dıxwast ku pêşneyareki bıke û dûra bıçe. Lı dawiyê de bıryar da ku, pêşneyara xwe ji cıvatê ra bıbêje. Ê berê xwe guhart ser Reşo, jı Reşo û hemû kesan ra usa got:

- Kek Reşo û geli bıran, lı gor dıtın û bawerıya mın, divê naha em van mesele û çirokan, gengeşiyên diroki bıterikının, wexta van gotûbêjan nine. İro we hemûyan ji ew dengê top û tankan bıhistın; divê em lı ser wan dangan bısekının û bıpeyvın, ne ku lı ser tıştên diroki û rojên bıhuri. Ew heyam zûva derbaz bûye, çûye. Gelê me ji, mina hemû gelan lı zikê dirokê de şaşiti kırıne, qenci kırıne û hatiye gihiştiye ev rojê. Helbet xelıtiyên gelê me pırın, balam sedemê wan şaşitiyan ji hebûn, iro ji hene. Lê divê em Erdnigari-Coxrafya-û nezaniya gelê xwe ji, lı

xwe birnekın. Lı milê dın de, divê em lı roja xwe a iroin bınhêrın, lı şaşıtı û xeltên xweyên bıhuri de dersan derxının, dersan bıstının. Lı gor baweriya mın mesela heri giring ev e. Jı bona ev, werın em van gengeşiyên lı ser rojên bıhuri û dirokê bıterıkının, bıhêlinın jı bona rojek dın, lı ser wan dengê top û tankan bıaxıfın. Gelo ew dengên ku iro der û ber dıhêjandın, ew dengana dengên çı bûn? Ez dıxwazım em lı ser wan dangan bısekinın.

Reşo lı ser xwastek û pêşneyara Xıdê naxırvan babet guhêrand"kek Xıdır rast dibêje, pêşneyara wi lı şûnêdaye, divê em van meselan bıterıkının, weki kek Xıdır ji got, bıhêlinın jı bona rojek dın û guh bıdın pêşneyara kek Xıdır. Lewra ev kêmasiya mın bû, mın axaftına xwe geleki ji dirêj kır. Naha ez lı we hemûyan bıpırsım, gelo we keseki nûçek lı aliya Seyit Rıza û Şahan Axa de standiye, an ji bihistiye, yan na? Hemûyan gotın"na". Lê ku usaye, pêşneyara mın ewe ku, em keseki, du kesan bışının ba Seyit Rıza û Şahan Axa. Ez bawerım ew sedı-sed lı ser wan dangan û nûçe-mûçeyên dın da ji agadarın. Jı ber ku ew serokên tevgera Dêrsm'ın"got.

Lı nav wê civatê de miroveki nav Eli, jı wira"Elo"dıgotın, lı şûna xwe de rabû serxwe, jı civatê ra"zor başe bırano, ez amademe, lı dılda ji dıxwazım ku bıçım. Ew kesên ku dıxwazın lı tev mın werın, em hevra bıçın gundê Seyit Ali Rıza û lı wê ji bıçın cem Şahan Axa, bıla ew kesana bıçın malên xwe, lı hındırê seateki de xwe amade bıkın û pıştı seateki de divê em rêkevin bıçın"got.

Pıştı ew bıryaran, gotúbêj û gengeşıyan de, du kesên dın ji xwastın ku lı tev Elo bıçın mala Seyit Ali Rıza û Şahan Axa, lı wan pırsbıkın û bışêwırın, gelo çı hey, çı tune? Ew dengana, dengên çı bûn? felan-bêvan. Lı pey daxwaziya wan du kesên dın de, civat lı wê hev belav bû û herkes dageriya mala xwe, ber kar û berên xwe.

Xıdê naxırvan ji lı tev civatê derket der, bı lez û bez rêket çû mala xwe, ku lı mala xwe û jına xwe bınhêre, -

gelo ew çawane û çıdıkın; jı kurê xwera ji pivazeki bigire û dagere ber naxıra pêz û dêwêr. Jı ber ku geleki ji deng mabû. Çavên Xîdê piçûk ji lı riya bavê de mabûn. Lewra lawikê belengaz him tenê mabû dırsiya, him ji bı zık birçibûnê fırsıka wi lı nav hev dıket.

Pışti çend hûrdeman de Xîdê mezın xwe gihand pêşiya deriyê mala xwe, bı lez deri tanda ku bıkeve hındır, lê deri lı paşva hatıbû dadan. Lı wê demê de Xîd ecêb ma, tırsiya, xwe bı xwera "gelo çı bû, ev çı rewşe?" got û deri bı sert kuta. Lı ser dengê deri kutandınê, Xeca xwişka Xîdê bı lez lı şuna xwe de rabû çû paş dêri, bı dengeki nızım va pırsiya "ew kiye?" got û lı hiviya bersivê de ma. Lı pey ew Xîdê:

- Keçê ezım, dêri veke, ma lı we xêre, we deri paşda dadaye hûn lı hundır de çı dıkın?. Lê-lê ma çı lı we qewmiye? got.

Pışti hêrsketın û dengê Xîdê de, Xecê rot lı paş dêri de kışand, jı bırayê xwera deri vekır, Xîd kete hındır, dıt ku ewe jına wi ketiye ber sêlê nan dıpêje, Hesenê Pıçûk ji lı ser erdê de rûniştiye, perçek nanê teze ji lı destdaye, nan dıxwe, dev û rûyên wi lı nav gilêşk, çılm û qılêrê de maye, vızık lı ser çav û gepên wi de hêwiriyane, kambaxan radıbın dıfırıkın, dûra disa şuva vedıgerın tên lı ser rûyê liwık û canê liwık de dıhêwırın, ew çılm û gilêşkê tev xwına liwık dımêjın û dıxwın. Xîdê lı hember wê pêşdariyê de axinek lı kûrayiya dılda kışand bervı kurê xwe çû, ew lı ser erdê de rakır kire hambêza xwe, bı paçeki va dev û rûyê Hesen paqıj kıır û lı ser lıngan de sekıniya lı jına xwe nihêriya. Melek ji lı ber sêlê de mate mêrê xwe mabû, nedızanıbû ku çı bıke û çı bıbêje. Lewra tırs ketıbû zıkê Melekê, Melek dırsiya, xem û qısaweta kurê xwe dıkır. Dûra aqıl zû hate sêri, berê xwe guhart ser mêrê xwe, balam wê mêrê xwe qenc nedit. Lewra benz lı ser Xîdê de nemabû, rûyê wi zer û sıpi bûbû. Jı bona ew, Melek bêtır

xemgin bû û tırsiya. Pışti du-sê hûrdeman de Melekê deng lı Xidê kır, jı Xidê ra usa got:

- Lo-lo lı te xêre, çı hate serê te? Reng-meng qet lı rûyê teda nemaye, gelo lı te çı qewımı, çı hate serê te? Rûyê te zer û sıpi bûye, rengê te hatiye guhartın. Ma çıra tu tenêyi? Te pez, dewar û ew lawıka lı kuderê de hiştın, naha ew lı kune?

Xidê Hesên lı hambêza xwe de dani ser sekûyê û bersiva jına xwe usa da:

- Lê-lê mal şewitiyê, ma tu kerri, te ew gum û guma denggan nebihist? Cihan bı wan denggan va hêjiya, naxıra pêzdêwêr lı hev belav bûn, me bı zorê pez-dewar komkır. Dûra me pez-dewar ani nêzıka gund, ez ji hatım ku lı ser wan denggan piçeki serwext bıbım, gelo ew dengana, dengên çı bûn, fêr bıkıım.

Melekê nan lı ser sêlê de wergerand û vegeriya bersiva mêrê xwe usa da:

- Raste ez bêt kêfım, çavên mın ji pırr diêşın, jana çavan hişên mın lı serê mın de nehiştine, balam ez ne kerım, piçeki gêj bûme ewqas. Me ew dengana bihistın, mina te û mina hemû gundiyan. Lı destpêkêde me got bıbe ku xortên gund derketine jori gund, lı nav xwe de tıfingan diteqının, tıfingên xwe dicêribının; an ji ketine nav leca nişan û sevkaniyan, ku ki pırr sevkane, ki lı navina nişangehê dixine, felan-bêvan. Balam dûra em ji mina te û mina kesên dın serwext bûn ku, na, ew dengana, dengê tıfingên Martini felan ninın, dengê top û tank anın. Jı bona ew bû ku, em zef tırsiyan, xofek mezın kete dilê me; icar em lı der reviyân hatın ketın hındır, me deri ji lı paşda dada, ku em xwe bıparêzın.

Xidê çav lı ser jına xwe û xwişka xwe gerand, bı niv ken û henek va:

- Lê-lê mala we ava be, we qet dengê tıfing-mıfingan nebihistine? Tu çito dibêji me lı destpêkê de wer fêmkır ku ew dengana, dengên tıfinganın? Ez bawerım bıli dengê top

û tankan, iro fırok û helikopterên Romê ji lı gelek ciyan de bombe barandin, xesereyên mezın gihandin gelê me, got.

Tirsek heri mezın kete dilê Melekê, lı ber agirê sêlê de diricıfiya, nedızanibû ku çı bibêje, an ji çı pırs bıke. Lewra wê ji mina hemû Kurdan bêbextiya Romê ditıbû û bihistibû. Balam wê bı çavên xwe va fırok û helikopter qet neditıbûn. Jı bona ew, Melekê lı mêrê xwe pırsiya:

- Lo tu jı bona serê bavê xwe jı mınra bibêje, gelo ew fırok û helikopterên ku tu dibêji, qal û behsa wan diki, gelo ew çine, çitonın? Hemû kes qal û behsa ruxina-tah-rip-wan û hêza wana hılşandını dıkin, mirov ecêb dibine. Hêkmeta Xwedê, mirov tiştên werge çêdikin jı bona kuştına mirovan. Mirov goştê mirov naxwe, balam bı ev celeb mirov jı mirov wenda dike, dibe dijminê xwe bı xwe. .

Xıd xar bû lı ser paçê nan de naneki teze û germ girt lı hev bada, beri ku destpêka nan xwarinê bıke, jı Melekê ra:

- Keçê ez ji mina teme, mın jı qet ew tiştana neditine. Yên ku ditine mın lı devê wan bihistiye. Lı aliya dın de ez ji mina te dibêjim û carna ecêb dımınım. Xwedê çıra qûlên xwe kirine dijminê hevûdu? Çıra mirov, mirov bıkuje? Ez bawerım ev cihan jı me hemû qûlên Xwedê ra bese, me hemûyan têr dike. Balam tu dibini mirov bûne hûtên heft seri, zık birçi û çav birçi, dıxwın-naxwın têr nabın. Jı wan hûtan yek jı, Roma Reşe. Werqas xwina gelê me û gelên dın vexwariye ku, disa jı têr nebûye, têr nebûye, ez jı tera çı bibêjim. .

Melekê axinek kışand û disa jı mêrê xwera:

- Bı rasti ez jı qet maneki nadım kar û berên qûlên Xwedê. Tu dibini hınek heywan hene hevûdu dıxwın, zıkên xwe têrdıkin, hınek dıçêrım bı giyan zık têr dıbın, lı derya û çeman de disa masi hevûdu dıxwın, zıkên xwe têr dıkin. Ango mirov lı evana dınhêre ecêb dımıne. Lê em mirov ne ew heywanın, em mirovın, dıpeyvın, çêdikin, diafirının, jı

mera şerme ku em hevûdu bıkujin, heqên hevûdu bıxwın û bîstinin, xwina hevûdu bırijinin. Tu qal û behsa fırok û helikopteran diki, mın ew qet neditine û nızanım ew çine ji. Mın heya roja iro, xêncı gund-mundan qet bajarek ji neditiye. Ez ji mina te bêt xwendın û perwerde mame. Lê disa hûn mêr hezar qati lı me jınan bêtır lı ser pırr tıştan de serwextın. Hûn dıçın dıbinın, dıgerım, em ji lı aşpêj-xanan de, lı ber kar û ber û zarokan de jiyana xwe lı nav xızani û nezaniyê de derbaz dıkın, kêfa we tinın, zarokan jı wera xwedi dıkın. Herwaha ez van tıştan dırêj nekım, tu bı kerema xwe mın lı ser wan fırok û helikopteran de piçeki serwext bıke, bıla dilê mın hêsa bıbe, got..

Lı ser daxwazi û pırsa Melekê Xidê bersiv usa da:

- Keçê bı serê bavê mın, mın ji qet fırok-mırok, helikopter û tıştên wek wan neditine. Mın ji tera got, carek dın ji, jı tera bıbêjum, mın ew tıştana neditine, ez ji mina teme, mın ji nexwediye, tu evana baş ji dızani. Jı ber ku em meriyê hevın, heftsed bavên hevûdu nasdıkın. Ki çûye dibistanan xwendiyê, nexwendiyê em baş dızanın. Ez bawerım ferqa mın û te, ferqa mêr û jınane. Ango ez mêmım, tu ji jını. Em mêr lı we jınan bêtır xudan hın heqanın, ev raste. Ez çıbıkım ev zagona Ola İslam usa daniye. Mihamed gotiye "Xwedê mêr bı taybeti afirandiye, ku jı jınan hukum bıke, mêr ji jınan bıaqiltire, divê doliwa jınan lı dest mêran debe". Ango ev fermana Xwedê û pêxambere. Ferqa mın û te, ez dıkarıbım bıçım nav koma mirovan, nav civateki, an ji lıgel keseki zana û serokeki de rûnım, lı wan guhdar bıkun, tışteki lı wan fêrbın, tışteki bıpeyivım, tenê evqas. Jı bona fırok û helikopteran te pırskır, mın ji lı devê miroveki de navê wan tıştan bihist û lı ser wan agadar bûm. Tu ji dızani ku, carna ez ji dıçım Xarpitê têm. Çendek berê ez disa çûbûm Xarpitê, tu baş dızani. Lı wê rojê de ez lı çayxaneki de rûniştıbûm, lı kêleka mın de çend kesan lı nav xwe de dıpeyiviyan, mın ji ew guhdar dıkırın. Yeki ji hevalên xwera dıgot "fırok mina teyran dı-

fırıkın, perr û qanatên wan hene, serê wan mina serê masiye, geleki ji mezinin". Çawa ku wi kesi ji digot, her firokek li ev xaniyê me mezin, fereh û gırsire. Bombe ji li binê zık û qanatên fırokdane. Wexta şer fırokevan li fıro-kên xwe sıwar dibın, wana mina teyran radıkın hewa, li esman de difırıkın û wan bombean li ser gund, bajar û hemû hedefên xwe de dibarinın, rûniştvanên wan gund û bajarın, hedefên xweyên leşkeri dışewıtının, hıldışının, dıkın pag li erdê va yek dıkın. Fırokevanên fırokan bı tılı û pêçiyên xwe va pêle bıkjokên xweger-otomatik-dıkın, dı-dewısının, li eyni dûvik û hûrdemê de-saniye, dakka-binê wan fırokan vedıbın, ew bombeyên ku li fırokandane, hemû li hewa, li esman mina têri, dilopên avê û baranê dibarın. Li bıli ev, li ber çavên fırokevanan de teleskop û dûrbin ji hene. Ew li jor esman de dıkarıbın li her cih û deran bınhêrın, hedefên xwe pêdan-tespıt-bıkın, bomban li ser hedefên xwe de bıbarının. .

Melekê nan patın ji xwe bırkırıbû mêrê xwe guhdar dıkir û ecêb dıma. Dûra ji Xıdê ra usa got:

- Lo-lo tu mın ecêb mayi diki. Bawerke ev tıştên ku tu dibêji û qal û behsa wan diki, baweriya mın qet li wan tıştan nay; ango mırov ecêb mayi dımıne. Ma tu çıra nabêji ku, êdi hemû cihan bûye Ehrıman-Şeytan-û pıncanı. Ji ber ku ev tıştên ku tu dibêji, lê mexeyide, ez qet bawer nakım. Ew kar û berana, kar û berên Xwedê nının, ên Ehrımanan û pıncanın.

Xıdê heya dawiyê jına xwe guhdar kır, dûra ji jına xwera usa got:

- Keçê-keçê ez ji dızanım êdi cihan bûye Ehrıman û pıncanı, ma em çı bıkın? Naha tu van tıştan ji xwe bırbıke, ez nıkarıbım te li ser van tıştan de serwext û agadar bıkıım. Mın bıhistınên xwe ji tera got, ewqas. Lê bı rasti aqılê mın ji nagihêje nûvedanên-ıcat-usa. Naha em ji bona ew tıştên ku me nedıtıne û aqılê me nagihêje wan kar, ber û nûvedanan, em wana bıterıkının, ji bona wan serê xwe

neêşinin, êdi ev babeta bese. Tu bı xwe ji dibini ku ez li vıra gelteme. Mın ew lawık tenê li ber pêz û dêwêr de cihîştiye, divê êdi ez dagerım cem liwık û pêz û dêwêr. Ha, ez ji xwe birnekım, lawê te serik pivaz dixwast. Dıgot " nan li tûrık de hışk bûye naye xwarın, divê tu ji mınra serik pivaz bini". İro mın zıkê xwe bı sıping û xilokan va têr kır, lê lawê te nexwast ku sıping û xilokan bıxwe. Naha ez du nanê teze bıgırım, tu, yan ji Xec rabın seriyek ji pivaz bıdın mın, ez rêkevım bıçım bıdım liwık, bıla lawık bıxwe zıkê xwe têr bıke, ku li dêwêr û pêz bınhêre. De haydê hûn yek bı kerema xwe ji mınra pivazeki bınn, wext ji pırr nemaye, êdi êvar dibe, divê ez zû xwe bıgihinım ba liwık û ba dewar û pêz. .

Melek ji bona pivaz xwastına kurê xwe geleki hêrs ket, keyidi û bı dengeki bılınd va ji mêrê xwera:

- Lo-lo bı rastı ez pırr caran te ji qenc nasnakım, aqılê mın nagihêje hemû gotın û baweriyên te. Pırr caran tu ji mınra mina kesên xerib û biyani dipeyivi, tu hayji mala xwe nini, çiyê te heye, çiyê te tune, tu qet nızani. Bı rastı ev ji, ji tera şerme. Naha ez li te pırs bıkıım, li payıza çûyi de, ma te çend litır pivaz ji bona mala xwe kıriya? Neh-deh seri pivaz li malda mane, ew ji, ji bona sorxaça girmıyan û xwarın-marınên dın pêwıst dibe, ez bawerım tu ji vi tışta baş dızani. Dûra bıbe ku sıbe, dusıbe mıvaneki deri li me vekır, ma ez wê çaxê çı xaliyê li serê xwe kıım? Ez çıto rûye te û xwe sıpi bıkıım? Naha tu van du nanên teze bıgıre bıbe bıde wi, bıla bıxwe xenıma xweke, zıkê xwe têr bıke. Ew bêt mıraza cıwane, nanê teze ji mina pışıkê nerm û bı tame. Ez bawerım ew ji rewşa mala bavê xwe dızane. Bıla qasa bejna lihêfa bavê xwe, çêqên xwe dırêj bıke, gotınên mın ji tera evın, pivaz-mıvaz ji tunenın.

Hêrsa Xıdê geleki rabûbû, lê nedıxwast ku bıqıre ser jına xwe, peyveke nebaş ji jına xwera bıbêje, dilê wê bıêşine, pêşberiya -huzur-malê bırevine. İcar wi bı dengeki mılaım û nızım va, ji jına xwera:

- Keçê ez nızanım jı wera çı bîbêjum û çı bıkıım. Ez şev û roj jı kesan ra, jı gundiyan ra şıvanti, gavanti û xulamti dıkım, lê disa jı em ti û birçine; em û ev du zarok bı têri nanê ceh, garıs û gılgıl jı nabinım, bı wan zıkên xwe têr nakım. Lê ez jı nızanım ku çı bıkıım, çı havıl bıbinım û çı xaliyê lı serê xwekıım. Gelek wexte lı aqılê serê mın de ramanek heye, ew jı mın gelekı ponjini dıke. Ango lı serê mın de tıştekek heye, ez dıxwazım jı tera bîbêjum, got.

- Gelo disa çı mabest û nêta te heye? Bîbêje, em jı bıbi-hısın.

- Keçê lê tıştê ku Xwedê dızane, mırov çawa wi tıştı lı qûlên Xwedê veşêrine û betal bıke. Mabesta mın ewe ku, em rojeki bı zû lı vi gundi de mala xwe barkın, derkevın bıçın hêla qeza Mézgirê, herêma "Newala Karê" lı gundê Kûpıkê de ciwar bın. Ango ew gunda, gundê mırsûdê meye. Ez bawerım qenc tê bira te, par, ango lı sala bıhuri de, lı nav demek qenc dabe, Bayê Seyid hatıbû mala me; beri ku em Gulbanga xwe bıgırın, çıralıxa wi bıdıne wi, wi jı mera" hûn ku guhdare mın dıkın, mala xwe lı ev gundi de barkın werın lı gundê meda ciwar bın; ez naxıra pez-dewarê gund jı bıdıne we "got. Keçê bı rasti ez pırr dıxwazım lı vi gundi de derkevım bıçım. Meri û merıstanan neheqiyên mezin lı me kırın. Pıştı mırina bavê mın, hemû heqên mın betal kırın, çı mal, mılk û zeviyên me hebûn, hemû wana gırtın, bostek erd nedan mın. Ez her roj ev malê bavê xwe lı dest wan de dibinım, dıçım ber çala gorê têm. Bawerke êdı tebat lı dilê mın de nema, çêtire ez lı vıra dırkevım. Sedem tenê ev jı nine, divê mırov pêşerojên xwe jı bıhênije, bine bira xwe. Baweriya mın ewe ku, wexta ku em bıçın gundê Bayê Seyid, ango gundê Kûpıkê, wê rewşa me a abori jı lı vır qenc bıbe, dolıwa me bêtır baş bımeşe. Keçê tu bı xwe jı dibini, pıştı ewqas neheqi, bêbexti û mırina bavê mın de, em bı şev û roj dışuxulın, kar dıkın, lê disa jı em tazi, bırcı, rût û ling xasine. Ma va çı hêkmeta Xwedê ye keçê, em zıkê xwe bı

nanê ceh, garis û gılğul va ji têt nakın. Em ne qatix bî têtî dîbinın, ne nanê tûsi, ne ji pivazan. Lı aliki ev rewşa hejari û belengazi, lı aliya dın de ji, her roj jiyan lı nav tırs û xofê de derbaz dibe. Em lı diya xwe de bûne, nebûne, me qet rojeke xwe a qenc û zık têtî neditiye. Em her tum mina xulamın, berdest û nokeran jı mir, axa û kesên xudan mal, mülk, kesên dewlemend ra kar dıkın. Gelek salın ku em naxırvaniya vi gundi dıkın, lê disa ji rewş naye guhartın, mina tas û serşoka beri. Bınhêre delaliya dilê mın, tu bı xwe ji dızani û dîbini, em bêt ax û bêt erdın. Kozikek me a serbıxwe tune ku em têda rûnın. Xaniyê me bû pag, ew paga ji lı dest mın de gırtın, nedam mın. İro em lı xaniyê keseki de rûdının. Lê ku em bıçın kuderê, bawer ke her der jı mera yeke. Jı bona ev ji, ez dîbêjım em lı vi gundi de derkevın bıçın wê hêlê. Lewra gundên wê aliyê, ango gundên qeza Mêzgırê, lı van gundên dorbera qeza Xozatê çêtırın. Heya roja iro lı wê herême de rê û dirbên hukma Tırk ji çênebûne, hukma Romê neketiye wê aliyê. Em xudan du kuramın, sibe disa zarok jı mera çêbıbın, bibe ku sibe hukma Tırk êriş bıde ser vê aliyê, lı wê demê de gelo em çı xaliyê lı serê xwekın? Em çı bıkın, lı kuva bıçın? Dîbêjın hukma Tırk bı hezaran leşker, top û tank kırıye Xarpîtê; bibe ku sibe şer destpêbıke, hukma Romê rewşa Dêrsım jı bıke mina rewşa Qoçkırıyê, Şêx Said û çiyayê Agır. Na-na keçê bı navê Xızır, Roja Zeri ez naxwazım em lı tev du kurên xwe, bı destê leşkerên Roma Reş va bêne kuştın, dilê mın qet tışteki usa naxwaze.

Tebat lı Melekê de nema bû, balam nedıxwast ku dilê mêrê xwe bışikine, jı mêrê xwera hêrs bıkeve, tışteki bêt erêni bıbêje. Dûra bıryar da ku bersivê bıde mêrê xwe, çend tıştan jı mêrê xwera bıbêje. Bı hêrs helpûngek hevır lı leganê de derxıst, da ser xonçê, bı destan pışaft dûra piçek ard avıt ser helpûnga hêvır bı destan lı ser hêvır de belav kır û kırtnak-oklava-da ser ku hêvır veke icar sekıniya, berê xwe da mêrê xwe, jı mêrê xwera:

- Na la-law xêncı du kurên te, xêncı canê te û xwişka te û mın, ma canê zar, zêç, keç, bûk û xortên kesi tunın? Ma can û xwina mın û te, can û xwina du kurên te û xwişka - te, jı can û xwina zar, zêç, keç, bûk û xortên gelê Kurd çêtire? Xwina me jı xwina wan sortire? Te ev tısta beri jı, jı mınra gotıbû, mın bersiv dabû te, iro carek dın jı, jı tera bibêjum. Ez naxwazım lı ev gundi de derkevım. Lewra ez vi gundi zef hezdıkım. Tu ku dıxwazi bıçı, fermo rê vekiriye. Lê tıka mın lı te, jı bona mın û du kurên mın israr meke. Binhêre em lı vi gundi de hatine cihanê. Me lı vi gundi de çavên xwe lı cihanê vekır û em lı vi gundi de dijin. Em hemû gundi jı, bı dûr û nêzık va meriyên hevın, hevûdu baş nasdıkın, xuy û xurıştên hevûdu jı dızanın. Dıvê tu mın fêmbıki, ez naxwazım lı ev gundi de derkevım bıçım ciyeki dın. Bı kerema xwe jı mınra carek dın qal û behsa şol û meseleyên usa meke. Qasa heq û keda te, heq û keda mın jı lı ser van du pızêzan de heye. Em ku mırın bı hevra bımırın, lı vi gundi de, lı nav meri û merıstanan de. Her çıqas ku wana lı me neheqiyên mezın jı kırine, lê disa meriyên mene, roja şer çoê wan lı tev ço'yê me û lı ber serê meye, wê disa ew me bıparêzın û lı me ew xwedı derkevın. Paşgotına mın jı tera ev e. Mırına me lı vi gundi de, mayına me, disa lı ev gundi de. Tıka mın lı te bese evqas rık meke, lewra ez naxwazım. Dıvê tu mın fêm bıki ez naxwazım bıçıme gundeki dın, ez naxwazım bıçıme dereki, te got erê? got û dengê xwe bırrand.

Xıd têgihışt ku Melek qet naxwaze lı gundê Torût'ê de derkeve bıçe gund û an jı ciyeki dın. Jı bona ew jı Xıdê dengê xwe bırrand, tûrıkê xwe avıt ser milê xwe û bı hêrs û lez derket der çû xwe gıhand ba kurê xwe û ber pêz û dêwêr. Xıdê piçûk çawa ku bavê xwe dit geleki kêfxweş bû, bervı bavê xwe çû û jı bavê xwera:

- Na Apo tu evqas lı kuderê de mayi? Çıra tu usa dereng keti? Bawerke te ez bı zıkê bırcı kuştım. Ka te jı mınra

got"ez zû têt"lı te çı qewımı, ku tu usa dereng mayi? Bînhêre êdi êvar hat..

Xîdê bav kurê xwe hembêz kîr, ser û porê kurê xwe mîsda, lı kurê xwe şabû û dûra jı kurê xwera:

- Qet mepirse kurê mın. Çawa ku ez ketım hındır gund mın dit ku bı riya Xwedê de qet kesek lı pêşiya deriyan de tune, kesek naye ditın; gund bêt mirov û tenha dıhat xuyakırın. Jı bona ev ji, beri ku ez bıçım mal, mın berê xwe da aliya mala Reşo û ez çûm mala Reşo. Mın mina her dem deri tanda û ez ketım hındır. Lê ez ketım hındır ku çı bıbinım, hemû gundi lı mala Reşo de kombûne, lı nav xwe de qisedıkın, ketine nav gengeşiya wan dengên ku iro sibê de dıhatın. Reşo xwast ku ez ji piçeki rûnım. Lê mın dilê Reşo û gundiyan neşikand, ez ji rûniştım, mın ew guhdar kırın. Dûra jı mın xwast ku çend tıştan ji ez bıpeyivim. Lê tu bavê xwe qenc dizani, ez axaftinê pırr hezdıkım, mın ku destpêka axaftinê kır, êdi ez naxwazım ku kesek bıpeyive, ez hemû tıştan ji, jı xwe birdıkım, tenê babeta axaftinê lı aqilê mında dımine. Lê wexta ku mın destpêka axaftinê kır, êdi mın tu ji, pez-dewar ji hemû birkırın. Jı bona ev ji ez dereng mam lawê mın, tu bavê xwe bıboxşine, bıborine. Bı taybeti Reşo xweş qal û behsa tıştên diroki dıkır. Tu bavê xwe baş dizani, ez çirok û meseleyên diroki pırr hezdıkım. Jı bona evana ez dereng ketım. Dûra lı ser pêşneyara mın, Eloyê Zinê, Memê Hesê û Dizgûnê Amed bıryar standın ku bı hevra bıçın mala Seyit Ali Rıza û Şahan Axa, pırs bıkın gelo ew dengana, dengên çı bûn, çı nûçe hene, tunın, felan-bêvan.

Pışti axaftına Xîdê bav, Xîdê piçûk jı bavê xwe pırsiya:

- Apo ma te jı mınra pivaz ani, neani, bı kerema xwe tu ew jı mınra bıbêje? Lewra iro ez birçıyan mırım, got. Xîdê bav tûrık lı ser milê xwe de dani, ew du nanên teze lı tûrık de derxıst dirêje kurê xwe kır û jı kurê xwera usa got:

- Kurê mın tu mın bıborine. Mın jı tera pivaz-mivaz neani. Lewra diya te geleki ji hêrs ket û jı mınra usa got"du-sê seri qıxse pivaz mane, ew ji, jı bona sorxaça girmıyan û xwarına mivanan pêwıstın". Ez çı bıkıım kurê mın, diya te usa got, pivaz neda, ku ez jı tera bınum. Mın jı nexwast, ku jı bona pivazeki dilê diya te biêşınım, an jı jêra pevbiçım. Ew kewani û berpırsiyara malêye, vatiniyên xwe ji qenc dızane. Wê jı tera du nanên germ û teze şand. Jı mınra got"tu jı kûrê xwera bıbêje ew cıwane, jı wıra pivaz-mivaz ne pêwıste. Bıla van du nanên germ û teze bıgire bıxwe, zıka xwe têr bıke, ew lawê Piltan begê û Alişan begê nine".

Xıdê piçûk jı diya xwera geleki qeheriya, hêrs ket, lı ser erdê de rûnişt û bı kelegiri jı bavê xwera:

- Bû-bû Apo xem nine, ez diya xwe qenc nasdıkıım. Bıla Xwedê agirê mala bavê diya mın bıtemırine, ew her tum usaye, her car jı usa dıbêje. Lı gor birûbaweriyên wê mivan jı zarokên wê çêtırın. Bıla mivanên wê zık têr bıın, zarokên wê jı bı birçıyan bımırın. Ev adet û baweriyana ne tenê adet û baweriyên diya mının, her usa jı, yên hemû jinên Kurdan û gelê Kurdane. Carna ez tışteki lı diya xwe dıxwazım, ew jı mınra usa dıbêje" na kurê mın ez naxwazım lı cem mivanên Xwedê de rûyê xwe reş bıkıım". Ango ez qet diya xwe fêm nakım, ku usa jı bımeşe û ev xurıştı xwe jı ku neterikine, ez wê heya roja mırınê jı fêm nakım. Heke ku mırov hejar û belengaz be, nan û xwarın jı, jı bona mivanan tunebe, ma rûyê mırovan çawa reş dıbe? Ew mivanên ku têne mala me, tu bı xwe jı wana dıbini û hemûyan jı qenc nasdıki. Ew hemû şıvan û gavanên mina mene. Axa û mir nayên mala me. Tenê salê de careki-ducaran Pir, Rayber û Mırşûd têne tên mala me, ew jı, jı bona çıralixê. Mala wan ava be, ew jı gel dışêlinın. Axa û mir jı qet nayên mala me. Ango her teyrek bı refên xwera dıfırıke. Çına me û wan lı hev cûdaye. Dûra mivanên Xwedê, dıvê jı bona xwarınên bı taybeti neçın

mala keseki. Mivanên Xwedê çî hêvi dîkîn ew nabe, divê çî amade dîtî wi bixwî, lî Xwedê şîkîr bîkî. Hûn mezin dibêjî" Helal, Hazîr, Ya Xîzîr". Eynî usa..

Xîdê bav kurê xwe guhdar dîkîr û lî berxwe dîket.
Dûra çû lî ba kurê xwe de rûnişt û jî kurê xwera:

- Layê minê delal tu berxwe mekeve, hêrsa xwe rameke, mexeyîde, lî qîsûrên diya xwe menhêre, wêna bîborîne. Tu hina zarokî, aqîlê te nagihêje kar û berên malan, malxwe û kewaniyên malan. Tu jî ku rojeki mezin bûyî, zewîciyay, bûy xudan mal, bûy xudan jîn, zar û zêç, wê çaxê heq bîd diya xwe û bavê xwe. Tu jî rojeki dîbî berpîrsiyarê mala xwe û gelek tîştan. Ez bawerîm wê çaxê tu me bîni bîra xwe. Diya te a hejar çî bîke kurê min? Me ev tîştana usa dîtîne, em usa fêrbûne. Ev perwerde û zanyariya, diya me û bavê me daye me, divê em jî lî pey kevneşopiyên bav û kalan bûneşîm. Ango adet û toreyên qenc dibêjîm. Ew tîştên ku jî bona îro jî başîm, divê mirov wana bîrneke. Mivan hezkîrîm adetek herî qenc û maqûle. Mîrovê ku mivanan hezîneke, ew kesa mîrovatiyê jî heznake. Bav û kalên me bî valayî mivan hezînekirîne. Wana mîrovhezîya xwe, bî mivanhezîya xwe va peyîtandîne. Ango îspat kirîne. Kurê min tunebûn rewşek nengwaze-çetin-pîrr zore; Xwedê keseki neke nav tunebûnê. Lê ku hebûna mirov hebe, ma ew kîjan dayîk û bave ku, jî zarokên xwera çav tengiyê bîke, zarokên xwe birçî bîhêline? Xwedê mala tunebûnê bîşewîtîne. Xêncî ev, ez jî tera çî bîbêjîm lawê min, got.

Xîdê piçûk bavê xwe guhdar dîkîr û lî navbera gotînen bav û diya xwe de pîrd sazîkîr. Dûra vegeyîrîya jî bavê xwera:

- Erê-erê Apo, seranser, seranser; ez te û diya xwe baş dîzanîm û dînasîm. Tu jî weka diya min jî minra dibêjî, aqîl û ramanên we yeke, hûn mîna hevîm. Raste Apo ez hina zarokîm, aqîlê min nagihêje gelek tîştan, balam ez jî, jî ev zarokatiya xwe de gelek tîştan û neheqîyan dîbînim.

Ez li hemû heval û hemsalên xwe û xwe dînhêrîm û xwe û wan dîbinim. Lî gund de mezin û piçûkan, kal, piran, rewş qencan, hejarên mina me hemûyan dîbinim û nasdîkîm. Erê aqil rêberê kar û berê mirove, balam çav ku nebinim, aqil pîrr tîştan nîkarîbe bike û li nav hev derxine. Ez zarokîm ev raste. Aqlê min ne mina aqlê we mezinane, balam ez jî dîbinim Apo. Em li alîki tazî û birçî, ling xasî, nanê ceh, garîs û gîlgîl nabinim, li aliya dîn de jî li nav tîrs û xofan de dijîn. Bî taybetî ev nanê tîsî û bêt qatix êdî loqleyên me hişk û zîwa kîrîne. Ev rewş jî min pîrr berxwe dîxine û dîxeyidîne, hêrsa min radîke, ez bînteng dîbîm. Carna ez bî xwe bî xwera dîbêjîm"gelo ev rewşa jîyana me heya çî wext dombîke?. Ma em heya çî wext usa şivan, gavan, naxîrvan, berdest û xulamê hin kesan bîn?.

Xîdê heya dawiyê kurê xwe guhdar-kîr û ecêb ma. Bî xwe û xwera"ev bêt mîraza mina mezinan dîaxîfe, ev gotînên vî dilê min dax kîrîn"got û vegeriya ser kurê û jî kurê xwera:

- Lî min bînhêre û guhên xwe qenc bîde ser min kuro; - êdî bese ev gotînên te, ez naxwazim tu min bîxeyidîni, dil û kezewa min perçe bîki û êşê bîki hemû bedena min. Derd û kulên ku Xwedê û pêxamber dane min û diya te, ew jî mera besîm. Ev gotînên te bêtîr derd û kulên me her zêde dîke. Tu ku bî rasti diya xwe û bavê xwe hezdîki, Xwedê ê xwe ku dihebîni, tîka min li te, divê carek dîn tu jî mînra usa nepeyivî, qal û behsa tîştên usa neki. Min çend car jî diya tera got û tîka kîr. Min got keçê were tu guhdare min bîke, em li vî gundî de mala xwe barbîkîm bîçîn hêla Mêzgirê. Çawa ku tu jî dîzani, her sal Pir, Rayber û mîrşûdên me li wê aliya Mêzgirê de tîn. Ew herêma ku Pir, Rayber û mîrşûdên me li wê tîn, jî wê herêmê ra"Newala Karê"dîbêjîm. Sala çûyî mîrşûdê me Bay Seyîd jî mînra"Xîdo were tu guhdare min bîke, li vî gundî de derkeve bî rojekî zû were li gundê meda ciwar be, em naxîra pez û dewarên gund jî bîdîne te. Gundê me

gundeki qence û hemû gundi ji gotinên mîn tinin şûnê, dilê mîn naşikinîn. Ez bawerim li gundê mede rewşa te bî her alikiva qenc dibe" got. Diya te ji ew gotinên Bay Seyid hemû bihistin. Pîştî çûyina Bay Seyid, mîn ev mesele ji diya tera vekir, bawerke li şûna xwe de hilpirtikiya, bî cînan ket, qiriya ser mîn, got"na û na"guh neda ser mîn û nepejirand. Lê ez bawerim em ku biçin wê aliyê, anga biçin gundê Bay Seyid, wê rewşa me qenc bibe, jiyana me tîşteki were guhartin, piçeki zikê me têr bibe. Kurê mîn tu qenc guh bide ser mîn. Ez dixwazim tu vê meselê jî diya xwera vekî. Diya te, li te pirr hezdikeyê û bibe ku ew guh bide gotinên te, dilê te neşikine û vê daxwaziya mîn bipejirine, bine şûnê, got. Li ser ew gotina Xidê bav, Xidê piçûk:

- Bû Apo bû, zor başe, serseran ez van gotin û daxwaziya te jî diya xwera bibêjim. Lê ez hêvi dîkîm ku ew disa jî mînra hêrs nekeve û li mîn nexine. Lê divê ez vê meselê li roj û demek wê a qenc de, jî wêra vekim. Anga roj û demek wê a kêf xwaşî û dîlşai de. Ku ew xatirê mîn neşikine û bibêje"erê". Weki dîn tu diya mîn baş dîzani. Wê ku got"na"Xwedê jî li jor esman de were jêr, ew disa dibêje"na". Ez diya xwe baş nasdikim. Ew"Nûh" dibêje, pêxamber nabêje. Xuruştî diya mîn jî ev e, em çî bîkî, got.

Xidê piçûk gotinên xwe teva kir qedand, bî lez û bez li çar aliyên pêz û dêwêr de çû û hat. Dûra disa dageriya cem bavê xwe û jî bavê xwera:

- Apo tê bira te çendek berê xalê mîn Aliekber hatibû mala me, te ev mesela jî wira jî vekiribû?

- Belê Qenc tê bira mîn.

- Ez jî wê rojê qenc tinim bira xwe. Xalê mîn jî tera digot"zava evqas baweriya xwe li herkesi meyne. Hinek jî wan seyidan hene pirr derewan dîkî. disa hinek Pir, Rayber û Mîrşûd hene kedxwariyê dîkî, dîrav bî faizê dîdî hejar û belengazan, deh qat bî şûva dîstin. ew qet

kar nakin; kar û berên rêçberiyê çiyê qet nızanın. Teralın, mina boxan dıgerın, lı ser pıřta talıbên xwe de dijın, xwına wan dımêjın, hestiyên wan dıkojın. Disa hınek jı wan hene, ew jı bêt namûsın; bı çavên bed jı keç, jın û bûkên talıbên xwe dınhêrın, doxın sıstın. Xalê mın dıgot"mın řêx û meleyên Sunniyan neditine, balam dıbêjın ew jı seyidan zêdetır derewan dıkın, gelê Kurd dıxapının. Ew heval û hogırên dijminanın, jı dijminan ra bûne hevpar, xwe fırotine Tırk û Ereb û Farıs'an". Apo naha tu bı kerema xwe jı mınra bıbêje û mın agadar bıke. Mın hın gotınên xalê xwe fêm nekırın. Wi dıgot řêx û Seyid kedxwarın, doxın sıstın; gelo kedxwarı û doxın sıstı çiyê? Doxına wana çıra sıst dıbe Apo? Wexta ku doxına wan sıst bû, dıvê ew doxınên xwe kip gırêbıdın û qenc bıřıdının, ku carek dın doxına wan sıst nebe, wer nine Apo?.

Jı bona ew gotınên Xıdê pıçûk, Xıdê bav hêrs ket û êriř da ser kurê xwe, qiriya bı çêr û leqem va jı kurê xwera:

- Kuro hıřbe, ez naxwazım wan gotınên xalê te carek dın bıbihısım. Xalê te êdi ew bûye kafır û Yêzit. Wi Pir, Rayber û Mırřûd hemû bırkırıne. Me dıgot bıla ew bıxwıne bıbe mırov, lê ew dıxwıne roj bı roj dıbe kafır û Yêzit, tête guhartın. Sıbê, dısbıe wê ew bıbe mamoste, bıçe gund û bajaran zarokan bıde xwendın, wana fêre tıřtan bıke, bıelımıne. Gelo ew ku usa bıke û bımeře, bı ew felse xwe va kar û tevger bıke, ki zarokên xwe bıřıne dıbıstanê ba wi û bıde xwendınê?. Wi řerm û edew jı lı cıhanê de rakırıye. Ew çêqên xwe lı gor rex û lıhêf'a xwe dırêj nake. Ez jı bona wi geleki jı dıtırısım. Ew ku her tım werge tevger bıke û bıaxıfe, Xwedê neke rojeki belaak mezın were serê wi, çavên wi kor bıbın, devê wi xar, zımanê wi jı lal bıbe. Kurê mın, ez qurbana canê te, nebe-nebe ku tu guh bıdı wi xalê xwe ê dınık; nebe ku tu jı lı pêřerojan de mina xalê xwe bıki, mina wi tevger bıki û bıaxıfı. Xwedê her tıřt lı gor xwasteka xwe afirandıye. Qenci afirandıye, lê lı hember qenciyê bedı derxıstiye, ku mırov bıbine û qenciyê

hezbike, bediyê rûkırın-tercih-neke. Qenc bınhêre kurê mın, lı hember agir av û baran, lı heber rojê şev, lı hember tariyê ronahi, lı hember eviniyê nefirin-nefret-û kin, lı hember jiyanê mırın, lı hember dijminatiyê hevalti, dostayeti, lı hember nezani û xeşimiye aqıl, fels û zanin afırandiye. Wi ji bona qûlên xwe pêxamber şandiye, Pir, Rayber û Mırşûd şandiye. Ziyaretên mezın derxistiye holê, bı milyonan tışt wi nûvedan-icat-kırıye. Ha, lê ku xalê te rexneyê şêx û melan dıke, tışt-mıştên pis û bêt erêni ji wanra dibêje ew tışteki dıne, bıla bıbêje; wê çaxê ez ji, Xwedê ji, hemû Elewi ji dılşa dıbın. Ji ber ku hemû şêx, mele û xoceyên Sunni diji Elewiyanın. Ew birûbaweriyên xwe lı Omer, Osman, Ebûbekır, Mawiye û Yêzit tinın. Divê xalê te van tıştan qenc zanıbe. Pir, Rayber û Mırşûd, ew hemû esl û kokên xwe dıbın lı esl û koka Mihemed va gırêdıdın. Dıbên"em newiyê pêxamber, Bamasûr, Kurêş Bawa, Axûcan, Seysawûn, Pir Sultan û ên dının". Bamasûr lı İranê diwêr sıwar bûye, lı zıkê seateki de ew diwara ajotiye aniye qeza Mêzgirê lı gundê Moxındiyê de daye sekınandın, lı wê rawestiye. Padişah'ê Romê Kurêş Bawa avitiye fırina agir, deri lı ser dadaye, rojtıra dın derê fırinê vekırıye ku çı bıbine, ri û simbêlên Kurêş Bawa qemır girtine, Kurêş Bawa bı serman dıricıfe, qet neşewitiye. Seysawûn kefa sawûnê û mêwa zebeş lı ser çemê Fırâtê de kırıye pırd û gel lı ser kefa sawûn û mêwa zebeş de derbaz bûne. Axûcan kasek jehr vexwariye, dûra ew jehra lı bınê neynûkên tiliyên destên xwe de dakırıye, disa ew kasa mina berê tıji kırıye, bı wê jehrê nemırıye. Ango ewên dın ji, wana her yeki kırametek derxistiye, cûre-cûre hêkmet temaşe kafıran kırine. Ma ew xalê te ê dınık van tıştan dızane, yan na?.

Xıdê pıçûk:

- Başe Apo, başe, mın hemû gotınên te fêm kır. Balam ez xalê xwe zef hezdıkım, ew xorteki dınık nine, xorteki heri bıaqıle. Tu bı xwe ji wi pırr hezdıki, balam gotınên wi



heznaki. Herwaha ji bona nêta te a mal barkırınê ji, ez ji diya xwera bîbêjum, lı wê tıka bıkıım, dūr û dirêj ji wêra bıaxıfım, guh bıdıım ser gotınên wê û bınhêrım gelo ew çı dıbê. Ez hêvi dıkım bersıva wê erêni be, bıbêje"erê"dax-waziya te bıpejırine. Ha ez disa dagerım ser mesela xalê xwe. Ew tıştên ku tu lı derheqa xalê mın Aliekber de dıbêji, bı rasti neheqiye. Xalê mın dıxwine, qafa wi ji qafa me bêtır vekırıye. Tu xalê mın baş nasdıki, ew derewan nake, ew ku wan tıştan nezane, ew qal û behsa tıştên werge nake. Ez sedi-sed bawerım ku, gotınên xalê mın rastın. Te bı xwe ji çend caran gotıbû, iro ji tu dıbêji û berxwe dıkevi. Te dıgot"mala hın serok eşırên me bışewite, ew ji Seyit Ali Rıza ra arıkariyê nakın, bêt ali dısekımın û hınek ji yekser lı tev dijınan dıxebıtın". Ku usaye, divê tu pıştğırıya wan seyidan û axan neki û negiri.

Jı bona axaftına Xıdê piçûk, Xıdê bav disa hêrs ket, rabû ser lıngan û qırıya ser kurê û bı dengeki bılınd va:

- Kuro hışbe, kûçık bavê kûçık bav, kehr bavê kehr bav, hina bina şır lı çevê te tê. Ez bala xwe dıdıım ser te û lı te dıfıkırım, dıbınım ku, tu ji mina xalê xwe ji mınra deng dıki û dıxwazi ku weka wi bıbi kafır. Kuro pıncê heram lı mın qenc bınhêre, guhên xwe qenc bıde ser mın, ez nax-wazım tu ji weka xalê xwe bıbi dijê Pir, Rayber, Mırşûd, ziyaret û ewlıyan. Xalê te şerm û edewa cıhanê rakırıye. Beri ku ew destpêka xwendınê bıke ji werge bû. Me dıgot bıla Aliekber bıxwine, bıbe mırov, lê ew her ku çû, bû Ehrıman. Çawa ku Ehrıman diji Xwedê derketiye, Aliekber ji diji seyidan û ziyaretan derdıkeve. Tırısa mın ewe, wê ew xışma Xwedê bıkışıne serxwe. Bav û kalan çı gotıne; gotıne ku" Çû gergerê, hat kehrê berê". Mırov dıbêje ev meteloka jı bona xalê te hatiye gotın. Jı ber ku xalê te dıçe dıbıstanan dıxwine, dadıgere mal lı diji adet, tore û bawerıyên me derdıkeve. Ango xwendınê ew usa kır.

Xıdê piçûk dit ku bavê wi geleki hêrs ketiye, dest û pê lédilerzın, dıxwaze ku tışteki bıke, icar dengê xwe bırrand,

her tırsiya, bersivek neda bavê xwe û dûra bî hêdika li şûna xwe de rabû çû li binê dareki de rûnişt, kete nav teşqelan û kete nav şirovekîrîna gotinên bavê xwe û gotinên xalê xwe.

Xîdê bav piştî çuyîna kurê xwe û hemû axaftina xwe de, bî hêrs li şûna xwe de rabû, çû li dorbera naxira pêz û dêwêr de ziviriya, destpêkîr xwe bî xwera axaft, qisekîr. Bî xwe bî xwera" ez bawerim min dilê lawê xwe êşand. Ew li ser hemû gotin û şîretên min de, gelekî ji tırsiya, li min xeyidiya. Dîvê min werge ji wira nepeyiviya, werqas hêrs neketama. Ew dest û pêên min û mala mine. Ew ku nebe ki ji minra arikari bike, ki li tev min were ber naxira dewar û pêz" got û bî dengeki nîzm û mlaim va gazi kurê xwe kir:

- Kurê min ez dîbêjum êdi em pêz û dêwêr kombîkîr, hêdi-hêdi bervî gund bîbîn. Lewra ev e êvar bû, hîndîk maye ku roj biçe ava. Îro me zîkê pêz û dêwêr ji qenc têrkîriye. Sibe da heya naha naxîr li nav giya û nefelan de çêriyan, bînhêre, bî taybetî zîkên ga û çêlekan bûne weka xaşiyên kayê got û destpêka pez komkîrîne kir.

Herdu Xîdan li zîkê çend hûrdeman de naxira pêz û dêwêr komkîrîr dan pêşîya xwe, hêdi-hêdi bervî gund meşandin. Dûra Xîdê bav nêzîka kurê xwe bû, dest avit paş stuyê kurê xwe, porê lawê xwe bî evîni va mîsda û ji kurê xwera:

- Bînhêre lawê minê bîaqîl û delal, ez qenc têgîhiştum ku, min iro dilê te pîrr êşand. Ez lêborandinê li lawê xwe dîxwazum, tu min bîborîne û bîbaxşîne. Ez bawerim tu baş têgîhiştî, ku te pêle ranên minên bed kir. Te xwast ku, tu ji, ji minra mina xalê xwe bîaxîfî, rexneyê hîn tîştan bîki. Lê xalê te xwendîye û dîxwine; ew êdi mezîne. Van rojan de ji ew êdi bûye mamoste. Dorbera wi her fereh bûye; gelek hevalê wiên zana hene. Çend mamostan xalê te pîrr hezdîkîrîr. Xalê te mina te nine. Ew li zîkê Ola xwe de derketîye. Ev ji me berxwe dîxîne. Ez naxwazum li pêşe-

rojan de tu ji diji Ol'a İslam derkevi, bîbi bêt Ol, Pir, Rayber û mırşûdan birbiki. Dıvê tu Ola xwe û Pir, Rayber û mırşûdên xwe, qet jı xwe birneki. Çawa ku mın beri ji, jı tera got, Pir, Rayber û Mırşûd, ewana hemû xudan ocax û xudan kırametın. Mın jı tera qal û behsa diwarê Bamasûr kır. Ez carek dın ji, jı tera bîbêjum. Bamasûr lı aliya İranê, berbanga sıbê de, lı diwarê xwe sıwar bûye, lı zikê seateki de hatiye xwe gihandiye hêla Mêzgirê, gundê Moxındiyê de diwarê xwe daye sekınandın, taştı xwe lı wi gundi de xwariye û ew gunda jı xwera kıriye wareki nû û lı wi gundi de bıngêh gırtiye, lı wi gundi de zewiciye, bûye xudan zar, zêç û newi, dūra roj hatiye ew ji mırıye çûye gihiştıye rama Xwedê, lı bıhiştê de rûniştıye. Ew gunda-gor ku dibêjıngundeki eşıra Şadiyane, balam newiye Bamasûr ji lı wi gundi de rûdının, hevparê wi gundine. Tıştên ku lı derheqa diwarê Bamasûr de mın bihistıne, dibêjın "qet kesek qenc nızane ku, Bamasûr çendsed sal berê hatiye lı wi gundi de ciwar bûye". Kes sal mırına wi ji nızane. Lê tıştê ku ecêbe, bala meriyan dıkışine, ew ji ew e, ku dibêjın ew diwara çawa roja ku Bamasûr sıwar bûye, ew diwar werge sekıniye û qet hılneşiye, mina kevireki lı şına xwe de maye. Ew diwar bûye ocaxeki zor mezın û ziyaretgehek heri gıring. Her roj bı sedan kes û malbat dıçın ser wi diwari, wi diwari ziyaret dıkın. Yên ku nexwaşın, jı bona nexwaşiyên xwe, yên ku xudan derd û kulın, jı bona derd û kulên xwe, yên ku bêt zarokın, jınên wan zarokan naynın, ew ji, jı bona zarokan dıçın ser wi ocaxê mezın. Yên nexwaş xwaş, yên xudan derd û kul, derd û kulên wan çareser dıbın, qenc dıbın. Kesên bêt zarok dıbın xudan zarok, Xwedê zarokan dıde wan, ango ez jı tera çı bîbêjum kurê mın, mırov dev xar dıçe, dev rast vedıgere. Dıbên" iro lı ser wi ocaxi de newiyê Bamasûr, kurê Seyid Bertêl, Seyid Sılêman rûdine". Gor ku Bay Seyid jı mera dıgot" Seyid Sılêman xudan sê kuran û keçekiye. Navên kurê wi, Seyid Husên, Seyid Piro û

Seyid Memed. Keça wi ji nav Ana Elif'e. Seyid Sîlêman ew keça xwe daye kurê serokê eşira Axûcan, Doxan Dede ê Meletiyê. Ewê ku li qeza Doxan Şehrê de rûdine û navê wi dane wê qezaê". Disa gor ku Bay Seyid dıgot, newiyê Doxan Dede, zavayê Seyid Sîlêmin Husên Doxan dji gelê xwe ye, heval û hevparê hukma Romêye, hevalê Mîstefa Kemale. Kurê Seyid Sîlêmin, Seyid Husên, çawa ku dibêjin xorteki pîrr bîaqile, zor zanaye, jire, jêhate. Ew ji hevalê Mîstefa Kemal û Îsmet Paşa ê kerre. Îsmet Paşa û Mîstefa Kemal wi zef hezdîkîn. Ango ew kesên ku wana nasdîkîn, usa dibêjin. Ew ji dji tevgera Dêrsûm û Seyit Ali Rıza ne.

Pîştî ewqas gotinên Xîdê mezîn de, Xîdê piçûk:

- Na-na Apo, ez li te nexeyidime û suneketime, bawerke. Çira ez li te sukevîm û bixeyidîm? Te li min tîştê nekîr ku, ez li te sukevîm û an jî bixeyidîm. Min ew gotinên xalê xwe jî tera got, tu jî, jî bona wan gotinên xalê min, jî mîra hêrs ketî û qehîriyay, tenê evqas. Lê ez çî bîkîm Apo, tu min bîborîne, ez xalê xwe û gotinên wî pîrr hezdîkîm. Ez jî tera nabêjîm hemû gotinên xalê min rastî jî. Jî ber ku, çawa ku tu jî dibêjî, ez hina zarokîm, aqilê min evqase, mîna aqilê we kamîl nebûye. Lê wê roj bê ez jî mezîn bîbîm û bîgihêjîm salên we. Herwaha Apo, bî rasti te gelek tîşt gotî, qal û behsa hîm kesan û navan kîr, ez bûm nasê wan navan û kesan, spas, destên tera dîramîsîm, balam ez dîxwazîm li te tîştêkî pîrs bîkîm.

- Pîrske.

- Lê divê tu disa jî minra hêrs nekevi û nexeyidi, bû?

- Na-na bî navê Xwedê û Xîzîr, ez naxeyidîm. Çî dibêjî bibêje, tu azayî.

- Apo, jî minra rast bibêje, ew tîştên ku tu dibêjî, ew çîrokên ku tu qal û behsa wan dîkî, pesna wan dîdî, gelo ew hemû rastî? Bî rasti birûbawerîya te li wan gotî û çîrokan tê? Raste tu li xalê min mezîntîrî, tu jî pîrr tîştan

ra dîbêji"ew rastın"Xalê mın ji dîji te derdıkeve jı tera dîbêje"na ew derewın". Lê nızanım hûn kijan rastın.

- Xîdê bav:

- Bînhêre lawê mın, ez qet bawer nakım ku lı ev cihan de keseki bêt birûbaweri hebe. Herkes xudan birûbaweriye-kiye. Mîrovên bêt baweri lı cihan de tunın, ku hene ji ez nızanım. Lê ku hebın ji, ez dîbêjım ew kesana xelıtın, Xwedê wana bîborine. Balam Xalê te baweriya xwe lı gelek tıştan nayne. Lê ez nıkarıbım jı tera bîbêjım"sedi-sed ez rastım, ew xelite, yan ji ew raste, ez xelıtım". Êdi Xwedê dızane, ki raste, ki xelite.

Pıştı ew gengeşiyê de herdu Xıdan dengê xwe bırandın û pez û dewar bervı gund ajotın û lı zıkê çend hûrdeman de pez û dewar gihandın bînê gund; pez û dewar lı hev veqetıyan û berıdan malên xwediyên xwe. Gelek keç û xortên gund ji, lı bervı pezên xwe çûbûn, ku pez û dewarên wan neçın malek dın. Lê pez û dewar wer hubûbûn ku, qet riya mala xwediyên xwe şaş nedıkırın û lı hev vedıqetıyan û dıçûn pêş axur û cihên xwe. Lı zıkê çend hûrdeman de hemû pez û dewar lı pêş çavên herdu Xıdan de wenda bûn, tenê lı pêş wan de çêleka wana nav Altûn, nogına nav Zeri, mi a wana reşbelek nav Elif û bızına wana Kol mabûn. Herdu Xıdan ji, çêleka, nogın, mi û bızına xwe ajotın bırın mal, kırın hevşe ê pêş dêri û dage-riyan ketın hındırê malê. Çawa ku çavên Xîdê pıçûk lı diya xwe ket, yekser jı diya xwera:

- Dayê bı rastı ez iro lı te geleki xeyidime. Te jı mınra qıxsek pivaz neşand, ku ez bı hêsai nanê ceh-garis bıxwım, zıkê xwe têr bıkıım. Fermo jı tera ev torbe ê nan, bıgire, tu bı xwe ev nanên ceh û garis, hışk mina qûm û qûtê mı-rişkan bıxwe, lê ku xazi lı devê teda heye, bı xaziya devê xwe va nermke bıçû û daquline, bînhêre çawaye got.

Melek geleki jı kurê xwera hêrsket, xeyidi û jı kurê xwera:

- Kuro hışbe bêt mıraz. Ma te û bavê te her tışt anine mal, mın ji lı we veşartıye? Çavên te kor ninın, tu bı xwe ji dibini ku, lı malda çı heye, çı tune. Mın ji bavê tera got çend seri pivaz maye, ew ji, ji bona sorxaçê. Kuro ez kewaniya vê malême, ez nıkarıbım ji tera, ji bavê te û mivaneki Xwedê ra, girmi û xwarınên bêt sorxaç, bêt rûn û rıci bıpêjum. Divê em usa dolıw bıkın, qasa lihêfa xwe lingên xwe dirêj kın, got û lı şûna xwe de rûnışt, disa lı ber êşa çavan kire nale-nal.

Lı ber hêrsketına Melekê Xıdê pıçûk qet dengê xwe dernexist, lı tev bavê xwe çû lı ber agirê pıxêrigê de rûnışt, lı hıviya şivê de ma. Pışti du-sê hûrdeman de Xıdê mezın:

- Lê-lê ez dibinım tu geleki bêt kêfi, lawê te ji tu xeydandi, tu lı qısûrên wi mêze meke, xwe meqeherine, ber-xwe mekeve, em çı bıkın ev bextê meye, Xwedê lı ser eniya me usa nıvisandiye, divê em van derd û kulan bıqşının, em nıkarıbın lı diji Xwedê derkevın, weki dın em çı bıkın. Ez dızanım rewşa te ne başe, tu lı şûna xwe de rûna, bıla Xec ji mera tışteki bine, em şıva xwe bıxwın û bıkevın nav nivına xwe rakevın, sibe disa Xwedê mezıne, çı dıbe, çı nabe. Helbet Xwedê ji mera ji rojeki deriyeki veke, ji mera ji were ramê, got.

Lı pışti gotınên Xıdê, Xec rabû çû ber sepeta rûn û dew, sepet rakır, hesık kire destê xwe, dewê ku hındır dızıkêde bû bı hesıkê va tevda kire huskerê, lı tev çend nanan ani dani ser xonçê û hemû bı hevra lı dorbera xonçê de rûnıştın û şıva xwe xwarın, dûra ji hemû bı bédengi ketın nav nivın û binê lihêfên xwe razıyan ketın xewa kûr û pêva çûn.

Hewayê bıharê qenc derbaz dıbû. Gel destpêka çınandına ceh'an kırıbûn. Zarokan şıxre'ên ceh û kêsan dıki-

şandin bênderan, dıbistan ji ketıbûn betlanê. Şagirtên dıbistanan bûbûn şıxrevan, bûbûn şıvanê berx, karık, golık û dewar û pezan. Ew şagirtana jı dê û bavên xwera dıbûn arikar, kar dıkırın. Mamosteyên dıbistanan dageriyabûn malên xwe, gund û bajarên xwe. Mamosteyên gundi lı tev dê, bav û bırayên xwe dıxebıtıyan, û rêçberi dıkırın, ceh û genım dıçınıyan, gam dıgerandın. Yek jı wan mamoste'an ji Aliekber bû. Ew sala wi a ewlin bû ku, ew bûbû mamoste, lı gundeki Xarpitê de mamosteti dıkır. Lı betlana dıbistanan de ew dageriyabû mala xwe, balam kar nedıkır. Lı malda hedûra wi nedıhat, canê wi dıhat şıdandın, binteng dıbû, nedızanıbû ku çı bıke. Carna lı tev bavê xwe dıçû bajêr, carna lı tev bırayên xwe dıçû ceh çınandınê, lê disa ji rojên wi bı dılxışı derbaz nedıbûn, sewr teng dıbû. Dûra wi ew karana ji heznedıkır. Jı ber ku pıraniya zeviyên ceh bı destan dıhatın çınandın, destê mırovan hemû birindar dıbûn, dıhelısiyan, tılıyên mırov dıwerımıyan, bırin kul dıbûn nê m dıgırtın, dıêşıyan jan dıdan, mırov lı ber wan êş û janana de xew nedıkır.

Pışti şıv xwarınê bû, Aliekber malda lı tev bav, bıra û diya xwe rûnıştıbû, dıpeyiviya, rewşa kar û beran lı bırayên xwe dıpırsiya. Dûra berê xwe guhart ser bavê xwe, - jı bavê xwera:

- Bavo ez dıxwazım sibe lı aliya xwişka xwe de bıçım. Mın biriya wê, zava û xarziyên xwe kıriye. Ez Xozatê û gundê me zef hezdıkım, balam kar û berên gundan pırr hez nakım. Kar û berên gund jı bona mın gıranın. Lewra qet nûvedanek nû neketiye gundên me Kurdan. Ez karê gıran nıkarıbım bıkıım. We ez hute karê gıran nekırıme, ez çı bıkıım. Ez dıbêm jı bona du-sê heftan bıçım bıbım mıvanê Melekê û Xıdê zava ê xwe, gelo tu û diya mın çı dıbêjın? got. Bav û diya Aliekber:

- Riya te vekırıbe kurê mın, êdi ne pêwıste ku, tu lı me destûrê bıstını, Xwedê şıkır êdi tu mezını, xorteki xwenda, zana û mamosteyi, çı wext dıxwazi bıçe, jı tera oxırbe.

Lewra me ji biriya Melekê û newiyên xwe kırıye. Bıç wana bıbine, jı mera nûçan bine, gotın.

Beri ku herkes bıkevın xewê, bavê Aliekber Eli, jı Ali-ekber ra:

- Kuro em hêvi dıkın tu lı gund de jı xwera keçikeki ji bıbını, dûra em bıçın jı tera bıxwazın. Lewra êdi wexta te a zewacêye, got. Aliekber qet dengê xwe dernexıst, şerm kır, gep lı rû sor bûn, lı şûna xwe de sekınıya, serê xwe daxıst, bı bêdengi lı şûna xwe de rabû çû ket nav nivına xwe, lihêf ji kışand ser xwe û kete xewa kûr.

Rojtıra dın sıbê de Aliekber boxçe xwe a nan amede kır, berê xwe da riya Xozatê û gundê Torût'ê. Rê geleki ji dûr bû. Mırov bı peya rojeki dumeşıya xwe dıgıhand gundê Torût'ê, hewa ji geleki germ, tava rojê ji mırov dışewıtand. Lê Aliekber xort bû, xorteki sportmen, can lez û wurya bû-Atik-meş ji hezdıkır. Wı lı beri mıxurba êvarê de xwe gıhand korta bıne gundê Torût'ê û kete nav xeyalan. Bı xwe bı xwera"gelo naha ku xwişka mın, mın bıbine, wê ew çı bıke, lı ey mıxurba êvarê de jı mınra çı bıbêje"got û nêzıka gund bû.

Xıdê naxırvan û kurê xwe lı wê rojê de geleki westıya-bûn. Lewra pêz û dêwêr ew geleki westandıbûn. Bı taybeti bıızınan lı vırde-wırde bazdıdan, dıçûn bıne darên Mazi, jı bona berûyan. Lê berû hina geleki pıçûkbûn, ew nûva lı kovıkên xwe de derketıbûn. Balam disa ji bıızınan bıhna berûyan dıgırtın û dıbeziyan bıne daran, dıçûn dıketın nav kelem û darıstanan, lı hev belav dıbûn, her refek lı aliki de dıçûn. Herdu Xıd ji lı dû wan bıızın û pezên revın de bazdıdan, ku wana vezerının, bıının ba hev kombıkın, balam ew ji geleki dıjwar dıbû, herdu Xıd dıwestıyan û bêt hılm dıman. Xıdê pıçûk carna xwe dıgıhand bıızıneki, bı hêrs pê qoçên wê bıızınê dıgırt, ew bıızına dıda ber çoan, ço lı devê bıızınê dıxıst, dev û pozê wê bıızınê dışıkand, lı nav xwınê de dıhişt. Dûra, çawa ku wı ew bıızına berdıda, ıcar bıızınê disa mına beri, weka kevrosk bazdıda bıne

daran û nav kelem, jî bona berûyan û birêşê daran, direviya û direviya. Xêncı ew rewşa bızinan, bı taybeti lı meha Gulanê de moze jî derdiketin û wan jî ga û çêlek gez dıkırın û dibûn sedema reva wan û hevbelavbûna wan. Ga û çêlekan wexta ku dengê wan mozan dibihistin, te digot lı cınan ketine, har dibûn, doçên xwe radıkırın û direviyan, bazdıdan û ha bazdıdan; êdi ku lı kijan aliva çûn. Pırr caran komkırına wan heywanan jî bona herdu Xıdan her zamet dibû nedihatın komkırın, direviyan û lı şuneki de nedisekınıyan. Carna jî yekser direviyan dıçûn mal dıketın axuran, lı axuran de mexel dibûn, dıman.

Mıxurba êvarê êdi ketıbû ser erdê, gundiyan çırayên xwe vêxıstıbûn. Xıdê naxırvan û kurê xwe jî, bı westiyayi lı ber ronahiya agirê lojinê de rûnıştıbûn, pıšta xwe jî dabûn diwêr, ew rewşa bızinan û reva ga û çêlekan jî Melekê û Xecê ra dengdıkırın. Xıdê pıçûk jî lı ber agir de germ bûbû, xew ketıbû ser, stu lı ser nedisekınıya, noqını xew dibû, disa lı xwe dıhesiya. Lı wê demê de deri hate kutan. Çawa ku dengê kutandına dêri hat, Melek vecınıqıya serxwe, bı a Xwedê ev xêre, gelo ew kıye lı vê mıxurba êvarê de deriyê me dıkute? got û rabû ser lıngan, balam Xıdê mezın bı lez û rev xwe gıhand paşıya dêri, bı deng" xêre, ew kıye?" got û pırskır.

- Zava dêri veke ezım, ez, Aliekberê bûrayê te, got.

Çawa ku Xıdê dengê Aliekber bihist, yekser deri vekır û Aliekber hambêz kır, kıre nav mılên xwe û" lo tu xêr hati, sılamet hati, ser seri û ser çavên mınrı hati, kuro kijan ba û bahozê tu avıti vi ali, mamoste' yê meyê delal de keremke were hındır, me geleki jı biriya te kırıye lo. Bibêje, çı heye, çı tune?" got û Aliekber berda û berê xwe guhêrand ser Melekê" keçê ela tu ev bırayê xweyê çeleng û spehi bınhêre, mamosta bınhêre, bûye çı xort. Keçê ez bawerım bırayê te rıya xwe şaş kırıye. Gelek wexte nedıhat mala me, em hesreta wıda mabûn, wer nine lê?" got, Aliekber jı xwıška wıra hışt. Melekê jı bırayê xwe hambêz

kır, rûyê Aliekber maçkır" de fermo rûne " got û hemû bî hevra rûniştin. Dûra Xidê piçûk çû destê xalê xwe maçkır û lî kêleka xalê xwe de rûnişt. Xecê ji, jî Aliekber ra" tu xêr hati " got, rewş û dem pîrskır û lî şûna xwe de ew jî rûnişt û lî Aliekber mêzekır. Êdi Aliekber jî Xidê û Melekê ra nîabû. Bî taybeti Melekê pîrs dıkır û ha pîrs dıkır. Dûra ketin nav guftûgoên cûre, cûre, heya nivê şevê. Dûra aqıl hate serê Melekê, ku nivê şevêye. Jî bona ew jî, Melekê jî birayê xwera usa got:

- Tu me bîborine birayê delal, me tu heya ev seat hişti, nehişt ku tu bîkevi xewê. Sibê de heya naha tu lî rêdabûy, ez bawerim tu geleki jî westiyayi. Naha tu rabe bîkeve xewê, em axaftinên xwe bîhêlinin sibê.

pişti gotin û pêşneyara Melekê, Aliekber jî zavayê xwera:

- Zava ez dîxwazim sibe lî tev te û xarziyê xwe, bêm ber naxira pêz û dêwêr. Bawerke ez şivantiya pêz hezdikim. Mirov lî ber pêz û dêwêr de, şinayiyê, Gul û kulilkan û her cûre çiçegan dibine, bîna şinayiyê û wan çiçegan sewra meriyan fereh dîke, hedûra meriyan tê. Bîli van wexta xilok û sîpîngane jî, ez lî sîpîng û xilokan jî pîr hezdikim, got.

Xidê zava:

- Na-na kuro, tu mivani, hina nû hati. Ela tu çend rojan lî mal, gel xwişka xwe bîsekin, ew lî te têr bibe, dûra em bîfikirin, tu çito dîxwazi em werge bîkin. Ez dibêm sibe nabe, ango ez ev daxwaziya te napejirinim û nabêjim"erê" got û dengê xwe bîrand. Îcar Aliekber:

- Na zava, bî navê Xwedê ez dîxwazim lî tev we bême ber pêz. Tu jî bona serê bavê xwe, mebêje"na"ez qet itiraz-mitiraz jî naxwazim, hûn xurîştî mîn jî qenc dîzanin. Mîn ku got"divê ev tîştî bibe, an jî ez vî tîştî bîkum"lê divê sedi-sea ew tîştî bibe û ez wî tîştî bîkum. Ango lî navda mîrîn ku tunebe, ez xwastek û gotinên xwe tinime şûnê. Naha em lî ser vê meselê peymanbest-antlaşma-bûn?.



Melekê dit ku Aliekber" Nûh " dibêje û pêxamber nabêje, jî bona ew:

- Başe-başe ez qurbana canê birayê xwe, tu çito dixwazi werge bike, bî kêfa te, qet xem meke. Naha em bikevîn xewê, sibe Xwedê mezîne. Lî aliya dîn de, zavayê te û xarziyê te jî, iro gelekî westiyane, jî wanra jî rawest û vês pêwîste. Beri ku tu werê, wana qal û behsa reva bızînan, ga û çêlekan dîkîrîn. Bızînan çî anîne serê wan, ga û çêlekan çî kîrîne û çito lî ber mozan reviyane, ew dengdîkîrîn. Bawerke ev xarziyê te werqas ku lî dû pêz û dêwêr de reviyaye, hemû tîlî û neynûkên liwîk lî nav xwînê de mane, hatîne birandî; binê neynûkên tîliyên lîngên wî, hemû reş bûne, bûne weka qetran. Em çî bîkîn birayê delal, ev lawîka usa xasî û tazi lî ber dêwêr û pêz de jiyana xwe derbaz dîke, jiyana wî a cîwanti usa heder dibe dîçe. Hevalên wî lî dibîstanandane, dixwînî, ev lawîkê me jî usa bûye şivanê pez û dewaran. Xwedê mala hejartiyê bişewitîne, tunebûn zore, zor keko, em çî bîkîn? Ev bextê meye, Xwedê lî ser eniya me usa nîvisandiye lê dîvê em jî bona ev rewşa xwe şîkîr bîkîn, wer nine birayê delal? got û rabû çû nivîna Aliekber serast kîr û lî şûna xwe de bêdeng ma. Dûra Aliekber lî şûna xwe de rabû çû ser nivîna xwe de rûnişt, jî xwişkî xwera usa got:

- Jî bona karguzariya-hizmet-te bî dîlda spas, destên tera dîramisîm, balam ez hîn gotîm û baweriyên we heznakîm. Tu hemû tîşt dîgîrî, dibê lî Xwedê va girêdî û dibêjî"ev karê Xwedê ye, Xwedê lî ser eniya me usa nîvisiye"nîzam çî û çî. Carna hêrsa mîn her radîbe, bîhn lî mîn teng dibe, lê ez nîkarîbîm tîşteki bîkîm. Lewra ev realîta gelê meye, ev perwerde a gelê meye. Mala wan serdestan bişewite, rûniştîne jî bona hejar û belengazan tîştên wer afîrandîne ku, lî aqîlan dûr. Gel jî lî wan bawer kîriye. Ew bûne mir, ew bûne axa, ew bûne şêx, ew bûne seyîd, ew bûne bal-yozê Xwedê û zîktêr, lî jiyana komeletiyê de, bûne şûrê serserê hejar û belengazan. Ango bî kurtasî"qûl bûne qûlê

qûlan"weki dîn ez jî tera çî bîbêjum xwişka mîn. Tu baweriyên xweyên bêt bîngehin jî mînra dîbêji, ez jî nîkarîbum bî hêsayi ramanên teyên bêt erênî û bêt bîngehin bîguhêrinîn. Ev kar û xebat û zeman dîxwaze, yekcar nabe. Herwaha xwişka delal, ez serê te neêşînim, hîndê tu nexwaşî, çavên te diêşî. Çêtîre em gotî û axaftîmên xwe bîhêlînin sîbe û rojên dîn. De şev baş, Xwedê hêsabûnê bîde we, got û kete xewa şîrin û kûr.

Aliekber tev hemû neferên malê, lî berbanga sîbê de hişyar bû, rabû serxwe, kînc û kolên xwe lî xwekîr, derket der çû ber çîrtîka coka avê dest û rûyê xwe bî lez şoşt û dîsa dageriya hîndîr lî ser kursi de rûnişt. Herdu Xîd jî lî nav nivnên xwe de rûniştîbûn, nedîxwastî ku lî nav nivnên xwe de rabî. Xec jî bî meşka dew va mijûl dîbû, Melekê jî girmiya sawar dîda ser kuçîkan, êzing dîkîr bînê dizîka girmiyê, hewl dîda ku agir vêxîne. Pîştî demek kurt de, ronahiya Roja Zeri, cîhan ronak kîr. Lî wê demê de herdu Xîd jî êdî rabûbûn serxwe, xwe amade dîkîrîn. Dûra derketî der, ew jî çûn ser çîrtîka avê dest û rûyên xwe şoştî û dageriyên hîndîr. Xîdê mezî çû gepên Aliekber maçkîr, Aliekber jî destê wî. Dûra Xîdê piçûk jî çû destê xalê xwe maçkîr û hemû lî benda girmiyê de man. Pîştî çend hûrdeman de Melekê dizîka sawarê lî ser agir de dani jêr, ew girmiya germ bî hesîkê kîre leganek piçûk, legan jî dani ser xonça nan patînê û gazi hemûyan kîr"taşte amadeye, de fermo werî ser sîfra xwarînê" got, dûra hemû lî ser sîfrê de kombûn, nanê ceh û garîs jî pişartî hîndîrê girmiyê, bî kevçiyên darîk va destpêka xawrînê kîrîn. Pîştî taşte xwarînê derketî der, ku êdî Roja Zeri lî paş gaza hember de derketîye, mina bînderek gîlover sor û zer tê xuyakîrîn. Çawa ku derketîna rojê ditî, hemûyan lî hember rojê de sîlawetên xwe anî û dageriyên serhevû-

du, keleyên xwe lı hevûdu bıriyan, hevûdu maçkırın û ew karên xwe werge qedandin. Dûra Xidê mezın çû lı axur de mi, bızın û çêleka xwe derxıst der, da pêşiya xwe, lı tev Aliekber û Xidê piçûk ajot û lı binê gund de pez û dewarê gund lı gundiyan radest gırt û berê pêz û dêwêr da aliya zımagê hember gund.

Xidê piçûk qet nedıxwast ku lı xalê xwe dırkeve, her tım dıxwast ku lıgel wi rûne, lıgel wi bımeşe. Jı bona ew ji, lıgel xalê xwe dımeşiya û lı xalê xwe pırs-pırsdıkırın. Xidê mezın ji lı dorbera dewar û pêz de dıhat û dıçû. Pışti panzdeh, bıst hûrdeman de, naxıra pêz û dêwêr gıhandın bıne zımag û Xide mezın lı aliyek naxırêde, Aliekber û Xidê piçûk ji lı aliyeki de sekınıyan û çın lı ser kevıreki de lıgel hev rûnıştın, lı pêz-dêwêr û pêşdariya dorberên xwe û Gul û sosınan nihêriyan. Pez û dewar ji ketıbûn nav çêre û giyayên teze û xwaşık de dıçêriyan û zıkên xwe têr dıkırın.

Roj hêdi-hêdi bılınd dıbû, tava rojê tin dıda cıhanê, cıhan germ dıkır. Qırıkên reşbelek lı hêlınên xwe de radıbûn dıfırıkıyan, dıkırın qire-qir, dıksılêmanan û kewan dıxwendın, pepûgan dıkırın pep û pep, huli, sısorek û baz lı jor esman de dıfırıkıyan, lı nêçırên xwe dıgeriyan, mêşên hıngıv, pizeng û mozebeş lı tev vızık û kelmêşan lı çiçegan, lı her cûre giya û hêşınıyan dıhêwıriyan, zıkên xwe têr dıkırın, canên xwe germ dıkırın. Aliekber ji lı wan heywanan, pêşdariya çıyan, deşt û kaşan, kendal û zınaran, kevırên ası û bılınd, dar û darıstanan dınhêriya û bı xwe bı xwera" Xwedê mala dıjınan bışewıtine, ev welatê delal, ev welatê mına bıhişt kırıne bıne bandûrên xwe, jiyan lı me kırıne dogeh-cenem-kırıne zıندان. Ev welata ku lı bıne bandûra Romê de nebana, ew zılm û zorên bêt mırovi ku lı ser gelê meda nehatana ajotın, ez bawerım gelê me lı beri gelek gelan ev welata şên û nûjen bıkırana, her der bıkırana bıhişt. Lê em çı bıkın, çavên felekê korbın; iro lı darıstanên bêt şêr û bêt fil de, rovi û tori xwe

hût dıbinın û dıhesıbinın, têda dıçın û tên, cırıtın davıjın, bejnên xwe temaşe dıkın. Gelê me ji bûye noker û xulamê wan rovi û toriyan lı bin destên wan de dıji; hêyy Xwedê o tu nepejırini, islam çı ani serê gelê me. Bav û kalên me wexta ku Tırk derketın lı bervı Anadolûyê hatın, lı şerê Malazgêrtê de, ji bona birûbaweriyên Ola İslami pıştğiriya Tırkên har û hov gırtın, lı hember Bizans, Bizans ra şerkı-rın, Bizans bınxıstın û Tırk lı navçe a Anadolûyê de kırın xudan dewlet. Jı bona çı? Jı bona Ola İslam, ji bona İslam biratiyê. Gor ku dibêjın, lı wi şeri de Tırk tenê çar hezar kes bûne, nêzıka heşt hezar ji Kurd bûne, lê ew çar hezar bûn xudan dewlet, balanı em disa man bındest û nebûn xudan heqê xweê çarenûsi. Lê dûra Tırk İslam bırayên me lı me çı kırın?. İcar lı zıkê zeman de, gav bı gav bervı welatê me hatın, bı sed hezaran xwına gelê me rijandın û welatê me dagirkırın. Heya roja iro tenê ev erdê Dêrsım lı dest me Kurdan de maye, lê ev ji hey a çı wext lı dest meda dumine kes nızane. Bıbe ku sibe-dusibe ev erda ji lı dest meda bıçe. Hindê wer tê xuyakırın. Lewra hevgırtınêk û tevgerek me a Netewi tune. Ax lı mın, ax lı mın. Bav û kalan çı gotine? Gotine ku" Mın ani cihê xwe, berda rûh û canê xwe". Bı rasti ji usa bûye. Ev gotın lı şınê de hatiye gotın. Lê mala wan bav û kalıkên xıra be, peyvın her qenc gotine, lê nebûne xudanê ew gotınên xwe.

Lı mêjo ê Aliekber de ev tıştana dıhatın û dıçın. Ali-ekber çavên xwe zûre çıyan û deştan kırıbû, kûr-kûr dı-hênjiya. Wext ji geleki derbaz bûbû. Tava rojê tin dıda, -êdi wexta xwarına fıravinê bû. Dewar û pez ji zıkên xwe têr kırıbûn, lı binê siya dar û kevıren de mexel bûbûn, dıkayıyan. Wext ji hatıbû xwe gıhandıbû dema nivrojê. Ango êdi wexta xwarınê bû. Xıdê mezın ji hum lı dêwêr û pêz dınhêriya, hum ji lı Aliekber mêzedıkır. Lewra Aliek-ber lı ser kevıreki de rûnıştıbû kûrkûr dıhıziriya. Ew rewş ji bala Xıdê dıkışand. Jı bona ew, Xıdê deng lı bûrayê xwe kır û ji bûrayê xwera:

- Aliekber kuro lı te xêre, ew çıye tu ewqas dihênji û deng lı te dernakevi? İro tu lı bin ev tava germ de fetısiyay; te guhdare me nekır û tu lı tev me hati ber naxıra pêz û dêwêr. Herwaha, naha wext nivroje, ez dibêm êdi em pêz-dêwêr lı vır rakın, bajon bıbın ber newala binê gazê avdın, dûra bıbın binê siya darên nêzıka gund de bıdın mexelkırın. Hindê ew dera bêhriya gunde. Lı wê hemû keç, bûk û jinên gund tên, pez û dewarên xwe didoşın. Tu ji lı wê keç bêhrivanan bınhêre. Bawerke gelek keçikên bedew û delal hene. Te ku kijan keçık ecıband, jı mınra bıbêje, dûra em bıçın bı fermana Xwedê jı tera bıxwazın. Ez bawerım qet bavê keçıkeki nabêje "na". Jı ber ku tu mamosteyi. Herkes dıxwaze, ku keça xwe bıde mamosteki. Ango ev mabest û ramana mıne, gelo tu çı dibêji?.

Aliekber qet bersivek neda Xıdê zava ê xwe. Lı şuna xwe de rabû çu ba Xıdê xarziyê xwe, bı hevra pez û dewar lı wê rakırın, dan pêşiya xwe, ajotın bırin lı binê siya darên bêhriya gund de dan mexelkırın û hersê bı hevra lı binê siya dareki de rûnştın. Pışti çend hûrdeman de, hemû bêhrivanên gund beroşên xwe girtın û bervı bêhriyê va meşıyan. Bı taybeti keç û bûkan xwe xemılandıbûn, kum û gulıkên xwe dabûn serê xwe, şar û valeyên rengin û bı şırık ji, bı qenci mûnandıbûn, dabûn ser kumên xwe, mori û mırcan ji lı simên gulıkên xwe û şırıkên şarên xwe de herbılın kırıbûn, lı pêşiya kumên xwe de disa zêr û ziv dûriyabûn, dabûn pêş eniyên xwe, ew şar û valeyên rengin, şırık û simên bı mori û mırcan, tev dıravên zêr û ziv lı ser eniya wan keç û bûkan de diburuqıyan, bedewiyek bı taybeti dıdan keç û bûkan, mırov dıgot mexwe, meke lı wan keç û bûkên bedew bınhêre. Lı tev wan keç û bûkan Xeca xwişka Xıdê ji xwe bı qenci xemılandıbû, lı tev bûka xwe Melekê û bêhrivanên gund bervı bêhriyê dumeşıyan, hın keç û bûkan kılam dıgotın, dıstırındın, lı nav xwe de henek dıkırın. Melekê ji fırawına Xerdu Xıdan û bırayê

xwe kiribû destê xwe li tev keç, bûk û jinan dumeşiya. Hina ku negihîştibû binê siya daran, deng li birayê xwe Aliekber kir û ji birayê xwera:

- Mamoste te disa zarokatiya xwe ani bira xwe. Tu hati li me bûy mivan, lê te tewart nekir li malda rûni, tu bûy şivanê naxira pêz û dêwêr, gelo iro wexta te çawa derbaz bû? Te heya ev dem çito tewart kir?. Li piştî pîrsa Melekê, Aliekber usa got:

- Xwişka delal wexta min qenc derbaz bû û wê derbaz bibe ji. Ez ji mina we gundime, li ev gund de hatime cihan, ma çi ferqa min û we heye?. Ez bawerim tene ferqa min û we, min xwendiyê ez bûme mamoste, we ji nexwendiyê, hûn nebûne mamoste û karmendeki dewletê. Ango hemû ferq evqase. Ew ji sûçe we nine, sûçê dijminane, sûçe ew dewleta bêbexte, ewa ku gelê me kiriyê ev rewşê. Bili ev em hemû mirovin, neh mehinine; heke ku Xwedê heye, em hemû ji qûlê Xwedê ne. Bejn û bala me, çav û biriyên me, şikl û rengên me, ku li hev neçin, weka hev nebîn ji, disa em hemû bi hebûneki va çêbûne, cewherê me yeke. Ma çi ferq dike ku çermê mirov reş be, zer be, sîpi be, her weki din? Hemû mirov eyni tişt dixwazin. Weka av, hewa, nan, xwarin, stargeh û hwd. Disa ez qet bawer nakim ku Xwedê bibêje" divê hinek li cihanê de birçi, tazi, rût, bê mal û stargeh bin, hinek ji li nav hebûnan de gevzdin, xudan erd û mal, xudan qesr û qonax û zik têr bin". Disa Xwedê negotiye ku kesên xudan hêzên bi fiziki, li kesên bê hêz, li kesên jar û sistan teda bîkin, heqên wana li dest wan bigirin bixwin. Kesên Ehriman dîlpakan bixapinin, serdest hebîn şeran derxinin, mirovan bikujin, bixwazin ev cihanê bîkin bin bandûra xwe" na haşa Xwedê qet tiştêki usa negotiye. Bi kurtasi ez dixwazim bibêjm, em hemû mirovin, qûlê Xwedê ne, cewherê me yeke.

Piştî ev gotinan de hemû bêhrivanên gund, Xecê û Melekê pez û dewarên xwe şarkirin û disa dageriyan gund, malên xwe. Li wê herdu Xîd û Aliekber li bêhriyê tenê

man. Pez û dewar ji mexel bûbûn dîkayîyan. Bî taybetî Xîdê piçûk lî kêleka xalê xwe de rûniştîbû pîrs lî xalê xwe dîpîrsiya, dîxwast ku ew ji mîna mezînan jî xalê xwera bîpeyive. Lî wê navberê de Xîdê mezînan disa qal û behsa seyîdan û ziyaretan kir û jî Aliekber ra usa got:

- Aliekber, kuro tu pîrr hatiye guhartin, ez dibînim te her tîşt lî xwe bîrkîriye, tu dibêji "pîrr tîşt derewîn, bawerîya min lî wan nay". Ango tu çî dibêji, çî deng dîki, ev xarziyê teyê bêt mîraz yekser wan tîştan lî devê te distîne û dîxwaze ku wana bîfroşe min, jî mînra bêbêje û min bîxeyidine. Ango ev ji mîna te bûye bêt îtiqat û bêt bawerî; tenê lî gotînên te bawer dîke, dibêje "xalê min raste" felan-bêvan. Bînhêre bûrayê delal, nahe em bî xwe bî xwene, divê em jî hevra bîaxîfîn û hevûdu serwest bîkîn. Tu qenc dîzani ku em talîbê seyîdanîm. Seyîd Pîr, Rayber û mîrşûdê mene. Xwedê seyîd bî taybetî afirandîne, ew kîrîne xudan kîramet, serdest û xudan aqîl, xudan nîfûs. Bamasûr çawa diwar ajotîye aniye gundê Moxîndiyê, Kurêş Bawa çîto lî fırîna agir de neşewîtiye, ew çawa lî hîrçê sîwar bûye, çawa mar mîna şelaq-kamçî-kîriye destê xwe û pê ew mar, hîrç ajotîye, Seysawûn çîto kefa sawûne û mêwa zebes lî ser çemê Fîratê de kîriye pîrd, Axûcan çawa jehr vexwariye û dûra jî lî bîne neynûken xwe de dakîriye, disa ew kasa jehrê tîjî kîriye, anga aqîlê mîrov qet nagihêje van kîrametan. Îro jî gelek newiyên wan kesên xudan kîramet hene, dîkevîn agran, bî xwaziya devên xwe va agir dîtemîrînîn, mîlên xwe dîkîn nav sîlîlên avên beravan û sîlîlên goşt; qet canê wan naşewite. Ew dîkevîn nav tîrafîa agir, agir dalês dîkîn û dîtemîrînîn zîmanê wan, canê wan qet naşewite. Ez jî tera çî bîbêjîm keko, anga rewş usaye, divê tu bawerîya xwe lî wan kîrametên Pîr, Rayber û mîrşûdan bîni. Aliekber, ez qurban, tu cîwani, Xwedê neke jî bona bêt îtiqatîya te, ew jî tera nîfîran bîkîn, wê bela, mela werîn serê te.

Aliekber Xidê zava ê xwe guhdar dıdır, balam lı dılda kela wi radıbû, dıxwast ku pê xırıka zava ê xwe bigire, - bîbêje" êdi bese, ez qet naxwazım te guhdar bıkm" balam şerm dıdır, nedıxwast werqas dilê zava ê xwe biêşine û wi lı xwe bıde suketin. Lewra wi xurısta zava ê xwe û itiqata wi a jı bona Xwedê, Pir, Rayber û murşûdan baş dızaniya. Jı bona ew ji, Aliekber jı zava ê xwera bı xwaşmêri û bı mlaimi dıaxıfiya, hêrsa xwe lı wi nedıda kıvşê, eşkere nedıdır. Wi dıgot, bav û kalan çı gotine? Gotine" bı peyv û gotinên xwaş va, mirov mar lı qulê de derdixine". Lê ez ku dıxwazım keseki qezenc bıkm, divê ez tışteki bı tolerans û tışteki ji dılınım bıbm, xwe lı sewiya wande bıdım temaşekırın, ku ew lı mın bawer bıkm. Mamoste ê mın, her tum jı mınra ev tısta dıgot û şiret lı mın dıdır.

Xidê axaftına xwe kuta kıdır. Wer dıhat kıfşê ku, êdi wi dilê xwe piçeki hêsa kıribû. Dûra bı rûki ken va dageriya ser Aliekber, jı Aliekber ra:

- De tu bîbêje xort û mamosteyê delal, gelo tu bê guhêrandın, yan na? Ez hêvi dıkm tu jı mınra bîbêji"erê" ha ez qurban?.

Aliekber:

- Zava tu mın bıbaşşine, tu mın bıborine, mın beri ji, jı tera gotıbû, carek dın ji, jı tera bıbêjum; birûbaweriyên mın lı wan tıştan nay, ez bawer nakım. Ev tıştên ku tu dıbêji, bawerke hın kesan lı zıkên xwe de derxistine, ne ku aqılên xwe de. Ango lı xaş û loqleyên xwe de avıtine der, kesên nezan, xeşim, hejar û belengazên mina te ji bawer kırine. Mexeyide, tu jı mınra qal û behsa tıştên bêt zanısti û nebûyi, tıştên Metafizik û İdealizmê diki; ez çito baweriya xwe lı wan tıştên nebûyi binım?.

- Kuro Metafizik û İdamiz çiye? Meta kê fizike, miz kıriye?.

Aliekber kıre teqe-teq û keniya û usa got:

- Zava tu her bıji lo, bı rasti tu zor qeşmeri. Tu dıbini,

tu nıkarıbi ku bıbêji" Metafizik û İdealizm" tu çawa ji mınra bıkevi leca rastiyan?

Xıdê:

- Kuro tu evana bıterıkine, ez çı bıkıım, zımanê mın mina zımanê te nagere. Te pırtûk xwendine, tu bûy mamoste ez çı bıkıım. Naha tu henekên xwe lı mın meke, bersivên pırsên mın bıde, bı rasti ew çine te gotın?

Aliekber:

- Metafizik lı dûri pênc dılpekin-duyu-û hissên mırove, weka dılpekinêk şeşemine. Ango hissek şeşan. Ew tıştên ku aqılê mırovan nagihêje, lı dūrveyiyê aqılane, jı tıştên ne-bûyi û xurefa, wek ew kırametên ku tu dibêji, ew tıştên ku bı çavan nayên ditın, bı destan nayên gırtın, bı xem û xeyalan va hatine afırandın, ewana hemû dıkevın zıkê kategoriya Metafizik û İdealizmê; weki dın ez jı tera çawa salıx-tarif-bıkıım.

Xıdê:

- Na-na bı serê te, bawerke disa aqılê mın negihışt ev tıştên ku tu dibêji û qal û behsa wan dıki.

Aliekber:

- Zava, bınhêre, guhê xwe qenc bıde ser mın û mın qenc guhdar bıke, bû?. Te gelek tışt gotın û peyiviyay, dilê xwe hinik kır. Ango tu verşiyay, lı fırsıka xwe de pırr tışt derxıstın, naha jı dora mine, dıvê ez jı tera çend tıştan bıbêjum, balam suketın û xeyidandın tune, ev a bû?

- Helbet.

- Soz?

- Bı navê Xwedê soz, ez lı te naxeyidım. Ma çıra ez lı te bıxeyidım? Ez lı te çıqas bıxeyidım ji, ez ewqas ji te hezdıkım. Ez nızanım ku jı tera çı bıbêjum. Kuro hevırê me usa hatiye pışaftın, tu qısûrên mın menhêre, mın bıborine. Tu dıxwazi tışteki bıbêji, ez dibêm, lı şûna tışteki de hezar tışti bıbêje, tu aza û serbesti. Lê lı derên dın de, derên xerib de, mıqate xwe be, bı balkêşi bıaxıfe, hayjı gotınên xwe be, dost hene, dijımın hene, çı dıbe, çı nabe. Bêbexti lı

nav gelê meda her zêdeye. Gelê me fisan li nav civatê de dîke tîrr, belav dîke. Ez naxwazim bediyek were serê te û tu biêşi. Herwaha, naha dora teye, fermo bîaxîfe.

Aliekbek beri ku destpêka axaftina xwe bike, jî Xîdê ra:

- Zava, bibe ku axaftina me dirêj bibe, çêtire em pêz û dêwêr êdi li vir rakin bîbin aliya gazê, li wê em rûnî bîaxîfîn, pez û dewar jî bîla xwera bîçêrîn, heya ku êvar hat, bû?. Li pey ew gotinên Aliekber de, icar Xîdê:

- Zor başe, got û hemû bî hevra rabûn, pez û dewar rakîrîn û bîrîn gaza hember gund li nav çêrê de belav kirin û disa li gelhev rûniştin, Xîdê piçûk ra ji" tu zû-zû li dora naxîrê ra were, here qenc li naxîrê bînhêre, disa were li gel me rûne" gotin û li cihêki bîlînd de li gel hev rûniştin û Aliekber destpêka axaftina xwe kir û usa got:

- Bînhêre zava ê delal, guhên xwe qenc bîde ser min, ez û tu em ne tenê zava û bîrane, her usa em meriyên hevîn jî. Dîvê em hevûdu neşînin gîramiyê bîdîn hevûdu, hevûdu hezbîkîn, dilên hevûdu neşîkîn. Naha ez jî tera mina bîraki te ê piçûk dîpeyivim. Tu dibêji Bamasûr diwar li Îranê ajotîye anîye li gundê Moxîndiyê de rawestandîye, hukma Romê Kurêş Bawa avîtiye fîrîna agir, Kurêş Bawa neşewîtiye, li hîrçê sîwar bûye, marek jî mina şelaq kîriye destê xwe, bî wî mari hîrç ajotîye, Axûcan jehr vexwarîye, Seysawûn kefa sawûnê û mêwa zebeş kîriye pîrd û gel li serda derbaz bûye, felan-bêvan û hwd, wer nine?. De başe, lê ku ev gotinên te hemû rastîn, bîla naha newiyên wan kesên xudan kîramet, diwaran bajon, bîla bîkevin fîrînên agirîyan neşewîtin-sîwarbûna hîrçan û pêgîrtîna maran tîştêk nine, jehran vexwîn, li bîne neynûkên tîliyên xwe de dakîn, bîla kefa sawûnê û mêwa zebeş bîkîn pîrd û gel li serda derbazbîn, herîn wî alî werîn, em jî li kîrametên wana bînhêrîn û bîbînîn, bawerîya xwe li wan bînin, wer nine lê zava? Ez bawerim ev heqê meye, ku em li wan bîxwazîn, bî çavên xwe va kîrametên wan

bîbinin, dûra bîryar bîdîn, rasti û ne rastiyan. Te jî mînra çî digot? Te digot" çêleyê mar bêt jehr nabe". Lê ku usa-
 ye, ew jî çêleyê wan kesên xudan kîremetîn. Te digot" Xwedê Seyid bî taybetî afirandîne, esl û koka wan dîgihêje
 pêxamberan, ew xudan esl û kokên bîjarîn" ku ew raste, aha meydan. Lî nav gel de têt gotîn. Mîrovek çûye Helebê
 hatiye, jî hevalên xwera" lo-lo bawer bîkîn lî bajarê Helebê kehr lî pêpelûkan de dûmeşîn, dîçîn derdîkevîn ser
 avayiyan". Hevalan jêra gotîne" kuro derewan meke " wi disa rîk kîriye, gotiye" na ez rast dîbêjûm". Îcar heval
 xeyidiyane, jî wîra gotîne" ê başe, Heleb lî vîra nine, balam lî welatê meda jî kehr û avayi hene; de tu keremke
 kehreki bine lî pêpelûkê de bîmeşîne, derxîne ser avayi-
 yeki". Zava gotînen te jî bûne ew mesela Helebê, kehr û pêpelûkê. Ez jî dîbêjûm bî rasti seyid ku xudan kîrametîn,
 bîla kîrameteki derxînin ez jî bîbinûm û lî wan bawer bîkîm. Na zava, pîsmamê delal, mîrov bî çavên koran
 cihanê kîtandîn-tahlîl- nake. Hîn kesan ew derewana der-
 xîstîne, hîn kar û berên bî canbazi lî gel dane temaşekîrîn, kesên nezan jî bawer kîrîne. Gel û civatên bêt zanyari û
 bêt perwerde zû têne xapandîn û baweriyên xwe lî derew û canbaziyan werge tinîn. Ez qet bawer nakîm, ku gel û
 civatên şareza û şarwerî lî tiştên werge xurafa û can-
 baziyan werge bawer bîkîn. Na ew ne keyse. Mesela gelên Ewrûpi. Ez bawerîm-gor ku hîn kes dîbêjûn- gelên Ewrûpi
 qet lî derewên usa bawer nakîn. Ev tiştên ku tu jî mînra dîbêjî, lê ku tu jî wanra bîbêjî, ew lî te bîkenîn û jî tera
 bîbêjûn, -tu mîn bîborîne- ev mîrîka bodleye. Berî ku ez bîçîm dîbîstanê, ez jî mîna we hemûyan bûm. Mesela
 wexta ku hîv têtê girtîn, gelê me dîbêje" ezbenî ejdiyarek, yan jî hûtek heft serî derketiye pêşiya hîva Zerî, dîxwaze
 ku hîvê bîxwe û daqulîne". Jî bona ev jî herkes tenikeki dîke dest xwe û lî tenikê dîxîne dîke teqe-teq; hîn kes jî
 lûleyên tîfîngên xwe bervî jor hîvê dîkîn, gulân berdîdîn esman, ku ew ejdiyar, an jî hût bîtirse û bîreve, hîvê

nexwe. Wexta ku çend salan de carê roj tête girtin disa gel usa dîke û baweriyên xwe her usa dîdomine. Lê bî rasti ev baweriyana û ev tevgerên usa ne bî zanîstine. Sedemên hiv girtin û roj girtinê bî zanîstîye, ango bî îlmiye. Çend salan de carê ev cihana me dîkeve pêşîya ronahiya hiv û rojê, hinek cihê cihan lî nav tariyê de dîmine, evqas. Jî ber ku ev cihan dîçerixe, dîzîvire, qet nasekîne. Lê şêx, seyid û meleyên me dibêjin" ev cihan lî ser qoçê Ga ê Bor de dîsekîne. Wexta ku "Ga ê Bor" xwe lî şûna xwe de dîlvîne, dîleqîne, an jî simek" Ga ê Bor " dîlve, icar ev cihan dîhêje û erdhêjin dibe, çîya û kaş hîldîşin, felanbêvan. Naha ez lî te disa pîrskîm zava, qet tîştên usa dîbîn? Îro êdî mirov ev cihan kîşf kîriye, ev cihan çîye, çî nine. Ewrûpi'yan nûvedanên wer derxîstîne ku, aqlê mirov dîsekîne. Ez bawerim iro canbazekî Ewrûpi ku were nav gelê me, lî gelê me leyiztokek xwe a canbazi bîde temaşekîrîn, gelê me jî wê leyiztoka a canbazi û wî kesira jî bibêje" ev kesa xudan kîramete " wê wî canbazi jî bîkîn Xwedê. Tu jî lî tev gel usa bibêji. Disa Ewrûpiyan çek û silayên wer derxîstîne ku, dîrveyiyê aqilane. Lî dîbîstanê de jî mera usa dîgotîm. Hîm mamosteyên me ew nûvedanên nû bî çavên xwe va dîtîne. Wana jî mera dîgotîm" iro lî welatên Ewrûpi de qûlên Xwedê, ew kesên mina mîn û te, cûre-cûre makîne, trêna, balefîr û keştîyên herî mezîn çêkîrîne, mirov lî wan sîwar dîbe, lî hewa de mina teyran dîfîrîke, lî ser deryan de keştî avjên dîkîm, lî Okyanûsan derbaz dîbîn dîçîn şeş kîşwerên cihan. Trêna lî nav welatan de mina marên reş lî ser erdê de xîj dîbîn, dîçîn, mirovan û pertalan dîbîn welatan û tînnî. Ez bawerim te trêna dîtiye. Lewra iro trêna heya Xarpiîtê tê, lî wê heya bajarê Mûşê û Erzurumê jî bîçe. Lî zemanekî kurt te jî, xetên trêna wê bîkeve hemû bajarên Kurdistanê. Ango mirov ew tîştana jî bona hêşabûna çûyîn û hatînên mirov, hêşabûna kar û berên mirov, hêşabûna boranê-ulaşim-û hemû hacetên leşkerî û hwd nûvedan kîrîne. Sarwerî her pêşve



çûye, divê mirov evana zanibe, bî tıştên derew û nezanîsti bawer neke. Tu mîn qenc nasdîki. Ez lî zaroktiya xwe de, heya roja iro, jî tıştên diroki û çirokan pîrr hezdîkîm. Lî gor birûbaweriyên mîn, pîraniya naveroka çirokan ne derewîn, gelek tıştên rast û balkêş lî çirokan de hene. Helbet pîrr çirokên ku bî derewan hatîne afirandîn, ew jî hene. Minak, wek çirokên kîrametan û felan. Lî hindirê jiyana diroka mirovatîyê de, hejar û belengazên ev cihanê, her tûm derd û kulên xwe kîrîne çirok. Lî dewrên bîhuri de mirov kevneyar bûye, heq û zagon tunebûne, demoqrasi qet tunebûye, mirov nezanîbûye ku, wekhevîti û pîrensîbên wekhevîtiyê çîye, pîrensîbên mirovatîyê çîye. Lê roj hatiye mirovati gav bî gav pêşva çûye, mirov destpêka axaftîne kîriye, her tewîr zîman derketîne holê, mirov destpêka çêkîrîna hacetan kîriye, jiyana komeletî hatiye guhartîn, dubendiyên çîneyî derketîye meydanê. Ango dewra hejartîyê û dewlemendiyê destpêkîriye. Mirov lî dewra kevneyariyê de derketîye, ketîye dewra nokeriyê, angî koletîyê. Êdî kedxwari bî şîkleki barbarî va derketîye holê, ketîye jiyana mirovatîyê. Axa, mir, qîral û padişah derketîne, wan serdestan jî hejar û belengazan ra Xwedê afirandîne, jî hemû zîlm, zor û barbariyên xwera gotîne" evana hemû kar û berên Xwedê ne ". Bî wî şîklîva hukumdariyên xweyên kedxwari domandîne, bî navê Xwedê va jî, hejar û belengaz xemrevî-tesellî-kîrîne. Angî felsefa ev çiroka mirovatîyê her dirêje, balam mîn jî tera vebîri a-özet-ew çirokê got. Bî kurtasi zîlmkaran zîlm û neheqiyên mezîn anîne serê hejar û belengazan, wana jî ew zîlm û zorana jî xwera kîrîne çirok. Padişah, axa û mir kîrîne hûtên heft serî, xwe û civat jî kîrîne leheng û mêrxwasên çirokan. Jî ber ku, yekser lî dijî neheqîyan û sîtemkariyan derneketîne, bî tîrsa zalîman, kîret û barbariyên wan va dengên xwe bî hîmbîzî-gür-denexistîne, hemû derd û kulên xwe werge anîne zîman. Dûra heyam derbaz bûye, jiyana mirovati pêşva çûye, mirov roj bî roj

hatiye guhartin, kar û berên edneyari-teknik-derketine û jiyana her pêşva çûye. Mirovên zana û filozofên gewre derketine, teori û ramanên qenc afirandine û kîrîna jiyana mirovatîyê û mirov ji ew pejîrandine û roj hatiye gihîştîye ev heyama me.

Xîdê naxîrvan lî bûrayê xwe guhdar dîkir û ecêb dîma. Xwe bî xwera" mirovê xwenda başqeye, ne weka mîne. Ez tenê naxîrvanîyê û kar û berên gundan dîzanîm. Ez lî Aliekber guhdar dîkîm, gotînen wî û seyîdan qet hev nagîrî. Gelo nîzam kîjan raste?" got û dagerîya ser Aliekber, jî Aliekber ra:

- Aliekber, mîn lî jiyana xwe de qet keştî û derya nedîtîne. Ew çîtone nîzanîm. Lî alîya dîn de, ez hîn gotîn û peyvên te fêmkîm, têngîhêjîm. Tu jî mînra şarwerî, şareze û gelek tîştên dîn dibêjî, balam ez wan peyvînan fêmkîm, kuro evana hemû te lî ku hukîrîn? Bî kerema xwe jî mînra mana wana bibêje.

Aliekber:

- Ez jî tera çawa bibêjî zava? Şareza û peyva şarwerî evana peyvîkên zîmanê Kurdîne. Bî Tîrkî" Medenîyet û uygarlîk"dibêjî. Wekî dîn ez jî tera çî bibêjî û çî salîx bîkîm, an jî çawa naveroka wan peyvîkan vekîm û lî te bîdîm fêmkîrîn? Mîn bî xwe jî keştî û derya nedîtîne, balam mîn lî pîrtûkan de, bî taybetî lî pîrtûka Erdnîgarîya Tîrkîyê de xwendîye û derya jî lî nexşan de dîtîye. Wekî dîn ez jî mîna te neçûme bajarên Rojava, ku keştî û deryan bîbînim.

Xîdê:

- Ê başe, ez pîrsên xwe pîrr dirêj nekîm, wekî dîn tu dîxwazî jî mînra çî bibêjî? Tu ku dîxwazî ez jî mîna te dîjî hîn tîştan derkevîm, na, bî valayî zîmanê xwe derbaz meke, gewrîya xwe jî meêşîne, te got erê?

Aliekber:

- Na-na zava, bawerke mabestek mîna werge tune, em jî hevra dîaxîfîm, ez jî tera nabêjîm ku, tu jî bîbe mîna mîn.

Ha mın qal û behsa çirokan dıkır. Mın beri ji jı tera gotıbû, ez çirokan û tıştên diroki zef hezdıkım. Beri wexta ku mivanek dıhat mala me, an ji dıhat mala çinareki, mın dixwast ku ez her tun biçım lıgel wi mivani de rûnum, wi guhdar bıkıım, gelo ew mivana çı dibêje, çı dixıfe, cıvata dorbera mivan çı dibêjın, çı qısedıkın. Ev xurısta mın bû, mın perwa-merağ-dıkır, iro ji ez disa mina berême. Lı wan deman de, pırr caran mezinan ez nedıhiştım, ku ez lı wan û mivan nêzık rûnum. Ez lı wan dûr, ciheki paş dêri de rûdınıştım, mın bı balkêşi ew mezinên xwe guhdar dıkırın. Bı rasti hın kesan çirokên xwaşik dıgotın, mın ji ew çirokana hemû jıber dıkırın. Rojeki mivanek hatıbû mala me, lê bı rasti mıroveki heri zana bû. Wi dıgot" edneyari pêşva çûye, cihan her nûjen bûye, divê gelê me ji, ew tıştên nûjen bıbine, jı xwera karbine, baweriyên xwe lı nûvedanên nû bine, lı derewên Olperestan neyne, êdi lı ev xewa kûr de hişyarbe rabe serxwe, lı binê zılm û zora dijminan de felat bıbe, welatê xwe Rızgar bıke, zincirên bındestiyê û nokertiyê bıškine, ev bındestiya êdi bese". Mın lı wan salan de, ew gotinên wi mivanê hêja fêm nedıkır, gelo mivan dixwast çı bıbêje, ez qet tenedıgıhiştım. Lê navda zaman derbaz bû û roj hat ez têgiştım hemû gotinên wi mivanê hêja, welatperwer û Kurdperwerê Kurdistan. Wi çı gotiye û qesta wi çı bûye.

Xıdê mezin û Aliekber ew tıştana lı nav xwe de dıpeyivıyan, ketıbûn nav gengeşiyên kûr. Xıdê piçûk ji xalê xwe û bavê xwe guhdar dıkır û carna ji radıbû lı dorbera pêz-dêwêr de diçû dıhat, disa lı cem bavê xwe û xalê xwe de rûdınışt, ew gudar dıkırın. Wi ji dixwast çend tıştan lı xalê xwe bıpırse, balam lı bavê xwe ditırsiya. Dûra diyax nekır, ew ji kete nav gotinên bavê xwe û xalê xwe. Yekser jı xalê xwera:

- Xalo tu dibêji gelê Kurd bındeste, gelo em lı bin destê kêdane? Dijminê me Kurdan kine? Bı rasti ez evana qet nızanım û aqılê mın nagihêje ev gotinên we. Pışti pırsa

Xidê piçûk de, Xidê bav vegeriya ser kurê xwe, jî kurê xwera:

- Kurê mîn tu hina zaroki, bihna şir lî devê te tê, çêtire tu nekevi nav axaftina mezinan. Sebîr bîke rojeki tu jî evana hemûyan fêrbi, naha mekeve nav gotinên me.

Xidê piçûk jî gotinên bavê xwe xeyidiya û rîk kîr û got:

- Apo ez jî dixwazim fêrbim, keremke bîla xalê mîn ber-siva mîn bîde, ma çira tu dibî asteng?.

Xidê bav bêtir hêrs ket û jî kurê xwera:

- Kuro hişbe kehr bav. Ela lî vi pincê heram binhêrîn, jî bavê xwera çito dipeyive. Ez bawerim lî pêşerojan de, tu jî bibi mîna xalê xwe û Pir, Rayber û murşûd'an betal biki, diji Xwedê jî derkevi, bibêji "Xwedê jî tune". Rewşa te usa tête xuyakirin..

Xidê piçûk dit ku bavê wi geleki hêrs ketiye, nîkarîbe jî Aliekber ra tişteki bibêje, îê hêrsa xwe lî ser wi de derdixine. Lewra jî gotinên Aliekber geleki jî eciz bûye. Jî bona ew lî şûna xwe de rabû serxwe, bî dengêki nîzm û mîlayim va, jî bavê xwera usa got:

- Apo ne pêwîste ku tu hêrskevi, qet meqehere, bihna xwe teng meke. Mîn jî wera tişteki negot, ma tu çira dixeyidi û her tum usa diki? Tu bavê mîni, ev jî xalê mîne. Naza mîn lî we buhriya lewma mîn jî wera werge got û pîrsiya. Mîn xwast ku, ez lî we çend tiştan fêrbîbim. Lê bî rasti mîn ku bizaniyana tu evqas jî mînra hêrs dîkevi, bawerke mîn qet dengê xwe dernedixist û tu evqas nedî-qehîrandi. Herwaha Apo tu mîn bîborine, ez lêborandinê lî te dixwazim; carek dîn ez usa nakim û dilê te naêşînim..

Aliekber bî dileki şa û bî rûyeki ken va pê milê xarziyê xwe girt û ew lişgel xwe de da rûniştandin; dûra vegeriya ser zava ê xwe, jî zava ê xwera:

- Zava te lawîk geleki berxwe xist, dilê liwîk êşand, bawerke ev nabe. Divê tu pisikolojiya zarokan û mezinan zanîbi. Pisikolojiya mezinan û zarokan mîna hev nîne. Tu

ku usa nehêlini zarok bîaxîfîn, îcar jî bona pêşerojên wan qenc nabe. Ew her tum lî nav civatê de bêdeng dîminin û his nîzm dîbin. Destûrê bîde kurê xwe bîla ew jî bîaxîfe, bînhêre, guhdar bîke ew çî dîbêje û çî dîxwaze, mabest û ramana wî çîye. Bawerke carna zarokên hûr, mina kesên zef bîaqîl dîpeyivîn, mîrov ecêb dîmine, bawer nake, got.

Xîdê bav:

- De başe lo, fêmdariye, dîrêj meke. Tu dîzani xurîştîta wî lî a te çûye, lewma tu pîştîgîriya wî dîgîri. Vêca ez vî dîborînim û efû dîkum, tîştêki dîn jî wîra nabêjûm. Lê ez hêvî dîkum ew carek dîn, mina îro jî mînra û kesekî dînra usa neaxîfe, tîştên ku lî bejna wî dîrêjtîrîn, lî wan dîr bîsekîne, bîla tenê mezînan guhdarke. Wê roj bê dora axaftînê were wî jî, te got erê?.

Lî pîştî hêrsketîna Xîdê bav, şewq û kêfa Aliekber jî revîya. Îcar ew jî lî şûna xwe de rabû, jî zava ê xwera:

- Zava çêtîre em evan tîştan bîterîkînin, dûra me ku wext dît carek dîn em bîpeyivîn. Lewra êvar ev e disa hat. Em gotînen xweyên mayî jî bîhêlînin jî bona îşev, ku lî malda bîaxîfîn çêtîr dibe. Naha em rabîn lî dorbera pêz û dêwêr de belav bîn, wext pîrr hîndîk maye. Bînhêre roj pîştî çend hûrdeman de wê bîçe ava. Navbera roj û çîya de mesasek maye. De haydê, adey ya Xîzîr. Bîbine zava ez weka te dîpeyivîn.

Melek û Xeca xwîşka Xîdê kar û berên malê û hemû suxureyên pêş derî, axur û hefşan qedandîbûn û herdu dagerîyabûn lî ber pîxêrîga agir de rûnîştîbûn, lî benda dagerandîna naxîra pêz û dêwêr, herdu Xîdan û Aliekber de mabûn. Çavên Melekê jî disa dîêşîyan û roj bî roj bervî bedbûnê de dîçûn. Lî wê rojê de Melekê kar û berên malê disa lî nav wê êş û janê de kuta kîrîbû. Hejara belengaz nedîkarîbû ku lî şûna xwe de rûne. Dîkîr ahx û ahx, of û

of, dıgiriya û dınaliya. Xec ji lı hember ew rewşa bûka xwe, berxwe dıket, dıxwast ku ew bıbe hevparê êşa çavên bûka xwe. Pışti gelek giri û nalandinan de, Melekê bı kefa destê xwe va, çavên xwe mısda û jı zeyiya xwe Xecê ra usa got:

- Xecê bawerke iro çavên mın lı duhu û pêr zêtır diêşın, ez wer zan dıkım ku naha ronahiya çavên mın têne der. Binhêre diya mın, ev e jı mınra carek dın şev hat, ez nızanım çı xaliyê lı serê xwe kım. Roj hındık maye ku bıçe ava. Naha naxıra pêz-dêwêr, tev bıra û bıraziyê te, wê lı ku bı, ew bên. İro du rojin ew bırayê mın Aliekber ji lı tev zava û xarziyê xwe dıçe ber naxırê, nızam ew çawa wexta xwe derbaz dıke. Tu bı kerema xwe rabe, wê dizikê bıde ser ağır, işev em jı Aliekber ra xaşilê bipêjın, lewra ew xaşilê zef hezdıke. Dûra carek dın lı der beran binhêre, paqj ke, hata ku ew hatın. İro rewşek zor behite-tuhaf-ke-tiye ser bedena mın, bawerke hêz lı jonyên mın de şıkiyane, ez naxwazım ku lı şûna xwe de rabım. Ez dızanım tu ji qet vala nesekıniyay, balam tu weka mın nexwaş nini. Sıbê de heta niha kılandına dew, nan patın û paqjkırına axur, kışandına zılb û rıxan, ez geleki westandım. Hındê tu ji westiyay, balam tu mın bıborine. Lı vê gavê de ez dıxwazım bıkevım nav nivına xwe, paldım û bıkevım xewa kûr, ku ez ev êşa çavan jı xwe birkım; weki dın ez qet tışteki naxwazım.

Lı wê demê de Hesenê piçûk disa lı hêlaneka xwe de kıre qirin û gazin, te dıgot weki derzi lı canê wi de dıçe, lı ber jana derziyê ewqas dıke qirin û gazin. Jı bona qirin û gazina Hesenê piçûk, Melek bı hêrs lı şûna xwe de rabû, jı Xeca zeyiya xwera:

- Te dit diya mın, binhêre bextê mın çıtıoye, derd tê ser derdan. Mın hêvi dıkır ku ez tışteki hêsa bı, icar ev bêt murazê bıraziyê te hişyar bû; vê carê ji ew mecal nede mın, ku ez piçeki vêsa xwe bıgırım. Ahx ev bextê mın. Lê nızam ez jı bona ev bextê xwe jı Xwedê ra çı bıbêjım.

Xwedê mala Xwedê bişewitine, li aliki ev çavêşiya daye mîn, li aliya dîn de ji, ev neçari, hejari û xızaniya malê. Wi malşewiti rojeki zîkê me têr nekîr. Em rojeki ti, rojeki birçine. Ji yana me li nav tunebûnê de derbaz dibe û diçe. Wi qet rojek qenc neda me; rojek bê tî xem û xeyal jî mera nekîr nesib. Lê nîzam ev rewşa me û axîriya me çawa bibe û heya çî wext usa bimeşe?.

Melek çû li ber hêlaneka kurê xwe de sekîni, bî dengekî bilînd va qiriya ser Hesenê piçûk û usa jî kurê xwera got:

- Kuro malşewitiyo tu li mîn çî dixwazi? Av li agirê bavê bûyo, mal xirab, mîn niv seat beri tu mêjandî, binê te paqij kir, tu li zîkê niv seateki de disa hişyar bûy. Li berên mîn de çiqas şîr hebû, te ew jî mit, dilopek şîr li berên mîn de nehişt, berên mîn zîwa kirin, berên mîn bûn mina pîzdana heywanan; ez jî nîzanim ku, çî qotîkê û xenimê bîdime te, zîkê te têrkim, ev deng û sewta te bîbirinim. Hîn kes dibêjin jî zarokan ra şîrê mangan û bîzînan qence, lê balam ez qet bawer nakim û ez naxwazim şîrê heywanan jî bîdime te. Lewra risîpiyên me û hîn Pir-rayberên me dibêjin" ew zarokên ku şîrê heywanan vedixwin, li hindirê zeman de dibîn mina heywanan û bê tî hiş û bê tî aqil dibîn, aqilê wan dibe mina aqilê heywanan". Jî bona ev jî ez naxwazim şîrê bîzînê an jî çêlekê bîdime te. Jî ber ku tu kurê minî, mîn tu neh meh li zîkê xwe de xwedî kirî, mîn tu gerandî û li nav hezar zorên de ani cihan; ev nêzîka du sal bû ku ez zamet û cefaên te dixşînim, te dimêjinim, te dihêjinim, te digerinim û haş dikim, ez naxwazim bî şîrê heywanan va aqilê te kê mî bikim..

Jî bona ew nezani û xêşimiya dayikên Kurdistan, mamosteyê Aliekber, jî Aliekber ra usa digot:

- Belê kurê mîn, gelê Kurd ne tenê li nav xızaniya aboridaye, her usa jî ew li nav nezaniyek herî mezîndaye. Jî

ber ku dijmanan nehiştine ku gelê Kurd ji çavên xwe veke, tîşteki pêşva biçê, li xwe bihese û li doza xwe û welatê xwe xwedi derkeve, welatê xwe û ramanên xwe nûjen bike, bibe mina hemû gelên pêşveçûyi û şareza. Tirk, Ereb û Faris'an bi barbari welatê me Kurdan dagirkirine û kirine mêtingehên xwe. Wana qet ji gelê Kurd ra çu rastiyeke negotine, hemû tîştên bi zanisti ji gelê Kurd veşartine. Gelek axa, mir, şêx û seyidên gelê Kurd ji neyaran ra bûne heval û hevpar, li tev dijmanan xebitiane, welat vala û talan kirine, hebûna Kurdistan şêlandine. Wa kesan her tum maf û berjewendiyên xwe li jori her tîşt hesibandine, qet li gelê xwe û welatê xwe xwedi derneketine. Kesên welatparêz û Niştumanperwer ji, wana qet navçeeke qenc neditine, ku ji gelê xwera tîşteki bikin û tîşteki bibêjin. Pîraniya wan welatparêzan Kurdistan, li ser gili û êxbarkirina caş û bêbextan va hatine kuştin û hatine dardakirin. Ew bêbextiya bi taybeti li destpêka Ola Îslami virde destpêkiriye, heya roja iro ji, ew rewş xwe diparêzine. Ji bona ew bêbextiya dijmanan, bêbextiya dozfiroşên gelê Kurd, ev nezaniya ketiye nav gelê Kurd. Dayikên gelê Kurd nezan mane, tîştên nebûyi bawer dikin. Her çiqas ku iro li Kurdistanê de rewş mina sed salan bihuri nine ji, disa gelê Kurd nezane, bêt perwerde û zanyariye, disa li nav gelê Kurd de, birûbaweriyên bêt erêni, ên paşverû, bêt zemani, ên heri derew û bêt bingehin her zêdene, disa axa, mir, şêx û seyidên kedxwar ji bona berjewendiyên xwe ji gelra derewan dikin, dijmanan ji gelê xwera temaşe nakin; ew dixwazin ku hissên netewi bîdîm temirandin, li şûna hissên netewi de, hissên Îslami her tum rakin jor û li nav gel de bi qenci lûl bikin. Ew ji Kurdan ra dibêjin" bibên em beri her tîşt Îslamî, averûya -kavram-netewi bikin dereca duwemin" ew bêbextana qet naxwazin ku kesek ji gelê Kurd ra rastiyan bibêje, şaşitiyên Ola Îslam û Olên din bibêje, rexne ê Ola Îslami û Olan bike. Ez bawerim iro gelê Kurd sedi nod nîzane ku

Ola İslam lı gelan çawa dane pejırandın, Ola İslam û rêbaza Ola İslam Quran çıye û gelo çı lı rûpelên Quranê de hatine nıvisin, gelo jı bona pejırandına Ola İslami çıqas zılm û zor lı gelê Kurd hatiye kırın û çıqas xwına Kurd hatiye rıjandın, ku gelê Kurd bıbe İslam.

İro lı welatê meda perwerde, ango zanyari geleki kême û lı sewiyek heri nızmdaye. Hutbûna pırtûk xwendınan her kême. Gelê me hayjı kılasikên Ewrûpi û cihana nûjen nıne. Cihanê û dirokzanên cihanê, kes gerokên ku hatine Kurdistanê geriyane, lı ser Kurdistanê karpêk-eser- nıvisandıne, wan kesan werqas nasnake; karpêk, afirandın û serpêhatiyên wan naxwine. Tenê Tırk, Erebe û Farıs'an çı nıvisandıne wana dıxwine û birûbaweriyên xwe lı nıviskarên dijminan tıne. Pıraniya gelê Kurd qet lı xwe nepırsiyaye û negotiye" gelo bı rasti Tırk, Erebe û Farıs, rast dınvısinın, yan na". Disa gelê me qet neaniye aqılê xwe ku gelo dijmin jı dijminên xwera, zordest jı berdest û bındestên xwera, qet rastiyan dibêjin û dınvısinın?". Na, gelê Kurd qet ev tısta neaniye bira xwe û lı xwe nepırsiyaye. Hın welatparêzên Kurd dıxwazın ku wan derewên dijminan pûç bıkın, balam hum navçeak demoqratik nabinın, hum jı gelek kes hatine xapandın, lı wana bawer nakın. Lewra dijmin xwe leheng dıdın temaşekırın, gelê me jı dıxwaze ku ew jı bıbe hevparê wan lehengiyên dijminan û wan derewan.

Aliyekber tu zan meke ku ez lı diji Ola İslam û Ol'ên dın derdikevım, an jı derewan dıkım û dubendiyan dıkım serê gel. Na, mabestek mına usa tune, balam lê divê em beri her tıst lı hemû aliyan de dırist û dılsoz bıın, jı gelê xwera rastiyan bıbêjin, riyên rast temaşe gelê xwe bıkın. Ku, jı bona rasti gotınan de mırın û kuştın jı hebe, lê divê disa em rastiyan bıbêjin, rastiyan bınvısinın û rê û dırbên rast lı gelê xwe û mirovatiyê bıdın temaşekırın. Hindê bı rasti gelê me geleki mazlûm û bındeste, ew rewş jı gelê mera guneye.

Çawa ku herkes ji dizane, li qurna heftan de Ola İslam derket holê û hate eşkerekirin. Gelê Ereb nijadek Qûm-istanan bû. Karên wan tenê kuştin, zılm, zor, talankirin û şêlandin bû. Bı zora şûr barbari dıkırin, şerûd û şerhez bûn. Bı talan û şêlandinan va zikên xwe têr dıkırin. Kar û xebat nedızanıbûn, rêçberî, xwedikırına pez û dewar pırr nedızanıbûn û her teral bûn, qırêj û gemarin bûn. Lewra av her kêm bûn. Mihamed û hevalên xwe li nav rewşek werge de ew gelên şerûd û birçi rêzkırin, bı wan şerûd û barbaran va êriş dan ser gelan, bı zora şûr, kuştin û xwinê va Ola İslam li gelan dan pejırandın. Bı taybeti pıştı mırına Mihamed, dewra Xelife Omer de, zılm û sitemkariyek barbari û bêt mırovi li ser gelê Kurd de bıkar anin. Barbar arteşên Ola İslam, ewên şerûd, har û hov êriş dan ser Kurdistanê, bı sed hezaran Kurd kuştin, welatê gelê Kurd talan kırin, şewıtandın û şêlandın, qet tışteki nehiştın, Kurdistan tar û mahr kırin. Barbaran şûr dıdan ser singê jin, mêr, xort, kal û pıran, dıgotın" bıbêje Eşhedu Enna, la ileha illellah, we eşhedu enna, Mihamed resûl Allah". Lê wan dayik, bav û xwişkên meyên reben, hejar û belengazan nedıkarıbûn ku mina wan leşkerên Ereb, ewên har û hov, eşeda xwe binın, ew çı dibêjin mina wan li wan vegerinin, bilêv-telafuz-bıkın, icar wan bêbextan şûr dıdan ser gewri û xırıka wan, zımanên wan derdixıstın der, bı meqesan zımanên wan rebenan jêdıkırin, dûra ji serê wan qutdıkırin, li bedena wan dûrdixıstın, dıkırin du perçe. Li pıştı sala 612 P. Z nê, heya sala 638- 39'an de, bı wi tehri û bı wan barbariyan va, gelê Kurd û gelek gelên dın bûn İslam. Ango bı zora şûr, kuştin, zılm û zordariyên wan barbaran de, Ola İslam bû Ola gelê Kurd. İro ji gelê Kurd sedi nod neh İslame û şertên İslamiyê ji, jı hemû gelên dın zêdetır tine şünê, bı tundi li Ola İslam va hatiye qemıtandın û girêdayın. Lê hezar mıxabın ku, li qurna heftan de bıgire heya roja iroin, gelê Kurd bı destên İslam bıran va hatiye kuştın û tête kuştın, bı sed hezaran

cangori daye. Wan dewletên Îslam bîran, ne tenê Kurd bî fiziki kuştine, her usa wana ser erd û bîn erdê gelê Kurd ji talan kirine, Kurdistan lî nav xwe de parvekirine, kirine çar perçe û mêtingehên xwe, heqê jiyana mirovi ji, lî gelê Kurd standine. Çar dewletên Îslam, Tîrkiye, Îran, Iraq û Sûriye bûne hevparê Kurdistan. Bî taybeti lî destpêka damezrandina Komara Mistefa Kemal virde hukma Romê navê gelê Kurd û Kurdistan ji betal kir. Îro dibêje" nî-jadek nav Kurd, welateki nav Kurdistan qet lî cihanê de tune, Kurd Tîrkên çîyanin, zumanê Kurdan ji, zumaneki tevliheve; ew zuman ji pekvedayiya-karîşim- zumanê Tîrk, Ereb û Farîs'e; wana ew ji lî ser çîyan jî xwera çêkirine". Ki ku jî xwera bîbêje ez Kurdîm, divê ew kesa bî salan ceza bistine û bikeve girtixanan û zindanan. Ev lî Mak-zagona-Anayasa-hukma Romê de bûye deqek bî taybeti.

Mamosteyê Aliekber evana jî Aliekber ra yek û yek dîgotin û Aliekber serwext dîkir. Dîgot" Aliekber, rewş geleki dijware, em nîkarîbîn ku van tîştan jî gelê xwera bîbêjin, lewra navçe tune. Hûn cîwanin, wê pêşerojên we qenc bîbîn, roj were welatê me ji Rîzgar bibe, gelê me ji bîgihêje azadiya xwe, şareza û nûjen bibe; wê demoqrasi bikeve nav gelê me jî. Azabûna ramanan wê destpêbîke, - qet kesek jî bona mabest û ramanên xwe neye kuştin û nekeve girtixanan û zindanan. Lî wan rojên han de, divê tu û kesên mina te jî gelê mera ev tîştan bîbêjin û gel agadar û serwext bîkîn. Bîbine kurê mîn, lî qurna bistan de gelê me lî nav çî rewşêdaye. Bî taybeti dayikên me lî nav nezaniyek herî mezin dane. Dayikên Neteweki çîqas bîaqîl û serwext bîn, ew Netewa jî ewqas bîaqîl, serwext, şareza û pêşvaçûyiye. Dayikên Neteweki ku çîqas nezan û xêşim bîn, neferên ew Netew jî ewqas xêşim, nezan û paşva mayine. Bînhêre lî ev qurna bistan de, dayikên me nîzanin ku çî bîkîm; şîrên heywanan naxwazîn bîdîn zarokên xwe, zarokên xwe bî birçîyan dîkujîn. Lî gor baweriyên wan, heke ku zarok şîrê heywanan vebîxwîn, wê aqîlê

zarokan ji bibe mina aqilên heywanan. Hindê hın Şêx,
Seyid û kesên mafperest û nezan usa şiret lı gel dıkın û gel
dixapının. Xwedê axırıya me Kurdan xêr bike.

Melek lı ser lıngan, lı ber hêlaneka kurê xwe de xwe
piçeki xûz kırıbû, berê xwe ê aliya rastê ji kırıbû devê
Hesen, Hesen dimêjand, dixwast ku kurê xwe haş bike, ew
qirin û gazina wi bıbirine. Dit ku deriyê malê vebû, mi a
Elif û bızına Kol ketın hındır, lı dû wan de ji herdu Xıd û
Aliekber xwe gihandın pêş şêmûga dêri. Melekê çito ku
bırayê xwe Aliekber dit, bı dılşai û bı rûkeni va, jı bırayê
xwera" ez qurbana ev bırayê xwe ê mamoste bım, bınhêrın
iro ew bûye şıvanê pêz û dêwêr. Kuro de tu jı xwişka
xwera bıbêje, gelo iro roja te çawa derbaz bû? Te lı ber
naxirê de çı kır? Disa te û zavayê xwe şer kır, yan na?.

Aliekber:

- Xwişka delal, bı rasti iro roja mın zef qenc derbaz bû,
mın û mêrê te ji, me qet şer nekır, pevneçû. Tu wi qenc
nasdıki, ew bı dev lı mın dıqehere û dixeyide, balam lı
zikê xwe de ew mın hezdıke. Dûra ew ku lı mın bıqehere
ji, ew lı mın mezıntıre, ez lı qısûrên wi mêze nakım,
naxwazım dilê wi bıêşınım; ez û wi meriyê hevın, zava û
bûrane. Tu rewşa me pırsmeke, lê gelo tu çawayi û ew êşa
çavên te çito bûn? Gelo hina çavên te mina beri diêşın,
yan na?.

Melekê:

- Aliekber ez jı tera çito bıbêjım, bawerke êşa çavan mın
dıkuje, jana çavan carna dadıkeve nav dıl, kezew û gur-
çıkên mın, ez nıkarıbım ku lı şûna xwe de bısekınım, yan
ji bı hêsa i kareki bıkıım. Ev bêt mırazê xarziyê te ji, qet
mecalê nade mın, ku ez ji yan piçeki rûnım hêsa bıbım,
yan ji kar û bereki malê bıkıım. Lê Xwedê jı Xeca zeyiya

mın razi be, ew jı mınra dibe arikar, pıraniya suxureyên malê ew dıke, nahêline ku ez bıwestım. Balam êşa çavan mın dıwestine, eciz dıke, nızam ez çı bıkim bırayê delal.

Melekê hum jı Aliekber ra dıpeyiviya, hum ji Hesenê kurê xwe dimêjand; balam Hesen dıgiriya, nedıxwast ku çıçıkê diya xwe bıke devê xwe bımêje, serê xwe lı vırde, vırde dıbir, dıani, bı zımanê xwe va çıçıkên diya xwe lı devê xwe de tandıda, dıavıt der, dıkır qirin û gazin, te dıgot, naha dıfetise û dımire. Jı bona wê rewşa Hesen, Melek hêrs dıket, jı kurê xwera nıfır dıkırın û " kuro êdi hışbe, Xwedê lı mın gırtıyo, bêt mırız, tu lı mın çı dıxwazi?" dıgot.

Jı bona ewqas qırini û gaziniya Hesen, Aliekber jı xwişka xwe pırsiya:

- Melek, xwişka mına delal, gelo ev lawıka çıra usa ewqas dıgire, dıke qirin û gazın? Ez dınhêrım tu çı dıki ew haş nabe, gelo nebe ku lawık nexwaş be? An ji şır lı berên teda tunın, lewma ew çıçıkên te bı zıman davêje der. Bıbe ku şırê berên te liwık têr nake, weki dın qet tıştık nay aqılê mın, tu çı dıbêji?

Melek:

- Lê ku bırcıye, bıla qotık û xenimê bıxwe bavê mın, ez çı bıkim û çı bıdım vi bêt mırızı? Çıqas ku şır lı berên mın de hebû, wi ew ji hemû mit, qet dılopek şır lı berên mın de nehişt, berên mın wi zıwa kır, weki dın ez çı bıdım vi û zıkê vi bı çı têr bıkim, bı kerema xwe tu jı mınra bıbêje. Tu bûy mamoste, gelo çı pêşneyara te heye?.

Aliekber lı şûna xwe de rabû serxwe, çû ber hêlaneka Hesen, jı xwişka xwera:

- Melek, xwişka mın, xwe meqheherine, rewşa te eyane, tu nexwaşi, lı xwarınê da ji ketiyi; ez dıbinım tu lı nav van rojan de geleki ji jar bûyi. Bıbe ku jı bona ev nexwaşi û sıstiya te, şırê berên te kêm bûne, çêtire tu yan şırê bızinê, yan ji şırê mangê bıdı liwık, zıkê liwık têr bıki. Lı vê rewşê de em nızanın çı bıkim. Qet qeysek, an ji mızın û

pivanek me ji tune ku, em şîrê berên te bîpivîn, an ji zanîbîn çiqas şîr lî berên teda maye. Jî bona ev, ez dibêjum û pêşneyar dikim, tu êdî iro şuva, her roj tiştêk şîrê mangê, yan ji şîrê bîzînê bîdî liwîk, zîkê liwîk têr bîkî. Ez bawerim lawîk birçîye, jî bona ev digire, dîke qirin û hawar. Heqê wi ji heye. Çî bîke belengazê mîn, firşîk valaye. Dûra ew pîzêze, zîman lî wi nagere, rewşa xwe jî tera napeyive, ku jî tera bîbêje "dayê ez birçîme". Naha tu bî kerema xwe rabe bîçe mangê, yan ji bîzînê bîdoşe, piçek şîr bîne bikeline, bîde liwîk, zîkê liwîk têr bîke, bîla lawîk bîkeve xewê, ew ji hêsa bîbe, tu û em ji, bû xwişka mîn? Lewra şîr-şîre çî ferq dîke. Ez bawerim ferqek wer a mezîn lî nav şîrê mîrov û heywanan de ji tune, wer nine diya mîn, de tu bîbêje?

Melek:

- Ma çîto ferqa şîrê mîrov û şîrê heywanan tune bîrayê delal? Şîrê jînan, ango şîrê mîrov şîrine, ne weka şîrê heywanane. Ferqa yekem ev e. A duwem jî, jî bona mîn zor gîringe. Dibêjî "ki ku şîrê heywanan bîde zarokên xwe, wê zarokên wan aqîl sîvîk bîbîn, bîkevînc encama heywanan". Jî bona ev, ew kijan dayîke ku bîxwaze zarokên xwe bî destên xwe va bîke weka heywanan. Tu dikarî bî bersîva ev pîrsa mîn bîdî bîrayê delal?

Aliékber geleki jî xwişka xwera hêrs ket, balam hêrsa xwe û xeyidandîna xwe neda kîfşê, bî zîmaneki nerm û şîrin va, jî Meleka xwişka xwera usa got:

- Melek, xwişka mîna delal, ez naxwazim dilê te zef bîêşînim, divê tu ev zanîbî. Lî mîn qenc guhdar ke. Tu ku bî rasti bîrayê xwe hezdîkî, gîramîyê dîdî mîrîyên xwe, bî kerema xwe jî mînra bêje, gelo ev derewa kê jî tera got? Ev derewa bêt doçîk kê jî tera afîrand? Te ev zanîstîya lî ku derê bîhist? Kijan bîjişk û zanîstkar ev tiştî jî tera got û şîret lî te û kesên mîna te kîr? Keçê êdî bîterîkînim ev nezaniyan, êdî bese ev xêşîmîya me. Ma tu bî çavên xwe va nabîni, em çîto rûnê heywanan, goştên heywanan dîx-

wın? Ma ew dewê ku em vedıxwın, toraq, pênr û çur-
tanên ku dıxwın, lı şır dernakevın? Lê ku ev gotına te rast
bana, dıvê iro hemû mirovên cihan aqıl sıvık, mina heywan-
nan bıjiyana, wer nine xwişka mın? Naha tu bêtır hêrsa
mın rameke, rabe bıçe yan çêlekê, yan ji bızınê şarke,
kasek şır bine bıkeline bıde liwık, zıkê liwık têr bıke, bıla
lawık rakeve. Tu ku ev kari naki, bıla Xeca zeyıya te
rabe, ew vi kari bıke. Ez jı tera dubar bıkım, êdı bese guh
meda ev derewan û kesên derewçın.

Aqılê Melekê tevlihev ketıbû, nedızanıbû ku çı bersivê
bıde bırayê xwe, icar dısa bı rık jı bırayê xwera:

- Bınhêre Aliekber, raste te xwendıye, tu bûyi mamos-
te, balam heqê te tune ku, tu jı mınra bıbêji ez lı herkesi
bıaqıtırım, lı herkesi zêtır çirok û meselan lı navhev der-
dınım, her tışti dızanım. Te xwendıye, lê kesên dın ji
ceribokên-tecrübe-wan hene. Tu hına zaroki, bina şır lı
devê te tê. Ez bala xwe dıdım ser te, tu dıxwazi ku pêle
ranên mınên bed bıki. Kuro tu lı pirê me Seyid Kekıl û
Seyid Weyis bıaqıtiri? Ew heft qat bıne erdê û esman
dızanın. Wana Quran kuta kırine. Seyid Weyis dıgot" şırê
heywanan medın zarokan.

Aliekber, ez naxwazım dilê te biêşınım keko, balam tu pırr tê ser mın û mın dıxeyidini. Mın beri ji, ji tera got, carek dın ji, ji tera bîbêjum, ez naxwazım şîrê heywanan bîdım kurê xwe û aqlê kurê xwe bıkıım mına heywanan. Kuro ew kijan dayike ku ev tıştı bıke?

Sewra Aliekber her teng bûbûwi êdi nedıxwast ku ew gotinên xwişka xwe guhdar bıke. Lewra axaftına Melekê û ew baweriya Melekê, hêrsa Aliekber radıkr û bihna wi teng dıkr. Lı dawiyê de Aliekber êdi ketıbû rewşa teqandınê, balam rewşa xwe neda kıfşê û carek dı ji xwişka xwera:

- Lı mın qenc bınhêre xwişka delal, guhên xwe ji qenc bıde ser mın, ez ji tera çı dıbêjum. Mın beri ji, ji tera gotıbû, ez carek dın ji, ji tera bîbêjum û dubar bıkıım Ez ji tera dıbêjum ev tıştên ku tu dıbêji, ew tıştên ku Seyid Kekıl û Seyid Weyis ji tera gotıne, ew hemû derewın, ne rastın, tıştên bı zanısti nının. Mın lı te tıka kıır, carek dın ji lı te tıka dıkıım, rabe kevçiyek şîrê çêlekê, yan ji şîrê bıızınê bıde liwık, zıkê liwık têr bıke, bıla lawık bıkeve xewê, tu ji lı ev giri, qirin û gazına wi felat be, em ji. Ez ji tera evqas dıbêjum, te gôt erê? Tu ji mınra qal û behsa Seyid Kekıl û Seyid Weyis dıki. Keçê ez ji tev hındık qasa te wan kesan nasdıkıım, dızanıım ew pırê mene ji. Ewana sala çûyi, ango par zıvıstanê hatıbûn mala me, ji bona çıralıxên xwe. Der û cınarên me ji lı dora wan de kom-bûbûn ew guhdar dıkıırın. Ango gundi ji bona wan lı mala meda cıvıyabûn, lı nav xwe de ketıbûn hındır gengeşıyan, hın zarok ji derketıbûn ser pıştı xanıyê me, lı nav xwe de cûre-cûre leyıztok û gow dıleyıztın. dengê gowê lı ser xêni de dıkr tap û tap deng derdıxıst. Rev û beza wan, xwe hukutandına wan ji pıştı xêni dıhêjand, cısır û mar-

diyaqên asraqa, xêni dıkırım şıqe-şıq û deng derdixıstın. Ji bona ew ji Seyid Kekıl û Seyid Weyis eciz û binteng dibûn. Dûra wana ji bavê mın pırsıyan, gotın" Eli, gelo ew çı tap û tape lı ser xêni de tê, me bêt kêf dıke?" Bavê mın ji wanra" pıro ew zarokın derketıne ser pıştı xêni, lı nav xwe de gow û leyiztokên cûre-cûre dıleyızın" got. Lı ser ew bersıva bavê mın, Seyid Weyis hêrs ket, ji cıvatêra usa got:

- Talıbên delal, cıvata hêja, divê hûn nehêlinın zarokên we gow bıleyızın, gowan ji zarokên xwera çemekın, ev ne başe. Hemû leyiztokên gılower ji bona zarokên me Elewıyan ne qencın, ewana ji mera gunene. Bı taybeti gow bı serê newiyê hezreti pêxamber, Mihamed Mıstefa, Husên çêbûye. Leyiztoka gowê lı heyama Xelifetiya Yezıt pıştı tevkuştına Kerbela de destpêkırıye. Ango gow bı serê İmam Husên va nûvedan-ıcat-bûye. Çawa ku hûn ji dızanın, lı pıştı mırina hezreti Mihamed û hezreti Eli, lı heyama xelifetiya Yezıt de, dubendiyên navbera newiyên Mihamed Hesên, Husên û xelife Yezıt, her tûj bûn. Yezıt İmam Hesên bı destê jına wi, da kuştın, İmam Husên çû Kufayê. İcar Yezıt bı arteşek gewre va êriş da ser bajarê Kufayê û hêzên İmam Husên. Lı Kerbela'yê de şereki mezın destpêkır û hêzên hezreti Husên şer wendakırın, bınketın, tar û mar bûn. Yezıt barbarıyek mezın kır, tevkuştınêk bêt mırovi lı Kerbela'yê de çêbû, İmam Husên hate kuştın. İcar Yezıt serê İmam Husên jêkır ani bajarê Şamê, lı wê serê İmam Husên da zarokın, ku zarok serê İmam Husên ji xwera bıkın gow pê bıleyızın. Lı wê rojê virde gow nûvedan bû. Dûra ew nûvedana kete nav hemû dijminên malbata pêxamber û Ehlibeyt. Roj hat ew leyiztoka kete nav hemû kafırên cıhan û hat gihişt ev rojê. Ji bona ev e ku, ez ji we hemûyan ra dibêjum, mehêlinın zarokên we ji xwera gow çêbıkın, bı goan bıleyızın, şıretên mın lı we evın, dıgot. Ango Seyid Weyis werge dıgot û werge şıret lı me dıkir û diji gow leyiztikê derdiket. Lê bı

rasti ew birûbaweriyên Seyid Weyis ne rastın, peywendiyên nûvedankırına gowê qet lı serê İmam Husên ra tune, ew hemû derewın. Naha te ez fêm kırım xwişka delal?

Melekê birayê xwe guhdar dıkır, balam lı kûrahiya dilê xwe de diji gotinên birayê xwe derdiket. Pışti pırsa birayê xwe" belê-belê, mın tu qenc fêm kırı " got û usa lı Aliekber pırsiya:

- Kuro ma ew gotinên Seyid Weyis ne rastın? Lı gor birûbaweriya te Seyid Weyis derewan dıke? Aliekber ez qurban usa mebêje, ji bona te qenc nabe. Ez hêvi dıkım Xwedê ev gotinên te bıborine, weki dın ez ji tera çı bıbêjim, birayê delal.

Aliekber:

- Belê-belê xwişka delal, ew tıştana hemû derewın, Seyid Weyis tışteki nızane, derewan dıke, hım ji derewên bêt doçık û derewên gırs lı zıkê xwe de diafirine. Peywendiyê gow çêkırın û gow derketinê qet ji serê İmam Husên ra tune. Gow haceteki ji bona spora mirovan nûvedan bûye. Ew ji, lı bajarê Şamê nûvedan nebûye, lı welatên Rojava, angó lı Ewrûpê nûvadan bûye, naha te fêm kır?.

Melekê:

- Kuro êdi hişbe, Xwedê neke naha devê te xar, zımanê te ji lal dıbe, tu gewer dıbi, dıçi. Şireta mın lı te, bala xwe bide ser gotinên xwe û devê xwe.

Aliekber:

- Lê-lê Xwedê ku ji bona ev tıştên ku ez dibêjim dıxeyide, dilê xwe ji mınra teng dıke, devê mın xar, zımanê mın ji lal dıke, mın dıkuje û dıbe hevparê xwediyê wan derewan, pıştgırıya xwediyê wan derewan, kesên mina Seyid Weyis ku dıgire, bıla dereng nemine, devê mın xar, zımanê mın ji lal bıke, bı hûrdemeki zû ruhê mın bıgire, mın bıkuje, kar û berên xwe bıqedine. Lê ez sedi-sed bawerım, Xwedê ji baş dızane ku, ew gotınana hemû derewın, gotinên bêt zanıstine, gotinên kesên xeşım û şêx û

seyidên nezanın. Bı taybeti hınek şêx û seyid hene, kar û berên wan hemû derewın, tıştên nebûyi û metafizikın.

Melekê:

- Aliekber ez dibêjım êdi em van tıştan biterikının, hindê tu dilê mın diêşini, mın dixeyidini, çêtire tu devê xwe dade, hışbe. Ez te qenc dınasım, lewra tu bırayê mını. Tu wexta ku destpêka axaftınê diki, wek miroveki gotarvan-hatib-dıaxıfı û ha dıaxıfı. Bı ev şikli tu dixwazi ku bıbêji" ez miroveki bıaqılum, ez ji hemû kesan pirtır dızanım" felan- bêvan. Ango ez ev xurışta te qet heznakım, raymezıniyê meke, qurebûn qet lı te naşiki lo.

Aliekber:

- Na, xwişka mına delal, lı ser ev babetê tu zef xeltili. Mın qet negotiye û ez qet nabêjım ji, ku ez lı herkesi bıaqiltırım, an ji lı herkesi pirtır tıştan dızanım, an ji bıbêjım" mın xwendıye "felan-bêvan. Na-na xwişka mın ev ne xurışta mine, tu buhtanan davêji ser mın. Ma tu dızani nıviskarêki pêkenoki Fransız çı gotiye? Wi nıviskarê Fransızı gotiye ku" Bodleyê xwenda, lı bodleyê nexwenda zêtır bodleye". Ez ji dibêjım" kehrê xwenda, lı kehrê nexwenda zêtır kehre". Ango mirov her tışt lı dibıstanan de fêr nake. Xeşım û qetilkarên wer lı zaningehan de derketıne, ku hejmara wan naye hesabkırın xwişka mın. Tu rasti nabêji, xurışta mın wek gotınên te nine, tu mın baş nasdiki. Em ku neçûna nêzıka bajarê Xarpitê, mın ji nedıkarıbû bıçıme dibıstanan û bıxwinım. Bırayê meyên mezin nexwendın, wexta wan derbaz bû ew şev û roj xebıtiyan, ez şandım dibıstanan, lı ev rojê şikır. Lê divê tu zanıbi, ez xorteki pozbılınd, raymezın û qure ninım, ez xwe lı keseki bılıntır û zanatır ji nabinım. Balam tıştên rast, rastın, tıştên derew ji her tum derewın, divê tu ev tışt zanıbi.

Xıdê mezin lı ber diwarê pıxêriga ağır de rûniştıbû, pişta xwe ji dabû diwêr, guftugo û gengeşiyên jına xwe û bûrayê xwe guhdar dıkır. Xeca xwişka Xıdê ji çubû lı axur de çêlek û nogına Zeri grêdıda, mi û bızin dıkır hevşe, ji

wi kari ra mijûl dîbû. Balam Xîd lî şûna xwe de eciz dîbû, bî raberzinên jîna xwe û bûrayê xwe va kêfa wi direviya, canê wi dîşîdiya, bihn lî wi teng dîbû. Xîd lî nav rewşek werge de lî şûna xwe de rabû, çû lîgel Melekê û Aliekber de sekîni, jî Aliekber ra:

- Bînhêre Aliekber, te iro lî ber pêz de jî usa kır, ez geleki xeyidandim, naha jî tu xwişka xwe dixeyidîni, dilê wê diêşîni, pêle ranên wê'ên radi-özel-dîki. Kuro êdi bese, biterîkine van gotinên xwe û vê seri hîşkiya xwe. Tu jî dibîni ev belengaza xwişka xwe, bînhêre ew nexwaşe, çavên wê diêşîni, rewşa wê ne rewşe çira tu usa rîk dîki, ev rebenê berxwe dixîni û dilê wê diêşîni? Kuro ev rewş lî te naşîki, got.

Aliekber:

- Zava ez te û xwişka xwe baş nasdîkîm û xurîştî we jî qenc dîzanîm. Hûn herdu lî yek baweriyek û lî yek qewarekidane -kalîp-. Lê ez jî nîzanîm ku, hûn çira evqas zû dîqeherîni û dixeyidîni. Ez jî ev xuya we heznakîm, lê dîvê carna jî hûn guhdare kesani bîkîni. Bav û kalên me çî gotîne, ez bawerîm hûn qenc dîzanîni. Gotîne" Lê tu ku hezar tîştî dîzani, carna jî, ew kesê ku tenê yek tîştî dîzane, lî wi pîrseki bîpîrse û lî wi jî bîşewîre". Ez jî xwişka xwera dîbêjîm, xwişkê lawîk bîrçîye, zîkê liwîk valaye, şîrê berên te zîkê liwîk têr nake, rabe çend qîlm şîrê bîzîni, yan jî şîrê mangê bîde liwîk, zîkê liwîk têr bîke, bîla lawîk bîkeve xewê, ezbenî ew dîbêje" na ez naxwazîm şîrê heywanan bîdîm kurê xwe, aqîlê kurê xwe bîkîm mîna aqîlê heywanan" felan-bêvan. Naha ez lî we herduyan bîpîrsîm, gelo ev kurê we, ku bî zîk vala î, û bîrçî bîmîre, jî wera çêtîr dîbe? Ez jî wera dîbêjîm hûn guhdare mîni bîkîni, şîrê mangê, yan jî şîrê bîzîni bîdîni liwîk, zîkê liwîk têr bîkîni, bîla ev lawîka bîkeve xewê. Hûn ku usa nekîni, wê ew nehêline em çavên xwe bî hevîni û bîkevîni xewê. Tîştê ku ez dîbêjîm, tîştê ku ez lî we dixwazîm hemû ev e, naha hûn têgîhîştîni ez çî dîbêjîm?.

Xidê mezın:

- Fêmdariye bûrayê delal, êdi evqas gengeşi bese, tu bı kerema xwe were rûne, dûra Xwedê mezine. Lê tıştê ku ez lı te dıxwazım, divê tu mebêji Seyid Weyis, Seyid Kekıl derewan dıkın, Seyid hemû derewçının, felan-bêvan.

Aliekber:

- Na zava, ez nabêjum hemû seyid derewan dıkın û hemû derewçının. Ez bawerım gelek seyid û şêxên dilsoz û welat-perwer ji hene. Minak: Şêxeki wek wan cangoriyên Kurdistan, Şêx Said, Şêx Ubedullah, Şêx Mamût Berzanci, Şêx Aptulqedirê Geylani û gelek kesên dın. Lı aliya dın de gelek seyidên her dilsoz ji hene. Ew kesana bı rasti tıştên rast jı talibên xwera dibêjın, rê û dırbana lı kesana temaşê dıkın, seri ronakın, rewşenbirin, dost û dijmin lı hev cûda dıkın, lı dû hukma Romê nakevın, naxwazın bıbın berdest û xulamê Tırk, Erebi û Faris'an. Ango ez gelek seyidên werge ji nasdikım, giramiyê didime wan, qedra wan dıgırım, maqûliya wan hezdikım. Balam hemû gotinên mın ji bona seyid û şêxên derewçın, seyid û şêxên nezan, ewên dozfiroş, evên ku bûne hevparê neyaran, jı bona wanın, ez jı bona wan dibêjum, naha te ez fêm kırım zava?.

Lı wê navberê de Xidê piçûk ji kete nav gengeşıya dê û bavê xwe û xalê xwe, balam piştgiriya xalê xwe girt û jı diya xwe û bavê xwera usa got:

- Xalê mın rast dibêje, balam hûn xalê mın fêm nakın, guh nadın gotinên xalo, diji gotinên wi derdıkevın. Lı gor baweriya mın hûn xelıtın, lı nav şaşitiyandane. Ez ji Seyid Weyis û Seyid Kekıl nasdikım, divê hûn zanıbın, ewana qasa xalê mın tıştan nızanın, wana dibistan neditıne, nexwedıne, xalê mın xwendıye, şol û meselan qenc dızane. Xalo jı diya mınra dibêje" rabe qılmek şirê mangê, yan jı şirê bızınê bıde liwık, zıkê liwık têr bıke, bıla lawık bıkevi xewê" diya mın guhdare bırayê xwe nake, dibêje" na şirê heywanan jı zarokan ra baş nine, ez şirê heywanan nadıme

kurê xwe". Ez dibêjim hûn guhdare xalo bîkîn çêtire. Lewra wext ji geleki derbaz bû, êdi wexta raketinêye.

Xidê bav bî bédengi kurê xwe guhdar dîkir, li dîlda şadibû, balam nedixwast ku dîlşabûna xwe eşkere bike, - îcar bî şikleki hêrsketi va" kuro tu hişbe, mekeve nav gotinên mezînan kehr bav hina bihna gû li devê te tê, rabe biçe bikeve xewê. Tu ji dixwazi min xalê xwe bibêji Seyid Weyis û Seyid Kekil derewan dîkî, ew derewçînan, wer nine?" got û dengê xwe birrand.

Xidê piçûk bî bédengi li şûna xwe de rabû çû kete nav nivîna xwe, li hêf ji kîşande ser xwe û li nivîna xwe de palda û kete xewê. Îcar Aliekber ji zavayê xwera xeyidi û got:

- Ma çira tu li liwîk ra hêrs dîkevi, êriş dîdi ser liwîk, liwîk dîtirsîni?. Gotinên min li ser ev babetê hemû rastî, divê hûn usa zanîbin. Ez carek dîn ji, ji wera bibêjim, hindê Seyid Weyis û Seyid Kekil xêşimîna nezanîna, derewan dîkî, ji bona şîrê heywanan. Şîrê heywanan aqilê zarokan naguhêrine, yekta-bilakis-kêra xwe heye ji bona zarokan. Ne tenê ji bona zarokan, her usa ji, ji mezînan ra ji şîr zor girîng û pêwîste.

Xidê mezîna:

- Aliekber ez heyrana te, kuro bibêje" towe-towe" Xwedê neke tîşteki bêt erênî were serê te lo, tu cîwanî, ji tera guneye. Divê tu qenc zanîbi, seyid xudan nîfûsîna, ewladê balyozê Xwedê Mihamed Mîstefa'ne, ji Xwedê ji her nêzîkîna, Xwedê wan dibihise, guhdare gotinên wan dîke, daxwaziyên wana tîne şûnê. Bibe ku rojeki ew van gotinên te bibihîsîna, ji te bixeyidîna û ji tera nîfîran bîkîna. Bawer ke bûrayê delal, Xwedê daxwazi û nîfîrên wan dîpejîrine, hemû gotinên wana tîne cih. Ez bala te carek dîna dîkîşimîna kuro, divê tu qenc bîaxîfî, guhên te hemû gotinên te bibihîsîna şîretên min li te, divê tu li derheqê seyîdan de usa neaxîfî û zem û dema wan neki.

Lı wê navberê de Xeca xwişka Xidê lı axur de derket û kete hindirê malê. Dit ku ewe zava û bûra lı nav xwe de ketine nav mesela gotinên seyidan, lı ser wan meselan dengên xwe bılind kırine gengeşi dıkın, jı hevûdura hêrs dıkevin, mırov dibêje, naha radıbın hev şer dıkın. Ew rewş lı Xecê xwaş nehat û ew jı kete nav axaftınên Xidê bırayê xwe û Aliekber, jı wanra:

- Bese êdi ev raberzinên we û gengeşiyên we. Mala we ava be, hûn bı ev gotın û raberzinên xwe va têr nabın, çiye lo?. Bınhêrın şeve, tari û zulmatê destpêkırıye, êdi wexta razanê û xewêye. We hina şıva xwe jı nexwariye. Naha hûn van raberzinên xwe bıterıkının, ez jı wera sıfrê amade bıkıım, hûn şıva xwe bıxwın û em bıkevin xewê, sıbe Xwedê mezine. Heke ku hûn ev gengeşıyan têr nebûne, sıbe nûva destpêbıkın heya êvari, bıhêrın lı dawıya axaftınên we de çı dıkevi destên we. Bınhêrın şewqa ağır jı hêdi-hêdi kêm dıbe, ez naxwazım nûva ağır gurr bıkıım, çêtire em şıva xwe bıxwın û bıkevin xewê, got.

Lı ser pêşneyara Xece, Xidê û Aliekber gengeşi bır-randın û çûn ser sıfrê, şıva xwe xwarın û dûra herkes çû kete nav nivına xwe paldan û ketın xewê. Balam xewa Aliekber nedıhat, bıhna wi teng dıbû, nedızanıbû ku çı bıke. Dûra bı kûrahi hênıjiya, kete nav xem û xeyalan, bı xwe bı xwera" bı rasti jı tariye, xêncı şewqa ağır jı şewq tune. Gelê me lı nav tariyê de dıkeve xewê, lı nav tariyê de maye. Bılı ronahiya rojê şewq û eletırıkên gelê me tune-nın, dijınan em lı tariyê de hiştine. Ev tarıbûn, ne tenê tarıbûna şewqan û tunebûna eletırıkan û vejenan û endezyarine-tekniki-her usa jı dijınan gelê me lı nav tarıbûna nezaniyê û xeşimiyê de jı hiştine. Em lı şarezaiya cihanê, em lı dırûdên-nimet-cihanê bêpar mane. Jınên me lı qurna bistan de şırê heywanan nadın zarokên xwe, ew zarokên xwe bı bırçıyan dıkujın, jı ev mırınan ra jı" em çı bıkıım, ev fermana Xwedê'ye, Xwedê lı ser eniya me usa nıvısandıye, em nıkarıbın lı diji fermana Xwedê derkevın"

dîbêjîn. Îro lî hemû gundên Kurdistan de qet şewq û eletirik nayên ditîn. Hejar û belengazên me Kurdan lî malên xwe de dîlopek gaz nabînin. Bîlî axa, mir û seyîdan, hemû gundiyan me lî ber ronahiya agir de û lî ber ronahiya darên kindîr de şîvên xwe dîxwîn, lî nav hev de dîpeyîvîn. Bî taybetî ev rewş lî nav me Kurdên Dêrsim de her zêdeye. Ez lî gelek gundên Dêrsim de geriyame, pîraniya gundiyan, darên kindîran hîşk dîkîn bî taybetî şevên payîz û zîvistanê de, êvar-êvar mîna çîra vêdîxînin, lî ber şewqa wan darên kindîran de şîvên xwe dîxwîn, dîkevîn xewê. Mîn ev bî çavên xwe va dîtiye. Pîraniya Kurdên Rojhîlata Dêrsim usa dîkîn. Ew kindîran dajon, wext tê ew wan kindîran dîbîrîn tînin lî bîn tava rojê de hîşk dîkîn, dûra qurfên wan bî tîpûçan dîkutîn, tene lî sap cûda dîkîn, dîbîn mal dîkîn çalan, lî dema zîvistanê de lî tev kuncîyan dîqewîrînin, dûra bî qenci dîkutîn, dîkîn nav pîvazan bî rûn de dîqewîrînin, dîkîn Zerfet dîxwîn. Mîn gelek caran jî ew xwarîna xwarîye, haya naha jî tama ew xwarînê lî pîduyên devê mîn de mayîye. Sapê wan kindîran jî dîkîn gurz û dîbîn dîkîn nav golên avan, jî bona çend rojan lî nav avê de dîhêlînin, bî qenci nerm û terr dîkîn dûra lî avê tînin der û tîqalên-kabuk-wan darên kindîran sîpî dîkîn û wî çermî-ango tîqalê kindîran-dîrîsîn û dîkîn kîşter-kîrnap-û bî ew kîşter heywanan xwe girêdîdîn. Sala çûyî lî dema zîvistanê de ez jî bona du rojan çûbûm alîya Mêzgirê gundê Kîrziyê lî malekî de bûbûm mîvan. Xwedîyê malê pîştî nivê şeve rabûbû ser xwe, lî ber pîxêriga agir de rûnîştîbû pîfe agir dîkîr ku darê kindîr vîxîne û bîçe axur lî pez û dewarê xweyên avîs bînhêre. Ango wî hejarê Kurd ew dara kindîr jî xwera kîrîbû eletirik, dîxwast ku bîçe pez-dewarên xwe bînhêre ey Xwedê' o tu ev rewşê nepejîrîni" got û hewl da ku ew jî bîkeve xewê. Pîştî çend hûrdeman de Alîekber jî pêva çû kete xewa kûr.

Lı berbanga sibê de Melek bı nalini rabû serxwe, Xec ji hişyar kûr û herduyan hevra girmiya sawarê dan ser agir, piçek kundirên hişk û lowikên hişk ji kîrîn nav sawarê û li benda kelandina girmiyê de man. Pîştî ku dizîka girmiyê li ser agir de danin jêr, gazi herdu Xîdan û Aliekber ji kîrîn, ku ew ji rabîn taştê xwe bixwîn û biçin ber naxîra pêz û dêwêr. Herdû Xîd û Aliekber rabûn serxwe, beri ku biçin dest û rûyên xwe bişon, Xîdê mezîn jî Aliekber ra:

- Aliekber, tu li malda bîsekî, raze hêsa be, ez naxwazim tu ji mina me her roj bîwesti. Lewra xwişka te ji dîxwaze ku tu li gel wê bîsekî, hîndê ew nexwaze ji, got, balam Aliekber ew pêşneyara nepejîrand û disa li tev bûra û xarziyê xwe çû ber pêz û dêwêr. Lewra wi pêşdariya çiya, kaş û deştan zef hezdîkîr, dîxwast ku çend rojên xwe werge, li nav ew pêşdariyê de derbaz bike.

Aliekber û herdu Xîdan li binê gund de pez û dewarên gundiyan radest girtin. Gelek keşan li Aliekber tîka kîrîn ku ew neçe ber naxîra pêz-dêwêr, li gunde gel wan bîsekî û jî wanra bîpeyive, çî deng û bahs li Xarpitê de hene, jî wanra bîbêje, balam Aliekber ew pêşneyara wan jî nepejîrand û jî wanra:

- Ez hina jî bona çend rojan li vîrame, ez soz didime we, wê ez bême malên we ji rûnîm, jî wera jî bîpeyivim, nan xwê ên we ji bixwîm, lê hûn du-sê rojan destûrê bîdîm, got û li tev herdu Xîdan naxîra pêz û dêwêr ajot û pez û dewar disa bîrîn gaza gund berdînan nav çêrê û bî xwe ji li derdora naxîrê de belav bûn, her yek li aliyekî de, li ser kevîreki de rûniştin û balên xwe dan ser naxîra pêz û dêwêr. Pîştî demek kurt de Xîdê mezîn gazi Aliekber kîr û jî Aliekber ra:

- Aliekber ela were vîra disa em piçeki pevbiçîn lo, got û Aliekber çû ligel zavayê xwe de rûnişt. Pîştî hînek guftugoan de Xîdê disa xwast ku qal û behsa hîn tîştên Oli bike, îcar disa bîhna Aliekber teng bû, xwast ku jî zavayê

xwera tışteki nebaş bibêje, balam xwe zeft kır û berê xwe guhart ser Xîdê û jî Xîdê ra:

- Zava disa tu dıxwazi çî bibêji? Bı rasti ew tıştên ku me duhu gotın, lı ser wan tıştan em peyivıyan, qal û behsa seyidan û gotınên wan kır, ma tu disa dıxwazi em lı ser wan raberzinan bıkın? Gelo tu bı rasti lı wan tıştan bawer diki, yan na ?.

- Kijan tışt û mesele kuro ? Bawer ke qet nay bira mın bı kerema xwe tu bine bira mın.

- Ka qenc bine bira xwe zava, bawerım du sal beri bû, ez disa hatıbûm mala we, lı wê demê de Seyid Weyisê pirê me jî hatıbû mala we, hemû gundi jî lı mala we de civı-yabûn, Seyid Weyis guhdar dıkırın. Wi jî wera ew çiroka gow ê û çiroka serê İmam Husên dengdıkır, we hemûyan jî, çawa ku keriyên miyan bılûra şıvan guhdar dıkın, bı dengê bılûre dıçın ser avê û werge tevger dıkın, we jî eynı mina keriyên miyan, Seyid Weyis guhdar dıkır, bı kêfan hûn dıbûn çar koşe. .

Yekser hêrsa Xîdê rabû, çoyê dest xwe lı kêvır xıst, jî Aliekber ra:

- Aliekber, ma tu dıxwazi çî bibêji kuro? Te em hemû gundi kırın keriyên miyan, lı gor baweriya te em hemû heywanın, tu tenê bı aqıl û mırovı, wer nine?.

Aliekber dit ku Xîd her dıxeyidi, icar wi:

- Haşa zava, çıra tu usa dıhesibini, ev gotinek geleriye lı nav gel de têt gotın, qet mabestek mına bed jî, jî bona gundiyan tune, divê tu lı ev bawer bıki.

Lı pışti ew gotınên Aliekber, icar Xîdê:

- De tu bibêje, gelo mana ev gotiên te çine? Seyid Weyis jî civatê ra çî dıgot? Bı kerema xwe tu jî mınra ew bibêje, ez jî bıbıhisım.

Lı pışti ew reaksiyana Xîdê de Aliekber:

- Başê zava, de tu bı kerema xwe qenc guhdar bıke, ez jî, jî tera ew çiroka ku Seyid Weyis dıgot, ew çiroka gowê û serê İmam Husên bibêjım. Ez bawerım tu baş birtini û

dızani, lê disa ji ez hevce dıbinum ku jı tera dubar bıkıın. Seyid Weyis usa dıgot:

- Roja ku hezreti Muhamed Mistefa mır, Omer, Osman û Ebûbekir neçûn ser taziya pêxamber, lı ciheki de hatın ba hev, lı hev şêwirıyan, lı nav xwe de Ebûbekır kırın Xelife ê İslami. Lê heqê xelifetiye ê hezreti Eli bû. Wan hersıyan bêbextiyek mezın kırın, heqê Eli xwarın. Lewra Eli hum pısmamê pêxamber bû, hum ji zava ê pêxamber. Zagona İslamiye ji lı aliya pêxamber de werge hatıbû danin. Lê ku rojeki pêxamber mır, dıviyabû lı malbata pêxamber de kesek şûna pêxamber bıgire û ew bıbe Xelife ê İslam. Lê sed mıxabın ku werge nebû, Omer, Osman û Ebûbekır ji werge nekırın, heqê Eli xwarın û betal kırın. Jı bona ew bêbextiyê û heq xwarınê ji, dubendiyek mezın kete nav Ola İslam. Ew dubendiya bı taybeti lı heyama xelifetiya Mawiye û kurê wi Yezit de, her gurr bû û bû sedemaa tevkuştınek heri mezın. Mawiye û Yezit hınek zagon û deqên Quranê guhartın, lı dıji malbata pêxamber de dıjminatiya xwe eşkere kırın. Jına İmam Hesên Cûde xapandın, bı destên wê jehr dan İmam Hesên, İmam Hesên kuştın. İcar İmam Husên çû bajarê Kûfê, ku jı alıgirên xwera meselê bıaxıfe, lı dıji Yezit derkeve, lê yezit şık bır wê meselê û çüyına İmam Husên, ew çüyına jı bona xwe xetere dit û taf de bı arteşek gewre va êriş da ser bajarê Kûfê û Kerbelayê, hemû alıgirên malbata pêxamber û newiyên pêxamber bı barbari hatın kuştın û Yezit İmam Husên dil gırt, serê wi bı şûr jêkır û lı tev xwe ani Şamê. Dûra gazi zarokên ew taxa xwe kır, serê İmam Husên da wan zarokan û jı wan zarokan ra usa got:

- Ez ev seri dıdıme we, dıvê hûn zanıbın ku ev seri, serê dıjminê mın û dıjminê malbata mıne. Daxwaziya mın lı we ewe ku, hûn ev seri jı xwera bıkıın gow û pê ev seri bıleyızın, ta ku porê ev seri weşıye, goşt ji lı ser helısiya û tenê hesti man.

Ezbeni, zarok ji li pısti ew fermana Yezit de, serê İmam Husên dıgırın û ji xwera dıkın gow, li meydan û kûçan de pê serê İmam Husên gow dıleyızın. Eve, bı ew formê va cara yekemin li ev cihanê de gow nûvedan dıbe. Yezit ji, her roj radıbe dıçe ba wan zarokan, li zarokan mêze dıke, carna ji ew serê İmam Husên ji zarokan dıstine, serê İmam Husên dıde ber şelaq'an -kamçi- şelaq li devê İmam Husên dıxine, dıbêje" de mêrani çıtoye tu bıbine, gazi bavê xwe û bapirê xwe û Xwedê ê xwe bıke, bıla ew werın te bıbinın, te li destên mın de felat bıkın, ez ji wana bıbinım û baweriya xwe li wan binım".

Belê, wexta ku ew kafıra şelaq li devê İmam Husên û serê İmam Husên dıxine, serê İmam Husên tê zıman, ji Yezit ra usa dıbêje" ey kafır, ceddê mın Mihemed Mıstefa û Eli, wê rojek bê tol û qesasa mın û ên hemû cangoriyên Kerbelayê ji te û hemû alıgır û neferên malbata te bıstının, cezayên gırs û gewre bıdıne we, we hemûyan bavêjıne dojhê û agrê dojhê de we bışewıtının, li sitilên qetranan de wê ew we bıkelının, bıkın Xaş, goştên we bavêjın ber mar û mışkan".

Geleki qenc tê bira mın zava, bawerke Seyid Weyis ew çiroka xwe usa dıdomand, dıgot" ezbeni, dısa rojeki zarok mına her rojan pê serê İmam Husên dıleyızın, bı pınan û lıngan va serê İmam Husên vırde-wırde gıldır dıkın, li nav xwe de şematın derdıxının, nışka ve dıbinın ku ewe keşışeki dêra Xaçparêzan bervı wan tê. Çawa ku keşış nêzıka zarokan dıbe, dıbine ku ew zarokana bı seriyeki" Beyni Adem" va dıleyızın, wi seri li nav xwe de gıldır dıkın vi ali, wi ali, kêfa xwe tının. Keşış li hember dısekıne li zarokan dınhêre, dıbine ku ew seriya tê zıman, ji zarokan ra" Xwedê û ceddê mın her mezının, wê rojek bê ew qesasa mın li Yezit bıstının" dıbêje.

Zava, Seyid Weyis berdewam dıkir û dıgot" ew keşışa nasê pêxamber û nasê malbata pêxamber bûye. Rojeki çûye bajarê Mekkê ku bıbe mivanê pêxamber, li pêş derê

qonaxa pêxamber de ditiye ku, ewe pêxamber hezreti Mihamed Mîstefa, Îmam Hesen daye ser jonyeki xwe, Îmam Husên ji daye ser jonyeki xwe, jî wanra" hûn herdu canê min û ronahiya çavên minin" dibêje û gepên ew newiyên xwe maçdıke. Çawa ku keşiş serê Îmam Husên dibine, agirek dıkeve dilê keşiş, hıstêr lı çavên keşiş de dibarin, nızane ku çı bike. Lewra keşiş lı dilê xwe de hezkıriyeki Mihamed û malbata wi bûye. Wi zanıbûye ku Mihamed Mîstefa pêxamberê dawı û pêxamberê axıriye, balyozê Xwedê ê rastiye, bı dilda baweriya xwe lı Mihamed aniye, balam baweriya xwe eşkere nekıriye. Keşiş xudan heft kuran û keçıkeki bûye, jına wi ji çendek beri mıriye, çûye rama Xwedê. Keşiş lı hember wê barbariyê tewat nake, bı dilkeseri nêzıka zarokan dıbe û piçeki ji xwe dilhinik dıke, dûra ji zarokan ra:

- Zarokıno, naha hûn werın ez ji wera tışteki bıbêjum ez û we em lı nav xwe de peymaneki çêbıkın. Hûn ev seri bıdın mın, ez ji dırav bıdım we, hûn herın lı sükê de ji xwera şekırên sorık û mewıjan bıkırın bıxwın, zıkên xwe têr bıkın, ez ji ev seri bıgırım bıçım mal. Ango qet metır-sın, hûn çıqas dırav dıxwazın, ez bıdım we. Ew zarokana ji wê pêşneyara keşiş dıpejırının û serê Îmam Husên dıdine keşiş û lı hemberê serê Îmam Husên, dırav lı keşiş dıstının û dıçın dıkevın çarşı û sũkan, ji xwera şekırên sorık û mewıjan dıkırın dıxwın, zıkên xwe têr dıkın. Keşiş ji lı wê serê Îmam Husên dıgire û dıçe mal, wi serê birri radeste keça xwe dıke. Lı destpêkê de keçık geleki dıtirse, balam keşiş meselê jı keça xwera dibêje û keça xwe agadar dıke. Dûra keşiş keça xwe usa teme dıke û dibêje" keça mın, ev seri serê newiyê Mihamed pêxamber, kurê Eli Abdulmutalib, ê Îmam Husêne. Tıka mın lı te, dıvê tu lı ev seri qenc bınhêri, ev seri lı ciheki baş de veşêrını, ku qet kesek nabine û hayjı ev seri nebe. Jı bırayên xwera ji qet qal û behsa ev seri meke". Keçık ji, jı bavê xwera" bavo tu qet perwa-mera-q-meke, ez ev seri lı ciheki wer de

veşêrinum ku qet kesek nebine, jî bona ev çu qisaweta te nebe û hêsa raweste" dibêje û serê Îmam Husên dîgire û dibe şûnek heri qenc de vedîşêrine û dadîgere cem bavê xwe. Keşîş carek dîn keça xwe teme dîke û dîçe lî hîndîr dêra xwe de dîkeve nav mitalan. Rojtîra dîn ew kafîrê Yezîd disa derdîkeve der, ku bîçe gel zarokan lî serê Îmam Husên binhêre, gelo ew zarokana çîto lî pê serê Îmam Husên dîleyîzîn, serî lî çî rewşêdaye. Dîçe lî kûçan de zarokan dibîne, balam serê Îmam Husên lî cem zarokan de nabîne, serî lî wan deran de tune, zarok lî şûna gow leyîzîtokê de çavgîrtîk dîleyîzîn. Îcar çawa ku Yezîd serê Îmam Husên lî dest zarokan de nabîne, bî hêrs dîqîre ser zarokan û jî zarokan dîpîrse, dibêje" lalaw ew serîyê ku mîn dabû we, we ew serîya çîkîr, we da kê, kîjan alîva we avî? Jî mînra zû bîbêjîn, we ew lî kuderê de vêşart? Ez dîxwazîm hûn ew serî jî mînra zû bînîn, na-na ku hûn jî mînra ew serî neynîn, bî navê Xwedê ez we hemûyan bîkujîm û serê we hemûyan jî jêkîm, goştên we jî bavêjîm ber kûçîkan". Pîştî ew hêrsketîn û gef xwarîna Yezîd de, zarok jî yezîd ra:

- Ezbenî, em mîna çend rojên bîhurî lî pê ew serî dîleyîzîtîn, nîşka ve keşîşê dêra Xaçparêzan lî pêş me derket jî mera got" zarokîno, ez dîrav bîdîme we, hûn herîn bî ev dîravan jî xwera şekîrên sorîk û mewîjan bîkîrîn, bîxwîn, ev serî jî hûn bîdîme mîn". Lî ser ew pêşneyara keşîş, me ew serî da keşîş, wî jî dîrav da me, em çûn sûkê, me jî xwera şekîrên sorîk û mewîjî kîrîyan, xwarîn. Ango hemû mesele û bûyer ev e. Lê tu ku ew serî şûva dîxwazî, wê em bîçîn dêrê jî keşîş ra ew meselê bîbêjîn û ew serî lî wî disa bîstînîn, bînîn bîdîme te, dibêjîn. Lî ser wan gotînen zarokan Yezîd bî lez û bez dadîgere qesra xwe û gazî berdestekî xwe dîke û jî berdestê xwera:

- Zûke bîçe dêra Xaçparêzan, jî mînra gazî ew keşîşê dêrê bîke, bîla nesekîne, zû were pêşberîya-huzur-mîn, dibêje, ferman dîke. Berdestê Yezîd jî dîçe gazî keşîş dîke,

fermana Yezit ji keşîş ra dîbêje, keşîş, dîde pêşiya xwe tine qesra Yezit, derdixine pêşberî Yezit" fermî ezbenî mîn fermana te anî şûnê" dîbêje û derdikeve der. Pîştî derketîna berdest, Yezit bî hêrs û xîşm jî keşîş ra:

- Keşîşê birêz, ma te çîra ew serê dijminê mîn lî zarokan stand, gîrt bîr? Naha ez ferman dîkîm, divê tu bîçî mal, ew serî bî zû mînra bîşîni. Na ku tu usa neki, bî navê Xwedê ez serê te jî mîna serê Husên jêkîm bîdîme zarokan, bîla zarok jî xwera bîkîm gow, an jî, ez bavêjîm ber seg û teyrân. Ez bawerîm te ez û fermana mîn bîhist. De qet mesekî zû derkeve der, bîçe ew serî lî wextek herî zû de jî mînra bîşîne, dîbêje. .

Keşîş bî xwîn sarî Yezit guhdar dîke, dûra" serseran ezbenî" dîbêje û lî qesra Yezit de derdikeve der dîçe mal. Lî şeva ew rojê de, bî dîziyan serê kurekî xwe jêdîke û rojtîra dîn sîbê de, jî Yezit ra dîşîne. Balam Yezit dînhêre ku ew serî, serê Îmam Husên nîne. Îcar Yezit bî gef û hêrs gazi xulamekî xwe dîke, dîbêje" zû bîçe jî keşîş ra bîbêje ev serî, serê Îmam Husên nîne, bîla hêrsa mîn pîrr ranêke, jî mînra serê dijminê mîn bîşîne". Xulam jî" serseran " dîbêje û dîçe fermana Yezit jî keşîş ra dîbêje û dîsa dadîgere qesra Yezit. Rojtîra dîn, vêca keşîş serê kurekî xwe ê dîn jêdîke, jî Yezit ra dîşîne, dîsa Yezit lî ew serî dînhêre, ku ew serî jî, serê Îmam Husên nîne. Welhasîlî kelam keşîş jî bona serê Îmam Husên, serê heft kurên xwe jêdîke û jî Yezit ra dîşîne, balam lî Yezit nade bawerkîrîn, lî dawiyê de dîreve û xwe vedîşêrine. Yezit çîqas hewl dîde ku, keşîş û serê Îmam Husên bîbine, lê qet raste rêça keşîş û serê Îmam Husên nay, lî dawiyê de dest lî gerandînê berdîde. Ezbenî, lî zîkê wê bûyerê da, keça keşîş jî, her roj ew serê Îmam Husên bî qencî dîşo, bîhnên xweşîk lî serî ra dîke, mîna Gul û çîçegan serê Îmam Husên bîhn dîke. Lê hûn lî hêkmeta Xwedê bînhêrîn, keça keşîş bî ew bîhnkîrîna dîgel serê Îmam Husên va, bî zarok de nefsnexwaş dîbe. Ango dîbe ducan. Pîştî neh meh, neh roj, neh hûrdem û neh

dûvikan de duxwaskan dibe, bı fermana rebê alemê, kureki mina nûr tine ev cihan. Belê, keça keşîş duxwaskan dibe, kureki wê ê weka nûr dîwelîde, lê balam qet lı aze-wiya keça keşîş tıştek nabe, ew keçika mina beri werge azew dumine. Ango ez jı we ezbeniyên xwera ku bibêjum, ew lawıka du-sê mehini dibe, nabe, icar ehrimaniyek di-keve dilê Yezit. Yezit bı xwe û xwera" gelo kesek lı eslê Eli û Mihamed de mane, yan na?" dibêje û jı bona ew pirsê fermanek bı taybeti derdixine, ku hemû Remilvanên welatê wi, lı heyamek heri kurt de werın qesra wi û derkevın pêşberiya wi, wi bıbinın. Lı ser fermana wi kafıri hemû Remilvanên welatên İslam lı heyamek heri kın de, lı qesra Yezit de kom dıbin û derdikevın pêşberiya Yezit, jı Yezit ra:

- Ezbeni te ferman kırine, ku tu me bıbini, jı bona ev ji, em hatine pêşberiya te, gelo xêre? Ku fermanek te heye, em hemû amadene, fermo ferman ke, em fermana Xelife ê xwe binine cih, dibêjin.

Em naha Yezit û Remilvanên wi lı qesra wi de cihbî-hêlinın, dagerın ba keşîş, keça keşîş û ew kurê keça keşîş, gelo ew çıbûn û çı dıkın?. Ezbeni çito ku keşîş ew fermana Yezit dibihise, yekser dikeve nav tevger û xebatê. Gazi keça xwe dike û jı keça xwera usa dibêje:

- Keça mina delal, qet mesekin, zûke sitıla avê bıgire bı lez bıçe ber ava newalê, sitıla xwe tiji av ke, bıde ser agir, ev lawikê xwe ji bıke hındirê ava sitilê, kinc û kolan ji, têke ser, bı qenci lı hındirê sitıla avê de bıxımıne û lı tev kincan bıkeline. Lê ku bı rasti, lı ev lawiki de xwina nı-jada pêxamber hebe, wê ew neşewite û qet tıştek lı ev lawik nebe. Lê na-na ku xwina nıjada pêxamber lı ev lawik de tunebe, wê ew bışewite, bıçe, xem nake. Weki dın qet rê û rêgehek me a dın ji tune. De tu rabe, guhdare bavê xwe bıke, ev gotınên mın zû bine şunê.

Lı ser ew gotın û pêşneyara keşîş, keça keşîş radıbe sitıla beravê û kinc û kolan digire, tev kurê xwe dıçe ber

ava newalê, sitilê tji av dıke, dıde ser ağır, kurê xwe ji dıke hındır ava sitilê, kinc û kolan ji dıke ser, bı qenci dınxımıne û ağır lı binê sitilê de gurr dıke, kurê xwe û kinc-kolan dıkeline, ha dıkeline, lı hiviya rewş û axıriya kurê xwe de dımıne.

Naha disa em keça keşış lı wê rewşê û lı ber sitıla beravê de cıhbıhêlinın, dagerın qesra Yezit, gelo Yezit û Remilvanên Yezit, ew çı dıkın û çı dıbêjın.

Beie, hemû Remilvanên Yezit, lı ser fermana Yezit Remilên xwe vedıkın û lı Remilên xwe dınhêrin û ha dınhêrin. Lı dawiyê de hemû bı hevra" ezbeni em geleki xemginın, berxwe dıkevın, lê malesef lı ew malbatê de kesek felat bûye, balam ew ji, lı nav" heft deryan de tète xuyakırın. Lê sed mıxabın ku, em ji nızanın ew kijan deryaye" dıbêjın. Ango ew Remilvanên Yezit, wê sitıla avê lı Remilên xwe de mina heft deryan dıbinın, wan dıtınên xwe ji Yezit ra werge dıbêjın. Ew lawık ji, lı nav ava kelox de naşewite, naxeniqe, lı binê wan kinc û kolan de gıxıkan dıke û xwe bı xwera dıkene. Wexta ku ew lawıka lı nav ew ava kelox û binê kinc û kolan de gıxıkan dıke, dıkene, icar ew ava sitıla beravê dıke fıqe-fıq serhev de dıçe, deng derdıxıne. Ango çawa ku hûn ji bı çavên xwe va dıbinın, wexta ku dereca kela avê lı sewiya germi de derbaz dıbe, icar ew ava dıke fıqe-fıq, serhevda dıçe, deng derdıkeve. Eve, ew roj, ev roj, av usa dıkele. Bikurtasi ew fıqe-fıqa avê lı gıxıkên wi masûmê pak, newiyê pêxamber va destpêkiriye, hatiye gihiştiye ev roja me. Lı beri wê rojê av usa nedikeliya û nedıkir fıqe-fıq û lı serhev de nedıçû. Pışti ew hêkmeta Xwedê û wê bûyerê, keşış navê wi lawıki datine "İmam Baqır". Jı ber ku ew sitıla ku keça keşış dabû ser ağır, cewhera wê sitilê bı baqır, angosıfır va hatıbû çêkırın. Gelo naha hûn hemû serwext bûn? Ango koka me dıçe xwe dıgihêjine İmam Baqır û nijada pêxamberê ev cıhan, Mihemed Mıstefa.

Belê, zavayê delal, Seyid Weyis jî civatê ra, jî te û minra usa dıgot. Naha divê tu qenc lî meselê binhêri, şirovekırına ev gotinan bıki, bı kûr bihênji û jî xwe bıpırsi, bibêji" gelo evana rastın, yan ne rastın, derewın". Zava ez xulam, mirov çawa lî tıştên usa bawer bıke?. Nızam keşış jî bona serê İmam Husên, serê heft kurên xwe jêkırıye daye Yezit, disa navê wi maye keşış, ew nebûye İslam, ev yek. A duwem: Keça keşış serê İmam Husên binkırıye, bı wê bihnê va nefsnexwaş bûye, roj hatiye kureki wê keça keşış welıdiye hatiye cihan, qet lî azewiya keça keşış tıştek nebûye. Keça keşış ew lawıka kırıye nav ava sitilê, kinc û kol jî lî serda nıxımandıye, lê ew lawıka lî nav wê ava sitilê de nexenqıye û neşewıtiye, nızam beri ew bûyerê, av mina iro nekeliyaye, ew kela avê û fıqe-fıqa avê bı gıxıkên ew kurê keça keşış de destpêkırıye û hatiye gihiştıye ev roj û heyama me. Nıjada seyidan û koka seyidan jî dıçe xwe dıgihêjine İmam Baqır û Mihamed Mıstefa, felan-bêvan. Ango evqas jî derew dıbın zava? De tu bibêje. .

Ha, gotınek wi a dın jî hate bira mın zava. Seyid Weyis dıgot" pışti ew tevkuştına Kerbela, dilgırtın û cangoribûna İmam Husên û jêkırına serê wi de, Yezit diya İmam Husên û İmam Hesen, keça pêxamber Fadime'i Zuhre jî dil dıgire tine Şamê, hemû kinc-kolên Fadime'i Zuhre lî ser bedena wê de dıçırine, tine der, Fadime'i Zuhre tazi û şılf dıke, werge lî deveki sıwar dıke û lî kûçan de dıgerine. Armanç, pê namûsa keça pêxamber, jına hezreti Eli, diya İmam Hesen û Husên bıleyize, lî pêş çavên gel de, navê wê malbatê rezil û rusva bıke. Lı wi zemani de, pıšta devan jî mina pıšta hesp û haşa kehıran dûz bûye. Lê wexta ku ew kafırê Yezit, Ana Fadime bı wi şıkli va lî devê sıwar dıke, Xwedê Tahla pıšta devê weka iro, çawa ku hûn jî dıbının, çal dıke, bı ew hêkmeta Xwedê va, paş û pêşıya Fadime'i Zuhre tête dadan, cihên eyibi lî ber çavan de wenda dıbın, balam Yezit disa jî ar nake û lî Xwedê natırse, zılm û zor-dariya xwe dıdomine".

Ev ji derewa duwem zava, te qenc guhdar kır?. Ango beri hukumdariya Yezit de, şıklê devan mina ev heyama me nebûye, pîştâ devan ji weka pîştâ kehr, hesp û qantîran dûz bûye, Xwedê tala ji bona cih eyibên bedena Fadime'i Zuhre, pîştâ devan weha çal û kort kîriye, ku paşi û pêşiya Fadime'i Zuhre neye ditin. Zava te dit ev çi derewek mezine?. Gor ku dirok dîwîsine, milyonan sal beri mîrov û heywan hebûne. Şıklê devan beri Yezit de ji mina şıklê iroin bûye. Lî gor gotin û baweriya Seyid Weyis, pîştâ devan lî dewra yezit vîrde werge hatiye guhartin. Ango, Xwedê tala ji bona Fadime i Zuhre bedena devan guhartiye, kîriye ev şıklê iroin. Lê usa dibe? Mala wi Xwedê ava be, lî cihan de ewqas zîlm û zordari bûne, bî milyonan zar û zêç, pîr û kal, keç û bûk bî destên zalimên wek Yezit va hatine kuştin, ma çira wi lî ew deman de dengê xwe dernexistiye? Ma çira wi lî wan neheqi û zîlman nihêriye, bêdeng maye? Ma ew hejar û belengazana, ew milyonên cangori qûlên wi nebûn? Ma wi ew milyonana neafîrandibûn? Ma wi çira lî tevkuştina Kerbela, lî tevkuştinên hemû cihan, lî tevkuştina Qoçkiri'yê, lî tevkuştina Şêx Said, lî tevkuştina çiyayê Agîr nenhêriya û qet dengê nekîr?. Lî gor baweriya we, Xwedê tenê ji bona xatîrê Fadime'i Zuhre û şîlf bûyîna wê ew hêkmeta xwe derxistiye û eyîba Fadime'i Zuhre hefîdandiye? Tenê ewqas wer nine zava?. Na-na pîsmam, ev hemû derewîn, Seyid Weyis û kesên mina Seyid Weyis derewan dîkin, tîştên wer nebûne, Xwedê tîştên wer nekîriye, ev çirokana hîn kesên derewçîn û bêbext derxistine, bawerke peywendiyên van derewan jî rastiyan ra tune. Ev derewana dûrveyyîyê zanînê ne, dîji rastiyanin, dîvê tu evana zanîbi zava.

Sewra Xîdê gelekî teng bûbû, lî şûna xwe de zor dîsekîniya. Dûra bî hêdîka rabû serxwe, jî Aliekber ra:

- Kuro tu dîxwazî jî mînra van tîştan bibêjî û serê mîn bîêşîni, fîrşîka mîn lî nav hev xîni? Ez bawerim tu lî mal-

da bisekini hin çêtır dibe jı bona mın. Lewra tu pırr dia-xıfı, dıji seyidan derdıkevi, dıkevi ber gunan, ev ji, jı tera nabe, tu cıwani, ez lı jına te dıtırsım, got û çû lı dora pêz û dêwêr de piçeki zıvırı, disa dageriya ba Aliekber. Aliekber çıto ku zavayê xwe dit, lı wi keniya û usa got:

- Ez dıbinım zıkê te û devê te mina hev nine. Bınhêre tu disa hati gel mın. Ez bawerım tu ji dıxwazi bıaxıfı, qal û behsa çirokan bıki. Bı kurtasi tu gengeşiyê hezdiki, wer nine? Bınhêre zava, lı ber naxırê em wexta xwe çawa derbaz bıkın, dıvê em jı hevra bıaxıfın, jı hevra kılaman bıstırının, henekan bıkın, ku zeman zû derbaz bıbe. Bı rasti dengê te ji geleki xwaşe, tu xwaş dıstırini. Naha tu lı mın guhdar ke, ez jı tera çirokek Seyid Weyis, yek a dın bıbêjum, ma tu çı dıbêji, dıxwazi yan na?

Lı pey ew pırs û henekên Aliekber de, icar Xıdê:

- Bınhêre Aliekber, çı dıxwazi bıbêje, balam pırr dev mavêje seyidan ev yek. A duwem, çirokan pırr dirêj meke, kurt bıbıre, ku tama çirokan nereve, ev ji dudu. Hemû xwastekên mın lı te evın, naha bû?

Lı pişt ew gotınan de Aliekber disa keniya û usa got:

- Ma çıra tu jı mınra dıbêji dirêj meke lo? Lê ez baş dızanım, wexta ku yek jı tera kılama Memê Alan, kılama Ūsivê Kal, kılama Sêvdin Begê dıstrine, tu qet jı wi kesira nabêji" kılama xwe piçeki kın bıbıre" tu bı dıl û can guhdar dıki, ma çıra tu naxwazi çirokên mın guhdar bıki?.

Xıdê disa bı hêrs jı Aliekber ra:

- De bû, de bû kuro tu dıxwazi jı mınra kijan çirokê bıbêji?.

- Zava ez xurışta te qenc dızanım, tu çirokên Metafizik û xurefa zef hezdiki, ez ji dıxwazım çirokek wer jı tera bıbêjum. Ez bawerım te ew çiroka bıhistiye, balam disa ji ez dıxwazım jı tera carek dın ji bıbêjum, bınum bira te. Seyid Weyis dıgot" rojeki hezreti pêxamber Mihamed Mıstefa, lı tev esabeyên xwe lı mala xwe de rûnıştiye, lı tev

eseban ketiye nav gengeşiya pırsa cihanê û pırsa Ola İslami. Lı ew demê de nişka ve deriyê malê vebûye, gureki gewrê weka hırçeki lı pêş dêri de hatiye xuyakırın. Dûra gur lı ber dêri de mexel bûye, serê xwe ji daye ser darê şemûga dêri, herdu çavên xwe zûrr kırıye, lı pêxamber û esabeyên pêxamber nihêriyaye, pêxamber û hemû esabe werge şaş û ecêb mane, nezanine ku çı bıkın û çı bıbêjn, bédeng mane. Lı pışti çend hûrdeman de, icar hezreti pêxamber vecinîqiye serxwe, berê xwe guhartiye aliya gur, lı gur usa pırsiyaye, gotiye" Ya gurê Xwedê, tu hati vıra ji bona çı? Gelo çı xwasteka te lı me heye, tu lı me çı dıxwazi? Lê ku xwastek te lı me heye, keremke ji mera bıbêje, em ji bınhêrın, çıqas ku dest me bê, wê em ji, ew xwastek û daxwaziya te bınn şûnê". Lı pışti ew pırsa pêxamber de, icar gur hatiye zıman, ji pêxamberê Ola İslam hezreti Mihamed ra usa gotiye:

- Ya balyozê Xwedê, ez bawerım hatına mın lı te eyane. tu sedemê ev hatına mın dızanı. Ez hatıme ku, tu bı fermana Xwedê keça xwe bıdı mın, ez ji, ji keça tera bızewıcım, bıçım bıgihêjum mırazê xwe". Çıto ku gur hatiye zıman axaftiye, hemû esabe kerr û lal bûne, lı şûnên xwe de werge sar bûne mane. Hezreti Mihamed ji lı esaban nihêriyaye, ditiye ku hemû lı şûnên xwe de bédeng sekınıyane, lı hevûdu û gur mêzedıkın, qet dengek ji yeki dernakeve. Lı nav ew pêşdariyê de, hezreti pêxamber berê xwe dıguhêrine ser gurê Xwedê, ji gur ra usa dibêje:

- Ya gurê Xwedê, lı darê ev cihan de tenê keçıkek mın hebû, mın ew ji çendek beri da kurapê xwe hezreti Eli, zewıcand. Bawerke, lê ku keçıkek mına dın hebana, mın bı fermana Xwedê ew keçıka xwe ji bıdana te. Lê dıvê tu mın bıborını û bıbaşını. Rewş beri lı Xwedê, dûra ji lı te eyane ku, keça mın tune". Pêxamber gotına xwe dıqedine û dûra disa lı esaban dınhêre, balam kesek qet dengê xwe dernaxine û werge lı şûna xwe de dısekının. Pışti hınek

bêdengiyê de, şivaneki deveyên pêxamber lı paş dêri de radıbe ser lıngan, jı hezreti pêxamber ra usa dibêje:

- Ya balyozê Xwedê lı te eyane, keçek mına azew heye, ev gurê Xwedê ji qal û behsa fermana Xwedê kır, ez ji, jı bona nav û fermana Xwedê, dıxwazım bı dılda keça xwe bıdıme ev gurê Xwedê. Lı aliya mın de ev mesele çareser bû, balam dıvê ez bıçım mal ev meselê jı jına xwe û keça xwera ji deng bıkıım, daxwaziya wan ji bıstinım, dilê wan ji razi bıkıım, dûra ez keçıka xwe radeste gurê Xwedê bıkıım, bıla gurê Xwedê bıgire jı xwera bıbe. Naha tu destûrê bıde mın ez bıçım mal ev meselê jı jına xwe û keça xwera bıaxıfım, raya wana erêni û ne erêni bıstinım û disa şuva bêm û nûça"erê û na"bıdıme we.

Lı ser ew gotına şivan, hezreti pêxamber destûrê dıde şivan û şivan bı lez û bez bazdıde dıçe mal, wê rewş û meselê jı jına xwe û keça xwera dengdıke, dibêje" gelo hûn çı dibêjım û ramana we çıye? dıpirse. Bersıva yekemın keçık dıde. Jı bavê xwera:

- Bavo tu bavê mıni, ez lı bıoyên-hücre-teda derketıme lı bedena xwe de xwına te dıkışınım, tu ku mın bıkuji, mın bavêji ava çem û deryan bıxenıqını, ez jı tera nabêjım" bavo na û ev kari meke ". Ango tu çawa dıxwazi û çawa ferman dıki, ez dibêjım"erê"û hemû gotınên te dıpejırınım, dibêje.

İcar dor tê jına şivan. Jına şivan ji lı mêrê xwera:

- Mêrik tu mêri, mêrê mıni, tu esmanı, ez ji erdım. Çawa ku lı jor esman de çı ku tê erd dıpejırıne, ez û tu ji mına erd û esmanın. Bı gotınêk dın, ez erdım tu ji esmanı. Te ku gotıye"erê"dıvê ez ji bıbêjım"erê". Te ku gotıye"-na" dıvê ez ji bıbêjım"na". Naha te nêt û ramana me bıhist. Gotın û ramanên me hemû evın. De tu bı kerema xwe zû bıçe ev nûçe bıde gurê Xwedê û balyozê Xwedê, bıla ew dılaşa bıbın, xem nekın" dibêje.

Şivan destûr û dılxawziya jın û keça xwe dıstıne û dadıgere mala pêxamber, gel pêxamber û esaban, nûça bı

xêr dîde pêxamber û gurê Xwedê, wana dîlşa û kêfxwaş dîke, dûra carek dîn vedigere diçe mal, kinc û kolên keça xwe amade dîke, dîke heqibeki û keçik ji lî diya xwe helaliya xwe dixwaze û bî giri lî dû bavê xwe dîkeve, diçe mala pêxamber, lî wê helaliya xwe jî bavê xwe, pêxamber û hemû esaban dixwaze û radeste gur dibe. Gur jî, jî pêxamber û xezûrê xwera spas dîke û keçikê dîde dû xwe û lî pêş çavan de diçe wenda dibe.

Lî nav ew rojê û wê bûyerê de, mehe lî pey hev derbaz dîbin dîçin. Lê jîna şivan her roj digire, qisawet û xema keça xwe dîke. Rojek lî rojan de, lîgel mêrê xwe de rûdîne, bî kelegiri û bî dileki keseri va jî mêrê xwera:

- Mêrik ez bî gori, lî zîkê ev cihan de tenê keçîkek me hebû, mîn ew jî, jî bona xwatîre te, xwatîrê balyozê Xwedê hezreti Mihamed û jî bona fermana Xwedê, da ew gurê Xwedê, ez lî diji fermana Xwedê û daxwaziya we derneketim, mîn dilê we neşîkand, ew hejara xwe radeste we û wi guri kîr. Lê mîn nedîzanibû ku ez usa evqas biriya keça xwe dikim û evqas xemgin dibun. Bawerke, dil û kezewa mîn her dişewite, ez êdî diyax nakim, mîn pîr biriya keça xwe kîriye û ez jî bî derd û qisaweta wê -ku usa bimeşe- zû bimirim. Mêrik me ew hebûna xwe da wi guri, gur ew gurt, bîr çû, gelo gur ew keçîka me çîkîr? Çî ani serê wê rebena me? Gelo kî dîzane ku, gur ew keçîka me çî kîriye, çî aniye serê ew keçîka me? Bibe ku gur ew belengaza me perçe-perçe bîke bîxwe jî, lê qet kesek nîzane. Bî kerema xwe tu jî mînra bîbêje, gelo naha ew keçîka me lî kuye û çî hatiye serê wê keçîka me? dibêje.

Şivan jî bona ew rewşa jîna xwe geleki dîlşîn û xemgin dibe, berxwe dîkeve, dûra jî jîna xwera:

- Keçê bawerke, ez jî mina teme. Ez ku jî tera bîbêjum, ew rebena mîn şev û roj lî xem û xeyalên mînda naçe, lî şevan de ez qet xew nakim, bibe ku tu bawer neki. Dilê mîn jî, mina dilê te dişewite. Divê tu zanîbi, ew çiqas ku keça teye, werqas jî keça mine, ew lî bedena xwe de xwîna

mın dıqşine, ez ji jı bona wê xemginım, berxwe dıkevım, dıl û kezewa mın ji, mina dıl û kezewa te dışewite, balam ez ji mina teme, ez ji nızanım ku, naha ew keçıka me lı kuye, gelo çı hatiye serê wê û gur ew çı kırıye. Jı bona ev ji, ez nızanım ku çı xaliyê lı serê xwe kım, dibêje.

Jın û mêr lıgel hev rûdının, destpêka giri dıkın, ahx û tûx dibên, dûra jınık jı mêrê xwera:

- Ez dibêjum tu bıçı lı pêxamber bıpirsi. Ez bawerım keçıka me ku lı kuderê de be, wê ew dızane, lı ser rewşa keçıka me ji, ew qenc serwext û agadare. Çetire naha tu rabe bıçe ba pêxamber, ev rewşa me jı wıra bıbêje, jı bona çend rojan ji destûrê lı wi bıstine, naha ew keçıka me ku lı kuderêdaye -mırıye, mayiye- ew dızane. Bıla ew rê û şûnê ji, jı tera salıx bıke, tu bıçe ew keçıka me bıbine, jı mınra nûçek bı xêr bine. Jı bona nıhêrina devan ji, bıla qet xem neke. Heya roja ku tu vejeri, ez lı devan bınhêrım û wana bıçêrinım, dibêje.

Şıvan lı ser daxwazi û pêşneyara jına xwe, radıbe dıçe derdıkeve pêşberiya pêxamber, meselê jı pêxamber ra vedıke, dibêje" Ya balyozê Xwedê, ez dıxwazım jı bona çend rojan tu destûrê bıdı mın, ez bıçım ba keçıka xwe, gelo ew lı nav çı rewşêdaye bıbinım, lı ev xem, xeyal û qıswetan felat bım, jı kewaniya xwera ji nûçek bı xêr bınum. Balam ez nızanım ku lı kuva bıçım, rê û dırban nızanım, tıka mın lı te, tu jı mınra rê salıx bıke, rojeki zû ez bıçım, bêm. Jı bona devan ji, tu qet xem meke, wê kewaniya mın lı devan qenc bınhêre û tunebûna mın lı we temaşe neke" dibêje.

Hezreti pêxamber dıbıne ku şıvan pırr berxwe dıkeve, dıxwaze ku bı rojeki zû bıçe keçıka xwe bıbine, gelo mıriye, mayiye pê bıhese û jı bona ew ji, jı jına xwera nûçek bı xêr bine. Jı bona ew, pêxamber destûrê dıde şıvan, rê û şûnê ji bı qenci jı şıvan ra salıx dıke û "de oxır be" dibêje. Şıvan geleki dılşa dıbe, dıçe dest û lıngên pêxamber maçdıke, xwatırê xwe dıxwaze û dadıgere mal, mesela destûr

girtinê ji, jî jina xwera deng dîke, nanek-du nan ji dîke torbe ê xwe, jî jina xwe ji xwatirê xwe dîxwaze û bî lez û rev rêdîkeve dîçe ew cihê ku pêxamber lî wi salix kîriye, lî wê derê de derdîkeve. Lî gor salix kîrîna pêxamber, şivan dîçe bîn çiyaki herî bilînd, lî pêş derê şikeftê de keça xwe dibîne. Çawa ku çavên keçikê lî bavê xwe dîkeve, bavê xwe dibîne, keçik bî dil şabûna xwe va nîzane ku çî bîke û çî bîbêje. Lî şûna xwe de mîna heykeleki dîmine, hunde lî bavê xwe dînhêre û dînhêre, dûra aqîl tê sêri, bî rev û bez bervî bavê xwe bazdîde, dîçe xwe digihêjîne bavê xwe, bî dilşayi bavê xwe hembêz dîke, herdu milên xwe lî dora stuyê bavê xwe dipêçe, bavê xwe maç dîke û bî dilşayiya xwe va dîgire, dûra stuyê bavê xwe berdîde xar dîbe lîng û destê bavê xwe maçdîke, naxwaze ku dest û lîngên bavê xwe lî destên xwe de berde. Lî piştî çend hûrdeman de, êdî şivan pê milên keçika xwe dîgire û jî keça xwera:

- Keça mîn, ez qurban, êdî beşe, megîre, bînhêre ez lîgel teme, de tu ev giriya xwe bîterîkîne, rabe serxwe, ez lî bejn û bala te û rûyê te bînhêrim, gelek wexte mîn tu neditiyî, ez lî hesreta dîtîna hîndava teda mame, dîbêje.

Şivan bî ew şiklî va keça xwe xemrevî dîke, keçik dest û lîngên bavê xwe berdîde û lîgel bavê xwe lî ser kevîreki de rûdîne destpêka rewş û dema diya xwe dîke û dîpîrse. Piştî rewş-dem pîrskîrînê de, îcar şivan lî keça xwe pîrs dîke, dîbêje" keça mîn, gelo ew gurê mêrê te lî kuye?". Çîto ku şivan wê pîrsê lî keça xwe dîpîrse, lî wê demê de keçik pîrr berxwe dîkeve, her xemgîn dîbe û jî bavê xwera:

- Bavo mala te ava, te çîra ev pîrs usa pîrsiya, te jî mêrê mînra got" ew mêrê te ê gur lî kuye". Ax lî serê mîn, naha ez çî xaliyê lî serê xwekim, dîbêje.

Şivan qet manekî nade berxwaketîna keça xwe, dîxwaze ku lî keça xwe bîpîrse, bîbêje" keça mîn çîra tu usa evqas berxwe dîkevi" nîşka ve ew gurê Gewr lî şikeftê de derdîkeve, disa wek cara yekem tê zîman, jî keça şivan ra:

- Jinik tu qet berxwe mekeve, bavê te rast pîrsiya, li ser ev gotin û babetê, heqê bavê teye, ku usa li te bîirse. Lewra bavê te wexta ku ez ditim, wi ez gur ditim. Ez ji bona ev û gur bûyina xwe ji şermezar ninim û şerm ji nakim. Naha tu evana biterikine, bavê xwe fermo hindir bike, ew rêva hatiye westiyaye, ji bavê tera vês û hêsabûn divêt, dibêje û xezûrê xwe fermo hindirê şikefta xwe dike.

Şivan çawa ku dibine gur disa mina miroveki heri bîaqil diaxîfa, ecêb dimine, xwin li bedena şivan de sar dibe, werge li şûna xwe de disekine, nîzane ku çî bike û çî bibêje. Dûra keça şivan pê destê bavê xwe digire û her sê bî hevra dikevin hindirê şikeftê. Şivan li hindirê şikeftê dînhêre disa li nav ecêba şivan de dimine. Ji ber ku, hindirê şikeftê mina qesrek padişan û qralan mezin û fereh, bî neqşên zêr, ziv û diranên fil'an va hatiye çêkîrîn û xemilandin, mina bîhiştê rastin li nav nûrêdaye, mirov qim nake ku, li wan neqşan û ew pêşdariya wê qesra mina bîhiştê bînhêre. Ango mirov dibêje" merî nexwe û veme-xwe, li wê qesrê û pêşdariya wê bîhiştê bînhêre". Piştî rûniştandinê, keça şivan gazi ew mêrê xwe ê dilq gur dike û dibe hindirê oda xwe a razanê, ji mêrê xwe tîka dike ku, ew êdi li dilqê gur de derkeve, xwe û hindava xwe li xezûrê xwe bide temaşekîrîn. Pîrr li ber gur digere, dibêje" tu ku li ev cihan de çî hezdîki, ji bona xwatrê ew, ji bona serê ew, ev postê xwe li ser bedena xwe derxine, bila bavê min te bibine, ew derd, kul û qîsawetên wi nemînin". Lê keçik çiqas ku lava dike, ber wi digere, lê ew napejirine û dibêje" na û na ". Li dawiyê de keça şivan" ez dixwazim tu ji bona ew xatîrê" Mahr" birandîna me, xwe li ev dilqê gur de derxini, bila bavê min te bibine" dibêje û li mêrê xwe tîka dike. Çito ku keça şivan ji mêrê xwe ê dilq gur ra werge dibêje, gur" eywax jinik, te ez li ciheki heri teng da girtim û bêt havil hiştim. Lewra ji bona xatîrê" Mahr" birandînê û wê fermana Xwedê erd û esman radiwestin " dibêje û ew postê gur li ser bedena xwe de derdixine û li

dılqê gur de derdıkeve dıçe lı pêşberiya xezûrê xwe de rûdine. Şıvan lı şûna xwe de xwe şaş dıke û nızane ku çı bıbêje. Dıbıne ku ew qesra lı nav nûra hındava zava ê wida maye, ronahiya hındava zava ê wi, mina ronahiya Roja Zeri şewq dıde, her derê roni dıke. Şıvan pışti ew pêşdariyê êdi jına xwe, qom û qebilên xwe, heval û hogırên xwe, pêxamber û devan, hemûyan jı xwe birdıke, dıbe bengiyê nûra hındava zava ê xwe û lı ew şıkeftê de rûdine û dısekinre. Ew her roj bı dılşa i jı zava ê xwera dıaxıfe, lı nûra hındava wi dınhêre, heyama xwe bı kêfxwaşi debaz dıke. Şıvan wer hute zava ê xwe û nûra hındava wi dıbe ku, êdi ew derbazbûna meh û salan jı nabıne, ferq nake, sal û meh çawa derbaz dıbın, dıçın nızane û hayjı zeman nabe. Bı ew şıklıva çıqas sal derbaz dıbın, lê Xwedê dızane. Keça wi û zava ê wi jı, jı wıra tışteki nabêjın, jına wi a hejar birnayın û xem nakın. Rojek lı rojan de, çito dıbe Xwedê dızane, şıvan jına xwe, heval, hogır, qom û qebilên xwe û pêxamber tıne bira xwe û bı lez radıbe, dıçe ba keça xwe, jı keça xwera:

- Keça mına delal, ez geleki lı mala weda mam, dıvê êdi hûn destûrê bıdine mın, ez dagerım mal lıgel dıya te, naha ew tenêye, mın xem dıke, berxwe dıkeve, çı dıbe, çı nabe, çêtıre êdi ez dagerım mal, dıbêje.

Lı ew demê de keçık jı berxwe dıkeve, lewra ew jı naxwaze ku bavê wê bıçe. Dûra dıya wê tê bira wê û jı bavê xwera dıbêje" bavo destûr dayın ew karê Xwedê ye, tu piçekı aram bıke, ez bıçım ev meselê jı zava ê tera jı bıbêjım, bınhêrım ew çı dıbêje û gelo mabesta wi çıye. Dûra em bı hevra bıryar bıstınım û te rêkın". Ezbeni keçık dıçe ew meselê jı mêrê xwera dıbêje, ew jı" destûr dayın heqê Xwedê'ye" dıbêje û herdu hevra bıryar dıdın ku êdi ew şıvan şıva bışınım. Beri ku gur xezûrê xwe rêke, sê loqman dıde xezûrê xwe, jı xezûrê xwera usa dıbêje:

-Xezûrê delal, tu me bıborıne, qısûrek me ku heye, efû bıke, me ewqas karguzari jı tera nekır. Naha ez sê loqme

xwarın dıdıme te. Jı van loqman yek, ê teye, fermo bistine, ev herdu loqmeyên dın ji, bı kerema xwe tu yeki bide hezreti pêxamber, yeki ji bide hemû esaban, bila ew lı nav xwede parva bıkın, bıxwın.

Şıvan wan sê loqme xwarın dıgire, xwatırê xwe dıxwaze û bervı mala xwe rêdıkeve, tê nêzıka bajarê Mekkê, ku ewe jınıkek pırekal lı ber devane, devan dıçêrine, hemû deve lı hev belav bûne, ew jınıka kal nıkare ku wan devan bine ba hev, lı ciheki de kom bıke, dıgire û dıgazine, dıl û kezewa mirov dışewıtine. Şıvan çıto ku wê rewşa jınıka kal dibine, guneyê wi lı jınıkê tê, jı jınıkêra arıkari dıke, hemû devan berhev dıke tıne lı ciheki de dıde sekınandın û lıgel jınıkê de rûdıne, lı jınıkê dıpırse, dibêje" pırê ma qet keseki te tune ku ew jı tera arıkari bıke? Tu jınek kalı, deve çêrandın karê te nine, ev kar, karê cıwanane. Jınıka pır, dısa destpêka giri dıke û jı şıvan ra:

- Ez çı bıkıım bırayê delal, lı darê ev cıhan de tenê keçek mın hebû, mın û mêrê xwe jı bona fermana Xwedê ew keçıka xwe me da gureki çıyan. Dûra mêrê mın lı ser daxwaziya mın rêket çû ku ew keçıka xwe bıbine, gelo ew çıbû, gur çı anı serê wê keçıka me a belengaz û reben, lê sed mıxabın ku, mêrê mın jı çû, ew jı şıva nehat. Ez jı usa jı deveyên pêxamber ra şıvantıyê dıkım, balam rewşa mın ne rewşe dibêje.

Çıto ku şıvan wan gotınan dıbihise" hey wax, ev jınıka mıne, gelo lı navbera çüyına mın de çend sal derbaz bûne, ku ez qet hayjı zeman nebûme" dibêje û bı bédeng lı şına xwe de radıbe, xwe bı xwera dibêje çêtıre ez bıçım ev spartınan bıdıme pêxamber û esaban, dûra vegerım bêm ba jına xwe, rewşa keça xwe û zava ê xwe jı jına xwera deng bıkıım. Şıvan werge jı dıke. Dıçe wan loqman radeste pêxamber û esaban dıke û dadıgere cem jına xwe, ew nûça bı xêr dıde jına xwe û jına xwe dılşa û agadar dıke. Lê wexta ku ew esabeyên pêxamber ew loqme lı nav xwe de parve dıkın dıxwın, hemû ecêb dımının, lı tama ew loqme

têr nabın. İcar hemû lı dilên xwe de dibêjın" keşka mın keça xwe bıdana ew guri" lê kar lı kar derbaz dıbe. Ev çirok ji usa dawı dibine. Naha we ev tıştana bihistın? evana hemû hêkmetên Xwedê'ne, divê hûn lı van tıştan bawer bıkın, dıgot Seyid Weyis.

Belê, zava û pısmanê minê hêja, naha ez lı te pırs bıkıın, gelo lı gor birûbaweriya te evana rastın? Zava ez qurbam, mırov qet lı tıştên usa bawer dıke?. Lı gor gotınên Seyid Weyis ew gur mılaketeki Xwedê bûye, Xwedê ew kıriye dılgê gur şandıye meclisa pêxamber, ku lı dilên wan esaban bınhêre, gelo dilên wan çıqas lı Xwedê bawer dıkın û çıqas paqjın, felan-bêvan. Ev çı derewın zava, qenc bıhênije. Ango ew mılaketê Xwedê ketiye dılgê gur, çûye serê xwe daye ser şêmûga derê pêxamber, bı fermana Xwedê keça pêxamber jı pêxamber xwastiye, dûra ew şıvanê pêxamber keça xwe daye ew gur, lı pey ew şıvan çûye lı şıkeftê de ew qesra mina bihişt ditiye, wi guri ew postê xwe lı serxwe derxistiye, şıkeft lı nav nûr û ronahiyê de hiştiye, nızam qet hayjı xwe nebûye ku lı navbera ew çûyinêde çend sal derbaz bûne, çawa ewqas kal û kokım bûye, nızam hemû esabe lı tama ew loqme têr nebûne, poşman bûne, nızam çı û nızam çı. Zava êdı bese lo, lı xwe bıhese, lı xwe pırs bıke, bıbêje" ez lı kijan qurnê de dıjim". Baweriya xwe lı tıştên usa meyne. Bawerke derewên usa çek û sileyên kedxwariyê û xeşimiyê ne. Lı roja derketına sazûmana serdestan de ev derewana derketine, ew çına kedxwar ev derewên usa lı tev xwe meşandıne, anine gıhandıne ev roja me.

Xıd geleki hêrs ketıbû, nedızambû ku jı bûrayê xwera çı bıbêje û çı bıke, dûra lı şûna xwe de rabû se xwe û jı Aliekber ra:

- Bınhêre Aliekber ev e êvar bû, tu rabe em pêz û dêwêr dagerinın gund, bıçın mal, lı mal de em disa jı hevra bıpeyvın, disa tu ew çirokên xwe jı mera bıbêje, bıla xwişka te ji lı te guhdar bıke, gotınên te bıbihisi, got û

gazi kurê xwe kır, ku ew ji li şûna xwe de rabe, bı hevra pêz û dêwêr kombikın û pêz û dêwêr êdi dagerinın gund. Lı zıkê neh-deh hûrdeman de pez û dewar komkırın û dageriyan gund, pez û dewarên gundiyan radeste gundiyan kırın û ew ji ghiştın mala xwe.

Melek û Xec ji li benda wan de mabûn. Melekê çawa ku bırayê xwe dit, disa:

- Aliekber ez qurban, roja te çito derbaz bû, got. Aliekber ji, ji xwişka xwera spas kır û kete hındır. Melekê disa pilava sawarê patıbû, lowık û kundırên hışk ji kırıbû nav sawarê, werge li benda şiv xwarinê de mabû. Pışti hatına herdu Xıdan û Aliekber, Xeca xwişka Xidê sıfre amade kır û hemû bı hevra li dora sıfrê de kombûn. Aliekber çend kevçi sawar avit devê xwe, balam fırşika Aliekber li navhev ket, xwarın terıkand. Lewra Aliekber kundırên hışk heznedıkır. Lı Aliya dın de sawar bêt sorxaç û bêt rûn bû, mirov dıgot" ew pilava sawarê rıciye, qet rûn têda tune-ye". Çito ku Aliekber xwarın terıkand, Melek li berxwe ket û pırsiya:

- Çıra te nexwar bırayê delal?

Aliekber:

- Hûn mın bıborinın, bawerkın micêza-iştah-mın tune lewma, got û kursiyê xwe şuva kışand ber diwêr, pıšta xwe ji da diwêr û werge li şûna xwe de li benda neferên malê de sekını, ku ew ji xwarına xwe bıxwın û disa tışteki bı hevra bıaxıfın.

Herdu Xıdan, Xec û Melekê zıkên xwe têr kırıbûn, balam ji bona Aliekber berxwe dıketın. Ji ber ku wi geleki kêm xwarıbû. Dûra Xidê mezın çû li kêleka Aliekber de rûnişt" te iro gelek tışt gotın, hêrsa mın rakır, naha ji te xwarın nexwar, bêtır hêrsa mın rabû. Tê kıfşê, ku te çıra pilava sawarê nexwar. Lewra pilav wek xwarınek rıci bû lewma. Ez ji bona ev ji tera nıkarıbım tışteki bıbêjum, lewra xwişka te ji bona rûn zef temayiyê dıke, rûn ji bona mivanan hıltine, hındê ew súcê wêye" got û du-sê êzing

avit ser agir, piçeki şewq gurr kır. Lewra lı malê de gaz tunebû, lı ber ronahiya agir de rûdınıştın. Pışti demek kurt de Xıd disa dageriya ser Aliekber, jı Aliekber ra:

- Kuro te iro çı digot? Tu çıra dji gelek tıştan derdıkevi? Ma tu lı hemû axa û mirên me Kurdan bıaqlırtı ango? Lı hemû serokên eşirên me, şêx û seyidên me Kurdan qenc bınhêre, ew hemû birûbaweriyên xwe lı wan çirokan û wan kırametan tinın, lê tu lı wan kıramet û çirokan qet bawer naki, çıra? Tu hina zarokê duhuniyi, jı mınra dı-bêji, ew gotınên seyidan û ew çirokên wan hemû derewın, dermanê mêjo şoştınêne, hecetên berdestiyê û xulamiyêne, nızam çıne û çı ninın". Jı tera ez rasti bıbêjım Aliekber, ew gotınên te lı mın xwaş nayên. Tıka mın lı te, carek dın wan tıştan jı mınra mebêje, dji seyidan û kırametên wan dermekeve, naha bû bûrayê delal? got û dengê xwe bırand.

İcar dor hatıbû Aliekber, lê nedıxwast ku pırr tıştan bıbêje. Lê bı dengeki nızım û bı rûkeni:

- Zava ez birûbaweriyên xwe jı tera dıbêjım, ez jı tera tıştên berbıçav temaşe dıkım, lê tu disa naxwazi bıbını, naxwazi bawer bıki. Ez jı tera carek dın jı bıbêjım, hınek kes hene zef derewan dıkın. Ez nabêjım hemû wek hevın, hemû derewan dıkın, lê yên ku derewan dıkın -tu mın bıborine- ew jı gelekın. Seyid Weyis jı, yek jı lı wane, naha bû? Bınhêre, êdı ez naxwazım em hevûdu bıêşınım.

Lı wê navberê de Melek jı kete nav ew gengeşıya Ali-ekber û Xıdê mêrê xwe û jı bırayê xwe Aliekber ra:

- Bınhêre bırayê delal, tu pırr qenc dızanı ez çıqas lı te hezdıkım, balam carna tu bıhna mırov teng dıki, mırov nızane ku jı tera çı bıbêje. Tu hati mala me mıvandariyê, lê tu nehati ku jı mera şer bıki û dji birûbaweriyên me û dji Pir û rayberan derkevi, bıbêji" ew derewan dıkın, derewçının" nızam çı û nızam çı. Kuro dıvê tu qenc zanı-bı, ev cıhan ku, iro usa dısekıne, jı bona rû gıramiya seyidan û kırametên wan seyidan dısekıne. Lı navbera wan

û Xwedê de peywendiyên taybeti hene, Xwedê guh dide gotinên wan û guhdare wan dike. Qenc bifikire birayê delal, bibine hindava Roja Zeri û Hiva Zeri, ew çito şewqê didim ev cihana me. Eve, ronahiya Roja Zeri, rû û hindava Eli, ronahiya Hiva Zeri ji, rû û hindava Mihamed'e. Pir û Rayber ji newiyê Eli û Mihamed'ın gotinên wan, gotinên Xwedê ne, kuro tu ciwani, ma qet tırsa te lı Xwedê tune? Mın lı destpêkê de ji, jı tera gotibû, carek dın ji, jı birayê xwera bibêjım, ez qurban, evan tıştan mebêje, jı tera guneye, Xwedê neke tıstek tê serê te. Çêtire tu dilê seyidan û Xwedê lı xwe neêşini, xwe piçeki biguhêrini. Lı ew demê de, em ji dilşa dibın, dilê Pir, Rayber û Xwedê ji şadıbın. Naha te ez fêmkırım, ez çı dibêjım, got û dengê xwe birand.

Aliekber dixwast ku ji zava û xwişka xwera mina hevaleki dilsoz û mina keseki şareza bipeyiva, hın tıştan lı wan bide fêmkırın, lê ew ne keys bû. Lewra lı navbera wande çiya û deryayên Okyanûs hebûn. Hesinên wan ji mina hev nebûn. Her yek bı cûreki hatibûn kutan û avdan. Yek bı jengin bû, yek ji mina Gewher diburuçiya. Lı ew bédengiyê de Aliekber bı kûrayi dihênjiya û bı xwe bı xwera" Hesın ku neye xebitandın, wê ew jeng bigire". Ev gotinên mın ji bibe ku hesinê xwişka mın û zava ê mın bı kar bine, bide xebatê, ronak û geş bike" dıgot. Lê disa ew ne keys bû, jı bona ew wext zû bû, zeman dixwast. Pışti gelek bédengiyê de, Aliekber berê xwe guhart aliya xwişka xwe, jı xwişka xwera:

- Xwişka mina delal, ne pêwiste ku em ji hevra şer bıkın, jı hevûdu ra hêrs bikevın, dilên hevûdu bêşının. Beri her tışt divê tu zanıbi, tu dayiki. Lı ev cihan de her tışt lı destê dayikê de destpêdike, hemû tışt karpêkên dayikêne. Lê dayikên Netewe ki, ku xeşım û nezan bın, wê ew Netew ji xeşım û nezan dımine, dibe berdest û xulam, lê ku dayikên Netewe ki, ku şareza û şarweri bın, wê ew Netewa ji dibe Netewek şareza, pêşverû û şarweri. Bınhêre xwişka delal,

tu ku usa li nav nezaniyê de bisekîni, wê zarokên te ji li nav xêşimi û nezaniyê de mezın dıbin, rê û rêgehên rast ji xwera nabinın, dost û dijminên xwe li hev cûda nakın, dıbin berdest û xulam, dıbin şıvan û gavan ji mir û axan ra kar dıkın. Li rewşa me Kurdan bı qenci binhêre. Çıra nijadek mina Kurd ketiye ev rewşê? Çıra em iro bûne berdest û xulamê Tirk, Ereb û Faris'an? Wan çavên xwe çar veke û li me û Tıkan, li me û Ereban û Faris'an binhêre, lê bêt derew, bejn û bala me, çav û biriyên me, li ên wan pırr-pırr çêtırın. Bejna Kurdeki qasa du Tırkane, lê disa ji em Kurd li bin destê Tirk de dijın, çıra? Ji ber ku em nezan, bêt zanyari û bêt perwerde mane. Pıraniya zanayên me ji li tev dijminan xebitiyane, bûne yarê dijminan. Çıra mirov bıbe berdest û şıvanê mirov? Divê mirov ji mirov ra weka mirov xızmet bıke. Çıra mirov, mirov bıkuje û heqê mirov bıxwe? Çıra yek bıxwe û hezar ji li wi binhêrın? Divê her mirov qasa hêza xwe, li gor huner û gevıla, ango kabiliyeta xwe, ji mirovatiyê ra, ji civata xwera xızmet bıke, ne ku bıbe xulam û berdest ji kesan ra bı zêktêri bıxebite, keda xwe bıfroşe. Çıra hın kesên teral li ser pıšta hejar û belengazan de bıjin û dewranan bajon, çıra? Çıra kesên wek mir, axan, şêx û seyidan li nav hebûnan de bıjin, bıxwinın, mezın bıbın, li kêfa xwe binhêrın û derewên bêt doçık bıafırının? Çıra ew ji gelê xwera rastıyan nabêjın? Çıra ew nahêlın jın, keç ji bıxwinın? Çıra ew ji gelek jınan ra dızewıcın û jınan ji xwera dıkın wek haceteki erzan û bêt hêja? Çıra ev neheqiya li nav jın û mêran de hebe? Divê êdi mirov pêşiya ev neheqiyan bıgire, êdi evana besın. Ma çıra em li bin destê Tirk, Ereb û Faris'an de bıjin? Divê ez li we bıpırsım, çıra em li ev rewşêdane? Gelo sedemên ev bındestiya me kine û çine?. Ango mirov dıxwaze gelek tıştan bıbêje û pırs bıke, balan navçe tune, ez çı bıkıım. Ango em ji hevra yar nının. Mırov li pırr meselan dınhêri, çirokan guhdar dıke û şıvovekırına wan çirokan dıke, dıbıne ku pıraniya wan

meselan û çirokan derewın. Ew çirokên ku, bingehê wan xwe dıgihêjine metafizik û Ol'an, ewana hemû afirandinên sermiyandarının. Wan kedxwaran ewana ji bona maf û berjewendiyên xwe ji hejar û belengazan ra afirandine. Binhêre xwişka delal, ez dixwazim tu min qenc guhdar biki, guhên xwe qenc bîdi ser min û hêrsnekevi. Ango em ji hevûdura meqeherin, xeyidandin tune. Ez ji wera nabê-jum hûn li hindirê rojeki de werin guhêrandin. Na. Lê a qenc ewe ku em hevûdu guhdar bıkın, gramiyê bîdın gotinên hevûdu, piçeki bî tolerans tevger bıkın, ku em pêşva bıçın, em tıştan fêr bıbın. Seyid Weyis gelek tıştên derew dıgotın. Wan derewan ji bala min dıkişand, balam gel ew guhdar dıkır. Lê tıştê heri balkêş û ecêb, cıvatê dıgot" Seyid Weyis zor zanaye, mıroveki heri kûre, hemû tıştên ser erd û bın erd dızane". Seyid Weyis ji cıvatê ra usa dıgot" Ezbeni mıroveki Seyidi Sadet, Ewladı Resûl, li ev cihan de çiqas gunekar dibe, bıla bıbe, lê ew li roja maşherê de, divê şefaate bıde heftê hezar kesi". We ev gotına baş bihist xwişka min? Lê bêt derew, Seyid Weyis eynen usa dıgot. Ango Seyid ku dızıyê bıke, mırovan bıkuje, helal-heran nebêje bıxwe, bı çavê gemarin li namûsa mırovan ji binhêre, derewan bıke, heqê kesan betal bıke, lê disa ji, li roja maşherê de-lê ku heye-divê şefaate bıde heftê hezar kesi. Êhh, ez qurbana we zava, xwişka delel, qet tıştên usa dibe? De hûn ji mınra bıbêjın.

Pışti pırsa Aliekber, Melekê ji bırayê xwera:

- Dibe kuro, çira nabe, ew seyidın, ewladê Resûlın, Xwedê ew werge afirandine û ew fermana daye wan. Ew kesên ku li seyidan bawer nekın ji, ew kafırın, got û dengê xwe bırand. İcar Aliekber diyax nekır, bersiv usa da xwişka xwe:

- Lê-lê maşewitiyê ev çawa dibe? Mala te xırab be ha, ma ew ji mina min û te û mina herkesi neh meyini, xudan dayik û bav, xudan çav û rû, dev û poz û eyni beden nının, diya min?. Ma ew ji mina herkesi qûlê Xwedê

ninin ? Ma Xwedê ew çito bî taybeti afirandîne? Ma çikê wan lî ê min û te zêdetire? Na-na xwişka mîn, evana hemû derewîn. Naha ez carek dîn lî te bîpîrsim, ma kê Xwedê ditiye? Ev yek. A duwem: Xwedê ew tiştê jî kê ra gotiye û kê bihistiye? Divê tu bawer biki xwişka mîn. Lî ev cihan de, ew kesê ku Xwedê ditiye, ew kesa tune, ew gotîna çirokî, ew kesên ku ev tiştana gotîne, wana jî bona berjewendiyên xwe lî berxwe derxistîne, derewên bêdî qirîne, got.

Melekê bî kefa destê xwe va çavên xwe mîsda û jî bî-rayê xwera:

- Towe-towe bibêje bîrayê delal, haşa-haşa Seyid derewan nakîn, ev yek. A dudu: Ew kesên ku Xwedê ditîne ew lî nijada seyidan de gelekî zêdene û ew kesana hene, divê tu bawer biki û nebi kafîr, jî tera guneyê, got. Lî pey ew rîka Melekê, îcar Aliekber:

- Erê-erê xwişka mîn, bîsekîne û tu guhê xwe qenc bîde ser mîn, Seyid Weyis jî bona we jînan jî çirokek herî gîring afirandiye. Ez bawerim naha ez ku jî tera ew çiroka wî jî bîbêjim, tu pîrîr dîlşa bibî, wê kêfa te bê. Jî ber ku ruhê xulamtiyê bî metodên Oli û metafîzîkî va kîrîne nav xwîna we, hûn bûne nokerê mêran. Ango mêr çî bîbêjin, hûn bîpejîrînin, bibêjin "erê raste, ev fermana pêxamber û Xwedê'ye". Bî kurtasi lî jîyana mirovati de, hîn mafperastan gelek çîrok jî bona we jînan û gelên hejar û belengaz derxistîne. Karê we jînan tenê zarok anîn, lî aşpêjxanê de nan û xwarîna patîna, mal paqîjkîrîne û êvar-êvar jî divê hûn bîkevîna hembêza mêran û kêfa mêran bînin, mêr çî bîbên û çî bîxwazîna, divê hûn bîbên" erê " û fermana wan bînin cih. Jî ber ku hemû dek û dolav bîrîne jî Xwedê va gîrêdane û bî çîrokan va jî mêjîyên we şoştîne. Lî pey ew gotîna Aliekber de, îcar Melekê usa got:

- La-law evqas dîrêj meke, bibêje jî mînra, bî rasti Seyid Weyis jî bona me jînan çî çîrok derxistiye, an jî gotiye?. Lî pey ew reaksiyona Melekê, îcar Aliekber:

- Belê-belê, de bisekin, ez jî xwişka xwera bibêjim, balam ez qet naxwazim hûn gotinên min bibirin, peyman ev e bû?

- Erê lo bû, soz. Lî pişti soz dayina Melekê de, Aliekber:

- Ê başe xwişka min, de hûn guhdar bîkin, binhêrî Seyid Weyis jî bona jinan çî çirok dîgot. Dîgot rojeki keça hezreti Mihamed Ana Fadime, çûye lî kêleka bavê xwe de rûniştiye, jî bavê xwera" bavo ez dixwazim lî te tîşteki pîrs bikim, lê divê tu jî minra rasti bibêji".

Xîd û Melekê bî hevra:

- Kuro tu dixwazi çî bibêji? Ango pêxamber lî jiyana xwe de derew kirine, ku keça wi Ana Fadime jî bavê xwera gotiye "divê tu jî minra rasti bibêji" flan-bêvan, haşa-haşa kuro, evqas pêşva meçe, jî tera guneye. Jî bona ew reaksiyonê, Aliekber usa got:

- Binhêrî we peyman çirand. Min jî wera got, ku soz birandî tune, we jî got" erê " soz da. Lê we tewat nekîr ku ez çiroka xwe bîqedinim. Carek dî jî wera dibêjim, soz birandî, peyman xerîtandî-bozmak-tune. Herwaha, pêxamber jî keça xwera dibêje" pîrske keça min, ez bersiva pîrsa te bîdîm, dilê te şabîkîm". Pişti ew gotîna pêxamber, vêca Ana Fadime jî bavê xwe pîrs dîke, dibêje" bavo tu balyozê Xwedê'yi, her tîşt lî te eyane û tu qenc dîzani, gelo lî ev cihan de qet jînek mina min jî mêrê xwera qenc, dilsoz, xîzmet û azet heye, yan tune? Ev yek. A duwem: Gelo disa lî ev cihan de, ew kijan jîne ku lî beri min diçe bihiştê ?".

Lî pey ew pîrsê icar Mihamed:

- Belê keça min, ew jîna ku jî te bêtir jî mêrê xwera qenc, dilsoz, xîzmet û azete, ew jîna ku lî beri te biçe bihiştê heye, çawa tune, dibêje.

Lî pişti ew gotinên Mihamed de, Ana Fadime bêtir perwa-merak-dîke û jî bavê xwe disa pîrs dîke, dibêje" bavo ew jînika jîna kijan mêr û mêrxwasiye ? Nijada wê

jinikê çiyê û ew jinika lî kuderê de, lî kijan gund û bajari de diji?". Dûra lî bavê xwe tîka dîke û dibêje"bavo divê tu navnişana wê jinikê bîdî min, ez dixwazim biçim wê jinikê bî çavên xwe va bîbinim". Lî ser daxwaziya Ana Fadime, pêxamber navnişana ew jinikê dîde keça xwe Ana Fadime û dibêje" biçê bîbine, dûra bîyara xwe jî minra bîbêje.

Belê, Ana Fadime rojtira dîn, lî ser salixdana bavê xwe, lî sibê de zû radibe serxwe û rêdîkeve diçe gundeki piçûk lî pêş derê maleki de derdîkeve. Dînhêre ku deriyê malê dadaye, qet dengê jî lî hîndîrê malê de dernakeve. Tîştê herî balkêş jî, ewe du-sê nan lî ser paçeki, lî bîn tava rojê de raxistine, cerekî avê jî disa lî bînê tava rojêdaye, bêdengiyek berdewame. Îcar Ana Fadime ecêb dimine, qet maneki nade wan nanan û cerê avê, diçê pêş dêri lî dêri dixine, dêri dikute û dibêje" êyy kes lî ev malê de tune? Vêca lî hîndîr de jinikek bersivê dîde Ana Fadime û dibêje" tu kiyî, hati jî bona çî û tu çî dixwazî?" Lî derva Ana Fadime dibêje" ez keça Mihamed pêxamberê Îslam, Ana Fadime'me, hatime ku te bîbinim û jî tera piçeki bîpeyivim". Îcar lî hîndîr de jinik usa bersivê dîde Ana Fadime, dibêje" tu min bîborine, çu nûçe a mêrê min lî ser ev hevdiîna me tune. Jî bona ev, ez nîkarîbim jî tera dêri vekim û lî tev te rûnim û jî tera bîpeyivim. Çêtire tu biçê mala xwe, îşev ez jî bona hevdiîna me destûrê jî mêrê xwe bîstinim, sibê bî kerema xwe carek dîn were em hevûdu bîbinim". Lî ser ew bersivê Ana Fadime bêt havîl dimine û bî xemgîni dadîgere mal. Rojtira dîn îcar kurê xwe ê mezîn Hesen jî dîgire ba xwe, disa rêdîkeve diçe ew gundi, mala wê jinikê. Disa dînhêre ku, ewe derî dadaye, du-sê nan û tev cerê avê lî bîn tava rojêdane, pêşdari eynî pêşdariye. Ana Fadime disa nêzîka dêri dibe, dêri dukute, dibêje" êyy kes lî ev malê de heye, yan tune?". Lî hîndîr de disa dengê" fermo Ana Fadime, ez lî maldame, berî ku ez jî tera dêri vekim, divê ez disa lî te bîpîrsim, gelo tu tenêyî, an jî kes-mes lî tev te hene, tunenin?". Ana Fadime

dîbêje" xwişka mın, bı rasti ez ne tenême, kurê mın Hesên ji lîgel mîne, em hatîne ku te bîbinim, piçeki jî tera bîpeyivın û biçin. Bawerke ez naxwazim te pırr mijûl bikum û zamanê te bîstinim". Lı pişti ev gotinên Ana Fadime de, icar jînik usa bersivê dîde Ana Fadime:

- Diya mın tu keça pêxamberi, ez naxwazim dilê te biêşinim, lê divê tu mın bîborini, mın jî mêrê xwe tene destûra te standiye, balam ê kurê te nestandiyê, tu qisûrên mın menhêre, mın bîbaxşine, ez nîkaribim dêri jî tera vekim û te bîbinim. Çêtire tu dager mala xwe, işev ez destûra kurê te Hesên ji lı mêrê xwe bîstinim, sibe tu tev kurê xwe carek dın keremke were em hevûdu bîbinim, dîbêje û dengê xwe dîbirine.

Belê, Ana Fadime dibîne ku jînik qet naxwaze ku, bêt destûra mêrê xwe tişteki bîke û tişteki bîbêje. Jî bona ew tevgera jînikê ecêb dîmine. Lê disa jî dengê xwe dernaxine û kor û poşman dadigere mal û bî kûrahi dîhîzire, dîfîkîre, bı xwe bı xwera" bı rasti jî, ez jî mêrê xwe Eli'ra, weka ev jînikê, evqas dîlsoz nînim, jî bona her kareki piçûk jî Eli destûrê nîstinim" dîbêje û roja sêyem de, icar kurê xwe Husên ji lı tev xwe dibe, lê jînik disa eyîni tîştan jî Ana Fadime ra dîbêje û dêri jêra venake. Welhasil lı dawiyê, roja çaran de, jînik destûra hevdiîna Ana Fadime û du kurên wê lı mêrê xwe distîne û dêri jî Ana Fadime û du kurên wêra vedîke. Ana Fadime çawa ku dîkeve hîndîrê mala wê jînikê, xwe şaş dîke, ecêb dîmine. Dibîne ku jînik şîlf taziye, ewe lı ber piçêriga agir de rûniştiye, desteki xwe daye pêşiya xwe, ê dın jî daye ser singê xwe, werge sekîniye, lı paş dêri de jî ewe çoyeki gîrs û stûr heye, lı bîli ewana qet lı hîndîrê malê de tişteki tune. Pişti çend hûrdeman de, Ana Fadime lı jînikê pîrs dîke, dîbêje" xwişka delal ev çı rewşe tu lı navdayi? Çıra tu usa tazi û şîlfi? Ma çıra te ew nanana û cerê avê danîne ber tavê? Karê ev çö çiyê, ku te ew daniye paş dêri?. Jî bona pîrsên Ana Fadime, jînik usa bersiv dîde:

- Em malbatek her hejarın, zarokên me ji nebûn. Mêrê min miroveki şivane. Jı bona xwekirinê tenê kiraseki me heye, ew ji mêrê min xwedike. Lewra ew lı dervaye, lı bın tava rojê, lın bın berf û baranê de dewar û pez dıçêrine. Ku ew wi kirasi lı xwe neke, wê tav wi bışewıtine, berf û baran wi bıqerisine, wê ew naxwaş bıkeve, bêt mecal bumine. Lı rewşek werge de, gelo ki lı me bınhêre û em doliwa xwe çito bımeşının? dıbêje, ew jınıka.

Lı pışti ew bersiva jınıkê, icar Ana Fadime disa lı jınıkê dıpirse, dıbêje" lê ku rewş usaye heqê te heye tu usa bıki, balam ez dıxwazım lı ser ew nan û ava der û ev ço ê paş dêri de serwext bıbım, gelo te çıra ew nanana û cerê avê dane bın tava rojê û çıra te ev ço a daye paş dêri werge lı hındır de daniye?". Jınık usa bersivê dıde:

- Başe, ez bersiva ev pırsên te ji bıdım dıbêje û usa axaftına xwe berdewam dıke. Bınhêre xwişka mın, tu keça pêxamberi, lı mın baştır ji her tışti dızani. Çı dıbêjın? Dıbên" Mırışk-mırışke, avê vedıxwe, serê xwe radıke lı Xwedê dınhêre" eyni usa. Naha saldem havine, mêrê mın lı derva bın tava rojê de ber dewar û pêzdaye, ew ava germ vedıxwe, nanê wi lı torbe de hışk dıbe, ew werge wi nanê hışk dıxwe. Lê ku mêrê mın nanê hışk bıxwe, ava germ vexwe, ez ji lı malda nanê nerm û ava sar vebıxwım, Xwedê ev napejırine, ev guneye. Jı bo ev e ku, ez ji nanê xwe hışk dıkım dûra dıxwım, ava xwe ji germ dıkım werge vedıxwım. Sedema ew nan û ava der ev e. Lı vır em daggerın ser mesela ço. Ço ji bı taybeti mın daniye paş dêri. Bıbe ku mêrê mın ji bona tışteki hêrs bıkeve û hêrsa xwe lı kesi daneyne û dagere mal hêrsa xwe lı ser mın dayne, bıxwaze mın bıkute. Jı bona ev ji ez naxwazım mêrê mın lı rewşek usa de lı çoeki bıgere û bıkeve zemetan, bêtır hêrs bıkeve û bıxeyide. Mın ev çoya daye ber çavan, ku lı rewşek werge de, mêrê mın lı çoyeki negere û nekeve zemetan, zû bıbine û mın bıkute, dıbêje ew jınık.

Lı pışti ew gotinên jınîkê de, Ana Fadime bı hêdika radibe serxwe, jı jınîkêra spas dıke, xwatırê xwe dıxwaze û lı tev du kurên xwe derdıkeve der dıçe mala xwe û carek dın wê jınîkê û hemû ew tevgerên wê jınîkê tine ber çavan û dıkeve nav ecêba gıran. Bı xwe bı xwera" heqê bavê mın heye, cihê ew jınîkê bıhişte, dıvê ew lı beri mın bıçe bıhiştê. Jı ber ku, ew tıştên ku ew jınıka jı bona mêrê xwe dıke, ez jı mêreki wek Eli ra nakım" dıbêje.

Lı nav wê hevnasiya Ana Fadime û wê jınîkê de çendek derbaz dıbe, nabe, ew jınıka belengaz nexwaş dıkeve û dımire. Nûça mırına wê jınîkê gelek kesan berxwe dıxine û hemû kes radıbın dıçın ku gora wê bıkolın, meyitê wê rabıkın û wê jınîkê çalbıkın. Hezreti Mihamed ji, jı bona mırına wê jınîkê zef berxwe dıkeve û gazi keça xwe Fadimê dıke û bı hevra rêdıkevın dıçın ser meyitê wê jınîkê. Pışti gor kolandın û amadekırına hemû şert û tışdan de, icar gel meyit radıkın dıdın ser mılan û bervı gorê dıbın. Hezreti pêxamber û Ana Fadime ji lı tev gel dımeşın. Lı wê meşê de yekcar Hezreti pêxamber şevqe ê xwe lı ser serê xwe de radıke, pışti çend hürdeman de, disa şevqe ê xwe dıde ser serê xwe. Lı pey ew, Ana Fadime lı bavê xwe dınhêre ku, ewe bavê wê Hezreti pêxamber lı nav gel de, lı ser tılıyên lingên xwe de dımeşe, qet paniya xwe nade ser erdê. Dûra wexta ku meyitê jınîkê dadıxının, dıkın gorê, lı wê gavê de ji, disa yekcar Hezreti pêxamber" Yarebi tu Gafûrû Rahimi" ango ya Xwedê tu mezını, bıborine, dıbêje. Dûra jınîkê çal dıkın û herkes lı wê belaw dıbın û dıçın malên xwe. Lê wexta ku Hezreti pêxamber lı tev keça xwe Ana Fadime dadıgerın dıçın mal, lı mal de Ana Fadime jı bavê xwe pırs dıke, dıbêje" bavo te çıra, wexta ku gel meyitê wê jınîkê bervı gorê dıbir, şevqe ê xwe derxıst? Çıra tu lı ser tılıyên lingên xwe de dımeşıyay? Çıra wexta ku meyit daxıstın gorê te got" Yarebi tu Gafûrû Rahimi" gelo ewana jı bona çı bûn? Bı kerema xwe jı mınra bıbêje. Hezreti pêxamber usa bersivê dıde keça xwe,

dibêje" Ya Fadime, mın şevqe ê xwe jı bona rama Xwedê derxist. Lewra wexta ku gel meyitê wê jınikê bervı gorê bır, Xwedê rama xwe lı ser wê jınikê de barand. Mın jı şevqe ê xwe derxist ku, rama Xwedê piçeki jı lı ser serê mın keve, serê mın jı bı rama Xwedê va şıl bıbe. Ez lı ser tiliyên lingên xwe de meşiyam, lewra lı jor de werqas hûri û melekên Xwedê hatın, ku cih nema ez lı ser tevayiya lingên xwe de bimeşım, ez bêt havıl mam û lı ser tiliyan meşiyam. Wexta çalkırına meyitê wê jınikê de ji, mın got" Yarebi tu Gafûrû Rahimi". Lewra wê jınikê lı hemû jıyana xwe a zewaci de, şeveki piştı xwe guhêrandıbû mêrê xwe. Jı bona ew kêmasiya wê jınikê ji, Xwedê mılaketeki heri xışm şandıbû ser gora wê jınikê, ku ew mılêketa cezaeki bıde wê jınikê. Wexta ku ew mılêketê Xwedê bı xışm û êriş va hat ser gora jınikê, lı wê demêde ez lı ber Xwedê geriyam, ku ew wê qısûra jınikê bıborine, efû bıke. Lı ser ew daxwaziya mın ji, Xwedê ew kêmasiya wê jınikê efû kır, ew mılêketa ji şıva dageriya çû. Ango sedema şevqe derxistına mın, sedema lıser meşa tiliyan û gotına mına lı ser gorê, hemû evana bûn keça mın.

Lı kutabûna ev çirokê de, Aliekber dageriya ser xwişka xwe Melekê, jı xwişka xwera:

- Naha ez lı xwişka xwe pırs bıkıım, gelo te bı rasti nave-roka ev çirokê fêım kır? Lê ez bawerım te qet tışteık lı ev çirokê de dernexist, te ev çiroka şırovenekır. Bınhêre xwişka delal, Seyid Weyis lı ev çiroka xwe de, şerbeta xulamti û berdestiya jınan belav dıke. Vê çirokê ji dıbe lı pêxamber va gırêdıde. Ango lı ev çirokê de, pêxamberê Xwedê xulamti û berdestiya jınan tine ber çavan, mêran dıke dereca heri bılınd, heqê dayıkan betal dıke. Mêran dıke serdest, jınan dıke ji berdest û hebûnek heri erzan. Ku bıhna mêr teng bıbe, dıvê ço bıgire û jınıka xwe bı qenci bıkute û hêrsa xwe daxine, bıhna xwe fereh bıke. Mêr qopıki bıke, rojê lı deh jınan ra rabe, rûne, gel jêra bêje" lê ew mêre, Xwedê jın û mêr bı cûdayi afırandıye.

Tuştên usa fermana Xwedê û pêxamberın". Lê ku jin şaştiyekî bike, yekcar heqê wê dibê kuştin, navê wê jî dibê Qexpe. Lê qet zagonên usa dibin xwişka min delal? Mêr çî dibe bila bike, welleh eferim. Lê ku jin tuştêki bike, yekser ew têtê kuştin û nişana qexpetiyê distîne. Bînhêre xwişka min, Xwedê çito tuştên usa dibêje û dibe? Mîrov çawa dayika xwe bikute? Lewra hemû jin dayikên, em hemû karpêkên dayikanın. Dayik ku nebe, qet tuştêk û hebûnek nabe. Xwedê çawa fermanên usa derdixîne û dibe zagon? Jinikê lî hemû jiyana xwe a zewaci de, şevêki xwe şaş kiriyê û piştê xwe guhêrandiyê mêrê xwe, jî bona ew jî, Xwedê mîlaketek şandiyê, ku ew mîlêketa bîçe cezayekî bide wê jinikê. Naha em bibêjin, lê mêr ku piştê xwe biguhêrine jîna xwe, gelo Xwedê çî ceza dide mêr?. Na, jî bona mêran Xwedê her tuştê helal kiriyê, jî bona jinan jî heram. Guhê xwe qenc bide ser min xwişka min, tuştên usa nabîn, evana hemû derewên hînek Şêx, Seyid, Mir û axanın. Jî ber ku mafên wan lî derewên usa de hene, Xwedê qet ne fermanên usa derxistîne û ne jî zagonên usa. Lî diroka mîrovatiyê de jî, qet kesekî ne Xwedê ditiyê û ne jî, jî Xwedê ra peyiviyayê.

Melek û Xîd jî Aliekber ra gelekî hêrs ketibûn, nedizaniyên ku çî bîkî û çî bibêjin. Lê Aliekber bêtir lî diji ew çirokan derdiket dixwast ku xwişka xwe û zava ê xwe tuştêki bine rê, ramanên wan biguhêrine, wana piçêki serwext bike, lê ew ne keys bû. Jî lewra hevîrên wan werge hatibûn pişavtin, bî hêsa î nedihatın guhartın. Lî dawiyê de Xîdê tewat nekîr, lî şûna xwe de rabû serxwe, lî hîndîr malê de hat û çû, dûra jî Aliekber ra:

- Aliekber, ez lî te tîka dikim êdî bese ev gotinên te. Ez naxwazim tu jî mera usa bipeyivî. Bî rasti tu me gelekî dîşîni. Lî hember ev gotinên te, ez naxwazim dilê te jî bîşînim, lewra tu hati lî me bûyî mivan. Lî milê dîn de, tu baş dizanî ku em te pîrr hezdîkîm, gîramiyê dîdîm te, lê dîvê tu şûna xwe zanîbî, got.



Lı wê navberê de xwişka Xîdê Xec kete nav ew gengeşi û raberzinê-münakaşa-jı bira ê xwe Xîdê ra:

- La-law we xêre, tu û bûkê çira evqas lı Aliekber ra hêrs dıkevın? Hûn dıxwazın wi bıdın axaftın, ew ji, ji wera dıaxıfe, dûra hêrsa we radıbe, hûn dıxeyidın, hêrs dıkevın û dıxwazın ku devê wi dadın. Lê ev nabe, eyibe ji wera. Bınhêrın wi xwendıye, ew bûye mamoste, hûn ji şıvan û kesên ne xwendane. Dûra heqê herkesi heye ku, raman û mabestên xwe bıbêje. Lı vır mane ew nine ku, hûn baweriyên xwe lı Aliekber bınin. Bısekının, aram bı-kın, bıla lawık ji wera bıpeyive. Bı rasti ji, ez bı xwe gotınên Aliekber zef hezdıkın. Mırov lı kesên wek Aliekber pırr tıştan fêr dıbe. Lı nav lêvên Aliekber de, bawerkın hıngıf dıherıke, lê mıxabe ku hûn hayjı ew gotınên wi ninın, got.

Lı pışti axaftına Xecê de, Xîd bêtır hêrs ket û jı Xecê ra:

- Erê-erê ela lı vê por gjıkınê bınhêrın, iro ev ji bûye keçek zana, pıšta Aliekber dıgire, lı gotınên wi xwedi derdıke û dıbêje" hemû gotınên Aliekber rastın". Ma keçek te lı ku xwend? Lı şûna xwe de rûne tu" keçek por dirêj, aqıl kını". Ez naxwazım tu bı destên xweyên bı hevır va bıkevi nav kar û berên mêran û gotınên mêran.

Lı pey ew hêrsketına Xîdê de, Aliekber:

- Na zava ev neheqiye, çira tu usa dıaxıfı. Bınhêre, çıqas ku heqê mın û te ê axaftınê heye, heqê Xec û Xecan ji heye. Jı ber ku jın dayikên mene. Dıvê lı navbera mêr û jinan de heqê wekhevi hebe. Bınhêre Xwedê ew ji mina mın û te mırov-hım ji dayik-afırandıye. Dayıka mırov, Xwedê ê mırove. Heqê te tune ku, tu deng jı yeki bıdı bırandınê, ev nabe, jı tera eyibe. Naha em van gengeşıyan û raberzinên usa bıterıkının û bıkevın xewê. Sıbê dısa em lı ber pêz, lı ser gelek tıştan bısekının û şırovekırına van tıştan bınhêrın. Balam bêt şer û bêt pevçún. De Xwedê hêsabúnê bıde we, ez dıxwazım êdı razım, lewra raber-

zinên me pırr dirêj bûn, ez ku piçeki dın ji bixafım, wê şer derkeve. Balam ez ne miroveki şervanê bı fizikime, ez şervanê zanin û axaftinê me, got û kete nav nivina xwe û binê lihêfa xwe, dengê xwe bîrand.

Belê, Aliekber gelek tiştên qenc digotın, balam sewiya perwerde û zanyariya Xıd û Xıdan, Xec û Xecan, Alo û Meman her nızm bû û wana gotinên kesên mina Aliekber fêm nedikırın. Lê li aliya Dêrsım de şêx- mêx tunebûn, balam Pir û rayberên kedxwar her zêdebûn. Li nav wan Pir û rayberan de gelek kesên nezan û xeşim hebûn. Wana ji bı nezaniyên xwe va, bı bihistına guhan va derewên derewçinan li nav gel de belav dikırın. Hin kesên piçek xwenda û zana ji, ji bona berjewendiyên xwe ji gel ra derewên bêt doçik derdixıstın, gel dixwapandın, tiştên nebûyi li zikên xwe de derdixıstın û ew derewana dibırın bı Ol'an va û bı pêxamberan va girêdıdan û çiralix û geşt ji talibên xwe-murûdên xwe- komdikırın. Hin Pir û rayberan ji talibê xweyên hejar û belengaz çırlıxên mezin dixwastın. Digotın" divê tu ev, an ew tiştê bıdı mın. Na ku, tu nedi mın, wê ez li pêşiya deriyê tedi kevirêki tikim, bila kesek ne were mala te, ne ji silavek Xwedê bide te. Ez nale li te binım, kes ne loqmeki bide te, ne perçeki qurbanê were mala te, ne kes pez û dewarên xwe bike tev pez û dewarên te. Li dawiyê de tu" Dustanê bı Agır " ji, ji stuyê xwedeki, wê disa guneyên te efû nebın, ceddê mın te li dojah'ê de bişewitine û li sitıla qetranê de ji bikeline. Bı wan gotinan va ew hejar û belengazana ditırsandın û daxwaziyên xwe dıanin şûnê û ew tiştana li talibên xwe distandın, ew kesana dikırın binê deynan û xızan dikırın. Li bılı ew tırsandınan de, Pir û Rayber li cihê heri jor de, li ser doşeg û xaliçan de rûdınıştın, ji talibên xwera usa digotın" mirov dikaribe bixwine bibe, Mıdûr, bibe Qaymeqam, bibe, Wali, bibe Paşa, bibe Serbaz û Serdar, bibe

Newêrger bîkeve meclis û parlamento'an, bibe Serok Wezir û Serok Komar, balam mirov qet nîkaribe bibe Seyidê Sadet û ewladê resûl".

Belê, li alîki dijminan gelê Kurd dîxapandin, berdîdan hevûdu, xwîn dîdan rijandin û kêf dîkîrîn, li aliya dîn de jî, hînek şêx û seyidên kedxwar, tev gelek axa û miran gel dîxwapandin û li tari û zulmatan de dîhiştin. Ne dîxwastin ku gel şiyar be, gel bîxwine. Pir û rayberan bî tembûrê çîralix komdîkîrîn, dîwa dîxwandin. Dîgotin" Xwedê tembûr kutandin bî taybeti daye me seyidan, ev pişe a-senat-meye, bîli me, ki ku tembûrê bîkute, Xwedê napejîrine, li aliya Xwedê de ev guneye".

Carna hîn taliban jî Pir û rayberên xwe pîrs dîkîrîn, dîgotin" Bavo Sultan, hûn dîbêjin" em Seyidi Saadet, Ewladî Resûl'in" mana ev gotina we ewe ku, hûn Erebin. Jî ber ku pêxamber bî nijada xwe ya Erebbû. Lê hûn ku bî rasti ewladê wi û newiyê wine, mana ev ewe ku hûn jî Erebin, gelo ev raste?". Li piştî ev pîrsên usa de, wan Pir û rayberan usa bersivên wan kesan dîdan. Dîgotin" na haşa em ne Erebin, em Kurdin. Lewra pêxamber gotiye" ez Erebin, balam Erebbî mînda nine". Mana ev çiyê êdî hûn hesab bîkîn û bîhênîjin, şîrovekirîna ev gotinê hûn li navhev derxînin.

Bî taybeti li destpêka qurna bîstan de, helbestên hîn hozanan, wek helbestên Şah Îsmail, Pir Sultan, Nesîmî, Kazak Abdal û ên dîn, êdî ketîbûn nav Kurdên Dêrsûm jî. Pir û rayberên gerok û geştewan, pîrtûkên wan hozanan jî xwera peyda dîkîrîn, dîanîn dîbîrîn cem hîn kesên ku zîmanê Tîrki dîzanîbûn û dîkarîbûn bî zîmanê Tîrki bîxwînin, dîdan xwendin û bî xwe jî li hember wan kesan de rûdîniştin û ew xwendîna wan kesan jîber dîkîrîn û dûra jî bî tembûre ew helbestana dîkîrîn beste û awaz dîstîrandin, cem girêdîdan, zîkîr dîkîrîn, dîgîriyan, gazi Xwedê û Mihamed, Hesên û Husên dîkîrîn. Wan Pir û rayberan çucarî şert û şûrtên Ola Îslam jî nedîanîn cih. Nîmêj

nedikırın, avdest nedıgırtın, nedıçûn hec, rojiya Remezanê ji nedıgırtın, tenê xêra bav û kalan dıdan, dıwazde roj, rojiya İmamên newiyên pêxamberê İslam dıgırtın. Dıgotın" nımêj kırın, avdest gırtın ne heqê meye. Lewra nımêja me hatiye kırın, avdesta me ji hatiye gırtın. Em naçın hec ji. Jı ber ku ocaxê meyên bı taybeti hene, ev ocaxana hecên mene. Em rojiya Remezan nagırın, em tenê rojiya imaman dıgırın. Em zekat, felan-bêvan ji nızanın. Lewra xêr dayına bav û kalan ji mera zekate. Em naxwazın bıçın mızgeftê ji. Jı ber ku Hezreti Eli lı mızgeftê de hatiye kuştın. Mızgefta me, malên mene. Em sê roj ji, rojiya Xızır dıgırın. Disa em rojiya Goxendê, rojiya heftê Adarê, hıvde ê Adarê, bist û yekê Adarê ji dıgırın, evana ji, jı mera besın". Ango wan Pir û rayberan, lı aliki de werge dıgotın û ew tıştana lı gel daxwaz dıkırın, lı aliya dın de ji, dıwayên xwe, kılam, stran û awazên xwe dıqulpandın, anga werdigerandın zımanê dijmin û bıyanıyan. Bı wan kıretan va hacetên zor gıring dıdan destên dijminan. Ku dijmin bı hêsai bıbêje" aha fermo bınhêrın, evana bı nijad û bınkoka xwe va Tırkın. Jı ber ku hemû tıştên van, stran û dıwayên van bı zımanê Tırkine. Mana ev ji ewe ku, ev gela bı nijada xwe va Tırke".

Lı milê dın de wan Pir û rayberan ji talıbên xwera dıgotın" hemû Kurdên Sunni dijminê mene. Jı ber ku wana lı tev Xelife Yezit de, lı Kerbelayê newiyên Mıhamed, kurên Eli kuştına. Hemû kesên Sunni kafırın, qetla wan helale". Wana bı ew nezaniya xwe va karên dijmin dıkırın, gelê xwe dıkırın dijminên hevûdu. Jı ber ku dijmin ew xapandıbûn. Ew kırıbûn xudan ocax û xelifeyên Kurdên Elewi. Bı taybeti hukma Romê, lı dewra Padişah Yawûz de Kurd kırıbûn diji hev. Lı dewra Sultan Mamût II, em de ji, dewleta Romê bı taybeti gelek" Rastnameyên Ocaxtiyê" dabû hın serok eşirên Kurdan. Xêncı gelek serok eşirên Kurdên Sunni, hın serok eşirên Kurdên Elewi ji bûbûn xudanê wan Rastnameyên ocaxtiyê. Minak: -

Wek serokê eşira Bamasûran, Kurêşan, Seysawûnan, Axû-
canan û yên din.

Lı pışti du-sê seat gengeşyan de, Aliekber geleki wes-
tiyabû. Jı bona ew ji zû pêva çûbû, ketibû xewa kûr. Lı
dû razandına Aliekber de, Melekê xuruya ağır temırand,
tırafa ağır lı binê xaliyê de bı qenci nixumand û ew ji tev
mêrê xwe çû kete xewê.

Şev sayi, esman şın, bı milyon stêr dıbrıqıyan. Hın
gundiyan lı ser pışta xaniyan xwe de holık çêkırıbûn, lı
binê wan holıkan de radızıyan. Hınekan ji nivinên xwe
tenê lı ser pışa xaniyan û binê çardaxan de raxıstıbûn
ketıbûn xewê. Cihan lı nav bédengiyeki de bû. Xêncı
dengê beqan, qet dengek lı gundê Torût'ê de dervedıket. -
Xewa hın kesan reviyabû, lı nav nivin û binê lihêfên xwe
de lı esman, stêr û hiva Zeri, lı pêwr û riya kakêşan dın-
hêriyan. Her yeki stêrek dıkr sitêra xwe. Carna stêr lı
şûna xwe de dıket, dıbızdıya, mina tirijên bırûskan, tirij û
şewq lı pey dıket, dirêj dıbû, dûra lı ber çavan de wenda
dıbû. Lı demên werge de, dıgotın" aha mırovek disa mıır".
Lı gor baweriya wan, her mırovek stêrek xwe hebû. Wexta
ku mırov ji dımır, ew stêr ji werge lı şûna xwe de dıket û
dıbızdıya, dıçû lı ber çavan de wenda dıbû. Carna ji lı nav
goristan û hın ciyan de gústêrk dıfırıkiyan, icar dıgotın"
fınd lı ser hın goran de vêketiye, xwediyê wan goran kesên
dılpak û paqıjın. Hori û melekên Xwedê lı ser wan tırban
de fından vêdixinın". Ango gundiyan belengaz nedızanı-
bûn ku gústêrk çine, çıra lı şevên taride ew mina ağır û
şewq tên xuyakırın.

Lı pışti nivê şevê de, hiva Zeri çûbû ava, wenda bû-
bû. Berbanga sibê tari û zulmat çırandıbû. Dikên sibê lı
ser çit û darên hevşan de disa dıkırin qire-qır bang dıkı-
rın, mızgına hatına ronahiyê dıdan xwediyên xwe û gundi-

yan. Melek bı dengê dikan, beri herkesi vecenîya serxwe, hişyar bû. Lê rewşa Melekê ne rewş bû, çavên wê her diêşyan û histêr lı çavan de dıbariyan. Lı wê demê de Hesenê piçûk ji lı hêlaneka xwe de hişyar bû. Melek bı hêdika lı nav nivina xwe de rabû serxwe çû kurê xwe mêjand, ew haşkir û dageriya ber pıxêriga agir, ku agir dade, girmiya sibê bide ser agir, ji bona taşte a sibê amade bike. Herdu Xıd, Xec û Aliekber ji, lı xewa kûrda bûn, xewnên rengin dıdıtın.

Melek derket pêşiya dêri, çû lı ser maxa êzıngan de tevalek hejık girt û disa dageriya ber pıxêriga agir, ew hejıkana hürkırın û da ser agir, pıfe agir kır û agir vexıst, dûra dustanê hesın da ser agir û dizıka aya girmiyê ji da ser dustan. Lı wê dageriya çû lı binê sepetê de beroşa mast derxıst, dûra çû meşk ani mast kire hindirê meşkê, devê meşkê ji bı qenci kip girêda, kêri kire nav lolewiyan û meşka dewê xwe bir lı sêpiyê de dardakır û destpêka kılândına dewê xwe kır. Ronahiya rojê hêdi-hêdi cihan roni dıkır. Esmen şın û sayi, stêrika sibê lı jor esman de melûl-melûl dıburıqiyan û bervı wendebûnê dıçû. Hiva Zeri zûva çûbû ava, lı ber çavan de wenda bûbû, nedıhat dıtın. Tirijê roja jından xwe gıhandıbûn serê çiyayê Tûjık Bawa û hemû çiyayên Dêrsım. Hemû teyr û tûr lı hêlinên xwe de, gur, hırç, rovi, tori, kurbeşık, kûze, simborek û mar lı qul û şikeftên xwe de hişyar bûbûn. Dengê beqan lı ava çem û newalan de nedıhat bıhistın. Disa rêwan lı rê'ên xwe de dımeşyan dıçûn kar û berên xwe û gund û bajarın. Jınên gundê Torût'ê hemû rabûbûn ser piyan. Kê dew dıka, kê lı pez û dewarên xwe dınhêriya, zıkên heywanên xwe têr dıkır, binê heywanan dımışt, paqış dıkır. Qire-qıra dikan û dengê kılândına meşkên dew lı nav hev dıketın û dıbûn awazek ecêb û bı wê awazê hemû gundi hişyar dıbûn, radıbûn serxwe.

Melekê lı nav wê awaza sibê de meşka xwe da sekı-nandın û çû pêşiya sêpiyê, devê meşka dewê xwe vekır, tı-

liya xwe a îşaretê kire nav mastê hındirê meşkê, dûra tiliya xwe kışand ani der lı tiliya xwe mêzekır, gelo dew bûye, yan na. Dıt ku na, hina dew û rûn bı qenci lı hev-ûdu cûda nebûne, divê piçeki dın dew bê kılândın. Disa devê meşka dewê xwe girêda û destpêka kılândinê kır. Pışti çend hûrdeman de, dıt ku ronahiya rojê xwe gihan-diye serê gaza gund, ewe hêdi-hêdi bervı gund tê. Melekê lı wê demê de dew kılândın terıkand û bı lez bazda hındır Xıdê mêrê xwe, zeyiya xwe Xec, kurê xwe û birayê xwe Aliekber, hemû lı xewê de hişyar kırın. Dûra disa bı lez çû kixsek pivaz ani sıpıkır, bı kêrê ew pivaza hûrık-hûrık hûrkır, kire tawê, lı wê çû kevçiyek rûn lı kûzê rûn de derxıst ani kire hındirê tawê û tawe da ser agir, bı qenci ew pivaza lı nav rûn de qewırand û kire sorxaç berda nav gırmiya hındirê dizıkê. Pışti ew kar, icar melekê bı kevçiyê darık va lı tama girmiyê mêzekır, gelo xwê û tama xwe çitone. Dıt ku ne xırabe û êdi gırmi keliyaye ji. Zeman wenda nekır û bı lepikên paçık va dizık lı ser agir de dani jêr ser erdê û gazi Xeca zeyiya xwe kır, jı Xecê ra:

- Tu bı kerema xwe were girmiyê bıke leganê, amade bıke bıde ser xoçê, bıla birayê te û zarok rabın taştı xwe bıxwın herın ber pêz û dêwêr, ez ji ew dew dakım, dûra ji ez û te xurniya xwe bıkın, got.

Herdu Xıd û Aliekber lı nav nivinên xwe de rabûn çûn der, ber çirtıka avê dest û rûyên xwe şoştın û dageriyan hındır ser sıfra girmiyê. Xıdê mezın çend nanên ceh û garis ji pişart kire hındirê girmiyê û destpêka xwarınê kırın. Melekê ji piçeki dın dewê xwe kılând, dûra meşka dew lı sêpiyê derxıst ani hındır, bır ber sepetê, sepet rakır û lı binê sepetê de beroşek derxıst, parzûn da ser devê beroşê, dûra kêri lı nav lolewiyên meşkê de derxıst, devê meşkê vekır û dew lı parzûn de dakır. Pışti dakırına du-sê caran de, Melekê dew û rûn lı hevûdu cûda kır û bı qenci rûn gıvışt û ew rûna gırt bır kire xılıkek piçûk û disa dageriya ber dewê beroşê. Jı bona wê rojê hinek dew ji

neferên malê ra cûda kîr, ê dîn jî disa kîre hîndîrê dizîkê û dizîk da ser agir û ew dewa keland kîre toraq. Dûra ew toraqa jî kîre parzûn û parzûn jî bîr lî mixê stuna malê de dardakîr, ku ew şojiya toraqê dabe û av lî nav toraqê de nemîne. Lî pîştî ewqas zemet de, Melekê karê xwe qedand û " ohx Xwedê şîkîr, mîn iro jî ev sîxura qedand" got lî şûna xwe de rûnişt piçeki vêsa xwe gîrt û jî Xeca zeyiya xwera" ez zef westiyame, dîxwazim piçeki vêsa xwe bîgîrîm got û lî şûna xwe de rûnişt.

Hemû gundiyan pez û dewarên xwe derxistibûn der, lî benda Xîdê de mabûn. Xîd jî bî lez û bez lî şûna xwe de rabû serxwe û ço û torbe ê nanê xwe jî gîrt û jî kurê xwe Xîdê piçûk ra:

- Kurê mîn ez qurban de zûke em biçîn, gel lî hiviya medaye, em iro piçeki dereng ketin got û dûra dageriya cem Aliekber, jî Aliekber ra:

- Bûrayê delal, were tu guhdare mîn bîke lî malda, gel xwişka xwe de bumîne. Dûra biçe nav gund, gelek xortên mina te hene, jî wanra bîbe heval. Lî aliya dîn de gelek jî keçîkên çeleng spehî, bedew û xweşik hene. Wan keçîkan bîbine, bîbe ku tu yekî biçîbîni, hezbîkî. Keçên gundiyan jî bona mamostan dîmîrîm, ew bengiyê mamosteyê mina tene. Kuro were guhdare mîn bîke, lî malda bîsekîne, got, lê Aliekber:

- Zor spas zava, zewac jî mînra pîrr zûye, ez naxwazim lî ev demê de bîzewîcim, bawerke em lî demek herî nazîk de dijîm, qet kes nîzane ku wê sîbe çî were serê me. Jî bona ev ez naxwazim bîzewîcim û bîkevîm guneyê yekî, ev yek. A duwem ez naxwazim lî gund de bîsekinîm, ez bengiyê Xweza me, bengiyê Gul û sosînanîm. Ez her car nayê mî gund. Îro jî ez dîxwazim lî tev we bêm, em bînhêrîm sîbe Xwedê mezîne. Lî aliya dîn de, ez heya du heftêyên dîn jî lî vîra me. Ez jî pîrr dîxwazim gundiyan bîbinîm, wana nasbîkîm, jî wana ra bîpeyîvîm. Lewra pîraniya gundiyan meriyên mene. Gundi mîn nasnakîm,

balam bavê mın baş nasdıkın. Bı kurtasi ez ji pırr dıxwazım lı sûka dayın û standına ramanên gundiyan de bême ditın, balam ez dibêm ev kar iro nabe, pışti sibe ez wi kari ji binum cih, got û lı dû pêz û dewar ket û meşiya.

Xidê naxırvan kır, nekır bûrayê xwe qani-ikna-nekır û Aliekber disa lı tev zava û xarziyê xwe pez û dewar ajot û berê naxirê dan lewera -mera- gund. Xidê mezin lı dû Aliekber û lı aliya destê rastê de dimeşiya, Tûrikê nanê xwe ji avitibû ser milê xwe pez û dewar diajot. Lı wê demê de Elo ê Êmoşê paşva lı Xidê pırsiya got" kek Xıdır duhu we pez biribû lı kuderê çêrandibû? Bawerke zikê pêz û dêwêr gihiştibû ser pıšta pêz û dêwêr. Em hêvi dıkın tu her roj pêz û dêwêr werge biçêrini û zikê heywanan têr bıki. Lı pey ew gotinê de, icar bersiva Xidê:

- Kek Elo hûn ji dızanın ku dem dema şınayiyêye, her cûre giya hêşın bûne, lı her der nefel û pêçek her zêdene, pez û dewar hemû wan giyan, nefel û pêçekan dıxwın, zikên xwe têr dıkın, lı nav giyan de wenda dıbın. Gul û Sosın, Nêrgız û Bınefş, Belgizar û Beybûn, Reyhan Lale û hemû kulilkên Xweza bihn dıdın, mirov bı bihna wan sermest dibe, heyran dimine, xwe lı bihiştê de dıbıne. Wexta ku mirov dıkeve nav ew pêşdariyê, nav wê şınahi-yê, nav bihn û rengên wan Gul û çiçegan, bawerke kek Elo, mirov qet naxwaze ku lı nav wan rengên bı hezaran cûra Gul û sosınan de, lı nav wan bihnên xweşik de der-keve. Lê em çı bıkın kek Elo, Xwedê lı hember ronahiyê û Roja Zeri de, tari û zulmat derxistiye, balam ronahi kırıye pey tari û zulmatê, tari û zulmat çırandiye, belav kırıye, ev cihan û jiyan her xweşik kırıye. Şewq û germiya Roja Zeri jiyanê dide hemû hebûnên ev cihan. Lı hember sar û sermayê, germayi, şewq û tava rojê, lı hember xewê, hişyarbûn, lı hember jiyanê mırın, lı hember qenciyê bedi, lı hember rastiyan derew, lı hember hezkırın û eviniyê, kin û kerhın -nefret- lı hember azadî û aşitiyê şer û pev-çûn afirandiye bırayê delal. Bawerke, heke ku sar û ser-

ma, tırsa dijminên bêbext û heywanên har û hov tunebana, ez çucaran lı demên usa de danedıgeriyam gund û mal, mın zamanê xwe lı ew şıkefta malda derbaz nedıkır, lı nav ew pêşdariya xweşik de dımam û mın jiyana xwe werge derbaz dıkır. Mırov dıxwaze lı nav ew pêşdari, Gul û çiçegan de bımıre, got û dengê xwe bırand, balam lı naxıra pêz û dêwêr dūr mabû. Jı ber ku ketıbû nav axaftınek gıring. Lı pey ew axaftına Xıdê de, Elo:

- Lo-lo kek Xıdır, ez lı te pırs dıkım, dibêm we duhu pez û dewar bıribê ku, lı kuderê çêrandıbû, tu bersiva mın bı cûreki dın dıdı. Mına hozaneki mezin, bı zamaneki wêje i jı mınra diaxıfı. Kuro te ev tıştana lı ku hınkırın? Te ev sırûşa lı kuderê stand? got û dengê xwe bırand. Dûra Xıdê usa besiv da Elo:

- Kek Elo tu mın bıbaşıne, bı rasti her mırov dıxwaze jı tera bıpeyive, mırov lı gotınên te têr nabe. Tu mıroveki heri xweş galegali, lê çı dibêjın" rêwan re, rê dıvêt". Dıvê ez jı êdi ev galegalê bıterıkınım û xwe bıgihêjınım zarokan, lewra ev galegala xweşik ez dam sekinandın. Lê ez dıxwazım jı bırayê xwera evqas bıbêjım. Ev gotınana lı kûrahiya dilê mın de derketın. Keko ez lı ku, hozanti lı ku. Ez mıroveki hejar û belengaz, naxırvaneki Xwedê me. Lê ez dıkarıbım jı tera evqas bıbêjım, heke ku mırov lı nav ew xurıšta Xwedê de bısekıne, bıbe hevalê Xweza, bawerke ew mırova sırûşt lı Xweza dıstıne. Bıbe ku mın jı ev sırûšta lı ev Xweza welêt standıye. Ha, tu mın bıborine kek Elo, mın bersiva pırsa te jı xwe bırakır. Me duhu naxır bıribû gaza hember gund û derdora newalan de çêrand, iro jı ez dıxwazım disa bıbım wan deran. Lewra lı wan deran de çêre pıre. Lı pey ew gotınên Xıdê de, icar Elo:

- Kek Xıdır de tu bıçe, jı tera oxır be. Beri ku tu bıçi ez dıxwazım te lı ser tışteki de agadar bıkıım. Bı kerema xwe lı dewarên mezin qenc bınhêrın. Ango lı ga û çêlekan, golık û mozıkên vırni. Jı lewra, wexta mozan û gamêşane.

Ew andêrana hêsaiyê nadin heywanên mezin. Ew kam-baxana bî taybeti dijminê ga û çêlekanin. Lî bedena wan sıwar dîbin û wan heywanan gez dîkin, xwina wan dîmê-jîn, wana lî cînan dîxinin. Tu qenc dîzani lî demên usa de hemû heywanên mezin lî ber wan gamêş û mozan de baz-dîdîn, dîrevîn, dîkevîn nav zeviyên ceh û genim. Lî ev demê de jî êdî ceh gihiştine, geniman firig dane. Dax-waziya mîn ewe ku, hûn nehêlinin ga û çêlek birevîn herin bîkevîn nav zeviyên ceh û genim, xeserê negihêjinin çan-dîniya gundiyan. Lî aliya dîn de ez dîxwazim tu zanîbî, hemû gundî lî te geleki razine û te zef hezdîkîn. Dûra em gundî hemû meriyên hevîn. Raste, lî mêjde meriyên te lî we neheqiyên mezin kîrine. Pîştî mîrîna bavê te, Ap û meriyên te heqê te xwarîn, betal kîrîn, balam ew dax-waziya me nebû. Em hemû neferên eşîrekine, dost û yarên hevîn. Ez dîbinim dolîwa te jî qenc nameşe. Jî bona ev, ez dîxwazim jî gundiyan ra bîbêjim, em heqê te piçeki zêde bîkîn. Bîla her malek çapek genim zêde bîde te, tu jî de-bara xwe bîkî. Lewra tu jî xudan zar û zêçî. Ev pêşneyara mîne, ez bawer dîkîm, ku hemû gundî jî ev pêşneyara mîn bîpejîrinin. Lî dû ew gotînan de Xîdê naxîrvan:

- Bî dîlda spas kek Elo, jî tera û hemû gundiyanra jî. Ela em bînhêrîn, bîla wexta bînderan bê, lî wê demê de tu jî gundiyan ra bîbêje. Ez dîbêm naha em van tîştan lî vîra bîterîkînin, dagerîn ber kar û berên xwe. Ez û te ketîn nav guftûgoan, zarok û naxîra pêz lî mîn dîrketîm. Ha berî ku ez bîçîm, ez dîxwazim lî te tîşteki herî gîring pîrs bîkîm. Gelo hûn çûn cem Seyid Ali Rîza û Şahan axa hatîm, yan na ?. Ma we tîstek hînkîr, ew dengê top û tankan çîbûn?. Lî ser ew pîrsê, îcar Elo:

- Belê-belê kek Xîdır, em çûn hatîm. Tîştên ku Seyid Ali Rîza û Şahan axa dîgotîm, leşkerên Romê bervî Pêrtégê û Xozatê va tîn, tetbîqat û tedrîba'ên-manavra-leşkerî dîkîn, lê bî rasti armanc ne wergeye. Armanca dewleta Tîrk ewe ku, tevgera Dêrsûm bîtîrsîne, dûra jî lî bînda bîtemîrine,

herêma Dêrsım ji bıke bınê bandûra xwe, bıke bınê lıng û lepên xwe. Ez bı xwe ji usa bawerım, ku daxwaziya dewleta Romê ev e. Jı ber ku bıngêhê ev dewletê lı ser himên mêtinkariyê de hatiye danin. Lê em hina nemırine kek Xıdır, em xwaşın. Heya em yek ji sax buminın, em lıngên dijminên gemar nakın ser ev erdê evrar -kutsal- erdê bav û kalên xwe. Ew gotınana geleki lı Xıdê xweş hatın. Dûra Xıdê usa bersiv da:

- Hey tu her û her bıji kek Elo. Bawerke dilê mın dıxwaze, ku hemû Kurd bıbın mina te û mina te bıaxıfın. Dil pırr dıxwast ku hemû Kurdan usa bıgotana, bı hevra bıbana yar, lı hember dijminan de hêzên xwe bıkırana yek, bı mina yek beden bıketana hındırê şeran. Lı wan deman de bıla dost û dijminan ji qenc bıdiditana, ku ki mêre, ki jıne, ki berxe, ki berane. Lê sed mıxabın ku dijminên xwinmij, Ehriman û rovi, dubendiyên Ol û meseban, dubendiyên eşiri kırine nav gelê Kurd, nehiştine ku gelê Kurd ji, jı xwera dewletek xwe a" desthelatek naven-di" sazbike, sazûmanek" dadmendi " pêkbine. Bınhêre bırayê delal, pıraniya eşirên Kurd bûne hevalên neyaran, xwına bıran dırjinın û jı dewleta Romê ra arikari dıkın, bûne hevparê dijminan. Lê bı rasti ev ji, jı me gelê Kurd ra şermek zor mezıne, eyibek bêt efıye.

- Tu qet metırse kek Xıdır, bıhna xwe teng, hêviya xwe ji wenda meke. Ev çerxa cihane dızıvire. Carna mırov lı ber çerxa cihan dıkeve tête pelçiqandin, wenda dıbe. Carna ji mırov lı ser çerxê dıkeve, rasta ciheki heri bılınd û qenc dıbe, serdıkeve. Lê ez bawerım wê ew roj jı bona gelê me ji were û gelê me ji serkeve, bıbe xudan dewlet û dezgeh, bıbe xudan top û tank, bıbe xudan şan û rûmet, bıbe xudanê heqê xwe ê mırovi û çarenûsi, bıbe xudan fırok û leşker, welatê xwe bıparêze. Bıbe şervanê aşiti û demoqrasiyê, bıbe minaka wekhevitiyê. Ew roj ji pırr dır nine. Ez bawer dıkım gelê me ji, wê roj bê hemû şaşiti û xelıtiyên xwe bıbine, hêzên welatparêz bıbın yek, lı hember

dijmnan mina yek bedenek şer bıkın. Lingên hemû dij-
 minan û mêtinkaran lı ser ev erdê evrar û piroz de rabıkn
 û bışekinın. Lı ev sıpartınên bav û kalan xwedi derkevın,
 welat şên, geş û nûjen bıkın. Lê ku em nebinın bırayê
 delal, wê zarokên me, newiyên me wê rojê bıbinın. Lı ser
 erdê bav û kalên xwe de bêt tırs û bêt xof, lı zıkê cihanek
 bêt şer de bıjin. Wê roj bê, hemû gelên cihan jı hevra
 bıbin dost û yar, heval û hogır. Jıyan pırr xwaşe keko,
 mırın û kuştın ne başe. Şer û pevçûn jı mırov ra şermek
 heri mezıne, eyıbiya ev cihan û mırovatıyêye. Lê em çı
 bıkın keko, sed mıxabın ku hukma Romê û hın dewlet û
 sazûmanên wek dewleta Romê van tıştan û van peywen-
 diyên mırovatıyê nızanın. An jı naxwazın van tıştan fêr
 bıbin. Bıbe ku berjewendiyên wanên heywani û gemarın
 dest nade wan, ku ew van şert û şûrtên mırovatıyê bınn
 şûnê. Lê ev rewşa wan jı heya çı wext berdewam dıke, em
 nızanın. Jı bona ev e ku ez dibêjım kek Xıdır bıhna xwe
 teng meke, dilê xwe fereh bıgire, hêviya xwe wenda meke,
 Xwedê mezıne. İro evqas bese jı mera, de bı xwatırê te,
 mın tu geleki dayi sekinandın, got Elo û şuva vegeıriya.

Lı pıştı ew gotûbêjên werge de, Xıdê jı Elo ra spas kıır
 û çû xwe gıhand naxıra pêz û dêwêr, Aliekber û kurê xwe.
 Hersıyan bı hevra pez û dewar ajotın bınn tata hember
 gund kıırın nav çêrê û bı xwe jı her yek lı alıyek pêz de
 derketın ser ciheki bılınd de rûnıştın, naxıra pêz û dêwêr
 jı kıırın bıne sehêta-kontrol-çavan.

Dewar û pez dıçêrıyan zıkên xwe têr dıkırın. Xıdê
 pıçûk jı xwera kozık çêdıkır, jı kozıkê ra mıjûl dıbû. -
 Aliekber jı derketıbû ser kevıreki heri gewre û bılınd, lı
 çıya û kaşan, tırr û newalan, kevır û zınaran, dar û da-
 rıstanan, kendal û zımagın, çem û kaniyan, Gul û çiçegan
 û bedewiya Xweza dınhêriya, xwe bı xwera" hey ez qur-
 bana karê te Xwedê bınn, ev çı welateki xwaşıke, ev çı
 bedewıye te çêkıriye. Lê aqılê mın qet nagihêje ev karê te.
 Tu lı aliki de welateki usa mina bıhişt dıafırını, lı alıya

dinde ji rûniştvanên ev bihiştê diki bin destên ew dewletên har û hov û ne mirov. Xwediyê ev bihiştê, ew kesên çav reş û belek, ew kesên bejn bilind û kûbar, ew kesên şeng û şepal, ew kesên çelen û bedew, ew kesên çak û delal, şêr û piling te kirine xulamê har û hovan, te kirine nav hejari û xızaniyê. Rûniştvanên ev bihiştê te li rewşek ne mirovi de dijîn. Lê ev bihiştê te ku li destê Ewrûpiyan de bana, wê ev bîketana çi rewşê û bîbana çi? Lê ez ji tera çi bîbêjim Xwedê o, tu bi xwe ev rewşê dibini, lê nizam tu çito ev rewşê dipejirini?"

Xidê mezûn ji derketibû ciheki bilind, tili avitibû paşguhê xwe, kılama Bêhrivanê dîstrand, dilê xwe şa, ruhê xwe ji şad dîkir. Lê bi rasti dengê Xidê zef xwaş û delal, zil û zelal bû. Xwedê dengê bi taybetî dabû Xidê. Te digot, bila Xid bîstrine, ez bi ti û birçî Xidê guhdar bîkîm. Xid dengbêjeki bêt nav bû. mina gelek dengbêjên Kurd û Kurdistan.

Aliyekber ji him ketibû nav xem û xeyalên welêt û gelê xwe, him ji Xid guhdar dîkir û xemgîn dibû. Li dawiyê de diyax nekîr, li şûna xwe de rabû çû ba zavayê xwe, ji zavayê xwe Xidê ra:

- Zava ez dixwazim tu ji minra kılama Sêvdin Begê û kılama Êsivê Kal û Zinê bîstirini. Bawerke ez ew kılamana zef hezdîkîm. Min ew kılamana bi devê xîzmê mîrşûdê me, li gundê Qurqurîkê Apê Piro'yê Îmamê de bîhistibûn. Par ew hatibû mala me bûbû mivan, li mala meda ew kılamana strandibûn. Xêncî evana, wina kılama Silê Sêwi û kılama Seyid Mîstefa ê Axcê ji baş dîstrand. Gelo tu ewana nîzani, yan na?" got, Xidê usa bersiv da:

- Bawerke Aliyekber, ez wan kılaman nîzanîm. Min ji ew kılamana bîhistine. Bi taybetî kılama Sêvdin Begê û kılama Êsivê Kal û Zinê, ewana kılamên mêraniyanîm. Qaymeqamê dewleta Romê, li ser fermana dewleta xwe, Sêvdin Begê dil digire, jîna wi a piçûk ji, bi zorê digire ji xwera dibe. Li meydana Amedê de Sêvdin Begê li ser erdê radî-

xinin çarmixê. Dest û lungên wi bı erdê va mîx dîkîn. Dûra bı şıxabê-matkap- zîkê Sêvdin Begê qul dîkîn û mûmê ji dîkîn ew qula zîkê wi mêrxwasê Kurd vêdixinin. Lı demek werge de, kurê Sêvdin Begê ê çardeh salini lı hındırê gizme a xwe de şeşara xwe derdixine, gulan lı ser Qaymeqamê Romê de dibarine û lı hespa xwe sıwar dibe û lı ber çavan de wenda dibe. Sêvdin Beg beri ku bımure, wê mêrxwasiya kurê xwe dibine, kılamek xwaşik davêje ser kurê xwe. Bı rasti ew kılama geleki xwaşe. Kılama Ūsivê Kal û Zînê ji, ew kılama, kılamek mêrani û eviniyêye. Kılama Silê Sêwi ji, zılma hukma Roma bêbext lı ser keseki bêkes dıde xuyakırın. Kılama Seyid Mıstefa ê Axcê ji, ew disa kılamek eviniyêye. Lı ew kılâmê de evini û kırameta Seyid Mıstefa ê Axcê heye. Çawa ku navê kılâmê ji xwe dıde kıfşê, Seyid Mıstefa dibe bengiyê keçîkek nav Axcihan. Jı bona ew ji navê wi dibe "Seyid Mıstefa ê Axcê". Lê hezar mıxabın ku ez ew kılamana nızanım got.

Lı wê navberê de Aliekber babet guhart û jı zavayê xwera:

- Zava xwişka mın jı mınra got, ku tu dıxwazi mala xwe bar bıki, bıçi herêma Newala Karê, gelo çıra? Çı guhartinek nû lı wê aliyê de heye? Ango ew herêma jı bona te bıhişte, çiye? Ez bawerım tu ku bıçi wêderê, ew der ji mina vıraye. Tu were guhdare mın bıke, ev bıryar û daxwaziya xwe, jı xwe birbıke û bıtexıle. Tu ku dıxwazi lı gund derkevi, çêtire mala xwe bar bıke were bajêr, Xarpitê de ciwar be. Ez bawerım Xarpit jı bona te çêtire. Bajare, tu dıkarıbi kar-marê barkêşiyê ji, jı xwera bıbini. Lı deşta Xarpitê de carna gelek karên çandiniyê, çınandına ceh û genıman pırr dıbın. Tu bı xwe ji dibini, kurên te ji mina te bêt xwendın dımının, ew ji lı pêşerojan de mina te dıbın şıvanê pez û dewaran. Ew ji, jı zarokan ra heyfe, mıxabe. Hûn werın Xarpitê ez xarziyê xwe bıbım cem xwe, bıla ew lı cem mın de bıxwine, bıbe mırov, bıbe keseki zana û serwext. Gewherên me Kurdan usa bêt

xwendin lı şûnên xwe de jeng dıgırın, dıçın, jı kareki ra nabın. Ev ji, jı gelê mera zef guneye. Tu were guhdare mın bıke, ev gotinên mın bine cih. Çıra bav û kalên me gotine " xwendin bazinê zêrine". Gelên xwenda serketine zava, tu were rık meke, rojeki zû were Xarpîtê de ciwar be, got Aliekber, lê Xidê usa lê vegerand:

- Aliekber, ez lı te tıka dıkım, tu ji, jı mınra mina xwişka xwe mepeyive, şiretan lı mın meke. Ez naxwazım bıçım bajaran de bıkevın kûçan. Salên kurê mın ji, jı bona dıbistane zûva derbaz bûye. Dûra ez naxwazım kurê mın bıçe lı dıbistana Tırkan de bıxwine û bıbe Tırk, zımanê xwe jı xwe birbıke, felan-bêvan, got Xidê lı hiviya gotinên Aliekber de ma.

- Zavayê delal, ez ji qenc dızanım ku, dıbistan, dıbistanên Tıkanın. Tu bı xwe mın ji dıbini, ku mın ji lı dıbistanên Tırkan de xwendıye, ez bûme mamoste. Ango lı gor baweriya te ez bûme Tırk û mın zımanê xwe jı xwe birki-riye? Na-na zava, ev ne tışteki raste, ne ji tışteki zanıstiye. Bawerke ez lı beri bêtır bûme Kurd. Bı qafek zelal û vekırı de, ez dost û dijminê xwe bêtır lihev cûda dıkım. Ew kesên ku xwe wenda dıkın, ew ne mırovın, xwına wan sıftoye-bozuk-mırov bıxwine, bıla kijan zıman dıbe bıbe. Em çı bıkın dijminan welatê me dagirkırıne, nahêlinın em bı zımanê xwe bıxwinın, bınvısinın û xwe nasbıkın. Ev zagona dewleta Romêye. Lı ev rewşê de sûcê axa, mir, şêx û seyidên me ji her zêdene. Tılıyên wanên gemarin lı ev parçebûna welêt de heye. Gelê Kurd heftê û du destnıvisên wan û ew nama wana ku, wan jı Konferansa Lozanê ra şandıbû, çawa birbıke?. Ango çı dıxwazım jı tera bıbêjum, sûcê dijmin û hevparên dijminan her gırane. Ew naxwazın zarokên me Kurdan bıxwinın û bıbın kesên zana û serwext. Ev jı bona dijminan xeterek heri mezine. İro lı şûna şûr, tıfing û çekan de pênûs hene. Lı ser text û sıfran de, pênûs mesele û pırsegirekan çareser dıke. Tu ji dıxwazi karê dijminan û hevparên wan bini cih. Tu lı ew kesên

dozfiroş menhêre, ew kesana zûva hatine firotin. Qet ji xwe birmeke, li nav her geli de kesên dozfiroş û bêbext hene, lê ên me Kurdan her zêdene. Ji lewra sedemên ev bêbextiyan ji hene. Sedema yekemin dijminê gelê Kurd çar dewlet û sê nijadın. Tirk, Ereb, Faris, ev sê nijad. Çar dewlet ji, Tirkîye, Îran, Iraq û Sûriye. Li milê din de, Erdnigariya Kurdistan li ciheki heri xirabdaye. Riyek me a derya tune, ku li rojên tengasi de, em derkevî der ji xwera dost û yareki bîbinin. Bi kurtasi li dorbera meda çar dewletên xwinmîj, dijminên me, ên berbî çavî, objektîfî. Yek ji dozfiroşên me, bû pênc. Yek ji Erdnigariya welatê me, ango Coxrafiya Kurdistan, bû şeş. Ango ev şeş dijminan em kirinê ev rewşê û li çar aliyên meda qet dost û yareki me tunenin.

Herwaha zava tu qenc binêre. Li bîlî evqes bêt erênîyan û faktorên nebaş de ji, disa iro ew kesên ku li doza welatê xwe xwedi derdikevî, ew kesên xwenda, ew kesên Rewşenbir û Ronakbirên Kurdistanın. Wan hemûyan ji, li dibistanên dijminan de xwendine. Aha binhêre toxtor Nûri, Alişêr Efendi, malbata Bedirxanan, gelek hevalên Şêx Said, hevalên Abdulqediri Geylani û hevalên İhsan Nûri û hin kesên din. Zavayê delal, divê tu qenc zanî, li binê ev "Gerdûn" li ser ev cihan de, qet sazgehek, qet dewletek bi destên şivan û gavan, xêşim û nezanan de, nehatiye demazrandin, nehatiye sazkirin. Disa qet şoreşek netewî bi destên şivan, gavan û nezanan va çênebûye. Xwedê rama xwe lêke, Ispartakus ji dewletek nokeran-köle-çêkir, balam jina wê dewlete dirêj nebû, li zîkê heyamek heri kurt de hate hilşandin, hate xurandînbî sedhezaran ew kesên hejar û belengaz cangori bûn. Naha ez li te pîrs bikim zava, çira ew tevgera Ispartakus serneket, çira?. Ji ber ku nokerên hejar û belengaz, kesên ne xwende bûn. Ne hesab û matematik dîzaniyan, ne Sosyoloji, ango kar û berên civaki, ne ji Xurîşt û Pisikoloji, Fizik û Kimya, Dirok û Erdnigariya cihan û welatê xwe dîzaniyan. Kar û

berên dewletê çito têne meşandin nedızanibûn, lı zaninên werr dūr bûn. Lı dawiyê de hemû telef bûn û disa Împaratora Roma ew sazûmana û dolıwgeriya kire destên xwe û serket.

Lı vir naha em dagerın ser rewşa me Kurdan. Çıra heyra roja iro dewletek me Kurdan tune? Jı ber ku gelê me qasa dijminên dorbera xwe ne xwendiyê. Tırk û Ereb û Farıs'an nehiştine lı welatê meda ji dibistan ava bîbın. Wana her tım xwastine ku em lı dibistanên wan de bixwinın û lı binê tina-tesir-perwerde a wan de buminın û werın helandın, xwe wenda bıkın û bîbın Tırk û Ereb û Farıs. Jı bona ev ji, wana gelekı hewl dane û qêret kirine. Lê Xwedê şıkır ew daxwaziya wan nebûye û nehatiye cih, wê iro şuva ji ew daxwaziya wan wê nebe û lı loqleyên wanên tiji gemar de bimine. Zava ez ji tera vebiri-kesin-bibêjım, wê roj bê em ji lı bın bandûra dijminan de felat bîbın. Em ji ev welatê xwe ê wek bihişt Rızgar bıkın, bêt tırs û bêt xof serbılıd û aza bıjin. Ma çıkê me lı Tırk, Ereb û Farıs'an kêmıtre? Bejn û bala me, çav û biriyên me ji ên wan mêtinkaran, hov û xwinmıjan çêtırın. Aqılê me ji, lı qailê wan kêmıtir nine, em ji wan bıaqıltırın. Lê sed mıxabın ku em zef saf û dılpakın, zor dılsızın. Jı bona ev ji, em zû têne xwapandın, baweriyên xwe ji peyvên şirin tinın. Em dek û dolavan û rêzaniyê wek dijminên xwe nızanın. Jı bona ev ji, em her tım dibın nêçirên dijminan. Lê bıla mala felekê bışewıte, jı bona ev dılpakiya me, em kırın bın destê hın karbıdestên pis û mırrdar.

Herwaha zava, ez bawerım mın gelekı serê te êşand. Dıvê êdı ez van gotınan û ev babatê bıterıkınım û te û hişên te ligel hev bıhêlınım û dawı bıdım ev axaftına xwe.

Xıdê qet bersıvek neda Aliekber û bı hêdıka lı şûna xwe de rabû bervı kurê xwe meşıya. Wext ji êdı nêzıka êvarê bû û roj bervı ava dıçû. Siya çıyan û kaşan daketıbûn ser deşt û dūzan, çal û kortan, geli û newalan. Cotkaran cotên xwe berda bûn. Nir dabûn ser mılên xwe, mesasên xwe ji

kırıbûn destên xwe û ga'ên xwe diajotin, bervı malên xwe dıçûn. Jinên ku çûbûn kaxa zevıyan, çalên xwe tıji kax kırıbûn, avıtıbûn ser milên xwe bervı gund dımeşıyan. Şıvanê berx, kar û golıkan, berx, kar û golıkên xwe dadıgerandın malên xwe. Dik û mırişk lı pêş derê axuran de kombûbûn, dıxwastın ku bıçın hındır derkevın ser ref û çitên hevşan de hêsa bıbın, bıkevın xew. Melek û Xec ji derketıbûn pêşıya dêri, disa lı benda herdu Xıdan û Aliekber de mabûn. Zar û zêçên gund û hın xortên gund ji bervı pêz dıçûn, ku pezên xwe lı tev naxırê cûda bıkın bınnın mal. Lı kehran sıwar bıbın û kehran bıkın lecê. Pıştı çend hûrdeman de, naxıra pêz û dêwêr xwe gıhand bıne gund. Lı zıkê heyamek herı kurt de, hemû pez û dewarên gund lı hev cûda bûn û çûn xwe gıhandın malên xwedıyên xwe, ketın axur û hevşan de mexel bûn. Mi, bıızın û çêleka Xıdê ji xwe gıhandın pêşıya dêri. Herdu Xıd û Aliekber ji lı dû wan de bervı Melek û Xecê, bervı mala xwe dıhatın. Çawa ku ew heywan gıhiştın pêş dêri, Melekê pê serê miya xwe a nav Elif gırt û lı miya xwe şabû, çavê miya xwe maç kır û "ez qurbana canê te bım, Elifa mın" got. Lı wê demê de Xıdê piçûk ew gotına diya xwe bıhist û dexes bû, moca zaroktıyê lı ser gıran bû. Ji bona ew ji, ji diya xwera:

- Day ez bawer dıkım tu miya Elif ji me zêtır hezdıki, wer nine?" got û yekser derê malê vekır û kete hındırê malê. Ji bona ew Melek berxweket û lı pey kurê xwe kete hındır malê, xwe gıhand kurê xwe ji kurê xwera:

- Qenc guh bıde ser mın lawê mın, tu çıra usa dıpeyivi, mın berxwe dıxını û lı ev heywanan dexesıyê dıki?. Dıvê tu baş zanıbi, tu lı kûrahiya dılê mın de dıji. Te û Hesên, we lı kûrahiya dılê mın de ciheki herı gıring standıye. Ez miya Elif û heywanan bı cûreki dın û bı ruheki dın va hezdıkım. Tu evınıyê nızani, şol û meselan lı nav hev dıxını kurê mın. Bıha te lı gel mın, qasa bıha ev çıhanêye, bıha miya Elif ji, tenê qasa bıha mıyekıye. Naha tu serwext bûy?. Tu bı xwe ji qenc dızani, ku ev heywanana ku

nebin, em bı nanê tisi lı zikê saleki de hışk dıbin, dımırın, dıçın. Ew kevçiyê rûnê ku em dıkın nav sorxaça girmiyın, ew xwarınên ku em dıpêjın dıdın pêşiya mivaneki rûyê xwe sıpi dıkın, ew kasa dewê ku em hemû vedıxwın, evana hemû lı sawiya ev mi, bızın û manga Altûn daye. Jı bona ev e ku, ez dıbêjın ev heywanana canê mene. Rûnê me lı wane, toraqa me lı wane, çurtanê me lı wane. Ango ev heywanana ku nebin, rewşa me ne rewşe lawê mın. Lı milê dın de, ez hemû heywanên Xwedê zef hezdıkım, ev xurışta mîne kurê mın, got û kurê xwe kirê hembêza xwe û lı ber stuna malê de rûnişt û lı kurê xwe şabû. Balam disa çavên Melekê her diêşiyın. Jı bona ew ji Melekê bı desteki porê kurê xwe mıstdıda, bı desteki ji çavên xwe û gazi Xwedê û Xızır dıkır, ku ew werın jı wêra arikari bıkın, lê qet kesek lı hawariya wê de nedihat.

Bı ew şıklı va roj derbaz dıbûn û dıçûn. Aliekber ji dageriyabû Xarpitê mala xwe. Êşa çavên Melekê hatıbûn temırandın, balam piçeki pûs ketıbû ser çavên Melekê. Lı ew demê de Melek disa jı zarokan de ducan bû. Xıdê û Melekê dıxwastın ku, Xwedê keçıkeki ji bıde wan. Gundiyên Torût'ê hemûyan ceh, nûk, nisk, fik û kûşneyên xwe çınandıbûn anıbûn ser bênderan de gerandıbûn û zada wan çandınıyan rakırıbûn. İcar dor hatıbû çınandına genıman. Hemû gundi, tev jin û mêran çûbûn bı dasan genım dıçınıyan. Hın kesên kal, pir ji lı gund de bênder dıgerandın. Tava Rojê tin dıda, çermê beden û rûyê mırov dışewıtand, dıkır mina rengê sıfır û hesınê reş. Dasvan û kêlandivanên genıman lı nav xwe de dıketın lecê, xwe lı vi alide, lı wi alide radişandın, dıbırın, dıanin, te dıgot mina leşkeran hewerê-talim-dıkın. Dasvanan êlceg kırıbûn tılıyên destên xweyên çepê, tılıyên xwe dırêj kırıbûn. Wexta ku dasvan bı destê xwe ê rastê va dasa xwe lı sapê genım

dıda û bı destê xwe ê çepê va ji, bı êlcegan pê sapê genım dıgırt û ew sapa dıkır desti, êlceg lı devê dasê dıxıst, deng lı devê dasê de derdiket, dıkır teqe-teq şeqe-şeq, awazek xwaşık derdiket. Wexta ku hemû dasvan bı hevra xardıbûn, rastdıbûn, êlceg lı devê dasan dıxıstın, ew awaza bêtır xwaşık dıhat bihistın. Dasvanan destiyên wer dımûnan û radıkırın, ku mırov ecêb dıma. Her destiyeki wan dıbû pırnagek, dıbû gurzek. Ango mırov lı ew pêşdariya dasvanan têr nedıbû. Jın û zarokên Torût'ê ji pırnag komdıkırın, dıdan ser hev, bı gıman gırêdıdan dıkırın gurz, dûra ji lı kehr û qantıran bardıkırın, dıkışandın ser benderan, lod dıkırın. Dûra ji dor bı dor lı ser benderan deradıkıstın, gam dıdan ser û dıgerandın, dıkırın ka û malaxme. Pıştı ew ji makine dıdan ber malaxmê, ka û tene lı hev cûda dıkırın. Lı pıştı ewqas kar, ber û zemet de, herkesi zada xwe bı çalan dıkışandın, dıbırın, dıkırın ambar û pêtegên xwe de cih dıkırın. Ka ji, bı astır û xaşıyan va dıkışandın dıbırın dıkırın kadıman, jı bona heywanan, ku demsala zıvıstanê de bıdın heywanên xwe.

Roj, meh û demsalên Xwedê zû-zû derbaz dıbûn û dıçûn. Lı nav wan meh deman de Melek duxwaskan bûbû û Xwedê keçıkek mina topa nûr dabû Xıdê û Melekê. Disa keç û xortên gund sê şev lı mala Xıdê de reqısiyabûn, kêf kırıbûn. Disa gundiyan xwarınên cûr-cûre patıbûn, bırbûn mala Xıdê. Disa Xıdê naxırvani dıkır, dıçû ber pêz û dêwêr dıhat.

Xıdê navê keçıka xwe ji danıbû "Xwaskar". Xwaskar bı rasti ji Xwaskar bû. Çav û bıriyên reş-belek û bedew, te dıgot Xwedê bı taybeti afirandiye. Xwaskar ji roj bı roj mezın dıbû, êdi rûdınişt û dıkışıya. Hevin û payız zûva derbaz bûbûn. Hemû gundiyan Torût'ê lı dema payızê de

çiloyên xwe biriyabûn, avranên xwe kiribûn, ardên xwe ji kiribûn ambaran, çiloyên xwe ji kışandibûn, anibûn kiribûn kadinan û li paş xaniyan de lod kiribûn. Dêrsûm û hemû gund û bajarên Kurdistan li nav pûk û berfê de mabûn. Ava çemê Mızûr, Xarçık, Fırat û Mûradê cemıdıyabûn. Cemedada avên wan çeman ji rêwanan ra bûbûn berr û pird. Gel bi peya û sıwari, tev kervanên kehr û qantirên xwe va li ser cemedada avên wan çeman de derbaz dibûn, diçûn wi ali, dihatin vi ali. Nêçirvan derketibûn ser çiya û kaşan, nav deşt kortan, kew dipekandın û li dû kewan diketın, ku kewan biwestinın û dûra pêbigırın û nêçir bıkın. Jin û keçan disa pembû dijendın dıkırın lifık. Xaliçe, cacım, astır û balgîfên rengin çêdıkırın. Bı taybeti keçikên azew û gıranlıx ji bona bavaniyên-çeyiz- xwe doxin, keji, gore û tentene çêdıkırın. Zarok çûbûn ketibûn axur û kadinan de çavgirtık û veşortık dileyiztın. Kalên risipi, xort, mêrên ciwan li malan de rûniştibûn li nav xwe de qusedıkırın, çirok dıgotın, qal û behsa mêr û mêrxwasan dıkırın. Kesên dengbêj ji kılam û lawje distırandın. Rojên zıvıstanê li nav ba, bahoz û pûkan de derbaz dibûn û diçûn. Disa wexta cejna Xızır nêzık bûbû û pıraniya gundiyan berx, beran, gısk, nêri, bızin û mi ji bona qurbana Xızır girêdabûn, bı taybeti xwedi dıkırın, ku ew heywanana bêtır qelew bıbin û goşt bıgırın. Jin, keç û bûkan disa ji bona Qawûta Xızır genım dıqewırandın û bı destaran va dihêrandın dıkırın Qawût û dûra ji ew Qawûta bı taybeti dıkırın legan û sersuman de-küp-vedıřartın, ku li roja cejna Xızır de bıpêjin û li nav der û cinaran de belav bıkın. Lê ji bona Qawûta Xızır genımê weri paqij li mala Xıdê de tunebû. Ji bona ew ji, Xıdê jına xwe Melek li tev Xwaskara piçûk řandıbu gundê Ferhatan mala xısmeki xwe, ku Melek bıçe çapek genımê paqij bine û bıke Qawût. Li ew roj de hewa geleki ji qenc, esman sayi û řın, tava rojê ji cihan germ dıkır. Gundê Ferhatan li Torût'ê werqas dûr nebû û geleki nêzıke hevûdu bûn. Melek ji

nêzika nivrojê de çûbû Ferhatan mala xısmê xwe. Hesenê piçûk lıgel meta xwe Xecê de bû. Xidê mezın ji kurê xwe ê mezın Xid girtibû gel xwe, herdu hevra çûbûn mala kurapê xwe Mizûr. Mizûr pısmamê Xidê ê heqiqi bû. Mala Mizûr piçeki lı jori gund de bû. Jı xêncı herdu Xidan, lı mala Mizûr de gelek kesên dın ji hebûn. Ango gelek gundiye Torût'ê lı wê malê de kombûbûn, lı nav xwe de qısedıkırın, çay vedıxwarım, henek dıkırın, tıştık ji hevûdura dıgotın. Lı nêzika êvarê de hewa hate guhartın, berfê disa destpêkır, ba û bahoz lı nav hev ket, her der bû mij û dûman. Ba ki wer dıhat ku, te dıgot naha xaniyan lı ser erdê de radıke dıfırine, an ji hıldışine, dıxurine. Berf û pûkek wer destpêkırıbû ku, lı derva çav çavan nedıdıt. Xeca xwişka Xidê ji, lı tev bıraziyê xwe Hesen malda tenê mabûn. Jı bona ew ji Xec dıtırısiya. Bı taybeti Xec lı zaroktiya xwe de hatıbû tırsandın. Jı wêra qal, behsa cın, pêri, kefteran kırıbûn û gotıbûn" evana lı demên firêqet, lı demên pûk û berfan de derdıkevın, mırovan dıxwın" felanbêvan. Jı bona ew ji Xec her dıtırısiya. Lı pencereyên mala Xidê de cam tunebûn. Xidê lı şûna caman de, qaxızên rojnameki mina caman lı pencereyên mala xwe va, bı hevır zeliqandıbûn. Lê ew ba, bahoza bı hêz, ew qaxızana çırandın. Jı bona ew ji tırsa Xecê her çû zêde bû. Lı wê demê de Xec bı lez û bez lı şûna xwe de rabû, çû palasakehrê û hın paçên kevn girtın û pencere bı wan paç û palasakehrê va dadan û lı ber ronahiya ağır de, lı tev Hesen lı şûna xwe de rûnişt, lı hiviya bıra û bûka xwe de ma.

Lı aliya dın de ji, Melekê lı gundê Ferhatan de çapek genım lı xısmê xwe girtıbû kırıbû torbe, totbe ji lı stuyê xwe de dardakırıbû, Xwaskar ji kırıbû hembêza xwe rêketıbû, ku dagere were mala xwe. Lê lı rê de, ew ba û bahozê, ew pûk û berfê mecal lı Melekê bırandın. Melek ketıbû nav xema keçıka xwe. Pêçeka keçıka xwe kırıbû nav mlên xwe, serê keçıka xwe ji kırıbû bınc çenık û gew-

riya xwe, hewl dıda ku werge bimeşe, ew ba û bahoza xesereki negihêjine keçıka wê û wê pızêzê nexeniqine. - Melekê lı aliyeki de hewl dıda ku xwe lı nav ew tofanê de felat bıke û xwe bıgihêjine mal, lı aliya dın de ji dıkir qirin û hawar gazi gundiyan û Xwedê, Xızır dıkir. Lê sed heyf bû ku, qet keseki deng û hawariya Melekê nedıbıhist. Melek lı tev ew keçıka xwe a pızêz de, lı ber ew ba û bahozê de, lı vırde, wırde dıçû û dıhat, dıket û radıbû. Giri û qirina Xwaskarê ji dıl û kezewa mirov perçe dıkir. Ew pızêza lı hambêza diya xwe de dıket nav ew berfa sar û cemed, tozıka berfê dıket ser dev, çav û birıyan, hılm û nefes lı Xwaskarê dıhat birandın. Melekê xwe dıavıt ser keçıka xwe, disa ew lı ser berfê de radıkir, dıkir hambêza xwe ku bimeşe, an ji xwe bılivine, lê ba û bahoz, pûk û berfa zalım û bêbext ew rê û mecal nedıdan Melekê. Lı dırva ji zûrina gurên bıçı dıhat. Melekê xêncı fıng-e-fınga ba û bahozê, tozıka berfê, zûre-zûra guran û hewte-hewta kûçıkan bêtır, qet dengek nedıbıhist. Bı taybeti dengê kûçıkan, dengvedan dıdan çıyan û kaşan. Êdi hêz û teqat lı ling û jonyên Melekê de nemabûn, dilê Melekê zor dı-xebıtiya, deng lı Xwaskara piçûk de hatıbû birandın, qet dengek jı Xwaskarê de dernedıket. Lı nav ew rewşa heri dijwar û xırab da ji, disa Melekê hewl dıda, cat dıkir ku, xwe û keçıka xwe lı nav pûk, berf û wê xezewê de felat bıke. Lê êdi ew ne keys û bû. Ew berf û pûk, ew ba û bahoza êdi bûbûn Ezrailê canê Melekê û Xwaskara piçûk. Melekê çıqas ku berxwe dıda, werqas ji dıket û radıbû, hılm û nefes jê dıhat birandın. Lı dawiyê de hêz û teqata jonyan şıkiyan, hılm û nefes lı Melekê hate birandın û lı tev Xwaskara piçûk, lı nav berfê de dırêj bûn û bı ew rengi va can û ruhê xwe radeste ew pûk û berfê kırın, mı-rın çûn gihiştın rama Xwedê.

Lı piştı rêketına Melekê de, xofek mezın kete dilê kur-apê Melekê Heyder. Jı ber ku, ew ba û bahoza, ew berf û pûka nışka ve derketıbû. Jı bona ew ji, Heyder lepikên

xwe kırım destên xwe, hegala xwe avit ser serê xwe û lı ser şevqe ê xwe de bı qenci kip gırêda, hêdig ji kırım lıngên xwe, ço ê xwe ji girt û derket der, rêket, berê xwe da gundê Torût'ê. Roj ji êdi çûbû ava, mîxurba êvarê dest-pêkırîbû. Disa berf dıbariya, ba û bahoz her berdewam bû. Lê Heyder mina şêreki darıstanan bû, gurê rê û dıban, xorteki bejn bılınd, xorteki çeleng û sıpehi bû. Ew lı pûk û berfê, ba û bahozan qet nedıtırsiya. Heyder beri ku lı rêkeve, ji neferên malê ra:

- Ez bawerım me iro xelitek mezın kır. Dıvê me Melek tenê neşandana mal, em yek ji wêra bıçûna. Erê, lê rê a Torût'ê werqas dún nine, balam disa ji ew jınek bû, lı hambêza wê de ew pızêza hebû. Beri ku ew lı rêkeve, kambax hewa ji qenc bû, lê nıška ve ev ba û bahoz dest-pêkır, got û hêrsa xwe rakır.

Lı ew demê de jına Heyder Çıçegê ji mêrê xwera:

- Heyder bawerke, ez geleki lı ber Melekê geriyam, ku ew neçe mal. Bı rasti me hemûyan ji biriya wê kırîbû. Ji bona ev ji, mın ji Melekê ra got, tu wera guhdare mın bıke, işev lı me bıbe mıvan, sıbe çapek genımê xwe bıgıre û bıçe mal. Bıbe ku Heyder ji lı tev te were Torût'ê, lê mın çı kır nekır got" na û na mın ji Xıdê ra gotiye ez vedıgerım". Dûra rabû rêket û çû. Lı ev çüyına wê de, qet guneki me ji tune, got.

Heyder bı lez û bez derket der û berê xwe da Torût'ê. - Berf û bahozek wer hebû, ku mırov nedıkarbû ku bımeşe. Lê Heyder mina çiyayeki bû, nedıhat lıvandın. Pışti çend hûrdeman de, Heyder lı pêşiya xwe, lı ser berfê de tıştıeki reşık dıt. Lı destpêkê de got, bıbe ku kevíre. Lê lı dawiyê de, bı xwe bı xwera, na-na ez van deran qenc dızanı, lı ser ev rê de, kevír-mevırên usa tunebún, gelo ev çiye? got û bı lez xwe gıhand ew tıştê reş. Dıt ku çı bıbine, ew reşık bedena Melekê û Xwaskara pıçûkın û herdu ji xenıqıne, mırıne. Lı ew demê de, kela Heydar rabû, giriya, lı xwe xıst, kıre qıqın û hawar. Dıl û kezewa Heyder dışewı-

tiya, xwin lı ranên Heyder de sar dıbû. Lı nav rewşek werge de, Heyder meytê Melek û Xwaskara piçûk lı ser berfê de rakır, herdu dan ser hev, bı benê pêçeka Xwaskarê va herdu bı qenci hevra girêdan û ew da ser milê xwe û bı lez bervı Torût'ê meşiya.

Xidê naxırvan lı tev kurê xwe lı mala Mizûrê pısmamê xwe de, lı tev gelek kesan, lı wê rûniştibû. Xidê çûyina jına xwe Melekê ji, jı xwe birkırıbû, ketıbû nav gengeşiyên xwaş û şirin. Şev ji êdi tari bûbû, wexta şivxwarinê bû. Jı bona ew, Reşo ê İwê" hevalino, divê naha em rabın bıçın malên xwe, şiva xwe bıxwin, dûra em çarak dın dagerın bën vıra mala kek Mizûr, yan ji em lı mala meda kombı-bın, bıla kek Elo jı mera çirokan bıbêje, kek Xıdır ji, jı mera kılaman bıstırine, gelo hûn ji ev nêt û ramana mınra çı dıbbêjn? got û derket pêşiya dêri. Lı ew gotına Reşo de, icar Elo ê Êmoşê:

- Na-na hevalino, ez dıxwazım pişti şivxwarinê de, em lı mala meda kombıbin. İşev ez dıxwazım hûn hemû bıbin mivanê mın. Bawer kın paketek çaya mın ji heye, em bı hevra çayek teze vebıxwin, zıkên xwe piçeki germ bıkın, got û lı hiviya bersiva hevalan de ma. Lı pêş dêri de hemû kesan ew pêşneyara Elo pejırandın û dageriyan malên xwe, ku pişti şivxwarinê de dagerın mala Elo, çay vebıxwin.

Herdu Xıd ji gelesi birçi bûbûn. Jı bona ew ji lez dı-kırın ku, gaveki zû xwe bıgihêjinın mal şiva xwe bıxwin, zıkên xwe têr bıkın û dagerın mala Elo, çay vebıxwin. Bı lez xwe avıtın hındirê malê, balam mal lı nav tari û zulmatê de bû. Xidê deng lı jına xwe Melekê kır-lı gor texmina wi, Melek zûva dageriyabû mal-lê Xidê dengê Melekê nebıhist, Xecê bersiv da bırayê xwe, got" Xwedê mala we bışewıtine, ev çı rewşe, çıra tu evqas bûyi mıroveki bêt

pırsiyar? Tu û kurê xwe çûn mala Mızûr nehatın, Melek lı tev ew pızêzê çû Ferhatan danegeriya mal, ba û bahozê qaxızên pencıran çırandın û pûk û berf kete hındırê malê, ez û ev Hesenê reben lı malda, nav ev çar diwaran de mina du sêwiyan man".

Lı pışti gılı û gazineñ Xecê de Xıd yekser vecenıqiya serxwe, xofek mezın kete dilê Xıdê, bı hêrs pê milê xwişka xwe girt, jı xwişka xwera:

- Te çı got, te çı got? Ango heya ev seatê Melek nehatiye mal? Keçê tışteq neye serê bûka te? Wê qet usa nedikir, gelo çibû? Mın jı wêra got bısekin ez bıçım Ferhatan, wê rık kır û got, na, ez dıxwazım bıçım, lewra mın biriya Heyder û zarokan kırıye, nızam çı û çı. Pu nale lı ev bextê mın bê, naha ez çı xaliyê lı serê xwe kım. Çêtıre naha ez bıçım Ferhatan, hubıkım, çıra Melek danegeriya mala xwe, got û bı lez û rev derket der berê xwe da riya Ferhatan. Lê berf nedıbariya, ba û bahoz hatıbûn sekınandın û ewr belav bûbûn, lı esman de stêrik dıburuqiyan, hıvê şewq dida cihanê. Xıd çıto kû lı gund derket beri da Ferhatan, dit ku ewe miroveki tışteq daye ser milê xwe bervı Torût'ê tê. Lê Xıdê çu tışteki bed neani bira xwe û bervı wi mirovi meşiya. Lewra riya herdu gundan yek bû. Pışti du-sê hûrdeman de Xıd û Heyder hatın hemberi hev û hevûdu bı qenci ditın, naskırın lı wê gavê de agırek ket dilê Heyder bû mina agırpjı û volkan, xiskiniyek pêket, destpêka giri kır. Lı ew gavê de Xıdê xwe şaş kır, jonyên Xıdê şikiyan, xwin lı bedena Xıdê de sar bû, nezaniya ku çı bıke û çı bıbêje. Lı pışti çend hûrdeman de Heyder deng lı Xıdê kır:

- Bıborine pısmamê delal, beri ku Melek derkeve, ez lı malda nebûm. Melekê jı guhdare zarokan nekırıye, rabûye lı tev ev pızêza xwe rêketiye, ku were mal. İcar lı pışti derketına wê de, ew berf û pûk, ew ba û bahoz destpêdike û lı rêda ev herdu canana lı nav berf û pûkê de dıxenıkın û dımırın. Lê wexta ku ez hatım mal mın Melek nedıt û

zarokan ji mınra gotın, Melekê guhdare me nekır rabû çû, bawerke xofek kete zıkê mın û ez rabûm pê wê ketım. Lê sed mıxabın ku ez dereng mabûm û lı rêda ez raste meytên wan hatım, got û disa kıra xiske- xisk giriya.

Aqıl lı serê Xidê de nemabû, nedızanıbû ku çı bıke û çı bıbêje. Dûra Heyder pê milê Xidê gurt û "serê te û zarokên te xwaşbın, em çı bıkın, bırayê delal, bextê Melekê û bextê Xwaskara piçûk ji usa bûye. Xwedê lı ser eniya wan ji usa nıvisandiye. Em nıkarıbın lı dıji fermana Xwedê de ji derkevın" got û Xid hêjand û yekser Xid vecemıqiya ser-xwe û destpêka giri, qirin û hawariyê kır. Girin û qirina Xidê bû mina dengê topek leşkeri dengvedan da gundê Torût'ê, gund lı bında hêjand. Hemû gundi derketın derguh dan ew dengi. Dûra têgihiştın û lı xwe hesiyan ku, ew qirin û hawariya Xidê naxırvane. Hemû gundi ecêb man, qet tışteq fêm nekırın. Lı ew demê de pısmamê Xidê Mızûr, Reşo û Elo bı rev û bez xwe gihandın cem Xidê. Dıtın ku ewe meytê Melek û Xwaskara piçûk lı ser milê Heyder dane. Heyder çiroka mırina Melek û Xwaskara piçûk ji wanra ji dengkır û hemû bı hevra bervı mala Xidê meşıyan. Êdi hemû gundi ji lı ser ew bûyera reş agadar bûbûn, berxwe dıketın û dıgiriyan. Pışti heyamek heri kurt de, meytê Melek û Xwaskara piçûk gihandın mal. Şiniyek mezın kete mala Xidê. Xec dıgiriya û porê xwe dırûçıkand, Xidê piçûk lingê dayika xwe kırıbû devê xwe, lingê diya xwe dımit, maç dıkır, dıqiriya û dıgiriya. Jinên gund lı dora herdu meytan de rûniştıbûn dıgiran. Hın jinên deng xwaşık lı ser Melek û Xwaskara piçûk kılam û lawje dist-randın, dılorandın. Lawjeyên wan jınan kela dilê mırov radıkır, dil û kezewa mırov dışewıtand, dax dıkır. Ew jınana her yek mina hozaneki bûn. Lı eyni hûrdemê de gotın û helbestên wer lı dilên xwe de derdixıstın ku, mırov ecêb dıma, bawer nedıkır. Bı dengê wanên xwaşık va hemû kes dıgiriyan. Girina wan kesan dıketın nav hev dibû awazek pırr dengi, awazek mina koro.



Lı pışti nivê şevê de hemû gundi dageriyabûn malên xwe. Reşo ê İwê ji herdu Xid bırıbûn mala xwe, çend jinên porsipi ji, ligel herdu meyitan û Xeca azew de ci-hiştibûn, ku ew lı meyitan bıpên, ligel Xecê de biminin. Heyder ji çûbû mala Elo, lı wê ketibû xewê. Lê xewa Xidê qet nedihat, Xidê lı nav nivinê de dıkır xiske-xisk û dıgiriya, berxwe dıket, xem dıkır. Lı nav rewşek werge de seat û hûrdem zû-zû derbaz dıbûn û dıçûn. Disa berbanga sibê destpêkırıbû, dikan bang dıkırin, qıre-qıra dikan bû. Xidê belengaz ji werqas gıriyabû ku, êdi hıstêr lı çavan de nemabûn. Hemû cihana Xidê xuriyabû, qet hêviyek lı dilê Xidê de nemabû, lı nav nivinê de mina dareki dırêj bûbû, mabû. Xidê piçûk ji, pışti nivê şevê de pêva çûbû ketibû xewek kûr, deng jê dervedıket.

Belê, ronahiya sibê de disa hemû gundi lı mala Xidê de kom bûn. Hemû kesên ciwan tevır û bêrên xwe gırtın û berê xwe dan gorıstana gund, ku bıçın tırba Melekê û Xwaskara piçûk bıkolın. Lê hewa gelekı sar bû, berf qemıriyabû, bûbû êrxûç, mina kevir. Jı bona sermayê ji, hemû kesan lepikên tıftık kırıbûn destên xwe, ku destên wan neqemırın. Pışti pêdandına şûna herdu tırban de, destpêka kolandına herdu tırban kırın. Lı malda ji, jinên porsipi, lı derva ser berfê de agırek dadan û sitıla avê dan ser ağır, ku wan herdu meyitan bışon û dûra bıbın çal bıkın. Balam lı nav jınan de ew kesa ku, lı ser meyitê mırıyan de Quranê bıxwine, ew tunebû. Jı ber ku, lı herêma Dêrsım de, him dıbıstan tunebûn, him ji mamos-teyên bı zımanê Erebi. Quran xwendın ji, dıviyabû ku mırov bı Erebi bıxwendana. Jı ber ku, dıgotın" zımanê Quranê, zımanê Xwedê ye û zımanê Xwedê ji naye çapkırın û naye wergerandın". Bı taybeti hın kesan Quran tenê jıber kırıbûn dıxwendın, balam qet peyvek lı xwendına xwe fêm nedıkırın. Jı wan ra ji" kesên xwende û mele dıgotın". Lı bılı ewqas kêmasiyan de, lê disa ji jınan meyit çawa têne şoştın baş dızaniyan. Jı ber ku lı hemû gundên

Kurdîstan de nexwaşi û mîrîn her zêde bûn. Ango roj û mehe tunebû ku li gundeki de yan mêrek, yan ji, jin û zarokek nemire. Li aliya din de, tiştê heri balkêş û girîng ew bû ku, li herêma Dêrsim de ne nexwaşxanek hebû, ne bijjkek û ne ji dermaneki bî zanisti. Jî bona ew ji, êdi gel bûbû bijjken hevûdu. Hemû kesan qenc dîzanibûn ku meyit çito têne şoştin. Li ew aliye de gelek jin û mêrên pîspor hebûn, qet keseki ji xem nedikir.

Disa hemû jinên gund li dorbera herdu meyitan de rûniştibûn digiriyan dîstirandin. Xidê ji piştî xwe dabû diwêr, serê xwe ji kiribû nav herdu jonyên çêqên xwe, werge noqin-dalmak-bûbû, li şûna xwe de mabû. Xid werqas giriyabû ku, çav li ser Xidê bûbûn sîlqên sor. Li ew demê de tiştê heri girîng hate bira Xidê û Xid vecenqiya serxwe, bî xwe bî xwera" eywax ax li serê min, ez ev jina xwe a reben û ev keçika xwe li çî bîpêçim û çal bîkîm. Ne qirûşek dîrav li bêrika mînda heye, ne ji çend metro caw li mala mînda tê ditin, gelo naha ez çî bîkîm" got û bî lez derket pêşiya dêri, yekser çû cem Eloyê Êmoşê, pê milê Elo girt û li nav gel da derxist der, jî Elo ra:

- Kek Elo ez ketime bextê te, ez naxwazim ev meselê jî pîsmamê xwe Mîzûr ra vekim, ez naxwazim ew zanibe jî. Bawerke qet qirûşek dîrav li bêrika mînda tune, gelo ez kefenê van belengazên xwe li kuderê de peyda bîkîm? got û disa destpêka giri kir. Li pey rewşa Xidê de, icar Elo:

- Kek Xidîr evqas berxwe mekeve lo, ew kara zûva amade bûye, kefenê ev herdu belangazên te hatine dûrin û amadene. Mîn ev rewşa te baş dîzaniya. Jî bona ev ji, li malda topek caw hebû, mîn li berbanga sîbê de, ew topa caw ani da jinan, ku ew jî ev herdu rebenên tera bîkîn kefen û bîdûrin, amade bîkîm. Jinan ji ew kara li zîkê pênc hûrdeman de qedandin û çû. Jî bona ev ji tu qet berxwe mekeve. Ma kek Xidîr cinarti jî bona kijan rojêye? Ma em li kijan rojê de qedra hevûdu zanîbîn? Lê ku li rojên usa de em jî hevra nebîn yar, jî hevûdu ra ku nebîn

arîkar û destên xwe dirêje hevûdu nekîn, ma kijan rojêde em jî hevra bîbîn yar û arîkari bîkîn?. Naha tu dilê xwe fereh bîke, qet metirse û biçê lî hîn kesên xerib ra mijûl bibe. Lewra hîn kesên gundên din jî ev nûça bîhistîne û hatîne. Ango tu biçê ba wan kesan, xem meke, ez û Reşo hemû tişt çareser dikin, qet kêmasiyek jî tune. Jî bona kesên xerib û mivanan jî, disa der û cinaran hemû hazîriyên xwe kîrîne.

Êdi çu kêmasiyek nemabû. Xort û mêrên cîwan herdu tîrb kolandibûn û amade kiribûn, lî benda herdu meyitan de mabûn. Jînan jî kar û berên kefen û hemû tiştên din qedandibûn, lî hiviya meyit şoştîne de mabûn.

Lî nav jînan de jîna Mîstefayê Kekê, jînek herî kal û porsîpi bû. Navê jîna Mîstefayê Kekê Kûbar bû, jî wêra" Amojîna Kîw" dîgotin. Amojîna Kîw, ne tenê meyitên jînên gundê Torût'ê dişoşt, her usa jî, lî rojên mîrîna jînên gund-mundên din de jî, gazi wê dikirin, Amojîna Kîw jî diçû, meyitê wan jînan dişoşt, ew karê xwe bî serfirazi derbaz dikir û tev hîn dirav û diyariyan de, dadîgeriya mala xwe.

Heyam nêzîka nivrojê bû. Av lî derva germ bûbû, êdi hemû jînan lî benda meyit şoştîne de mabûn. Amojîna Kîw bî lez rabû serxwe û jî jînan ra:

- Jî mêran yekî ra bîbêjîn, bîla du gaman binî daynî nêzîka sitîla avê, êdi ez meyitê ev herdu belengazên Xwedê bîşom, got û derkete der, çu lîgel sitîla avê de sekîni.

Lî piştî du-sê hûrdeman de, çend mêr çûn du texte gam anînan danî ser berfê û lî cem jînan de wenda bûn.

Amojîna Kîw berî ku destpêka meyit şoştîne bîke, huskerek av girt da destê jînikêki, jî ew jînikê ra:

- Tu bî kerema xwe ev avê bigire lî destên minke, got û huskera avê da destê jînikê, jînikê jî ew huskera avê girt û lî destên Amojîna Kîw kir û Amojîna Kîw destên xwe şoştin û sîlaweta xwe anî, got" Ya Xwedê, ya Eli û Mîhamed, ya Hesên, Husên û diwazde imamên Kerbelayê, ya

Xızirê ser kelek û keştiyan, çem û newalan, derya û dengizan, ya Dızgûn Bawa û Tûjik Bawa, ya Bamasûr û diwarê wi ê Moxındiyê, ya Kurêş Bawa û Avdelmûsa, ya Roj û Hiva Zeri, ya hemû ziyaretên ev cihan" dûra lepıkeki bı caw kire destê xwe, qalıwek sawûn jı gırt û destpêka meyt şoştınê kır. Amojına Kıw him ew meytana dışoştın, him jı lêvên xwe lihev dıxıstın tışt-mışt dıgotın, balam qet keseki nedızanıbûn ku Amojına Kıw çı dıbêje.

Bı ew şıkli va, Amojına Kıw lı hındirê niv seateki de, ew herdu meytana şoştın û jı bona kefen kırınê amade kırın. Dûra lepık lı destê xwe de ani der, gazi çend jınan kır û bı hevra kefen avıtın bınê herdu meytan û bı qenci kefen kırın û bedena wan lı nav ew cawê sıpi de wenda kırın û disa ew herdu meytana bırın hındirê malê lı ser doşegeki de danin û lı hiviya Quran xwendın û kar-berên dawi de man.

Lı hındirê mala Xıdê de cih tunebû ku mırov rûne. Avdılah xoce jı lı paş serê herdu meytan de rûniştıbû bı Erebi Quran dıxwend, cıvatê ji"amin-amin"dıgot. Herdu Xıd û Xec lı tev gelek kesên dışewat û dılhınık de dıgiriyan, dılorandın. Pışti çend hürdeman de Avdılah xoce Quran xwendın qedand, dûra hemû cıvat yek û yek çûn keleyên xwe lı wan herdu meytan bırıyan, singên wan maç kırın, yên ku diravên xwe hebûn lı bêrik û kiseyên xwe de dirav derxıstın avıtın ser singê wan meytan û derketın der, lı benda derxıstına herdu meytan de man. Dûra çend kesan meytê Melekê gırtın bırın der, dan ser çar daran, yeki jı Xwaskara pıçûk kire hembêza xwe bır û ew kara pêk ani. Lı derva çar kes ketın bınê meytê Melekê, yeki jı disa meytê Xwaskara pıçûk kire hembêza xwe û cıvat bervı gorıstana gund meşıya. Lı nivê rêde herdu meyt danin ser erdê, rakırın jor, nımêje herdu meytan kırın. Lı nımêja cenezande Avdılah xoce" ey cıvata muslimin, hûn lı ev kesana razine, yan na" got, pırs kır, cıvatê ji" em razine, bıla Xwedê jı lı evana razıbe" gotın û herdu meyt

bırın çal kırım, axa reş kırım ser bedene Melekê û Xwaskara piçûk dewisandin lı zıkê axa reş da wenda kırım û lı wê gelek cinaran cıvat lı nav xwe de parve kırım û her maleki neh, deh, bist kes mivan girtın û bırın malên xwe kırım mivan, xwarın dan mivanan û zıkên xwe û mivanên xwe têr kırım. Lı pişti ew, disa hemû kes dageriyan mala Xidê, serxwaşi jı Xidê daxwaz kırım û xwatırên xwe xwastın û dageriyan çûn malên xwe.

Lı mala Xidê de şiniya Melekê û Xwaskara piçûk berdewam bû. Sıbe de heya êvar Xidê piçûk dıkıre xiske- xisk dıgiriya û dılorand, dil û kezewa mırov perçe dıkır. Carna serê xwe lı diwêr dıxıst, dıgot" day tu çıra lı nav ew pûk û berfê de rêketi, ku weri mal? Te çıra ew xwişka mına piçûk jı xwera bır? Ma Qawûta Xızır jı bona te ewqas giring bû? Ma çıra ew Xızıra lı hawariya te û Xwaskara piçûk de nehat? Ma te çıra ez û Hesen sêwi hiştın û te lı nav meda koçê xwe barkır û tu çûyi? Ma iro şuva em jı kêra bibên day, jı kêra bibên yadê?"

Lı ser mırına Melekê û Xwaskara piçûk de du roj derbaz bûbûn. Lı derva jı hewa sayi û tav bû, berf bûbû êrxûç diburuqiya. Hın gundiyeş Torût'ê jı dıxwastın ku bıçın Xarpitê, jı xwera dayin-standinê bıkın û hın nûçan-mûçan jı kom bıkın, disa vegerın werın malên xwe. Lı nav wan kesan de, Reşoyê İwê jı hebû. Beri ku Reşo rêkeve bıçe Xarpitê, bı xwe bı xwera" beri ku ez rêkevım, çêtire ez seriyeki lı Xidê Apê Memê xınim, dûra herım Xarpitê" got û meşiya çû mala Xidê, deri vekır û kete hındır. Xidê çito ku Reşo dit, lı şûna xwe de rabû serxwe" oh tu xêr hati kek Reşo, fermo keremke rûne" got, kursi dirêje Reşo kır, Reşo rûnenışt û jı Xidê ra:

- Kek Xıdır, iro nêta mın heye, ku ez biçım Xarpitê.
Çawa ku tu ji qenc dızani, ev bêtara ku hate serê te em
geleki xemgin kırım. Lı bıli ev, nûça xesû, xezûr û bûrayên
te ji lı ser ev mırına Melekê û Xwaskara piçûk de tunemin.
Tu ku dıxwazi ez herım mala xezûrê te, ev nûça reş bıdım
wan ji. Ku tu dereng bıhêlini, ez bawerım Apê Eli ji te
bıxeyide, subıkeve. Ev ji nabe, gelo tu çı dıbêji, em çı
bıkın? got û lı benda bersıva Xıdê de ma. Lı pey ew pırsê,
ıcar Xıdê:

- Welleh kek Reşo ez ji lı ev baweriyêdame. Mın ji pırr
dıxwast ku ez bêt wan Melekê û Xwaskara piçûk çal-
nekım, lı hıviya xezûr, xesû û bûrayên xwe de buminım.
Balam tu bı xwe ji qenc dızani ku, rê ji geleki dûre, dûra
hewa pûk û berf bû, mın nedıkarıbû ku nûçeki bışınım
pey wan, wana bınum vıra. Çêtre tu bıçı mala wan ev
nûça reş ji wanra bıbêji, derengi nabe. Ev lı aqılê mında
bû. Tu ku iro neçûna Xarpitê, nêta mın ew bû ku, sıbe ez
bı xwe bıçûma. Herwaha, tu bı kerema xwe bıçe mala
wan, jı wanra bıbêje, got û lı tev Reşo derket pêşiya dêri û
Reşo rêkır, bı xwe ji disa dageriya hındır malê, rûnişt û
kete nav derd û kul û xeman.

Belê, Xıd lı ber sobe ağır de rûniştıbû, bı meşa ağır va
xaliya ağır tevdıda, xali xêz dıkır û ketıbû nav noqına xem
û xeyalan. Xıdê piçûk ji disa dıkıre xiske-xisk dıgiriya. Lı
aliya dın de ji Hesên dıgiriya û dıgot" ez bırçime û ez
bırçime". Lı wê demê de Hesên êdi sê salni de bû, balam
aqılê xwe nedıgıhişt mırına diya xwe û xwişka xwe. Xeca
reben ji çı dıda Hesên, Hesên qıma xwe lı wan xwarınan
nedani û bêtır dıkıre qırin û hawari. Xecê nan û toraq
dıdayê, wi dıgot "na". Girmi dıda ber, disa dıgot "na" û
pin lı tasa girmiyê dıxıst û girmi dırıjand. Ango Hesên bı
wi şikli va Xeca belengaz eciz û bêzar dıkır. Xecê carna pê
pozê Hesên dıgırt, kevçiyê girmiyê, an ji kevçiyê şir bı
zorê lı gewriya Hesên de dadıkır û bı zorê zikê bıraziyê
xwe têr dıkır. Zira Xecê pışti gotın û şıretên Aliekber de,

êdi her roj şir dıda Hesên, jî jinên cinaran ra pêşneyar dîkir ku, êdi ew jî şir bîdî zarokê xweyên biçûk û zarokên xwe biçî nehêlin.

Hewa gelekî tav û xwaşîk bû. Reşo li tev hevalên xwe berrî Xarpîtê dimeşîyan. Li nêzîka êvarê de xwe gihandî bajêr. Piştî biçek dayî û standî de, Reşo berê xwe da gundê xezûrê Xîdê, çû li Mala xezûrê Xîdê Apê Eli de bû mivan. Aliekber li tev birayên xwe, ew hemû li malda bûn. Çawa kû Apê Eli, Aliekber û hemû neferên malê Reşo ditin" wey tu xêr û sîlamet hati, ser-ser û çavên mera hati, gelo kijan ba i tu avitî vîra kek Reşo" gotî û hemûyan Reşo dewate hîndîr kirî û Reşo birî hîndîr dan rûniştandî. Piştî rewş-dem pîrskirî de, îcar Apê Eli û jîna wî, rewş û dema keç, zava û newiyên xwe, Aliekber û birayên xwe jî, xwişk, zava û xarziyên xwe, rewş û demên wan pîrskirî, çawane, çawa nînin, felan-bêvan, Reşo bî xemgîni ew nûça rêş da hemû neferên wê malê û ew bûyera jî wanra got. Îcar şûna şabûniyê de, şîniyê destpêkirî û hemûyan li xwe xîstî û girîyan. Reşo çî dîkir, nedîkir, ew xemrevî nedîkirî, girî û lorandî her zêde dibû, li Xîdê diqeheriyan. Apê Eli û jîna xwe digotî" çîto Xîdê bêy me keçî me û newiya me çalkî". Aliekber û birayên xwe û xwişka wana nav Xeycan jî, digotî" çî heqê Xîdê hebû, kû Xîd xwişka me û xarziya me bêy me çal b.ke. Ango her yekî tiştê digotî û digirîyan, berxwe diketî. Bî taybetî digotî" çîra Xîd bî xwe neçûye Ferhatan û Melek şandîye. Balam bawer nedîkirî kû ew xwasteka Melekê bû.

Apê Eli û tev hemû neferên malê, wê şevê xew nekîrî, heya berbanga sibê girîyan şîni danî. Li berbanga sibê de jî, Apê Eli tev jîna xwe û sê kurên xwe va rabûn û berê xwe dan aliya Xozatê, gundê Torût'ê. Li piştî gelek dijwariyan û nêzîka êvarê de xwe gihandî mala zavayê xwe.

Kesên ku ew ditin, ew ji hatin mala Xîdê de kom bûn. Îcar şiniyek nû li mala Xîdê de destpêkir. Hemû dîgiriyan û berxwe dîketin. Pîştî serxwaşi xwastinê de, yekser çûn ser tîrban, tîrb maçkîrîn, giriyan, dûra disa dageriyan mala Xîdê. Li mala Xîdê de, Îmamê Hesê jî Apê Eli ra:

- Apê Eli tu usa berxwe mekeve, ev fermana Xwedê'ye. Xwedê jî bona me qûlên xwe gelek celeb-çeşit-mîrîn derxistiye. Mîrîna keç û newiya te jî, jî celebek mîrîna Xwedê ye, em nîkarîbîn tîşteki bîkî û tîşteki jî bibêjîn. Hîn kes li avên çem, newal û deryan de dîxeniqîn dîmîrîn, hîn kes bi nexwaşiyên cûre-cûre va dîmîrîn, hîn kes dîbîn nêçîrên heywanên har û hov, perçe dîbîn, dîbîn xwarînen wan heywanên har û hov, dîmîrîn, dîçîn, hîn kes li şer û pevçûnan de têne kuştin, cangori dîbîn, hîn kes li ser dar, kevir û zinaran de dîkevin dîmîrîn, dîçîn rama Xwedê. Ango jîyan bi xwe usaye Apê Eli. Lê mîrîna herî zor gelo tu dîzani çî cûre mîrîne?. Li gor baweriya min, mîrîna herî jan û êş, mîrîna pevçûn û şerane. Em qûlên Xwedê têne hemberî hevûdu, hevûdu dîkujîn, jî hevûdura hezar cûre dafîkan çêdîkîn, şûr û kêran dîkşînin serê hevûdu jêdîkîn, bi tîfîng û topan, canê hevûdu qul û perçe dîkîn û hevûdu dîkujîn, telef dîkîn. Ango mîrov evana tîne bira xwe û ber çavên xwe, ecêb dîmine, qet manekî nade van kîret û karan. Tu dînhêrî li alîkî de cihan bi destên qûlên Xwedê, nû û nûjen dîbe, şarezayî pêşva dîçe, li alîya dîn de jî, disa em qûlên Xwedê jî hevûdura bi hezaran dek û dolavan amade dîkîn, ku em hevûdu bîkujîn, jî bona xwîn rijandî û qîr anîna hevûdu her cûre çekan, top, tank û fîrokan çêdîkîn, got û rabû xwastîrê xwe xwast û dageriya mala xwe.

Şeva duwem bû, ku Apê Eli û tev jin û zarokên xwe, li gundê Torût'ê, li mala Reşoyê Îwê de mîvan bûn. Hemû

der û cinarên dılsoz ji lı dor Apê Eli de kombûbûn. Hiv lı aliya Rojhilatê de mina bënderek gilower derketibû, ro-nahi dıda cihanê. Disa bı milyonan stêrik lı jor esman de diburuqıyan, şewqa wan diket nav şewqa hiva Zeri. Hindirê mala Reşo ji, lı nav mij û dûmana titûn û cıxaran de mabû. Kê lı bêrika xwe de qutiya titûna xwe derdixist titûn dıkir qelûn, an ji korcıka xwe, bızûtek agir ji bı destê xorteki cıwan va dıda ser devê qelûn, an ji korcıka xwe û titûna xwe vêdixist, hın kesan ji titûn dıkirın nav qaxızeki dipêçan û vêdixistin, dıkışandın û ha dıkışandın, dûman lı devê wan de mina dûmana devê lûla trêne derdiket û hindirê malê nav mij û dûmanê de dıma. Xortên cıwan lı aliki de bızûtên agir dıgirtın dıdan ser titûna qelûn û korcıkên mezınan, titûna zıkê qelûn û korcıkên wan vêdixistin, lı aliya dın de ji, xavli û pêşkir avıtıbûn ser milên xwe xızmet û azeta mivanan dıkirın, çay û qewe dıdan mivanan. Keç û jınan ji Zerfet avıtıbûn binê sêla agir, lı hiviya pijiyandına Zerfetê de mabûn. Hın keçan ji çurtan dıpişartın dıkirın dew, ku ji bona Zerfetê her tışt amade bıkın. Jınên porsipi û kalemêrên gund lı nav xwe de ketıbûn zıkê guftûgoan, gengeşıyan, raberzina hın çirok, meselê û bûyeran dıkirın. Lı nêzıka seat nehê şevê de, Zerfet amade bû, hemû mivanan Zerfeta xwe xwarın û heya nivê şevê lı nav xwe de gengeşi kırın û dûra herkesi xwatirê xwe lı malxweyê malê û Apê Eli xwastın û derketın der çûn malên xwe, ketın xewa kûr. Rojtıra dın lı berbanga sibê de, Apê Eli rabû serxwe, gazi jin û zarokên xwe kır, ew ji hişyar kırın, xwatirê xwe lı Reşo û neferên mala Reşo xwast û çûn mala Xidê zavayê xwe, ew ji lı xewê de hişyar kırın, xwatirê xwe lı wan ji xwastın û çûn çavên Xidê piçûk û Hesen ji maçkırın û berê xwe dan riya Xarpitê, bı dilkeseri û dılxemgini dagerıyan mala xwe.

Roj û mehe zû-zû derbaz dibûn dîçûn. Disa bîhar, havin û payiz şuva mabûn, zivîstanê destpêkîrîbû. Disa hewa sar, ba û bahoz, berf dibariya. Disa xaniyên gundiyan lî nav berfa sîpi de wenda bûbûn. Disa nêçîrvanên kewan derketîbûn ser kaş û çîyan refên kewan lî binê kevîr û zînanan de, qul û şîkeftan de radîkîrîn, dîpîkandin, dîgotîn" ha hat û hat" lî pey kewan dîketîn, lî ser kevîr û daran de dibezîyan, bazdîdan. Gundîyan berfa ser pîştî xaniyên xwe dîmîştî, sîvingên xaniyên xwe bî şonîkan tîpûç dîkîrîn. Tape-tapa şonîkan dibû mîna awazek defê, dengvedan dîda gund, çîya û kaşên hember gund. Hînekan jî ka dîavîtin ser pîştî xaniyên xwe, darluq dîkîrîn ser luq xaniyên xwe luq dîkîrîn, ku pîştî xaniyan dîlop nekîn. Disa zar û zêç ketîbûn axur û kadînan de çavgîrtîk û veşortok dîleyîztî. Hîz zarokên hûr jî bî lîngên xasî derketîbûn der lî ser berfê de xwe xîj dîkîrîn. Berf dîkîrîn destên xwe dîgîvîştî dîkîrîn top, dîavîtin hevûdu, hevûdu dîşandî. Bî wî şîklîva dest û lîngên wan sor dibûn, dibûn mîna lîngên kewan dîtevizîyan, lê disa jî nedîxwastî ku dagerî malên xwe. Dûra tîliyên dest û lîngên wan jan dîdan, dîşewîtyan, jan û êşê xwe dîda dîl û kezewa wan zarokan, îcar dîkîrîn qîrîn dîgîrîyan. Dayîkên wan zarokan ew zarokên xwe lî ser berfê de dîgîrtî dîkîrîn hem-bêzên xwe, dîbîrîn hîndîr mal. Dûra dest û lîngên wan zarokên xwe dîkîrîn nav avek çêrmgerm, ku wê jan û êşê bîdîn sekîmandî, qîrîn û gazîna wan bîbîrîn, wana haş bîkî. Hîz kesan jî bî tawûgan lî ser çîya û kaşan de êzîng û çîlo dîkîşandî dianî malên xwe. Disa keç û jînan teşî dîrîstî, xalîçe, astîr, cacîm û balgîfên rengî çêdîkîrîn. Lî nav dem û navçeeq werge de Xîdê naxîrvan lî mala xwe de rûmîştîbû, kûr kûr dîhênjîya û bî dîlda dîgîrîya. Lî dilê xwe de dîgot" Xwedê o, ez çî xalîyê lî serê xwekîm, heya çî wext ez ev tengasîyê bîkîşînim, van herdu zarokên xwe sêwî bîhêlînim, bî ev rewşa hejarî û xîzaniyê de çîto van sêwî-



yên xwe xwedi bikim, doliwa xwe bimeşinum? Ya rebê alemê tu ji minra deriyeki veke".

Xîd li nav xem û xeyalên werge de li ber sobê de rûniştibû. Xîdê piçûk ji li ber piçêriga agir, li ser astireki de paldabû, ketibû xewê pêva çûbû. Xec ji li Hesênê piçûk ra mijûl dibû, bêdengiyek ketibû hındirê malê. Li wê demê de, nişka ve Eloyê Êmoşê deri vekir û kete hındirê mala Xîdê, Xîd vecemqand serxwe û ji Xîdê ra:

- Dema te bi xêr kek Xîdir, ev çî rewşe tu evqas noqin bûyi û evqas dihiziri, gelo xêre? got, li ser ligan de sekini. Xîdê bi lez kursi da Elo" fermo-fermo kek Elo keremke danîşe, tu xêr û sılamet hati bırayê delal, kijan ba i tu aviti vê aliya mala minê hejarê Xwedê" got û Elo da rûniştandin. Pişti rewş-dem pırskırmê de Elo cıxarek ji xwera pêça û vexist, du-sê hılm kışand û dūra peyvek li wir de, peyvek li wir de ani, li dawiyê de ji Xîdê ra usa got û usa pêşneyar kir:

- Kek Xîdir, li gor birûbaweriya min ji tera zewac divêt, zewac pêwiste. Lê ku tu guhdari min bırayê xwe diki, ji tera sedi-sed keçikek şir helal divêt. Ji xwera keçikek şir helal bibine, bızewice. Bibe ku sibe qismeteki ev xwişka te derkeve, ew ji biçê mêrbike û bızewice. Gelo wê çaxê rewşa te û rewşa van zarokên te çawa bibe? Ki ji mivaneki tera karguzariyeki bike? Ki ji tera û zarokên tera nan û xwarineki bipêje û amade bike? Ki ji tera wan heywanan bidoşe û kewantiya ev malê bike? Bi kurtasi divê tu van tiştana hemû bini ber çavan. Dūra tu hina cıwani, xorti, ji tera jin divêt, jin, qenc bihizire û bifikire.

Pişti ew gotinên Elo de, Xîdê serê xwe li berxwe de rakir, li Elo nihêriya, bi bêdengi, li dilê xwe de ji xwe bi xwera" eve, evaye hevalti û dosti. Bila Xwedê çu kesi bêt dost û bêt hevalaleki dilsoz nehêline" got û usa bersiv da Elo:

- Zor spas kek Elo, ev gotinên te hemû rastin û li şûnêdane. Balam ez nızanum çî bikim û çî xaliyê li serê xwe-

kım. Ez miroveki hejar û belengazım, naxırvaneki Xwedê me, bêt mal û mılkı, ki keça xwe dıde mın? Ez bıçım keça kê jı xwera bıxwazım? Ez ew şır helala ku tu dıbêji gelo lı kuderê bıbinım? Bı hêsa i keçıkek şır helal naye dıtın. Bawer bıke kek Elo, ez jı dıxwazım keçıkek şır helal, an jı jınek bı a şır helal jı xwera bıbinım bızewıcım. Ez jı pır dıxwazım şır helalek jı van sêwiyên mınra bıbe dayık. Lê ew şır helala lı kuye? Eve, hemû şol û mesele tên lı ser ev de dıbın gırê û dışıdın. Weki te ev pêşneyara kır, de bı kerema xwe tu jı mınra bıbêje, tu aqıleki bıde mın û keçıkeki, an jı jınek bı lı mın temaşe bıke, jı mınra bıbêje" kek Xıdo bıçe ew keçıkê, an jı ew jınıkê jı xwera bıxwaze bine" felan-bêvan. Ango rewş usaye, ez jı nızanım ku çı jı tera bıbêjım. Ez lı Xıdê kurê xwe natırsım, ew êdı mezıne, dıkarıbe bıçe lı dereki jı xwera kareki şıvanti jı bıbine, zıkê xwe têr bıke û bırcıyan nemıre, lê ez ev Hesenê pıçık çı bıkı? Bêt derew stuyê mın jı bona wı xare. Lı pey gotınên Xıde de, icar Elo:

- Guhê xwe qenc bıde ser mın kek Xıdır. Tu mın baş nasdıki, em hemsalên hevın, bı hevra mezın bın. Me bı hevra şer kır, me pevçû, em lı hev suketın, em lı hev hatın. Ango ew dem, dema zaroktıya me bû, divê em wana bıdın alıyeke, ew bıranınê mene, divê heya roja mırınê jı em wan kıretên xwe, çewtı û rastıyên xwe çucar bınekın, tım bırbının, ew jı mera bıbın ders, em lı ser ewana pır nesekımın. Bêt derew kek Xıdır ez te mına bırake xwe dıbınım û hezdıkım. Mın gotınên te qenc guhdar kırın û ev gotınên te hemû rastın û lı şına xwedane, rewşa te berbıçave, tu ne miroveki dewlemendi, xudan mal û mılki, lê balam tu hina her cıwani, weka şêri, tu dıkarıbe her cûre kar bıki û bıxebıtı, tu dıkarıbe nan û xwarına xwe lı kevrı jı derxını. Eva rewşa te a rast û berbıçave. Naha em evana bıdıne alıke kek Xıdır. Lı mılê dın de tışteki dın heye, divê tu ew tışt qenc bıbını. Ew tışt jı xurıšta Xwedê ye. Xwedê her tışt du alı afırandıye. Nêr jı bona mê, mê jı bona nêr.

Yek jı bêy yeki nabe. Bibe ji ew jıyan nine. Tu bı xwe ji mêri, tera jinek pêwiste keko, em nıkarıbın te bıxesının ji. Tu bırayê xwe bıbaşine kek Xıdır, ez jı tera usa dıaxıfım. Ez bawerım qenc tê bira te, hevala me a yekemin kehr bû. Em bı hevaltiya kehran va lı xwe hesıyan û me mêraniya xwe tam kır. Lı wê demê de êdi av ketıbû binê zamanê me, me dıyax nedıkır, em lı du kehran dıketın, me kehr dıpe-kandın. Em çı bıkın keko, zagonên ev cıvata me usaye. Cıvata Tırk, Erebe û Farıs'an, ne mina cıvata meye. Tu mın bıborine bırayê delal, ên wan" Kerxane" hene, jın lı wan kerxanan de xwe dıfroşın, felan-bêvan. Lê lı nav me Kurdan de ew tıştı tune, em Kurd bêt namûsiyên werge napejırının. Jın dayikên mene, dayik çıto canê xwe jı bona dırav û dolıwa xwe a jıyani bıfroşe. Hezar cari lı Xwedê şıkır ku, ew bêt namûsiya lı zagona me a komeleti de tune, dırok qet tışteki usa ji namıvisine. Ha, mın çı dıxwast jı tera bıgotana lo? Tu lı qısûrên mın mêze meke kek Xıdır, ez lı kuderê bûm, hatım ku. Ma tu dızani mabesta mın çı bû û mın çı dıxwast jı tera çı bıgotana?.

- Te dıxwast çı bıgotana kek Elo?.
- Bınhêre kek Xıdır, guhên xwe qenc bıde ser mın. Tu lı mın qencır dızani û dıbını, got Elo.
- Ez çı dızanım û çı dıbınım kek Elo?.
- Kuro axaftına mın mebere, aram bıke ez jı tera çı dıbêjum. Ma tu çıra naxwazi ku hın tıştan bıbını? Çawa ku tu bı xwe ji dızani, xwişkek Meleka jına te a rahmeti heye. Bı gotınek dın gorımek-baldız- te heye û ew jı êdi keçıkek azew, mezin, gêranlıxe. Payıza çûyi de mın ew dit. Ez dıbêjum ku, em bıçın bı fermana Xwedê, wê jı tera bıxwazın. Tu tev hındık malbata xezûrê xwe jı qenc nasdıki, hûn xısmên hevın ji. Xêncı ev, ew keçıka xwişka jına teye, zarokên te mina zarokên wê têne hesıbandın ew xaltiya herdu kurên teye. Bı kurtasi ez wê keçıkê jı tera lıyaq dıbınım, lı vır ez dıxwazın lı nêta te bınhêrım û mabesta te zanıbım. Gelo tu ev nêt û pêşneyara mın çıto dıbını û jı

bona ev meselê çî dıxwazi jî mınra bîbêji kek Xıdır? Heke ku tu jî mınra bîbêji" başe, erê" bawerke ez pışti sibe ev meselê jî çend kesên maqûl û qedır bılınd ra, wek kek Reşo û Mızûr ra bîbêjum û roja İn'a pêş me jî em biçın mala Apê Eli, bî fermana Xwedê gorıma te jî tera bıxwazın. Qenc bîhênje û bersivek erêni bîde mın. Bû kek Xıdır, tu çî dibêji? got û lı benda bersiva Xıdê de ma. İcar Xıdê:

- Welleh kek Elo ez jî nızanım ku jî tera çî bîbêjum û çî bersivê bîdime te. Bî rasti dilê mın lı şıkêdaye. Gelo xezûrê mın, xesûya mın û bûrayên mın çî bîbêjum û çî bersivê bîdine we? Gelo ew lı ev pêşneyara wera bîbên "erê" bipejirinin, yan na? Ango ez nıkarıbum bersivek bî erêni bîdime te, bîbêjum" başe biçın jî mınra bıxwazın". Bî rasti hûn çawa mınasib dîbinın werge bıkın, êdi ew karê te û der û cinarane. Gotinê mınên dawî jî tera evın, got û Xıdê deng xwe bırand. Lı pey ew gotinên Xıdê de icar Elo:

- Başe kek Xıdır tu hemû tışt jî mınra bîhêline, ez sedised ev meselê çareser bıkın û lı zamaneki heri kurt de dilê te şabıkım te lı ev bê jiniyê de felat kıım. Xezûre te kek Eli dostê meye, ez qet bawer nakım ku ew jî mera bîbêje "na" û bersivek ne baş bîde me. Naha ez dıxwazım rabım. Tu destûrê bîde bırayê xwe êdi ez biçım mal, dûra jî biçım ev meselê Reşo û Mızûr ra jî bîbêjum, angori nêt û ramanên wan jî ez xwe amade bıkın û lı roja Çarşemê em rêkevın biçın, ku şeva İn'ê em ev karê xwe ê bî xêr bıkın, bıın cih. Elo ew tıştana jî Xıdê ra got û derket der çû mala xwe.

Lı berbanga roja Çarşemê de Eloyê Êmoşê, Reşoyê İwê, tev Mızûrê kurapê Xıdê rabûn serxwe, xwe amade kırıın û derketın der, lı ser êrxûça berfê de meşıyan berê xwe dan alıya Xarpitê. Lı pey wan Xıd ketıbû nav xem û xeyalan, şerm dıkır û dıtırsiya. Bı xwe bı xwera dıgot "lê ku xezûrê mın lı mın bıxeyide û bîbêje "na" lê ku bîbêje" mırovê bêt şerm dıxwaze jî gorıma xwera bızewice ". Ango

dilê Xidê reş dıbû, geş dıbû, nedızanıbû ku çı bıke û çito li meselê bifikire.

Elo, Reşo û Mızûr pışti nivrojê xwe gihandin Xarpitê. - Wê şevê çûn li mala naseki de bûn mivan. Rojtira dın, Pêncşemê, nêzıka êvarê de rabûn rêketin çûn mala xezûrê Xidê, Apê Eli bûn mivan. Aliekber ji çend hûrdem beri mivanan xwe gihandibû mal. Çawa ku Apê Eli û Aliekber, Elo, Reşo û Mızûr ditin, nezaniyan ku çı bıkin. Bı lez mivan fermo hindir kırım û hemû hevra ketin çardaxa pêş dêri. Lı pêş dêri de çarixên xwe li lingên xwe de derxistin û ketin hindirê oda mivanan, çûn li ser textê raxisti de rûniştin. Aliekber balgif dan paş piştên mivanan" bı kere ma xwe hêsa rûnın" got û destpêka rewş û xatiran kır. Dûra çû li torta jêrin de êzingên sobê anî kire sobê, sobe vêxist û paşva çû li ser kursiyeki de rûnişt. Dûra dê, xwişk û birayên Aliekber ji hatin, rewş û demên mivanên xwe pırs kırım, ew ji li cihên xwe de rûniştin û li benda gotinên mivanan de man. Mivanan ji rewş û dema neferên mala Apê Eli pırs kırım û ew vatiniyên xwe anin cih.

Lı pişti gelek pırs û pırsiyaran, gotûbêjan de, Elo rûyê xwe guhart ser Aliekber, ji Aliekber ra:

- Kek Aliekber tu Rewşenbir û Ronakbireki me Kurdani, gelo rêzaniya Romê, rêzaniya cihanê li çı rewşê û li çı encamêdaye? Ango rewşa rêzaniya cihanê û a Romê çawa dumeşe? Toxtor Nûri li kuye û ew li çı rewşêdaye? Gelo ew çı dıke? Gor ku me bihistibû, dıgotin ew li aliya Sêvazê de hatiye girtin, gelo ew raste yan na?. Lı pey ew pırsan de, icar Aliekber:

- Welleh kek Elo ev nûça pırr tışteki nû nine. Tıştên ku ez dızanim, ez bawerim hûn ji dızanın. Lı gor nûçeyên dawî, dıbêjın hukma Romê ew xwe ji bona dagirkırına Dêrsım amade dıke. Hûn bı xwe ji dıbinın ku bı hezaran leşkerên Romê ketiye Xarpitê û her roj bûyerek derdıkeve. Fırok û helikopter li ser Dêrsım û gundên Xarpitê de dıfırın, dıçın û tên, carna bomban li ser hın ciyan de

dıbarının, xesereyên mezin dıdın gel û welatê me. Gor ku weşanên Romê dıwıvısının û em dıbıhısın, Mıstefa Kemal gotıye ku" Dêrsım bûye kûnêrek mezin, dıvê ev kûnêra lı bında were jêkırın û bırırandın" gef- mef xwariye. Toxtor Nûri ji çendek beri mın ew lı Guzera-kapalı çarşı-bajêr de dıt, welleh qenc bû. Raste ew lı alıya Sêvazê de hatıbû gırtın, balam dûra lı ser dıj derketına Seyit Ali Rıza û hın kesên dın, şandına gelek name û kışandına gelek telqırafan de, ew berdabûn. Lê lı ev demê de ew lı kuye ez wê nızanım. Çend roj beri, Wali Fahri ê dinık ez ji gazi qonaxa xwe kırıbûm, mın got "gelo xêre" ez rabûm çûm. Bıborının seg bavê-seg bav, ez geleki êşandım, eciz kırım, bıhna mın teng kır, hêrsa mın rakır, lê ez çı bıkıım, mın dengê xwe dernexist, derketım der hatım mal. Lı mın dıpirsiya, dıgot" jı mınra bıbêje, Seyit Ali Rıza naha lı kuye û ew çı dıxwazi bıke? Toxtor Nûri, Şahan Axa û Alışêr ew çı dıxwazın bıkıın? Tu çıra carna jı toxtor Nûri ra dıbi heval? Tu mamoste û karmendeki dewleta Tırki, ev dewletê tu day xwendın û ev dewlet te xwedi dıke û dırav dıde te" felan-bêvan. Ez jı wi dinikê segbav ra çı bıbêjum kek Elo. Lê Xwedê qet nepejırine, em lı welatê xwe de mina nokeran lı bıın bandûra Roma Reş de dıjin. Çavên felekê korbın nexwaşıyek mezin kırıye nav me Kurdan, em Kurd bûne neyarên hev. Qet hevgırtınek û yekıtiyek xurt lı nav meda tune. Her eşırek bı serê xwe kar dıke, her eşırek xwe lı alıyeke de dıqşıne. Gelek serok eşırên me bûne heval-hogırên neyaran. Em Kurd bûne kerıya pezan, Roma Reş ji bûye şıvanê me. Canê şıvan çı dıxwaze, şıvan wi dıke. Canê şıvan goşt dıxwaze, icar şıvan kerıyê serjêdıke, jı xwera dıke xwarın, zıkê xwe û zıkên zar û zêçên xwe têr dıke, zıkên hemû xısmên xwe, qom û qebilên xwe têr dıke, lı ser pıştê de pal dıde radıze. Bawer bıke kek Elo, rewşa me Kurdan usaye. Mırov dıbêje" Xwedê ev gelê me bı taybeti jı bona karê xulamti û nokerıyê afırandıye". Xêncı ev ez jı wera çı bıbêjum û çı nûça qenc bıdıme we.

Hûn mın bîborinin, mın bı van gotinên xwe va, serê we êşand, got û dengê xwe bîrand.

Ew gotinên Aliekber lı Elo her xweş hatın; jı bona ew jı Elo:

- Na-na Aliekber ev çı gotine tu dibêji. Bawerke te em geleki kêfxwaş kırım. Ev gotinên te hemû lı cihê xwedane. Tama mirovatiyê, tama qêret û biratîyê lı ev gotinên te tîn. Tu her û her biji kekê mın, got û carek dın jı Aliekber ra spas kır û xwast ku êdi dagere ser mesele keç xwastinê, wê meselê çareser bıke.

Hemû neferên malê û mivan lı bın şewqa fanosê, lı dorbera sifra şiv xwarinê de kom bûbûn, şiva xwa dıxwarın, lı nav xwe de dıpeyivıyan. Lı pişti şiv xwarinê de disa herkes dageriya şûna xwe, lı şûna xwe de rûniştın. Lı wê navberê de Elo çav qire Reşo û Mızûr kır, dûra lı malxwe ê malê destûr xwast û usa jı Apê Eli ra got:

- Apê Eli, bı rasti mırına Meleka keça te û newiya te em geleki berxwe xıstın, em jı bona mırına wan zef xemgin bûn. Wexta wan a mırinê nebû, lê em çı bıkın ecela Xwedê jı wanra werge hatıbû, Xwedê lı ser eniya wan de ji werge nıvisandıbû. Me lı sala çûyi de ji gotıbû, lê dıvê em carek dın ji bibêjin" hûn xwaş bın, serê we xwaş be, yên mayın xwaş bın. Em nıkarıbın lı dıji fermana Şahi Merdan derkevın, tışteki bıkın û bibêjin. Em hemû ji rêwanên wê rêne. Çawa ku tu ji dızani du newiyên te lı aliya dayikê de sêwi mane, jı wan zarokan ra dayikek şir helal, dayikek dılrâm pêwıste. Îşev şeva İnê ye, ev şev şevêk evrar û piroze, şevêk xêran û mırazane. Em jı lı ev şeva evrar û piroz de mivanê ev malêne. Lê tıştê ku Xwedê dızane, em çawa betal bıkın. Em hatine ku, bı fermana Xwedê, qewlê pêxamber, keça te a azew Xeycanê jı Xıdê kurê Apê Memê ra bıxwazın. Hûn hemû neferên malê, Xıdê qenc nasdıkın, hûn xısmên hevın jı. Keça te jı xaltiya wan sêwiyanê, xênci keça te çu kesek jı wan zarokan ra nabe dayik. Gotın û xwasteka me hemû evın, êdi em her tışt jı we neferên ev

malê ra dihêlinin û her tışt davêjm bexte we, hûn çı dıxwazın bîbêjm, em razine.

Apê Eli bı bédengi Elo guhdar kır, dûra çavên xwe ser zarokên xwe û jına xwe de gerand, rûyê xwe dagerand ser Elo, Reşo û Mızûr ra:

- Kek Elo, bı dûrva be ji em hemû xısmên hevın, kesên yek eşirekine. Lı bıli ev em dostên hevın, me nan û xwêên hevûdu xwariye. Ango ez qet nıkarıbım jı wera tışteki bîbêjm. Bawerkın devê mın lı hızûra we de lal dibe, zımânê mın nazıvire. We jı mınra qal û behsa fermana Xwedê û qewlê pêxamber kır. Bı wan navan erd û esman dısekının. Xeycan keça mın nine, keça weye, lı aliya mın de hûn çawa dıxwazın, çawa liyaq dıbinın, werge bıkın ez dıbêm" erê, ser seran, ser çavan" lê divê hûn jı diya keçikê û bırayên keçikê jı bıpırsın, gelo ew çı dıbêjm?. Dûra divê em lı keçıka xwe jı bıpırsın, dılxwaziya wê jı bıstinın. Bı taybeti heqê dayıka keçikê, lı heqê mın zêdetire. Bı kurtasi hûn jı wan bıpırsın, got û soz da jın û zarokên xwe.

Navê xesûya Xıdê Fadime bû, jı wêra "Fadê" dıgotın. Ew jı êdi geleki kal bûbû. Bı taybeti mırına keça wê û newiya wê, ew bêtır kal kırıbû. Ew her roj jı bona mırına keça xwe û newiya xwe dıgiriya û berxwe dıket. Carna jı Hesenê pıçûk û Xıdê pıçûk dıhatın bira wê û ber çavên wê. Lı demên werge de, ew bêtır berxwe dıket û bı xwe bı xwera usa dıgot "Xwedê' o wê rewşa wan newiyê minên sêwi çawa bıbe? Ki jı wanra bıbe dayıkek şır helal? Lê ku Xıd jı keçıkek bıyani ra bızewıce, gelo wê ew keçıka jı wan newiyên mınra bıbe dayık? Na-na ez qet bawer nakın, nav lı sere, çı dıbêjm "Dêmari" dıbêjm. Ango diya mina mar. Lê mar qet dibe dostê qûlên Xwedê. Ew zaluma û mırdara nebû ku, Ehriman lı bıhiştê de ketıbû dılqê wi". Amojına Fadime çıto ku ew pêşneyara Elo bıhist geleki kêfxwaş bû û bı xwe bı xwera usa got "ev zor qence. Bıla xaltiya wan sêwiye mın, jı wan sêwiye mınra bıbe dayık. Ma Xeca mın lı Xıdê çêtır mêreki dıbine? Xıdê mın weka şêre,

dılınzme, mivanheze, welatperwere. Lê piçeki hejare, bêt mal û milke, naxırvane. Na-na ev kêmasi nine. Xwedê şıkır kor nine, seqet nine, dest û pêyên xwe bı hêzın, mina hemû kesan ew ji doliwa xwe bıke û bıçe. Jı bona wi ji Xwedê mezine. Bı a Xwedê ev pêşneyara Elo lı mın xwaş hat".

Amojına Fadime wer lı şına xwe de noqın búbû dıhê-njiya , çavên xwe guhartıbû aliya sobê, lı sobe a ağır dınhêriya. Lı wê demê de Elo bı azinek -yöntem- xwaşmêri va, berê xwe da Amojına Fadime, jı Amojına Fadime ra:

- Amojın divê em lı te ji pırs bıkın, sêri lı ramana te ji xinın, ramana te ji bıstının, êh gelo tu jı ev meselê ra çı dıbêji? Nêt û mabesta te çiye? got û lı bındaa bersiva Amojına Fadime de ma.

Lı pey ew gotınan de, icar Amojına Fadime:

- Welleh kek Elo ez a hejar û reben jı wera çı bıbêjım, mezinê malê çı dıbêje, lı mın pişwaziye -kabul- ew esmane, ez ji erdım. Dûra hemû gotınên we başın, lı cihên xwedane. Ez ji bawerım, ku keçıkek xerib jı wan newiyên mınên sêwıra çucaran nabe dayik. Xec xaltiya wane, encax Xec jı wanra bıbe dayik. Ez evqas dıbêjım, gotınên mın jı hemû evın, êdi tışteki dın lı mın pırs mekın, got û disa kete nav bédengiyeki lı şına xwe de ma.

Dor hatıbû Aliekber û herdu bırayên Xeycanê. Vêca Elo lı wan ra:

- Xortên delal gelo hûn jı ev meselê ra çı dıbêjın û çawa liyaq dıbinın?. Hemûyan bı yek deveki va" bav û dayika me çawa liyaq dıbinın, divê em ji lı dû wan bıçın û bıbên-"erê". Jı bona ev ji, em dıbên erê û dıji bıryara dê û bavê xwe dernakevın" gotın û dawiya ew kari anin. Dûra Elo, Reşo û Mizûr lı şınên xwe de rabûn serxwe, çûn destên Apê Eli û Amojına Fadime, çavên her sê xortan maçkırın" Xwedê mırazê herduyan û hemû zarokên we bıke" gotın, jı hemûyan ra spas kırin, dûra bı dıleki şa va ketın nav nivinên xwe razıyan, ketın xewa kûr.

Rojtira dın lı pışti taşte xwarinê de Elo, Reşo û Mızûr lı hemû neferên mala Apê Eli xwatirê xwe xwastın û rêketın çûn sûka Xarpitê, hın tışt-mışt û hevceên xwe lı fırotgeha Husênê Pilvanki de kırıyan û disa berê xwe dan aliya Xozatê, gundê Torût'ê. Lı pışti gelek dijwariya rê, berf û baranê de, beri muxurba êvarê de xwe gihandın malên xwe. Pışti şiv xwarinê de ji her sê, rabûn çûn mala Xidê, hemû gotinên Apê Eli û neferên mala wi ji Xidê ra deng kırın, mızgin dan Xidê, Xid piroz kırın û disa dagerıyan malên xwe.

Dawiya meha Adarê bû, baran dıbariya, lehi û lesar dıçûn. Disa avên çem û newalan bûbûn derya û dengız. Disa kelekvanan kelekên xwe danibûn ser avên çeman rêwan derbaz dıkırın. Disa gundiyeên deştan hêdi-hêdi destpêka cot ajotinê kırıbûn. Disa Xidê naxırvan lı gundê Torûtê de bû û lı rojên bêt baran de diçû ber naxıra bızinên reş. Disa mi, bızın û çêlekên gundiyan dızan, berx, kar û golık zêde dibûn. Disa keç û xort derketibûn nav kelem û darıstanan êzing dıbrıyan dıkışandın malên xwe.

Lı ew demsal û demê de roja dewata zewaca Xidê nêzık bûbû. Lewra çendek beri disa Elo û çend gundi çûbûn mala xezûrê Xidê nişan danibûn, dermal biriyabûn, roja dewatê ji pêdandın bûn -tespit- û dagerıyabûn malên xwe. Jı bona ew ji Xidê perwa-merak-dıkır, bı xwe bı xwera" gelo ez dawetek çıtoni bıkıım, ez mêreki bime, jı mınra daweta duwemin ne pêwıste, ev jı mınra şerme "dıgot. Lê Elo û hemû gundiyan jı Xidê ra gotıbûn, ku" raste tu mêreki bı'yi, balam keçık, keçıkek azewe, jı wêra dawet dıvêt, em qet itiraz-mıtıraz jı naxwazın, dıvê ev daweta lı nav me gundiyan de bıbe".

Lı gor bıryarê, dawıya meha Avrıl'ê de dewata Xidê destpêkır. Lê dawet bêt def û bêt zurne bû. Keç û xortan

kılam dıstrandın, kemanvan keman dıkuta û hın keçık lı hemberê hevûdu de dıreqısiyan. Gelek gundi ji çûbûn Xarpitê, gundê Apê Eli, lı mala Apê Eli de kombûbûn, ku rojtıra ji dın bûkê sıwar bıkın û binın. Dilaniya dawetê lı wê ji destpêkiribû keç û xort dıreqısiyan û kılam dıstrandın. Kêf kêfa keç û xortan û cıwanan bû.

Rojtıra dın lı pışti taşte xwarınê de, jın, keç û bûkên der û cinaran lı tev Amojına Fadime Xec xemilandın, bı dıleki keser û xemgini va Xec lı hespê sıwar kırın û tev hemû gundiyan Torût'ê rêkırın şandın gundê Torût'ê.

Çavên Xıdê û hemû gundiyan lı rêde bûn. Seat ji zû-zû derbaz dıbûn û dıçûn. Wext hatıbû xwe gıhandıbû nêzıka êvarê. Lewra rê gelekı dûr bû. Jı bona ew ji herkesi perwa dıkır. Nıška ve hın xortan mızgın dan Xıdê û mezınên gund, gotın" ev e bûk anin" Xıd û şoşpan derxıstın ser pıšta xêni. Lı pışti çend hûrdeman de, hemû dawetvan, bûk û berbûyan xwe gıhandın pêş mala Xıdê. Lı binê sıvinga xêni de hesp dan sekınandın. Lı ser pıšta xêni de ji, Xıd û şoşpan ji bona sêv avıtandına serê bûkê, xwe amade dıkırın. Herduyan destmalek dabûn ser devên xwe, bı destên xweyên çepê va ji, pê destmalê gırtıbûn, werge lı benda sêv avıtınê de mabûn. Dûra mezınan ferman kırın, ku êdi Xıd û şoşpan sêvên xwe bavêjın serê bûkê û karê xwe bıqedının û dawıya dawetê binın. Lı ser ferman û işareta mezınan, beri şoşpan çû ser sıvingê lı dûşa serê bûkê de sêva destê xwe lı ser serê bûkê de sê caran çerıxand, cardın şuva çû lı şûna xwe de sekını. İcar Xıd çû ser sıvingê, lı dûşa serê bûkê de ew sêva destê xwe lı ser serê bûkê de sê car zıvırand û sêv avıt lı kumê serê bûkê xıst û şuva çû. İcar dawetvan ketın serhev, ku ki ew sêvê bıgire. Lı pışti Xıdê, icar dor hatıbû şoşpan. Şoşpan ji disa mina berê ew karê xwe ani cih û sêv avıt serê bûkê, lı ser pıšta xêni de daketın jêr, çûn lı mala Reşo de rûnıştın, lı benda dawıyêde man. Berbûkan ji hespa bûkê kışandın pêş dêri, kevçiyek ji lı ser zenguya lıngê bûkê de şıkandın, bûk lı

ser hespê danın jêr, berbûkek kete binê milê bûkê û bûk girt bir lı paş pêrigê de, lı ser lingan, da sekınandın, bı xwe ji lıgel bûkê de ma, ta ku zava were.

Lı piştı ew karana de, icar texte û sıfre amade bûn, hemû dawetvanan goşt, sawar û pilava "dan" xwarın û belav bûn çûn malên xwe. Dûra gelek xortên gund ço, rot û hejik kırım destên xwe û çûn Xidê zava û şoşpan lı mala Reşo de derxıstın der û bervı mala Xidê meşıyan. Şoşpan lı pêşiyê, Xid ji lı dû şoşpan dımeşıya. Lı herdu aliyên zava û şoşpan de ji, xort dımeşıyan, dıkırın qırın û hawari. Kê carna ço, rot û hejik lı ser û piştı zava û şoşpan dıxıst, kê lı ser erdê de kevir û herri dıgirt diavıt lı ser û piştı şoşpan û zava dıxıst, canê wan dıêşand, kê ji qet dengek dernedıxıst û bı bêdengi lı tev hevalan dımeşıya, lı ew pêşdariyê mêzedıkır. Xortan bı ew edet û kevnêşopiya bav û kalan va Xid û zava bırım pêşıya dêri, Xid tandan kırım hındır û bı xwe ji lı hev belav bûn û çûn malên xwe. Xid ji yekser çû paş pêrigê cem delaliya xwe û berbûkê. Çıto ku Xid çû paş pêrigê, icar berbûkê destê Xidê û Xecê kırım serhev "Xwedê mırazê we bıke, zewaca we piroz be, xudan zarok û newi bın" got û lı paş pêrigê de derket der çû mala xwe. Xid û Xec ji lı wê gihiştın mırazên xwe, bûn jin û mêrên hev, lı hev şabûn.

Roj û meh disa zû-zû derbaz dibûn, dıçûn. Xec ji êdi hute her tıştı bûbû. Hesenê piçûk ji, ji Xecê ra "day" dıgot. Hesen qet nedızanıbû ku, Xec xaltiya wiye. Herdu Xid ji disa mina her heyam dıçûn ber naxıra pêz û dêwêr dıhatın. Bı wi şikli va zeman xwe gihandıbû meha Tebaxê. Gundiyên torût'ê kê gam dıgerand, kê dasa genım dıçınıya, kê ji makine dabû ber malaxma genımê xwe, ka û tene lı hev cûda dıkır. Zarokan ji bı kehr û qantıran va şıxre dıkişandın, jınan lı bın darên Tû û Bi'yan de hêrmi

dıqelişandın, dilim dıkırın, dıbirin lı ser pıştı xaniyan de, lı binê tava rojê de radıxıstın, hışk dıkırın, dıkırın Qax, ku lı zıvıstanê de jı xwera bıkın Xoşav.

Xıdê naxırvan carna pıştı şiv xwarınê de dıçû ser bêderên gundiyan, lı bin ronahiya hivê de, an ji lı ber ronahiya fanosê de jı gundiyan ra arikari dıkır, makina malaxmê dıçerıxand, dıda xebatê. Gundiyan ji lı pıştı qedandına kar û pivandına ceh û genımên xwe de, çapek, niv çap, an ji niv olçeg tene dıdan Xıdê. Xıdê ji ew ceh, an ji genıma dıgırt dıbir mal, jı bona doliwa xwe a zıvıstanê dıkır pêteg, an ji ambarê hıldıani, lı dawıya meha çırıya pêşın de dıbir aş dıhêrand, jı doliwa mala xwera dıkır ard.

Lê carna lı wan şevên havınê de, ba dıhat, ka lı ber ba dıket, bênder lı nav mıj û dûmana toza ka ê de duma, şewqa fanosê dıtemrıya, toza ka yê dıket çavên mırov û pozê mırov mecal jı mırov dıbirand, çavên mırov diêşand, jan û eşek çavan destpêdıkır. Ew çav êşa lı zıkê zamaneki heri kurt de dıbû nexwaşiyek çavan. Bı ew nexwaşiyê va pırr kesen çavên xwe wenda dıkırın, çavên pırr kesen kor dıbûn.

Lı şevê ew meha Tebaxê de Reşo makine dabû ber malaxma genımê xwe, Xıdê ji, jı Reşo ra makine badıda, jı Reşo ra arikari dıkır. Hivê ji lı navına esman de şewq dıda, ronahiya xwe lı ser cihan de belav dıkır. Ba'yeki hinik ji dıhat, ka belav dıkır, toza ka yê dıket serser û çavên Reşo, Xıdê û jına Reşo, ser û çavên wan lı nav toz û ka yê de dıman. Xıdê makine bı kar dıani, milê çerxa makinê badıda, Reşo bı bêra dar va malexme dıkır ser bêjınga makinê, jına Reşo ji bı kışok bêrikê va, lı pêş devê makinê de tene dıkişand, lı ber devê makinê de tene dırdıxıst, dıavıt serhev lod dıkır. Xıdê lı aliki makine badıda, lı milê dın de ji kılam dıgot û dıstrand. Dengê Xıdê ê xwaşık dengvedan dıda xaniyên gund û çıyayê hember gund. Carna dengê Xıdê û teqe-teqa makinê dıketın nav hev, awazek ecêb derdıket. Pıştı heyamek heri kın de, ser û

çavên Xîdê, Reşo û jına Reşo lı nav tozê de bûn mina berfa sıpi. Te dıgot" berf lı ser serê wan de bariyaye". Lı dawiyê de dıtın ku ba nahêle ew kar bıkın, jı bona ew jı kar cihuştın û dageriyan çûn malên xwe, ketın xewê, ew kara hiştın jı bona rojtıra dın.

Lı nivê şevê de Xîd vecenıqiya serxwe. Lewra êşa çavan Xîd lı xewa kûr de hişyar kır. Çavên Xîdê her diêşıyan û jan dıdan. Dıgotın" Xıdo tu qet xwe melivine, emê te bıkujin". Xîd lı ber êşa çavan de, nedıkarıbû ku, lı nav nivına xwe de raze, yan jı rûne. Of û ofa Xîdê herdu Xec û zarok jı lı xewê de hişyar kırın. Xîdê herdu kefa destên xwe dabûn ser çavên xwe, çavên xwe mıstdıdan, radıbû serxwe lı hindirê malê de dıhat û dıçû, dıkir axın û nalin. Bı ew rewşê va heya sıbe raneziya û raneket. Herdu Xec û Xîdê piçûk jı heya sıbe lıgel Xıde man û neketın xewê. Êdi seat hatıbû xwe gihandıbû wexta derketına dewar û pêz. Lê Xîdê nedıkarıbû ku gaveki bavêje bıçe pêşıya dêri. Jı bona ew jı, jı xwişka xwe Xecê ra:

- Xecê diya mın, iro tu lı tev bıraziyê xwe bıçe ber naxıra pêz û dêwêr, bawerke rewşa mın ne rewşe, çavên mın her diêşın, got û Xeca xwişka xwe lı tev kurê xwe Xîdê piçûk şande ber naxıra pêz û dêwêr.

Xec û Xîdê piçûk lı ber pêz-dêwêr de bûn. Xîd jı ketıbû nav nivına xwe, hın der û cınar jı lı dora Xîdê de kom-bûbûn, lı Xîdê dınhêriyan. Lê Xîd lı şûna xwe de nedıkarıbû ku bısekıne, çavên wı her ku dıçûn diêşıyan û jan dıdan. Herdû çavên Xîdê lı ser serê Xîdê de sor bûbûn, - bûbûn mina gola xwına sor. Hıstêr lı çavên Xîdê de mina baranê dıbariyan, lı ser gepên Xîdê de dadıketın jêr dıhe-rıkiyan, dıketın nav simbêlên Xîdê de dadıketın ser lêvên Xîdê, lı wê jı dadıketın jêr dıketın devê Xîdê, devê Xîdê şıl û şor dıkırın. Xîdê belengaz paç û destmalek jı lı mala xwe de nedıdıt ku, hıstêrên çavên xwe paqj û zıwa bıke. Kesên lı dorbera Xîdê jı, jı Xîdê ra dıwa dıkırın, dıgotın" ev fermana Xwedê ye, Xwedê nexwaşiyên usa dıde qûlên

xwe, em çî bîkîn". Lê çucaran bijjîk û nexwaşxanek nedihat bira wan. Lewra ew tiştana jî gel ra xerib bûn. Zar û zêç, xort û mêr, keç, pir û kal nexwaş diketin, bî roj û mehan li nav nivinan de duman, hemû neferên malê û gundi li dorbera wan nexwaşan de kom dibûn û li benda mîrîn, an jî felatbûna wan nexwaşan de duman. Lê sed heyf ku, pîraniya wan nexwaşan dîmîrîn, çucaran kesekî jî pîrs nedikir ku, ew kesana çîra mîrîn. Hemûyan diçotîn" ev fermana Xwedê ye" û mesele diçedandîn.

Çavêşîya Xîdê her diçû zêde dibû, şev û roj Xîdê xew nedikirêş û janê mecal nedîda Xîdê, ku Xîd piçeki bîkeve xewê. Te diçot"t oza isota tûj a Arnawût'an kirîna çavên Xîdê". Li mala Xîdê de qorek gundi radibûn, qoret dihatin li dorbera Xîdê de rûdîştin. Lê qet tiştêk li destên kesekî de nedihat. Hemûyan tenê şîrê berê jînan derman didîtin, şîrê berê jînan dikîrîn çavên Xîdê. Lê ew şîr jî qet kêrek nedîgîhand çavên Xîdê û êşa çavên Xîdê. Li dawîya hefteki de, Xîdê belengaz ronîha çavê xwe ê çepê wenda kir, reşîka çavê Xîdê belav bû, tenê sîpiya çavê çepê ma. Wê nexwaşîya çavan, çavekî Xîdê bîr û Xîd li ciwantiya xwe de bû mîrovekî çav kor, çavekî xwe wenda kir. Jî bona ew jî, zor berxwe diket, şerm dikir ku li cem hevalekî xwe de rûne, li rûyê hevalekî xwe bînhêre. Wî wer fêhm dikir ku, hemû kes li wî dînhêrîn û dîkenîn, jêra "çav kor" dibêjîn.

Roj û hefte derbaz dibûn, êdî kul û bîrîna çavê Xîdê qenc bûbûn, êş û jan jî hatibûn bîrandîn, şelîqa-çapakçavan nemabû, xwîn û reşîka çavê çepê nedihat xuyakîrîn. - Xîd êdî rabûbû serxwe disa mîna berî li tev kurê xwe diçû ber naxîra pêz û dêwêr dihat. Disa payîz li şûva mabû. Disa hemû gundiyan çîlo'ên xwe bîrîyabûn, aş û avranên xwe kirîbûn, li malên xwe de rûdîştibûn. Disa zivîstana xezew li tev pûk û berfê hatibû, sar û serma a xwe belav

dikir. Disa nêçirvan derketîbûn ser kaş û çiyar de kew dîpekandîn, ew heywanên reben û belengaz dîwestandîn û jî xwera dikirin nêçir serjêdikîn goştên wan dîxwarin. Disa gundiyan her roj berfên ser piştê xaniyên xwe dimiştin, berf li ser sîngan de dikirin jêr. Disa gundiyan piştê xaniyên luq, sîngên xaniyên xwe jî têpûç dikirin, tap û tapa şûnikan bû. Disa heyam hatîbû xwe gihandîbû dawîya meha çilêyê paşin. Disa wexta pirozkirin û rojî girtina cejna Xîzîr hatîbû. Disa hîn kesan qurbanên Xîzîr girêdabûn. Disa hemû kesan destpêka sê roj rojî girtinê kirîbûn. Disa jinan genim dîqewirandîn, bî destaran dihêrandîn dikirin Qawût. Disa keç, bûk û jinan, xaliçe, astîr, cacîn, balgîf, keji, doxin, gore, lepîk, saq û tentene çêdikirin, kevan dîjendîn pembû dikirin pelte, teşî dîrîstîn ris dikirin gilok û lifîk. Disa jîn, keç û bûkan bî dolavan pelteyên pembû dîrîstîn dikirin gilok dîşandîn cîlagvanan jî zar û zêç û neferên malên xwera dikirin çaw. Disa hemû kesan jî cejna Xîzîr ra "ev cejne Ola Îslamî ya" dîgotîn û cejna Xîzîr jî dikirin ser Ola Îslam.

Bî taybetî wexta ku jinan Qawût a Xîzîr dihêrandîn dikirin legan û sitîlan de dîxîmandîn, îcar hîn xort û kesên Ehrîman li şevên tari de bî dîziyan dîketîn mala yekî xudan dewar û pêz, nalekî kehrê, qantîrê, yan jî nalekî hespê dîgirtîn û dîketîn wê malê, bî wî nalê kevn va ew Qawûta dax û nişan dikirin û derdîketîn der dîçûn malên xwe li benda rojtîra dîn de dîman, ku ew mala çî dîke û çî dîbêje. Li rojtîra dîn de wê malê wexta ku ew îşaret û daxa nal dîdît, vêca şîni û şahîyek dîket ew malê, qurban serjêdîbûn, goşt, kîlor û patîleyên bî rûn her zêde dîbûn û hemû neferên gundiyan têra dîlên xwe ew xwarîna dîxwarin, zîkên xwe têr dikirin û jî xwedî û neferên ew malê ra dîwa dikirin. Wan belengazan wer bawer dikirin ku, Xîzîr li hespê xwe sîwar bûye, çûye malên wan. Êdî xana wan bûye xana Xîzîr û bereket li ser mala wan de wenda nabe, ew dîbîn xudan mal û kesên her dewlemend.

Jı ber ku Kurdên Dêrsım werge bawer dıkırın. Lı gor ew baweriyê Xızır lı şeva dawı de dıçû mala yeki dılsoz û dılpak, bereketa xwe dıkır hındırê wê malê. Îşareta çûyına Xızır ji, îşareta nalê hespa wi bû. Jı bona ew bû ku hın kesen ew dek û dolavana dianin ser malek xudan hebûn, xudan dewar û pez.

Roja dawıya cejna Xızır bû. Disa roj çûbû ava, hemû kesan fıgara xwe vekırıbûn, xwarınên xwe xwarıbûn zıkên xwe ji têr kırıbûn. Lı pışti fıgar vekırın û şiv xwarınê de, disa gelek xort, mêr û kalemêrên gund lı mala Reşo de kom bûbûn, lı nav xwe de ketıbûn zıkê hın meselan, qal û behsa doza welat û pırsa Kurdıstan û Dêrsım dıkırın. Disa ode lı nav mij û dûmana dûyê cıxaran de mabû, mirov lı nav ew dû de dıfetısiya, nexwaş dıket. Nıška ve Elo lı Xıdê tıka kır ku, Xıd ji cıvatê ra kılama Bêhrivan û kılama sê bırayên mirên Xarpitê- Sılêman beg, Kazım beg û Niyazi begê-bıstırine, balam kêfa Xıdê tunebû, jı bona rewşa çavê xwe berxwe dıket, şerm dıkır. Dıtırsiya ku, yek bı wi tınazên xwe bıke. Lı destpêkê de got "na û na" lê lı dawiyê de ew pêşneyara cıvatê pejırand û destpêka kılamma Bêhrivanê û sê Mir bırayên Xarpitê kır. Ew her sê bıra lı berbanga rojeki de, bı destên callatên Roma Reş de hatıbûn dardakırın. Xıdê lı pışti kılama Bêhrivanê de, tılı avıt paş guhê xwe, destpêka ew lawje a dışewat kır.

- Heway Xarpitê, lê day, lê dayê, lê day, lê dayêêê Ahx hewaki sare. Dıbên sıbe seat lı çaran, Sılêman begê, Kazım begê û Niyazi begê pıçûk va, ahx dıbın davıne dare. Caran jı bırnabe, lumın, lumın, lumın, lumın lumın, derdê cigera hare, got û dawıya kılama xwe ani.

Lê ev kılam gelesi dırêj bû û Xıdê bı dengê xwe ê xwaşık va dıstrand, dıl û kezewa guhdaran dışewıtan û dıso. Hemû kes xemgın bûbûn dıgırıyan, kınê wan her dıçû jı bona hukma Romê her zêde dıbûn. Xıdê hemû kes giri xıstıbûn, cıvat dıgırıya. Wext ji hatıbû xwe gıhandıbû nivê şevê. Lı derva disa berf dıbarıya, gulıyên daran lı

bînê berfê de mabûn. Avên kani û çirtikan qemiriyabûn. Lı derva hewta-hewta kûçikan, zûre-zûra guran bû. Lı demek werge de Elo jı cıvatê ra:

- Geli hevalan bihêrin wext geleki derbaz bûye, ez bawerım xewa hın kesan jı tê. Pêşneyara mın ewe ku, divê êdi em rabin lı hev belav bın, biçın malên xwe, sibe geleki karê me hemûyan heye. Hûn hemû jı xwe birmekın, sibe zû de qurbanên Xızır serjêdıbin û lı nav der û cinaran de belav dıbin. Lı pişti nivrojê de jı em dıçın ser tırbên bav û kalan û ziyaretan, loqman belav dıkın jı bona ruhên mirıyan xwe Quranê dıxwinın û dıwa dıkın.

Lı ser daxwazi û pêşneyara Elo, hemû kes rabûn ser-xwe, lı malxweê malê ra spas kırın, derketın der û çûn malên xwe. Wexta ku Xıdê xwe gıhand mal, dit ku Xeca jına wi ewe lı ber pıxêriga agir de rûmıştıye, lı benda Xıdê de maye. Jı bona ew Xıd jı berxwe ket û jı jına xwera:

- Keçê tu çıra raneketi? Seat çıye? Ma tu dengê dikan nabıhisi, ku wext lı nivê şevê derbaz bûye?. Jı bona ew, Xec kenıya û jı mêrê xwera:

- Xem nine, xewa mın nehat. Bı taybeti lı şevên usa de xwişka mın Melek tê bıra mın. Tu geleki dereng mayı, zarok jı ketın xewê, qıswetên mın jı her zêde bûn, xew lı mın revıya, ez lı benda teda mam, got û dûra xwe tazi kırın û ketın bınê lihêfa xwe, lı hev hatın badan û xew de çûn.

Hewa ewr û mij bû. Balam berf nedıbarıya. Jınên gund kê hevir-hevir dıkır, dıkır Parxaç dıavıt bınê sêla agir dıpat, kê Kılör, Patile û nanê hışkeva dıpat, kê cûre-cûre xwanên dın çêdıkır, kê Nanê Tawê lı rûn de dıpat, dıqewırand, ango hemû jınên gund jı bona ew roja taybeti, her yeki tışteq dıpat û amade dıkır û jı wan karan ra mijûl dıbûn. Lı pişti nivrojê de hemû gundi lı hindirê gorıstana gund de kom bûn. Lê hemû tırb lı bınê berfê de

mabûn, nedihatın xuyakırın. Hındê hemû gundiyan şûna tîrbên mîriyên xwe dîzaniyan. Lı destpêkê de herkes çû ser tîrbên mîriyên xwe, bı bêran berf lı ser tîrban de avıtın, lı ser her tîrbeki de fındek vêxıstın û hın jınan mina hemû salan bîhuri destpêka giri û strandına lawjeyên dîşewtı kırın. Xoce Avdılah ji, jı bona ruhê hemû mîriyan Quran dıxwend, xortan Parxaç, Kılör, Patile û Nanê Tawê perçe dıkırın û lı nav gel de belav dıkırın. Xıd ji lı tev xwişk, zarok û jına xwe va çûbûn ser tîrba Melekê û Xwaskara piçûk dıgiriyan. Lı wê ji ew disa hemû bı hevra çûn ser tîrba bavê Xıdê Apê Mem, ew ji ziyaret kırın û hatın ketın nav civatê û piştı qedandına Quran xwendinê de ji hemû gundi lı wê hev belav bûn û dageriyan malên xwe. Lı rojtıra dın sıbê de ji, hemû kesın qurbanên xwe ser-jêkırın, qawûtên xwe patın û lı nav der û cinaran de belav kırın, dawıya pirozkırına cejna Xızır anın.

Belê, Kurdên Dêrsım bı ew şıklı va cejna Xızır lı nav xwe de piroz dıkırın û ew cejnê lı nav wan de ciheki heri giring dıstand. Bı taybeti lı nav seyid û talibên herêma Mêzgirê "Newala Karê" de, ew cejn lı hemû cejnên Oli mezıntır û giringtır dıhat hesabandın. Jı ber ku ocaxê heri mezın, ocaxê Bamasûr lı ew herêmê de bû. Eşıra Bamasûr ji lı dereca pirtı û mırşûdtiyê de bû. Ew eşirê ji jı talibên xwera werga salıx dıda, hemû taliban ji ew gotınên Pir, Rayber û mırşûd'an dıanin ci. Navenda eşıra Bamasûr'an lı nav çar gundan de bû. Ew gundana ji Kûpık, Lodek, Qurqurık û Şowag bûn. Ocaxê Bamasûr lı gundê Moxındiyê de bû, balam pıraniya rûniştvanên Moxındiyê kesên eşıra Şadiyan bûn. Ango ew gunda, gundeki tevlihev bû. Hukma Romê lı Moxındiyê de ji leşkergehek xwe vekırıbû, ew gunda ji, jı xwera kırıbû liwa, angonahiye. Lı dawiyê de ji, navê gundê Moxındiyê guhartıbû, kırıbû "Darikent"

ango "bajarê garis". Lê bî rasti lî gundê Moxindiyê de, xêncî darên Şekok, Gijok, Tawiyân, tîştêk nedîhat dîtîn. Erdê çandiniyê her kêmbû. Gund lî nav du kaşan, gelî û kortek çal de hatibû avakirin. Pîraniya kesên eşira Bamasûr, lî Rojhîlata gund, lî ser kaşê Rojhîlatê de rûdiniştin. Lî ew taxê ra jî "Gaza Moxindiyê" digotîn. Lî bilî ew çar gundên navenda eşira Bamasûran, her usa jî, gelek malbatên eşira Bamasûr lî gundê Karê -taxa Balan- Kîrzi, gundê Teman, Golan, Seymamûdan, Ferec, Golek, lî herêma Çarsancanqê de jî, lî gundê Mezra Çîrko, Hêwedan de dijîyan. Gundê Teman û Golan, gundê eşira Îzolan, Ferec û Golek jî gundên eşira Xeraniyan bûn, ango lî tevlihev rûdiniştin. Lî gundê Seymamûdan de jî, disa kesên eşira Bamasûr, çawa ku nav jî lî serê, ezbeta Seymamûdan rûdiniştin, cinarên wan eşira Kurêşan gundê Paş, eşira Îzolan, gundê Çeleqasê bûn. Pîraniya rûniştvanên Mezra Çîrko jî, kesên gundê Kûpîkê bûn, çûbûn ew cih jî xwera kiribûn gund lî ew derê de dijîyan. Hêwedan jî disa gundeki tevlihev bû. Lî dorbera wan gundan de jî, gundê Mastanê, Qêçiyân û Kûrkan hebûn. Talibên eşira Bamasûr lî Erzurum, Erzingan, Baybûrt, Sêvaz, Meletiyê, Meraş, Adiyaman, Xarpît, Çapaxûr û Qersê de dîhatin dîtîn. Wan Kurdên Elewî jî hemû seyidên aliya Qeza Mêzgirê ra -wek kesên eşira Seysawûnan, Derwêşgewran û yê dîn- "Seyidên Newala Karê" digotîn. Lî pey eşira Bamasûr eşira Kurêşan dîhat, ku ew eşira jî lî encamê Raybertiyê de bû, balam eşirek her mezînbû. Lî navbera wan seyidan de jî, dexesî û hesûdiyêk herî mezînbû. Jî bona taliban şer dîkîrîn. Yek bî mivandari jî biçûna mala talibê yekî, îcar ewê dîn dîxeyidiya, digot "çîra tu dîçî mala talibê min" û destpêka şer dîkîrîn. Wana malbatên talibên xwe jî, mina hebûnek meteryal, an jî mina mal û mîlk lî nav xwe de parve dîkîrîn. Jî bona ew jî, êdî talibên reben lî dest wan de dîketin nav belayên mezînbûn, nedîzaniyê bûn ku çî bîkînbûn.



Her sal, bı taybeti lı demsala zıvıstanê de, hemû seyidên xudan talıb, zar û zêçên xwe lı şuva dıhiştın û derdiketın der dıçûn lı kijan gund û bajari de talıbên wan hebûn, lı nav wan gund û bajaran de, mal bı mal dıgerıyan, çıralıx û geşt kom dıkırın. Jı ber ku hemû kes lı demsala zıvıstanê de, lı malên xwe de bûn, lı ew demê de kes nedıçû kar û xebateki. Ji ber ku her der lı bınê berfê de bû. Kar û karxane ji lı wan gund û bajaran de nedıhatın ditın.

Lı pıştı pirozkırına cejna Xızır de disa Mırşûdê Xıdê naxırvan Bay Seyid hatıbû gundê Torût'ê lı mala Xıdê de búbû mivan. Bay Seyid ew du sê sal bû ku lı aliya Xıdê û gundê Torût'ê de nehatıbû. Hındê Bay Seyid mina hın seyidan, ewqas lı nav talıban de nedıgerıya. Wi pırani rêçberi dıkır û dolıwa xwe bı rêçberi dımeşand. Balam carna ew ji derdiket dıçû nav talıbên xwe dıgerıya, jı xwera hın dırav, tışt-mışt kom dıkır. Lê nûça wi lı ser mırına Melek û Xwaskara pıçûk de û çav korbûna Xıdê de tunebû. Pıştı têgıhişbûna wan bûyeran de, Bay Seyid, xwaşderbazi û serxwaşıya Xıdê û hemû neferên mala Xıdê xwast û jı bona çend rojan lı gundê Torût'ê de bû mivan, lı hın malan de Cem gırêda, cıvat ani gelhev, jı xwera gelek dırav, tışt-mışt ji komkır. Lı nav wan rojan de jı Xıdê ra got" kuro tu were guh bıde mın, mala xwe barka were lı gundê meda ciwar be" ew pêşneyara xwe a beri dubar kır û lı benda bersıva Xıdê de ma. Balam Xıdê bersıvek vebırı neda Bay Seyid, jı Bay Seyid ra:

- Bawa, ez nıkarıbım iro jı tera bıbêm" erê, yan jı na". Dıvê ez lı ser ev tışt û pêşneyara te, lı ser pêşerojên xwe û zar, zêçên xwe bıhızırım û dúra bıyareki bıstınun. Jı bona ev, ez dıbêjum naha em lı ser ev meselê serê xwe neêşının, vê meselê bıhêlinın rojên pêş xwe. Em bınhêrın rewş çı dıbe û çı bûyer dıqewımın, got û dengê xwe bırand.

Bay Seyid lı roja dawiyê de disa lı mala Xîdê de bû mivan. Disa hemû gundi lı dora Bay Seyid de kom bûn, heya nivê şevê lı gelhev rûniştın galegal kırın, qal û behsa Ol û mesaban û rewşa welêt kırın û dageriyan malên xwe.

Lı roja dın sibê de hemû zû rabûn serxwe û lı ser sîfre a girmiya niskan de rûniştın girmiya xwe xwarın, zikên xwe têr kırın û disa rabûn çûn lı şûnên xwe de rûniştın. Lı pişti taşte xwarınê de, Xîd rabû çû mala Reşo, çend qurış lı Reşo deyn kır û disa dageriya mala xweku çiralıxa mırşûdê xwe bîde mırşûdê xwe, dıwa xwe bistine û dûra ji mırşûdê xwe rêwan ke. Bay Seyid ji lez dıkır, ku bı hûrdemek zû de, rabe rêkeve, hina ku berf êrxûçe xwe bıgihêjine Sorpiyan, an ji Mameki, bervı Mêzgirê û mala xwe va bıçê.

Xîdê gazi hemû neferên mala xwe kır, hemû bı hevra lı hember Bay Seyid de rêz bûn, destên xwe dan ser singên xwe, tiliyên lingên xweyên rastê ji dan ser ling û tiliên lingên xweyên çepê, bı sıviki piçeki ji xwe xar kırın, bı pişti xûzi lı benda "Gulbang" dayina-dıwa dayin-Bay Seyid de man. Bay Seyid ji dıwa "Gulbanga" wan bı zımanê Kurdi da û dawiya "Gulbangê" ani, ew erka xwe qedand. Lı pey dawı anina "Gulbang" dayinê de, icar hemû xar bûn, jonyên xwe dan ser erdê, erd maç kırın, bı ew şikli va lı ser jonyan de kışıyan çûn, ku xwe bıgihêjinın dest û lingên mırşûdê xwe Bay Seyid maç bıkın, destê mırşûd lı pišta xwe xinın, xêr û dıwa mırşûd bistinın. Heya xwe gıhandın dest û lingên Bay Seyid, pênc-şes car erd maç kırın dûra xwe gıhandın dest û lingên Bay Seyid, yek û yek dest û lingên Bay Seyid maç kırın, Bay Seyid ji destê xwe lı pišta hemûyan xıst "ber Xwedê de xar bıın, ceddê mın Bamasûr xızmet û azeta we û ev çiralıxa we bıpejirine, xana we xana Xızır û kaniya Mızûr be" got û hemû bı hevra disa bı dûpişti dageriyan cihên xwe de rûniştın. Xîdê ji ew çend quruşana kire bêrika Bay Seyid û Bay Seyid bı lez rabû serxwe, xwatirê xwe lı hemû kesan xwast

derket der. Hemû gundi ji lı derva hêviya rêketına Bay Seyid de bûn. Ew ji hemû çûn dest û lingên Bay Seyid maçkırın û Bay Seyid ji lı hemû gundiyan xwatirê xwe xwast û rêket, berê xwe da aliya Mêzgirê û gundê Kûpikê, lı pêş çavan de çû wenda bû.

Pûk û berfa zıvistanê lı şuva mabûn. Disa demsala bıharê destpêkırıbû. Disa lı ser kaş û çıyan, deşt û dûzan, çal û kortan de berf diheiya dibû lehi û lesar. Disa çem û newalên Kurdistan bûbûn derya û dengiz. Disa rê û dırb lı gel hatıbûn gırtın, peywendî û têkiliyên gel lihev hatıbûn bırandın, ew lehi û lesarana, ew çem û newalana bûbûn asteng. Jı ber ku pırd tunebûn. Disa ew lehi û lesarana, ew çem û newalana bûbûn dijminê gelê Kurd. Zar û zêç, rêwanên gund û bajarın lı wan lehi û lesaran de, lı avên wan çem û newalan de dıxenıqıyan dıçûn û pırr caran cendeg û laşên wan kesın ji nedıhatın dıtın.

Lı gor baweriya Kurdên herêma Dêrsım, lı bist yekê Adarê de sêla sor, an ji sêla germ disa ketıbû binê erdê, erd û ax germ dıkkır, helm jı axê derdiket dibû mij û dûman lı ser kaş û çıyan, çal û kortan, gaz û tatan de radıbû derdiket esman, dıket nav ewran de wenda dibû, dı-bû ewr. Disa lı ser zınar û kevırên bılınd de, kaş û tûman de Nêrgız û Belgizar, Bınefş û Sosın, Beybûn û Reyhan, Gul û kulılkan zil dabûn, pışku'yên wan hêdi-hêdi vedı-bûn, çırpozên genım û çewder êdı qasa bosteki bejn bılınd, dırêj bûbûn, cotkaran jı bona cotên bıharê nır û hevcarên xwe dıbırın cem nacaran çêdıkırın, gısınên hevcaran dı-bırın dıdan hesınkar û kûrevanan, gısınên hevcarên xwe zot dıkırın. Gundiyan pezên xwe derdixıstın der lı çiyên berf helandı de dıçêrandın. Lı ew demê de Xıdê ji disa bızın û tuştura xwe derxıstıbû der, ew dıçêrandın, bıreşê daran dıda bızın û tuştura xwe, zıkên wan têr dıkır.

Lewra êdi lı mala Xidê de, ka, giya û kês pırr hındık mabû.

Ew roj ji werge qediyabû, disa êvarê destpêkırîbû, mı-xurba êvarê êdi ketîbû ser cihanê, cihan tari kırîbû. Hemû gundiye Torût'ê ji, kar û berên xwe qedandîbûn lı malên xwe de rûnştîbûn, bûbûn heval û hevparê derd û kulên xwe. Herdu Xid û herdu Xec ji, lı dorbera sobê de rûnştîbûn, lı bin melûliya çîrê de xwe germ dıkırın. Hesen ji ketîbû nav nivina xwe, pêva çûbû, ketîbû xewa kûr. Bê-dengiyek ketîbû mala Xidê, qet lı keseki de dengek der-nedıket. Xid disa ketîbû nav şol û mesela mal barkırînê, ji bona ew meselê noqın bûbû dıhızırıya. Çavên xwe dabû ser sobê werge mat mabû. Dûra lı xwe hesiya, bı xwe bı xwera "divê ez êdi ev meselê û ev bıryara xwe, ji jına xwera û xwişka xwera bibêjım, heya çı wext ez ev xwas-teka xwe lı dilê xwe de veşêrinım" got û çavên xwe lı ser jına xwe û xwişka xwe de gerand, dûra bı dengeki maqûl va ji jin û xwişka xwera usa got:

- Ez dibêjım lı dawıya meha Avrıl'ê de, êdi em mala xwe lı ev gundê bavê xwe de barkın bıçın alıya" Newala Karê" lı gundê Bay Seyid, Kûpık'de ciwarbın. Ez hêvi dıkım rewşa me lı gundê Kûpıkê de qenc dıbe. Ev alıya Xozatê geleki ji xetereye. Ji ber ku ev herêma me lı Xarpitê û lı hukma Romê geleki nêzıke. Xwedê rama xwe lêbıke, mın ev xwastek û daxwaziya xwe ji Melekê ra ji gotîbû, balam wê ev daxwaziya mın cawkırîbû. Mın çı kır, nekır, wê nepejırand, got "na û na" heya roja mırınê. Ez hêvi dıkım hûn ji weka wê rehmetiyê nebêjın "na û na".

Herdu Xecan lı destpêkê de tışteq negotın, balam lı pışti çend hûrdeman de, Xeca jına Xidê ji mêrê xwe Xidê ra:

- Welleh tu dızani, ji bona mın qet tışteq ferq nake, ha lı vır, ha lı wır. Gelo xwişka te Xec çı dibêje? Divê ew ji ramana xwe ji tera bibêje, divê tu destûra wê ji bıstını, got.

Lı pey ew gotinên Xecê de, icar Xeca azew:

- Hûn ji bona min qet tışteki mebêjin, hûn lı ku, ez lıgel we. Raste ev gund, gundê bavê meye, ez lı ev gundi de hatume cihan. Balam mana ev, ew nine ku ez heya dawiya jina xwe lı ev gundi de duminım, yan ji dijim. Dûra ew neheqiya xısmên me her roj lı ber çavên min de naçın. Wana hemû mal û milk û erd ji me girtın, heqên me betal kırın, em lı nav xızaniyê de hiştın. Em bûn şıvanên wan, ew ji bûn axayên me. Çêtire em rojeki bı zû lı ev gundi de derkevın bıçın, bıla çavên min lı wan kesan û ew erd û zeviyan nekeve, got û ramana xwe aşkere kır. Dûra rabû çû ket nav nivina xwe û ket xewa kûr. Xeca jina Xidê ji rabû çû şır da ser ağır, şır keland, dûra dani jêr piçeki lı benda çêrmgermbûna şır de sekını, dit ku şır êdi çêrmgerm bûye, icar şır havın kır û ew ji lı tev mêrê xwe rabû çû kete xewê.

Lı berbanga sıbê de herdu Xec rabûn, ew masta kırın meşka dew, bı hevra meşk bırin der lı sêpiyê de dardakırın û her yeki bı aliki va lolewiyên meşkê kırın destên xwe û destpêka kılândına dewê xwe kırın. Dûra Xeca xwişka Xidê ew nûça mal barkırına xwe ji gelek der û cinaran ra got û ew nûça lı nav gund de belav bû, gelek kes û malbat berxwe ketın, xemgin bûn. Ji ber ku Xid û hemû neferên mala Xidê lı ew gundi de hatıbûn cihan. Lı bıli ew pıraniya gundiyan xısm û meriyên hevbûn, lı ciheki de hatıbûn lı ser ew erdê torût'de ciwar bûbûn. Bavê Xidê Apê Mem lı tev gelek xısm, meri û gundiyan xwe va lı ber zılm û sitemkariya Roma Reş de reviyabûn hatıbûn lı ser ew erdi de, ew gundê Torût'ê avakırıbûn. Ciyê gundê Torût'ê beri hemû kelem û darıstan bû. Wan ew dar, kelem û darıstanana bı tevır, merr û bêran va kolandıbûn, ji xwera kırıbûn zevi û bostan. Xidê ew rewş û zılma

dewleta Roma Reş, çito ku lı devê bavê xwe de bihistibû, werge ji, jı kurê xwera û hın kesanra dengdıkır. Wi ew gotın û serpehatiyên bavê xwe, usa jı kesan ra dıgot:

- Bav û bapirên me lı bajarê Sêvazê, qeza Zera, lı gundê Zarife de, têne cihan, lı wi gundi de mezın dıbın û dıbın xudan zar û zêç. Ango ew gunda, gundeki bav û kalen meye. Em hın eşira Bextiyaran lı mêj de lı ew gund û herêmê de ciwar bûne. Bapirê mın xudan şeş kuran û keçeki bûye. Lı gor gotına bavê mın, bırayê mezın bavê mın, Mem bûye. Lı pey bavê mın, Apên mın Dırso, Silêman, Hesên, Hemo û İmam. Navê meta mın jı Zerife bûye. Ango bavê mın jı mınra usa dıgot. Bavê mın jı mınra dıgot, lawê mın dawıya meha Gulan'ê bû, hemû gundiyan me lı ber kar-berê xweyên bıharê de bûn, cot dıajotın, keç û jınan giya dıçınıyan, lı nav çandınıyan xwe de gırnûg û cılbikên bıyani derdixıstın. Lı êvarê ra jı ya seatek mabû, ya jı niv seat. Ango hındık mabû ku Roj bıçe ava. Lı ew demê de, nıška ve leşkerên dewleta Romê lı her çar alıyan meda derketın. Xwastın ku gund bıkın hındırê çeperek leşkeri. Serbazeki bejn kın, çav kort lı pêşıya leşkeran de lı hespek qırır sıwar bûbû, ferman dıda leşkeran, ku leşker gazi gundiyan bıkın, bıbêjın lı malên xwe de dermekevin, lı dereki va merevin, em malan sehêt-kontrol-dıkın. Lê me armanca dewleta Romê û dek û dolavên hukma Romê baş dızanıbû. Ew hatıbûn ku, xort û mêrên Kurdan kom bıkın bıbın leşkeriyê û bışının şer. Lı ew salan de jı, Romê û Rûs, Romê û Yewnan, hın gelên Balkan û ên dın şer dıkırın. Lı alıya Rojhılatê de jı Ereban xwe dılıvandın. Ango hukma Romê geleki ketıbû tengasiyê. Dûra hukma hov arteşên bı taybeti sazdıkır. Bı taybeti lı ser xortên me Kurdan de dısekınıyan. Pıraniya leşkerên Romê xort û mêrên Kurdan bûn. jı bona ew bû ku, me sebeba hatına leşkerên Romê û armanca leşker qenc dızanıya û fêm dıkır. Lê çıqas ku hın xort û mêrên Kurd bı dek û dolavên Romê va hatıbûn xapandın, bı dıl çübûn,

bûbûn leşkerê Romê, Romê ew kırîbûn serbaz, sıvan û paşa ji, lê disa ji pîraniya welatparêzên Kurd li diji ew artêşan û wê rêzaniya Romê derdiketin. Kurdperwerên Kurdistan ji mera digotin, Roma Reş her roj herêmekî, welatekî û ciheki xwe wenda dike. Gelên Rojavê, ewên wek Bûlzar, Romen, Sîrp, Xîrwat, Ernavût û yênan, li bîn bandûra Romê de azad dibin. Ango Rom êdî ketiye nav nexwaşiyek herî mezîn û bêderman. Ji bona ew ji her dîtirse û xew nake. Xew li hukma Romê reviyaye. Ji bona ew ji hewl dide ku, gelê Kurd bi têkiliyên Olî va bixapîne, tevahiya Kurdistanê bike binê bandûra xwe a gemarin, gelê Kurd bihelîne, wenda bike. Ji bona ew ji divê gelê Kurd şiyar û çav payî bisekinê û bi derewên dewleta Romê neye xapandin. Belê me ev gotinana bihistibûn û pîr tîşt ji me bi çavên xwe va dîtibûn. Ji bona ew baweriyê bû ku, qet hêviyek me li dewleta Romê tunebû. Me çito ku leşkerên Romê ditin em reviyar û me xwe vêşart. Dûra pîraniya gundiyan bêd çek bûn. Li ew revê de ez û du birayên xwe, anga Hemo û Îmam li dest leşkerên Romê de felat bûn. Leşker xwe negihand me, me çepera leşker biriya û me berê xwe da çiya û geliyên kûr. Li ew şer û revê de, sed mîxabîn ku, sê birayên min Dîrso, Sîlêman û Hesên tev gelek xort û mêrên gund hatin girtin bûn dilên Romê.

Em ji derketibûn ser çiyar, li şikeft û qulên kevîran de me xwe vedîşart. Piştî heftekî me bihist ku leşkerên Romê li gund derketine. Li ser ew nûçê em dageriyan gund ku çî bîbinîn, xêncî jin û zarokan, kal û pîran qet li gund de kesek nehiştine. Li ser ew şer û bûyerê çendek derbaz bû, nebû, icar disa leşkerên Romê qol avitîn ser gund, gund kırîn nav çeperê, dorbera gund biriyar. Li ew demê de êdî me mîrîn da ber çavên xwe û em ketin nav şereki giran, ji leşkerên Romê ra şer kır. Li wî şeri de me gelek ji leşkerên Romê kuştin, lê sed heyfe ku, li dawiyê de guleyên me neman, qediyar. Dûra ez çûm min xwe li nav qûrçek

kevıran de xwe vêşart, lı tariya şevê de mın gund, dê, bav, xwişkek û du bırayên xwe lı şuva hiştın, ez revıyan û derketım serê çıyan. Pışti du heftan ez disa bı dızıyan dagerıyan gund, ku çı bıbinım, hemû gund hatiye şewıtandın, xêncı çend pir û kalan qet kesek lı gund de nemaye. Pıraniya gundiyan hatıbûn kuştın. Lı nav wan mırıyan de dê û bavê mın ji hebûn. Dûra gundiyeın dorbera gundê me çübûn ew cangoriyeın gundê me çalkırıbûn. Jı bona ew, mın tırba diya xwe û bavê xwe nasnedıkır, hın kesan lı mın temaşe kırın. Dûra mın lı hın kesan pırsiya jı bona Hemo, İmam û xwişka xwe Zerife, jı mınra gotın" Zerife, Hemo û İmam lı tev selefa-kafıle-gundiyan, leşkerên Romê dan pêşiya xwe û bıрін". Lê qet keseki nedızanıbû ku ew kesana bırıbûn ku. Ez şev û roj jı bona diya xwe û bavê xwe, jı bona xwişk û bırayên xwe giriyan, lı xwişk û bırayên xwe gerıyam, lê mın ne ew ditın, ne ji lı derheqa wan de nûçek stand. Lı destpêkê de Dırso, Silêman û Hesên dil gırtın bıрін şandın şer, ew dan kuştın û ew şuva nehataın. Lê ew lı kıjan şeri de cangori búbûn, lı ser kıjan erdi de ew çal búbûn, ew nedihat kufşê û ez teneghiştım ji. Ez lı xwişka xwe Zerife, Hemo û İmam pır gerıyam, balam mın ew ji nedıtın. Lê çı hatıbû serê wan, hukma Romê ew çawa kuştıbûn ew ditbar-belli-nebû. Lı pışti ewqas zılm sitemkariyê, dewleta Romê disa lı me dıgeriya, her roj qol dıavıt ser gund. Em mêrên ku mabûn her roj lı serê çıyan de bûn, em lı şıkeftan de radızıyan. Rewşa herêma Qoçkiriye jı her roj bervı bediyê dıçû. Eşirên me Kurdan ji, jı hevra neyar bûn. Pıraniyan guhdare hevûdu nedıkırın. Hın serok eşir búbûn kûçıkên dewleta Romê, gelê xwe dıfırotın. Êdi roj hat rewşa me kete xeterek mezin û me çend malên eşıra Bextiyaran bıryar stand, ku em lı gund derkevın, bırevın aliya Dêrsım. Me werge ji kır. Lı destpêkê de em sê malbat hatın mala bavê Şahan axa, wi camêri jı ev erda lı me temaşe kır û got" hûn ku dıxwazın lı ser ev erdi de jı xwera mal û xaniyan ava bıkın, ciwar

bın, fermo jı wera ev erd" got û şûna ev gundê lı me te-
maşe kır. Ango beri ev ciyê gundê me hemû kelem û dar-
ıstan bû. Me ew kelem û darıstan birıyan, dûra me ev erd
kola jı xwera kır zevi û bostan. Me mal û xani ji, jı xwera
ava kırın. Dûra gelek xısmê meyên dın ji hatın gel me û lı
ev gundi de ciwar bûn. Lı pışti ewqas tışt de ez zewıcıyam
û tu hati cihan. Lı pey te çend kur û keç bûn, hemû ne-
jiyan û mırın. Lı dawiyê de ev xwişka te hat cihan, tışteş
lênebû, jiya, bû wek şêr. Lê lı Xwedê û ev roj şıkır" dıgot
bavê minê dılovan.

Belê, Xidê ew gotın û serpêhatiyên bavê xwe zû-zû ji
heval û hogirên xwera, jı kurê xwe Xidê piçûk ra dıgot û
dıgiriya. Xidê dıgot" bavê mın ez zû zewıcandım. Wexta
ku ez zewıcıyam, lı ew demê de ez lı şazdeh salını de bûm.
Xwişka mın Xec sê-çar salını de bû. Pışti zewaca mın şeş
meh derbaz bûn, nebûn, lı zıkê meheki de, beri bavê mın,
dûra ji diya mın mır û ew çûn gihiştın rama Xwedê. Dûra
ji meriyên mın lı mın neheqi kırın û hemû erd lı darê zorê
lı dest mın girtın tışteş nedan mın".

Roj û seat zû-zû derbaz dıbûn û dıçûn. Xidê ji êdi bı
vebırı bıryar standıbû ku, mala xwe bar bıke bıçe qeza
Mêzgirê, herêma "Newala Karê" lı gundê Kûpıkê de ciwar
bıbe. Lê dem jı bona Xidê ne baş bû. Lewra ava çemê
Mızûr, Xarçık, Mûrad û Fırat'ê mina behrên Okyanûs
bûn. Lı ser avên wan çeman de pırd tunebûn, ku gel bı
hêsayi lı ser wan avên çeman de derbaz bıbe, bıçe wi ali,
were vi ali. Lê ew kara ne keys bû. Lı ser wan avên
çeman de tenê bı kelekan gel derbaz dıbûn, balam Xid ji lı
kelekan dıtırsiya. Lı ser kelekê de heşên Xidê dıçûn, fir-
şıka Xidê lı navhev dıket, tama Xidê dıreviya, Xid bed dı-
bû, nexwaş dıket. Jı bona ew ji, Xid lı benda meha Gulanê
de mabû.

Rojek sayi, esman şin bû. Sibe-sibe pepûg derketibûn ser gaz û tatan, kaş û çiyân, dar û zinaran bî dengeki dîlşewati va dîxwendin, dîkırın pep û pep. Qebqebandına kewan, pip û pipa dîksilêmanan, çik û çika çivikan, xîşexîş avên kani û çirtikan bû. Gundiyên Torût'ê ji êdi çêrandına pez û dewarên xwe lî nav xwe de kırıbûn nobet. - Her roj malek dîçû ber pez û dewarên gund, pez û dewar dîçêrand. Lî ew rojê de ji gundiyan pez û dewarên xwe bırıbûn radeste nobetkar kırıbûn, dageriyabûn pêş deriyê mala Xîdê. Xîdê cıl û corên xwe lî kehra xwe a boz û kehra Reşo bardîkır. Herdu Xecan çal û heqîbên xwe amade dîkırın, dıgırıyan berxwe dîketın. Xîdê pıçûk ji stuyê xwe nızın kırıbû bî kûrahi dîhênjıya û ketıbû nav bédengıyeki. Xîdê mezın pışti cıl û cor barkırınê de, weris avıt ser barê kehran, weris lî binê zîkê kehran de gırt, lî heçi derbaz kır, barê keran bî qenci kışand û şıdand, weris gırêda û bî kelegiri dagerıya ba neferên der û cinaran, destên hemû mezınan û çavên zarokan maçkır, xwadırê xwe lî hemû gundiyan xwast, got" heqên xwe helalkın, bımının lî nav xwaşiyê" û lî gundiyan cûda bû û berê xwe da aliya "Newala Karê" gundê Kûpıkê. Lî pey Xîdê herdu Xecan û Xîdê pıçûk ji lî hemû der û cinaran xwadırê xwe xwastın bî dîşını lî dû Xîdê de meşıyan, lî ber çavan de wenda bûn çûn, gund şıva hıştın.

Xîd û neferên mala xwe hêdi-hêdi bî meşa kehran meşıyan, hina ku roj neçûbû ava xwe gıhandın nêzıka Mameki,-navê Tûncêliyê ê kevn Mamaki bû, dûra hukma Tırk ew nava ji guhart kır Tûncêli- gundê Sıxankê. Wê şevê lî mala Hesenê Kurêşi de bûn mivan û lî berbanga sıbê de disa rabûn rêketın lî çem derbaz bûn û ketın rıyek evraz-yokuş-binê gundê Tırkêlê. Lî ew gundi de ji eşıra Derwêşgeran rûdınıştın. Lî pışti çend hûrdeman de, yekcar lî nav kelem û binê kevıran de çend mırovên bî çek derketın

û riya Xidê naxırvan bırıyan. Gotın" bisekının, beri ku hûn neyên kuştın".

Reng-meng lı ser Xidê û neferên lıgel Xidê de nema bûn, bı tırsan dırıcıfıyan, hêz lı jonyên keseki de nemabû. Xidê nedızanıbû ku çı bıke û çı bıbêje. Herdu Xec ji bı tırsan dev lênedıgerıyan, lal bûbûn, ketıbûn derece a mırınê. Xidê piçûk ji disa weka bav û diya xwe lı şûna xwe de bûbû wek kevir mabû. Lı ew rewşê de rêbiran ji Xidê ra:

- Çıqas ku dırav lı bêrikên weda hene, hemû derxinın bıdine me. Heke ku hûn bıbêjin "na" bı navê Xwedê em we hemûyan lı vıra bıkujın, gotın û dawıya fermana xwe anin.

Lı ser fermana ew kesan de, icar Xidê:

- Welleh çu quruşek lı bêrikên meda tunenin. Hûn ku bawer nakın werın lı bêrikên me bınhêrın, heke ku we tıştekt dit hemû ji wera, bıgırın bıbın. Xêncı ev ez ji wera çı bıbêjım, got.

Rêbiran bı lez û bez lı bêrika Xidê û paşla Xidê, pêş û piştên herdu Xecan bı qenci nuhêriyan, lê çu quruşek lı bêrik, pişt û pêşa yeki de nedıtın. Dûra hêrs ketın, hın cıl û corên Xidê lı ser kehıran gırtın avıtın ser piştên xwe û disa ketın nav dar û darıstanan û lı ber çavan de wenda bûn çûn.

Xidê belengaz gelek cıl û corên xwe wenda kırıbû, berxwe dıket, herdu Xec û Xidê piçûk ji dıgiriyan, wan nedızanıbûn ku çı bıkın û ji hevûdu ra çı bıbêjin. Xidê qet nedızanıbû ku ew kesana ji kine, ji bona çı ew riyan dıbirın û ew karê bêt erêni bıkar tının. Erê rast bû, hın kesên bed û bêt hış hebûn, rê dıbirıyan û ew kara dıkırın, lê gelo ew kesana, ew kesên bed, dız û rêbir bûn, yan ji pêşmergeyên bırçı, bêt cıl û cor bûn?. Ew ji, ji bona Xidê ronahi û eyan nebû. Xidê nedızanıbû ku Dêrsım ketiye dorvebirinê, rê û dırb lı aliya dıjımın de hatine gırtın. Ew tenê ji bona cıl corên xwe berxwe dıket, dıgiriya û dıgot"

ew dîzên bêbext ez şêlandim, ez bêt cıl û cor hiştum, Xwedê o ez naha çî xaliyê li serê xwekum?".

Pîştî gelek giri û şîni, Xîd disa li tev du kurên xwe, xwişk û jina xwe va rêketin, kehrên xwe ji dan pêş xwe, li nav gundê Tirkêlê de derbaz bûn derketin ser çiyayê Qirxler, li jori gundê Mezra Reş de meşîyan xwe gihandin Rojhilata gundê Pûlanê û berjêri gundê Qurqurîkê bûn. Pîştî heyamek heri kurt de xwe gihandin gundê Qurqurîkê, kehrên xwe ajotin çûn li pêş derê Bay Piro ê Îmamê de rawestiyan. Bay Piro miroveki zor dîlpak, dîlsoz, dîrist, maqûl û mivanhez bû. Bay Piro Xîdê naxîrvan û gelek kesên gundê Torût'ê qenc nasdikir. Wi li ciwantiya xwe de ri berdabû, ri'ek reng zerik mina zêrê zer li ser gep û hindava wi de diburîqiya, mirov heyran dîma ku li ri a Bay Piro binhêre. Wi çito ku Xîd û zar zêçên Xîdê li pêş derê tortê de ditin, xwe avit stuyê Xîdê, herdu aliyê gepên Xîdê maçkîr, dûra ên Xîdê piçûk û Hesên. Herdu Xec û herdu Xîd ji çûn destên Bay Piro maçkîrin, ku tîşteki bîbêjin, icar jina Bay Piro Ana Elif derket der. Disa hemû neferên mala Xîdê û Xîd çûn destê Ana Elif ji maçkîrin, rewş û demên hev pîrsîyan, ku êdi rêkevî bîçin Kûpîkê, Bay Piro nehişt û ew daweta hindîr kîrin" fermo werin hindîr, dûra hûn diçin" got, barê kehran dani, ka û giya kîr ber kehran û hemû bî hevra ketin hindîrê xêni. Li pîştî hîn pîrs û bersîvan de, Xîdê hemû rewşa jiyana gund û serpehatiyên xwe, rewşa ew rêbirinê û wan kesên rêbir yek û yek ji Bay Piro ra dengkîr û giriya. Bî taybetî Bay Piro ji bona ew bûyera rêbirinê berxwe ket, ji wan kesan ra çend tîştên nebaş ji got, dûra dageriya ser Xîdê, ji Xîdê ra:

- Berxwe mekeve Xîdê min, ev jiyane, her tewîr serenceme têne serê mirovan. Bûyerên usa pîrin û pîrr dîbin. Tu ji kesê yekemin nîni. Ez bawerim ew kesana kesê rêbir û nijdevan-eşkiya-an ji kesên dîz nînin. Bibe ku ew kesana pêşmerge'ên tevgera Dêrsûm'bin. Ew camêrên hejar û

welatperwer çı bıkın? Dijmın Dêrsım kırıye dor-
vebirinê-abluka-tevger bêt nan û bêt havıl maye, rê û dırb
mina beri ninın, hemû hatine gırtın. Ango ev tıştana têne
bira min, bıbe ku ew kesana kesên nebaş, kesên bed,
rêbır, nıjdevan û dızbın ji. Lê bı rasti mırov nızane. Her-
waha canê te sax be, berxwe mekeve, wê em ji tera havi-
leki bıbinın. Weki tu dıçı mala Bay Seyid, qet xem meke,
ew camêra ji tera her tıştı bıbine û amade bıke. Dûra em
hemû saxın, nemırine û lı vırane, lihêfek me ji hebe, wê
em ew lihêf a xwe bıdıne te. Raste, rewşa me ji qenc nine,
em ji mina beri dernakevın derveyiyê Dêrsım, naçın nav
talıbên xwe de nagerın. Rê û dırb lı me Dêrsımıyan hatiye
gırtın û bırandın. Em dıtırsın ku derkevın derveyiyê Dêr-
sım. Gor ku mın bıhistiye, dıbên hukma Romê ji bona
êrişkırınêk ne mırovi xwe amade dıke, ku pırsa Dêrsım ji
êdi lı holê rake, qıra me Dêrsımıyan ji bine, rewşa me ji
bıke mina rewşa Qoçkırı'yê, Şêx Said, çiyayê Agırê. Lı
nav eşirên me Dêrsımıyan de ji dubendi her gurr bûne.
Kes qet guh nade keseki. Gelek serok eşirên Kurd bûne
leyıztokên Romê. Gor ku dıbêjın kurê serokê eşıra me
Bamasûran, kurê Seyid Sılêmanê Lodekan, Bay Seyid
Husên, serokê eşıra Xeraniyan Hesên Axa ê Germisiyê,
serokê eşıra İzolan Mele Úsıv ê Riçıkê, serokê eşıra Şa-
dıyan Resûl Axa ê Newala Oxıyê, serokê eşıra Ariyan
Memık Axa, serokê eşıra Xormekiyan Bertal Axa ê Cıva-
rıkê, serokê eşıra Lolan û gelek eşır û serok eşirên me
Dêrsımıyam bûne hevalên hukma Romê, bûne hevalê
genral Avdılah Alpdoxan. Herkes lı mafê xwe digere û
dınhêre. Herkes ji bona berjewendiyê xwe ê şexşı tevger
dıke. Ar, namûs, qêret û rûmet lı dilê gelek serok eşirên
me Kurdan de nemaye. Gelê me lı nav tırs û xofan de dıji.
Qet kesek bêt tırs lı mala xwe de ranaze. Bı şev dıçın lı
şıkeftan de radızın, rojtıra dın vedıgerın malên xwe û
dıçın ber pez û kar-marên xweyên çandınıyê. Hemû zar û
zêç tan-sıtma-gırtine nexwaşın, her roj yek-dudu dımırın.

Qet kesek pırsnake, ku ev zarokana çıra dımırın, ev nexwaşıya çıye, gelo dermanê ev nexwaşıyê çıye, çı nine. Qet kesek bijijkeki nabine. Ango rewşa gel her xırabe Xîdê mın, lê nızam axırıya me Kurdan çawa bıbe, ev ji ne eyane. Tu wexta ku bı çaveki vekırı, bı aqıleki qenc û maqûl va lı mesela me Kurdan dınhêri, tu ecêb dımını. Mırov dıbêje Xwedê gelê Kurd bı taybeti afirandiye. Jı Mırtıban ra gotiye" hûn bıçın ku, ew der welatê weya, qet doza erdeki mekın". Jı me Kurdan ra ji gotiye" hûn ji lı bin destan de dermekevin, bıbin xulam û berdestên Tırk, Erebi û Farısan". Ango em ketıne rewşek usa. Em xêrne-xwazên hevın, neyarên hevın. Kuro qenc bınhêre heya roja duhu gelê Erebi lı bakûra Efriqa de, lı nav Qûm û qûmıstanan de dijıyan. Ew kesên qûmıstanan hatın lı ser erdê Rojhılata Navın de bûn xudan dewlet û dezgeh, bûn Împarator. Tırkên nijad Moxol lı Asya navın de derketın hatın derbaz bûn çûn navına Anadolıyê bûn xudan dewlet û dezgeh, dûra bûn Împarator, em gelê Kurd bı hezaran salın ku lı ser erdê Mezopotamıya de dijın, em dimatıyê -yerli- ev erdine, lê hezar mıxabın ku em nebûne xudan dewlet û dezgeh, em nebûne yarên hevûdu. Gelo çıra? Gelo sedem çıbûn ku em ketıne ev rewşa iroin? Gelo çıra em ji jı hevra nebûne dost û yar, nebûne xwişk, bıra û yek beden? Ma eşır û serokê Tırk, Erebi, Farıs û hemû gel û Netew'ên ev cihan tunebûn? Hemû gelên cihan bûn xudan dewlet, dezgeh, bûn xudan heqên xweyên çarenûsi, em gelê Kurd ji man bındest, bûn xulam û berdestên Tırk, Erebi û Farıs'an. Hêy Xwedê o tu ev rewşê nepejırını, lı bıli ev ez jı tera çı bıbêjum Xîdê mın, tu jı mınrı tışteki bıbêje.

Bay Pıro dawıya axaftına xwe û gotınên xwe anı, dûra jı jına xwera got" keçê evana lı rêva hatıne, bırcıne, bı kerema xwe rabe jı ev mıvanê meyên ezız ra xwarıneki amade bıke". Lı ser daxwazi û fermına Bay Pıro, Ana Elıf rabû helal, hazır çı ku hebû amade kıır, da ser xonçê û

zikên mivanan têrkır û pişti wextek heri kurt de Xîd rabû serxwe, ku bî rêkeve biçe gundê Kûpîkê, lê li ew demê de Bay Piro:

- Xîdê mın, ez dıxwazın hûn işev bıbın mivanê mın, sibe ez bî xwe li tev we werım, we bıbım Kûpîkê radeste Bay Seyid bıkim. Bay Seyid xısmê meye, em meriyên hevın, ha li vir, ha li wir, çı ferq dıke. Hûn li riyek dûr va hatıne, rûnın vêsa xwe bıgırın, hêsa bın. Bila bihna we piçeki fereh bıbe, ew tırsa li ser we bireve, avê germkın xwe bışon, dûra Xwedê mezine, got, çı kır nekır, Xîdê got "na û na" nesekınıya. Li pişti ew bıryara Xîdê de, êdi Bay Piro dengê xwe dernexıst, tışteki jı Xîdê ra negot û li tev Xîdê rêket, berê xwe dan aliya Kûpîkê.

Li navbera gundê Qurqurık û Kûpîkê de rê her kurt bû. Tenê li navbera wan herdu gundan de tapeki piçûk hebû. Mırov li Qurqurîkê de radıbû rêdıket, beri deh hûrdeman de xwe dıgıhand gundê Kûpîkê. Rûnıştvanên gundê Qurqurîkê ji hemû kesên eşıra Bamasûran bûn. Li gund de sê tax û sê ezbet hebûn. Navê ew ezbetan ev bûn: Husênıyan, Hesênıyan û Safıyan. Pıraniya ezbeta Safıyan li taxa Zênan de rûdınıştın. Ew herdu taxên dın ji, disa bî navê Hesênıyan û Husênıyan va dıhatın naskırın. Hın ezbeta Safıyan ji li gundê Kûpîkê, li taxa "Kevırê Şırê" de ciwar dibûn, balam pıraniyan jı ew taxê ra "Mala Weli Hesê" dıgotın. Malbatên ew taxê ji, disa li ser rûnıştvanên Kûpîkê de dıhatın hesabdıın.

Li bınê gundê Qurqurîkê de newalêk hebû. Ew newalê navenda gund û taxa Zênan li hev cûda dıkir. Li navbera riya Kûpîkê û taxa Zênan de ji gelek darên hêrmıyan hebûn. Darên wan hêrmıyan li du aliyên rê de rêz bûbûn, guliyan xwe dırêje hevûdu kırıbûn, ew guliyan gihiştıbûn hevûdu, li hev hatıbûn badan, mırov li demsala bıhar û

havinê de lı bın siya wan hêrmiyan de derbaz dıbû. Bı taybeti lı heyama hêrmi gırtin û gihiştına wan hêrmiyan de, guliyên wan hêrmiyan lı bın giraniya hêrmiyan de xardıbûn dadiketın jêr, te digot naha ew guliyana dışikın. Jı ber ku giraniya her hêrmiyeki nêzıka niv kilo bû. Her hêrmiyek mina çurtaneki gılower bû. Wexta ku ew hêrmiyana zer dıbûn digihiştın, mirov lı ser ew guliyana de jêdikır dıbir ber devê xwe, gezek lı ew hêrmiyan dıxıst û dıxwar, ew hêrmiyana lı devê mirov de dıheliyan. Tama wan hêrmiyan şirin, mina hıngıv, şerbeta tırî û tû'an, mina şekirê Amedê, bastiqê Xarpitê bûn. Xoşava wan hêrmiyan disa werqas şirin, mina ava jıyanê, jin dıda mirov, dil û kezewa mirov hınık dıkır. Pırr caran xwediyê wan hêrmiyan pasewan-bekçi-lı ber wan hêrmiyan de dıhiştın, ew pasewanana şev û roj lı wan hêrmiyan dıpan û lı wan hêrmiyan dınhêriyan, ku rêwanên ew rê û kesmesek wan hêrmiyan jêneke û nedize. Lewra hın rêwan û kesên nebaş, bı dızıyan derdiketin ser guliyên wan hêrmiyan, ew hêrmiyana dadışandın dıkırın ser erdê, dūra ji dadiketın jêr ew hêrmiyana kom dıkırın, dıkırın çal û torbeyên xwe, dıdızıyan, dıbirın malên xwe.

Hêrmi hina negihiştıbûn. Bay Piro û neferên mala Xıdê lı ava newala gund de derbazbûn ketın nav malên taxa Zênan, sılav dan kesên lı ser pıšta xaniyan, ber deriyan, - meşıyan lı pêş deriyê xaniyê Ali Bawa ê Têlp de rabırtın û ketın nav wan darên hêrmiyan û lı bervı Kúpikê meşıyan. Lı pêş wan de deşteşek hebû, qasa ciyê çend benderan. Deşt lı nav çal, kort û guniyan de bû. Mırov rê nedıdit ku lı ew deştê de bımeşe. Axa wê deştê ji axek piçek reng zer û gewr tevlihev mina qûm bû. Hemû gundiyan Kúpık û Qurqurıkê dıçûn ew axa dıkolan, bı serad û bêjıngan va dadıwıtın dıkırın çalan, lı kehr û qantıran bardıkırın dıbirın bı ew xaliyê pıšta xaniyên xwe, hındirê malên xwe çılpav dıkırın. Ew erda êdi werqas hatıbû kolandın, ku lı nav çal, kort û biran de mabû. Wexta ku berf û baran ji



dıbariyan, ew çal û kort û birana tji berf û av dıbûn. Mırov nedıkarıbû ku lı ew korta xaliyê de derbaz bıbe. Lewra hemû der golên avê û heri, şumitok bûn, lıngê mırov dışumıtiya, mırov diket zikê wan çal û kortan, nedıkarıbû ku bı hêsayi derkeve, kinc û kolên mırov lı nav heriyê de dıman. Navê ew deştê ji "Korta Xaliyê" bû.

Xidê naxırvan lı tev Bay Piro, lı "Korta Xaliyê" derbaz bûn, lı hember gundê Kûpıkê, lı tırrê "Newala Sêvıkê" de daketin jêr, lı ava ew newala piçûk de derbaz bûn, lı ber derê Hamedê Elikê û Hamedê Şariwanê de rabirtın, çûn xwe gihandın goma jorin, pêş derê mala Bay Seyid. Bay Seyit lı ew demê de tev jına xwe, kurê xwe ê piçûk Birê, Zuhre a keça xwe lı ser kevırên pêşiya xêni de, lı ber tava rojê de rûniştıbûn, lı nav xwe de dıpeyiviyan. Çawa ku çavên Bay Seyid lı Xidê, zar û zêçên Xidê û Bay Piro ket, bı dileki şa lı şûna xwe de rabû serxwe bervı malbata Xidê û Bay Piro meşiya û xwe gihand Xidê, stuyê Xidê kire hembêza xwe, gepên Xidê maçkır, çû çavên Hesên û Xidê piçûk, çavên wan ji maçkır, herdu Xid û Xec ji çûn destên Bay Seyid, destên jına wi û keç û kurê wi maçkırın. Bay Seyid û Bay Piro ji keleyên xwe lı ser mılên hevûdu birıyan, bı lez barên kehran danin, kehr bırin kırın axur, dûra hemû bı hevra lı pêpelûga pêş deri de meşıyan derketın jor, çûn lı oda mivanan de lı ser sekûyê de rûniştın û destpêka rewş, dem pırskırına hevûdu kırın. Xidê ji Bay Seyid ra ji ew serpêhatiya xwe û rewşa wan rêbıran deng kır. Bay Seyid û jına wi ji geleki berxwe ketın. Dûra Bay Seyid gazi keça xwe Zuhre ê kır, ku ew bıçe avek teze bine û çayeki bıkeline, ji mivanan ra amade bıke. Zuhre a keça Bay Seyid ji, bı rasti keçek her bedew bû. Gepên wê'ên sor û sıpi mina sêvên İxdırê û hınara reg sor bûn. Bejna wê a kûbar, tenık û dırêj mina sıpındareki Kurdistan bû. Wê porê xwe ê kej bı qenci mûnandıbû, ew porê wê dadıket ser panıyên lıngê wê, çavên wê'ên reş-belek û bıriyê wê'ên qeytan, dev û lêvên wê'ên narin, dıranê

wê'ên mina mircanan aqlê serê xortan lı serê xortan de derdixist. Zuhre ê gulukek Amedê dabû ser fesê xwe, şar û valeyên rengê kesk û sor û zer û sıpi lıhev mûnandibû dabû dora fesê xwe, mori û mircan lı rêşiyên guluka xwe de dakırıbû, ew rêşî û mori, mircanana dadıketın ser çav, bırı û bıjengên Zuhre' yê, bedewiyek bı taybeti dıdan wê keçıka mina hori û melekan. Pozê wê ê zırav û narın mina pozê Kılopetra Şabanûya Yewnani bû. Mırov wexta ku lı ew bedewiya Zuhre ê dınhêriya, xwe lı bıhiştekek rastide, lıgen horiyeki de dıhesıband.

Zuhre a bedew bı lez û bez kûzê avê gurt çû lı kaniya Şarık de tiji av kır ani. Dûra ağır dada, ava teze kire çaydank û çaydank da ser ağır av kelan, çay demkır bır lı oda mivanan de dani ser xoñçê û disa dageriya oda jınan cem diya xwe û herdu Xecan. Pışti çay vexwarın, nan xwarın û zık têrkırınê de, Bay Seyid, Bay piro lı tev Xidê de derketın der, ku bıçın xaniyê ku Xid têda rûne, ew xani lı Xidê temaşe bıkın. Ew xani lı paş xaniyê Bay Seyid de bû, jı wi xanira" Goma jor" dıgotın. Xani tenê du çavi bûn. Jı bona ew Bay Seyid jı Xidê ra:

- Xidê mın tu lı virde dolıw bıke. Hindê pez, dewarên te pırr nının. Te ew çend pez, dewarên xwe ê heyi ji, jı xwera neanine. Çendek dûra tu bıçe ew pez û dewarên xwe ji bıgire bine. Lı wê demê de, lı çaviyeki de tu rûne, çaviya dın ji lı navinê de çiteki bıksıne bıke du çavi. Dûra aliki bıke kadin, aliya dın ji, jı pez û dewarê xwera bıke axur. Ez bawerım heya heyameki ev xani jı tera bese, got û lı benda bersıva Xidê de ma. Lı pey ew gotınan de, icar Xidê:

- Bawa tu qenc dızani, pez û dewarên mın werqas tune-nın. Tenê du mi, bıızın û tuştırek, çêlekek û nogınek mın hene. Mın ew jı radeste Elo ê Êmoşê kırın, sıbe, dusıbe ez dıxwazım bıçım wana jı bınum. Lê ez hêvi dıkım disa rêbır nekevın pêşiya mın, got û ew tırsa xwe ani zıman.

Pışti xani ditinê de, Xîd çû destê Bay Seyid carek dın maçkır, jı Bay Seyid ra spas kır, disa dageriyan mal. Lı nêzıka êvarê de Bay Piro xwatirê xwe lı Xîdê û hemû kesan xwast û dageriya çû mala xwe. Rojtıra dın ji Bay Seyid lı nav xısm û gundiyan de hemû hevcedariyên mala Xîdê amade kır û Xîd lı tev zar û zêçên xwe kete binê ew xani û lı wir de ciwar bû. Lı pışti sê çar rojen de, Xîdê kurê xwe, Xîdê piçûk ji girt ba xwe, bı hevra berê xwe dan gundê Torût'ê çûn ew pez û dewarên xwe ji girtın anin gundê Kûpikê.

Lı hefta duduyan de Bay Seyid gazi hemû gundiyan kır, hemû gundi lı ser bêndera Seyidê Curnıkan de kom bûn. Bay Seyid rewşa Xîdê jı hemû gundiyan ra dengkır. Jı bona heqê naxırvaniya Xîdê ji, heqê Xîdê ê saleki pêdan kır û Xîdê disa tev kurê xwe destpêka naxırvaniya xwe kır. Lı çend rojên destpêkê de her roj mirovek lı tev Xîdê dıçû ber naxıra pêz û dêwêr, ku ci û war lı Xîdê bıdın temaşekırın. Jı ber ku ew ci û war lı Xîdê ra xerib bûn. Gelo Xîdê naxır bıbirana lı kuderê de bıçêrandına? Kijan erd û kijan pawan a gundê Kûpikê bû? Xîd lı zıkê hefteki de fêre hemû ciyan bû û her der bı qenci naskır û çu dijwariyek jı xwera nehişt.

Roj û mehe zû-zû derbaz dıbûn dıçûn, jina mirov kın dıkırın. Jı bona Xîdê û neferên mala Xîdê ji jiyanek nû destpêkırıbû. Rojên bıhuri lı şuva mabûn. Dolıwa Xîdê baş dımeşiya. Hemû gundiyan qedra Xîdê dıgirtın, nedıxwastın ku Xîd biriya gundê Torût'ê, heval û hogırên xwe bıke. Guneyên gundiyan lı Xîdê dıhat. Dıgotın" Xîd xeribe, hejare, dıvê em qedra Xîdê bıgırın û dilê Xîdê neşıkının. Şahan Axa ê eşıra Bextiyaran jı me seyidan ra nebêje ku seyidan lı hejareki eşıra mın nenhêriyan, xwatirê wi neza-

niyan, ev ji, ji mera eyibe, dîvê kesek ji me Kûpîkiyan ra tîşteki usa nebêje".

Belê, bî rasti ji, ji bona Xîdê û neferên mala Xîdê jîyanek nû destpêkîribû. Êdi zarokên seyidan diçûn mala Xîdê lî tev Hesên dileyiztî. Hesên sibê de heya êvari lî tev Hesênê kurê Gul Mistefa, Îmamê kurê Hamedê Şariwanê, Husênê kurê Hamedê Elîkê dileyiztî û lî derva nedihat hîndîr. Lî tev wan diçû malên wan. Pîrr caran lî malên wan hevalên xwe de dima, dîket xewê. Xîdê piçûk ji, ji xwera çend heval ditîbû, wexta xwe a valayî lî tev wan hevalên xwe de derbaz dîkîr. Herdu Xec ji êdi bûbûn hevalê jînên seyidan, ji wan ra karguzari dîkîrî. Jî hemû jîn û keçîkên seyidan ra "Ana" dîgotî. Lewra jînên talîban, jî jînên seyidan ra dîgotî" jînên seyidan jî eslê keçê Mihamed pêxamberê Îslamîne. Ku ew keçê kêsên ne seyid bî jî, êdi ew ketîne hevriya Seyidî Sadet, ewladi Resûl, wan jî cîyê Ana Fadîme standîye". Jî bona ew baweriyê bû ku, herdu Xec her roj diçûn jî malekî û jîneki ra arîkari dîkîrî, lî wan malan de zemanê xwe derbaz dîkîrî. Jînên seyidan jî kînc û kolên xweyên kevn dîdan herdu Xecan, zîkên wan têr dîkîrî.

Lî nav jîyanek werge nû de zemanê Xîdê û neferên mala Xîdê derbaz dîbûn. Zeman hatîbû xwe gîhandîbû demsala payîzê, meha çiriya paşîn. Xîdê dixwast ku mala xwe bîguhêrine. Lewra ew mala jî Xîdê ra gelekî piçûk û teng bû. Jî bona ew jî, Xîdê ramana xwe jî Bay Seyid ra vekîr, destûr lî Bay Seyid standî û mala xwe barkîr çû lî taxa "Sêdîkan" lî xaniyê Apê Îsmail de ciwar bû. Lewra xaniyê Apê Îsmail bêtir gîrsî û fereh, axur û kadî jî hebûn. Lî alîya dîn de jî, ew tax navenda gund dîhat hesîbandî.

Gundê Kûpîkê lî ser heft ciyan de hatîbû avakîrî. Ango heft taxên gunde Kûpîkê hebûn. Taxa Sêdîkan, Goma Hemê Ali, Goma Karrê, taxa Korta Reş, Mala Wîalî, Goma Bay Seyid û taxa Kevîrê Şîrê û navenda gund.

Lı goma Hemê Ali, Goma Karrê û taxa Sêdikan de eşira Derwêşgewran rûdiniştin. Lı taxa Korta Reş, Mala Wiali, Goma Bay Seyid, taxa Kevirê Şirê û navenda gund de ji, eşira Bamasûran rûdiniştin, balam pez û dewarên gundiyan bi hevra nedîçûn çêrê. Lı destpêkê de Xidê tenê pez û dewarên navenda gund dibîr çêrê. İcar wexta ku mala xwe guhart, navenda gund terikand, icar destpêka naxır girtina taxa Mala Wiali, Goma Hemê Ali, taxa Sêdikan, Goma Karrê û Korta Reş kır. Navenda gund ji disa mina beri bû nobet.

Xidê ew zivîstana lı bın xaniyê Apê İsmail de derbaz kır, lı meha Avrîl'ê de mala xwe disa guhart, çû lı xaniyê Seyid Weli ê Mîstefê, Weli ê dengbêj û tembûrvan de ciwar bû. Seyid Weli bi rasti dengbêj û lawjevaneki heri qenc bû. Wi lı ser gelek kesan lawje derxistibûn û ew lawjeana dîstrandın. Wexta ku Seyid Weli ew lawje û kılâmên dın dîstrand, bi rasti dilê mirov dax dibû dîşewitiya. Malbata Seyid Weli ji malbatek nav û deng bû. Kalîkê wi Seyid Mîstefa ê Axcê, lı nav hemû Kurdên Elewi de ciheki heri giring dîstand, tiştên lı dîrveviyê aqlan lı derheqa Seyid Mîstefa ê Axcê, birayên wi Seyid Ali ê Seynûri, Seyid Abasê Koşê de deng dîkırın, mirov ecêb dıma.

Jı bona gelek efsane û çirokan, Xidê gundê Kûpîkê zef hezdîkır, wi xwe lı bihiştêk rasti de dîhesiband û her roj lı tev kurê xwe Xidê piçûk diçû jı malek seyidan ra kar û suxre dîkırın. Ew seyidana jı zor dîlxwaş dibûn, kêfa wan dîhat. Ango Xid jı seyidan ra bûbû xulameki heri dîlsoz. Lê ew rewş lı Xidê piçûk xwaş nedîhat, wi xulamti nedîpejirand. Wi carna xwe bi xwera digot "mırov çawa jı mirov ra bibe xulam û berdest? Ma bavê mın çira evqas dîxwaze ku jı seyidan ra bibe xulam û berdest?". Aqlê Xidê piçûk qet nedîghişt wan pırsan. Ew pırs û meselana lı nav hev dînedîxist. Wi zarokên seyidan jı heznedîkır. Jı ber ku zarokên seyidan qure û poz bîlind bûn. Kınc û kolên wan paqj û nû bûn, ên Xidê piçûk jı qılêr, pine lı ser pınan,

helisi bûn. Ji bona ew rewşê ji Xidê piçûk berxwe dîket, dexesi dîkir, şermezar dibû. Wi wer fêm dîkir ku, hemû zarokên seyidan li wi dîkenin, tînazên xwe li wi dîkin, li nav xwe de qeşmer dibinin.

Li gundê Kûpîkê de tenê du malbat seyid nebûn. Ew malbatana ji, yek malbata Xidê naxîrvan, a din ji malbata Alê Memê Şivan bû. Alê Memê Şivan ji zîlameki eşira Îzolan bû. Alê Memê ji li ew demê de xudan keç û kureki bû. Bavê wi Memê şivan li zaroktiya xwe de sêwi dimine. Li neh salina xwe diçe gundê Mastanê, dibê şivanê kar û bexên mala Gêdûk Axa. Li xortaniya xwe de ji tê li gundê Kûpîkê de cîwar dibe û ji seyidan ra colegtiyê dîke. Piştî mirîna Memê şivan de, kurê wi Ali diçe dibe colegê Seyid Bektaşê newiyê Seyid Mîstefa ê Axcê. Li herêma qeza Mêzgirê de, naveki Seyid Bektaş ji "Çapanoxlû" bû. Gor ku mezînan, kal û piran digotin " Seyid Bektaş li gundê Mezra Gazê, li mala Husên Axa de, bî destê Kurdên Şafî, Zaza'ên qeza Paliyê de tête kuştin. Hîn kesan ji digotin " na, li serihildan û tevkuştina Şêx Said'ê nemir de, serokê eşira Îzolan Mele Êsiv û serokê eşira Şadiyan Resûl Axa ê Newala Oxîyê ji Kurd birayên xwera nebûne arikar, li ew tevkuştinê de bûne hevparê hukma Roma Reş, ji bona ew ji, li piştî têkçûyîn û bînketina ew serihildana Şêx Said de Yado êriş daye ser gundê Mezra Gazê, gelek kesên eşira Îzolan kuştiye, li nav wan kesên cangori de ji, Seyid Bektaş ji hebûye. Lewra li ew şevê de, ew mivanê mala Husên axa bûye.

Hîn kesan ji digotin " Kurdên Şafî qol avitîne ser Elewiyan, ku Elewiyan bîkujin û ji xwera riya bîhiştê vekin". Lê bî rasti kijan gotin rastê em nîzanin. Em hêvi dîkin ku rastiya ew bûyerê li derheqa Kurdperwerên Kurdistan û dirokzanên gelê Kurd de li pêşerojan de were kifşkirin û serastkirin.

Li aliya din de, disa hîn kesan li derheqa serokê eşira Îzolan Mele Êsiv ê kurê Hêmed Axa de digotin " Mele Êsiv

li pey şerê cihan a yekemin û tevkuştuna Ermeniyan de li gundê" Ertixanê " -ku ew gunda li mêjde gundeki Ermeniyan bûye- xwedi derketiye û bî dara zorê ew gunda kîriye bîn bandûra xwe û milkê xwe. Jî bona ew neheqiyê ji, bî taybeti hukma Romê jî Mele Êsiv ra arikari kîriye û pişt daye ew tevgera Mele Êsiv. Lî pey dawî ditîna şerê cihan, tevkuştina Fîlan, xurandîna hukma Romê û destpêka tevgera Mîstefa Kemal de, îcar Mele Êsiv dibe dost û hevalê Mîstefa Kemal û Îsmet Paşa ê kerr. Wexta ku Mîstefa Kemal û Îsmet Paşa dîçin qeza Paliyê dîbîn mivanê Haşim Begê Paliyê, lî ew gerê û mivandariyê de dîbîn nasê Mele Êsiv, rojtira dîn jî radîbîn dîçin gundê Ertixanê lî mala Mele Êsiv de dîbîn mivan, jî bona bernama tevgera xwe a nû, xetme-onay-wî a arikari û pişt dayîne jî dîstînin. Jî bona ew dîlsozi, hevaltî û mivanhezîya Mele Êsiv jî, ew nişana Xakîtiyê dîdîn kurê wî ê mezîn Weli, Weli dîkîn" Weli Xakî ". Lî piştî ew rojê şûva jî, êdî kurê Mele Êsiv Weli dibe" Weli Xakî" lî nav gel de werge têtê naskîrîm, gel jî jî wîra " Weli Xakî" dîbêje. Ango hevalbendiya wan bî wî rengî çêdibe, zexm û qewîm dibe. Lî piştî damezrandîna Komara nû de jî, disa peywendiyê wanên hevaltî û dostiya wan berdewam dibe. Her çiqas ku lî dewra Mîstefa Kemal de gelek bûyer dîqewîmîn, tevgerên serihildanên gelê Kurd destpêdîbîn û bî sedhezaran gelê Kurd cangorî dîbîn û têne sîrgûnkîrîn jî, lê çûcaran dewleta Tîrk, Mîstefa Kemal û hemû heval û Serok Wezîrên wî, jî malbata Mele Êsiv ra qet tîşteki nabêjîn û wê malbatê naêşînin, hevaltîya wan domdike û dimeşe.

Mele Êsiv xudan sê kuran bû. Kurê wî ê mezîn nav Weli bû, ew bûbû" Weli Xakî ". Ê navendi nav Adil, ê piçûk jî nav Xelîl bû. Xelîl xorteki bejn tenîk, spehî, balam Kose bû. Adil lî ew malbatê de keseki herî bîjar, welatperwer û Kurdperwereki hêja, zor jîr û jêhat bû. Wî lî zanîngeha Tîrk, fakulta zagonê de xwendîbû, bûbû dadgereki dewleta Tîrk, balam ew yarê gelê xwe bû, jî çaş

û bêbextan ra bî mêrani şer dîkir, diji sîtemkariya dewleta Tirk a mêtinkar û xwinmij derdiket. Ji bona ew ji, ew ketibû bîn çavê dewleta Tirk a hov û bêt ram. Lî piştî gelek bûyeran de, Adil xwe paşva kişand û ew vatîniya berda, îcar bû Parêzger-Avukat-serbest kar kir. Lê sed mixabîna ku, wî ew karê xwe jî pîrr nemeşand, nexwaşîya dîl ew lî nav gel de rakir bir û ew mîr çû gihişt rama Xwedê.

Belê, Alê Memê Şivan ne tenê colegê mala Seyid Bektaş bû, her usa jî ew colegê hemû malbatên ezbeta" Seyid Mustafa ê Axcê" bû. Ew şev û roj lî ew ezbeta seyidan ra dixebitîya, colegti dîkir cot diajot. Ceh, genim, garîs, nûk, nîsk, kûşne, fik, gîlgîl û lazût diajot û diçîniya.

Kurê Alê Memê nav Husên bû. Ew lî Xîdê piçûk du-sê sal mezintir bû. Lê dişa jî hevalê Xîdê piçûk, ê herî nêzîk û dîl û can bû. Lewra rewş û bextên wan mîna hev bûn. Ew jî malbatek bêt ax û erd, malbatek biyani bûn lî ew gundi de. Xîdê piçûk Husên zef hezdîkir. Wî êdî xwe lî lî gundê Kûpîkê de xerîb û bêt heval nedîdit. Ew piştî çêrandîna dewar û pez, êvar-êvar diçû mala Alê Memê, ba Husên, heya nivê şevê ligel Husên de dîsekîniya, jî wîra qal û behsa gundê Torût'ê, heval û hogirên xweyên wî gundi dîkir. Carna jî bî henekî qal û behsa keçîkên bedew dîkir, diçot" Husên rojeki em bî hevra biçin ew alîya qeza Xozatê û gundên ew herêmê lî keçîkên bedew û xwaşîk bigerin, bîbinin. Te ku kijan keçîk ecîband, jî mînra bîbêje, ku em dagerîyan mal, wê ez jî bavê te Apê Ali ra bîbêjim, bîla ew lî tev bavê mîn biçin wê keçîkê jî tera bîxwazin. Lewra bavê mîn ew herêmê û hemû gundên Xozatê û gelek kesan qenc nasdîke".

Husênê kurê Alê Memê xortekî zor jêhat, jîr û her bîaqîl bû. Salên wî lî dora pazdeh-şazdeh bûn, balam ew

mina xorteki bist çar salni dihat xuyakırın. Mıl, bask û çepilên wi, mina mıl, bask û çepilên pelewanan bûn. Xort û mêrên seyidan qet zor nedıbirın wi. Ew mina şereki nav darıstanan xurt, çalak-çevik-û her wurya-atik-bû. Wexta ku ew dıket nav zarokên seyidan, her yek lı aliki va belav dıkir, ser û çavên wan dışikand, lı nav xwinê de dıhişt. Ji bona ew ji, bavê wi ji wira hêrs dıket, ku carek dın ew ji keseki ra şer neke. Lê xortên seyidan hêsa nedısekiniyan, destdirêji wi dıkirın, êdi ew ji bêt havıl dıma û wi lı wan dıxıst û ew dıkutan.

Rojeki disa lı navbera Husên û xortên seyidan de şereki gewre derket û Husên çend ji wan xortan xışır kırın, seri û çavên wan lı nav xwinê de hişt, ew revıyan. Dûra dê û bavên wan bı hevra êriş dan ser Husên, ku Husên bıkutın. Lı ew êrişa seyidan de, icar bavê Husên Alê Memê diyax nekır û xwe gihand arikari û hawara kurê xwe. Husên tev bavê xwe kete nav şereki gewre. Hemû ezbeta Seyid Abasan, tev jin, mêr û xortên xwe va êriş dabûn ser ew du kesan, lê disa ji zor nedıbirın wan herdu şêran. Lı ew şeri de Husên û bavê xwe heft kesên ezbeta Seyid Abasan xışır kırın, serên wan lı pirr ciyan de şıkandın, balam Alê Memê ji lı sêri de birindar bû. Dûra gundiye Lodekan xwe gihandın ew şeri, ketın navberê herdu aliyan, lı hev cûda kırın. Xidê piçûk ji ew şera û mêraniya hevalê xwe Husên bı çavên xwe va ditıbû; ji bona ew ji, wi êdi pişt a xwe her qewin dihesıband û bêtır nêzıke Husên dibû û wexta xwe derbaz dıkir. Ango êdi kêfa Xidê piçûk lı cih de bû.

Roj û mehe derbaz dibûn. Kesên mezin û kal roj bı roj hêzên xwe wenda dıkirın, bêtır kal dibûn. Zarokên piçûk ji gırs û mezin dibûn, lı bervı dewra xortaniyê dıçûn. Lı

nav wan zarokên piçûk de yek ji kurê Xîdê Hesen bû. Hesen ji roj bî roj mezîn dibû. Ew êdî dîçû ber kar, berx û golikan. Wi ji, jî xwera gelek heval ditibûn û her roj li tev wan bû. Ew û Îmamê kurê Bavo ê Kekê, Ali Rıza ê kurê Qemer, Husênê kurê Ali'yê Îmê, Mustefa ê kurê Ali'yê Seyidxan, Kekê kurê Apê Îsmail, Bîrê ê kurê Miçê Hamê, ewana hemû hevalên Hesen bûn. Ew zarokana hemû hemsalên hev bûn. Bî hevra dîçûn ber kar, bex û golikan, bî hevra dileyiztî. Xeca xaltiya Hesen ji her çiqas ku li dîlqê dêmariya Hesen dabû ji, lê wê Hesen mina kurê xwe ê heqiqî dîhesiband. Hesen ji ew mina diya xwe dîdit. Xecê jî bona Hesen û Xîdê her tîşt dîkîr û canê xwe jî bona wan fîda dîkîr. Lê carna jinên seyidan nedûhiştî ku Xec jî Hesen ra û kar û berê malê ra mijûl bibe. Jinên seyidan her roj gazi herdu Xecan dîkîrî, ku herdu Xec biçî jî wanra kar bîkî. Ango herdu Xec bûbûn berdestên jinên seyidan. Wana her roj li piştî kar û berên sîbein de, gazi herdu Xecan dîkîrî, ku ew biçî jî wanra hîriyê şebîkî, teşiyên wan bîrêsî, der û dorên wan paqîj bîkî, biçî kaniyê jî wanra ava teze binî. Bî kurtasi jiyana wan belengazan, werge derbaz dibû û dîçû.

Demsala havînê êdî şuva mabû. Heyam payîz, dawîya meha Îlonê, hewa jî piçeki hînik bû. Hemû gundiyan disa benderên xwe rakiribûn, zadên xwe jî kiribûn ambaran, li benda nobeta aşan de mabûn, ku zadên xwe bîbî bîhêrînin, avranên xwe bîkî, dolîwa xweyên çar-pênc mehan bîkî hîndîr, ku zîvîstan û bîharê derbaz bîkî. Jî bona ew jî, gundiyan gundê Kûpîkê, kê li gundê Şîlkê, li aşê mala Zayim de, kê li aşê mala Cîwê de, kê jî li gundê Dawaliyê, li aşê mala Bego de nobet girtibûn, zadên xwe bî kehr û qantîran va dîkişandî wan aşan, avranên xwe dîkîrî. Li alîya dîn de jî, disa gelek gundî jî bona dolîwa dewar û pezên xwe derketibûn nav dar û darîstanan çîlo'ên darên Mazi dibîriyan. Xîdê naxîrvan jî li tev jîna xwe û xwişka xwe, jî bona dolîwa pez, dewarên mala Qemer û Seyid

Weli ê Mistefê-ew du bira bûn-derketibûn nav daristana hember gund, lı binê gazê, ciyê nav "Barg"de çilo dibiriya. Lı nêzıka Xidê de Alê Memê û kurê wi Husên û keça wi Elif ji çûbûn ketibûn nav ew daristan, jı xwera û jı mala Bavo ê Kekê ra çilo dibiriyan. Bavo ê Kekê lı tev pısmamê xwe kurê Seyid Bektaş Muslum, lı gunde meriyeki ezbeta Seyid Abasan kuştibûn, dûra reviyabûn lı gundê Kûpikê de derketibûn. Muslum çûbû Baybûrt'ê lı gundê Lipanê de jı xwera keçıkek talibê xwe ditibû, lı ew gundi de zewıciyabû. Bavo ji çûbû Têrcanê, lı gundê Mixarê de jı xwera jınek bi ditibû, ew ji lı wê zewıciyabû, lı ew gundi de mabû. Lê Bavo beri ku bireve, ew xudan jınek heri bedew, sê kur û keçeki bû. Lê wi malşewati ew zarokên xwe sêwi, jına xwe ji bi hiştibû, hemû ji xwe birkırıbûn. Ew çar zarok û ew jınıka belengaz lı stuyê Alê Memê Şıvan de mabûn. Jı ber ku Alê Memê Şıvan colegê wan bû. Alê Memê Şıvan jı, ew zarokana mina zarokên xwe, ew jınıka ji mina xwişka xwe dihesiband û ew xwedi dıkırın, lı ser wan dibû sıh. Ew pênc gewriyana ji ketibûn nav gewriyên neferên mala Alê Memê, jiyana ew malê zor dıkır.

Xid derketibû ser dareki çilo dibiriya. Lı aliya wi a çepê de ji, Alê Memê û kurê wi Husên, ew kara dıkırın. - Ango her yek derketibûn ser dareki, teqa-teqa devê dasan bû, çilo dibiriyan. Lê dara ku Xid derketibû ser tiji gêle -karınca-bû. Gêle lı bın pañıka derpe ê Xidê de hıldıkışıyan dıçûn derdiketin ser çêqên Xidê, lı wê xwe digıhandın nav şeqên Xidê, canê Xidê gezdıkırın, xwına Xidê dımitın, cın dianin serê Xidê, Xid eciz û bêt kêf dıkırın. Xidê ji dıkır qirin û gazin, diyax nedıkır, vêca gazi Alê Memê dıkır, dıgot" lo-lo Ali van kambaxên gêlan, angomûriyan ez xwarım, ez kuştım, gelo ez çı bıkıım?". Alê Memê ji, lı Xidê dıkeniya, dıgot" kuro xwına te pırr paqıje, lewma wan gêlan dora te gırtıne, bısekıın ew heywanên Xwedê ji bı xwına te zıkên xwe têr bıkıın". İcar Xid ji

dikeniya û zû-zû das lı hejên çilo dıxıst dıbrıya û dıkr jêr. Dûra dadıket jêr çilo û çelig lı hev cûda dıkr, çelig lı çilo dûr dıxıst, herdu Xecan ji ew çilo bı qenci teval dıkrım dıdan ser hev û lı benda dızkırın û lodkırına çilo de dıman.

Lı nêzıka êvarê de herdu Xecan hemû tevalên çilo kışandın binê darek du çetel de rêzkırın. Dûra Xidê gazi Alê Memê kır, ku ew bıçe jı Xidê ra arikari bıke û ew ji çilo ê xwe diz bıke. Lı pışti çend hûrdeman de Alê Memê çû derket ser dara du çetel, Xidê ji bı şışek seri du çetel va çilo radıkr jor dıda Alê Memê, Alê Memê ji ew çilo dıgırt û lı nav ew çetelên darê de dıda ser hev û bı lıngan dıde-wısand û lod dıkr. Lı zıke heyamek heri kurt de Alê Memê ew kara jı Xidê ra qedand, jı bona qalıb gırtına çilo ji, gelek çeligên çilo û kevır ji da ser çilo û daket hat jêr, Xid lı ew tengasiyê de felat kır, dûra ji çû karê xwe qedand û bı hevra dagerıyan malên xwe.

Rojtıra dın disa hemû gundi derketıbûn der çûbûn ber kar û berên xwe. Ki çûbûn aşan û kar-marên dın, ki ji disa derketıbûn nav darıstanan de çilo dıbrıyan. Lı ew rojê de Xid tenê lı tev Alê Memê çûbû çilo birinê, herdu Xec ji lı mal de mabûn. Jı lewra tama Xeca jına Xidê tunebû, gıraniyek ketıbû ser Xecê, Xec bêt kêf bû, nedıkarıbû ku bıçe jı mêrê xwera çilo teval bıke. Jı bona ew Xec tev zeyiya xwe lı mal de rûnıştıbû, Xeca xwişka Xidê ji kar û berên malê dıkr, pêşiya dêri dumışt, paqj dıkr. Lı pışti niv rojê de jına Seyid Qemer Ana Xatûn û cayiya wê jına Seyid Weli Ana Elif gazi herdu Xecan kırın, ku herdu Xec bıçın jı bona Temd daninê jı wanra arikari bıkın. Herdu Xec ji rabûn çûn mala wan, bı hevra ris, sing û hemû hacetên Temd daninê gırtın çûn lı binê tû'ya binê gorıstana gund de sekinin. Dûra gazi Gul Mıstefa ê kurê Hesê kırın, ku Gul Mıstefa were jı wanra singên Temd'ê dayne, bıkute û singan bıke erdê. Gul Mıstefa ji bıvır gırt û çû arikariya amojınên xwe, jı zıkê çend hûr-

deman de bı qûna bıvır va sing kutan, kırım erdê û ligel wan de ma. Dûra Ana Xatûn û Ana Elif sêpi rakırın danin navina her çar singan, dareki mina kırtnameki-oklava- kırım nav sêpiyan, bı weris ew dara girêdan, dûra du darên wek darê yekemin anin dan paş singan, lı her aliki jineki bı qenci, kip pê wan daran girt û Ana Elif giloka ris girt, serê ris lı darê aliki va girêda bır aliya dın, lı ser darê dın de ji derbaz kır, êdi dawiya karên dijwar anin. Lı pey ew herdu cayi lı aliyek temdê de rûniştın, Xeca jına Xıdê jı giloka ris dıbir wi ali, vi ali dıhat dıçû û Ana Xatûn û Ana Elif ji simên ris lı ser ew daran de rêzdıkırın, bı qenci dıdan ber hev serast dıkırın. Lı wê demê de nişka ve Xec lı şûna xwe de sekini, desteki xwe da ser devê xwe, piçeki xar bû, bı destê xwe ê dın ji da ser zıkê xwe, zıkê xwe gıvişt, ji Ana Xatûn ra:

- Ana fırşika mın navhev dıkeve, verşiya mın tê, çavên mın tari dıbin, heşên mın dıçın, nızam ev çiye lı mın qewimi, çêtire hûn destûrê bıdine mın, ez piçeki rûnum, bıla Xeca zeyiya mın ev kari bıke, got û lı şûna xwe de rûnişt. Lı pişti ev tevgera Xecê, Ana Xatûn û Ana Elif, herduyan bı hevra:

- Lê-lê nebe ku tu ducan bi? Xêncı ev qet tışteki dın nay aqlê me. Em lı te dınhêrın maşela tu başi, weka tıviri, rengê te ji her başe, mina sêva sore. Em hêvi dıkın tu nefsnexwaş bi. Lewra ew du salın ku te mêr kıriye, tu zewiciy, heya roja iro ji zaroken te tunın. Hatına we a taxa me, ji wera wexêr-uğur-ani. Ziyaretên ev gundi û Bamasûr qet keseki bêt zarok nahêlinın wana tu ji dıtın, ew gelek zarok wê bıdine te ji, gotın û lı benda bersiva Xecê de man. Lı pey ew gotınan de, icar Xecê:

- Welleh Ana ez ji nızanım ku çıra fırşika mın lınavhev dıkeve û çıra heşên mın dıçın? Çıra çav lı ser mın tari dıbin? Hûn mın bıborinın ev du mehene ku ez eyiba xwe a serê mehê nabinım. Jı bona ev ji qet tışteki nehat aqlê mın, mın şerm kır ku jı wera bıbêjım. Lê iro êdi ez bêt havıl mam, mın ev rewşa xwe ji wera got.

- Haa, naha hate kışê, mın fêm kır tu sedi-sed ducani keçê, çavên te ronibın; Xıd ku êvari lı ber çılo dageriya mal, em ev mızgina hêja bıdıne Xıdê, bıla Xıd ji dıŝa bıbe. Lı pıŝti ew Xecê usa got:

- Na-na Ana, ez ketıme bextên we, ez têm dest û lingên we maçdıkm, hûn ji Xıdê'ra tıŝteki usa mebêjm, bısekinın ez ji wira bıbêjm, balam ez piçeki ji ŝerm dıkm, gelo ez ev meselê ji Xıdê ra çawa bıbêjm? got Melêkê.

Lı pıŝti ew gotmên Xecê de icar Ana Elif keniya û ji Xecê ra usa got:

- Keçê ji bona çı tu ŝerm diki û dibêji" ez ŝerm dıkm" felan-bêvan? Keçê te ku evqas ŝerm dıkr, ma çıra te mêr kır? Çıra tu keti hambêza Xıdê? Wexta ku lı tev Xıdê dıkevi nav nivinê û binê lihêfê, ma tu çıra Xıdê hambêz diki, dev û lêvên wi maç diki dimêji? Ma tu çıra lı ew demê de ŝerm û fedı naki? Naha ji rûyê te sor dıbe, tu ji mera dibêji" ez ŝerm dıkm". Na-na dikê ev ŝerm nine, ev rastiya jiyanêye, zagona Xwedê ye, divê hemû jindewarên Xwedê-nêr û mê-werın gelhev bıbın çıft, lı hev ŝabın, ku dıdemanên-nesil-xwe zêde bıkın û jiyan bımeŝe. Bınhêre keça mın dara bêt fêki nabe, ku bıbe ji ev-zel-makbul-nabe, hêja nabe. Lı me hemûyan bınhêre diya mın, em hemû ji lı ser ew pırdê de derbaz bın. Lı dest-pêkê de me ji mına te got û ŝermkır. Balam iro em xudan gelek zar û zêçanın, em ji bona zarokan ŝerm nakın, em ji bona ducanbınê ŝerm nakın. Ŝına ŝermê cıdaye. Ŝerm dızıye, ŝerm pıŝtiye, ŝerm bêbextiye, ŝerm doxin sıstiye, ŝerm teraliye, ŝerm dek û dolav û derew kırına, ŝerm neheqi, zordari û sıtemkariye, ŝerm mırov kuŝtine, ked-xwari û heq xwarına. Ango ŝerm evananın, bıli evana ez ji tera çı bıbêjm, got û Xec xemrevin-teselli-kır.

Lı pışti ew gotinên Ana Elif de Xec bêdeng ma, noqin bû kete nav xem û xeyalan. Dûra bı kûrahi hênîjiya, bı xwe bı xwera got" welleh ev wesfana gelek lı nav seyidan de hene. Cara yekemin pıraniya seyidan teralın, kar nakın, lı ser pıšta talibê xweyên hejar û belengaz de dijın. Lı nav seyidan de disa gelek derewçin û doxin sist hene. Hın Seyid hene ku ji jin û keçên talibên xwera" keça mın, xwişka mın" dibêjin, tu dibini rojtıra dın, ew wan keç û jinan dırevinın, ji wan keç û jinan ra dızewıcın, ji wanra radıbın, rûdımın". Dûra Xec vecemqıya serxwe disa bı xwe bı xwera" na-na Xwedê o tu mın bıbaxşine, ez lı derheqa seyidan de nebaş fıkrıyam, tıştên nebaş hatın bira mın û ber çavên mın. Heşa-heşa, ew Seyidi Sadet, Ewladên Resûlın, tu ji bona wana gunan nanıvisini, ew hemû newiyên balyozê tene" got û berê xwe da mal, çû lı ser palasa ser sekûyê de palda û dirêj bû, ku tışteki hêsa bibe.

Roj lı paş gaza Lodekan de hêdi-hêdi dıçû ava. Kesen ku çûbûn çılo bırandinê êdi dageriyabûn malên xwe. Malbatên ku nobeta aşan girtûbûn û avranên xwe dihêrandın ji, jin û zarokên wan, şiv xwarına wan dibırın aşan. Ana Xatûn û Ana Elif ji Temd danin qedandûbûn dageriyabûn malên xwe. Herdu Xec ji derketûbûn pêşiya dêri, lı benda naxıra pêz, dêwêr û Xidê mezın de mabûn. Lı wan rojan de, Xidê piçûk lı tev Hesênê bırayê xwe dıçû ber naxıra pêz û dêwêr, Xidê bav ji dıçû çılo dibırıya. Pırr zeman derbaz nebû naxıra pêz û dêwêr kete hındır gund balam Xidê mezın nedıhat xuyakırın, piçeki dereng ketibû. Jı bona ew ji Xecê xem dıkır. Lı pışti dewar, pez cikırınê de, Xecê dit ku ew e Xid lı ser tapê gar a hember de daketiye, nêzıka pagên mala Hesênê Şaverdi bûye, darxiçek êzing ji daye ser milê xwe, dasa çılo ji kırıye ber doxına derpe ê xwe bervı mal dımeşe tê. Lı zikê çend hûrdeman de Xidê xwe gihand pêş mala xwe, darxiçê êzingan bır dani ser maxa êzingan, lı tev jına xwe ketın hındır malê.

Lı pışti şiv xwarinê de Ana Elif diyax nekır, lı şûna xwe de rabû çû mala Xidê naxırvan. Çıto ku Ana Elif lı dêri de kete hındirê mala Xidê, hemû neferên malê û Xid rabûn ser lıngan, Ana Elif fermo kırın û Ana Elif çû lı ser kursi de rûnişt, jı neferên mala Xidê û Xidê ra spas kır; dûra gotinek lı wir ani, gotinek lı wir ani, lı dawiyê de berê xwe guhart ser Xidê, ku ew mızginê bıde Xidê, Xecê çav qırpe Ana Elif kır, ku Ana Elif jı Xidê ra ew nûçê nebêje, lê Ana Elif bıryar standibû ku ew mızginê bıde Xidê. Beri ku Ana Elif wê mızginê bıde Xidê, lı bin lêvan de jı Xecê keniya, dûra jı Xidê ra usa got:

- Xıdo ez dıxwazın nûçek gırıng û bıxêr bıdıme te. Lê beri ku ez ev nûça bıxêr bıdıme te, divê ez lı te pırs bıkıım, gelo tu jı bona mızgina mın çı bıdı mın?

- Xêre Ana çı mızgin, çı nûçe? Gelo jı bona çı, tu lı mın mızginê dıxwazi? Tu keremê ew nûça xwe jı mınra bıbêje, ez jı lı ser ew nûça te agadar û serwext bıbım, bınhêrum ku mınasibe, lı gor hêza xwe tışteki bıdıme te. Lê divê beri tu ew nûçê jı mınra bıbêji, got Xidê û lı benda bersiva Ana Elif de ma. İcar Ana Elif:

- Xıdo çavên te ronıbım, Xeca jına te jı mina mın lı zarokeki de ducane. Ez bawerım çıl'ên zarokên me bıkevın nav hev. Lewra ez jı ducanıım. Ango lı pêşerojan de zarokeki mın jı wê were cıhan. Jı bona ev divê tu êdı hın tıştan jı bona Xecê amade bıki, jı wêra bıbi arıkar. Ez bawerım naha tu serwext bûy. Mızgin xwastına mın ev nûça bû, gelo tu çı bıdı mın?

Xidê bı şermezari jı Ana Elif ra spas kır, balam dılaşabûniya xwe neda kıfşê, keniya, dûra jı Ana Elif ra:

- Ana ez xulamê weme, tu mızgina xwe çı dıxwazi, jı mınra bıbêje, ez jı zanıbım, dûra ez bersiveki bıdıme te. Bıbe ku tu lı mın tışteki heri hêja bıxwazi, hêza mın dest nede, bıbe ku tu tışteki heri erzan û pıçûk bıxwazi, anga ez mızanıım tu lı mın çı dıxwazi, got û lı benda daxwaziya Ana Elif de ma. Lı dû pırsa Xidê de, Ana Elif:

- Xıdo-Xıdo canê te xwaş be, ez jî tera henekên xwe dıkım, ma tu'ê hejar çı bîdî mın û çiyê te heye ku? got û rabû serxwe, xwatirê xwe xwast" şev baş, Xwedê hêsabûnê bîde we" got û derket der çû mala xwe.

Ana Elif bî rasti jînek dılsoz, jînek maqûl û zor bedew bû. Lî çar gundên eşira Bamasûr de, weka gundê Kûpık, Lodek, Qurqurık û Şowagê û lî hemû herêma Newala Karê de jînek wek Ana Elif bedew, çeleng û çak tunebû. Bejna wê a zırav û narin, ne pırr dirêj, ne kın, bejn çat, biriyê wê'ên qeytan, bijengê wê'ên dirêj weka tirên mêrxwasên Kardûk, pozê wê mina pênuşa dest Celal Bedirxan, çavên wê mina rengê qewa Yemen û Birezil, porê wê ê dirêj û pêlpêl rengê Şembelûtê-kestane-six û gulguli bûn. Lî bîli ew, lî her tiliyek Ana Elif de hunerek hebû. Xaliçeyên ku wê çêdıkırın, çinçinik û neqışên ku wê lî aqilê xwe de derdixistin, mirov ecêb dûma, dibû heyrana wan hûnerên wê. Ew lî eslê xwe va ne seyid bû. Ew keçek eşira Xormek bû. Bav û kalên wê lî gundeki qeza Xınîsê de ciwar dibûn û ew jî talibê Seyid Weli û Seyid Qemer bûn. Jî bona ew bedewî û hunerbaziya Ana Elif bû ku, Seyid Weli ew revandibû anibû gundê Kûpıkê jî xwera kırîbû jî û bermalî. Lê bî rasti lî zagona seyidtiyê de ew adet tunebû. Lê Seyid Weli ew zagona pelçiqandibû û jî keça talibê xwera zewiciyabû. Hın kesan jî bona tıştên han, henekên xwe dıkırın, dıgotın" em çı bıkın, eslê seyidan piçekî nefis sıvıkın, lî nefis û doxına xwe nıkarıbın bandûr bıkın, xwedi derkevın". Erê hın kesan bî heneki dıgotın, balam piçek jî rasti lî nav ew henekan de hebû.

Êdi zıvıstan, berf û pûk şuva mabûn. Zıkê Xecê û Ana Elif roj bî roj mezın dibûn dıwerımıyan, nedıkarıbûn ku kareki bıkın. Bî taybeti Xeca xwişka Xıdê nedıxwast ku

bûka wê xwe bîwestine û kareki bîke. Wê digot" bûkê tu rûne, ez kar dîkum, qet jî bona tîşteki xem meke".

Heyam destpêka meha Gulanê bû. Disa deşt û kaş, çal û kort, çiya û tapên Kurdistan lî nav hêşinayiyê de ma-bûn. Disa jiyaneke nû destpêkiribû. Disa Gul û Nêrgîz, Bînefş û Belgîzar, Beybûn û Sosîn, Reyhan û Qerenfîl, her cûre kulîlkên rengîn, lî tev çiçegên Bayiv, Hêrmî, Sêv, Hêrig, Fişne, Gijok, Şilan, Dîrîk, Tawî'yan, Dêrsûm û hemû erdê Kurdistanê xemilandi bûn. Disa avên çem û newalan bûbûn derya û dengîz dîherîkiyan, dîkîrîn xuşe-xuş. Disa her celeb teyrên Xwedê lî bîn sar û serma, berf û pûkên zivîstanê de felat bûbûn, lî bînê tava Roja Zeri, lî ser dar, kevîr û zînanan, lî ser gaz û tatan de xwe germ dîkîrîn, bî zîmanên xwe dîxwendîm û dîstîrandîm. Disa qîrîkên reş-belek lî ser sîpîndaran, lî ser guliyên darên Mazi, sêv û hêrmîyan de, kewan lî bînê gunî û bînê kevîran de, Qîjîk û kevokan lî bînê sîvingên xaniyan de, Çûkreş, Darkutîk û dîksîlêmanan lî curnê daran de, jî bona çêkîrîna hêlinên xwe, pêlax, xîjîk û qîlçîxên hûr û piçûk kom dîkîrîn, bî nikulên xwe va dîkîşandîm dîbîrîm hêlinên xwe çêdîkîrîm, hêk dîkîrîm kurt dîbûn, lî ser hêkan de pûn dîbûn çêlik dîanîn der. Çêlikên wan teyr û tûran dîkîrîm çiçe-çîq dengêki xwaşîk derdîxîstîm. Disa pep û pepa pepûgan, qebqebandîna kewan dîhat. Carna ew dengê pepûg, kewan, xwendîna hemû teyran jî mîrov ra ecêb dîhat. Ew jî lî kûrahiya dîlên xwe de dîgîriyan. Jî ber ku çêlik, dê û bavên wan teyr û tûran dîbûn nêçîrên nêçîrvanan, dîbûn nêçîrên mîrovan, telef dîbûn. Zarokên gundiyan bî perwerde xwe yê nezani va derdîketîm ser wan daran hêlinên wan heywanên bêt gune hîldîşandîm, hêkên wan teyran dîşîkandîm, çêlikên wan kewan dukuşîm û bî laşa wan çêlikan dîleyîzîm. Teyrên dayîk wexta ku dadîgerîyan ser hêlinên xwe, hêlin û çêlikên xwe nedîdîm, îcar dîkîrîm qîje-qîj bî seatan lî dora wan daran û ciyan de dîfîrîkiyan, dîhatîm û dîçûm; bî zîmanên xwe va pîrr tîşt dî-

gotın, lê qet keseki nedızanıbû ku ew teyrên belengaz û dılkeser çı dıbêjın û çı dıxwazın. Hıstêrên çavên wan teran keseki nedıdit. Qet keseki nedızanıbû ku, dıl û kezewên wan teyran, ji bona wan çêlıkên wan çıto dışewite.

Belê, Xıdê naxırvan carna lı ew kıret û tıştan dınhêriya, bêkêf dıbû û qet manek nedıda ew kar û bêbextiyên mırovatıyê. Wi dıgot" bı valayi negotıne" Kurmê Darê ji Darêye". Jındewar, jındewar dıxwe û dıji. Ev zagona gelo kê çêkırıye? Çıra ev tışt û ev xezeba ketıye nav xurıšta hemû mırovatıyê? Çıra mırov bûye dıjımınê mırov? Çıra mırov van heywanên bêt gune dukuje, serjêdıke û goştê wan dıxwe, zıkê xwe têr dıke? Çıra mırov van teyr û tûrên Xwedê nêçır dıke, bı pêgırtına ev teyrên Xwedê dilê xwe şadıke û hêsa dıbe? Bı rasti dıjımınê van teyr û turan, ji dıjımınê me Kurdan pırtırın".

Lı ew demsala Xwedê de disa şıvan û gavan ketıbûn pey pez û dewarên xwe, pez û dewarên xwe dıbırın dıçêrandın. Dengê bılûrên şıvanan dengvedan dıdan çıya û kaşên Kurdıstan. Te dıgot, ew çıya û kaş ji bılûran dıkutın û dıstrının". Disa keç û bûkên Dêrsım xwe xemılandıbûn, kınc û kolên xwe lı hevûdu temaşe dıkırın. Hın keç, bûk û jınan çarıx lı lıngên xwe de derxıstıbûn, sol, solmes û kondıre kırıbûn pê. Zarokên hûr dıçûn ber kar, berx û golıkan, êvar-êvar her yeki yan darxıçek, yan ji pışteşek êzing ji xwera dıani mal, ku dayıkên wan bı wan êzingan nan û xwarın bıpêjın. Lı alıya dın de wan şıvanê berx, kar û golıkan her roj bı ço'ên seri pij, yan ji bı xırçan va gızêr û xılok lı bıne erdê de derdıxıstın, dıbırın bı qenci dışoştın, dûra dıxwarın, bı wan gızêr û xılokan va zıkên xwe têr dıkırın. Nêrgız, Sosın, Beybûn, Belgızar û her cûre Gul û çiçegên dın ji berhev dıkırın dıbırın dıdan dê, bav, xwışk, bıra û der-cınarên xwe. Zarokan bı taybeti Belgızar ji xwera dıkırın tewrek leyıztok, lı pê ew çiçega rengın dıleyıztın, dûra ji dıavıtın devên xwe dıxwarın. Beri ku zarok ew belgızarana bıxwın, doçıka ew belgızarana dı-

kırın nav du tiliyên xwe, ew doçika Belgizarê li nav tiliyên xwe de hêdi-hêdi dızivirandin, kijan bızın, mi an ji çêleka wan avis bû, jî bona wan heywanên xwe'yên avis nêt dıgirtın, usa dıgotın" Ala zer/pela zer/berxa mi a me a qereqaş/karika bızına me a kol/golika manga me a Zeri/nêre mêçike bavêje der/". Li zikê ew çiçega nav Belgizar de, gulaçek hebû, wexta ku zarokan doçika ew Belgizarê dızivirandin vêca ew gulaça piçûk li nav lûla doçikê de derdiket diket ser erdê. Lê ku ew gulaça piçûk li ser sê bas-kên xwe de bımana -jı ber ku gulaçên ew çiçegê sê çetel bûn - icar zarokan dıgotın" berxık, karık, an ji golika manga me" êdi jı bona kijan heywanê nêt kırıbûn nêre; lê ku ew gulaça li ser sê çetelên xwe de nedisekınıya û werdıgeriya diket ser erdê, vêca ji dıgotın" mêye". Li nav zarokên Kurdên Dêrsım de ew baweriyek bi taybeti bû. Ew baweriya jı mêj de, li aliya bav û kalan de mabû, wan zarokan ji ew baweriya bav û kalan xwe didomandin û dianin şınê.

Naxırvaniya Xidê berdewambû. Disa Xıd li tev kurê xwe dıçû ber pez û dewarê gundiyan Kûpikê. Disa westandin, astıman destpêkırıbû. Gundiyan Kûpikê ji mina gundiyan Torûtê li rojên bıharê de sibe-sibe pez û dewarên xwe zû-zû derdixıstın der, dıkırin pêş Xidê, ku Xıd dewar û pezen wan bıbe bıçêrine. Bi taybeti ew tevgera gundiyan û ew kara li Xidê piçûk xwaş nedıhat Xidê piçûk mıruzê xwe tırş dıkir, berxwe diket û bi dılda dıgiriya. Carna dıçû li taldekide rûdınışt, dıkir xiske-xisk kelegiri dibû gazi Xwedê dıkir, dıgot" Xwedê o em heya kijan rojê usa jı qûlên tera naxırvaniyê û xulamtiyê bıkın. Dıvê tu jı mera ji deriyeki bi ronahi, deriyeki bi xêr vebiki, me ji li ev hejari û belengaziyê derxini, felat bıki".

Lı demsala bıharê de naxırvani geleki bı as-
 tem-zamet-bû. Lı aliki moze derdiketin hemû ga û çêlek
 belav dıkırın; lı aliya dın de ji bızınên reş lı şûnekide
 nedisekınıyan, vırde, wırde bazdıdan bınê daran, ku ji
 xwera berûyeki bıbinın. Bı taybeti wexta ku ga û çêlekan
 vize-vıza mozan dıbihistin, guhên xwe fit, doçikên xwe ji
 radıkırın bazdıdan dıçûn lı ber çavan de wenda dibûn. Lı
 demên werge de Xıdê pıçûk lı dû wan ga û çêlekan dıket,
 lı nav sinc û ser kevir û daran de bazdıda, sinc lı lingên wi
 de dıçûn xar, ling û tiliyê wiyên xasi lı kevir û daran
 dıketın bırındar dibûn, neynûkên lingên wi dışikıyan lı nav
 xwına sor de dıman, êş û jana ling, tılı û neynûkan xwe
 dıdan dıl û kezewa Xıdê, icar Xıdê belengaz lı ber ew êş û
 janê de tewat nedıkır, dıgiriya, dıkır qirin û gazin, arikari
 ji bavê xwe dıxwast. Xıdê bav ji dıçû xwe dıgihand hawara
 kurê xwe, lı ba wi de rûdınışt derzi lı bınê şevqeyê xwe de
 derdixıst, bı yek çaveki va lı sincên lingên kurê xwe dınhê-
 riya, bı devê derziyê va ew sincên hışk lı bınê lingên kurê
 xwe de derdixıst; goştê lingên Xıdê pıçûk lı tev xwına reng
 sor de derdiket der, lı ew demê de qirin û gazina Xıdê
 dıgihışt erd û esmanan, dıl û kezewa mirov perçe dıkır. Lı
 pışti ew emeli û karên kevneyari de, carna xwin lı birinan
 de nedıhat sekinandın, Xıdê nedıkarıbû ku xwe bılıvine û
 rabe ser lıngan bımeşe. Lı rewşên werge de Xıdê bav
 pinek lı ser derpe, an ji şelvarê xwe de dıçırınd, bı miza
 xwe va bele ew paçi dıkır, ew paça bı miza xwe va qenci
 şıl dıkır û ew paça dıda ser birina kurê xwe. Lı pışti ew
 kari de icar birina Xıdê bı miza şorr va dışewitiya û her
 jan dıda, qirin û gazina Xıdê her dıçû zêde dibû. Dûra
 Xıdê bav titûn lı qutiya xwe de derdixıst piçek titûn dıkır
 ew birinê, lı pey ew bı heste ê xwe va pişo dışewıtand agı-
 rek dadıda, paçeki dın dışewıtand û xaliya ew paçi ji mina
 titûnê dıda ser birina kurê xwe, bı paçeki dın va dıpêça, bı
 qenci kip gırêdıda û ew emeliya dıqedand.

Lı aliki ew astem û dijwari, lı aliya dın de ji, her roj çend mi û bızinên avîs lı nav naxirê de dızan. Ew rewş ji astem û dijwariyek cûda bû. Lı pergalên wer de Xidê piçûk dıçû nûçe dıda xwediyê wan pezên zayi, ku xwediyên wan pezên zayi bân, berx, kar, mi û bızinên xwe bıgırın bıbın malên xwe. Wexta ku xwediyê wan pezên zayi dıhatın, mi, bızın, kar û berxên xwe dıbırın, Xidê piçûk ji wanra usa dıgot:

- Dıvê hûn ji mera kılórên bı rûn, Hevrışk, Herire û yan ji naneki Tawê bıpêjın bıbın, ku pirê "Şarıkê Şıvan" kar, berx, dewar û pezê we bınhêre, nexwaşi û çoran neke nav pez û dewarên we. Heke ku hûn ji mera tışteki nepêjın, neynın, bı navê Xwedê û Şah Bamasûr, ez lı ew şûna ku mi û bızına we zan, lı ew şûnê de bı qenci gevz bıdım, bıla kar û berxên we nejin û bımırın". Xidê naxırvan ew adet û kevneşopiya bav û kalan her sal lı gel dıda temaşekırın û xwarınek xwaşık ji xwediyê pez û dewarên zayi dıxwast.

Demsala bıharê dısa şıva mabû; dısa germiya tava havinê mırov dışewıtand, dıheland. Dısa mêşelokên meha Tirmeh'ê dıkıırın çiqe-çiq. Dısa wexta bêhriya pezan bû. Dısa rêçber, pale û gundiyan Kurdistan lı ber ceh û genımên xwe de, ceh û genımên xwe dıçıniyan, şeqa-şeqa das û êlcegan, xuşe-xuşa devên kêlendiyan bû. Dısa çekçekok û qımbıl lı ber devên das û kêlendiyan de hıdıpekiyan, dıxwastın ku bırevın. Dısa kal û pıran gam dıgerandın, gundiyan malaxme'ên xwe komdıkıırın, makinevanan mılên makınan dıçerıxandın, ka û tene lı hev cûda dıkıırın. Dısa Xidê naxırvan pez û dewarê gund anıbû lı bıne dara" Seyweli " de dabû bêhriyê. Dısa pez û dewar lı bıne sıya ew dara ziyaret de mexel búbûn dıkan. Dısa keç, bük û jınên Kúpıkê kinc û kolên xwe ên nû lı xwe kırıbûn, gulık

û kumên xwe dabûn ser serên xwe, valeyên reng sor, zer, şin, kesk, sıpi, çequer, mor û pembe kırıbûn navhev mûnandıbûn dabûn dora kumên xwe, zêr û zivên piçûk lı pês qulên tacên zivin de dakırıbûn, ew taca lı ser kumên xwe de dûrabûn, zêr û zivên pêş tacên zivin lı tev mori û mır-canan, sim û rêşiyên gulikan de dakırıbûn ser çav û bıriyên xwe. Siya wan mori, mır-can, zêr û zivan daketıbû ser eni û çavên wan'ên reşbelek û kıldayi. Wan keç, bûk jınan porê xwe'yên reş û kej, biskê xwe'yên dirêj ji bı qenci mûnandıbûn lı ser qorık û tılorên xwe de dakırıbûn, guliye porên wan daketıbûn ser paniya lingên wan. Beroş û elbên xwe ji kırıbûn destên xwe'yên narin û şimşir, lı riya bêhriyê de çift-çift rêz bûbûn dumeşıyan, kılam dist-randın, bervi bêhriyê dıçûn; mirov bı dengê wanên xwa-şık va sermest dıbû, lı kinc û kolên wanên rengin û xem-loki va ji heyran dıma. Wana bı ew şıklı va pez û dewarên xwe dıdoşan, disa bı dıl şahi kılam distrandın û dadıgeri-yan malên xwe. Ew bedewi û xemilokên wan xewa xortan dırevand, xort dıbûn bengiyê wan keçên bedew û sıpehi.

Jınên taxa mala" Wi ali" lı bınê tû'ya tawûrê de astır raxıstıbûn lı ser ew astıran de rûnıştıbûn, lı nav xwe de dıpeyivıyan, ketıbûn nav hın galagotan. Xeca jına Xıdê û Xeca azew ji, jı wan jınên seyidan ra karguzari-hizmet-dıkırın. Zıkê Xecê gihiştıbû ber devê Xecê. Xec êdı lı benda roj û seatên xwe de mabû. Ana Elif duxwaskan bûbû keçek wê hatıbû cihan. Wê navê keçıka xwe ji da-nıbû Çıçeg. Çılê keça Ana Elif derneketıbû. Jı bona ew ji ew pırr dervedıket der û lı ew rojê de ji lı nav jınan de tunebû. Yekcar êşeki Xec gırt, Xecê destê xwe da ser zıkê xwe û rewşa xwe ji jınan ra dengkır. Jınan rewşa Xecê zû fêm kırın. Lewra êdı Xec ketıbû ber bıriyan. Jı bona ew ji bı lez Xec bıрін mal kırın nav nivinê û lı dorbera Xecê de

kombûn. Dûra gazi jına Bavo ê Kekê, Ana Senem kırım, ku ew bê karê pındepiriyê bîke. Jı ber ku pındepir"Navık-jêk û bijijk"a gundê Kûpıkê Ana Senem bû. Hemû jinên gund bı destê Ana Senem duxwaskan dibûn, ew dibû felatkara jınan û her tım ew dibû pındepir, ew dibû bijijk, wê navıka hemû zarokan jêdıkır. Hemû derman bı destên wê dihatın çêkırın. Dermanên ku Ana Senem çêdıkırın, hemû jı bona kul û birinan bûn. Bı rasti ji kêra wan dermanan geleki dıgıhişt kesên xudan kul û birin. Jı bona nexwaşiyên dın ji, Ana Senem jı kesên nexwaş ra, lı xwê dınhêriya. Xwê apsûn dıkır dıda wan kesên nexwaş. Gelek hunerên Ana Senem' ên bı taybeti hebûn. Ew jinek heri jirek, braqıl, jinek canık, mêran ra mêr, jınan ra ji jın, jinek bı esl û maqûl bû. Ew lı bist çar salına xwe de, bı mabû, lı çar zarokên xwe dınhêriya, ew zarokên xwe xwedi dıkırın û heya roja mırınê ji ew nezewıcı, zarokên xwe sêwi nehiştın. Ana Senem bı taybeti jı bona heywanên nexwaş ji, lı xwê dınhêriya. Ew hunera wê a heri mezın û taybeti bû. Wexta ku pez û dewareki gundiyan nexwaş dıketın, icar xwediye ew pez û dewari dıçûn ba Ana Senem, ku Ana Senem jı bona ew nexwaşıya heywanên wan, lı xwê bınhêre, wan heywanan xwaş bîke û jı wan heywanan ra havılêki bıbine. Lı milê dın de wexta ku mi, bızın an ji çêlekek dızan, golık, berx û karıkên xwe nedıhiştın bınê xwe, ku ew berx, golık, an ji karık şır bımêjin, disa xwediye wan heywanan dıçûn ba Ana Senem, ku Ana Senem jı bona ew rewşê ji heywanên wan ra lı xwê bınhêre, gelo çıra ew heywanana berx, kar, yan ji golikên xwe nahêlinın bınê xwe. Ana Senem ji mistek xwê dıgırt, ew xwê a dıkır teyfıkek paqj derdiket pêşıya dêri, lı hember Roja Zeri, lı ser kevıreki de rûdınışt, bı bédengi lêvên xwe lihev dıxıst û dıkıre mırre mırr, tışt-mışt dıgot û dıxwend, te dıgot, Ana Senem mele, yan ji xoce ê mırıyane, Quranê dıxwine. Dûra wê ew xwê a xwe dıgırt dıbir dıda wi kesi, jı wi kesi ra usa dıgot û pêşneyar dıkır:

- Çêleka we, yan ji mi û bızina we nezer lêketiye çavîni bûye. Tu ev xwê bîgire bibe mal, piçeki bike nav avê li ew heywanê xwe bide vexwarin; piçeki ji bike nav paçeki reng şin bi qenci bîdûre bike berbejn-muska-lî stuyê ew heywanê xwe de dardake; ê mayi ji bibe li pêş derê der de belav bike, li zîkê çend rojan de wê ew heywanê we qenc bibe, kar, berx, an ji golîka xwe bihêline binê xwe û bimêjine. Wan kesan ji ew gotin û pêşneyarên Ana Senem hemû dianin cih û bi rasti ji ew heywanana li zîkê çend rojan de dihatin guhartin, kar, berx, an ji golîkên xwe dihiştin binê xwe û dimêjandin. Balam heywanên nexwaş hemû dımırin, bêkêr dibûn, qet kêrek ew xwê nedigihîşt ew heywanên nexwaş. Lê disa ji gundiyan Ana Senem xudan kîramet dihesibandin.

Belê, li nav qirin û gazina Xecê de kureki Xecê hate cihan û Ana Senem oxek kışand" Xwedê şîkîr Xec felat bû" got û dûra navîka pîtîk jêkîr û karê mayin ji, jî Ana Xatûn ra hişt. Ana Xatûn ji mîstek xwê a hûr, hêrandî anî, ew pîtîka bi qenci xwê kîr, xalî qewîrand çêgerm kîr, ew xaliya rijand ser paçeki û raxîst, dûra pîtîk kîrê nav ew xaliya çêgerm, xalî kîre ser çêqên pîtîk û nav şeqên pîtîk bi qenci nîxîmand, dûra pêça kîre pêçek girêda, bêjîngêk anî li kêleka Xecê a aliya çepê de danî pêçeka pîtîk danî ser ew bêjîngê, paçeki piçûk ji da bin serê pîtîk, keleyê xwe li pîtîk birîya pêçeka pîtîk maçkîr, Xecê ra ji xwaşderbazi xwast û çû li şûna xwe de rûnişt.

Êdî dilşabûnek ketibû nav jînan, jînan şadibûn, ketibûn nav gengeşî û galagotan; êvar ji geleki nêzîk bûbû. Hîn jînan xwastin ku ew nûça bixêr jî Xîdê ra bîşînin ber pêz, ew mîzginê bîdîne Xîdê, balam hîn jînan ew pêşneyara nepejrandin, gotin" êvar nêzîke, piştî çend hûrdeman de wê roj biçe ava û naxîra pêz û dêwêr dagere gund. Wexta ku naxîra pêz û dêwêr xwe gihand nêzîka ziyareta, Dara Seyweli û Dara Qîza Azew, bîla yek bervî naxîra pêz biçe û ev mîzginê bîde Xîdê".

Roj lı paş gaza Lodekan de wenda bû, kete korta goma Mıstê Besê, xwe lı paş diyarê Germisîyê de vêşart û wenda kır. Herdu Xıdan û Hesên ji naxıra pêz û dêwêr gihan-dibûn navbera ziyareta "Dara Seyweli û Dara Qiza Azew" berrî " Mezela Qiran " û gund pez û dewar diajotin dıanin. Disa zarokên gund berrî pez û dewarên xwe çûbûn, li kehran sıwar bûbûn, kehr dıkirin lecê. Her zarokeki darrêki pij û sıncek kırîbû dest xwe, lı dı naxîrê de kehrên xwe dıdan sekınandın, wexta ku piçeki pez û dewar lı wan dırdıketın, icar serê kehran berdıdan, pij û sınc lı qorık û sıngên kehrê xwe de dıkirin xar, canê wan heywanên bêt zıman lı nav xwîne de dıman, lı ber jan û êşan pin diavitın, xwe hıldukutan, ew zarokana lı ser wan kehran de dıketın ser erdê, ser û çavên wan, mıl û çêqên wan dışıkıyan, birındar dibûn, lı nav xwîne de dıman; lê disa ji wana qet ar nedıkr, jıyana wan de nedıbû. Jı bona ew ji Xıd lı zarokan ra hêrs dıket û dıxeyıdıya, dıqıra ser zarokan. Lı ew demê de İncâ jına Alê Memê xwe gıhad nêzıka pêz û Xıdê naxırvan, ew mızgına bıxêr da Xıdê, jı Xıdê ra:

- Xıdo çavên te ronıbın, Xwedê jı tera bıhêline, Xeca jına te dıxaskan bû, kurrekî tê ê mına topek nûr hate cıhan, ez lı te mızgına xwe dıxwazım, gelo tu çı bıdı mın? got. Jı bona mızgînê Xıdê usa got:

- Zor spas xwişka İnc, gelo tu mızgına xwe çı dıxwazı? Ez dibêjim wexta ku rewşa mına aborı dest da mın, ez jı tera fıstaneki xurt, qumaşeki qutni bıkırım. Lê ku rewşa mın dest neda mın, icar ez jı wera jı bona çend rojan werım dasê bıçınım, an jı, jı wera çılo bıçşınım ber dêrı, got û bı hevra pez ajotin berrı mal hatın.

Xıdê piçûk jı çawa ku ew nûça lı devê jına Alê Memê de bıhist, jı bavê xwe bêtır dılaşa bû; nışka ve şevqe ê xwe lı erdê xıst, lı şûna xwe de xwe hılkuta û got " Xwedê şıkır bırayeki mınê dın hate cıhan, êdı em bûn sê bıra. Sê bıratı jı lı çırokên me Kurdan de zefın. Ku em hemû gırs bıbın,

bı a Xwedê wê çaxê kesek bı hêsayi zora xwe nade ser me, ço'ên me dıbın sê ço, êdi lı ew rojê de em dest lı naxırvaniyê ji berdın. Lewra ev berdestiyê ez bêzar kırım. Bın-hêre zarokên seyidan, lı malên xwe de rûdının, zıkên wan têr, kincên ser wan lı ên me qenc û nûtırın. Bı hezaran talibên wan hene. Em talib dıxebıtın, seyid ji dıxwın. Aqılê mın qet nagihêje ev dadmendiye-adalet-; gelo ev bı rasti karê Xwedê ye? Ev zagonên bêt dadmendi gelo kê jı bona me qûlan danine û derxıstnê?.


Xıue piçûk lı nav ew xem û xeyalan de beri bavê xwe xwe gihand mal cem xaltiya xwe û birayê xwe ê piçûk. Çawa ku kete hındır malê, yekser çû lı kêleka xaltiya xwe de xar bû, keleyê xwe lı pêçeka birayê xwe biri, pêçek maçkır, dûra çû destê xaltiya xwe" day xwaşderbaz be" got û dageriya ber piçêriga ağır de rûnişt. Pişti rûniştandına Xıdê piçûk de, Xıdê mezın ji xwe gihand mal û kete hındır. Xıdê bav ji mina kurê xwe çû pêçeka kurê xwe ê piçûk maçkır, jı jına xwera xwaşderbazi xwast û çû lı ber stuna xêni lı ser erdê de rûnişt, ew ji kete nav gotûbêjên jinan. İcar jinên seyidan destpêka henekan kırım, gotın" Xıdo ma çıra te Xec maçkır mal ava? Xıd keniya, xwast ku bersiveki bide jinên seyidan, lı ew gavê de Ana Senem lı Xıdê pırsiya, got" Xıdo tu kijan navi hezdiki, ku wi navi bıdi kurê Xwe ?". Lı pey ew pırsa Ana Senem de, icar Xıdê usa bersiv da Ana Senemê:

- Ana, bı navê Xwedê ez ji nızanım ku kijan navi bıdım kurê xwe. Tu bı kerema xwe ev pırsê jı xulam û destemo a-hizmetkar-xwe Xecê bıpırsa, gelo ew çı dıbêje, nêt û ramana wê çiye? got û lı şuna xwe de bédeng sekını.

Ana Senem vêca rûyê xwe guhart ser Xecê, lı Xecê pırsiya, got" keça mın gelo tu çı dıbêji? Te hemû gotinên Xıdê bıhistın, gelo tu kijan navi dıxwazi bıdi kurê xwe ?". Xec piçeki sekını dûra:

- Ana, bawerke, ez ji nızanım ku, jı tera çı bıbêjim, ev lawıka kurê mın nine, kurê weye, xulameki we ê nûye. -

Heke ku we naveki mînasib ditiye, jî mînra bîbêjîn. Lê ku we ji bona navê liwîk biryarek nestandiyê, ez dibêjûm navê liwîk" Eli " be. Jî ber ku navê bavê mîn ji Eliye. Lî aliya dîn de qenc tête bira mîn, Bay Seyid Weyis ê Nûri dîgot" Hiva Zeri hîndava Mîhamed, Roj Zeri ji hîndava Eli'ye, Eli Xwedê bî xweye. Eli bî hezar û yek navî va hatiye ev cihan, xwe jî qûlên xwe daye temaşekirîn". Disa Bay Seyid Weyis dîgot" rojeki hezreti Mîhamed û hezreti Eli bî hevra derketîne der çûne lî ciyekî de rûniştîne, ketîne nav gotûbêjan û rêzaniya Ola Îslam û cihan. Dûra hezreti Eli lî berîka xwe de kevîreki çarkoşe, mîna kevîrê zara tawlê derxistiye daye hezreti Mîhamed, gotiye" bî kerema xwe ev kevîrî bigîre, lî ev kevîrî bînhêre". Hezreti Mîhamed ji ew kevîra gîrtiye, çawa ku lî aliyek ew kevîrî nihêriye, xwe lî cîhenek herî cûda de ditiye. Lî hemû jîndewarên ew cihanê nihêriyaye, ditiye ku hemû jîndewarên ew cihan bî şîklî û bedenên xwe va bêtoşene, lî mîrovên ew cihana me neçûne. Lî nav ew pêşdariya ecêb de hezreti Mîhamed xwe şaş kirîye, îcar ew kevîr lî nav tîliyên xwe de carek dîn zivîrandiye, lî rûyekî dîn mêzekîriye, ku vêca çî bîbine, lî pêş wî de Xasbaxçeki bêt ser û paş, hemû der lî nav Gul û gulistanan de mane, ew der bîhiştêk bî taybetiye. Lî nav ew Xasbaxçe de qesrek gîrs û gewre heye; ew qesra hemû bî zêr hatiye çekîrîn, bî dîranê filan, gewher, elmas û lal va hatiye xemilandîn, mîrov lî ew qesrê heyran dimîne, qîm nake ku lî ew qesrê bînhêre; lî çar aliyên ew qesrê de Bîbîl û her cûre teyrên Xwedê lî ser darên ew Xasbaxçe de dîxwînin, bî dengê wan teyran awazek bî xwaş û taybetî derdîkeve. Hezreti Mîhamed lî nav ew Xasbaxçe de her tîşt lî xwe bîrdîke, yekcar ew kevîrî disa lî nav tîliyên xwe de dîzîvirîne, ku evcar çî bîbine, lî meydanek zor gewre de bî hezaran jîn, mêr, zar û zêç kombûne, hemû dîgîrîn, lî xwe dîxînin, dîkîn qîrîn, gazîn dîlorînin. Çawa ku hezreti Mîhamed ew şîni û girîna ew gelî dibîne, lî yekî pîrsdîke, dibêje" heval, gelo we xêre, ev çî girî û şîniya weye, hûn jî



bona çı usa dıgırın û lıxwe dıxının? Ez dıxwazım lı ser ev tevgera we agadar bıbım. Gelo lı we çı qewımıye û kiyê we mırıye ?". Lı ser pırsa hezreti Mıhamed de, icar ew kesa:

- Qet qal meke, me ronahiya çavên xwe, eviniya dilên xwe hezreti Eli wenda kır. Duhu hezreti Eli mır çû gihişt rama Xwedê, iro ji ev gel jı bona şını û cınaze ê Eli lı vıra kombûne dıgırın. Çawa ku hezreti Mıhamed ew gotinên wi kesi dibihise, jan û êşek dıkeve nav dıl û kezewa hezreti Mıhamed, ew ji destpêka giri dıke, xemgin dıbe, hêz lı dest û pêyan wi de namine, lı şûna xwe de sar dıbe, dımine. Lı ew demê de ew kevıra lı nav tıliyên hezreti Mıhamed de dıkeve ser erdê, hezreti Mıhamed nıška ve lı xwe dıhese, berê xwe dıguhêrine aliya xwe a rastê, ku ew e hezreti Eli lı ba wi de rûnıştiye lı bın lêvan de dıkene. Hezreti Mıhamed lı Eli dınhêre, dıbeje" Eli mala te ava, te zırav û loqleyên zıkê mın bızdandın ew çı bın mın dıtın, ew çı bın te anin serê mın? Aqlê mırov nagihêje karên te, sıra te, ango raza te û mêşa hıngıv". Bı rasti ji, ez ew gotinên Bay Weyis bawer dıkım, navê Eli zef hezdıkım. Ez dibêjım, em navê Eli lı ev lawıki kın. Çawa ku Xecê axaftına xwe qedand, hemû jınan bı hevra" welleh Xecê tu her bıji, te navê liwık dıt çû" gotın, Xec û navê pıtık pıroz kırın. Dûra Ana Senem jı bona ew çirokê bı taybeti Xecê ra spas kır û usa jı hemû jınan ra got:

- Geli canıkan hûn dıbinın lı nav gel de çı canıkên bıaqıl, xudan bırbaweri û itıqat hene. Seyid Weyis ev çiroka hezar cari lıgel me jı cıvatê ra gotıbû, lê sed mıxabın ku, me keseki ev çiroka hêja jıber nekırıye; lê Xecê hemû jıber kırıye, hezar cari jı Xecê ra eferim.

Mıxurba êvarê êdi ketıbû ser erdê. Derva hewa tari, esman sayi û şın bû. Disa stêrik lı esman de, tev hıva çardeh rojin de dibırıqıyan. Disa hemû gundi ketıbûn malên xwe,

lı ber ronahiya agir, çıra û darên kındıran de rûnştıbûn şıva xwe dixwarın. Xidê naxırvan ji şûşek gaz lı mala Alê memê deyn kırıbû, ku bı ew gazê, sê şevên şahi û dilani derbaz bıke. Keç û xortên gund lı bun ronahiya çırê de bıleyızın, bıstrının û bıreqısın, qeşmeriyên cûre-cûre derxının.

Keç û xortên gundê Kûpıkê sê şevan lı Xecê piyan, têra dılên xwe leyızın, reqısiyan, kılam strandın, qeşmeriyên têvel-çeşitli-ji hevûdu dan temaşekırın û dawıya ew sê şevên dilani anin. Jının gundiyan ji bona Xecê û neferên mala Xidê Sirakut, Zerfet, Keşke, Herire, Qawût û hın xwarınên dın dıpatın û dıbırın mala Xidê, ku Xec û neferên malê bıxwın û zıkên xwe têr bıkın. Jınan dıgotın" ev kevneşopiyek bav û kalên meye. Lı rojek duxwaskaniya jınek cinaran de, dıvê hemû cinarên dın ji ew jına duxwaskan û neferên mala wê jınkê ra bıbın arıkar, ji ew malê ra xwarınan bıpêjin, kar û berên ew malê bıkın. Dıvê em lı rojên şahı de lıgel hevbin; bı hevra bıreqısın û bı hevra şabın. Lı rojên mıri û şını de ji bı hevra bıgırın û bıgazın, ji hevûdu ra bıbın arıkar, ji hevûdu ra arıkarı bıkın; Xwedê usa ferman kırıye; dıvê em ev fermana Xwedê bınnın cih.

Xeca xwişka Xidê lı nav ew sê şevên dilani de dıl berdabû xorteki, bûbû bengi. Hindê wexta Xecê a zewacê ji derbaz bûbû. Ji bona rewşa wana hejari û naxırvaniyê, keseki Xec nexwastıbû. Lê lı dawiyê de qısmeteki Xecê derketıbû pêşıya Xecê, Xecê nedıxwast ku ew qısmetê xwe wenda bıke. Navê ew xorti İmam bû, ji wıra "İmamê Karrê" dıgotın. Ango leqaba İmamê "Karr" bû. İmam xorteki bejn tenik û bılınd, nêzıka du metro'an, şan-mıl fereh, mina şêreki nav darıstanan bû. İmam bêt dê û bêt bav, bêt xwişk û bıra bû. Wi lı zaroktıya xwe de dıya xwe û bavê xwe wenda kırıbû, lı alıya apê xwe Memê Karrê de mezın bûbû. Xêncı çend pısmamên İmamê, qet keseki İmamê tunebû. İmam ji keseki eşıra Dewrêşgewran bû.

Ango ew eşir ji, eşirek seyidan bû, balam talibên eşira Dewrêşgewran her kê m bûn. Pîraniya kesên ew eşirê, kedkar, astemkar û rêçber bûn, çiralix û geşt kom nedikîrîn. Bî taybeti eşira Bamasûran, li eşira Derwêşgewran dexesi dikîrîn, ew eşira qet heznedikîrîn. Hîn kesên eşira Bamasûr ji bona wê eşirê û navê ew eşirê usa digotin:

- Ezbenî, wexta ku padişahê hukma Romê, Kurêş Bawa davêje fırîna agir, rojtira dîm dibîne ku Kurêş bawa neşewitiye û ji bona ew kîrameta Kurêş Bawa ji nişana seyidtiyê û nişana ocaxzadetiyê dîde Kurêş Bawa, li ew demê de derwêşeki geve-budala-lî ew derê de bûye, li Kurêş Bawa dexesi kîriye, çûye xwe li nav xaliya agir de gevzdaye, hatiye pêşberiya padişah, gotiye, divê tu heqê seyidtiyê bîdî mî ji, lewra ez ji li tev Kurêş Bawa, li fırîna agir de bûm. Padişah çito ku ew derwêşê kînc gewr ditiye, ferman daye gotiye, zûkî ev dewrêşê kînc gewr li ber çavên mî de wenda bîkî, bîbî bavêjî der, beri ku ez wi bîkujîm. Parêzvanên padişah û leşkeran ji ew derwêşa avitîne der, ew ji dageriye hatiye Kurdistanê, ji gel ra gotiye" ez ji seyidîm, padişahê Romê ez ji avitîm fırîna agir ez neşewitîyam, nişana seyidtiyê daye mî ji". Li ew rojê vîrde ji, ji zarokên wi derwêşira gotîne "eşira Dewrêşgewr". Ji ber ku wi xwe kîriye nav xaliya agir gevzdaye, kînc û kolên xwe bî xaliya agir va reng gewr kîriye, bî ew derewê va ji xwe seyid daye temaşekîrîn".

Îmamê Karrê ne tenê mîroveki bêt xwişk û bîra, bêkes bû, ew her usa ji hejar û belengazeki Xwedê bû. Wi ji seyidên gundê Kûpîk û Lodekan ra şivanti û gavanti dikîr; ji bona zîk têriyê ji wanra dîxebitiya, ji wanra xulamti dikîr. Wexta ku seyidên gundê Kûpîk û Lodekan derdîketî der dîçûn nav talibên xwe, ji bona çiralix û geşt komkîrîne, wana Îmam ji, ji xwera dikîrîn koçek dîbîrîn, ku Îmam ew pez û dewarên ku talîb dîdîn wan ji ew pez û dewar ra bîbe şivan, ew pez û dewari bajoy, biçêrine, li tev wan bîbe sûka bajareki, ku ew wan pez û dewaran

bıfrosın jı xwera bıkın dırav, çend quruşan ji bıdıne İmam. Bılı ew, hın talıban lı pıştı çırılxa Pir, an ji Rayber dayinê de, jı bona heqê koçektiyê çend quruş ji didan İmam. Ango İmam bı ew şikli va dolıwa xwe dımeşand û dijiya. Bı taybeti lı demsala zıvıstanê de karê İmam her zêde dıbû, İmam pırr dıwestiya. Jı ber ku wi berfa ser xaniyê gelek malan tenê dımışt, ew xaniyana luq, sıving têpûç dıkırın; êzing û çılo jı gelek malbatan ra dıkışand ber derên wan malbatan. Bı kurtasi jiyana İmamê Karrê lı nav ew dijwariyê de dom dıkır. Wexta wi a zewacê ji, mina Xecê derbaz bûbû. Lewra wi nedıkarıbû ku qelınd bıde, ew yek. A duwem ew zef hejar, xorteki bêt erd bû, kesi nedıxwast ku keça xwe bıde İmamê. Lê lı dawıya hemû tıştan de qısmetê İmamê ji derketıbû; lı ew şevên dilani de, ew ji bûbû bengiyê Xecê, soza zewacê ji, jı Xecê standıbû, lı tev Xecê ketıbû govendê reqısiyabû, bı hevra kılam strandıbûn.

Lı pıştı çend heftan de, İmamê Karrê pısmam û çend xısmên xwe lı tev Bay Seyid, lı şeva İn'ê de şandın mala Xıdê naxırvan, ku ew bıçın Xecê jı wi ra bıxwazın. Ew kesana ji çûn, bı fermana Xwedê Xec jı İmamê ra xwastın, lı zikê şeş mehan de daweta wan kırın, İmam û Xec zewacıyan, çûn gihiştın mirazên xwe, bûn xudan zar û zêç, jiyana xwe guhartın.

Hesen êdi bûbû arikarê bıra û bavê xwe, lı tev wan dıçû ber naxıra pêz û dêwêr. Eli ê pıçûk ji êdi rûdınışt dıkışiya; carna radıbû ser lıngan tik dıbû dısekınıya, hêdi-hêdi gav dıavıtın, lı ser lıngan dıket, dımeşıya. Ew rewşa Eli pırr berdeyam nekır, Eli lı ser lıngan ket. Jı bona ew ji Xecê kılora ser lıng ketına kurê xwe pat; gazi Husênê kurê Alê Memê, Gul Mıstefa ê Hesê, Derwêşê kurê

Husênê Awês, Avdilah ê kurê Miçê Hamê kır, ku ew werin kılora ser ling ketina kurê wê Eli birevinin.

Belê, ew adetek bav û kalan bû, xwe li nav Kurdên Dêrsim de diparast. Wexta ku lawikek li ser lingan diket, hêdi-hêdi dimeşiya, dayika wi lawiki ya parxaçek bi rûn, yan naneki tewê, yan ji gelek kilorên bi rûn dipat, dûra gazi çend xortên jir, jêhat, bîaqıl û can lez dikir, ku ew bèn kilor, parxaç an ji ew nanê tewê bigirin û birevinin. Ew xortana ji dihatin kêleka ew parxaç, kilor yan ji nanê tewê qul dikirin, benek digirtin li ew qulê de derbaz dikirin dibirin li tiliya lingê ew lawik, tiliya mezın va girêdandan, ew xortana li dora liwîk de kom dibûn, nişka ve yeki bi lez dest diavît ew parxaç, kilor yan ji nanê tewê kaşdikir ew benda dibızdand, kêleka kilor, parxaç an ji nanê tewê dıçirand û bazdida, direviya. Li ew demê de icar ew xortên din li dû ew xorti diketin û ew dipekandın. Li dawiyê de xort li ciheki de dısekıniya, hemû xort dıgihıştın ew xortê can bi lez, bi hevra li ew şûnê de rûdınıştın, ew parxaç, kilor, an ji nanê tewê digirtın perçe dikirin li nav xwe de parvedıkirin û dıxwarın, bi ew şikli va, ew adeta bav û kalan dianin cih, dawiya ew rojê dianin.

Xecê ji, ji bona ew kevneşopiya bav û kalan û ew baweriyê, parxaçek bi rûn avıtibû binê sêlê patibû, kêleka parxaçê ji qul kiribû, ben li ew qulê de derbaz kiribû li tiliya kurê xwe va girêdabû, ew xortên gund ji li dora Xecê, Eli û parxaçê de kombûbûn, hemû der û cinar ji hatibûn ew pêşaniya parxaç revandina Eli de sekiniyabûn; yekcar Husênê kurê Alê Memê li nav hemû xortan de dest avit parxaçê, ben bızdand, parxaç dırand û mina gule a tıfingê li lûlê de derket û weka taziyeke pey kevroşk bazda û reviya. Çito ku Husên bazda reviya, icar hemû xort ji li dû Husên ketin û Husên fıltandın. Êh ew bêt havıl bû, qet keseki nedıkarıbû ku xwe bigihêjine Husên. Pışti çend hûrdeman de Husên xwe gihand "Mezela Qiran" li bin dareki de sekini, xortan ji xwe gihandın Husên û hemû bi

hevra rûniştin, parxaça xwe perçe kırım xwarin û dageriyan ba Xecê, Xec piroz kırım, çûn rûyê Eli ew ji maçkırım, pêşniyazên xwe ji bona peşerojên Eli pêşkêş kırım û dawiya ew adetê anin, lihev belav bûn û herkes dageriya çû mala xwe û ber kar û berê xwe.

Heyam bihar, esman sayi, rojê tav dıda cihan. Disa hemû jindewarên Xwedê li ber tava rojê de xwe germ dikirin. Disa jin û mêrên Kurd derketibûn pêş deriyan, ber diwaran, bin sivingan, ser xaniyan li bin tava Roja Zeri de rûniştibûn li nav xwe de dipeyiviyan. Li rojek werge de hemû mêr, jin û xortên gundê Kûpikê ji derketibûn pêş deri û ser xaniyên xwe de rûniştibûn tama tava biharê tam dikirin. Mêr û kalemêrên gund li nav xwe de daxme, xort ji li ser piştta xaniyan de kaw dileyiztin. Xeca jina Xidê ji kurê xwe Eli girtibû çûbû li ser xaniyê mala Seyid Qemer, li tev jina Seyid Weli, piştta xwe dabû diwêr li ser erdê de rûniştibû, ji Ana Elif ra dipeyiviya. Eli ê piçûk û Çiçega keça Seyid Weli ji li pêş çavên dayikên xwe de dileyiztin. Piştta demek kurt de Ana Elif û Xecê ew herdu zarokana li ser piştta xêni de tenê hiştin, çûn ketim hundir oda mivanan, sobe tiji êzing kırım, agir dan ber êzingan vexistin, çaydank a çay dan ser qula navina sobê, li benda kelandina avê de man, ku av bikele, çayê demkin û çay vebixwin. Nişka ve li derva qirinek hat, Ana Elif û Xecê bi lez bazdan der ser piştta xêni, ku çî bîbinin, ewe Eli li ser piştta xêni de ketiye jêr, li nav çamûr û heriyê de mina miriyeki dirêj bûye maye, qet dengê li Eli dernakeve. Çawa ku Xecê kurê xwe werge dit, xwe şaş kir, aqil li serê Xecê de nema, xwast ku ew ji xwe li ser piştta xêni de bavêje jêr, xwe biğihêjine kurê xwe, lê Ana Elif pê milê Xecê girt, bû asteng nehişt ku ew ji xwe seqet bike, bi hevra li pêpelûga pêş dêri de daketin xwe gihandin Eli.

Ana Elif Eli lı nav heriyê de rakır kire hembêza xwe, dit ku singê Eli radibe, rûdine, hêlm dıde-dıstine, yekcar berê xwe da Roja Zeri, got" ya Roja Zeri, lı te û lı Xwedê her şıkır, ku tışteq lı ev lawık nebûye". Ana Elif lı pey ew şıkırbûnê de, icar vegeriya aliya Xecê ji Xecê ra usa got:

- Keçê metirse kurê te xwaşe nemiriye, Xızır û Şah Bamasûr xwe gihandine kurê te, nehiştine tışteq lı kurê te bibe, kurê te bımire. Ez bawerım qurbanek te hebûye, ku ew qurbanê xwe avitiye ber Eli, nehiştıye ku tışteq were serê wı.

Lı pey ew gotınên Ana Elif de, Xecê bı qirin û gazin va kurê xwe lı nav mlên Ana Elif de girt, devê xwe da ser gepên kurê xwe, kurê xwe maçkır "ax lı serê mın, çavên mın ji bona te werın der, mın tu çawa lı ser pišta xêni de tenê hişti û ez çûm ketım hındırê malê, mın tu ji xwe birkırı; naha ku Xıd dageriya mal wê ez çı bersivê bıdime Xıdê" got û disa destpêka giri kır. Lı ser ew qirin û gazina Xecê, hemû jin û mêrên gund lı dorbera Xecê de kom bûbûn, Xec xemrevin-teselli-dıkırın, lê disa ji Xec dıgiriya, qirin û gazina Xecê erd û esman dıhêjand. Lı ew navberê de Ana Senem pê mlê Xecê girt" keçê usa megire berxwe mekeve, qet tışteq lı kurê te nebûye, tenê bı tırs birva çûye, wê ew pişti çend hûrdeman de lı xwe bihese, çavên xwe vebike hişyar bibe" got û dûra vegeriya jinan:

- Liwık lı dest ev belengazê de bıgırın, bıbın dev û rûyên wê bışon, bıla ev belengaza mın piçeki lı xwe bihese, sewra wê fereh bibe, got ferman kır. Pişti fermana Ana Senem. İncı jına Alê Memê, Eli lı hembêza Xecê de girt, jinên dın ji Xec bırin dev û rûyên Xecê bı ava sar va, qenci şoştın, dûra dagerandın bırin mala Seyid Weli lı ser sekûyê de, dan rûniştandın. Lı nav ew rewşê de seatek derbaz bû, nebû, Eli çavên xwe vekırın û destpêka giri û qirinê kır, te dıgot, naha dımire, diteqe, an ji dıfetise. Ji bona ew rewşê ji Xecê Eli dıgerand, lı ser mlên xwe de dıhêjand, ku Eli

dengê xwe bîbirine, negiri û haş bîbe. Lê ew ne keys bû, qirina Eli her dîçû zêde dibû.

Êdi roj çûbû ava; herdu Xîdan ji xwe gihandibûn mal. Balam li mala Xîdê de gelek kes li gel Xecê de rûniştibûn, Xec xemrevin dîkîrîn. Li alîki ew kes û gotinên wan kesan, li alîya din de ji qirin û gazina Eli qet meşazek nedîda Xîdê; Xîdê xwe şaş kiribû, nedizambû ku çî bike û çî bibêje. Dûra piçeki aqil hate sêri, dageriya ser Xecê, ji Xecê ra:

- Keçê te xêre, çî bû? Ma çîra ev lawîka usa dîgire, dîke qirin û gazin? Gelo tîştekek hate serê liwîk?.

Li ew demê de Ana Senem li şûna Xecê de usa bersiv da Xîdê:

- Xîdo-Xîdo berxwe mekeve, tîşteki herî girîng tune. Eli li ser xêni de ketiye, lê şîkîr Xwedê tîştekek li kurê te nebûye, balam ez bawerim zef tîrsîsyê, ji bona ev dîgire.

Li piştî ew gotinên Ana Senem de, Xîd bêtir berxwe ket, hêrsa wi her çû rabû, nedizambû ku çî bike û çî bibêje. Dûra bi hêrs dageriya ser Xecê, ji Xecê ra:

- Keçê ma çavên te kor bûn? Tu çîto ev lawîkê pîzêz li ser piştî xêni de tenê dîhêlini û dîçî dîkevi hindîr ji bona kasek çay? Çay û galagotên te ewqas girîng bûn?.

Xeca belengaz qet bersivek neda Xîdê mêrê xwe, werge li şûna xwe de sekîni, bi xwe bi xwera "heqê Xîdê ye ku, ew usa ji mînra hêrs bikeve û li mîn bîxeyîde. Mîn mîna kesên bêtaqil û dînikan kurê xwe tenê li ser piştî xêni de hişt û ez çûm ketum hindîrê mala Bay Seyîd Weli. Qet nehat bîra mîn ku ev lawîk li ser piştî xêni de dîkeve. Nîzam li ew demê de aqilê mîn kuva çûbû, li dawiyê de ev qeza kambax hate serê kurê mînê belengaz" got û histêr li çavan de bariyan. Dûra der û cinaran piçeki Xîd xemrevin kirin û hemû dageriyan çûn malên xwe.

Eli'yê piçûk dîkîr qirin û gazin qet haş nedibû. Wi li ew şevê de heya sibê xew nekîr, nehişt ku neferên malê ji bikevin xewê. Li piştî taşte xwarinê de Ana Senem disa



seriyek lı mala Xidê xıst, ku binhêre gelo rewşa Eli çawaye û Eli çawa bûye. Ket hındır dit ku, ew e Eli disa mina roja bıhuri dıgire, dıke qirin û gazin, tu dibêji, naha difetise, birva dıçe. Lı pey Ana Senem icar hın cinarên dın -wek Ana Elif, Ana Xatûn, Alê Memê û jına wi Înc, bûka Hemê Ali Pirimi- tev zar û zêçan lı mala Xidê de kom bûn. Lı pey gelek guftûgoan de hemûyan pêşneyar kırın, ku Xid biçe gundê Şowagê mala Keki Dede ji kurê xwe Eli ra, lı pirtûkê binhêre. Jı Xidê ra gotın" ku Keki Dede lı mal nebû, biçe mala Rıza ê Mamûd ê Beyteş, bıla ew ji liwık ra lı pirtûkê binhêre, berbejneki bınvisine, jı liwık ra bıke derman". Hemû kesan bı yek deveki va bıryar standın ku Xid biçe Şowagê, ya Keki Dede bıbine ew kari bine cih, yan ji biçe mala Rıza ê Mamûd ê Beyteş lı gel wi ew erkê bine cih. Lı pey ew bıryara der û cinaran, Xidê ji hemûyan pırsiya, got" gelo hûn kijani zef qenc dibinın? Nefesa kijani bêtır qence, kijan bêtır zanaye û lı pirtûkê baş dınhêre? Hemûyan gotın" ku Keki Dede çêtîre, ew bêtır zanaye, nefesa wi her qence. Lê ku te Keki Dede lı malda nedit, lı wê biçe mala Rıza ê Mamûd ê Beyteş, nefesa wi ji ne xırabê, ew ji lı pirtûkê qenc dınhêre. Dûra ew û Keki Dede xısmê hevın, meriyên hevın, esl û koka wan yeke. Ango êdi te kijan ku lı malda dit".

Lı pey ew pêşneyara der û cinaran, Xidê gazi zavayê xwe İmamê Karrê kır, ku ew bê lı tev Xidê piçûk biçe ber naxıra dewar û pêz. İmamê ji dilê bûrayê xwe neşıkand û lı tev Xidê piçûk çû ber naxıra pêz û dêwêr, Xidê mezin ji bı lez rêket, berê xwe da gundê Şowagê, ku biçe jı kurê xwera pirtûkê binhêre nivîşteki bıde nıvisin. Gundê Şowagê lı nav du çıyan, lı geliyek kûr de, lı ser çar taxan de hatıbû avakırın. Navenda gund, taxa Goma Feqirê, taxa Kaştûnan û taxa Hesê Kehr Dız. Mala Keki Dede lı jori navenda gund, nêzıka kaniya avê, sinorê navenda gund û taxa Kaştûnan de bû. Ew mal lı ser taxa Kaştûnan dıhat hesıbandın. Pıraniya kesên taxa Kaştûnan ji, Kuçıkvan

bûn, Kuçikên sêlên nan patinê çêdikirin û ew Kuçikên kevîr difîrotin.

Xîdê lî zîkê bist hûrdeman de xwe gihand pêş derê mala Keki Dede. Lî ew rojê de Keki Dede lî dereki de neçûbû lî malda rûniştibû, qelûn dikişand; dûra dûyê ku lî devê xwe de derdixist, pişe ew dûyê titûnê dikir û bî xwe bî xwera dixafiya, ketibû nav xem û xeyalên gera xwe û peywendiyên talibên xwe. Hindê çendek beri lî nav talibên xwe de dageriyabû mal. Jîn û zarokên wi ji çûbûn oda paşin, Keki Dede tenê lî oda mivanan de hiştibûn. Xîdê lî demek werge de deriyê mala Keki Dede vekir û kete hindir. Dit ku Keki Dede lî ser textê odê de rûniştiye, piştî xwe ji daye balifeki, ew e qelûna xwe a titûnê dikişine. Xîdê sîlav da, Keki Dede, Keki Dede ji sîlava Xîdê ragirt" tu xêr hati Xîdê min" got û cih lî Xîdê da temaşekirin. Beri ku Xîdê lî şûna xwe de danîşe, çû destê Keki Dede maçkir, dûra dageriya lî ser kursiyeki de rûnişt, lî benda rewş dem pîrskirina Keki Dede de ma. Piştî rewş, dem pîrskirîna de, Xîdê mesela kurê xwe ji Keki Dede ra yek û yek dengkir, got" ez hatime ku tu ji kurê minra lî pirtûkê binhêri, berbejneki binvisini". Lî ser ew daxwaziya Xîdê de, Keki Dede lî berika xwe de, pirtûka xwe a nav "Hamili" derxist, rûpeleki pirtûkê vekir û destpêka çav lêgerandin û xwendinê kir. Pirtûk bî tipên Erebi hatibû nîvisin. Lê bî rastî Keki Dede û kesên mina Keki Dede, zîmanê Erebi nedizanibûn. Lê wan tip jiber kiribûn, werge ji xwera pirtûk û Quran dixwendin. Ango wana naverokên pirtûkên zîmanê Erebi qet nedizanibûn. Lê wana xwe zana û kesên xwenda didan temaşekirin û didan naskirin. Bî taybetî berbejn nîvisandin û xwendina ew pirtûkan ji, ji xwera kiribûn riyek kedxwariyê. Bî nîvisandina berbejn û çav lêgerandinê wan pirtûkan va gel dixapandin, xwe kesên Loqmani Kekim dihesibandin, werge ji xwe lî gel didan peji-randin, gel ji dibû qûl û nokerên wan.

Keki Dede bı xwe bı xwera bêdengi pirtûk dıxwend û lêvên xwe lı hevûdu dıxıstın. Te dıgot, ew bı dızı tışteki analiz dıke û jı hev tıne der. Dûra dısa xwe bı xwera"-amin"got û destê xwe avıt bıne milê xwe ê çepê lı bêrika çekête xwe de pênuşek û perçek kaxız jı derxıst lı ser ew kaxızê de çend xet nıvisand reş kır, lı dawiyê de veğeriya alıya Xıde, jı Xıde ra usa got:

- Bınhêre talıbê minê delal, bı qenci guhên xwe bıde ser mın û gotınên mın. Ez jı tera çı dıbêjım dıvê tu ewana hemû yek bı yek bıni şunê. Qet xem mekın û metırsın, tışteki bı tırs tune. Kurê te nezer lêketiye, çavını bûye. Wexta ku ew lı ser xêni de dıkeve jêr, mılaketeki Xwedê xwe dıgihêjine ew kurê te ê " Masûmi Pak " nahêline ku tışteki were serê kurê te. Ew mılaketa kurê te dıde ser lepên xwe lı ser erde datine û dirêj dıke û dıçe. Ew qırın û gazına kurê te jı, çawa ku mın beri jı got nezere, lı ew bûyerê de lawık tırsiyaye. Bı kurtasi tışteki heri gıring tune, qet xem mekın. Tu ev kaxızê bıgire bıbe mal; niveki ev kaxızê bıçırine bıke nav kasek ava pak, paqıj û zelal; ew avê bı kurê xwe bıde vexwarın. Perçeki jı lı ber poz û çavên liwık de bışewıtine, bıla dıyê kaxızê bı qenci bıkeve poz û çavên liwık, lawık bıpijmine-hapşırsın-perçe ê mayın jı bıkın nav caweki bı mûm, ew cawê mûmi jı bıkın nav paçeki şın, bıkın mina sêguh bıdûrın bıkın berbejn, lı stuyê liwık de dardakın, yan jı lı ser milê wi ê çepê de, lı kırasê wi va bıdûrın. Lı pışti ev karen de, bı himet û fermana Xwedê, wê kurê te lı zıkê çend rojan de lı xwe bıhese û qenc bıbe, bıbe mina tıvir. Qet tışteki kurê te tune, berxwe mekevın, baweri û itıqata xwe wenda mekın. Xwedê û ceddê mın Şah Bamasûr mezinın, ew felatkarın, rama wan her zêdeye. Naha tu rabe bıçe mala xwe, ev gotın û şıretên mın yek û yek bıne şunê, ez te û neferên mala te lı heyamek heri kurt de dılaşa û kêfxwaş bıbinım: bêt hêvi mebım, Şahê Merdan mezıne. De jı tera oxır be.

sılavên min ji neferên mala xwera û der û cinarên xwera bîbêje.

Xîd lî şûna xwe de bî lez rabû serxwe; çû ew kaxîza ku Keki Dede bî Erebi nîvisandibû lî destê Keki Dede de girt, destê Keki Dede maçkır, lî bêrika xwe de pênçe quruşê wi zemani ji derxist kîre mîsta Keki Dede, jî Keki Dede ra spas kır, xwatîrê xwe xwast û derket der berê xwe da riya Kûpîkê. Xîdê bî lez û rev, lî zîkê çaryek seateki de xwe gihand mal. Çito ku kete hındîrê malê, ew gotinên Keki Dede jî neferên malê û hîn kesên ku hatibûn ditîna Eli, jî wanra yek û yek got. Dûra ew kaxîza lî bêrika xwe de derxist; Hesên şand mala Alê Memê ku ew bîçe jî wanra meqesê bine. Hesên ji çû mala Alê Memê, meqes ani, da bavê xwe. Xîdê jî bî meqesê va perçek kaxîz biriya, bîzûteki ağır jî bî meşê pêgirt ani ber pozê Eli, kaxîz da ser bîzûte ağır, kaxîz şewitand; beri ku dûyê kaxîzê derkeve Xîdê pozê Eli bêtir nêzîka dûyê kaxîzê kır, dûyê kaxîzê kete çav û fîrnîkên pozê Eli, lî dawiyê de xurri lî kaxîzê ket û Xecê Eli şuva kışand. Lî ew demê de Eli giriya kîre kuxe-kux, hîstêr lî çavan de bariyan. Dûra Xîdê perçeki dîn biriya kîre nav merşefek ava teze û zelal, ew ava jî da Eli, Eli ew ava vexwar. Perçe ê mayi jî xwast ku bîke nav perçeki şîn, lê lî malda cawê şîn nedit. Jî bona ew Xec rabû çû mala Ana Senem, paçeki şîn û perçek cawê bî mûmi ani, ew kaxîza kîre nav ew paçan, bî derziyê dûrit kîre berbejneq sêguh lî ser mîlê Eli ê çepê de, lî kıras va dûrit û dawiya karên xwe, şîret û gotinên Keki Dede anin cih û ew kaxîza jî kurê xwera kırın derman.

Belê, hemû nîvîşt û berbejn bêt havil û bêt kelk man. - Eli qenc nebû, her çû qirin û gazina Eli zêde bû. Eli ê belengaz lî ber jana qor û mîlê xwe de diyax nedîkır, jî bona ew jî digiriya, xew nedîket çavên Eli. Jî bona ew rewşa Eli, êdî neferên malê ji bêzar bûbûn, xew nedîket çavên wan jî. Lî piştî ewqas rewşa heri dijwar de gun-diyan pêşneyarek jî bona Xîdê anin, gotin" Xîdo divê tu ev

kurê xwe bibi ser ziyaretan bigerini, em bawerın ziyaret ji kurê tera bîbın derman, kurê te li ev nexwaşiyê de felat bibe, tendurîstiya kurê te were guhartın qenc bibe".

Lı ser ew pêşneyara seyidên Kûpikê, Xidê belengaz destpêka ew kari kır, xwast ku ew gotın û pêşneyarên seyidan bine şûnê. Beri çû mala Alê Memê, çend quruş dirav li Alê Memê deyn kır, dûra çû Qururikê berxek kırri ani mal û rojtıra dın kurê xwe hembêz kır, Xecê ji berx kire pêşiya xwe, berê xwe dan riya Moxındiyê, ku biçın ser ziyareta "Diwarê Bamasûr". Beri seateki de xwe gihandın pêş derê mala Bay Seyid Silêman û ber Diwarê Bamasûr. Çawa ku Xidê û Xecê xwe gihandın ber diwarê mala Seyid Silêmin, xarbûn ser joniyan, diwarê xêni maçkırın û dageriyan ketın hındır malê. Diwarê ku dıgotın "Diwarê Bamasûr" qet diwareki bi taybeti nebû û tışteki werge ji nedıhat xuyakırın. Tenê diwarê aliyek xêni piçeki li odan dûrxıstbûn, dirêj kırıbûn, ew diwar ji bûbû diwarê aliyek çardaxa pêş dêri. Ango diwareki werê bi taybeti li wê malê de tunebû. Ew diwar ji mina diwarên xêni bi kelpiç û heri ya hatıbû çêkırın, lê ji ew diwar ra dıgotın "Diwarê Bamasûr".

Herwaha, Xidê û Xecê li mala Seyid Silêmin de êvar kırın. Beri ku roj biçe ava berxê xwe girtın bırın ber ew "Diwarê Bamasûr" berê berxê dan aliya Rojê, tekbir anin serjêkırın, xwin rijandın ser diwêr û goştê qurbanê dan xwediyê malê; wê şevê li mala Seyid Silêmin de man. Rojtıra dın Xidê çend quruş ji avıt ser diwêr û disa tev kurê xwe û jına xwe dageriya Kûpikê mala xwe, li hiviya qenc bûna kurê xwe de ma. Lê sed mıxabın ku Eli qenc nebû. İcar gotın "Xıdo kurê xwe bibe ser ziyaretên dın ji bicêrbine". Vêca Xidê kurê xwe bir ser ziyareta Qoriyê, lê kurê wi qenc nebû, bir ser Dızgûn Bawa, qenc nebû, bir ser Çoribori, qenc nebû, bir ser Coşık Bawa, bir ser ziyareta Kule, bir ser ziyareta Seyid Cafer qenc nebû, bir ser kevırê Avdil Mûsa qenc nebû, qenc nebû. Êdi Xid li gera

ew ziyaretan bêzar bûbû. Xidê werqas jî kurê xwera berbejn nîvisandibûn, kirîbûn stuyê kurê xwe ku, kurê xwe kirîbû bin bareki nîvîştan. Lî stuyê Eli de, ne tene ew berbejn hebûn, her usa jî gelek kevîrên bî qul, axa hîn tîrban jî, jî Eli ra kirîbûn berbejn, lî stuyê ew belengazi de dardakirîbûn. Jî axa ew tîrbên ziyaret ra "Tewerîk" dîgotin. Ew axa him dîxwarin, him jî, jî nexwaşan ra dîkîrîn berbejn, lî stuyê nexwaşan û xwaşan de dardakîrîn, ku ew ax lî wanra bibe oxîr, lî rojên tengasi de wana felat bike. Bî kurtasi qet kêrek wan ziyaret, diwar û tîrban negihîştin Eli ê piçûk, rewşa Eli nehat guhartin. Lî piştî ewqas gera ziyaretan û asteman de Xid rûnişt bûrayê xwe Aliekber û hemû gotin û şîretên wî anîn bira xwe; dûra bî kûrahi hênjiya û meselan fikirîya, bî xwe bî xwera got "ez bawerim Aliekber tiştên rast dîgotin hêrsa min jî wîra radîbû. Lê iro ez dibînim û dihênjim, ku lîngên qazê mîna dîtina min nebûne. Wî dîgot" bînhêre zava, dijminên kedxwar û mêtînkîr nehiştine ku jîyanek nû û nûjen bikeve Kurdîstanê, bikeve nav gelê Kurd; gelê Kurd jî mîna hemû gelan şarmend û şareza bibe, pêşva biçe. Nehiştine ku lî Kurdîstanê de rê û dîrb çêbîbin, pişekari-sanayi- bikeve Kurdîstanê, karxane û nexwaşxane avabîbin; nehiştine ku perwerde a Kurdan pêşva biçe, Kurd jî bîxwînin bîbin Bijîjk, bîbin Cebîr, bîbin Mihendis, bîbin Parêzger û her tewîr karmendên dewletê. Bîlî hînek bêcgeyîtiyan-istîsnalar-mîna mamostetîya min û hîn Kurdperwerên meyên dîn, qet nexwastine ku Kurd jî şîyar bînin û lî xwe bihesînin. Tu bî çavên xwe va jî dibîni, ku Alo û Memo ên me bî zarokatiya xwe de dîmîrîn, seqet û kûd dibînin. Lê sed heyfe ku bav û dayikên me Kurdan dibêjin "ezbenî ev bextê meye, ev fermîna Xwedê ye; Xwedê lî ser enîya me usa nîvisandîye, ma em çî bîkînin?". Axa, mir, şêx, seyîdên meyên dewlemend jî bona pîzîk û kûnerek zarokên xwe berxwe dîkevînin, wan zarokên xwe dîşînin Îstembolê, Îzmîrê, Parîs û Londonê, ku ew zarokên wan lî

nexwaşxanan de razın, kul û birinên wan bı destên bijjkan va derman bıbın û qenc bıbın. Lê jı bona hejaran û zarokên hejaran ji ew perwerde a Xwedê û ziyaretan dane û amade kırine". Naha ez qenc dibinım ku, heqê Aliekber hebûye, wi jı mınra rast gotiye. Evaye ew bêtara hate serê kurê mın, me ev belengazê xwe bır ser kijan ziyaretê, qet ziyaretek jı Eli ê mınra nebû derman. Lê ku ez keseki dewlemend bama, ev kurê mın lı ev rewşê de nedıma, seqet nedıbû. Lı aliya dın de ez bı xwe ji dıbinım ku qet keseki dewlemend naçe ser ocax û ziyaretan; berbejnıan jı zarokên xwera nanivisine lı stuyên zarokên xwe de dardanake, ecêba Xwedê ev jiyana çıra usaye". Lı pışti ew biranına gotınên Aliekber de Xıd lı şûna xwe de rabû çû ber hêlaneka Eli, lı kurê xwe şabû, bı dileki xemgin va" ez çı xaliyê lı serê xwekım kurê mın, ez te lı kuva bıbım qenc bıkıım, havileki jı ev derd û nexwaşıya tera bıbinım" got û destpêka giri kır.

Qirin û gazina Eli nêzıka sê heftan berdewam kır. Lı pışti sê heftan de qirin û gazina Eli hat bırandın, êdi Eli nedıgiriya. Balam nedıxwast ku lı ser erdê de rûne, rabe lı ser lıngan de bısekıne, an jı bımeşe. Eli dıxwast ku her tım lı hêlanekê û hembêza diya xwe de bısekıne. Carna Xecê Eli dadıanı ser erdê, pê zendê wi dıgirt, ku wi rake ser lıngan bıde sekınandın, lê Eli lı ser lıngan de nedısekıniya, dıkır qirin dıgiriya, nedıxwast ku lı ser lıngan de bısekıne, an jı pêle erdê bıke.

Bı ew şıkli va roj û mehe derbaz dıbûn dıçûn. Herkes lı ber kar û berên xwe de bû. Eli ji êdi radıbû ser lıngan, lê tiliyê destê Eli'yên çepê nedılıviyan, milê Eli ê çepê roj bı roj jar dıbû. Eli bı tiliyên destê xwe ê çepê va, nedıkarıbû ku tışteki bıgire, an jı tışteki lı ser erdê de rake. Carna

radîbû ser lîngan, dîxwast ku bîmeşe, lê qora wi a çepê destûr nedîda Eli. Lewra qor tevîziyabû, hêz lî qora Eli de nemabû. Lî bîlî ew, qor piçeki jî kîn bûbû, Eli dîlîcîmîya, bî kuleki gav dîavîtin. Jî ber ku qora wi a çepê lî şûna xwe de derketîbû. Keseki Eli nebîrîbû cem bîjîjkeki û cebareki, ku ew lî Eli bînhêrîm, dest, pê û bedena wi sehêt-kontrol-bîkî, qor û mîlê lî cîhde derketî disa bîkî şûnê û gîrêbîdîm, qenc bîkî. Lê keseki ew karana nekîrîbûn. Rewşa hejari û nezaniyê Eli kîrîbû ew rewşê, Eli seqet bûbû. Paşverûyan Xîd jî xwera kîrîbûn leyîztok û ew şandîbûn ser tîrb, dîwar û daran, ew lawîkê mina topek nûr û belengaz seqet hiştîbûn.

Dîbîstan ketîbûn betlanê, heyam dawîya meha Gulanê bû. Aliekber jî gelekî bîriya xwişkî xwe, zava û xarziyên xwe kîrîbû, dîxwast ku bîçe xwişk, zava û xarziyên xwe bîbine. Lî alîya dîn de, Aliekber ew herêma "Newala Karê" û gundên seyîdan jî perwa-merak-dîkîr. Wî dîxwast bî taybetî ew herêmê bîbine. Bîlî ew, wî nexwaşî û seqetbûna xarziyê xwe jî bîhistîbû, balam wext nedîtîbû ku bîçe xwişk, zava û xarziyên xwe bîbine.

Aliekber nêta xwe jî dîya xwe, bav û bîrayên xwera got, destûra wan stand û berê xwe da alîya Mêzgîrê, herêma "Newala Karê" û gundê Kûpîkê. Navbera Xarpîtê û gundê Kûpîkê-bî peya rîyek kêse-qonaxa rojeki bû. Aliekber lî berbanga sîbê, tariyê de rabû serxwe lî rê ket, berî mîxurba êvarê xwe gîhand gundê Kûpîkê; balam wî mala xwişkî xwe nasnedîkîr. Lî taxa Sêdîkan de çû pêş derê mala Mîçê Hamê, derî kuta, Avdîlah ê kurê Mîçê Hamê derket der, Aliekber jî Avdîlêh mala Xîdê naxîrvan pîrsîya, Avdîlêh jî mala Xîdê lî Aliekber temaşe kîr û Aliekber çû xwe gîhand pêş derê xwişk, zava û xarziyên xwe, derî kuta û kete hîndîr. Çawa ku çavên Xîdê, Xecê û zarokan lî Aliekber ketî, hemû bî hevra rabûn serxwe,

xwe avıtın dest û rûyê Aliekber; xarziyên wi destên wi, Xıd û Xecê ji stuyê Aliekber hembêz kırın, gepên Aliekber maçkırın "kuro kijan ba û bahozê tu avıti ev ali? Te çıto riya xwe şaşkır tu hati ev aliya me? Ela danışe, rûne em qurban" gotın û Aliekber dan rûnıştandın û êdi destpêka pırs û pırsiyaran kırın. Gotın "çı hey, çı tune, tu jı mera ew bibêje? Dayê, bavo û zarok çawane? Deng û behsên lı ser welêt çıne? Gor ku me bihistiye dibêjın hukma Romê bıryar standiye ku êriş bavêje ser Dêrsım, gelo ew raste?" felan-bêvan, heya nivê şevê jı hevra qısekırın û derd û kulên xwe jı hevûdura gotın. Dûra Xecê nivına bırayê xwe amade kır "tu rêva hatiye westiyayi, me jı tu her westandi, rabe bıkeve nav nivına xwe raze, pırsên mayın û gotınên mayın jı em bihêlinın sıbe" got û hemû bı hevra rabûn ketın nav nivın û bınê lihêfên xwe, ketın xewa kûr.

Rojtıra dın hemû gundiyeın Kûpıkê bihistın ku, bûrayê Xıdê naxırvan ew ê mamoste Aliekber hatiye mala xwişka xwe. Jı bona ew gundiyan dıxwastın ku Aliekber bıbinın. Bı taybeti jınan qet keseki mamoste lı jıyanên xwe de neditbûn. Jı bona ew jı, perwa kırına keç û jınan her zêdebû. Dıgotın "gelo kesên bajarvani û mamoste çıtonın-?". Lı pışti niv rojê, êdi gundiyeın Kûpıkê yek û yek çûn mala Xıdê, jı bona xêrhatına Aliekber. Bı taybeti wexta ku keç û jınan Aliekber dıtın, geleki dılşa û kêfxwaş bûn. Lewra cara yekemin bû ku, wana mıroveki seri qot, stu qırawet, mamostek dıdıtın. Şıklê Aliekber jı wanra ecêb duhat xuyakırın. Hın kesan dıgotın ev xorta, xorteki bêt terbiye û bêt şerme, seri qot dıgere, qırewata mina hefsarê kehrê jı kırıye stuyê xwe, werge hatiye, xorteki ecêb û bêtoşeye. Lê Aliekber rawêj-tahmin-dıkır, ku gelek kes wi lı nav xwe de ecêb dibının, şıklê wi lı hın kesan xwaş nay, balam dengê xwe nedıkır. Bı taybeti hın kesên kal û kım, ew şıklê Aliekber heznedıkırın.

Roja sısiyan Seyid Weli û Seyid Qemer Aliekber daweta mala xwe kırın, ku Aliekber bıçe mala wan, şıva xwe lı

nala wan de bixwe-Ew herdu bira bi hevra rûdînştin li
ev cûda nebûbûn- Aliekber ji ew dawet û pêşniyaza wan
pejirand û çû bû mivanê Seyid Weli û Seyid Qemer.

Wext êdi êvar bû, Aliekber li mala Seyid Weli û Seyid
Qemer de rûniştibû; hemû gundiyên Kûpîkê ji li dorbera
Aliekber de kombûbûn, li Aliekber pîrs pîrsdikirî. Ali-
ekber ji qasa zanina xwe bersivên wan pîrsan dîda. Li
xaniyê paşin de ji Ana Elif û Ana Xatûn hevîrê Zerfetê
dipişavtin, hevîr dikirin, ku mivanan ra Zerfetê bavêjin
binê sêla agir û Zerfetê bîpêjin. Li ew navberê de Memê
Hamli berê xwe guhart ser Aliekber, ji Aliekber ra:

- Xortê delal, te xwendîye tu bûy mamoste ê dewleta
Romê, êh ev li te pîroz be. Ez bawerim te dirok ji xwen-
diye, tu tiştên diroki ji baş dizani. Li milê din de, hîn kes
qal û besa ew diroka ku Mîstefa Kemal li ser bîngêhê
derewan da daye nivisandin, tu ji mera qal û behsa ew
diroka derew û wan dirokzanên Mîstê Kor meke. Em dix-
wazim tu ji mera qal û behsa diroka me Kurdan û diroka
hukma Osmanli biki. Gelo çira hukma Osmanli werge li
bînkê, hate xurandin? Gelo ew Mîstê Kor li ku derê de
derket? Wina çira Kurd xapandin û dûra ji qira me Kur-
dan ani? Dîbêjin ew li heyamek heri kurt de êriş bide ser
Dêrsim ji, gelo ew raste? Ango pîrsên min evin; tu bi xwe
li Xarpiê tê; hûn ji karmendeki dewleta Romê, ê hukma
Mîstefa Kemal'i, bi kerema xwe ji bona ev pîrsên min,
çend bersivan bide me, got û li benda bersivên Aliekber de
ma.

Li piştî pîrsên Memê Hamli de, icar Aliekber ji Memê
Hamli û hemû civatê ra:

- Başê Bawa, spas, ez qasa zanina xwe bersivên ev pîrsên
te bîdim, ev yek. A duwem bibe ku ez li nav axaftina xwe
de, carna li nav ev babetên pîrsên teda derkevîm, qal û
behsa hîn tiştên din ji bikim. Li dem û rewşên usa de,
divê hûn nexeyidin, hêrs nekevî, gotinên min nebîrin,
qisûrên min nenhêrin, min bîborînin. Ango ez dixwazim

em li nav xwe de mina biran bipeyivîn, giramiyê bîdîn gotin û ramanên hevûdu. Ev pêşneyara min ku li aliya weda tête pejirandin hay-hay ez destpêka axaftina xwe bikim û bersivên pirsên te bîdîm; na ku usa nebe, çêtire em nekevin nav gegeşiyên ev mesele û bersivên ev pirsan, got.

Lî piştî ew pêşneyara Aliekber de, hemû civatê gotin " başe, soz kes li kesi naxeyide, tu destpêka axaftina xwe bike" Lî pey ew soz standinê de, Aliekber:

- Belê, beri hemû tişt ez dixwazim bîdîm zanin, hûn jî zanibîn, ku ew diroka ku Mîstefa Kemal daye nivisandin, sedi-sed naveroka ew dirokê derewe, qet tişteki bî zanisti li ew dirokê de tune. Bingehê ew dirokê pûçe. Qet rastiyeke li ew dirokê de tune û naye ditin jî. Ew dirok bî tiliyên hin kesên xwe firoş, derewçin û mafperestan va hatiye nivisandin, em jî ew dirokê li dibistanan de dixwinin û li şagirtan didin xwendin. Bî rasti cihan li ew derewan dîkene, tînazên xwe li hukma Romê dîke. Lî gor ew dirokê, nijada Tirk bavê hemû nijadên ev cihanê ye. Zîmanê Tirk jî, dayika hemû zîmanê gelên ev cihane. Lê mirov li derewên usa çawa bawer bike? Lê Tirk bî xwe bawer dîkin. Jî ber ku Tirk geleki koçere, geleki xwinrije, geleki har û hove. dirokek xwe a werî dirêj û paqij jî tune. Jî bona ew jî. karbidestên Tirk ketine nav hişên sernewqî, dixwazî xwe gîrs bîkî, balam hemû cihan jî dizane ku, rovi çucarane nabe fil. Hûn qenc dîzanin, bav û kalên me Kurdan gotine ku " Daristanên ku şêr têda tunebîn, rovi li wan daristanan de xwe fil dihesibînin". Mesela Tirkan jî usaye, ne pêwîste ku mirov dûr û dirêj li ser ew diroka derewçin bipeyive. Ev usaye. Naha em werî ser mesela xurandîna hukma Romê a kevn, hukma Osmanî. Ew zagonek Diyalektigê û zagonek Xweza bû, divê werge bîbana, werge jî bû. Ango li ev cihana meda hukma sazûmana Feodalizmê berrî wendabûn û têkçûyîne dîçû. Ew sazûmana paşverû û kevneperest li welatên Roj Ava, Ewropê de hatibû rakirînlî

şûna ew sazûmana paşverû de, sazûmana Kapitalizmê dest pêkiribû, gelekî ji pêşve çûbû, iro ji li duhu bêtir pêşva çûye û diçe ji. Sazûmana Feodalizmê li ser bingehê kuştin, lédan, barbarî û zîlmê de hatibû avakirin. Jiyan li ser xwinê û kuştinê de dumeşîya. Ango kê ku ki kuşt, kê ku ki talan kir û şêland ew dijiya. Dewlet ji werge bûn. Kijan dewlet xudan barbarên har û hov bûn, xudan fêl, dek û dolavan bûn, ew li ser piştê gelên hejar û bêt hêz de dijiyan û ew ji xwera dikirin xulam û noker, dewlemend dibûn, dibûn Împarator; gelek gel û erdên gelan dikirin binê bandûrên xwe. Hukma Osmanî ji werge bû. Împaratorê Osmanî bî dara kuştin û zîlmê, bî hêza barbaran va gelek welat kire bin bandûra xwe. Li ser erdê Anadolû û Rojhilata Navîn de bî dehan gel heland kire Tirk. Bî zarokên gelên hejar-wek zarokên Sırpan, Yewnanan, Xırwatan, Bulxaran, Romenan, Macaran, Kurdan, Ermenîyan, Gurcan, Asûri, Geldani, Erebb, Finîke û gelek gelên din va artêşên nav "Yeni Çeri" saz kir. Barbar artêşên dewleta Osmanî bî dara zorê, zarokên ew gelan li destê dayik û bavên de distandin, dibirîn li ocaxê Yeni Çerîyan de mezin dikirin, bî perwerde a barbarî va perwerde dikirin, dûra ji berdîdan ser gelan. Hukma Romê bî ew karê ne mirovî û bêbextî va qira gelan anî. Tixûbên Romê her fereh bûn. Bî hezaran dayikên dest û milên kurên xwe jêdikirin, ku hukma Romê zarokên wan nebe, neke leşker. Ango dewleta Romê bî mêraniya zarokên biyani va diket gerdegê. Îro ji hukma Romê bî wan kîret û barbarîyên xwe va pesna xwe dîde, dibêje "nîjada Tirk bavê cihane, dayika hemû zîmanê gelên ev cihan ji, zîmanê nîjada Tirke. Tirk lehenge, Tirk mêrxwas û egite" nîzam çî û çî. Lê Xwedê nepejirine em çî bikin û çî bibêjin.

Belê, li Ewrûpê de sazûmana Feodalizmê rabûbû, êdî ketibû nav rûpelên dirokê. Dewletên wek Îngilîz, Îspanya, Portekîz û Holanda rîya okyanûsan, Hindistan, Efriqa, parzemînen wek Emrîka û Awistûralya ditibûn. Teknolojî

roj bı roj pêşve dıçû, jiyan bêtır geş û nûjen dıbû; iro ji lı duhu bêtır geş û nûjen dıbe. Lı parzemina Ewrûpa de şert û şürtên Netewi hatıbûn şûnê, pırsên gelan û Netewan çareser bûbûn; eşir lı holê rabûbûn, dewletên Netewi hatıbûn damezrandın. Lê dewleta Osmanli a kevneperest û xwinmij ew şertên nû, nûjeni û nûvedanên nû nedıpejırand, jı nûvedanên nû û hemû hacetên nû ra" Karê Eh- rımanın" dıgot. Gelên Balkan lı hember hukma Romê bı mêrani şerdıkırın, dıxwastın ku lı bınê bandûra dewleta kevneperest a Osmanli de felat bıbın. Nedıxwastın ku êdi serebac û salyan bıdın hukma xwinxwar û paşverû. Dew- leta Osmanlı lı ser zagonên Ola İslam de dımeşıya. Ola İslam û berêwberê-temsılci-Ola İslam ji nûjeni nedıperırandın, dıji nûjeniyê derdıketın. Ango gelek faktorên dın ji hene, balam ez naxwazım hemûyan yek bı yek lı vıra dengkıın, jı wera bıbêjım. Ha lı dawiyê çı bû, çı hate serê hukma Romê, naha em dagerın ser ew meselê.

Lı dawıya qurne a nozdêh û lı destpêka qurne a bıstan de, êdi hukma Osmanli lı bervı xurandın û têkçûyinê dıçû. Avdıhemıt hewl dıda ku dıktatoriya sal û qurnê'ên bıhuri lı şuva bine, balam ew ne keys û bû. Jı ber ku lı hember hukma Avdıhemıt de dijberi û berberi derketıbû. Tevgera Tırkên cıwan destpêkırıbû. Partıya İtahat Teraki hatıbû damezrandın. 1908'an de şoreş çêbû balam tışteki werqas gırıng nehat holê, tışteki nehat guhartın. Lı ew zemani de hemû welatên cıhan jı dewleta Osmanli ra" mırovê nexwaş" dıgotın. Bı rasti ji lı ew deman de hukma Romê bûbû mıroveki her nexwaş, bervı mıırınê dıçû, dıkıre xıre- xır, hêlma dawiyê ketıbû xırıkê. Gelên Balkan yek û yek lı bınê bandûra Osmanli de felat dıbûn, dıgıhiştın azadıya xwe, dewletên xweyên Netewi û Serbıxwe sazıkırın, bı şer hukma Romê lı ser erdê bav û kalên xwe de dırdıxıstın, dıavıtın der. Lı Rojhılat û Rojhıлата başûr de gelên Erebi û Ermeni lı dıji sazûmana Osmanli û zılm û zora Osmanli şer dıkırın, ku rojeki bı zû lı bın bandûra hukma paşverû

û kevneperest de felat bîbîn, welatên xwe Rızgar bîkîn. Lê sed mîxabîn ku heya ew rojê li nav gelê Kurd de livandinek werê xurt tunebû. Gelê Kurd mina gelên Ereb û Ermeni rêzbûyi, şiyar, seri vekirî nebû. Neketibû nav şert û şûrtên Netewî. Erê li qurne a nozdeh, piştî 1838'an de, 1840-1846-1855-1879-1889'an de gelek serihildan li bin serokatiya mirên Botan, wek Bedirxan Paşa, Husên Bedirxan û bîrazîyê Bedirxan Yezdan Şêr de, li dîji hukma Osmanli de cih girtine ji, lê bî rasti li hindirê wan serihildan û tevgeran de, mirov ruheki Netewî, yekitiyek Netewî, li tevahiya Kurdistan de şiyarbûnek Netewî, kar û berên komeleti û rêxistinî nabîne. Ne tenê ew tevger û serihildanana; her usa ji, gelê Kurd li piştî hukma Yawûz Sultan Selim vîrde, gelek caran li heber hukma Roma Reş û Farîs'an de serê xwe rakirîye, jî wan dewletên hov û xwînrijan ra şer kirîye, bî sed hezaran cangorî daye, lê sed mîxabîn ku serneketiye. Ew serihildanên ku qewimiyane, hemû bûne serihildanên herêmi, li ew qonaxê de derneketine, nebûne serihildanên Netewî û tevahiya Kurdistan. Minak jî wera: Serihildana kela Dumdîm û serokatiya Xano ê Cengzêrin li hember Şah Abas, serihildanên eşîra Celaliyan û ên dîn. Serokên eşîrên me Kurdan li alîki de jî dijminan ra şer kirîne, li alîya dîn de jî, dageriyane jî hevûdura şer kirîne, xwîna hevûdu, xwîna biran rijandine. Bî kurtasi em dîkarin bîbêjin heya ew roja xurandîna hukma Osmanli û damezrandîna Komara Mîstefa Kemal, mirov li nav tevahiya gelê Kurd de qet yekitiyek bîrati û Netewî nabîne. Jî bona ew ji, hemû Niştîmanperwerên Kurdistan jî bona ew daxwaz û armanca evrar dilreş mane, xemgîn mane, xem û xeyalên roja Rızgariya Kurdistan de mane.

Li nav şert û şûrtên wan rojan de, hukma Romê hemû mêtîngehên xwe wenda dîkîr, dîtîrsiya ku Kurdistanê jî wenda bîke. Jî bona ew ji, bî çar destan, xwe li Kurdistanê va girêdabû û Ola Îslam jî, jî xwera kirîbû çekeki

heri mezin û gırs. Şert û baweriyên Îslami lı nav Kurdan de gurr dıkir. Hukma Osmanli ferman derxıstibû, Şeh-islam û hemû şêx û berêwberên Ola Îslam dıgotın" xêncı kesên Îslam hemû kesên ev cihan kafırın, qetla hemû xeyri Îslaman helale, çı Xaçparêz, çı Yahûd, çı Bûdis. Avdilhemit bı ew gotın û ferman, bı fêlbazi hemû casûsên xwe kırın nav Kurdan; gelek axayên Kurd, ewên dozfiroş, çaş û bêbext kırın Paşa, sırmeyên zer da ser mılên wan dozfiroşan, bı zêr û zıvan va ew çaşana xapandın û bı dest û bangeşiyênn wan va xortên Kurd komkırın, kırın leşker. Alayiyên Hamidi sazırın û ew Alayiyana berdan ser gelê Ermeni û Kurdên Yezidi û Kurdên Xaçparêz û Suryani. Alayiyên Hamidi qıra Ermeniyın, kurdên Yezidi û Xaçparêzan anin. Armanca Romê ew bû ku, Kurdan bı destê Kurdan bıde kuştın û bı hêza wana leşkeri parmen-di-istıfade-bıke, ew yek. A duwem, Kurd û Ermeniyın bine hemberi hev, ew herdu kurap hevûdu bıkujın, ku hêza wan qels û jar bıbe. A sêyem, dıvê Kurd şiyar nebın, heqê xweyên mırovi û çarenûsi xwedı dernekevın û nexwazın, dewletek nav Kurdıstan saznekın. Ango hukma Romê nedıxwast ku Kurdıstanê wenda bıke. Lewra hemû mêtıngêhên xwe wenda kırıbû, tenê Kurdıstan lı dest hukma Romê de mabû. Jı ber ku Kurdıstan ser erd û bınerdê xwe va her dewlemend bû, mina çêlekek bı şır bû. Hukma Romê ji nedıxwast ku dew û rûnê xwe wenda bıke, bêt şır û bêr rûn bımine. Lı dawiyê de, hukma xwınxwar du milyon Ermeni û ewqas ji Kurd kuşt, lê pêşiya damezrandına dewleta Ermeniyın negirt, dewleta gelê Ermeni saz bû, bû endamê sazûmana Sovyet, felat bû. Lê sed mıxabın ku em disa lı bıner bandûra hukma xwınxwar de man, bûn mêtıngêha hukma Tırk. Jı ber ku em gelekı şiyar û bı rêzbûyi nebûn, yekitıyek me a Netewi tune bû. Ango ew kêmasıyek me a diroki bû, iro ji disa ew kêmasiya me berdewame.

Ango ev tiştên ku me gotin, hemû li pişti şerê Balkan sala 1912 û şerê cihan a yekemin de 1914'an de bûn. Lî ew salan de cihan bûbû situlek ava kelandi, mina Volkan dîke-liya. Welatên Emperyal lî nav xwe de ketibûn zîkê leca parvekîrîna cihan. Lî ew demê de hukma Alman piştî dewleta Osmanli dîgirt. Lî şerê Balkan de hukma Osmanli binket, hemû mafê xwe ê Rojava wenda kîr. Îcar lî sala 1914'de Emperyalan tekoşînek xorteki Sîrpi jî xwera kîrîn mane, şerê cihanê derxistin. Şer keştîyên Îngiliz, Fransîz û Îtali, tev top û tankên xwe va ketin îstringehên Îstembolê. Bî taybeti Fransîz hêza xwe a gewre kîrîbû Berha Sîpi. Lî ser erdê Anadolû'yê de tevgera dij Xaçparêzan û kafîran destpêkîrîbû, balam gel bêt rêz bû. Hukma Avdîlhemît hatîbû xurandî, padişah Vatetî hatîbû şer hukum. Lî Çeneqelê û Gelîbolûyê de şer destpêkîrîbû. Hukma Romê bî hezaran xortên Kurd, Çerkez, Laz û Ernawût dîşand ew şerî, ku ew lî hember Îngiliz şer bîkîn. Lî ew şerî de bî sed hezaran kes hatîn kuştî, pîraniya wan cangorîyan xortên Kurd bûn. Lî ew şerî de Mîstefa Kemal serbazekî artêşa Osmanli, rutbe a wî Sîtvan-yüzbaşî-bû. Wî xwe lî ew şerê Çeneqeale û Gelîbolûyê de dabû naskîrîn, bîaqîliya xwe lî Padişah Vatetî dabû temaşekîrîn. Jî bona ew bû ku, Padişah Vatetî lî piştî ew şerî de rutbe a Generaliyê da Mîstefa Kemal û ew şand Anadolûyê, ku ew bîçe gel rêz bîke. Mîstefa Kemal bî fermana Vatetî tev gelek hevalê xweyên Îtahat Terakî va çû Anadolûyê. Lî destpêkê de çû bajarê Samsûnê. Lî wê gazi hemû axa û rêberên Lazan kîr, lî Samsûnê civînek mezîn civand, lî tev wan peyman nivîsand, gel lî dîjî sazûmana Feodalîzmê û dîjî xeyrî Îslaman rêz kîr, bîngêhê xwe lî Anqarê de danî. Dûra çû nav Kurdan, Kurd jî xapandî. Lî dawiyê de Mîstefa Kemal û hemû hevalên wî serketî. Komara nû îlan kîrî. Lî ew Komara nû ra gotî "ev Komar, Komara gelê Tîrk û gelê Kurde". Bî ew gotîne va derê Meclîsê jî vekîrî. Mîstefa Kemal lî ew şerê serketîne de arîkariya

çekdari û dîravi lî hukma Sovyet, lî Lenin stand. Dûra hemû gotinên xwe jî xwe birkîr, xweziya xwe lî ser erdê dalês kîr; lî ser betalkîrîna navê gelê Kurd de desthelata xwe nû sazîkîr, heftê du kesên Kurd jî ketin hîndîrê ew meclîs û desthelata nû, bûn Newêrger. Lî sala 1923'yan de, îcar Mîstefa Kemal bî destê wan heftê du Newêrgerên Kurd va, namek jî nivîsand jî serok û nûnerên Konferansa Lozanê ra şand. Wi ew name û naveroka ew namê va hemû nûnerên welatan xapand. Lî dawiyê de dewleta Mîstefa Kemal hat damezrandin; Emperyalan Kurdistan kîrîn çar perçe û lî nav xwe de parvekirin, kîrîn ev rewşa îroin. Lî nav wan Newêrgeran de sê kes jî Newêrgerên me Dêrsîmîyan bûn. Wek Diyab Axa, Hesên Xeyrî û Meço Axa. Lê dûra çî bû? Dûra jî her tîşt lî we hemûyan eyane. Lî piştî tevkuştîna Qoçkîriyê, îcar tevkuştîya Şêx Saîd û Çiyayê Agîrê destpêkîr. Hukma Mîstefa Kemal bî sed hezaran gelê Kurd kuşt, bî sed hezaran kes jî sîrgûn bûn, hemû serok û rêberên tevgera Rîzgariya Kurdistan hatin kuştin û hatin dardakîrîn. Mîstefa Kemal û hevalên wi qet kesek lî dijî xwe nehiştin. Naha jî-gor ku em dibîhisin- Mîstefa Kemal dîxwaze êrişek bî leşkerî bîde ser me Dêrsîmîyan, qîra me Dêrsîmîyan jî bine. Lê hûn hemû jî dibînin, ku eşîrên me Kurdan bûne dijî hevûdu, hêz perçe-perçene, gelek eşîr bêt alî mane; gelek jî bûne hevparê dewleta Mîstefa Kemal, lî tev dewleta xwînxwar kar dîkîn. Ev rewş jî, bî rastî kêmasî û şermek mezîne. Mîrov lî kar û kîretên me Kurdan şerm dîke. Ango aqîlê mîn qet nagîhêje kar û tîştên usa. Mîrov çawa dibe dost û hevparê dijmin? Mîrov çîto lî tev dijminên xwe birayên xwe dîkîje?". Lî ew navberê de Hamedê Elîkê gelekî bînteng bûbû, nedîxwast ku ew gotinên politik guhdar bîke, yekser axaftîna Alîekber birî, jî Alîekber ra usa got:

- Kurê mîn tu baş dîaxîfî ev raste. Balam divê tu zanîbî em bî şafiyên kafîr û yêzîdan ra nabîn heval û nabîn yek, piştgîriya wan nagîrîn. Ez bawerîm tu qenc dîzânî, wana lî

Kerbela ê de xwina Husên rijandîne, koka eslê Mihamed û Eli, Seyidi Saadet anine. Ew bûna aligirê Omer, Osman, Ebûbekir, Mawiye û Yêzit. Ew bûne dijminê "Ehlibeyt"em çawa ji wanra bîbin yek? Tu bî xwe ji qenc dîzani, ew şafiyên Paliyê wexta ku me dîbinin, dîxwazî ku me bîkujî, xwina me vebîxwî. Ew ji mera dîbêjî "hûn mirovên bêt nêmêj, bêt avdestî, hûn ne Îslamî, hûn kafîrî". Şêx û xoceyên wan, ferman dîdî, dîbêjî "ki ku deh Elewiyan bîkujê diçe bîhiştê" felan-bêvan. Şêx Said û Îhsan Nûri ji, ew Şafî bûn. Lewma Elewiyan piştgiriya tevgera wan negirt. Îro serokê eşîra me Bamasûran Seyid Sîlêman û kurê wi Bay Seyid Husên dîbêjî "bîla qet kesek ji tevgera Seyid Ali Rîza ra arikari neke, Seyid Ali Rîza çî wext bûye Seyid? Eşîra wi ne eşîrek Seyidi Sadet û ewladi Resûle. Ew eşîr, eşîrek talîbane, lî eslê pêxamber nehatiye. Seyid Sîlêman û kurê wi Bay Seyid Husên, mezî û pirê mene, zanayên mene. Ez bawerî ew lî te û pîrr kesên wek te zanatî. Tenê kurê Kekê Mîstefê Ali Barût lî dû ew dozê ketiye, dîbêje" Kurd û Kurdistan" ez bawerî axîriya wi ji bibe axîriya Şêx Said û hevalên Şêx Said. Ji bona ew rewşa Ali Barût, Bay Kek zef berxwe dikeve, balam ew qet guhdare bavê xwe ji nake. Lî aliya dî de em dîmîlî ninî, eşîrên dîmîlî dîziyê dîkî, bûne nijdevan--eşkiyapez û dewarên gel dîdîzî. Ango em xwe lî ser wan nahesibînin.

Ew gotînen Hamedê Elîkê hêrsa Aliekber rakî. Aliekber xeyidî, zef berxwe ket. Dûra bî xwînsari vegeriya ser Hamedê Elîkê, ji Hamedê Elîkê ra:

- Bînhêre Bawa, ez destên tera dîramisî, tu meriyê Mîrşûdê meyi, hum ji lî mî mezîntî. Lê tu mî bîborîne, ma tu dîzani bav û kalên ma Kurdan çî gotîne?.

- Ji mînrî bîbêje kurê mî, çî gotîne ?

- Gotîne ku "aql lî salan de nîne, aql lî serê mirov daye". Balam ez nabêjî ez lî te, an ji lî we bîaqîltîrî. Na haşa, ez usa nabêjî. Balam tu û kesên ku mîna te dîbê-



jîn, mina te dîfîkîrîn û dîhîzîrîn, hûn hemû xelîtin, lî nav şaşîtiyên herî mezîndane.

- Em lî nav kijan şaşîti û xelîtandane? got Hamedê Elîkê.

- Bî kerema xwe destûrê bîde mîn, ez jî tera şaşîtiyên te û ên kesên mina te bibêjîm. Beri hemû tîşt ez dîxwazîm werîm ser gotînen te û şîrovekirîna gotînen te. Raste em Elewîne, ew Şafîne. Gor bawerîya te em Îslamîn ew kafîrîn. Ew jî mina te jî mera" kafîr, bêt nêmej û bêt avdest" dibêjîm. Jî ber ku ew jî mina te hatîne perwerdekîrîn, jî wana ra jî wer gotîne û wana werge hînkîrîne. Çawa ku seyîdan jî mîn û tera ev tîştana gotîne, şêxên wan jî, jî wanra ev tîştana gotîne. Ew perwerde lî devê dijîmînan de, ango lî devê dewleta Romê de derketîye, ku me Kurdan bîke dijîmîne hevûdu. Ev dubendîya gemarîn hukma Romê kîrîye nav me Kurdan, îro jî dîxwaze ku lî ev dubendîyê kêr bibîne. Lî qurna şazdeh vîrde hukma Romê bî taybetî lî ser ev dubendîyê de disekîne. Camêran sed salan beri em xapandîm, anîn em gîhandîm ev rojê, em jî bî gotînen dijîmîm, dîbîm dijîmînen hevûdu. Bînhêrîm gelî seyîdan, ez îro lî vîra mîvanê weme. Dîvê hûn qenc lî meselan û bûyeran bînhêrîm, dîvê hûn qenc zanîbîm, lî ev qurna ku îro em têda dijîm, lî bûyer qewîmandînen ev qurnê bî çavekî vekîrî va bînhêrîm. Lî sala 1920'an de, wexta ku hukma Romê lî bajarê Sêvazê, herêma Qoçkîrîyê de destpêka kuştîna Kurdan kîr, gelo ew Kurdana çî Kurd bûn? Ma ew hemû Kurdên Elewî nebûn? Ma çîra dijîmîm bî barbarî qîra Qoçkîrîyan anî? Ma çîra bî hezaran zar, zêç, pîr, kal, keç, jîn, bûk û xort kuştîm, serjêkîrîm, malên wan kesan şewîtandîm, şêlandîm, talan kîrîm? Ma çîra dijîmîm namûsa me lî Qoçkîrîyê de peymal kîr?. Pênc sal lî pey ew tevkuştîne de, ma çîra dewleta Romê êrîş da ser tevgera Şêx Said, bî deh hezaran kes kuşt, hemû rêberên Rîzgariya Kurdistan dardakîrîm? Şêx Said bî xwe Sunnî bû. Dewleta Romê jî lî alîya Ol û meseb va, ew jî Îslam û Sunnî bû. Naha tu bî kerema xwe jî mînrî bibêje Bay

Seyid Hamed, çira hukma Romê bı deh hezaran ew Kurdên Sunni kuştın û hemû hevalên Şêx Said dardakırın? Çira dewleta Romê eşira Lolan û Xormek xapandın berdan ser wan biran ew tevger şikand? Çira biran qıra birayên xwe anin? Tevgera İhsan Nûri ji tevgera Kurdên Sunni bû. Çira dewleta Romê li dorbera çiyayê Agirê de bı deh hezaran kesên bêt sûc û bêt webal kuştın? Lı vir de tışteki her vekiri û berbi çav heye, lê hûn naxwazın ev tışti bibin. Ew ji ev e: Dijmın wexta ku li te dixine û te dikuje, qet nabêje "ev Sunniye, ew Elewiye". Ma dijmın çı dibêje tu dızani? Dıbêje "ev dijminê mine" hemû evqas hêsan. Naha te ez fêhm kırım û tu têgiştı Bay Hamed? Lı nav Tırkan de ji Sunni û Elewi hene, lı nav hemû gelan de ji mesebên cûda-cûda hene; lê ew qet mina te û me li hevûdu nafıkırın, jı hevûdu ra "kafir" nabêjin, mina me hevûdu nakujın, xwina birayên xwe narjının; ew dibên "em birane, em gel û nijadekın". Lê rasti ji ev e.

Kela Aliekber rabûbû, dıxwast ku bıaxıfe, lı ser ew nezani û xeşimiyê de verbişe, wan derd û kulan lı fırsıka xwe de derxine, jı gelê xwera rastiyan bıbêje, lê dıtırsiya. Jı ber ku lı nav Kurdan de gelek doz fıroş û bêbext hebûn. Aliekber bı xwe ji karmendeki dewleta Romê bû. Lê ku dewleta xwinxwar bıbıhistana ku Aliekber jı gel ra wan tıştan dibêje û werge dıaxıfe, gelo wê çaxê hukma Romê çı bıanina serê Aliekber? Lê disa ji Aliekber her tışt dabû ber çavên xwe û dıaxıfiya. Dıgot" geli Pir û mırşûdan, ez naxwazım serê we bı zêdei bıêşınım, balam ez dıxwazım hûn destûrê bıdıne mın, ez serpêhati û dıtınêk hevaleki xwe ê Kurdê Meletiyê jı werı bıbêjum, hûn ji qenc gıhdar bıkın, bınhêrın dijmin kiye, çı dıke û çı dıbiye".

Lı ew navberê de disa Hamedê Elikê xwast ku tışteki bıbêje, lê cıvatê destûr neda Hamedê Elikê û Aliekber destpêka axaftına serpêhati û dıtına ew hevalê xwe ê Kurdê Meletiyê kır û usa got:

- Belê, hukma Romê çawa ku hûn ji dızanın, li pîştî tevkuştina serihıldana Şêx Said de, icar êriş da ser serihıldana çiyayê Agirê, tevgera Îhsan Nûri. Lî ew demê de dewleta Romê ew hevalê minê Kurd ji bî dara zorê dıgire dibe dıke leşker û dîşine çiyayê Agır, ser tevgera Îhsan Nûri. Ew bırayê me ê Kurd ji, bî dehan bırayê xweyên Kurd dıkuje, bî dılda xemgin dibe, her roj dıgire û berxwe dıkeve, balam qet nıkaribe ku tışteki bıke. Wi hevali ji mınra qal û behsa bûyereki kır, bawer bıkın por lı ser mın de gj bû, ağır lı dil û kezewa mın ket, ez berxwe ketım, ecêb mam, ku mırov çawa ewqas dibe heywan, dibe har û hov. Wi hevali usa dıgot:

- Lı çar aliyên çiyayê Agır de şer berdewam bû. Kurd bırayên me bî mêrani berxwe dıdan û dırbên mezin dıgihandın hukma Romê, me nedıkarıbû ku hêza ew Kurdên leheng bıştıkının. Lı dawiyê de leşkerên İnan tev fırok û helikopterên xwe, leşkerên Sovyet û fırokên Sovyet tev top, tank û fırokên Tırk bûn û lı ser gund, bajar, mezire û gomên Kurdan de bombe barandın, her der şewıtandın, zar, zêç kal û pir hemû kuştın, qet kesek lı gund, mezire û goman de nehiştın. Bı ew barbari va ew tevger hate şıkandın. Hukma Romê bı deh hezaran Kurd kuşt. Dilê mın de xwin dıgiriya; mın dıxwast ku ez ji mina wan bırayên xwe bême kuştın û bımırım, lê ew ji ji mınra nedıbû. Ji ber ku lı paş mın de zarokên mın hebûn; mın nedıkarıbû ku tışteki bıkm û tışteki bıbêjım. Meyitên wan cangoriyên Kurdistan ji teyr û tûran, gur û torıyan ra bûbûn xwarın, lı bıın tavê de bedenên wan bıhn dıdan. Sê roj lı dû şıkestına ew tevgerê de, sıtvameki har û hov gazi mın û hevalêki mın kır, ku em bıçın ba wi. Lı ser ew fermanê em lez û rev çûn lı pêş sıtvan amade bûn "ferman ke Qumandan" me got. İcar sıtvan ji mera" bı lez tıfingên xwe bıgırın, rext'ên xwe ji-kütük-tıji gule kın, em dıçın nav ew gundên ku hatine şewıtandın û xurandın" got û fermana xwe beyan kır. Me ji lı zıkê çend hûrdeman de fermana sıtvan

ani cih û em dageriyan disa çûn ligel sitvan de amade bûn "em amadene qumandan" me got. Lı ew demê de bıyar-geha me lı kêleka çiyayê Agır de bû. Ango ciyê me her roj dihat guhartın. Me çito ku got "qumandan em amadene" icar sitvan kete pêşiya me, em ji lı dû sitvan meşiyın. Ango em du leşker pasewanê sitvan bûn, me ew diparast. Em bervı Rojhılata çiyê va dimeşiyın. Pışti neh, deh, bist hûrdeman de, me xwe gihand nêzıka gundeki. Ew gunda lı quntera çiyê de hatıbû avakırın, lê lı gund de qet miroveki Xwedê nedihat ditın. Beri ku em xwe bıgihının gund, lı binê riya meda, lawıkeki çar-pênc salını em ditın. Çawa ku çavên ew lawıkê belengaz lı me leşkeran ket, belengazê Xwedê bı tırs bazda reviya çû xwe gihand bı darek Şilan, xwast ku xwe lı nav ew dara sinc û dirri de veşêrine, felat bıbe. Lê serbazê hukma Romê, wi sitvanê bêbext, ew lawık dit û bı rev xwe gihand ew lawıki, pê çepıla liwık gırt û lı binê ew dara Şilan de derxist. Lı ew lawık pırsiya, got "tu kiy? Dê û bavên te lı kune? Tu lı vıra çı diki?" lê bersivek lawık tunebû. Jı ber ku lawık hum piçûk bû, hum ji Tırki nedızanıbû. Lê disa ji sitvan zor dıda ser ew lawıki, ku ew lawık bersiveki bıde wi. Lê ew ne keys bû. Lı pışti ew bêdengiya liwık de, yekcar sitvan ferman da mın, got "zûke guleki berde ser dil, an ji serê ev pinci bıkuje". Lı ser ew fermanê mın ji sitvan ra got "na qumandar ez nıkarıbım pızêzeke usa bıkujım, lı salê ev lawık de zarokên mın ji hene, çı sücê ev lawıki heye, ku em ev lawıki bıkujım? Ge'ê ev lawık lı me çı kırıye?". Lı ser ev gotinên mın de, icar sitvan fermana xwe dubar kır, got "ez ferman dıkım, divê tu ev lawıki bıkuji". Lê mın disa got "na" û bı amadeyi sekınıyam. Vêca sitvan dageriya ser hevalê mın, jı wıra ji" kuro kehr bavên, kehr bav, ez jı wera ferman dıkım dibêm ev pinci bıkujın, ev seg bavê hevalê te dibêje "na" naha ez jı tera dibêjım û ferman dıkım, zûke ev qexbe bavi bıkuje". Lê ew hevalê mın ji got "na û na" ew ferman nepejırand û neani cih. Lê ez bı gori, ma tu dızani

Li pişti ew gotin û berxwedana me de, wi sitvani çî kir? Yekcar li ser golima xwe de şêşara xwe kişand û hemû gule li pêş çavên meda berdan ser serê ew lawîki, mêjo ê ew lawîki pişqand, belav-belav kir, kuşt; dûra ji dageriya ser me, jî mera" divê hûn zambîn, çêle ê mar bêt jehr û axû nabe, ev kurê dijminê Tırke. Ku naha va ev neye kuştin, wê sibe ew rabe bibêje" Tırk dijminê mine" Tırkan bîkuje. Jî bona ev, divê serê çêle ê mar, bî piçûktiyê de were jêkirin û were pelçiqandin. Kuro seg bavên seg bav, divê hûn ev tiştana qenc zambîn. Ma li ranên weda qet xwina Tırk tune? Dûra carek din dageriya ser mîn, çend şimaq li mîn xîst, gelek peyv û çêrên nebaş jî mîn û hevalê mînra got û em li ew pêşdariye ne mirovî dūrketin. Ew roj, ev roj, kuştina ew lawîki her dem tê li ber çavên mîn de disekine, kinê mîn her diçe mezin dibe û tê sûtin".

Belê, Bay Seyid Hamed, wi hevalê minê Kurdê Meletiyê jî mînra ew ditin û serpêhatiyên xwe usa deng dîkir. Naha te û ev civatê, gelo we tiştê li ev serpêhatiya ew hevalê Kurd de û li ew bûyer û kîret û gotinên ew sitvan de derxistin, yan na? Ew lawîka ne kureki Kurdê Elewi bû; ew pîzêzeki Kurdê Sunnî bû. Ma çîra dijmin ew lawîkê bêt sûc û bêt webal kuşt? Mesele hemû ev e. Divê mirov dost û dijminê xwe nasbîke û dost û dijminê xwe li hev cûda bîke. Mirov jî bona Ol û meseban nabe dijminê gelê xwe. Beri ku Ol û meseb tunebûn em disa Kurd bûn, em bîra bûn, me jî hevûdura ev zuman dipeyiviya. Ola Îslam û hezkirina Eli, Mihamed, Hesên û Husên, ew duhu ketin nav me Kurdan. Lê em bî hezaran salin ku li ser ev erdî de ciwar dibîn. Ereb hezaran sal dûra li Afriqa bakûr derketin hatin li ser erdê Rojhilata Navin û Erebistana iroin de ciwar bûn.

Seyidên Kûpikê jî Aliekber ra ketibûn nav gengeşiyên, raberzîna meselan û bûyeran. Hîn kesan gotinên Aliekber fêm nedîkîrîn û jî Aliekber ra hêrs dîketin. Hîn kesan jî" welleh ev xorta, xortekî her bîaqîle û rastiyên dibêje"

dıgotın. Hın kes diji gotinên Aliekber derdıketin, lı hezar koşan de dızıvırıyan, dıgerıyan, dıhatın dısa lı ser mesela Elewi û Sunnitiyê dısekınıyan, bı rık "na ew kafırım, dijminê me Elewiyanın" dıgotın. Lı ew navberê de malxwe ê malê Seyid Qemer kete nav ew raberzinê û jı Aliekber ra usa got:

- Xortê delal, adet, tore û zagonên gelan û eşiran hene. Em nıkarıbın lı ev adet û toreyên gel û civatê dırkevın. Em û Sunniyan, lı sed salan vırde, bı gotınek dın, lı tevkuştına Kerbela'ê vırde dijminê hevın. Dûra em nıkarıbın mırına Seyid Bektaş, kesên mala Mele Husênê Mezra Gazê birbıkın. Seyid Bektaş apê mine. Ew endameki eşira Bamasûr bû. Wi lı ciyeki heri bılına de şünd dıgirt. Em çito xwına xwe birbıkın, tol û qesasên xwe negırın, xwına xwe lı ser erdê de bıhêlinn? Wê jinên me derpeyên xwe lı serê mekın, jı mera bıkın serhevde, bıbêjin" hûn ne mêrın, hûn jının, tırsonekın". Xortê delal ez bawerım tu jı naxwazi ku jin jı mera ev tıştana bıbêjin û bıkın serhevde.

Seyid Qemer axaftına xwe kuta kır û lı benda bersiva Aliekber de ma. İcar Aliekber dısa destpêka axaftınê kır û usa bersiv da Seyid Qemer:

- Bawa, ev tıştên ku tu dibêji, bawer bıke ne tıştên rastın, bıgehê ev gotmên te tunın û bıgehê ev gotınan pûçın. Lı hezaran sal beri Ola İslam û tevkuştına Kerbela'ê de, em Kurd dısa lı ser ev erdê bav û kalan de dijıyan. Lı ew heyam de em ne İslam bûn. Ola me Ola Zerdeşt bû. Em agirperest bûn. Pêxamberê me, bı xwe jı Kurdeki eşira magiyan nav " Zerdeşt " bû. Lı ew demê de em hemû bırayê hev bûn. Helbet lı nav bıran de jı şer û pevçûn dıbın, ev duhu jı dıbû, iro jı dıbe. Balam em lı ew demê de weka iro nebûbûn leyiztokên dijminan û neyaran. Weka roja iroin nebûbûn dijminê hevûdu. Me jı bona Erebb û Farıs'an xwına hevûdu nedırjand, me hevûdu nedıkuşt. Lı rojên tengasi de me pıšta hevûdu dıgirt, em dıçûn hawariyên hevûdu. Dûra Erebbên Qûmıstanan lı Af-

riqa bakûr derketin hatin lı ser erdê Rojhılata Navin, Erebestana iroin de ciwar bûn. Dûra wan Erebestan Qûmistanan, ewên har û hov Ola İslam derxistin. Bı zora şûr û kuştinê gelek gel kırım İslam. Gelê Kurd ji, lı pişti sed hezaran cangori dayin de, êdi bêt havıl ma, bû İslam. Lı pişti pejirandina Ola İslam de dubendiyên Ola İslam kete nav me Kurdan ji. Em ji bûn leyiztokên Ola İslam. Em ji bûn aligirê Xelifeyên İslam, aligirê dubendiyan û meseban. Ango partiyên ew zemani. Dûra Tırk derketin hatin ser erdê Rojhılata Navin de ciwar bûn. İcar Tırkan dest avit ew dubendiyan û ew dubendiyan lı nav me Kurdan de gurr kırım, bı xwe ji dûr sekiniyan. Helbet lı zikê diroka Ola İslam de ji gelek neheqi û zılm bûn. Tevkuştina Kerbela ji neheqiyek mezın bû, neheqiyek rêzani-siyasi-bû, helbet ew neheqiya naye pejirandin. Divê hemû kesên xudan wıdan, xudan ar û namûs, kesên pêşverû û ronakbir ew bûyer û ew tevkuştinê nanet bıkin. Jı ber ku ew tevkuştina rûreşiya ev cihan û rûreşiya mirovatiyê bû. Ez bawerim hemû mirovhez û demokratên ev cihanê, ew tevkuştinê nanet dıkin; çı Yahûd, Çı Bûdist, çı Xaçparêz. Divê ev usa were zanin. Lê, lı gor birûbaweriya mın, beri ku em bona tevkuştina Kerbela ê bıgirin, lê divê em ji bona wan cangoriyên xweyên diroki, ji bona ew sed hezarên ku Ola İslam nepejirandin û zımanên wan bı meqesan va hatin jêkırım û hatin kuştin; ji bona ew sed û pênc hezarên, ku serê wan lı bajarê Amedê de hatin jêkırım û ew seri lı ser kela Amedê de hatin gıldır kırım; ji bona wan cangoriyên Qoçkiriye û cangoriyên serihıldana Şêx Said, ji bona ew cangoriyên çiyayê Agirê bıgirin û berxwe bıkevın. Divê em beri cangoriyên gelê Ereb û gelên cihan, cangoriyên xwe birbinin, ji bona wan hıstêrên çavan birjinin, ji bona wan berxwe bıkevın. Jı ber ku ewana cangoriyê me Kurdanın, cangoriyê Kurdistanın. Ew bav, bapir û kalikên mebûn. Bavê diwazdeh İmaman Eli, wi bı şûrê xwe ê nav" Zulfıqar" va bı sedan Kurd kuştin,

ku Kurdan bike Îslam. Bı dara zorê mirov nıkarıbe raman û birûbaweriya mirovan biguhêrine. Naha zordestek derkeve were jı wera bibêje" yan hûn dıbin Sunni, meseba Sunni dıpejirinin, yan jı hûn têne kuştın". Lı rewşek usa de gelo hûn çı dıkın? Bı rasti rewşek usa lı we xwaş tê? Ez bawerım hûn mırınê bıdın ber çavên xwe, Sunnitiyê nepejirinin. Eve, wan kalikên me jı usa kırine, nexwastine ku bı zorê bıbin Îslam, nexwastine ku bı zorê ramanên xwe biguhêrinin. Ango em bı dara zorê kırine Îslam. Ola Îslam bı zorê çû xwe gıhand Asya Navin, taa heta Endenozya û Çinê çû. Lê em bibêjın, nebêjın, gelê me iro Îslame. Ola Îslam jı, jı me Kurdan ra nabêje ku" Kurdıno hûn hevûdu hezmekın, hevûdu bıkujın". Na tışteki usa tune, balam dıvê em jı mina hemû gelan hevûdu hezbıkın, gıramiyê bıdın birûbaweriyên hev, bı çaveki vekırı û bı aqıleki paqıj va lı gelş û bûyeran bınhêrın, ku meselan lı nav hev de derxının, şırovekırına meselan bıkın, bıgihêjın naveroka meselan. Wek gelên şareza û serwext lı heq û zagonan bıgerın. Ma çıkê me lı Tırk, Erebe û Farıs'an kêmıtre? Ew bûne dewlet û serdest, em jı bûne xulam û nokerên wan. Çı wext canê wan dıxwaze me dıkujın, qıra me tinın. Bawer bıkın, iro ew kalikê meyên cangori lı bıne erdê, turbên xwe de ku derkevın, kesên wek Kawa ê hesınkar bı hezaran mêrxwaşên mina wı, wê ew tû rûyê me bıkın, bibêjın" jı wera şerme, ku hûn iro bûne xulam û berdestê Tırk, Erebe û Farıs'an, heqê me lı we helal nebe, heqê me lı we xenim be, lı we herambe".

Lı nav civatê de Bay Bavikê Lodekan jı hebû. Mala Seyid Weli û Seyid Qemer talibên wı bûn. Eşıra bamasûr jı lı nav xwe de bûbûn Pir û rayberên hevûdu, keleyên xwe lı hevûdu bıriyabûn. Jı bona ew jı, lı ew şevê de Bay Bavk jı hebû. Bay Bavık miroveki pesn mezın, tıştên nebûyi lı zıkê xwe de derdixıst, mirov ecêb dıma. Bejna wı her kın, mina hacûc-macûceki bû. Lı jori civatê lı ser doşegê de jı rûnıştıbû, tızbi a xwe Keribar jı kırıbû nav

tılıyê xweyên du santi-metro, dikişand, şeqa- şeqa hewên tızbiyê bûn. Bay Bavikê Mızûri-Mızûr navê bavê wibû-lî dilê xwe de jî Aliekber ra hêrs ketibû, balam nedixwast ku hêrsa xwe eşkere bike, lê li şûna xwe de, xwe livand, dageriya ser civatê, jî civatê ra:

- Ez dibêjum em ev babetê biguhêrinin, ev gengeşî û raberzinên usa biterikinin, qal û behsa tışt-mıştên dîn bikin. Em dînhêrî cihan bûye Ehriman, mezinti, piçûkti nemaye; Pirti talıbtî nemaye, êdî hin kes qet guhdare Pir, Rayber û mırşûdên xwe nakin, ma ev gel çito bibe yek, hûn bibêjin? got û disa destpêka tızbi kışandina xwe kir. Lê ew gotinên Bay Bavik weka tirek her tûj li dil û kezewa Aliekber de çû xar. İcar Aliekber diyax nekır, carek dîn ket nav gengeşiyê û jî Bavikê Mızûr pırsiya, got" ma Bawa Sultan ev tıştên ku tu dibêji, ma ewana şert, şûrt û sazgehên Ola İslamın ?".

- Ango kijan şert, şûrt û sazgeh?

- Mesela sazgeha Pirti, Raybertî û Mırşûdtiyê. Li gor birûbawerîya te û birûbaweriyên ev civatê, ev sazgehên ku tu nav diki, ev sazgehana, gelo sazgehên Ola İslamın? Bî kerema jî mınra bibêje, navê van sazgehan li kijan rûpela Quranê de hatine nıvisandin? Quran zagona Ola İslame, divê tu bersivê bîdî mın, got û li benda bersiva Bay Bavik de ma.

Li pey ew pırsan de icar Bay bavik:

- Helbet ev sazgehana, sazgehên Ola İslamın, ma ev sazgehana, sazgehên Ola İslam nın, ên çine kuro?.

Aliekber dit ku Bay Bavik her xeyidiyaye, jî bona ew ji:

- Mexeyide, hêrsa xwe rameke Baba Sultan, tu xelîti, li zagonên Ola İslam û rûpelên Quranê de sazgehên Pirti, Raybertî û Mırşûdtiyê, sazgeha Kirivti û Misabtiyê tunenin. Gotinek bav û kalan heye, dibêjin" Kırına mırov, neynika mırove" Tu ku dızani bıaxife, ku tışteki nızani danışe guhdar bike". Lê ku bî rastî Quran zagona Ola

islame, Quran neynika Ola Îslame. Heke ku hene bı kere-
 ma xwe ji minra bibêje li kijan rûpelê de qal û behsa
 tîştên usa, wek sazgeha Pirtiyê, Raybertiyê, Mîrşûdtiyê,
 Kirivtiyê û Misaibtiyê dîke? Lê ez sedî-sed bawerim, ku li
 Quranê de qet tîştên usa tunin, Quran qet qal û behsa
 tîştên usa nake. Naha tu ji minra bibêje, ev sazgehana li
 ku ji mera usa mirat mane? ev yek. A duwem peyva Pir-
 tiyê bı Kurdiye, ku kesên sal mezin ra têtê gotin. Peyvika
 Rayber ji disa peyvîk bı Kurdiye, ji ew kesên ku rê û
 olaxên Oli li gel dane temaşekirin, ji wanra gotinê " Ray-
 ber". Peyvika Pêxamber ji her usa disa peyvek bı Kurdiye,
 ku ew kesê ku gel li ser rêça Oli de rêzkiriye û li dû xwe
 biriye, ji ew kesi ra ji Pêxamber gotine. Ango" pê-xwe-
 bir". Ku usa nine, bı kerema xwe tu ji min ra bibêje" na "
 û rûpelên Quranê li min temaşê bike got û li benda ber-
 siva Bay Bavîk de ma.

Hêrsa seyidan her rabûbû, dixwastin ku Aliekber li
 kevçiyek av de bixeniqinin, balam şerm dîkîrin, dîgotin"
 mivane". Ji ber ku nedîkaribûn bersivên Aliekber bîdîn.
 Bay Bavîk ji him li derece a Pirtiyêde bû, him ji Pirê wan
 hemûyan bû. Aliekber li ew gengeşiyê de serketibû, Bay
 Bavîk bersiv nedabû pîrsên Aliekber, li aliya zaninê de ew
 bînetibû. Dûra Seyid Welî babet guhart, qal û behsa pirti
 û raybertiyê kir û usa got:

- Êdi gel hatiye guhartin, ki ku du rojan diçe dibistanan
 xwe zana dîhesibine; Pir, Rayber û mîrşûdên xwe bir dîke,
 naxwazi çiralixê bîde Pir, Rayber û Mîrşûdê xwe. Gelek
 kes li rê derketine, vegeyriyane, Pir, Rayber û mîrşûdan
 nasnakîn, diçin mîzgeftan, nîmêj dîkîn, avdestê dîgîrin,
 diçin hec û rojiya Remezanê dîgîrin, angoo bûne kafîr
 çûne. Ax li serê me be, li ku derê maye ew wexta bav û
 kalikên me Seyid Mîstefa ê Axcê, Seyid Ali ê Seynûri û
 Seyid Abasê Kose. Mîrov li ev demê de talîbeki mina
 Wêrani Baba li ku ji xwera bibîne. Îro ew kijan mêr û
 talîbe ku mina Wêrani Baba dîke? Ev xortê me ji xwen-

diye, weka kesên lı rê derketi dixîfe. Herwaha Aliekber mivanê meye, divê em dilê mivan pırr neêşinin. Aliekber helbet nabe keseki mina Wêrani Baba.

Lı nav cıvatê û hemû guhdaran de Xidê naxırvan ji hebû, lê Xidê qet dengê xwe dernexist, bûrayê xwe û kesên dın guhdar dıkr û lı dilê xwe de" welleh eferim ji Aliekber ra, hemû Seyid nıkarıbin bersiveki bıdıne Aliekber. Aliekber lı van hemûyan zanatire. Liwık bı valayi zamanê xwe derbaz nekırıye; ez bawerım ev tıştana Aliekber lı ew mamosteyê xwe hınkırıye" got û dageriya aliya Seyid Weli, ji Seyid Weli ra:

- Bay Seyid Weli, te qal û behsa Wêrani Baba kır, gelo ew kesa kiye? Wi çı kırıye ku tu dibêji" kanê talibên mina Wêrani Baba?".

Lı ser ew pırsa Xidê, icar Seyid Weli:

- Xıdo çawa ku tu ji dızani, gundiye me em hemû seydın, xısmên hevın, newiyên Bamasûrın. Bay Bavık ji lı lodekan hatiye mala me, ew ji mina Aliekber işev mivanê meye. Bay Bavık hım Pirê meye, hım ji lı dırva ew xısmê meye; em endamê eşirekine. Em hemû ji lı hın ciyan de pirtiyê, lı hın ciyan de raybertiyê, hın ciyan de ji mırşûd-tiyê dıkn. Ez bawerım ev kesên ku naha lı vır mivanê mene, evana hemû çiroka Wêrani Baba dızanın. Balam ji bona pırsa te, heke ku pirê me Bay Bavık destûrê dıde mın, ez ji tera û Aliekber ra çiroka Wêrani Baba bıbêjum, got. Lı ser ew gotına Seyid Weli, vêca Bay Bavık:

- Fermo bavê mın, ew çı gotına tu dibêji, tu bıaxıfe, destûr dayin tenê heqê Xwedê û Şah Bamasûre. Ev camêra dıxwaze lı ser ew çiroka Wêrani Baba agadar û serwext bıbe. Dûra bıla Aliekber ji ew çirokê guhdar bıke û bıbıhise. Ji bona wi bêtır gırıngê, got û destûr da Seyid Weli, ku ew çiroka Wêrani Baba ji Xidê naxırvan û bûrayê wi Aliekber ra bıbêje. Lı pey destûr dayina Bay Bavık de, Seyid Weli:

- Zor spas Bawa, tême destên te dıramisım, ez naha ew çirokê ji ev mivanê me ê hêja ra bîbêjım, bîla Aliekber qenc guhdar bıke, hûn ji piçeki dengê xwe dermexinın, ta ku mın dawiya çirokê ani, got û destpêka axaftına çiroka Wêrani Baba kır û waha got:

- Belê, li zamaneki de miroveki dilsoz, dırıst, xudan birûbaweri, xudan Pir, Rayber û Mirşûd, xudan mal û hebûn hebûye. Kar û pişe ê-sanat-wi mirovi Goştfiroş -kasap- bûye. Ew mirov li dari cihan de tenê xudan kureki bûye. Navê kurê ew mirovi Wêrani bûye. Wêrani li pişti neh-deh salina xwe de, li gundeki gelek dûr de ji xwera hevaleki dibine û dûra ew herdu heval dıxwazın ji hevra bîbın mısaiib. Bavê Wêrani û bavê ew lawikê dın ji ew bıryar û daxwaziya kurên xwe tinın cih û Wêrani û ew lawik ji hevra dıbın, mısaiib, dıwa xwe dıstinın û dıkevın bın tariqeta şert û şürtên sazgeha mısaiibtıyê, iqrarê dıdın hevûdu. Bavê Wêrani li jiyana xwe a goşt fırotınê de, sibê de heya niv rojê, goşt beleş, bêt dırav dıfroşe, pişti niv rojê ji, bı dırav dıfroşe. Ew camêra heya roja xwe a mırınê ji, ew karê xwe werge dımeşine. Bavê Wêrani ji kurê xwera qesrek bı çıl ode çêdıke, lê deriyê oda jumar çıl'i qet ji keseki ra venake. Ji kurê xwe û jına xwera dibêje" ev oda, ode a Pir, Rayber û Mirşûdê mine, xêncı ewana ez qet naxwazım keseki dın gava xwe bavêjê hındırê ev odê". Bavê Wêrani her tım derê ew odê koç dıke û kilitê ji dıke bêrika xwe. Mehe û sal derbaz dıbın, Wêrani mezin dıbe, dıbe xorteki bıst salını, xorteki her çeleng û spehi, kamıl û bıraqıl. Wêrani ji her roj li tev bavê xwe dıçe fırotgeha xwe a goştfiroş de, ji bavê xwera arikari dıke û goşt dıfroşe. Ew ji lıgel bavê xwe dibê goştfiroşeki hêja, goştfiroşeki nav û deng û qedır bılınd. Rojeki Wêrani li mal derdıkeve der, dımeşe ku bıçe fırotgeha xwe ji bavê xwera mina her roj arikari bıke. Heyam ji demsala havinê bûye, icar li rêva Wêrani ti dıbe. Xwe dıgihêjine ser kaniyê, ku avê vebıxwe, dibine ku ewe keçıkek zor bedew li ser ava ka-

niyêye, bî merşeveki va cerê xwe tiji av dîke. Lî ew demê de Wêrani jî keçîkê ra" xwişka delal, ma keyse ku tu kasek av bîdi mîn, hîndê ez geleki ti bûme" dibêje. Keçîk jî merşefê tiji av dîke" fermo birayê delal" dibêje û merşefa avê dirêje Wêrani dîke. Wêrani jî merşefa avê dîgire-, av a xwe vedixwe, jî keçîkê ra carek dîn" zor spas xwişka delal" dibêje û diçe fırotgeha xwe, jî bavê xwera arikari dîke.

Lî ser ew rojê de heyamek derbaz dibe, icar rojeki bav û dayika Wêrani li gel kurê xwe de rûdîmîn, jî Wêrani ra:

- Kurê mîn êdî em kal bûne, jî ev malê ra bermaliyek dîvêt, bermaliyek pêwîste; êdî wexta te a zewacê jî hatiye, em dixwazîn te bîzewicînîn, gelo tu çî dîbêji" dîbêjîn. Wêrani jî lî pey ew gotîn û pêşneyara dê û bavê xwe de:

- Welleh hûn dîzanîn, hûn ku çawa mînasib dîbînîn, werge bîkîn. Hûn dê û bavê mînin, ez qet nîkarîbîm ku jî wera tîşteki bîbêjîm, dibêje û dengê xwe dîbire.

Lî piştî ew şewîrandîna dê û bavê Wêrani de çendek derbaz dibe, nabe, dê û bavê Wêrani dîçîn ew keçîka ku Wêrani lî ser kaniya avê de dîtîbû, jî wêra" xwişka delal kasek av bîde mîn" gotîbû, ew keçîkê jî Wêrani ra dixwazîn, qelînd dîdîm, dermalê datînin û roja dawetê jî pêdan dîkîn û dadîgerîm mala xwe. Roj tê icar gazi der û cinaran, heval û hogîrên xwe dîkîn, balyozeki jî dîşînin pey mîsaibê Wêrani, nûçe a dawetê jî wîra jî dîşînin, def û zurne tînin û destpêka dawetê dîkîn. Çîl roj û çîl şev dawet berdewam dîke, balam mîsaibê Wêrani nay dawetê. Jî bona nehatîna mîsaib, xorteki dîn dîkîn wekilê mîsaib û Wêrani lî tev ew xortî diçe ser sîvingê sêvê davêje ser delaliya xwe û dadîkeve jêr diçe maleki, dûra xort Wêrani dîbîn dîkîn hîndîr û lî hev belam dîbîn dîçîn malên xwe. Lê wexta ku Wêrani dîkeve hîndîr odê diçe paş pêrigê, ku lî delaliya xwe şabîbe, dîbine ku, ewe ew keçîka ku lî ser ava kaniyê bû, Wêrani jî wêra" xwişka delal ez geleki ti bûme, bî kerema xwe kasek av bîde mîn" wê keçîkê jî kase

tji av kırıbû dabû Wêrani" fermo bırayê delal" gotıbû ew keçıke, dê û bavê Wêrani jı Wêrani ra anine. Wêrani çawa ku ew keçikê dibine lı şûna xwe de werge sar dibe, hışk dibe dumine, qet nızane ku çı bıke û jı keçikê ra çı bıbêje. Dûra piçek aqıl tê serê Wêrani, Wêrani dadigere ser keçikê, jı keçikê ra usa dibêje:

- Ez bawerım qenc tê bira te. Nêzıka du sal beri lı ser kaniya avê, mın jı tera" xwişka delal kasek av bıde mın" gotıbû, te jı merşef tji av kırıbû dabû mın, jı mınra" fermo bırayê delal" gotıbû. Naha jı ez dibinum bav û dayika mın tu jı mınra anine. Ma ez naha tera çıto bıbêjum tu bıbe jına mın? Çıto ez bıkevım paşıla te? Ez çıto bıbım mêrê te û tu jı bıbi jına mın? Na Xwedê neke, tu xwişka mına axıretêyi, dibêje û nakeve paşıla ew keçıke. Lı pıştı ew gotınên Wêrani de, keçık jı, jı Wêrani ra:

- Raste, me jı hevra werge axaftıbû, te jı mınra "xwişkê, mın jı, jı tera bira" gotıbû, naha jı lı vıra divê em lı ser ew soza xwe bısekımın, bı çaveki xwişk û bıratıyê lı hevûdu mêzekın; iro şuva tu bırayê mını, ez jı xwişka te, dibêje û lı ew odê de mina xwişk bıraki bı gelhev radızın.

Lı ew şevê de, ew herdu cıwan bıryar dıdın ku jı hevra bıbın xwişk û bira, qet kesek jı nezane; dê û bavên wan jı meselê nezanın. Lı ew demê de Wêrani jı keçikê ra usa dibêje:

- Ramanek mın heye, em bıbêjum, nebêjum jınên gund sibe wê werın mala me, lı xwına çarşefê bınhêrın, wekil misaibê mın jı, işev lı derva lı me bıpê û lı mın bıpırse, bıbêje" tu guri, yan rovi'yê". Ango evana hemû wê bıbın û werın serên me. Divê ez jı wekil misaibê xwera derewan bıkıım, bıbêjum "ez gurım". Jı bona çarşefê jı, ez dibêjum ez pozê xwe xwın bıkıım û xwına pozê xwe lı çarşefê ra kım û jınan usa bıxapınım, dibêje. Wêrani werge jı dıke û tev keçikê mina bıraki keçikê radıze, çı bıryar lı nav xwe de standıne, wana jı hemûyan tine şûnê, herkes jı wana jum û mêr dızane. Mehek derbaz dibe, nabe, dê û bavê Wêrani ne-

xwaş dıkevın û lı pey hev zıkê du heftan de dımırın û dıçın dıgihêjn rama Xwedê. İcar hemû kar û ber, fırotgeh lı stuyê Wêrani de dımının. Wêrani ji mina bavê xwe sıbê de heya niv rojê goşt bêt dırav dıfroşe, lı pışti niv rojê şuva ji, bı dırav. Bı ew rewşê va roj û mehe derbaz dıbın dıçın. Rojeki mısabê Wêrani selıkeki tiji şır dıke û rêdıkeve dıçe mala mısabê xwe. Wexta ku mısabê Wêrani xwe dıgihêjine mala mısabê xwe û lı dêri de dıkeve hındır, dıbıne ku Wêrani lı malda nine, lı mal de, ew keçıka ku lı dılqê jına Wêrani'daye, ew lı maldaye. Çawa ku mısabê Wêrani dıkeve hındır, keçık ji jı mivan ra" tu xêr hatı" dıbêje, selıka şır lı destê mivan de dıstıne û dıbe lı mıxê stuna odê de dardadıke, şûnê ji lı mivan dıde temaşekırın û mivan rûdıne. Bı xwe ji derdıkeve der lı keseki dınhêre, ku keseki bışıne fırotgehê nûçê bıde Wêrani, ku bıbêje mivaneki Xwedê hatiye mala te. Lı derva keçık lawıkeki neh-deh salnı dıbıne û jı ew lawıka ra dıbêje " bı kerema xwe bıçe fırotgeha me jı Wêrani ra bıbêje mivaneki te hatiye, selıkek ji tiji şır kırıye, lı ew selıka mivan de şır dılop nake û naherıke, bıla nesekıne were mal". Ew lawıka ji dıçe ew gotınên jına Wêrani, yek bı yek jı Wêrani ra deng dıke, balam Wêrani qet mısabê xwe nayne bıra xwe, dıbêje" başe, tu bıçe jı amojına xwera bıbêje, bıla ew xızmeta mivanê Xwedê bıke, lı pışti seateki de ez fırotgehê dadıdım û têm mal". Ew lawıka ji dadıgere mala Wêrani, gotınên Wêrani jı jına Wêrani ra dıbêje û dısa dıçe tev hevalên xwe dıleyize. Dûra jınık derê oda mivan vedıke, dıkeve hındırê oda mivan çıtıka xwe ji lı ser rûyê xwe de radıke davêje ser kumê xwe, destpêka rewş dem pırskırına mivan û xızmeta mivan dıke. Lê çawa ku çavên mısabê Wêrani lı hındava keçıkê dıkeve, lı hındava keçıkê dınhêre, vêca nêta xwe xırab dıke, Ehrımanıyek dıkeve dılê mısabê Wêrani, ew dıl berdıde jına mısabê xwe, bı çaveki bed lı jına mısabê xwe dınhêre. Lı ew demê de şır lı selıkê de dıke şıre-şır û dırıje, dadıkeve ser erdê. Çawa ku şır lı

selikê de dirîje û dadîkeve ser erdê, lî ew demê de mîsaibê Wêrani lî xwe dîhese, şermezar dîbe, berxwe dîkeve, şerm û fedi dîke û radîbe derdîkeve der û berê xwe dîde aliya gundê xwe û dîçe mala xwe. Dûra Wêrani tê mal ku mivan lî malda tune. Lî jîna xwe pîrs dîke, jînk ew çirokê, seri de heya dawiyê jî Wêrani ra deng dîke. Jî bona ew bûyerê Wêrani jî jîna xwera:

- Dilê wi ne paqij bûye, dilê wi dileki gemarin bûye, lewma jî ew şîr lî selikê de herîkiyaye. Xem nake jî mînra mîsaibeki werge ne pêwîste, dibêje.

Belê, ew dîlgemara dîçe, lê bî hêkmeta Xwedê wexta ku ew dîlgemara bî dileki pis lî ew keçikê dînhêre, bî ew nîhêrandîna ew dîl gemari va îcar keçik lî zarok de nexwaş dumine, dîbe ducan. Keçik ew rewşa xwe jî Wêrani ra dibêje û Wêrani jî" em çî bakîn, ev hêkmeta Xwedê ye, Xwedê ev xêr bîke" dibêje û dengê xwe dernaxine. Ez serê we neêşînum Xîdê mîn, lî pîştî neh mehan jînk duxwaskan dîbe, kureki mîna nûr dîwelîde tê cîhan. Beri ku çîl'ê ew pîtkî derkeve, lî roja sî û neh, pîştî niv rojê de, mîroveki pîr û kal, sîwari lî ser hespek qîr de dîkeve pêş derê qesra Wêrani, lî hespa xwe peya dîbe, yekser derê qesrê vedîke û dîkeve hîndîrê qesrê, qet keseki ra jî tîşteki nabêje, lî ber derê sî û neh odan de dîmeşe derbaz dîbe dîçe pêş derê oda jîmar çîl'i, derê odê vedîke û dîkeve hîndîr, dîçe lî koşeyê jorin, lî ser doşegê de rûdîne. Çawa ku jîna Wêrani ew hatîna kalo û rewşa wî a ketîna hîndîr qesrê û derî vekîrîna oda jîmar çîl'i dîbine, ecêb dumine, balam qet tîşteki bî taybetî nayne bîra xwe, xwe bî xwe ra dibêje" mivaneki Xwedê ye, hatiye mîvandariyê". Dûra disa zarokeki dîşîne pey Wêrani, nûçe jî Wêrani ra dîşîne, dibêje" bî kerema xwe bîçe jî Wêrani ra bîbêje, mivaneki usa-usa hatiye, lî oda jîmar çîl'i de rûnîştîye, lî benda tedaye. Ew zaroka jî dîçe nûçê dîde Wêrani, balam Wêrani qet tîşteki nayne bîra xwe, nayne bîra xwe ku oda çîl'i koçkîrî û dadaiye, kilit jî lî bêrîka wîdaye. Ew tîştî qet nayne bîra

xwe ku wi kesi çito derê ew odê vekiriyê. Dûra Wêrani ji ew lawikira dibêje" biçê ji amojîna xwera bibêje, bila karguzariya mivan bike, piştî heyamek herî kurt de ez dadigerim mal". Lawîk ji dadigere ew gotinên Wêrani ji jîna Wêrani ra dibêje û diçe. Lî piştî heyamek herî kurt de Wêrani mina her roj derê firotgeha xwe dadîde, koç dîke û bî lez dadigere diçe mal; dibîne ku bî rasti jî ewe miroveki herî kal, dest pêçayî, kînc kevn, qîlêr û pine, lî ser doşega oda jumar çîl'î de rûniştîye, bî destê xwe ê çepê va tîzbi a xwe dîkşîne. Lî hember ewqas tîştên ecêb de, disa qet tîstek nayê bira Wêrani. Bî ew şiklî va Wêrani xîzmet û azeta mivanê xwe dîke heya dema şiv xwarinê. Dûra jîna Wêrani şivê amade dîke tîne dîde ser texte û mivan fermo dîke, ku mivan rabe lî tev Wêrani lî ser sîfrê danîşe û şiva xwe bixwe. Mivanê kal jî, jî jînikê ra spas dîke, radibe diçe lî tev Wêrani lî ser sîfre a xwarinê de rûdîne. Lî destpêka şiv xwarinê de icar mivanê kal kevçî dîke destê xwe ê çepê bî destê çepê va xwarinê dibe devê xwe. Jî bona ew rewşa mivan, nan xwarîna destê çepê, Wêrani lî mivanê kal pîrs dîke, dibêje" Ya pîri kal, mivanê Xwedê, ma çîra tu bî destê xwe ê çepê va xwarinê dibî devê xwe dixwî? Ma çîra te ew destê xwe ê rastê pêçaye, tu bî destê xwe ê rastê va xwarinê nabê devê xwe û naxwî ? Gelo te çîra ew destê xwe ê rastê pêçaye ?". Lî ser ew pîrsên Wêrani, icar mivanê kal jî malxwe ê malê Wêrani ra usa dibêje:

- Kurê min tu lî qîsûrên min menhêre, divê ez bî destê xwe ê çepê va xwarinê bixwîm, xêncî ev havîlek dîn tune. Jî ber ku destê minê rastê kule, lî nav birinek her xîrabdaye. Jî bona ev e ku, ez bî destê xwe ê çepê va xwarinê dixwîm.

Lî pey ew gotîna mivanê kal, vêca Wêrani disa dipirse. dibêje" Ya pîri kal, gelo çî hat serê ev destê te û destê te birin bû, kul bû? Ma te jî bona ev kul û birîna xwe qet dermanek û bijîjkek nedit?".

Lı pey ew pırsa Wêrani de, icar kalo:

- Belê, ez bı salan geriyam ku jı ev kul û birina destê xwera bijijkeki, dermaneki bıbinım, lê sed mıxabın ku mın ne bijijkek dıt, ne ji dermanek. Jı ber ku ew derman bı hêsayi naye dıtın. Gor ku jı mınra gotın, tenê dermanek heye, ew derman ji kesek nade mın.

- Çıto dermanek heye û kesek nade te ? Bı kerema xwe jı mınra bıbêje ew çı dermane û çıra kesek nade te ? Dıvê tu mın agadar bıki, ku ez ji zanıbım. Bıbe ku lı ser ev meselê ez jı tera arikari bıkıım, dıbêje Wêrani.

Lı ser ew israr û tıkakırına Wêrani, mivanê kal jı Wêrani ra:

- Bû kurê mın, ez jı tera ji bıbêjım. Welleh tenê dermanek heye, ew ji serjêkırına zarokeki çıl rojıniye. Heke ku mirovek pıtıkeki xwe ê çıl rojını serjêbıke, xwına ew pıtıki lı ev kul û birina mın ra bıke, wê ev kul û birina destê mın qenc bıbe û ez bıgihêjım tendurustiya xwe a beri û destê xwe ê rastê ji disa mına beri bıkar bınim û bıxebıtım. Na, ku kesek ew kari neke, ez heya roja mırınê ev derdê kul, birina destê xwe bıqşınım û destê xwe ê çepê bıdıım xebetê û bıkar bınim, dıbêje û dengê xwe dıbırine.

Lı pışti ew gotına mivanê kal, icar Wêrani pê destê jına xwe dıgıre û dıbe oda pıtık, derê odê dadıde û jı jınıkê ra:

- Te bı guhên xwe va ew gotınên mivanê Xwedê bıhistım. Kalo bı salane ku ew derdı dıqşıne. Tu ku guhdar mın dıki were em ev pıtıkê xwe jı ev mivanê Xwedê ra serjêkıın, xwına ev pıtık lı kul û birinên destê mivanê Xwedê ra bıkıın, bıla ev kalê reben lı ev derdı felat bıbe destê wı qenc bıbe, dıbêje Wêrani.

Lı pey ew pêşneyar û daxwaziya Wêrani de, jınık piçeki dıhênje û dúra jı Wêrani ra:

- Te ku bı rasti nêt kıriye, te ku bı dılda ev bıryar standıye, ez ji, jı tera dıbêm "erê". Ev xêrek jı Xwedê'raye, Xwedê mezıne, wê rojeki em disa bıbın xudan zar û zêç. De rabe em liwık bıgırın bıbın serjêkıın, xwına liwık lı

destê ew kalê reben ra kın û wi lı ew derdi de felat bıkın, dıbêje.

Belê, ew herdu dılpakên hêja bı hevra bıryar distının û radıbın dıçın lı dergûşê de ew pıtıkê çıl rojını derdixının dıbın ba mivanê Xwedê, tekbir dıqxının "Ya Xwedê" dıbêjin û ew zarokê çıl rojını serjêdıkın, xwına pıtık jı kul û birinên destê kalo ra dıkın, disa seri û bedena pıtık dıgırın tının dıkın hındirê dergûşê, mina beri radımedının, dadıgerın jı mivanê xwe ra "şev baş" dıbêjin û dıçın lı odayên xwe de dıkevın nav nivinên xwe û radızın dıkevın xewa kûr. Lı pıştı nivê şevê de, lı ser qırin û gazına pıtıkê ser jêkırı de hişyar dıbın hıldıfırın serxwe. Lı destpêkê de xewn fêmdıkın, balam dıbının û dıbıhısın ku ewe lawık xwaşe, mina beri lı dergûşa xwe de dıqire û dıgire. İcar xwe şaş dıkın lı şûna xwe de sar dıbın duminın. Herdu ji, bı xwe bı xwera" gelo ev xewne, ev xeyale, ev çı ecêba girane, me ev lawık serjêkırıbû, çawa dıbe, ku ev lawık carek dın lı xwe dıhese û jındewer dıbe?". Lı dawiyê de dıbının ku qırin û gazına lıwık her zêde dıbe. Herdu lı nav nivinên xwe de radıbın dıçın ba dergûşa pıtık, ku pıtık ew pıtıkê wan ê berêye. Dûra dadıgerın oda mivanê kal, dınhêrın ku mivan ji lı odê de tune. Dıçın axur lı hespa mivan dınhêrın, hesp ji lı axur de tune. Lı pey ew hemû hêkmetên Xwedê de, icar Wêrani destpêka giri dıke, lı xwe dıxine, dıbêje" ev çavên mın çıto kor bûn, ku mın ew pirê xwe ê balyozê Xwedê nasnekır? Ma çıra mın bı ev destên xwe va xızmeta pirê xwe nekır? Ma çıra ez bı ev şeq û lıngên xwe va bervi pirê xwe va neçûm? Ma çıra ev mêjo û aqlê serê mın jı mınra negotın ev pirê teye? dıbêje û lıxwe dıxine. Lı berbanga sıbê de gazi hevaleki xwe ê goştıroş dıke, xençerek mezın dıde dest hevalê xwe, jı hevalê xwera dıbêje" bı kerema xwe tu mın serjêke, her perçeki bedena mın ji lı alıyeke va bavêji, jı teyr û tûran ra bıki xwarın. Hevalê Wêrani çı dıke, nake, Wêrani dıbêje" na û na, divê tu ev tıka mın bını şûnê". Hevalê wi

ji Wêrani serjêdike û her perçeki bedena Wêrani davêje aliyeki. Hemû der û cinar ji li ew pêşdariyê dînhêrîn, dîgirîn, dîkîn qirin û gazin, lê mêrik tîka hevalê xwe tine cih. Li dest ew hevalê Wêrani de tenê perçeki bedana Wêrani dumine, nîşka ve sıwariyek li ew demê de derdikeve, jî goştîroşê hevalê Wêrani ra:

- Bisekîn, êdî bese, dibêje û li hespa xwe peye dibe, tê jêr. Dûra bî dengêki bîlînd va" hemû perçeyên bedana Wêrani werin ba hev" hemû perçe li eyni hûrdemê de tên ba hev. Hemû kes ji, li kalê sıwari dînhêrîn, şaş û dîndîbîn. Dûra kalê sıwari pineki li perçeyên bedena Wêrani dîxine, dibêje" rabe serxwe, bîbê zat û sıfateki nû, were meydanê". Yekcar Wêrani hîldîfire serxwe, dîbine ku ew kalo ê mivane, hemû der û cinar ji li dora Wêrani de kombûne. Wêrani xwe davêje lîngên kalo maçdike, lê li ew demê kalo:

- Îro şuva navê te Wêrani Baba ye, tu dîkarîbî jî ev keçîkê ra ji bîzewîci. Jî ber ku tu mîrî, nûva hati cihanê iro şuva ev keçîka jîna te û hevala te a axretêye, dibêje û li ber çavan de wenda dibe, dibe raz dîçe. Wêrani Baba ji nûva mara xwe dîbire, jî ew keçîkê ra dîzewîce, dîçe dîgîhêje mîrazê xwe. De naha tu jî mînra bîbêje Xîdo ew kîjan talîbe ku jî bona pîrê xwe, xwe dîkuje? Eve, hemû mesele ev e; ez bawerim te û Aliekber naveroka ev çîrokê fêmkîr.

Seyid Weli dawîya çîroka Wêrani Baba anî û li Aliekber pîrsiya:

- Êh xortê delal tu çî dibêjî li ev çîroka Wêrani Baba ra, jî mîn ra bîbêje? got. Aliekber nexwast ku bersîveki bîde Seyid Weli. Jî ber ku hemû kesen pîştîgîriya Seyid Weli dîgirt. Ew çîrok ji derewek wana hevpar bû. Dûra maf û berjewendiyên hemû seyîdan li çîrokên werge de hebûn. Pîraniya wan nedîxwastîn ku rastîyan jî talîbên xwera bîbêjîn. Aliekber ji ew yeka qenc dîzaniya. Dûra Aliekber ku tîşteki bêtîr pêşva bîçûna, pêle ranên wan bîkîrana, wana hum Aliekber bî qenci bîkutana, hum ji gîlî

bıkırana, Aliekber bıdana destê leşkerên Romê, lı mamostetiye de biavitana der, bıkırına girtixanê. Jı bona ew ji Aliekber dengê xwe dernexist, got" ez nızanım çı bıbêjum, ev baweriya weye".

Xidê naxırvan çirokên werge zef hezdıkır. Jı bona ew ji lı Seyid Weli tıka kır ku, Seyid Weli jı wira qal û behsa çiroka kûsi û hırçê ji bıke. Seyid Weli ji dilê Xidê neşıkand û usa destpêka çiroka kûsi û hırçê kır:

- Belê Xidê mın; lı mêj de kûsi û hırç ji mina mın û te mırov bûne. Rojeki pirê kûsi radıbe dıçe mala talıbê xwe ê nav kûsi. Kûsi ji mıroveki her temahkar bûye, hezkırıye malê cihanê bûye. Ew her sal lı Pir, Rayber û mırsûdê xwe reviyaye, ku çıralıxê nede Pir, Rayber û mırsûdê xwe. Lı ew rojê de ji disa lı pirê xwe reviyaye, çûye xwe lı nav êzing û qalíkên êzingan de vêşartiye; jı jına xwera ji gotiye" tu bıbêje kûsi lı malda nine, çûye bajêr, jı bona dayin-standınê". Lê ew derew û tevgera kûsi lı pir eyan bûye. Pir çawa ku ketiye hındır mala kûsi, jına kûsi çûye destê pirê xwe maçkırıye, rewş û dema pirê xwe pırsiyaye, icar dūra pir lı jına talıbê xwe ê nav kûsi pırsiyaye, gotiye" talıba mın, ma talıbê mın kûsi lı kuye?". Jınıkê ji gotiye" welleh pıro kûsi çû bajêr, wê çend rojên dın şuva bê mal". Çawa ku pir lı jınıkê ew bersiva standiye, hêrs ketiye çûye lı der, kûsi lı nav maxa êzing û qalíkên êzingan de ditiye, pinek lı êzing û qalíkên maxa êzingan xıstiye, jı kûsi ra" Xwedê û Ceddê mın te bıkın heywanek, lı nav qalıkeki zexm de bıhêlinın, her tım tu lı ser zıkê xwe de bımeşı". Xwedê ji ew nıfır û daxwaziya pir pejırandiye. kûsi kırıye ew rewşa iroin.

Navê hırçê ji Hesên bûye. Hesên ji mina kûsi mıroveki temahkar, mıroveki malhez bûye. Ew ji her sal lı Pir, Rayber û mırsûdê xwe reviyaye, ku çıralıxê nede keseki. Rojeki pirê Hesên dıçe mala talıbê xwe ê nav Hesên. Hesên ji dıçe xwe lı nav çermeki pırçıkın de vedışêrine, jı jına xwera ji dibêje" jı pir ra bıbêje Hesên lı mal nine".

Ew tevgera Hesên ji li pir eyan dibe. Pir bi ew zanina xwe va li derê Hesên de dîkeve hîndir, silav dîde jînikê, rewş dema jînikê pîrs dîke, dûra dîbêje" talîba min, Hesên li kuye" jînik ji dîbêje" Hesên li mal nine, nîzam çûye ku". Li pîştî ew gotina jînikê pir dîçe Hesên li nav ew çermê pîrç de dîbine, pineki li çerm dîxine û dîbêje" Xwedê bîla te ji bîke hîrç, derxine ser çiya û kaşan, nav dar û darîstanan, bîn sar û serman, berf û pûkan de bîhêline, bîla mîrov bîbîn dîjminê te. Xwedê ji ew nîfira pîrê Hesên dîpejirine û Hesên dîke hîrç û berdîde ser çiya û kaşan, nav dar û darîstanan, dîke bîn berf û pûkan. Ew roj, ev roj, rewşa kûsî û hîrçe li me hemûyan eyane Xîdê min. Jî bona ew e ku em Kurd jî hîrçê ra" Apê Hesên " dîbêjîn. Ango nîfirê Pir, Rayber û mîrşûdan, Xwedê dîpejirine, Xwedê nîfirên wan li keseki neke, amin.

Li dawîya wan çîrokan de, Aliekber li dilê xwe de" errr, Xwedê mala van bîşewitine, evana evqas derew û efsane li ku derxistîne, ev tîştana li ku afirandîne; vana qet dîbîstan ji neditîne, nexwedîne, gelo vana ev çîrokana li kijan pîrtûkê de ditîne? Kê jî van ra ev derewana kirîne, bî rasti mîrov ecêb dimîne" got.

Belê, pîraniya gel çîrokên werge zor hezdîkîrîn, lê raberzîn û gengeşiyên rêzani dîrdîketîn. Ango gengeşiyên politik li pîrr kesan xwaş nedîhat. Jî ber ku gel li dîrveyiyê karên politik de bûn. Mêjoyên gel bi çîrok û efsaneyên Olî û derewan va tîji kirîbûn. Gotîna û gengeşiyên politik serê pîraniyan dîşand. Gelê belengaz her tîşt li Xwedê hêvi dîkîr; li Eli û Mihamed hêvi dîkîr. Bî taybetî seyîdên Dêrsîm jî Eli ra" ew Xwedê bî xweye" dîgotîna, Eli Xwedê dîhesîbandîna. Aliekber ji ew meselana qenc dîzaniya. Li ew navberê de şiv amade bû, hemû kes li dora Zerfetê de kombûn. Li pîştî xwarîna û dest şoştîna de, disa herkes dagerîya li şûna xwe rûnişt, îcar Seyîd Abasê kurê Mîstefa ê Korta Reş xwast ku ew ji çend tîştan bîpeyive. Seyîd Abas bî rasti mîroveki her dîlsoz û her spehî bû. Li

gund de tenê Seyid Abas û Avdilah ê Şaribanê nıvisa Erebi dıxwendın, wana meyit dışoştın, wana Quran dıxwedın. Lı roja cejna Xızır û roja xêr dayına mıriyan de, disa wan herduyan Quran dıxwendın. Xêncı wan, yeki Quran xwenda ji, Hesê Weli Hesê bû, balam qet keseki Hesê Weli Hesê heznedıkır, keseki hêja nedıda wi. Lı ew şevê de Hesê Weli Hesê û Avdilah ê Şaribanê tunebûn, Aliekber ew nasnedıkırın. Lı pişti piçek bêdengiyê de Seyid Abas xwast ku cıvat tışteki bıaxıfe û tışteki bıbêje. Jı bona ew ji, Seyid Abas berê xwe guhart ser Aliekber, jı Aliekber ra:

- Xortê delal, em hın kes meselan qenc dızanin, tu guh mede nezanan, nezan her tım nezanın. Guneyê nezanan ji pırr tune. Jı ber ku şert û şürt jı bona gelek kesan çênebûne. Herwana em tıştên usa cıhbıhêlinin, werın ser babetaxwe. Çawa ku tu ji dızani, lı heyama şerê tevgera çiyayê Agır de, hukma Romê êrişek ji da ser eşıra Koçan. Eşıra Koçan ji, eşirek me Dêrsunıyane. Bı taybeti lı geliya Ali de -Ali boğazi- lı nav pêşmerge û leşkerên Romê de şereki gewre derket, gelek rojan ji ew şer berdewam bû, pırr kes hatın kuştın. Leşkerên Tırk çend gund ji şewı-tandın, kırım, pag, hemû hebûna wan gundan şêland. Lı dawiyê de pêşmergan dırbên mezın lı hukma Romê xıstın û hukma xwinxwar şuva kışiya û çû. Gelek kesan jı meraqal û behsa mêraniya pêşmergan û ew şeri dıkırın. Gor ku dıgotın "Husê Kopê" tenê bı serê xwe lı şeveki de tevahiya gıvalek-bölük-dıjmin hemû kuştıne. Bı rasti wexta ku me ew nûça bıhist serê me gihişt esmanan, em bı mêraniya "Husê Kopê" va serbılind bûn, dılşa bûn, kêfa me hat. Çıra gotıne "Xwin nabe Av" eyni usa. Lı pey ew me bıhist ku hukma Mıstefa Kemal, ango lı sala 1927'an de, lı welatê me de sazgehek nû vekıriye, gelo ew çı sazgehe? Lı nav de sal derbaz bûn, em hina ji lı ser ew sazgehê de agadar ninın. Ez dıxwazım tu me lı ser ew sazgeha hukma Romê ji agadar bıki. Xêncı evana çı dıqewımın, çı dıbın em nızanın. Rojên me lı ser van erdan û çıyan de derbaz

dibin dıçın; lı ev cihanê de çı dıqewımın em nızanın û nabıhısın. Tu hum mamosteyi, hum ji lı bajêr de dji. Jı bona ev em bawerın nûçe a te lı ser gelek tıştan, bûyer û qewımandınan heye, gelo çı dibın, çı dıqewımın, tu dıkarıbi jı mera bıbêji û me agadar bıki?.

Lı ser ew pırsên Seyid Abas de, icar Aliekber:

- Ser serê mın bawa, ez qasa zanina xwe hin tıştan jı wera bıbêjum. Belê, raste çawa ku te ji got, lı sala 1927 an de, hukma Romê lı welatê me de sazgehek nû vekır. Ew karê Romê ê sedsalane, gav bı gav hate kete welatê me û welatê me dagırkır. Ez bawerım ew ji gava hukma Romê a dawıye, dıxwaze ku Dêrsım ji bıke bıne bandûra xwe. Ew sazgeha ku tu dibêji "Sazgeha çavdêriya gişti" ye. Ew sazgeha bı taybeti jı bona pırsa me Dêrsımıyan hatiye sazkırın û lı ser rewşa Dêrsım dısekınê, lı tevgera Dêrsım dınhêre û sehêt-kontrol-dıke, ev yek. A duwem Mıstefa Kemal û dewleta wı a bêt ram bıyar standıne, dıranên xwe ji her tûj kırıne, ku gelê Dêrsım ji gez bıkın, Kurdên Dêrsım lı kevçiyek av de bıxeniqının, bıkujın xwına kurdan bırijının, goşt û hestiyên me Dêrsımıyan ji bıxwın û bıkojın; balam lı yek çareki de, lı yek rojeki de nıkarıbın ew barbarıyan bınn cih. Bınhêre naha ew çı dıkın? Naha jı ew hukma bêbext casûsên xwe kırıne nav gel, çaşan jı xwera dibine û dıkirre bı destên wan çaş û bêbextan raza tevgera Dêrsım distine, eşıran lı tevgerê dır dıxine, malbatên rêberên tevgerê berdıde serhevûdu. Gor ku dibêjin naha va bıraziyê Seyit Ali Rıza, Rayber kırriyane. Jı ber ku lı navbera Seyit Ali Rıza û Rayber de dubendiya erd û zevıyan heye. Jı bona Şahan axa ê eşıra Bextıyaran jı, disa dibêjin, dewleta Romê dıxwaze ku tışteki bine serê Şahan axa jı. Lê em hêvi dıkın ew tıştana nebın, Kurd dost û dıjminên xwe qenc nasbıkın. Erê gelek eşir lı tevgerê dırketine, balam tevger lı bınn serokatiya Seyit Ali Rıza, Alışêr, Toxtor Nûri û gelek kesên dın de dımeşe. Carna ez Toxtor Nûri lı sũka bajêr de dibınım, bûyer û nûçeyên ku lı pırsa

me Kurdan va girêdayine, ez li Toxtor Nûri dibîhisin. Hindê çapameniyên Romê pîrr tîştan nanivisînin. Ez bawerim nûçe pîrr nagihêjin we. Lewra ev gundên derdora Mêzgirê gelekî li navçe a Dêrsim û Xarpîtê dûrin. Dûra gor ku ez dîzanîm eşira we ji bêt ali maye. Toxtor Nûri dîgot" serokê eşira we Bay Seyid Sîlêman û kurê wi Seyid Husên naxwazî ku eşirek ji tevgera Dêrsim, xesma ji Seyit Ali Rîza ra arikari bikin". Bî taybetî Seyid Husên çûye mala Seyit Ali Rîza, ji Seyit Ali Rîza ra gotiye, ku "dev ji li ev kari berde, li ev kari bîtexile, na ku tu usa neki, wê ez ji hemû serokên eşiran ra bîbêjim, bîla piştgîriya te û tevgera te nekin, wê ez bîbim asteng. Ji ber ku ez Pir û Mîrşûdê pîraniyanîm". Ji bona ev ji, li navbera wan de raberzînen tîrş û tehl bûne, pevçûn çêbûye, dûra Seyit Ali Rîza hêrs ketiye, Seyid Husên ji mala xwe avitiye der, gotiye" tu ku naxwazî ez te bîkujim, bî gaveki zû li mala min derkeve, biçe mala xwe". Li pey ew bûyerê de ji, Seyid Husên bî tundi hevaltî ji hukma Mîstefa Kemal ra girêdaye. Lê ez bawerim Toxtor Nûri ji mînra tîştên rast dibêje. Li gor birûbawerîya min Bay Seyid Husên karên nebaş dike, em Kurd hemû birane, hukma Romê dijminê me ê hevpare got, xwast ku hin tîştên din ji bîbêje, li ew navberê de Îmamê Curnîkan ji Aliekber ra hêrs ket û ji Aliekber ra:

- Kuro ma Seyit Ali Rîza ê te ji Bay Seyid Sîlêman û ji kurê wi Bay Seyid Husên bîaqiltire? Helbet em piştgîriya Seyit Ali Rîza nagirin. Gor ku em dîzanîn û dibîhisin Mîstefa Kemal bî xwe ji mîroveki Elewîye, navê bavê wi" Ali Rîza'ye" kureki Ehlîbeyte; ew dostê meye, dijminê me nine. Seyit Ali Rîza ê te ji mîroveki dinke, ew Seyid ji nine. Ew dixwaze ku bibe Seyid û bibe serokê me hemûyan; lê ev ewqas hêsa nine. Eşira wi eşira Şêx Hesene. Nav li ser eşira wiye, ew eşir ne eşirek Elewîye, dûra dage-riye bûye Elewî. Tu bî xwe ji dîzani ku li nav me Elewîyan de sazgeha Şêxtiyê tune. Ji bona ev e ku, serokê me nax-

waze piştgiriya keseki wek Seyit Ali Rıza bigire. Ew mir-şûdê pıraniya eşirên Dêrsime, got û xwast ku hemû jehra dilê xwe li ser Aliyekber de verşe, li ew demê de Seyid Abas kete navberê, ji Îmamê Curnikan ra:

- Kek Îmam, keremke bila lawik ji mera bixaxife, ma çira tu ji ev xortê delal ra hêrs dıkevi? Ev xorta bihistinên xwe û birûbaweriyên xwe ji mera dibêje. Tu miroveki kamili, divê giramiyê bîdi gotin û bir-baweriya kesan. Mın pırs dan ev xorti, ew ji bersivên pırsên mın dıde mın û civat ji guhdar dıke. Bınhêre kek îmam, ez bawerim tu xeltili, li nav dubendiyên şaşdayi. Beri hemû tıst Mıstefa Kemal dostê me Kurdan nine, ew dijminê gelê meye. Ew ku Elewi be ji-ku ez qet bawer nakım-lê ew Elewiyê me Kurdan nine, Elewiyeki dijmine. Bınhêre gelek dewletên İslam hene, ma çira li nav ew dewletên İslam de şer çêdibın, İslam hevûdu dıkujın? Li gor baweriya te Elewi hevûdu nakujın; lê divê Sunni ji hevûdu nekujın. Balam jiyan ev gotin û baweriya te li me temaşe nake. Tu bı çavên xwe va ji dibini, dewleta Romê dewletek İslam û Sunniye, lê İslaman dıkuje. Dewleta Tırk, dewletên Ereban û Faris İslamın, ma çira ew dewletana dijminên hevûdu, ên bêdawine? Ma çira ew hevûdu dıkujın?. Tu dibini ku jiyan te rast dernaxine. Mala te ava be keko, lê ku Mıstefa Kemal doste me Elewiyan bû, ma çira wi bı deh hezaran Kurdên Elewi Li herêma Qoçkiriye de kuştın? Ma çira wi namûsa ew Kurdên Elewi peymal kır? Ma çira wi bı hezaran zar û zêçên Elewiyan kuştın? Ma çira leşkerên wi û ên Topal Osmanê Laz zıkê jinên nefsnexwaş qelişandın, zarok ji zıkê jınan de derxistın, ew pızêzên bêt sûc û bêt webal kırın ser şılfa û kuştın? Naha tu ji mınra bıbêje kek İmam, Elewi li Elewiyan usa dıkın? Naha ez li te pırs bı-kım, ma tu dıkarıbi zıkê jinek Kurdê Elewi bıqelişini? Kek İmam ez dıxwazım tu bersivek erêni bıdi mın, bı kerema xwe ji mera bıbêje bı rasti tu dıkarıbi ev tıştan bıki, yan na? got û hêrsa xwe beyan kır. Li piştı ew gotin û pırs

dayin de icar İmamê Curnikan sor bû, reş bû, lı dawiyê de" Xwedê neke, ne ku jnek Elewi, mirov nıkarıbe zıkê jnek kafır, yan ji zıkê heywanek avıs bıqelışine; ew ne mêraniye, ew karê heywanên har û hovın" got û bı şermezari lı pêş xwe nihêriya. Dûra Seyid Abas disa dageriya ser İmamê Curnikan, jı İmamê Curnikan ra:

- Te dit tu çı dibêji? Lı gor ev bersiva te, Mistefa Kemal doste me Kurdên Elewi nine; a rasti ji ev e. Ango jı mera şerme ku, em bibêjin Mistefa Kemal Elewiye, felan-bêvan. Na bırayê delal, mirov pişta dijminê xwe nagire. Ew kesên ku pişta dijmin bıgırın, ew Seyid Sılêman û Seyid Husên bı xwe ji bıın, lê dıvê mirov diji wan derkeve. Nızam eşira Seyit Ali Rıza, eşirek Seyid nine felan-bêvan. Seyid nebe ji, ew Kurde. Lı nav Kurdên Sunni de ji gelek kesên nav Seyid hene; ma ki jı wanra dibêje ew" Seyidi Saadet, ewladi Resûlın?" Jı tera minak, navê" Seyid Xan" mêrxwaseki Kurd. Lo hûn dibıın, wexta ku Rom Kurdan dıkuje, qet nabêje ev Elewiye, ew Sunniye; Rom dibêje" ev Kurde, evana Kurdın". Her tışt evqas vekiri û eşkereye. Xwedê mala we ava bıke, ma hûn van naxwazın tıştan bıbıın?. Bı rasti ev jı mera şermek gırane. Herwaha ez axaftına xwe pırr dirêj nekım, disa ez dorê bıdım Aliekber, bıla Aliekber bersivên pırsên mın bıde. Ha xortê delal, te çı dıgot, bı kerema xwe tu disa dager ser ew babetê. Belê, te qal û behsa ew zagonên ku hukma Romê derxıstiye, qal û behsa wan û qal û behsa eşirên me Dêrsımiyan dıkır. Tu bı kerema xwe, disa jı mera qal û behsa ew tıştan bıke, got û lı benda axaftın û bersivên Aliekber de ma.

Lı pişti ew gengeşi û raberzınan de Aliekber gelesi ji kêfxwaş bûbû; lı dilê xwe de dıgot, lê her çıqas ku lı nav gelê meda nezan hebın ji, lê lı Xwedê şıkır lı nav gel de kesê zana û dılsoz ji hene. Bı rasti ji" xwin nabe av". Lı nav me Kurdan de ji gelek zêr û gewher hene; lê Xwedê mala dijminan bışewitine, nehiştine ku ev zêr û gewherên

Kurdan ji zide bıbın, got û disa dageriya ser pirsên Seyid Abas û usa got:

- Belê, gelek eşirên me Dêrsımıyan li tevgerê dûrketine, bûne hevalbendê dijmin. Gor ku Toxtor Nûri ji mınra dıgot, bı taybeti eşira Alan, eşira Ariyan, eşira Ferhatan, eşira Qerebalan, Eşira Şadiyan, eşira Xeraniyan, eşira İzolan, eşira Bamasûran, eşira Derwêşgewran, eşira Seysawûnan, eşira Axûcanan, eşira Xormekan, eşira Lolan û gelek eşirên dın bêt ali mane. Bı taybeti Memık Axa ê eşira Ariyan, serokê eşira Xeraniyan Hesên Axa ê Germisiyê, serokê eşira Xormekiyan Bertal Axa ê Cıvarikê û gelek serok eşirên Kurdên Dêrsım bûne hevalê hukma Romê, li tev dijmin dıxebıtın. Ez bı xwe ji bawerım evana hemû rastın, ev eşir û serokana karê dijmin dı-kın, bûne hevparê dijmin. Lı milê dın de, du sal beri, hukma Mıstefa Kemal zagonek bı taybeti, a ku ji hêjmara wêra dıbêjın"2510"ev derxıstiye. Ango ew zagon 1934'an de derket. Lı gor ew zagonê hukma dagirker bı hezaran gelê Kurd sırgûne Rojava Tırkiyê û navçe a Tırkiyê dıke. Dewleta Tırk ew kırıye jiyanê, bı hezaran gelê Kurd li ser erdê bav û kalan de dûrdixine, wana dıgire dıbe Rojav û navçe a welatê xwe, ku wana bı hêsayi li wan deran de bıheline, wenda bıke. Lewra kesên ku li dewleta Romê doz bıkın, ew kesana tunenin. Cihan bûye çav kor û guh kerr bêdeng maye. Lı ev cihan de qet dewletek dostê Kurdan ji tune. Ew kesên bêt sûc û bêt webal li rê û dırbın de bı barbari têne kuştın, bı ti û bırci dımırın. Yên ku sax dımırın, wana ji ji xwera dıkın berdest û destemo-hizetkar-Çawa ku hûn ji dızanın li sala bıhuride hukma dagirker bı destê gelek caş û bêbextan dubendiyên mezın kırın nav eşirên Dêrsım. Bı destê eşira Qırxan li gundê Sinê de kurê Seyit Ali Rıza Bıra İbrahim, da kuştın. Seyit Ali Rıza ji bona kuştına kurê xwe êrişek gewre da ser eşira Qırxan, li ew êrişê de gelek kes hatın kuştın; Seyit Ali Rıza çend gundên eşira Qırxan ji hemû şewitan-

dın, ew gundana bûn pag. Jı bona ew bûyerê dilê hukma Romê geleki ji şabû. Dijmın lı ew bûyerê de zef kêr dit. Jı bona dijmın ew dılşabûn bû. Jı bona ew bûyerê tevgera Dêrsım geleki ji xesere dit û geleki ji qels û jar bû. Em hêvi dıkin ku, carek dın bûyerên werge lı nav Kurdan de cih negırın û neqewımın. Gotınên mın ji wera evın. Ez hêvi dıkım mın bersivên pırsên te dan. Lê ku mın tıstek ji xwe birkıriye, bı kerema xwe ji mınra bibêje, disa ez qasa zanina xwe, bersivê bıdume mırsûdê xwe. Gotınên mın hemû evın Bawa. Ez bawerım heyam ji lı nivê şevê derbaz bûye, ev e dengê dikan tê, dıvê êdi em rabın bıçın malên xwe, bıkevın xewê, pırsên mayın ji bıhêlının jı bona sıbe û dusıbe, got û Aliekber dawıya axaftına xwe ani. Hemûyan ji ew pêşneyara Aliekber pejırandın, gotın"başê" û jı Aliekber ra spas kırın û lı hev belan bûn, çün malên xwe. Aliekber û Xıdê ji lı malxwe ên malê Seyid Qemer û seyid Weli ra spas kırın û dagerıyan mala xwe û ketın xewa kûr.

Belê, êdi bûyer lı ser bûyeran dıqewımıyan; hukma Romê xwe jı bona dagırkırina Dêrsım bêtır amade dıkır. Artêşên Tırk ketıbûn nav gelek çalakiyên har û hov; top û tank dıkışandın Xarpıtê, lı dorbera bajêr de rêzdıkırın. Hukma bêt ram bı hezaran leşker anıbû lı leşkergehan de komkıribû. Disa pıraniya wan leşkeran zarokên Kurd bûn. Armanc disa ji welatparêzên Kurd ra eyan bû. Hukma bêbext disa dıxwast ku Kurdan bı destê Kurdan bıde kuştın. Hukma Romê çalaki lı ser çalakiyan pêkdıani. Lı sala 1936'an de icar meclisa Tırk zagonêk nû disa derxıst. Lı gor fermana ew zagonê navê bajarê Dêrsım "Mameki" kire "Kalan" dûra carek dın guhart vêca ji kire "Tünceli". Lı pey ew, jı bona zorbazıya xwe ji gelek rê û dırb vekır, ku hêsayi bıkeve Dêrsım. Disa lı eyni salê de Ser-

darê-komutan-Awerte a Tirk Avdilah Alpdoxan gazi gelek serok eşirên Dêrsım kır, lı tev wan rûnişt û lı hev şewırıyan, ku ew hemû çekên xwe radeste-teslim-dewleta Romê bıkın. Lê hezar mıxabın ku gelek serok eşirên Dêrsım ew daxwaziya dijmin pejırandın, çekên xwe radeste dijmin kırım û xwe û gel bêt çek hiştın. Ew bêbextiyê derbek mezin da tevgera Dêrsım. Lı ser ew nezani û bêbextiyê Seyit Ali Rıza hewl da ku, serokê eşiran lı ew karê nebaş vegerine, wana lı ew bıyarê dûrxine, wana bıtexılne, destê wan neke nav xwına bıran. Wi xwast ku lı nav hemû eşirên Dêrsım de "Eniyek û Yekitiyek Xurt" pêkbine, balam sed heyfe ku serokê eşira Ferhatan Cemşit Axa, serokê eşira Qerebalan Qonqazade Memed Ali Axa, serokê Xereniyan Hesên Axa, Mele Êsivê serokê eşira İzolan, serokê eşira Şadiyan Resûl Axa ê Oxiyê, serokê eşira Bamasûran Husên Doxanê Lodekan, serokê eşira Axûcanan Husên Doxan, Memık Axa ê Ariyan, Bertal Axa ê Xormekiyan û gelek eşirên dın qet nêzıke ew pêşneyara Seyit Ali Rıza û ew eni û yekitiyê nebûn. Xêncı ew serokên eşiran, Seyit Ali Rıza lı tev serokê eşira Kurêşan Ali ê Goxê, serokê eşira Demenan Cebrail Axa, serokê eşira Êsivan Qemer Axa û gelek kesên dın ra, lı binê gundê Halworê, lı kêleka çemê Mızûr, ciheki ziyaretgeh de rûnişt. Wan kesan lı ew derê de cıvnek lı nav xwe de çêkırım, dûr û dirêj lı hev şewırıyan, dûra hemûyan bı hevra, lı ser hemû birûbaweriyên xwe sond xwarın, ku lı hember Romê de şerbıkın û şerefa Kurdayetiyê bıparızın. Dûra hemûyan kevırek ji avıtın nav ava gola Xızır, bı ew şıklı va sondên xwe dubar kırım û disa dageriyan ser hêzên xwe.

Lı meha İlona sala 1936'an de, leşkerên Roma Reş tev hewa fırokên xwe va êrişek ne mirovı avıt ser gundê Seyit Ali Rıza, Sinê. Bı taybeti fırokên Romê gelek bombe û mitralyoz lı ser gundê Sinê de barandın. Lı ew êrişa

firokan de, firokvanek ji zırza a Mîstefa Kemal Sabiha Gokçen bû.

Hukma Romê li Adara 1937'an de sê qolardeş, gelek tabûr û li tev gelek destheviyên-birlik-din û milis, caşan va êrişek mezın da ser tevgera Dêrsım û bî taybeti herêma gundê Seyit Ali Rıza. Li wêderê de navbera leşkerên Romê û mêrxwasên tevgera Dêrsım de şerê heri gewre destpêkir û ew şer bî rojan berdewam bû. Bî taybeti li hember hêzên dijmin, mêrxwasên eşira Bextiyaran, li bin serokatiya Şahan Axa de bî mêrani şerdikirin, berxwe didan û dirbên mezın li leşkerên Romê dixistin. Dûra leşkerên Romê paşva kişiyên û çûn. Li dawiya ew şerê de, Seyit Ali Rıza, Şahan Axa, Alişêr û Toxtor Nûri li gel hev rûniştin li ser ew şerê çend rojan gengeşi kirin, li hev şewirîn, rewşa kêmasi û şaşitiyan anin ber çavan, li nav xwe de rexne li wan kêmasiyan girtin. Li ew rojê de biryar standin, ku tevger Alişêr bişine derveyi Welêt, ji bona tevgera Dêrsım û pîrsa Kurdistan alikariyekî ji dewletek xudan ram û mirovevin bistine. Lê dijminê bêbext û bêt ram vala nedisekîniya, gelek caş û casûs ji xwera kirriyabû; bî destên wan va hêza tevgera Dêrsım dîşikand, jar û qels dikir, raza tevgerê distand. Li nav wan caş, bêbext û casûsan de, yek ji biraziyê Seyit Ali Rıza Rayber bû. Rayber ketibû dîlqê caşekî gewre û yekemin; ji gelê xwe û apê xwera bêbexti dikir. Rayber ji bona mal û mîlk, erd û zeviyan, dirav, zêr û zivên cihan namûs û şerefa xwe dîfiroto, gelê xwe dida destê dijmin û dida kuştin. Li aliya din de meclisa Mîstefa Kemal her roj rûdinişt rewşa Dêrsım raberzin dikir. Wezirên hukma Mîstefa Kemal ji bona pîrsa tevgera Dêrsım biryarin dijminayi distandin. Bî taybeti wezirê kar û barê hindir Welêt, ew biryar û ferman ji serdarê leşkeri Avdîlah Alpdoxan û Îsmail Heqî Talay-Alay komutani ra dîşand. Li nav ew hemû fermanan de, fermanek bî taybeti ji ji bona Alişêr, Seyid Ali Rıza, Şahan Axa û hin kesên din bû. Li gor ew fermanê: Ki ku serê Seyit Ali Rıza,

Alişêr, Şahan Axa û ew kesên dîn jêbîke bibe bide dewleta Romê, wê hukma Mistefa Kemal a dagirker û xwinxwar, bî tenekan zêr, ziv, erd û ax bide wan kesan, wana her dewlemed bîke. Lî derketîna ew fermanê de êdi hemû çaq û bêbextên Kurdên Dêrsûm lî nav xwe de ketibûn lecê. Rayber bûbû serkarê hemû çaq û bêbextan. Wi her roj yek dîxapand û dîkîr nav refê çaq û bêbextan. Rayber bûbû Ehrimaneki bêt namûs, xwe berdabû pêsira tevgera Dêrsûm, qet vala nedisekîniya. Wi hewl dîda ku rojeki bî zû serê Alişêr jêke, bibe bide dewleta Romê, tenekek zêr û ziv bîstine, bibe miroveki her dewlemend, êdi kêf û zewqa xwe bînhêre. Rayberê bêbext jî bona ew nêta xwe rojeki lî tev kurapeki xwe ê dîn Zeynel Kop-Zeynel jî kurê bîraki Seyit Ali Rîza bû-û pênc-şes kesên dîn va rûdîne û jî wan- ra meselê deng dîke, wana jî dîke heyparê webalê xwe. Dûra hemû bî hevra bîryar distînin, ku bîçîn serê Alişêr jêbîkî û bîbîn bîdîn dewleta dijmin. Lî piştî bîryar standîne de hemû bî hevra radîbîn lî rê dîkevin û dîçîn pêş derê şikefta ku Alişêr têda rûdîne û Serdariya tevgerê dîke. Çawa ku çavên Alişêr Rayber û Zeynel Kop dîkeve, jî Zeynel ra "hûn xêr hatîne kek Zeynel, ez hêvi dîkîm hatîna we xêre" dibêje. Hîndê Alişêr, Rayber qenc nasdîke, balam Zeynel her tîm miroveki dîlsoz dîtiye, jî hevra hevaltî kîrîne, dostên hevbûne. Lî ser pîrsa Alişêr, Zeynel:

- Welleh kek Alişêr, rîya me lî ev alî ket, mîn jî hevalan ra got em bîçîn seriyeki lî Alişêr xînin, lewra em bîrçî bûne parîk nanê Alişêr bîxwîn û dûra dagerîn. Ango jî bona ev em hatîn, gelo tu mîvanan distînin, yan na? dibêje û lî hîviya bersîva Alişêr de dîmine.

Lî ser ew gotînen Zeynel de, îcar Alişêr:

- Hûn hemû xêr hatîne sîlamet, ser seran û ser çavan ra hatîne; çîkê me ku heye, em bî hevra bîxwîn" Helal Hazîr, Ya Xîzîr" ev gotîna bav û kalane, de kerem kîn fermo werîn hîndîr, dibêje.

Alişêr lı ew hatına wan de qet şıkeki nebe ser Zeynel. Ji ber ku ew Zeynel qenc nasdıke û dost dıbine. Bı hevra lı hember dijmin de şer kırıne. Lı destpêka hatına wan de, ew wer fêm dıke ku, Zeynel hatiye jı bona cebılzanê. Dûra ku Zeynel werge dibêje, Alişêr ji wana fermo hındır dıke, ku zikên wan têr bıke. Jına Alişêr Zarife Xanım ji radıbe bı lez û bez jı mivanan ra sıfrê amade dıke, xwarınê tine dıde ser texte, disa dadıgere ku bıçe hın tışt-mıştên dın û avê bine, çaşan de yek tıfinga xwe radıke û gule berdıde ser singê Alişêr, Alişêr cangori dıke. Çawa ku Zarife xanım dengê tıfingê dıbihise, bı şaşara xwe va dıçe ser wan bêbextan, yeki jı wan birındar dıke, lê sed mıxabın ku, ew bêbextana wê canıka gelê Kurd ji dıkujın, xwına wan herdu şervanên Kurdistan dırjının, wana cangori dıkın. Dûra serê wan herdu cangoriyan jêdıkın, dıkın torbeki, dıbın dıdın general Avdılah Alpdoxan, zêr û zıvan dıstinın û disa dadıgerın ser karên xwe ên bêbexti. Wexta ku Seyit Ali Rıza ew bêbextiya bıraziyê xwe dıbihise, dıgire, berxwe dıkeve, xemgın dıbe, cıhan jı wıra teng û tari dıbe, mıl û baskên wi dışıkın, nızane ku çı bıke.

Lı pıştı ew bêbextiyê de, Seyit Ali Rıza nûçeki bı lez dışıne pey Şahan Axa, ku ew zû bıçe wi bıbine. Şahan Axa ji lı ser banga Seyit Ali Rıza bı lez rêdıkeve dıçe bıryargeha Seyit Ali Rıza, dıbe mivan. Lı wê ew herdu şêrên tevgera Dêrsım bı hevra rûdının, ew bêbextiya Rayber û Zeynel gotûgo-müzakere-dıkın û dûra disa Şahan Axa dadıgere dıçe cem pêşmergeyên xwe.

Belê, rojên Xwedê zû-zû derbaz dıbın û dıçın. Çendek dûra Şahan Axa disa dıxwaze ku bıçe bıryargeha Seyit Ali Rıza, Seyit Ali Rıza bıbine, ku keyse mıroveki dın bışının derveyi Welêt, jı bona arikariyek mırovi. Şahan Axa jı bona ew mabestê radıbe lı tev kurê zırda bırayê xwe ê nav Suli Axa, Pırço rêdıkeve bervi bıryargeha Seyit Ali Rıza dımeşe. Şahan Axa lı rê de geleki dıweste û lı cıyeki de rûdine, ku piçeki vêsa xwe bıstine, icar xewa Şahan Axa

tê, balam Şahan Axa naxwaze ku raze piçeki çavên xwe germ bike. Lı wê Pırço israr dıke, ku Şahan Axa piçeki bıkeve xewê, çavên xwe germ bike. Pırço ji apê xwe Şahan Axa ra" Apo ev çend rojin ku tu qet ranazi, ev ji ji bona tendurustiya te ne başe, divê tu piçeki paldi, bıkevi xewê. Tu apê mini, ez ji bıraziyê teme. Bı navê Xwedê ez li te bıpêm, qet teyrekli ji li ser tera nehêlinim ku bıfire". Lı ser ew gotın û israrkırına Pırço, Şahan Axa ji baweriya xwe li wi tine û li ciyeki de paldide û pêva dıçe. Lı pişti çend hûrdeman de Pırço ê bêbext tıfinga Şahan Axa dıstine û bı tıfinga Şahan Axa va, Şahan Axa dukuje, serê Şahan Axa jêdıke dıke torbeki, ku ew ji ew serê Şahan Axa bıbe bıde Avdılah Alpdoxan, li rêva raste kurapê Şahan Axa Hesên dıbe. Çawa ku Hesên Pırço dıbine, li Pırço pırs dıke, dibêje" Pırço can, ma Şahan li kuye?". Lı ser ew pırsa Hesên de, Pırço usa bersiv dıde:

- Kareki apê mın derket, xwast ku zû bıçe gund û ew çû gund. Mın nexwast ez li tev apê xwe bıçım mal. Lewra canê mın usa xwast. Naha ji ez dıxwazım bıçım mal dibêje û li tev Hesên rêdıkevın, ku ew ji bıçın gund. Lı gor adet û toran Hesên dıkeve pêş Pırço, Pırço ji li dû Hesên de dimeşe, ku bı hevra herın mal. Lı geliyek kûr û tenha de Pırço li paşva bı duxa tıfingê va êriş dıde ser Hesên Axa, Hesên Axa ji dıkuje, serê wi ji jêdıke û porê herdu kurapan bı hevra girêdıde, wan herdu serıyan disa dıke torbe û berê xwe dıde riya Xarpitê, ku seateki zû xwe bıgihêjine cem serdarê Tırk, Avdılah Alpdoxan, zêr û zıvan bıstine. Lê mêrxwasên Dêrsım zû pêdıhesın û li rêva xwe dıgihêjinın Pırço û eyni hûrdemê de ew segê bêbext dıkujin û meytê wi ji gur û hırçan ra, ji teyr û tûran ra dıkın xwarın û nêçır. Wan seriyên herdu lehengên kurdıstan ji, dıgırın dıbın li tev bedenên wan bı kombûni-merasım-bınax dıkın. Lı pey ew bûyera bêbext hemû eşıra Bextıyaran û tevgera Dêrsım reş girêdıdın, şıniyek gewre dıkeve nav tevgera Dêrsım û eşıra Bextıyaran.

Hukma Romê lı her aliki de êriş dıda ser tevgera Dêrsım, xesereyên mezın dıda gund û bajaran û tevgerê. Bı hezaran kes dıhatın kuştın. Lewra hukma Romê xudan top, tank û fırok bû. Bı sed hezaran leşkerên xwe hebû. Fırokan lı jor de bombe mina dilopên baranê dıbarandın, gund, mezre û gom dişewtandın, dıkırın pag. Lı demek werge de Seyit Ali Rıza lı nêzıka çiyayê Tûjık Bawa de, lı benda Şahan Axa de bû, ku carek dın Şahan Axa bıbine û lı wi bişêwire, gelo jı bona rewşa tevgerê çı bıkın, çı nekın. Le sed mıxabın ku Seyit Ali Rıza ew hevalê xwe ê leheng ji wenda kırıbû, şuva hatına Şahan Axa tınebû. Seyit Ali Rıza lı şuna hatına Şahan Axa de, ew nûça reş stand, cihana Seyit Ali Rıza hate xurandın û hulşıya, hêz lı joniye kelo de neman, xemgin û dılkeser bû.

Belê, Seyit Ali Rıza bı rojan reşê Şahan Axa girêda. Dûra tev zar û zêçên xwe va lı gund de derket çû lı nav darıstana dırêj de kete bıne holık û şıkeftan de ciwar bû. Lı demek werge de kurê eşıra Bamasûr Seyid Husên mina balyozeki Romê carek dın çû ba Seyit Ali Rıza, ku Seyit Ali Rıza şer bıterıkine, bıçe radeste dijın bıbe. Lê Seyit Ali Rıza ew daxwaziya wi nepejırand, jı wıra got" bıçeşite -şiktir ol-bıçe lı vır, ber çavên mın de wenda bıbe, bıla carek dın çavên mı lı te nekevın".

Seyid Husên Doxan lı wan salan de xorteki bıst şeş, bıst heft salını bû. Lı şuna bavê xwe de wi serokatiya eşirê dimeşand. Apê wi Seyid Bektaş û Seyid İwık qet nedıkarıbın jı wıra tışteki bıbêjın. Du bırayên wi, Seyid Piro û Seyid Memed ji nedıkarıbın ku lı dijı wi derkevın. Ew búbû hevalê Avdılah Alpdoxan, İsmet Paşa ê kerr û gelek karmendên dewleta Romê. Wına gelek tesir ji dabû ser eşirên Dêrsım. Bı taybeti Hesên Axa ê Germisiyê û Ali Yıldırê Moxındiyê búbın xulamê Seyid Husên Doxan. Ali Yıldırım lı Mêzgirê, carna lı Xarpitê de doz wekili dıkır û

daxwaznîvis-dilekçe-jî hîn kesen ra dînvîsand, navê welat-parêzên kurd dînvîsand û dîkir lista reş dîda dewleta Romê, lî hember ew kari de jî, lî dewleta Romê dîrav dîstand. Seyid Husên Doxan jî xwe xelîfe ê Kurdên Elewî dîhesiband. Ew dîçû kijan mala mîrûdê xwe, hemû gundî lî dorbera wî de komdîbûn, lîngên wî lî sol û çarîxan de derdîxîstî dîşoştî, ew ava qilêra lîngên wî, bî nêta şer-beta şêkir û lîngîv vedîxwarî. Ango gel ewqas bawerîya xwe lî wî dîani. Wî dîgot " lî axretê dîvê ez şefaate bîdîme we". Gel jî bî rasti bawer dîkir. Jî bona ew bû ku, hukma Romê ew kirriyabû, kesên wek Ali yıldırım jî cigîr û hev-parên wî bûn.

Leşkerên Romê bûbûn har û hov, lî her alîki de êriş dîdan ser gund, bajar, gom û mezîreyên Dêrsûm, nedîgotî, pîr, ne dîgotî, kal, ne jî dîgotî, zar û zêç, kî ku dîdîtî, yekser dîkuştî, serî jêdîkirî. Lî gund û bajarî de hemû zar, zêç, jîn, keç, bûk, xort komdîkirî, dîbîrî, dîkirî, aşan û xanan, derî û pencere lî ser wan kesên bêt sûc û bêt webal de dadîdan, gaza bî jehr berdîdan hîndîrê wan aş û xanan, ew kesana bî ew rengî va dîkuştî, dûra jî agir berdîdan wan aş û xanan hemû dîşewîtandî, bedena wan kesan dîkirî ax û xalî. Bî sedan kes girêdîdan rêz dîkirî, dûra ew kesana dîdan ber gule û mîtralyozan dîkuştî; dûra jî dîçûn bî serê şîlfan va bîne lîngên wan cangorîyan sehêt dîkirî, gelo ew mîrîne, yan na. Yê ku hîna can nedabûn û nemîrîbûn, wana lî ber serê şîlfa tûj de, lîngên xwe bî hêdîka dîkişandî. Lî demên werge de îcar wan leşkerên har û hov ew kesana dîdan ber şîlfan û xençeran, canê wan kesan perçe-perçe dîkirî ruh lî bedena wan de derdîxîstî.

Belê, hukma Romê bî barbarî ketîbû Xozatê, Pêrtégê, Owacîxê, Çûmişgezegê, Pîlemorîyê, Nazmîyê, Mêzgirê û Çarsançaqê. Hukma har û hov roj bî roj ew tevgera Dêrsûm dîşikand, jar û qels dîkir. Leşker bî ew jî têr nedîbûn, îcar dîketî gundan mîna gurên bîrçî gund talan dîkirî,

dışêlandın, dûra ji agir berdîdan malan hemû gund dişewitandin, qet tışteki jindewer nedihîştin. Leşkerên har hemû pez û dewar ji serjêdikirin, bî têra dilên xwe goşt dîxwarin. Dûra hemû gundi tev zar û zêçan komdikirin dîbirin dîdan ber gule û mitralyozan hemû dîkuştin. Kesên ku li tev zar û zêçan reviyabûn ketibûn şikeftan xwe veşartibûn, ku canên xwe felat bîkîn, leşkerên Romê ew şikeftana dîditin, li destpêkê de disa gaza jehr berdîdan hîndirê wan şikeftan, dûra ji derê ew şikeftana bî çimento û keviran va beton dîkîrin, ew kesana werge li zîkê wan şikeftan de dîhêlandin û dîkuştin. Li bîli ew barbarîyan, wan leşkerên har û bêt namûs, destên xweyên qirêj û gemarin dirêje namûsa keç, bûk û jinên Kurd dîkîrin, bî dara zorê namûsa wan jin, keç û bûkên Kurd qirêj dîkîrin, kêfa xwe dînin; dûra ji berên wan dayik, keç û bûkên Kurd li bînda jêdikîrin, cendegên wan ji diavîtin zîkê newal û çeman, binê kevir û zinaran, ciyê çal û kort de mina êzîngan lod dîkîrin. Zîkên jinên nefsnexwaş bî şîlf û xençeran va dîqelîşandin, li pîzêzên sê mehîni bîgire heya neh mehîni li zîkê dayikên Kurd de dînin der, ew pîzêzên çîlmok û bî xwin dîkîrin ser şîlfên tîfîngên xwe radîkîrin hewa li wan pîzêzan dînhêriyan, gelo keçê, gelo kure. Li ew barbarîyê ji disa têr nedîbûn, îcar ew pîzêzana li ber çavên saxan de dîgerandin û dûra ji perçe dîkîrin diavîtin ser erdê. Bî hezaran zarokên piçûk dîgirtin dîkîrin çal û xaşîyan, devên ew çal û xaşîyan grêdîdan û ew çal û xaşîyên tîji zarok diavîtin ava çemê Mîzûr, Xarçîk û Fîratê, werge ew zarokana dîxenîqandin û dîkuştin. Bî sedan jin, zarok, xort, pîr û kal dîgirtin, serên wan dîdan ser gonçeki bî dar, bî şûr, xençer û bîviran va serê wan kesan jêdikîrin. Li bedena wan dîrdîxîstîn. Bî taybetî wexta ku serê wan zarokên hûr jêdikîrin, serî û beden li hev cûda dîbûn, bedena wan zarokên hûr bî hûrdeman, mina bedena mîrişk, yan ji dikeki li ser erdê de hîldîpekiyan, radîbûn disa dîketin ser erdê. Bî sedan keçên Dêrsûm ji bona pa-

rastina namûsên xwe, xwe li zinar û kevirên bilind de diavîtin jêr dîkuştin cangori dibûn; ku destên dijminê gemarin li namûs û canên wan nekeve.



Seyit Ali Rıza êdi tenê mabû. Li nav daristana dirêj de carna nûçe ji Cebraîl Axa ê eşira Demenan ra dîşand, balam wi bersivên nebaş dîstand. Her roj nûçeyek reş ji Seyit Ali Rıza ra dîhat; Seyit Ali Rıza berxwe dîket, nedîzanibû ku çi bike. Tevger li bin de qels bûbû, ketîbû. Bi deh hezaran kes cangori bûbûn. Ava çemê Mîzûr, Xarçîk û Fîratê sor bûbûn bi xwin diherîkiyan, ew çemana bi cendegên mirovan va tîji bûbûn. Lê dişa ji artêşên Romê nedîsekîniyan, êriş dîdan ser êrişan, bi xwinê têr nedîbûn. Îcar leşkerên Romê berê xwe dabûn newala Qutiyê, êriş dabûn ser eşira Demenan, zar û zêç dîkuştin. Lê dişa ji eşira Demenan seri li ber dijminê har de xar nedîkîr, bi mêrani, lehengi şer dîkîr, xesereyên mezîna dîda hêzên dijminê barbar. Lê sed mixabîna ku dijmin bi hêz, xudan top, tank û fîrokan bû. Li hember ew çekana tîfîngên Mawzer qet tîştekan nebûn. Li her alîki de fîrokevanên Romê fîrokên xwe diajotin ser gund, mezre, gom û şîkeftan, bombe li ser eşira Demenan de dîbarandin. Leşkerên bi peya ji, bi top û tankan va êriş dîdan ser êrişan zar, zêç, pîr û kal dîkuştin.

Şerê li navbera leşkerên Roma Reş û eşira Demenan bi rojan berdewam kîr. Li dawiyê de hêza eşira Demenan zor qels û sist bû, cebîlxane û guleyên tîfîngan kêmbûn. Li ser ew rewşê, wêca hemû leheng û sekvanên eşira Demenan derketin ser çîyayê sor. Li eynî demê de desthêviyek-bîrlîk-leşkerên Romê ji hîlkîşîyan derketin ser çîyayê Zelê. Eşira Demenan li ew demê de, li sê alîyan va ketîbû hîndurê dorvebirin û çeperek barbarî. Li ew cîyan de şerêki

heri gewre li nav mêrxwasên eşira Demenan û leşkerên Romê de domdikir, balam pıraniya şervanên eşira Demenan hatibûn kuştin, tenê mistek kes mabûn. Lê disa ji leşkerên Tirk mina mirişk û çeqelan li ber mistek mêrxwasên Kurd de diyax nekırın, revıyan, berê xwe dan newala Laçê. Li newala Laçê de ji şerêki werri giran destpêkir ku, Xwedê şerêki werge neyne serê çu geli û keseki. Ew şerê newala Laçê ji bı rojan berdewam kir; mêrxwasên eşira Demenan bı hezaran leşkerên dijmin kuştin; li destpêkê de tolek mezın ji dijminê xwınxwar standın, leşkerên Romê revıyan, şuva kışıyan. Dûra bı hêzek heri gewre va carek dın êriş dan ser newala Laçê û hêzên eşira Demenan şıkandın; yên ku dil girtın, ewana hemû bı barbari kuştın, yên ku revıyan ji canên xwe felat kırın û çûn xwe veşartın, wenda bûn.

Li pişti şerê newala Laçê û bınketına eşira Demenan, icar hukma Romê leşkerên xwe kir hemû gund û bajarên Dêrsım. Bı hezaran leşker ketın qeza Mêzgirê ji. Li Mêzgirê de ji bı hezaran kes hatın kuştın. Li pey ew barbariyên leşkerên Romê de hemû gundiyan qeza Mêzgirê tev zar û zêçen xwe va revıyan çûn derketın seri çıyan, li şıkeft, qulên kevir û zınaran de xwe veşartın, ku neyên kuştın, canên xwe felat bıkın.

Li nav atmosferek werge de, rojeki nûçek reş kete nav gundiyan gundê Kûpıkê, Lodekan, Qurqurık û Şowagê. Gotın" Ali Barût ê kurê Kekê Mistefê li nêzıka Sorpiyan de dil hatiye girtın, cendermeyên Romê destên wi gırêdane kırine kelepçan, dane pêşıya xwe, ku bıbın Xarpitê radeste dadıgeha xwe bıkın, wi ji bavêjın dar bıkujın. Lê dûra serbazê cenderman, fermanek daye cenderman, ku cenderme Ali Barût li rêda bıkujın, nekevın asteman, nebın Xarpitê. Li ser ew fermana serbaz, cenderme ji Ali Barût dıdın pêşıya xwe, bervı qeza Pêrtégê va dıbın. Li ser riya çıyayê Mercimekê de, Ali Barût ti dıbe. Li pişti gelek meş de, raste kaniyeki dıbın. Li ew demê de Ali Barût bı zıma-

nê Tırki lı cenderman tıka dıke, ku ew jı bona du-sê hûrdeman destûrê bıdın wi, ku ew xar bıbe, qılmek av vebıxwe, dıl û zıkê xwe piçeki hinik bıke. Lı ser tıakırına Ali Barût de, icar cenderme"fermo xarbe, ava xwe vexwe" dıbêjn. Ali Barût jı cenderman ra spas dıke, bı hêdıka xar dıbe, tê ser jonyan, disa bı hêdı, hêdı pişt xûz dıbe, devê xwe bervı ava kaniyê dıbe, lêvên xwe digihêjine ava kaniyê, qılmek, du qılman vedıxwe, venaxwe, lı wê demê de, ew herdu cendermeyên har û hov tıfingên xwe radıkın, lûleyên tıfingên xwe dıçerıxının ser serê Ali Barût û gulan lı ser seri û mêjo ê Ali Barût de dıbarının, serê wi xortê welatparêz perçe-perçe, mêjo ê wi jı dıpijiqının, ew ava wê kaniyê ji, bı xwına wi mêrxwasi va sor dıkın, wi lı ew derê de dıkujn û cangori dıkın. Hukma Romê wi xortê hêja ji werge dıkuje, meyitê ew xorti ji, jı teyr û tûran ra dıhêline, dıke xwarın û nêçır.

Lı zıkê rojeki de ew nûça reş lı nav Kurdên Dêrsım, bı taybeti lı nav gundên herêma Mêzgirê"Newala Karê"de belav bû. Bavê Ali Barût Kekê Mıstefê çıto ku ew nûça reş bıhist, hêz lı jonyên ew kali de derket, Apê Kek bêt hêz ma, lı şûna xwe de ket birva çû. Dûra der û cınar lı dora Apê Kek de kombûn, bı ava sar, dev û rûyê Apê Kek şoştın, hişyar kırın. Diya Ali Barût dıgıra lı xwe dıxıst, porê xwe dırûçıkand, birva dıçû û jınan disa ew hişyar dıkıryn. Dûra her sê xwişkên Ali Barût, Mırcan, Elif û Çiçeg lı mal de kombûn şini danın û porên xwe rûçıkandın. Lı darê cıhan de tenê bıraki wan hebû, wana ji ew bırayê xwe ji wenda kırıbûn. Lı mala Kekê Mıstefê de şiniyek dılşewat destpêkırıbû, hemû kes dıgırıyan. Jı bona cangoribûna Ali Barût, çar gundên seyidan, Kûpık, Lodek, Qurqurık û Şowagê reş gırêdabûn. Xêncı Ali Barût gelek kesên bıjar ji hatıbûn kuştın. Jı bona wan kesan û hemû cangoriyên Dêrsım, welatparêzên Kurdıstan her xemgın bûbûn, cıhan jı hemûyan ra bûbû tari û zulmat. Lê qet keseki nedıkarıbû ku tışteki bıke.

Bı rasti ji Ali Barût xorteki zor hêja bû. Jı bona ew ji, gel berxwe diket. Ew xorteki bîaqıl, jir, zana û jêhat bû. Wi tırs çıye qet nedızanbû, xorteki bêt tırs, mina bızûtek agir bû. Jı bona ew mêrani û xusûsiyetên wi bû ku jı wira dıgotın "Ali Barût". Ango ew paşnava gel dabû ew xortê delal. Jı ber ku ew xorteki mina Barût bû. Lı milê dın de Ali Barût xısmê Husên Doxanê kurê Seyid Sılêmin bû. Du-sê bav ketıbûn navbera wan. Jı bona zanabûn û bîaqılıya Ali Barût, gel zef Ali Barût hezdıkır, hêja û qedrek mezın dıdan Ali Barût. Gel jı bîaqılıbûna wi û maqûliya wi heyran dıma. Ew rewş ji, lı Husên Doxan xwaş nedıhat, ew dexesiya, lı Ali Barût hesûdi dıkır. Wi nedıxwast ku qet kesek lı hember wi de bibe pozber. Ango rakip. Jı bona ew ji, wi dıxwast ku bı rojeki zû bedena Ali Barût lı holê de rake. Jı bona ew sedemê ji wi û Ali Yıldırım navê Ali Barût ji kırıbû nav lista reş, dabûn general Avdılah Alpdoxan. Lı pışti ew bêbextiyê de ji, Ali Barût bı ew şıklı va hatıbû kuştın, ocaxê Kekê Mıstefê hatıbû temırandın, kor bûbû.

Hukma Romê dıgıhişt kuderê û vêsa xwe dıgırt, lı ew derê de leşkergehêk xwe ava dıkır. Lı ew demê de xwe gıhandıbû Mêzgirê, lı Mêzgirê de ji leşkergeh û bıryargehên xwe avadıkır û leşkerên xwe dışand gundan, ku ew bıçın xort û mêrên Kurd kombıkın bıının û bıkujın, yan ji bıbın bıkın leşker. Ew leşkerên har û hov ji mina gurên bırcı dıçûn dora gundan dıbırıyan, ew gundana dıkırın nav çeperê, bı zora çek û silan xort û mêrê Kurd komdıkırın dıbırın lı paş gundê Qamqamıkê, lı bıne çıyayê Aşıl Bawa û bıne kêrtê Mêzgirê, lı dorbera newala Sındamê de gırêdıdan, milên wan kesên bêt súc û bêt webal dıdan ber hev rêz dıkırın, dūra dıdan ber gule û mıtralyozan bı barbari dıkuştın, cangori dıkırın. Lı pışti ew karê barbari de, icar dıçûn ew kesên mıri dıdan ber şılfan, canên wan mıriyan perçe-perçe dıkırın. Bı taybeti ew kesên ku navê wan lı lista reş de bû, ew kesana bı cûreki heywani dıhatın

kuştın. Lı bêrika hemû serbaz, çawiş û serdeste'an de ew lista reş hebû. Ali Yıldırım, Husên Doxan û gelek bêbextên dın navê gelek Kurdperweran dabûn dewleta Romê. Lı nav wan navan de, navên du kurên Bilo Axa ê gundê Axkilisê, navê Axa Beg û Memed Efendi ji hebûn. Bilo Axa ji, axaki eşira İzolan bû. Herdu kurên Bilo Axa, Axa Beg û Memed Efendi, lı tevkuştına Ermeniyân de, lı tev gelek Kurd û Ermeniyân va reviyabûn, çûbûn Emrika lı wê ciwar bûbûn. Lı pişti xurandına dewleta Osmanlı û damezrandına komara Mîstefa Kemal û derketına "efûyek gelemper" de, ew herdu bira disa dageriyabûn welatê xwe û nav qom û qebilên xwe, dolıwa xwe dimeşandın û dıçûn. Ew herdu bira gelek ji zana û cihan-nas bûn. Gor ku dıgotın wana lı Emrika ê de, kar û berên dewletê de karmendi kiribûn.

Heyam dawıya meha Tirmeh bû. Lı ser her bostek erdê Dêrsım de xwin diherikiya, axa Dêrsım bı xwına deh hezaran va sor bûbû. Avên çem û kaniyan zelaliyên xwe wenda kiribûn, bı xwına cangoriyan va reş û sor bûbûn, werge diherikiyan, laşên cangoriyên kurdistan dıkışandın, dıbirın lı behr û axên dijmin û biyaniyan de derdixıstın. Lı jor, binê esmanê şın û sayi, lı binê tava Roja Zeri de refên quling, kew û kevok, baz û her cûre teyrên Xwedê dıfırkiyan. Ew ji mina gelê Kurd bêdeng mabûn nedexwendın. Lı gundan de kesên ciwan nemabûn. Dengê kılândına meşkên dewan nedıhat. Pez lı bêhriyan de nedıhatın ditın. Êdi keseki bêhrivanên xemlok û bedew nedıdit. Ciyê bêhri û bêhrivanan, elb û beroşên şiran ji reş girêdabûn. Pıranıya bêhrivanên Dêrsım cangori bûbûn. Yên mayın ji ketıbûn şikeftan û kozıkan dıgiriyan, nedıwêriyan ku derkevın der. Giya nehatıbûn çınandın, hemû bûbûn pelax ketıbûn ser erdê. Hêz lı mil û baskên kesên sax de nema bû. Kesi nedıkarıbu ku bıçe ber çandınıya xwe, ceh, genum, nisk û nûkên xwe bıçine. Jınan toraq nedıkelandın, çurtan çenedıkırın, lı binê şikeft û kozıkan de dıgiran û



dilorandin, gazi Xwedê dıkrın. Lı nav dem û atmosferek werge de herdu kurên Bilo Axa lı mala xwe de bı bédengi rûniştıbûn bı kûrahi dihênjiyan, rewş lı nav xwe de gengeşi dıkrın. Nıška ve leşkerên Romê lı paş gundê Axkilisê de derketin, gund kırım hındirê çeperê û herdu kurên Bilo Axa, Memed Efendi û Axa Beg dil girtın, destên wan gırêdan kırım kelepçan, dan pêş xwe û berê xwe dan aliya gundê Karê û Mêzgirê.

Hewa germ tava rojê tin dida; çiçe-çiqa mêşlokên meha Tirmeh bû. Cendermeyên Romê herdu kurên Bilo Axa dabûn pêş xwe bervı Mêzgirê dimeşıyan. Heya xwe gi-handın ser kêrtê Mêzgirê, Roja Zeri lı paş kela Mêzgirê de wenda bû, çû ava. Pışti bist hûrdeman de xwe gi-handın hındir Mêzgirê û pêş leşkergehê. Lı wê cendermeyên bêbext herdu layên Bilo Axa radeste serbazê xwe kırım " me fermana te ani şûnê qumandar, lı bıli ev gelo fermanek te a dın heye ?" gotın û dawıya erka xwe anin. Lı pey ew qumandar disa dageriya ser cenderman:

- Eferim ji we memetçikan ra, ez ev karguzariya we piroz dıkm, naha evana bıgırın bıbın bavêjin nav ew dil û girtıyan, sıbe lı pışti seat nehan de ji, disa ev herdu bıran ji mınra bınan vıra, ez ifada vana bı qenci bıgırım, got û ferman kır.

Lı ser fermana serbazê bêbext, cendermeyên har û hov herdu bıra disa dan pêşıya xwe û bıran kırım girtıxanê. Girtıxane bı taybeti bêt pencere hatıbû avakırın. Bı sedan xort û mêrên Kurd lı hındirê ew zindanê de lı ser hev de rûniştıbûn, keseki kesek nedıdit. Lı dorbera ew avayıya girtıxanê de, bı sedan leşker dısekınıyan. Ne avdestxanek ew girtıxanê hebû, ne ji serşokek. Gel lı derpê û kincên xwe de miz û gûyê xwe dıkr, mırov lı ber ew rewş û bıhnê de nedıkarıbû ku, hûrdemeki bısekıne. Qirin û gazina ew Kurdên dilgirtı dıgıhişte heft qatê esmanan, balam Xwedê ji nedıbihist. Pıraniya wan Kurdên dil, beri ku bıçın pêş gulekırınê lı ew zindanê de dımırın.

Rojtira dîn lî ser fermana serbaz, du cenderme çûn herdu kurên bîlo Axa, Memed Efendi û Axa Beg girtin anin ba serbaz, radeste serbaz kîrîn. Mina hemû gundiyên Kurdistan, hîn kesên Mêzgirîyan jî lî meha Gulanê de giya û kêsên xwe çinandibûn, anibûn lî ser benderên xwe de, lî bin tavê de raxistibûn, ku ew giya û kêsên xwe hişk bîkîn, dûra jî gamê bîdîn ser bigerînin bîkîn kêş lî dema zivistanê de bîdîn heywanên xwe, jî heywanên xwera bîkîn alîf. Serbazê Tirk herdu kurên Bîlo Axa ligel leşkeran de cihîşt, lî tev du leşkerên dîn de derket çû ser benderên Mêzgirîyan, wî û leşkeran bî hevra bender sehêt kîrîn, ditîn ku lî ser benderêki de tenê kerengê kehran û kerengê benîştan hatîne raxistin, ew kerengana gelekî jî hişk bûne, sincên wan kerengan bûne mîna derziyan û serê şûr û xençeran. Serbaz lî wê sekîrî, lî dorbera xwe nihêriya, dûra bî dengêki bîlînd va ferman da herdu leşkeran, got" zû bîçîn wan herdu bîran jî mînra bînin vîra". Leşkeran" fermana te ser seran" gotîn û bî lez û bez çûn herdu kurên Bîlo Axa jî serbazê xwera anin" fermî qumandar me jî tera ev herdu bîra anîn, bîlî ev fermanek te a dîn heye yan na ?" gotîn û lî benda fermana serbaz de man.

Lî pey ew gotînen cenderman de, îcar serbaz:

- Bî lez evan herdu bîran tazî, rût bîkîn; solên van jî lî lîngên van de derxînin, lîngên van xasî bîhêlînin, wî nirê ga'an jî bîdîn ser stuyê evana, bî qenci stuyên van bî nir va girêbîdîn, dûra jî gamê bîdîn paş van, bî zexta mesasê va evana mîna ga û hespan bajon bîdîn ber zextan, lî ser ev sincan de bigerînin, canên evana perçe- perçe bîkîn bîkujîn, ez jî lî evana bînhêrîm, dilê xwe şabîkîm, got û lî benda fermana xwe de ma.

Belê, leşkerên har û hov, lî piştî fermana ew serbazê barbar de, herdu kurên Bîlo Axa tazî û lîng xasî kîrîn, nir dan ser stuyê wan herdu bîran bî qenci girêdan, dûra ew bî ew rewşa tazî û lîng xasî va kîşandîn ser wan kerengên bî sinc, gam dan paş wan herdu bîran, dargam lî helqa nir

de derbaz kırım, bı zexta mesasê va ew herdu bîrana lî ser wan kerengan de gerandin û ew dan ber zextan, canên wan perçe-perçe kırım, ew herdu bîra bı ew şıklê barbari va kuştin, ew kerengana bı xwina wan du bîran va sor û şıl kırım. Wexta ku wan leşkerên bêt ram û barbar zext lî canê wan herdu bîran dîxistin, xwina wan mina ava kaniyeki dîherikiya, qirin û gazina wan herdu bîran erd û esman dîhêjand, serbazê Tirk ji dîkeniya û cîxara xwe dîkîşand "eva jî wera qence, bîbinî Tirk çî gele; hûn dîxwazî lî dîjî dewleta Tirk derkevî ha. De iro şuva ez we bîbinî, hûn çawa lî dîjî dewleta me derdîkevî" dîgot û kêfa xwe dîanî û pesna dewleta xwe û nijada xwe a barbar dîkîr.

Her roj lî nav gel de nûçeyên reş belav dîbûn. Bî taybetî eşira Îzolan jî bona herdu kurên Bîlo Axa reş girêdabûn, jî Mele Êsiv ra çêr û kifri dîkîrî, ku çu dengê lî wî dernakeve. Hemû hozan û dengbêjên Dêrsûm, jî bona cangoriyên xwe lawje dîstrandî, helbest dînivîsandî, dîgîriyan û dîlorandî. Seyid Weli yê dengbêj jî lî ser herdu kurên Bîlo Axa lawje'ek derxistîbû, bı dengê xwe ê xwaşîk va dîstrand, hemû kesên lî dora wî dîgîriyan, berxwe dîketî, hîstêrên çavan dîrijandî. Hukma Romê qet dengê keseki nedîbîhist. Disa barbari lî ser barbariyan dîanî cîh. Her roj disa bı sedan kesên bêt sûc û bîjar komdîkîr dîbîr dîkîr wargehên bine kêrtê Mêzgirê, wargehên "Êtê Xatûnê" de cîh dîkîr. Dûra leşkeran ew kesana dîbîrî lî newala bîne çiyayê Aşîl Bawa de rêz dîkîrî, dîdan ber qîrşûnan dîkuştî, ew erda bı xwinê va sor dîkîrî.

Êdi berxwedana eşira Demenan ji nemabû, tevahiya
 tevgera Dêrsim binketibû. Leşkerên Romê hemû gund
 talan dikirin, dişêlandin û dişewitandin. Nedixwastin ku li
 Dêrsim de jin berdewam be, kesek sax bimine. Li demek
 werge de hemû leşkerên Romê li tev caş û casûsên bêbext
 li Seyit Ali Rıza, hevalên wi û neferên mala wi dîgeriyan.
 Li ew kari de disa Rayber bûbû serkarê caşan, li dilqa
 yekemin de dileyizt, li apê xwe Seyit Ali Rıza, hevalên wi
 û neferên mala wi dîgeriya. Lê Seyit Ali Rıza pîrr şik
 nedibir, ku caş û bêbext wi, hevalên wi û neferên mala wi
 bibinin. Ew li tev hevalên xwe û neferên mala xwe va li
 nav daristana dirêj de dîsekiniya, berxwe diket û li havi-
 leki dîgeriya, ku riyeki bibine. Lê dijmin qet vala nedîseki-
 niya û şûna Seyit Ali Rıza zû pêdandın kır û çend casûsên
 xwe şandin ba Seyit Ali Rıza, ku ew biçin Seyit Ali Rıza ra
 bibêjin, dewlet dixwaze ji tera rûne, peyman binivisîne û
 heqê Dêrsimiyan nasbike û bide, şer ji bide rawestandın.
 Li ser cih salıxdana Rayberê bêbext, çend kes radibin
 dîçin li nav daristana dirêj de Seyit Ali Rıza dibinin, li tev
 Seyit Ali Rıza rûdının, hemû derewên xwe ji Seyit Ali Rıza
 ra dibêjin. Seyit Ali Rıza pîrr bawer nake, balam bêt havil
 dimine, qet riyek dın ji, ji xwera nabine. Li pey ew dek û
 dolavan de, Seyit Ali Rıza tev kurê xwe ê şanzdeh salni
 Husênê Reşık, serokê eşira Kurêşan Seyid Husên, serokê
 eşira Qılan Ali Axa, serokê eşira Ûsivan kurê Qemer Axa
 Fındıq, hemû şanzdeh kesên leheng û bijar radibin li tev
 wan bêbextan rêdikevin bervi Mamaxatûnê û bervi Er-
 zınganê va dîçin. Lê sed mîxabin ku li ser pird a Mama-
 xatûnê de Seyit Ali Rıza li tev hemû hevalên xwe va, bi
 namerdi dîkevin hindirê dafık û çepera leşkerên Roma, bi
 bêbexti têne girtin û dibin dil. Li pey ew namerdiyê û
 bêbextiyê de, icar leşker hemûyan bi hevra girêdîdın û
 dîkin navginek-araç-leşkeri dîşinin Xarpîtê, dîkin zindanek
 bi taybeti, ku bi rojeki zû bedena wan hemûyan wenda
 bîkın.

Lı ser ew namerdi û bêbextiyê de du-sê roj derbaz bûbûn. Çend rojên heftê lı şuva mabûn. Wext hatibû xwe gihandibû roja În'ê. Roja În'ê lı zagona Ola İslam de rojek evrar û piroze, roja xêr û sewabane, roja efûya sûc û webalane. Lı ew rojê de disa hemû İslam'ên cihan avdestên xwe girtibûn ketibûn mızgeftan, nımêja În'ê, ew nımêja ku hemû İslaman dıgotın "nımêja evrar û piroze" ew nımêja dıkirın. Hemû mızgeftên Xarpitê bı Olperestan va tıji bûbûn. İmamê mızgeftê ji, lı pêş civatê de " Salah" dıda." Xwedê mezine " dıgot û civat radibû ser lıngan û dûra xar dibû joni, dest, eni û serên xwe dıdan ser erdê "Xwedê, Xwedê" dıgotın dıwa dıkirın. Qet lı jiyana ew Olperestan de nebû, ku lı Dêrsım çı qewumiye, çı hatiye serê ew belengazên Kurdên Dêrsım. Qet dewletek Ola İslam jı bona kuştına bı deh hezaran Kurdên Dêrsım dengêk dervedıxıst. Serda ji piştı dewleta dagirker, a Tirkên barbar dıgirtın. Cihan ji bûbû kerr û lal, bûbû çav kor, dengêk lı gelên Cihan dervedıket. Dewleta Tirk qıra Kurdan anibû bı qozê xwe ê dawı dıleyızt. Jı bona ew ji, bı lez û bez ketibû hındirê tevgerên ne mirovi kar dıkir. General Avdılah Alpdoxan dıxwast ku, bı seateki zû Seyit Ali Rıza û hemû hevalên wi dardabıke bıkuje û wana lı cihanê de wenda bıke. Jı bona ew ji, bı bêsımê -telsız-têlqırafek şandibû Anqarê, ku dewlet bı zemeneki heri kurt de dadgereki bı taybeti bışıne Xarpitê, ew dadgera fermanek bı taybeti jı bona Seyit Ali Rıza û hevalên wi derxıne, bı rojeki zû wana dardabıke û bıkuje, lı wan felat bıbe.

Lı navbera ew têlqıraf şandınê de heftek derbaz bûbû. Disa roja Ola İslam a piroz û evrar, roja În'ê hatibû, disa hemû mızgeft jı Olperestan va tıji bûbûn "Xwedê mezine, Xwedê mezine" dıgotın. Lı mıxurba êvara ew şeva În'ê de bû; dadger İhsan Sabri xwe gihandibû istgeha-ıstasyon-Xarpitê û lı wê ji lı maşınek leşkeri sıwar bû, bı lez û bez xwe gıhand bıryargeha general Avdılah Alpdoxan. Lı piştı

rewş dem pırskırın û xêr hatinê de, general Avdılal Alp-
doxan û dadger İhsan Sabri derketın bı hevra çûn mala
dadgerê bajarê Xarpitê, ku ew ji bona dardakırına Seyit
Ali Rıza û hevalên wi fermanek bı taybeti derxine. Dad-
gerê Xarpitê ji wanra" dıvê hûn ferman û destûra Wali ji
bıstınin, ku hûn usa nekın qet nabe" got. Lı wê destûr û
ferman ji dadgerê Xarpitê standın, dūra rabûn çûn qesra
Wali, ferman û destûra Wali ji girtın û êdi ketın nav kar
û berên dardakırına wan Kurdperwerên Kurdistan, ku
wana çito bıkujın, yan ji çito dardabıkın. Rûniştın lı hev
şewırıyan, bı hevra bıryar standın û ketın nav tevgerên ne
mırovi, ku ew karê xweyên barbari zû bınin cih. Lewra
hukma Romê lez dıkır, ji bona ew ji dewleta har û hov,
dadger İhsan Sabri, lı Anqarê bı taybeti ji bona ew kari
şandıbû Xarpitê, ku ew ji wi kari zû bine şûnê.

Belê, bûyer lı ser bûyeran dıqewımıyan. Her roj bı
sedan kesên bêt webal dıhatın kuştın. Dadigehên Romê
mina pizeng û mozebeşên bı jehr dıxebıtiyan, fermana
kuştına Kurdperwerên Kurdistan derdixıstın û Kurdper-
werên Kurdistan dıkuştın û dardadıkırın. West pışti nivê
şeva Şemiyê, destpêka roja yekşemê bû. Hewa hınık, es-
man sayi, bı milyon stêrik lı binê esmanê şın de dıburu-
qıyan. Hıva Zeri berê xwe dabû rojavê, alıya bajarê Mele-
tiyê, xwe gıhandıbû ser gundê Xanê, bervı Baskelê dıçû.
Bajarê Xarpitê ketıbû nav bêdengiyek bı taybeti, dengê
dikan ji nedıhat. Te dıgot hemû dikên Xarpitê ji reşên
Kurdên Dêrsım gırêdane, bêdeng mane, bêdeng dıgırın û
deng nakın. Qet kesek lı kûçeyên bajêr de nedıhat dıtın
şewqên kûçan hatıbûn temırandın; tenê navgınen leşkerên
Romê şewqên xwe vêxıstıbûn, lı alıya taxa Sako de bervı
Xarpita jorin û istgeha bajêr va dıçûn, dengê wan nav-
gınen leşkeri dıhat, şewqên wan dıhatın dıtın; zır û zır û
vıre-vıra dengê motorên wan cemse û cıpan bû. Teyr û
tûrên Xwedê ji derketıbûn ser guliyê dar û beran, her
celebeki bı zamanên xwe va dıxwendın, cûre-cûre deng

derdixistin, ew dengana dıketın nav hev dibûn, mina melo-
diyek xemdar dıgihıştın guhên mirov, dilê mirov dişewitan-
dın. Carna disa lı jor esmanê sayi de stêrik lı şûnên xwe
de dibızdiyan, dıqetıyan; şewqa bızdandına wan dibûn
mina şewqa bırûskên ku lı nav ewrê reş de dıbin weka
fıtılukan şewq dıdın, eyne werge dıhatın xuyakırın û dūra
wenda dibûn. Şewqên qesra Wali ji dişewıtiyan, ronahi
dıdan derdora qesrê, te dıgot hemû karmendên dewleta
Romê lı tev general û serbazan lı ew şeva bêdeng de kom-
bûne lı hev dişewırın, gelo Seyit Ali Rıza û hemû hevalên
wi çito bıkujin, yan ji bı çı şikli va dardabıkın.

Seat û hürdem gıran-gıran derbaz dibûn dıçûn. Xewa
Seyit Ali Rıza û xewa hemû hevalên wi nedıhat; hemû lı
tariyê de rûniştıbûn, bı kûrahi dıhênjıyan, qet dengek lı
keseki dernedıket. Te dıgot mırına wana ew rojê lı wan
eyan bûye. Dūra Seyit Ali Rıza deng lı hevalên xwe kır,
xwast ku zanıbe, gelo heval ketıne xewê, yan na. Lê hemû
heval payi bûn, lı ew tariyê de lı şûnên xwe de rûniştıbûn,
ketıbûn nav xem û xeyalan û dıhênjıyan. Seyit Ali Rıza lı
ew şeva tari de dilaweri-cesaret-dıda hevalên xwe, dıgot
"heval'no qet metırsın, em çıqas ku bıjin ji, lı dawiyê de
dısa mırın heye; lê em bı valayi namırın. Me ji bona ar-
manceki, ji bona felatbûn û Rızgariya gel şerkır. Lı şeran
de serketın ji heye, bınetın ji; mırın ji heya, mayın ji. Lê
me şer wenda kır, em bınetın, ev ji bextê meye, dıvê em
ev axırıya xwe bıpejırının. Bawer bıkın qet tışteq ewqas lı
mın zor nay, balam bêbextiya Rayber, Zeynel û Pırço, ew
hın caşên dın dilê mın reş û dax kırın. Mırov çito ji bona
mal, milk û diravên cihan dıbe dıjminê gelê xwe û xısmên
xwe, malbata xwe? Ango qet aqlê mın nagihêje bêbextiyên
usa.

Seyit Ali Rıza hina axaftına xwe neqedandıbû, nıška ve
cemsek leşkeri lı pêş derê girtıxanê de sekını; şofêr pêle
rawestekê-fren-kır, tekerên cemsê dengeki xıjok derxıst û
bû repe-repa lıngên leşkeran. Dūra dengeki heri bed û

nebaş "zûkın, ev bêbextên welat lı girtixanê de derxinın, bıkın hındirê cemsê yekser bajon bıbın sûka Ka-yê" got û ferman kır. Lı ser ew fermana serbazê de, icar leşkeran ew şanzdeh kes lı girtixanê de derxıstın der, dest û pêyên hemûyan disa bı hevra gırêdan, kırın hındirê cemsê, gıvaleyê leşker ji lı tev tıfing û çekên xwe va ketın cip û cemsan, cemsan dilan kırın navına xwe û berê xwe dan aliya sûka Ka'yê, ew Kurdperwerana bervı mırınê rêxıstın bırin.

Berbanga sıbê êdi nêzık bûbû û stêrika sıbê bêtır şewq dıda. Hiv lı paş gundê Xanê û kaşê Keşanê de wenda bûbû. Lı meydana sûka Ka'de darên sê-pê amade kırıbûn. Wexta ku mırov lı ew darên sê-pê dınhêriya, sêpiyên dewê meşkên jinên Kurdan dıhatın bira mırov û ber çavên mırov. Lê ew sêpiyên jinan kurdan qet kesek nedıkuştın, ew yarên gel bûn, av û xwarına jıyanê belav dıkırın. Lê lı ew rojê de hemû sêpiyên jinên Kurdan ji reş gırêdabûn, lı ew sêpiyên mina xwe dınhêriyan, şerm û fedi dıkırın, lı berxwe dıketın, dıgotın "em ne hacetê kuştına jıyanê ne, em hacetê jıyana mırovetiyêne".

Belê, Besa jına Seyit Ali Rıza û jinên hevalên wi bı sêpiyên werge va dew dıkan. Wexta ku Seyit Ali Rıza û hemû hevalên wi lı ew sêpiyan mêzekırın, ew sêpi û dewê welêt, jin û zarokê xwe, qom û qebilên xwe anin bira xwe. Qet bawer nekırın, lı dilên xwe de gotın "tıştên usa nabın, ma çito iro ev hacetana bûne hacetên mırina me û mırina mırovan?". Bı taybeti Seyit Ali Rıza lı ew demê de dew kılandına Bes a jına xwe ani ber çavên xwe, lı kurê xwe Husênê Reşık nihêriya, ahxek bı kûrahi kışand, kete nav xem û xeyalê Bes a Canık, şêr û şervanên Kurdistan, qom û qebilan.

Lı çar aliyên meydanê de, leşker lı tev top û tankan de amade bûbûn, te dıgot hukma Romê xwe ji bona şerê hember Êrız û Yewnan amade dıke. Leşkeran meydan kırıbûn hındır çeperê, lı çar aliyên meydanê de tıfing

kırîbûn destên xwe werge amade bûbûn, li şûnên xwe de dîsekîniyan. Dadger Îhsan Sabri, dadgerê Xarpitê û Wali ê Xarpitê, general Avdîlah Alpdoxan, serbaz û gîre-gîrên artêşa dewleta Tirk li ser kursi û sendelyan de rûniştîbûn, li nav xwe de dipeyiviyan. Yekser serbaz ferman da leşkeran " zûkîn ew bêbextan li cemsê derxînin, destên wan bî qenci girêbîdî, ew kirasên sîpi, bêt mîl û hûçîk li wan kî, li benda fermana dadger û paşa de buminî" got. Li ser fermana serbazê xwînxwar, leşkeran mina heywanên birçî û har, Seyît Ali Rîza û hemû hevalên Seyît Ali Rîza, kurê Seyît Ali Rîza Husênê Reşîk li cemsê de daxîstî jêr, destên hemûyan bî qenci girêdan, kirasê sîpi û bêt hûçîk li wan kîrîn û li benda fermana dadger û qumandar de man. Li piştî çend hûrdeman de qumandar bî dengeki bîlînd va:

- Beri ev xortî li hember çavên bavê dardakî bîkujî, bîla ev bêbextê welêt bîbine ev cihan çend koşe û çend kûçeye, dewleta Tirk kîye û çîye, qenc nasbîke, got û ferman da leşkeran û celat. Li pey ew fermanê celat qet zeman wenda nekîr, Husênê Reşîk da pêşîya xwe, bervi dara sê-pê bîr. Celatê bêbext û har jî lez dîkîr, ku wan şanzdeh kesan bî zû dardabîke, jî bona her seriyekî dîrav li dewleta xwînxwar bîstîne. Li nav serbazan de, serbazek jî, li tev jîna xwe va hatîbû ew pêşdariya dardakîrîna wan şêr û bazên Kurdistan. Çawa ku çavên ew jînkê li ew xortê Kurdistan, Husênê Reşîk ket, agîrek kete dilê ew jînkê, dilê wê şewîtiya, kelegîrî bû-çîqas ku nebe, ew jî dayîk bû-jî mêrê xwe pîrsîya, got "gelo sûc û webalê ev xortê şanzdeh salîni çîye, ku hûn ev xortî dardadîkî? Bînhêre Xwedê ev xorta çîqas jî çeleng, çak û sîpehî çêkîrîye û afîrandîye. Mîrov çawa xortekî usa dîkuje û dardadîke?". Li ew demê de Seyît Ali Rîza li şûna xwe de ew gotîmên wê jînkê bîhist û jî jînkê ra:

- Diya min berxwe mekeve, bawer bîke ev xorta li nav hemû kurên min de, ê herî ne bedew û zîşte-çîrkîn-lê dîvê tu wan xortên minên dîn bîbîni, bînhêrî ew çîqas bedew,

çak û sipêhine, çiqas şêr û pilingin, dibêje, lê jînk ber-siveki nade Seyit Ali Rıza, lı wê radibe diçe. Wexta ku celat Husênê Reşık dibe binê sêpiyê, Seyit Ali Rıza lı şûna xwe de gazi kurê xwe dıke, jı kurê xwera dibêje " kurê mın, qet jı xwe birmeke, tu kurê mını, kurê şêr û bazên Dêrsım û Kurdıstani, ez naxwazım tu bitırsi, serê xwe lı ber dijmineki mina Roma Reş de xar bıki. Heke ku bitırsi, tu kurê mın nini". Seyit Ali Rıza jı kurê xwera ew tıştana dibêje û şıret dıke, lı şûna xwe dısekıne lı mırına kurê xwe dınhêre, bı dılda xwın dıgire. Lı zıkê çend hürdeman de Husênê Reşık lı hember çavên Seyit Ali Rıza û hemû hevalên wi de dardadıkın û dıkujın, dūra ji hemû hevalên seyit Ali Rıza yek û yek, disa lı hember çavên kalo de dardadıkın, wan hemûyan lı ew derê de cangori dıkın; icar dor tê Seyit Ali Rıza. Lê celat bûye heywanek, qet lı dardakırına mirovan têr nabe. dıxwaze ku eferimeki jı qumandar bıstine. Bı lez diçe pê mülê Seyit Ali Rıza dıgire, ku Seyit Ali Rıza bıbe binê dara sê-pê dardabıke, Seyit Ali Rıza pineki lı celat dıde wi lı xwe dūr dıxine û bı xwe dımeşe diçe binê benê helqa bı rûn, serê xwe lı helqa ben de derbaz dıke, berê xwe dıguhêrine, dadger, serbazan û general Avdılah Alpdoxan, jı wan hemûyan ra:

- Mın jı bona gelê xwe, jı bona parastına erdê bav û kalên xwe jı dewleta we a xwinxwar ra şer kır. Jı bona doza Kurdıstanê ez ketım hındır ev tevgerê. Lı jıyana mirovetiyê de, lı hember serketınan, bınetın jı hene. Lê iro tevgera azadiya gelê Kurd disa bınet, disa me bı hezaran cangori dan. Lê jı xwe birmekın, wê roj bê newiyên me gelê kurd ji serkevın, tol û qesasên me jı we û dewleta we bıstının. Baweriya mın ewe, newiyên me serkevın, we-latê xwe Rızgar bıkın, ew roja evrar û piroz bıbinın, Biji Kurd û Kurdıstan, dibêje, pineki lı kursiyê bıngên xwe dıxine, kursi gıldêr dıke û bı mêraniyek werge va lı hember çavên xwinxwaran de cangori dıbe û diçe dıkeve nav refên hemû cangoriyên Kurdıstan, dıgihêje rama Xwedê.

Belê, şanzdeh kes li hember çavên ew fizik mirovan de bi ew cûreyi va tèn dardakirin û têne kuştin, lê disa ji ew şikil mirov, dil, mêjo heywanên har û hov qima xwe li ew cûre mîrana wan mêrxwasên Kurd naynîn, wê mîrinê naecîbinîn. Ango li ew mîriyên Kurdan ji ditirsîn. Ji bona ew ji, vêca bi kamyonan êzîngan tinin li meydanê de davên serhev lod dîkin, dûra meytê wan cangoriyên Kurdistan li ser erdê radîkin dibînin dîdînin ser ew loda êzîngan û agir berdîdînin binê êzîngan û xurriya agir li êzîngan dikeve û xurri û dû'yê agir bilind dibînin û radîbînin esman.

Hewa tari berbanga sibê ye. Li destpêkê de dûyekî reş û tari li meydana sûka Ka'ê de bervî esman bilind dibê, mina ewreki reş dikeve ser bajarê Xarpêtê, bajêr dikeve bin mijek reş û tari. Kesên ku ji bona hewaki hinik pencîreyên xwe vekirî hiştine, icar ew dû û mij dikeve hindîrê malên ew kesên, gelek kes ji ber ew dû û bihna ew dû de, bi tîrs radîbînin serxwe, dibêjin "her hal li taxê de şewat heye" dikevin nav şik û xeman. Teyrên Xwedê li ser guliyên daran de radîbînin difîrîkin û li ew dû dûrdikevin. Xurriya agir li tev dû radîbe, ew taxê ronî dike. Rûdiştvanên ew taxê bi tîrs derdikevin der, dînhêrin ku tax li nav çepera leşkerandayê. Li piştî niv seatê de dûyê agir têtê temîrandînin, tenê xurri û tifafa agir dumine û beri ku roj derkeve ew agir ji têtê temîrandînin û bedenên ew cangoriyên Kurdistan bi ew barbariya dijmin va dibînin ax û xali wenda dibînin dîjîn. Li ew barbariyê de armanca Roma Reş ew bû ku, tîrba Seyît Ali Rîza û ên wan cangoriyên Kurdistan li ser erdê Kurdistan de çênebin, ji gelê Kurd re nebînin ziyaretgeh û kumetên bi diroki. Hukma xwinxwar ditirsiya ku, gelê Kurd bi tîrbên wan cangoriyan xwe va, wê dijminê xwe nasbîke. Ji bona ew ji diçûn "çêtîre tîrba kesên wek Seyît Ali Rîza neyên pêdandînin û kes nezane.

Heyam wexta havinê bû. Şini lı Dêrsım de berdewam bû. Seyit Ali Rıza û hevalên wi hemû hatıbûn kuştın cangori bûbûn. Balam jin, zarok û newiyên Seyit Ali Rıza saxbûn, xwe lı nav darıstana dirêj de veşartıbûn. Hukma xwınxwar vêca ji lı wan dıgeriya. Tırsek heri mezin ketıbû dilê Mistefa Kemal û hevalên wi. Ew xwınxwara bı xwe ji hatıbû nav şerê Dêrsım. Gor ku mezinan dıgotın, lı ew hatına wi de sevkaneki eşıra Demenan gule berdıde ser dilê wi, lı sed mıxabın ku, lı bêrika ser dilê wi de seat hebûye, ew seatê ew lı mırınê felat kırıye, balam bı gırani birıdar bûye, lı dawiyê de ji, bı ew birinê canı dojev bûye çûye.

Belê, hukma xwınxwar qet nedıxwast ku, keseki rêberê tevgerê sax bımıne. Lê ku yek sax bımıne, wê lı pêşerojan de pırsgırekan ji bona hukma xwınrij derxıne, rastiyan ji gelra bıbêje, disa rabe gelê Kurd lı diji dewleta xwınxwar de rêz bıke. Ji bona ew bû ku hukma bêbext lı neferên mala Seyit ali Rıza dıgeriya. Lê Rayberê bêbext şûna neferên malbata Seyit Ali Rıza dızaniya. Lı nav wan neferan de yek ji xwişka Rayber û çend zarokên wêbûn. Ango xwişka Rayber bûka Seyit Ali Rıza bû. Ji bona ew Rayberê bêbext disa rabû ket pêşiya leşkerên dijmin, lı tev dijmin çû lı nav darıstana dirêj de hemû neferên mala Seyit Ali Rıza bı namerdi nêçır gırt. Leşkerên Roma Reş lı pêş çavên Rayber sêzdeh neferên malbata Seyit Ali Rıza bı bombeyên destan va kuştın, canên wan perçe-perçe kırin. Wi caşê namerd perçeyên canê xwişka xwe û xarziyên xwe ji nedıdit. Ew bûbû keseki bêt hış û heywan, çavên wi qet tışteket nedıditın, serda ji dılşa dibû. Lı diroka gelê Kurd de keseki mina Rayber ewqas bêbext derneketıbû.



Hukma Romê her roj barbariyek diani serê Kurdên Dêrsım. Lı aliyeki de bı hezaran kes dikuşt, lı aliya dınde ji, dadıgeriya bı dara zorê gelê Dêrsım sırgûne rojavê û navça dewleta xwe dıkir. Lı ew ji têr nedibû, icar dageriyabû ser mesela çaş, casûs û bêbextên Kurd. Hukma Romê qet nedıxwast ku, çaş û casûsek ji sax bımıne. Lewra armanc û sedema ew tıştan hebûn. Lê ku ew çaş û casûsana, tevahiya neferên malên wan ku nehhatana kuştın, wê rojeki keseki ew malbatan, ew barbari û sitemkariya dewleta xwinrij û xwinxwar eşkere bıkirana. Lı nav neferên malbatên ew çaş, casûsan de, bıbana ku, keseki dilsoz, welatevin ji derketına. Wê çaxê wi Kurdperweri hemû dek, dolav û barbariyên dewleta Romê bınvısandana, bıkirana pırtûkek diroki, cihan lı ser ew barbariya dewleta Tırk bıhesandana, serwext û agadar bıkirana. Lê ew ji lı karê dewleta xwinxwar nedıhat. Lı demek werge de hukma dagırker wê çı bersiv bıdana cihan û mirovevinên cihan. Jı bona ew tırsê ji, hukma Romê dıxwast ku bedena hemû çaşan û zar û zêçên wan lı holê de rake, guhên xwe fıreçet bıke, qet kesek ji tışteki pırs neke, rexne lı dewleta xwinxwar negire.

Rojeki nûçek lı nav kesên mayın de belav bû. Dıgotın leşkerên Romê Bertal Axa ê Cıvarıkê, serokê eşıra Xormekiyan lı hındirê qeza Nazmiyê de bı barbari kuştıne. Lê leşker tenê bı kuştına wiji têr nebûne, icar berê xwe dane gundê Cıvarıkê, çüne lı gund de şêşt û şeş(66)kesên neferên malbata Bertal Axa komkırıne, hemû bı hevra girêdane bırinê lı ser bênderê de rêz kırıne, dūra hemû dane ber gulan bı barbari kuştıne, bı şılfan va ji, canên wan perçe-perçe kırıne, qet keseki ew malbatê sax nehiştıne. Jı bona ew gel berxwe diket, dıgıra û herkes ecêb dıma. Jı ber ku, Bertal Axa lı destpêka şer de heya roja dawıya temırandına şer, ew dilsozeki dewleta dijımın bû, heval û hogırê serbazên dewleta Romê û karmendên dewleta Romê bû. Wi lı hındirê du sal şer de ji dewleta Romê re xulamti

dikir, nan û av dida leşkerên Roma xwinxwar. Jı bona hesp û qantirên dijmin, giya, ka û kês dida dewleta Romê, fermanek dewleta Romê qet ducar nedikir, yek û yek diani cih. Lı aliya din de eşira Xormekiyan lı destpêka şerê Şêx Said de bûbû hevalê dewleta Tirk, dewleta Tirk ra gelek dilsozi kiribû, bı hezaran Kurd bırayên xwe kuştibûn. Gelo çito dibû ku, dewleta Romê keseki wek Bertal Axa û neferên mala wi bı ew şiklê barbari va bıkuje. Qet keseki armanca dewleta Romê nedizaniya, qet keseki bawer nedikir, ku dewleta Romê kesên wek Bertyal Axa û dosteki xwe ê werge bıkuje. Malbata Heyder Begê Varto ê ji ew nûça bihistibû, balam wan ji bawer nedikir. Hindê Heyder Beg û Bertal Axa serokên eşira Xormekiyan bûn, lı dûrve xısmên hevbûn. Malbata Heyder Begê ji şıkek nedibir ew karê dewleta Romê. Lı milê din de gel zor berxwe diket. Jı ber ku, şêşt û şeş kesên bêt sûc û bêt webal bı barbari hatibûn kuştin û hım ji pıraniya wan kesan jinên ducan û zarokên hûr bûn.

Dikên sibê disa kiribûn qirin bang dikirin, lê lı malên gund de kesek nedihat ditin. Gundi lı malên xwe de nedisekîniyan. Hemû gundi lı tev zar û zêçên xwe va derketibûn der çûbûn ketibûn şikeftên çıyan, lı binê zinar û baxıran de xwe veşartibûn, ku canên xwe û canên zar û zêçên xwe felat bıkin, bı destê dijminê xwinxwar va neyên kuştin. Xidê naxırvan ji lı tev zar û zêçên xwe va carna dıçû lı şikefta "Gara Sey Nûriyan" de xwe vedışart, carna ji disa lı tev gundiyan dıçû newala Lodekan û newala Qemlex de diket binê baxır û zınaran de xwe vedışart û zar û zêçên xwe dıparast. Xid her roj lı berbanga sibê de lı tev gundiyan de lı şikeft û binê zinar û kevıran de derdiket dıçû gund lı hevşe û axurande dewar û pezên gund derdixıst, lı tev kurê xwe Xidê piçûk dibır dıçêrand, lı ser

gaz û tatan û ciyên bilind de pasewani dîkir, lî derdora gund dînhêriya. Xîdê wexta ku leşkerekî dijmin didit, bî lez û bez nûçe dîda gundiyan, gundiyan jî, lî eynî demê de zar û zêçên xwe dîgirtin dîreviyan dîçûn dîketin kozîk û şîkeftan de xwe vedîşartin. Xîdê bî taybetî her roj pez û dewar dîbîr lî ser gaza Şowagê û çiyayê Curnîkan de dîçêrand. Jî lewra ew herdu cih gelekî bilind bûn, mirov dîkarîbû bî hêsayî lî dorbera gund bînhêre, kî tê gund, kî dîçe. Ango ew herdu cih jî bona nîhêrandîne û pasewaniyê her hawe- mûsait-bûn. Xêncî ew, çiyayê Curnîkan û gaza Şowagê, jî gundiyan Kûpîk û Şowagiyan ra zozan bûn; pez û dewarên ew herdu gundan lî ew deran de dîçêriyan, lî ew ciyan de dîhatin xwedîkirin.

Zeman nêzîke dawîya meha Tîrmeh bû. Disa hemû gundiyan Kûpîkê çûbûn şîkeft û derên kûr û geliyan de xwe veşartîbûn. Lî berbanga roja Çarşemê de Xîdê narîrvan lî tev gelek kesên gund, lî şîkefta kelemê mala Kekê Rîza de hişyar bû, lî tev kurê xwe Xîdê piçûk dageriya gund, ku pêz û dêwêr lî hevşe û axuran de derxine. Lî rê de xofek kete dilê Xîdê. Lewra lî nav gel de roja Çarşemê rojek bêt xêr dîhat peşîrandin, lî roja Çarşemê de berav nedîbû, kînc û kol nedîhatin şostin, dîgotin "lî roja Çarşemê de berav nabe, mirov avê xwe nake, kînc û kol nayên şostin, guneye mirov karê usa bîke". Xîdê jî ew gotîna dîanîna bîra xwe û bî tîrs bervî gund dîmeşîya. Xîdê çawa ku lî Mezela Qîran derbaz bû xwe gihand bîne gorîstana gund, dît ku çî bîbine, ewe leşkerên Roma Reş gund kîrîne çeperê, Seyîd Heyderê newiyê Seyîd Ali ê Seyîd Nûrî, xîsmê wî Seyîd Nesêmi dest girêdayî lî ser bêndera Bavo ê Kekê dane, çend leşker lîgel wan de bî çek sekîniyane, gelek leşkerên dîn jî dîkevî malan çek û mirovan dînhêrin, çî ku lî wan xwaş tê dîstinî û malan dîşêlinî. Lî hember ew pêşdari de dest û pêyan Xîdê şîkiyan, xwîn lî bedena Xîdê de zîwa bû, hêz lî joniyan Xîdê de neman, xwezi lî devê Xîdê de qedîya, lêvên Xîdê qelşîyan, Xîdê

xwe şaş kır lı şûna xwe de mina kevirêki werge mat bû sekîniya. Dûra hewl da ku bimeşe an ji bireve, lê ew êdi ne keys bû, xwe zor gihand binê darên hêrmiyên xapina mala Seyid Qemer, lı wêderê de sekîni, lı dilê xwe de gazi Xwedê, ziyaretan kır, lê qet kesek lı hawariya Xidê de nehat. Hın kesên gund ji reviyân, beri dan aliya kaşê Bargê, çûn lı ber çavan de wenda bûn. Lê herdu Xid ji bona revê dereng mabûn. Çawa ku leşkerên har û hov herdu Xid ditin, lûleyên tîfingên xwe guhartin ser herdu Xidan, gotin "merevin, wê hûn werin kuştin" û xwe gihandin herdu Xidan, herdu Xid dil girtin, destên wan ji girêdan kırım kelepçan, lı tev Seyid Heyder û Seyid Nesêmi dan pêşiya xwe, berê xwe dan aliya Mêzgirê, bîrın wargeha Etê Xatûnê, lı wê kırım girtixanê, deri lı ser wan de dadan, gotin "lı hindir de hêsa bisekînim, ta ku dora we a kuştinê bê".

Havine, germe, çiqe-çiqe mêşelokane. Lı jor esman de Roja Zeri ji, lı gelê Kurd ra hatiye xezebê, bêtır tav û tina xwe dadixine ser kurdên Dêrsim, bı germiya xwe va Kurdan dîşewitine. Lı aliki ew rewş, lı aliya dın de ji hukma Roma Reş avayiyên Mêzgirê ji Kurdan ra kırıye zindan û girtixane. Lı her xaniyeki de bı sedan kes hene; ew kesên hejar û belengaz hemû lı ser hev rûniştine; bı ti û birçi bervı mırinê dıçın, nıkarıbın dengên xwe derbıxınn, dev û lêv lı hemûyan zıwa bûne; bihna miz û gû devgirteka serê mirov belav dıke, radıke mêjo lı serê mirov de nahêle. Lê disa ji Roma Reş ew tıştana ji xwera kêm dıbine. Disa her roj bı sedan kesan tine dıke wan girtixanan û wargehana, her tıji dıke. Lı Moxındiyê Sılêman Sûdi Beg, ku ew bı salan dadgerê dewleta Romê bû, ji ew dewleta xwinxwar ra dadgeri kırıbû, êdi bûbû kedbûyi, bûbû kalemêreki heri kal. Lı gundê Mastanê kurê Gedûk Axa, lı Teman Hesenê Şekır, bı sedan kesên bêt sûc û bêt webal lı ew girtixanan û wargehan de bûn. Hukma Romê her roj bı sedan kes dıani dıkır ew girtixanan, bı sedan kes ji dıbir lı binê

çiyayê Aşıl Bawa de rêz dîkir û ew kesana dîdan ber qırşûnan, canên wan qul-qul dîkirin dukuştin. Hın caran leşkerên har û heywan nedixwastin ku qırşûnên xwe xerc bîkin, icar ew kesên hejar û bêt webal bî serê şîfan va, bî şûr û xençeran va dîkuştin. Dîgotin " jî qırşûnên mera guneye, çêtire em Kurdan bî şîf, şûr û xençeran va serjêbîkî bîkujin". Lî binê çiyayê Aşıl Bawa de jî disa pîr caran ew karê xweyên barbarî pêkdînin, bî sedan kes werge dîkuştin, meytên wan cangoriyên Kurdistan lî bî tavê de dîhiştin, jî teyr û tûran ra, jî gur, hîrç û toriyan ra-çakal-dîkirin nêçir û xwarin. Lî ber bihna meytên ew cangoriyên Kurdistan de, mîrov nedîkarîbû ku lî nêzîka çiyayê Aşıl Bawa de derbaz bibe, bîçe dereki.

Xîdê piçûk lî girtixanê de diyax nedîkir, dîgiriya, dîkir qirin û gazin, lî derê girtixanê dîxist, dîgot "dêri vekî mî berdî, ez naxwazim bîmirim, gelo çî sûc û guneyê mî heye? Gelo me lî we çî kîriye, ku we em anîne kîrîne ev zîdanê?. Pîştî du rojan Husên Doxanê serokê eşîra Bama-sûran xwast ku bîçe hîn kesan lî ew girtixanan de bîbine. Lewra wî nedixwast ku kes şîkê bibe ser wî, bî rovîti kar dîkir. Çawa ku çavên Xîdê piçûk lî Husên Doxan ket " bawa em ketîne bexte te, me lî ev zîdanê de felat ke, em bî tî û bîrçyan dîmirin" got û xwast ku xwe bavêje dest û lingên Seyîd Husên Doxan, leşkeran Xîd tandan û nehiştin. Rojîra dîn Husên Doxan destûr lî serdar û Qaymeqamê qeza Mêzgîrê stand û Xîdê piçûk, jî girtîyan ra kîre Avkêş, ku Xîdê piçûk jî dil û girtîyan ra avê bîkşîne bine. Jî bona ew jî Xîdê piçûk gelekî dîlşa bû, wî êdî jî dil û girtîyan ra av dîkîşand, av dîbîr dîda wan kesên hejar û belengaz. Xîdê piçûk her roj wexta ku derdîket dîçû, ku jî girtîyan ra avê bine, bî çavên xwe va dilên Kurd dîdît, leşkerên Roma çawa wan Kurdan dîkujin û dîdîm ber qırşûnan cangorî dîkîn, wî ew hemû dîdîtî. Jî bona ew jî tîrsa Xîdê piçûk her zêde dîbû, pîr caran bî tîrsan zîmanê wî nedîzîvîriya, dîbû kureki bêt zîman û lal. Pîştî du ro-

jan, icar dor hatıbû Seyid Heyder û Seyid Nesêmi ji. Lê leşkerên hukma xwinxwar qet keseki ra nedigotin ku em we dibin, dikujin; digotin" amade bîbin em we dîşinin Rojava Tirkîyê". Lê ew derew bû; ew kesana dibîrin li bîn çiyayê Aşil Bawa, li ew geliya kûr da didan ber gulan dikuştin, canên wan perçe-perçe dikirin. Çawa ku leşkeran gazi Seyid Heyder û gazi Seyid Nesêmi kîrin, li eyni wextê de Seyid Heyderê kal bi tîrsan şûna xwe de ma û li ew hûrdemê de dilê wi sekîniya û ew li zikê girtixanê de cangori bû, çû gihişt rama Xwedê. Lê Seyid Nesêmi li şûn rakirin dan pêşiya xwe, bîrin li bîn çiyayê Aşil Bawa li ew geliya kûr de, tev bi sedan kes dan ber gulan kuştin, ew ji li tev birayên xwe li wêderê de cangori bû.

Lî roja din de icar disa bi sedan kes li ew girtixane û wargehan de derxistin, bîrin li ber newala Sîdamê de rêzkirin, ku disa hemûyan bîdin ber gulan bikujin. Hewa disa her germ bû. Disa Xîdê piçûk bi elbê av ji dilan ra dikişand. Disa li geliya çiyayê Aşil Bawa de de xwina Kurdan diherikiya, ax sor dikir. Disa çiqe-çiqe mêşelokan, çiki-çika teyran bû. Disa bi sedan kes bi hevra hatîbûn girêdan li benda mîrîna xwe de bûn. Disa leşkeran nedixwastin ku qirşûnên xwe xerc bikin, dixwastin ku li şûna qirşûnan de şîlf, xençer û şûrên xwe bîkar binin, bi ew şikli va wan welatparêzên Kurdistan bikujin, canên wan perçe-perçe bikin. Lî nav wan kesên reben û belengaz de Sîlêman Sûdi Beg ji hebû. Leşkerên har û hov, ew kesên girêdayi didan ber şîlf û xençeran dikuştin, canên wan perçe-perçe dikirin. Lî ew demê de dor hatîbû Sîlêman Sûdi Begê kal ji. Beri ku leşker Sîlêman Sûdi ji bide ber şîlf û xençerê wi ji bi ew şikli va bikuje, Sîlêman Sûdi ji leşkerê har û hov ra:

- Leşker axa, beri ku tu mîn ji bikuji, ez dixwazim çend tiştan ji tera bibêjim. Mîn hemû jiyana xwe ji bona dewleta Tirk derbaz kir. Si sali zêtir ez dadgereki dewleta we bûm; gelek keda mîn ketiye nav keda dewleta we. Mîn ji

dewleta wera qet bêbextiyek ji nekîr. Mîn qet nedîani bira xwe, ku ez rojek usa dîbinim. Mîn bawer nedîkîr, ku ev bêtara were serê gelê Kurd. Mîn dîgot, Tîrk û Kurd Îslam bîrane, mafê ev gelana yeke, lê ez iro dîbinim ku ez xelîtiyame. Mîn qet nedîzanîbû ku dewlet ev bêbextiyê bine serê mîn û gelê mîn. Ez li we tîka dîkîm, hûn mîn bî ev şîkî va, bî şîlf û xençer va mekujî, destên mîn girêdayîne, ez nîkarîbim li bêrika xwe de dirav derxînim bîdîme we. Bî kerema xwe werîm li bêrika mîn de çend quruşên mîn hene ez bîdîme we, hûn bîkî heqê qîrşûnên ku hûn ber-bîdî ser canê mîn. Çêtîre hûn mîn bî qîrşûnan va bîkujî, bî qîrşûnan va bîkujî" dîbêje, lê leşkerên barbar û hov qet guh nadîm gotînen ew kalemêrê Kurd, wî jî dîdîm ber şîlf û xençeran, canê Sîlêman Sûdî Begê jî perçe-perçe dîkî, wî jî werge dîkujî û cangorî dîkî.

Xîdê pîçûk her roj cûre-cûre barbariyên dijîmî dîdîm, dîtîrsiya û ecêb dîma. Carna dev lê dîhat gîrtî, li şûna xwe de dîrîcîfîya, dîma, li ew kîret û bêbextiyên Romê her dîtîrsiya. Bî ew zarokîtiya xwe de bî navê mirovatîyê şerm dîkîr. Dûra bî xwe bî xwe bîryar stand, ku li mîxurba şevê de bîreve. Dûra ew bîryara xwe jî bavê xwera got, Xîdê bav li destpêkê de şîret li kurê xwe kîrî, li dawiyê de jî, jî kurê xwera:

- Zor başe kurê mîn, Xwedê li tev tebe. Lê ku tu li vîra lîgel mîn bîmîni, hûm tu, hûm jî ez, em mîrîna hevûdu bîbînin. Lê Xwedê ew roj û seatê li mîn temaşê neke. Ez naxwazim tu li hember çavên mîn werî kuştî û bîbî cangorî. Jî bona te jî her êş û jan dîbe, ku ez li pêş çavên te bême kuştî. Çêtîre tu revê bîcêrîbine. Lê ku tu werî kuştî jî tev hendîk ez te nabînin; lê hewl bîde xwe mede destê leşkerên Roma har û xwînxwar. Heke ku tu felat bûyî, êdî xêr û webalê bîrayên te û xalîtiya te li stuyê teda

bın; lı wan qenc bınhêre, wana xwedi bıke. De Xwedê lı tev te û lı tev karê tebe. Xwedê jı tera bıbe arıkar, riya te vekıri be, oxıra te ji xêr be, got û disa kete nav xem û qısa wetan.

Xıdê piçûk mina her roj disa elb kırıbû destê xwe bervi kaniyê dıçû. Dit ku ewe leşkeran disa selefek mirovên Kurd danê pêşiya xwe bervi wargehên Etê Xatûnê tinn. Xıdê çawa ku ew dilên Kurd ditın, elb lı dest xwe de avit û bervi newala Sındamê û çiyayê Aşıl Bawa va bazda reviya, weka qırşûneki xwe avit binê çiyê û kete nav kelem û darıstan. Çawa ku Xıdê piçûk bazda, lê leşkerên har û hov ji vala nesekıniyan û du leşkeran dan pey Xıdê piçûk, lê Xıdê gelekı rê girtıbû lı zıkê çend hûrdeman de xwe gihand paş Qamqamıkê çû lı paş çiyê de kete binê kevirêki xwe lı bın kêvir de vêşart. Lê leşker çıqas ku lı xıdê geriyan wan Xıd neditın û dūra disa vegeerıyan û çûn bıyargehên xwe.

Şev tari, hewa ji piçeki hinik bû. Xıdê piçûk ji lı binê kevirê nav darıstanê de lı stêrikên esman dınhêriya, bı tırsan xew nedıkir dırcıfiya. Xıd lı aliki lı leşkerên Romê dıtırsiya, lı aliya dın de ji, lı cın û pêriyan, gur û hırçan dıtırsiya. Jı bona ew ji Xıdê gazi Xwedê, ocax û ziyaretan dıkir "Bismillahirramanirrahim" dıgot. Lı pişti nivê şevê Xıd pêva çû kete xewê. Wexta ku çavên xwe vekır lı cihanê nihêriya dit ku roj gelekı ji bınınd bûye, nêzıka niv rojêye, hewa ji her germe. Disa mêşelokên meha Tebaxê dıkin qije-qij, tu dibêji qiyamet dadıkeve jêr.

Xıdê piçûk sê roj û sê şev lı ciyê xwe de, lı nav ew darıstanê paş gundê Qamqamıkê, quntera çiyayê Aşıl Bawa de ma. Lı zıkê ew sê roj û sê şevan de Xıdê bı berû û giyan va jiyana xwe meşand, lı dawiya şeva sêyem de, rabû disa lı ciyên dūr riyan de meşiya berê xwe da aliya

gundê Kûpîkê. Pişti meşa sê seatan de Xîdê xwe gihand gaza Lodekan, li tîrê newala Gola Miyan de daket jêr, li newalê derbaz bû, li ber zewiya Mêrga Çelê û paş taxa Sêdikan û Neqewa Sêvîkê de, xwe gihand pêş derê mala Bay Seyid û deri kuta, li pêş deri de sekîniya. Pişti heyamê heri kurt de Bay Seyid deri vekir ku, kê bîbine, ewe kirivê wi Xîdê piçûk li pêş derê wîdaye. Çawa ku Bay Seyid Xîdê kirivê xwe dit, xwe şaş kir, nezani ku çî bike û çî bîbêje. Dûra pê milê Xîdê girt kaşe hindir kir û jî Xîdê ra:

- Lo tu xêr û sîlamet hati, li ser-ser û li ser çavan de hati, ev e du heftene ku em jî bona we xem dîkin, hemû gundi şîni danine, jî bona te û bavê te, jî bona Seyid Heyder û Seyid Nesêmi dîgîrin, li xwe dîxin. Disa hemû zar û zêç şikeftandane, ez ê kal tenê li maldame. De tu rûne, jî minra bîbêje ez qurban, tu çawayi? Bavê te li ev demê de li kuye, çî hate serê wi? Gelo ew çî bû û naha çî dîke? got û li hêviya bersivên Xîdê kirivê xwe de ma. Xîdê piçûk jî hemû ditin û serpehatiyên xwe yek û yek jî kirivê xwe Bay Seyid ra deng kir, mîrîna Seyid Heyder û Seyid Nesêmi jî kirivê xwera got, ew zîlm û barbariya hukma Romê ani ber çavên Bay Seyid de jî raxist. Li pey ew gotinên Xîdê piçûk, îcar Bay Seyid rûnişt mîna zarokan jî bona wan cangorîyên Kurdistan giriya dîlxemgin bû. Dûra dit ku Xîdê li ser lîngan de nîkarîbe bîsekîne, xewa wî tê. Îcar Bay Seyid kirivê xwe rakir bir kîre nav nivînê, Xîdê piçûk pêva çû, kete xewek kûr.

Xîdê piçûk li xewê de xewn dîditin, ew zîlm û zor ew rev û tîrs hemû li xewna xwe de carek dîn ditin û vecinîqîya ser xwe. Çito ku çavên xwe vekîrin, dit ku Ana Zerif û keça wê Zuhre ewe dew dîkên, tap û tapa dengê meşkê tê, roj jî li ser kevîrê Huli de derketiye, mîna bînderek gîlower, sor, zer bûye şewq dîde cihan. Xîdê çito ku ew pêşdari û dew kîlandîna kirîva xwe dit, yekser rabû ser-xwe, çû destê Ana Zerif û Zuhre ê maçkir li pişti rewş

dem pîrskırînê de xwatırê xwe xwast û dageriya cem dê-
mariya xwe û bırayên xwe. Çawa ku çavên Xecê lı Xıdê
pıçûk ket, bı giri û qırin va xwe avıt ser Xıdê, Xıd kıre
hembêze xwe, gepên Xıdê maçkırın û lı tev giri û şini lı
Xıdê pırsiya, got:

- Ez qurbana canê te, ma kanê bavê te? Gelo bavê te
naha lı kuye? Jı mınra zû bıbêje, çı hate serê bavê te?
Kuro Romê ew bavê te ê belengaz ji kuşt? Bay Seyid Hey-
der û Seyid Nesêmi çı bûn?. Dûra Hesên û Ali ê pıçûk ji
xwe gihandın bırayê xwe, hemûyan bı hevra destpêka giri
kırın. Xıdê hemû ditın û serpêhatiyên xwe ji xaltiya xwera
ji yek û yek gotın û disa hemû bı hevra rûniştın ketın nav
giri û şiniyê.

Heyam hatıbû xwe gihandıbû navına meha Tebaxê. Pı-
raniya ceh û genimên Kurdên Dêrsım nehatıbûn çinandın.
Yên ku ceh û genimên xwe çinandıbûn, pıraniya wana ji
gurz û pırnagên ceh û genimên xwe lı zevıyan de hiştıbûn,
fersend neditıbûn ku, wan çandıniyên xwe bıkışının bıbın lı
ser benderên xwe de raxının, gamê bıdın ser bıgerının,
zada xwe a salê ji xwera amade bıkın. Pıraniya gundiyan lı
ber çandıniyên xwe de hatıbûn gırtın bûbûn nêçira leş-
kerên har û hov, cangori bûbûn. Lı bıli ew bı hezaran kes
ji lı ser erdê bav û kalan de gırtıbûn ew şandıbûn Rojavê,
mefi kırıbûn. Bı hezaran ocax hatıbûn temırandın. Gelek
zevi û zada gel hatıbûn şewıtandın. Pıraniya zevıyan reş
bûbûn, bûbûn mina qetran û teniya sêla nan patınê. Jı
bona heywanan pelaxên xozanan ji nehiştıbûn. Pez û
dewar lı gundan de nehiştıbûn, leşkerên har û hov hemû
serjêkırıbûn, ji xwe û serbazên xwera kırıbûn kevav xwa-
rıbûn. Xıdê pıçûk û Xec ji lı pêşiya dêri de rûniştıbûn ew
barbari û sitemkariya Roma Reş birdıanin, xem û xeyalê
wan barbariyan dıditın, lı tev Hesên û Ali ê pıçûk va

digiriyân, hesreta Xidê bav dikişandin. Lı nav ew giri û
xem, xeyalan de, nişka ve lı taxa Sêdikan de dengê Bayê
Apê derket. Bayê gazi Seyid Qemer dıkır. Jı lewra Seyid
Qemer Serbexo ê-muhtar-gund bû. Lı ew demê de hemû
neferên mala Seyid Qemer û Seyid Qemer lı mal de nebûn,
çûbûn newala kûr, xwe lı nav darên biyan û sıpindaran de
veşartibûn, hêj danegeriyabûn mal. Balam jına Seyid
Qemer Ana Xatûn lı tev cayıya xwe Ana Elif hatibûn mal
bı hevra dew dikan kar û suxreyên malê dıkırım. Lı ser
gazikırına Bayê Apê, Ana Xatûn derket ser piştta xaniyê
jêrın, jı Bayê Apê ra:

- Fermo kek Bayê, çiye te xêre? Jı bona çi tu gazi Qemer
diki? Qemer lı ev demê de lı mal nine, got.

Lı pey ew de, icar Bayê Apê:

- Ana Xatûn mın dıxwast jı Bay Qemer ra bixıftana jı
bona meseleki. Husê Mıstê jı mınra got, hukma Romê
Seyid Heyder û Seyid Nesêmi, Sılaman Sûdi Begê Moxın-
diyê, Hesenê Şekirê Goncikan, kurê Gêdûk Axa ê Mastanê
û bı sedan kesên dın duhu gulebaran kırine, hemû kuştine.
Gor ku Husê Mıstê dıgot, beri ku leşker wan kesan bıbın
bıdın ber qırşûn û şılfan, dilê Seyid Heyder radiweste,
Seyid Heyder dıkeve ser erdê lı eyne hûrdemê de dumire.
Lê leşkerên Romê ew kesê mırı jı dıdın ber qırşûn û
şılfan, canê wi jı perçe-perçe dıkın. Lı aliya dın de leşker
û serbazên xwinxwar çûne mala Memık Axa ê eşıra Ari-
yan, hemû neferên mala wi komkırına bırine lı ciyeki de
kuştine. Em hemû jı qenc dızanın ku, Memık Axa dost û
yarê dewleta Romê bû, gelo çıra dewleta Romê ew bêtara
ani serê wi? Bı rasti qet aqılê mın negihişt ev meselê. Gelo
çıra dewleta xwinmij ew yarê xwe û zar û zêçên wi kuşt?
Mın jı bona van meselan xwast ku Bay Seyid Qemer bıbi-
nım, jı wira van meselan bıbêjım. Jı ber ku ew Serbexo ê
gunde. Dûra divê em riyeke bıbinın, bıçın ew meyitên xwe
bının bıxax bıkın, gora wan cangorıyan çêkın.

Ana Xatûn Bayê Apê guhdar kîr û dûra ji, ji Bayê Apê ra:

- Ma Husê Mîstê ev nûçana lî ku bîhistine? Gelo kê ev nûça reş jî wira gotiye?.

- Weleh ez jî nîzanîm. Îşev Husê Mîstê jî ligel me bû. Me hemûyan xwe lî newala Gola Miyan de veşartibû, lî ew derê de Husê Mîstê jî mera got. Lê lî gor gotîna wî, yeki gundê Pûlanê jî wira gotiye. Ew kesê Pûlanê jî, ev nûça lî devê Hesên Axa ê Germisîyê de bîhistiye. Lewra Hesên Axa, axa ê wane. Lî aliya dîn de, Hesên Axa yarê dewleta Romêye jî. Husê Mîstê dîgot neferên mala Memîk Axa çîl kes bûne. Pîraniya wan jî, jîn û zarok bûne. Bî rasti guneyê min lî wan jîn û zarokan tê, ma sûcê wan jîn û zarokên bêt webal çî bûn? Ez jî bona jîn û zarokan berxwe dîkevîm, got Bayê Apê.

Lî pey ew disa Ana Xatûn:

- La-law tu nîzani dewleta Romê kîye, çî gûye, çî bêbexte, çî Ehrîmane. Ma nayê bîra te çend roj berî dewleta Romê çî anî serê mala talîbê me Bertal Axa ê Cîvarîkê, serokê eşîra Xormekîyan. Ma tu nîzani heye roja îro hukma Romê çend hezar zar, zêç, pîr, kal, jîn, xort û keçên me Kurdan kuştîne? Ma tu nîzani hukma Romê lî şêrê Şêx Said, Qoçkîrî û çîyayê Agîr de çî anîye serê gelê Kurd? Çensed hezar gelê Kurd kuştîye? Memîk Axa kesê yekemînine. Dûra ez jî, jî bona Memîk Axa berxwe nakevîm, bêbextên wer bêne kuştîn çêtîre, balam ez jî, jî bona wan zarokan berxwe dîkevîm. Bayê bî rasti te agîr lî dilê min xîst, ev nûça reş dilê min dax kîr. Dîl dîxwast ku te nûçek bî xêr bîdana hemû gundîyan. Lê te ev nûça reş, çîriya du gundîya û gelek kesên hêja û bîjar da me. Dûra kurê Xîdê naxîrvan, Xîdê piçûk jî ewe îro hatiye. wî jî kesekîra qet tiştêk negot. Ela em lî wî jî pîrskîn, got Ana Xatûn û dawîya axaftîna xwe anî.

Lı pıştı ew nûça reş hemû gundiyan Kûpikê dıgiriyan berxwe diketın, nedızanıbûn ku çı bıkın, dest û pê lı gundiyan şıkıyabûn, Serbexo Seyid Qemer ji lı havileki dıgeriya, ku bıçın wan meytên xwe lı bın tava rojê de bının, nekin xwarına teyr û tûran, gur û hırçan. Lê qet keseki havilek nedıdıt. Hemû gundiyan dıgotın" hın kesên tari gılı ê Seyid Heyder û gelek kesên dın kırına". Jı bona ew ji şık dıbirın "Hesê Weli Hesê". Dıgotın" Hesê Weli Hesê û Ali Yıldırım navên gelek kesan û navê Xidê naxırvan ji dane dewleta Romê". Jı bona ew bêbextiyê hemû gundiyan ji Hesê Weli Hesê ra dıran tûj dıkirın, balam nedıkarıbûn ji Hesê Weli Hesê ra tışteki bıbêjın. Lewra pıšta Hesê Weli Hesê zexm bû, zora kesi nedıçû wi.

Belê, Hesê Weli Hesê keseki eşıra Bamasûran, endameki ezbeta Safiyan bû. Hes miroveki bejn kın, balam Ehriman û bêbexteki mezın bû. Wi nıvisa Erebi ji baş dıxwand. Gundiyan ji wira "Kıno" dıgotın. Ew her tım zû-zû dıçû Xarpitê û Mêzgirê, lı serbaz û karmendên dewleta Romê ra rûdınışt, lı gundan de çı dıbe, çı nabe, ji karmend û serbazên dewleta Romê ra dıgot. Jı bona ew xurıšta wi ji, keseki ew heznedıkır. Lı bıli ew, çar gundên eşıra Bamasûr, Kûpık, Lodek, Qurqurık û Şowag, ew ezbeta Safiyan qasa guneyên xwe heznedıkırın. Carna ew ezbeta lı ser eşıra xwe ji nedıhesıbandın. Jı ew ezbetê ra ezbetek " Çavhavêj" ango bêt oxat dıgotın.

Serbaz, leşker û hemû karmendên dewleta Romê lez dıkirın, ku rojeki bı zû hemû gırtı û dilên Kurdan bıkujın, zû lı wan felat bın. Lewra sax mayın û jindewariya dil û gırtiyan, dewleta xwinmij û karmendên ew dewleta har û hov dıkirın nav kar û xebatan, aboriya dewleta xwinxwar jar dıkir, xewa wan barbaran dırevand. Jı bona ew ji leşkeran sıbê de heya êvari selef bı selef welatparêzên

Kurdistan dıgirtın dıbirin rêz dıkırın, mina her roj didan ber qırşûn û şılfan dıkuştın. Dıgotın " beri ku ferman lı Anqarê bê, dewlet bîbêje êdi bese, kesên mayin berdın mekujın, çêtire em hemûyan bıkujın". Jı bona ew ji serbaz, leşker û karmendên bêt ram lı nav xwe de bıryar standibûn, ku hemû dil û girtıyan bı rojeki zû bıkujın û dawıya wan binın.

Esman sayi, şev tari, stêrik lı esman dı dıburuqıyan. Hemû teyr û tûrên Xwedê ketıbûn hindır hêlinên xwe û bın kevir û curnên daran, hırç gur, rovi, tori, kûze, kurbeşik, sunborek, mışk û mar ji lı qulên xwe de ketıbûn xewa kûr, cihan lı nav bêdengıyeke mabû. Lê lı girtixane û wargehên Mêzgirê de ne bêdengıyek hebû, ne ji razandın û xew. Bı sedan kes ti, birçê. bêt cıl û nıvın lı nav gû û mizê de nedıkarıbûn ku paldın lı ciyeke de bıkevın xew. Hemûyan dıkırın qirin û gazın dıgırıyan, lê qet keseki ew qirin û gazınıya wan nedıbınist. Lı nav ew pêşdariya ne mırovi de Xıdê naxırvan tılı avıtıbû paş guhê xwe lawjeyên ku hozan û dengbêjên Kurd lı ser cangoriyên Kurdistan derxıstıbûn ew dıstrandın û hemû kes dıgırıyan, axınên kûr dıkışandın, ji felaka malşewat ra kıfri û çêr dıgotın. Dengê Xıdê û axına dılan dıket nav hev deng her bılınd dıbûn û dengvedana dengın xwe dıda pıšta girtixanê, te dıgot naha asraqa-tavan-girtixanê vedıbe, ax, cısır û kêran lı ser mırov de dadıkeve jêr, mırov dıkuje. Lı ew girtixana kambax de Xıdê naxırvan búbû mina şefeki orkestrak mezın, orkestra sehêt dıkır, hemû sazımend lı gor şanıdana wı tevger dıkırın.

Belê, lı nav ew atmosferê de berbanga sıbê destpêkırıbû. Disa dıkan kırıbûn qire-qir. Stêrik lı esman de hêdi-hêdi wenda dıbûn, Pêwr nedıhatın xuyakırın, ew ji lı jor esman de wenda búbûn. Riya ka ê nedıhat dıtın, êdi şewqa rojê ew hemû wenda kırıbûn. Pışti demek kurt de ronahiya rojê lı bergeha paş çıyayê Aşıl Bawa de xwe da xuyakırın û cihan kıre bınê ronahiya xwe. Teyr û tûr, hemû

jindewarın Xwedê lı xew de hişyar dıbûn, dıfırıkıyan, bazdıdan, dıxwarın, dıgerıyan, dıkenıyan û dıgırıyan. Jiyan ji bûbû qeşmer. Lı aliki zılm û zor, kuştın û xwin, - lêdan û teda, mırın û şini, lı aliya dın de ji, ken û kêf, şahı û dilani. Jiyan bı xwe ji ew bû. Jı ber ku avakarê ev cihan û pısporê jıyanê, zagona xwe usa amade kırıbû. Her tışt bı du ali. Paş û pêş, ser û bın. Lê lı ew sal û rojan de, ew zagona Xweza û Xwedê lı Dêrsım de nedımeşıya. Du alitiya jıyanê lı Dêrsım de nedıhat dıtın. Jiyan lı yek aliki va dımeşıya. Ew ali ji tenê kuştın û lêdan, zılm û zor, xwin û şini, girin û qırin bû. Lı şûna ken, giri û şini, kuştın û lêdan, zılm û sıtemkari, xwin û xwinxwari, barbari û zordestiyê girtıbû. Gelê Dêrsım ken û kêf, şahı û dilani ji xwe birkırıbûn. Şahi ji Dêrsımıyan ra bûbû şini.

Lı pêş derê girtixanê û wargehan de dengê gardıyanan dıhat. Yekcar dengê leşkeran ji kete nav dengên gardıyanan û bı sedan leşkerên har û hov girtixane û hemû wargeh kırın nav çeperê, berê tıfıngan veğerandın ser derê girtixanê û wargehan. Lı pêş hemû leşkeran de serbazeki ruh hov ferman da leşkeran, got" zûkın bı lez derıyan vekın, ev kûçık û bêbextan derxının der, dest û pêyên van bı qenci girêdın bıbın kar û bêrên ev segana bıqedının". Leşkeran bı lez û bez derê girtixanê û wargehan vekırın, hemû dil û gıtiyên Kurd derxıstın der, mılên hemûyan dan berhev û hemû bı hevra girêdan û berê wan dil û gıtiyên Kurd dan aliya newala bınê çıyayê Aşıl Bawa, lı nav çeperek leşkeri de dan meşandın bırın lı çıveki de dan sekınandın. Dûra leşkeran ew hemû dil û gıtiyên Kurd qor bı qor rêz kırın û ji bona gule-barankırınê amade kırın û disa şuva dagerıyan cem serbaz, tıfıngên xwe ji tiji qırşûn kırın, lı benda fermana serbazên xwe de man. Selefa rêza Xıdê naxırvan ji lı sed kesi zêdetır bû. Reng û benz lı ser keseki de nemabû, hemû lı benda mırına xwe de mabûn, xem û xeyalên zar û zêçên xwe, qom û qebilên xwe dıdıtın. Bı hezaran kes ketıbûn nav ew ruhuyeta mırovi, dıhênji-

yan, lı zikên xwe de gazi Xwedê dıkırın. Bêdengiyek lı ew geliya kûr de berdewam dıkır, qet dengek lı keseki de dervediket. Çırk û hûrdem zû-zû derbaz dıbûn, hemû dil û girtiyên Kurd lı lûleyên tıfingên leşkeran dınhêriyan, bı xwe bı xwera "çıra ağır nakın me nakujın, usa lı ser lıngan de dihêlinın, Romê em zûva kuştine, hêz lı joni û bedenên meda nehiştiye, me lı hûrdemek zû de bıkuje çetire" dıgotın. Xidê ji lı dilê xwe de werge dıgot û xem û xeyalê zar-zêçên xwe û jiyana xwe a bıhuri didit. Nişka ve dengeki bılınd dengvedan da çiyayê Aşıl Bawa û kêrtê Mézgirê, çiyayê Aşıl Bawa û kêrtê Mézgirê hêjand, bala hemû leşker û dilên Kurd kışand ser xwe. Hemû kesan guhên xwe vekırın û berê xwe guhartın aliya kêrtê Mézgirê; lı derdora xwe nihêriyan. İcar deng carek dın dubar bû. Lı ew demê de hemûyan dit ku ewe cipek leşkeri Ala dewleta Tırk û Ala serokê leşkeri rakırıye, qornê dıde ser qornê dıkute dadıkeve jêr û bervi leşker û dilan va tê. Lı pişti ew deng û ditına Ala leşkeri û Ala dewleta Tırk de, serbaz ferman kıır, ku qet leşkerek dilan ağır neke û nekuje. Lı ew demê de hemû kes mat bûbûn mabûn û bı xwe bı xwera "em hêvi dıkın xêre" dıgotın. Lı pişti çend hûrdeman de cipa leşkeri xwe gihand ba leşker û dilan. Lı cipa leşkeri de Maraşal Fewzi Çakmak Paşa hate jêr û yekser ferman da serbaz û leşkeran, ku ew dest û pêyên dil û girtiyên Kurd vekın, wana hemûyan berdın azad bıkın. Lı ser fermana Fewzi Çakmak, leşkeran bı lez û bez benên dest û pêyên dil û girtiyên kurd vekırın û disa lı benda fermana Fewzi Paşa de man.

Hemû dilên Kurd qet bawer nedıkırın; ew tışt ji wanra mina xewn û xeyal dıhat; hemû ketıbûn nav ecêbek gıran; lı hevûdu dınhêriyan, ji hevûdu ra" her hal Xızır gihişt hawariya me, Xwedê ji mera Xızır şand, ku ew me lı ev zılma Romê felat bıke" dıgotın. Lê bı rastı Xızır-mızır lı ew meselê de qet nehatıbû ditın. Erê, lı ew rojê de gelek kurd lı destê dewleta xwınxwar de felat bûbûn nehatıbûn

kuştın, lê lı zıkê du salan de nêzıka sed hezar Kurdên Dêrsım bı barbari hatıbûn kuştın, bı sed hezari zêdetır ji hatıbûn sırgûnkırın. Fewzi Çakmak ji, jı bona qenci û bedewiya jin û mêrên Dêrsım nehatıbû ew derê. Ew kesa ji bona maf û armanca dewleta xwe a hov hatıbû Dêrsım. Wina ew mirovheziya xwe ji, bı dılqeki artisti va dıda temaşekırın, ku Kurd bibêjin" Fewzi Paşa em felat kırın, ew yarê Kurdane" felan-bêvan.

Belê, hemû Kurdên dil nedızanıbûn ku çı bıkın û jı hevûdu ra çı bibêjin. Hemû lı benda gotın û fermana Fewzi Çakmak, a dawı de mabûn, ku Fewzi Paşa çı dibêje çı nabêje. Hemûyan lı dılên xwe de" gelo Fewzi Paşa bı rasti me berdide azad dıke" dıgotın û kûr-kûr dıhênıyan. Lı ew demê de Fewzi Çakmak berê xwe guhart ser aliya dilan, bı zımanê Tırki pırsiya, got" kesên ku lı nav weda Tırki bızanın, gelo ew kesane hene, yan tunenın?". Lı pey ew pırsê de çend kes lı nav dilan de derketın" ezbeni em Tırki dızanın" gotın û disa lı bendaa ferman û bersiva Fewzi Paşa de man.

Maraşal Fewzi Çakmak lı hemûya nihêriya û jı wan kesan ra:


- Lı nav weda yek kes jı mınra pêwıste, lı we ki baştır Tırki dızane û dıaxifê, dıvê ew tenê were gel mın, hûnên dın ji dagerın bıçın lı şûnên xwe de mın guhdar kın, got û lı nav Tırki zanan de yek bıjart û bır cem xwe. Fewzi Paşa beri ku destpêka axaftına xwe bıke, destê xwe ê rastê da ser şeşara xwe, lêvên xwe bı zımanê xwe va dalês kır, xwe lı virde-wırde hêjand û usa got:

- Hemwelatiyê mınên eziz û hêja, ez dıxwazım hûn qenc guh bıdın ser mın, ez jı wera çı dibêjum, ev hevala jı wera bibêje û wergerine zımanê we. Zımanê we dibêjum lê bı rasti ev zımanê we ne zımane, zımaneki nav "Kurd" ji lı ev cıhanê de tune. Herwaha, ez jı wera lı ser ev meselê ji bısekınım, lê dıvê hûn gotınên mın qenc fêm bıkın. Bın-hêrın hûn sedı nod û neh Tırki nızanın. Bı rasti jı ev jı

wera şerme, eyibe. Mirov çito zumanê dewleta xwe fêr nabe? Mirov çawa zarokên xwe naşine dibistanên dewleta xwe? Ev dewleta me, dewleta weye ji. Bawer bikin, esl û koka me yeke. Hûn li min binhêrin, bejn û bala min, çav û biriyên min, li bejn û bala we, çav û biriyên we çûne. Bav û kalên me û we, wexta ku li ser erdê Asya Navin de derketin hatin li ser ev erdan de ji Yewnan û kafiran ra şer kîrin, ew dan pêşiya xwe birin kîrin ser ew erd û warê wanên iroin, hûn birayên me li vir, li ser van çiyên û deştan de man. Helbet bav û kalên me nexwastin ku van erdan vala cihbihêlîm û tenê biçin Rojavê û li navçe a Anadolû ê de ciwar bibin. Ji bona ew hûn li ser van erdan de man, ku hûn van erdan biparêzin, lingên kafiran nekînin ser van erdê evrar û pîroz. Dûra we li ser van erdan de zumanê bav û kalên xwe ji xwe birkîr; îcar we li nav xwe de zumaneki herî kîr û kurt derxist. Ji ber ku hûn li pîraniya birayên xwe dûr mabûn. Ango we destpêkîr, peyvek li cînarên xwe Ereb, peyvîkek ji Faris'an, virde-wirde we çend peyvîkên din ji, ji xwera ditin, we ew peyvîkîna kîrin nav zumanê bav, kalîkên xwe, li tevhev xistin û ji xwera kîrin zuman û bî ew zumanî va we kar û berên xwe meşandin û hatin gihîştin ev rojê. We ji bîra û gelê xwera peywendî girênda. Dewletê ji wext nedit ku dagere ji wera mijûl bibe û peywendî ji wera girêbide. Ango dewletê serê xwe li şeran de felat nekîr, ku dagere ji derdê wera dermaneki bibîne, we perwerde bike. Hûn bî ew şiklî va li nav ev rewşa iroin de, kevneyar man, bûn rêbîrr, bûn nijdevan, hatin gihîştin ev rojê. Dîvê hûn li min û gotinên dewletê bawer bikin. Em ji wera qet derewan nakînin, hûn Tirkên xasînin, koka we diğihêje koka Tirkên Oxîz. Tirkên Oxîz ji, Tirkên xas û mêrxwasînin. Bî hezaran sal berî em xwedîyê van erdan û tevahiya Anadolûyê bûn. Binhêrin navê Anadolûyê bî Tirkîye. Ango mana ev peyvîkê "Dayê Tîji Bîke". Li mêj de, hezaran sal berî, dayîkek Tirk li ser rîya Anqarê de her roj dew daye rêwanan, zikên rêwanan

têr kırıye. Ki ku lı ba ew dayika Tırk de derbaz bûye, ji ew dayika Tırk ra "Ana Doldur" gotiye, lı pışti ew rojê vırde ji, navê ew erdê bûye "Anadolû". Bı hezaran sal dûra şer derketine, bav û kalên me û we bêt havıl mane, dageriyane çûne Asya Navin lı wê ciwar bûne. Dûra ji lı hemû cihan de belav bûne, bûne xudanê ev cihan. Ango bav û kalikên me lı cihanê de belav bûne, hemû cihan kırine binê bandûra xwe. Ango em bavê hemû nijad û gelên ev cihanêne. Lı diroka ev cihan de cara yekemin em derketine ser ev erdê Xwedê, bı eslê meva gel peyda bûne. Bav û kalên me Tırkan şareza i û şarweri lı ev cihanê de belav kırine. Bı kurtasi lı ev cihan de çı tıştên hêja hene, hemû bı destê bav û kalên meva çêbûne û hemû karpêkên me Tırkanın. Lı aliya dın de, zımanê me Tırkan dayika zımanê hemû gelên cihane. Şarweriya Mısıra kevn, Sumer, Akad, Asûr, Yewnan, Çin, Hitit, Hindistan, Roma, Med, Pers evana hemû yên mene. Em bav û kalên ew şarweri û ew gelên kevnın. Ango em Tırk nijadek usa her xas, bı-aqıl, xudan huner û çand, şervan û leheng, mêrxwas, gernas û egiştın. Hemû gelên ev cihan me qenc nasdikın; hemûyan ço û kotekên me pırr xwarine. Jı bona ev e ku kes me heznake. Bı taybeti dewleta Yewnan, Êrız û İngiliz dijminê mene. Lı ev serihıldana we de ji, bawer bıkın tılıya İngiliz û Yewnan heye. Bı taybeti İngiliz wan serokên we tız dıke, dıxwaze ku welatê me perçe bıke, me û we bıke dijminê hevûdu. Ev tışta ji nabe, kêra xwe nagihêje me û we. Dewleta me qet fersendê nade dijminan, nade kes û hêzên veqetixwaz û bêbextan. Xwedê şikir em hemû İslamın; Ola me yeke, esl û koka me yeke. Ev erd û welat, erd û welatê me û weye. Jı bona ev tıştana ez ji wera dibêjın, guh medın dijminan. Bawer bıkın lı ev cihan de nijadek nav Kurd tune. Dirok qet qal û behsa nijadek nav Kurd nake. Naha ez we hemûyan azad dikım, serbest berdidım. Ev fermana dewletêye. Dewleta me, dewletek bı rame, lı rojên tengaside dewlet lıgel weye. Êdi qet metir-

sın. Lı vır bêt tırs dagerın herın malên xwe û nav zar û zêçên xwe. Lê qet jı xwe birmekın, ku hûn Tırkın, hum jı Tırkên bı esl û xas. Ez jı wera sond dıxwın, sozê dıdime we, iro şuva dewlet lı gundên we de, lı hemû Rojhılata û Rojhılanda başûr a Tırkiyê de dibistanan ava bıke, dibistanan veke jı bona we û zarokên we. Lı destpêka avakırın û vekırına dibistanan de, dıvê hûn zarokên xwe bışının dibistanan, bıla zarokên we Tırki bıxwinın, Tırki bıwıvisının, zamanê Tırki fêr bıbın. Jı ber ku zamanê Tırki, zumanê bav û kalikê weye ji. Bıbın nasê çanda Tırk, bınhêrın çanda Tırk çıqas dewlemende. Hûn qenc dızanın, lı beri ev serihıldana we de, çend serihıldanên dın ji qewımıyan. Ez bawerım baş tête bira we ew serihıldana ketın çı encamê, çıto hatın temırandın, çı hate serê wan rêber û serokên wan tevger û serihıldanan. Mıstefa Kemal Paşa lı destpêka demazrandına komara nû de, jı serok û rêberên wera got, agadari da cihanê. Dıvê hûn qenc bıbın bira xwe, wı got" ev welat û ev meclıs, welat û meclısa gelê Tırk û Kurde". Lê hın dın û bêbextan fêr nekır, serı hışkı û bêbextı kırın. Bınhêrın iro lı meclısa me de nêzıka sed kesi Newêrgerên Kurd hene. Disa lı artêşên me Tırkan de bı sedan Serbaz, Sıtvan, Miralây û General hene. İsmet Paşa jı bı eslê xwe va Kurde. Ma qet we rojeki bıhistıye ku, wan kesan jı tışteki gotıye? Ma hemû serokên we jı wan kesan pırtır dızanın? Gelo ew jı wan kesan bıaqıltırın? Ew kesana hemû mırovên maqûl û zanane, ronakbır û rewşenbırın. Wan hemûyan lı dibıstanên bılınd û zanıngehan de xwendıne, kolej kuta kırıne. Balam ew kesana mına serok û rêberên we nabêjın "Em Kurdın". Bı rastı, ku geleki nav kurd hebana, wê wan kesana jı bıgotana "welleh em Kurdın". Lê em dibının û dınhêrın ku, ew kesana qet tışteki usa nabêjın; ser da jı, jı kesên mına serok û rêberên wera "ew nezan û xeşımın" dibêjın. Lı bılı ew Newêrger û serbazên leşkerı, iro lı hemû sazgehên dewletê de karmendên Kurd hene. Ew kesana Mamostene, Mıhendısın, Parêz-



gerın, Dadgerın, Bjişkın, Qaymeqamın, Wali ne, felanın-
bêvanın.

Fewzi Çakmak dıpeyiviya, dilan ji guhdar dıkırın, balam nedıkarıbûn ku, lı ser lıngan ewqas dûr û dirêj bısekının. Ji lewra hemû ti û bırcı bûn, zikên wan bı rojan tıştekek neditıbûn, hemû bêt xewbûn. Fewzi Çakmak ji axaftına xwe dirêj dıkır, wergêr ji, ji dilan ra werdıgerand zımanê Kurdi. Lê ew hejar û belengazên Kurd her bêzar û bêt kêf bûbûn. Dıxwastın ku, ew dijminê xwınxwar axaftına xwe kurt bıke, bıqedine, ku hûrdemeki zû, ew felat bıbın, bıçın bıgihêjın nav zar, zêçên xwe, qom û qebilê m xwe. Lê Fewzi Paşa ê xwınmıj dirêj dıkır û dirêj dıkır. Tıştên wer dıgotın ku te dıgot qet ew kesa Fewzi Paşa ê duhuni nine. Wexta ku wergêr gotınên Fewzi Paşa ji dilên kurdan ra werdıgerad, icar hemûyan lı hevûdu dınhêriyan, lı dil û hışên xwe de bı hezaran kıfri û çêr ji Fewzi Paşa ra dıgotın. Lı ew demê de Xidê naxırvan xwast ku bıbêje" ez dı... derewçinan... lê xwe zor zeft kır. Hemû dilên kurd lı hışên xwe de dıgotın" lı ev qetılkarê sed hezaran bınhêrin. Ev lı destpêka avakırına komara tırk de, heya roja iro "Serokê Serkantıya gıştı"ye. Ev hevalê Mıstefa Kemale. Ewana lı destpêka damezirandına komara nû de bextên xwe kırine yek. Hemû eyın rıxın. Ev xwınxwara ji lı destpêkêde heya roja iro ew kari dıke. Lı tevkuştına Qoçkırıyê de, lı tevkuştına Şêx Said û İhsan Nûri de, tılıyên vıên gemarin hebûn. Ev kesa berpırsıyarê hemû artêşên dewleta xwınxwar bû. İro ji ketıye dılqê mırovhezeki, dıxwaze ku bı ev derewan va me bıxapıne. Dıbêje em bırane, eslê Tırk û Kurd yeke, Ola me yeke, nızam esl û nıjada Tırk bavê hemû gelên cıhane. Errr av lı arê bavê ev xwınxwari be, ev çı derewın keko, ev bêbexta dıke û lıngên qantıran dışkıne. Dıbêje "Ola me yeke". Êhh başe, Ola me yeke, lê Ola we û Ereban, Ola we û Farıs'an ji yeke, ma çıra hûn ji wanra nabêjın Ereba û Farıs bırayên mene? Kuro ma ku bı rastı em bırabana esl û koka me ku

yekbana, ma qet we usa em dikuştin qıra me diani? Mırov çito bêtarên usa tine serê birayên xwe? Mırov çito bı şık-
 leki jenosidi birayên xwe dikuje? Erê raste, lı nav biran de
 ji şer û pevçûn derdıkeve, bira ji birayê xwe dikuje, ev
 realitê em dızanın. Jı bona xêrxwazi û xêrnexwaziya biran,
 bav û kalên me usa gotine" Bira ku bira be, jı jına bira ê
 xwera nazewice". Em bibêjin, ê baş, bira jı jına birayê
 xwera zewici. Ma bira dıkarıbe hemû zar û zêçên birayê
 xwe ji bıkuje? Em bibêjin bira zar û zêçên birayên xwe ji
 kuştin. Lê lı ew demê de wê diya wan zarokan çı bıke.
 Gelo ew jınika bı rasti jı ew kesira dıbe jin û yar? Na, ew
 ne keyse, çucaran ew jınika lı ew kesira nabe yar. Lı bili
 ev, lê ku bı rasti em bira bûn, kok û eslê me ku yek bû,
 ma çıra we bı hezaran zıkê jinên meyên duçan û nefsnex-
 waş qelışandin, bı hezaran ew pızêzên me û dayikên me
 kuştin, ew zarokana kırım serê şıfan, we ew pızêzana
 sehêt kırım" gelo kure, gelo keçe" gotın û ew barbariya
 anin serê birayên xwe?. Na-na paşa ê derewçin û bêbext,
 em qenc dızanın rewş çawaye û lingên qazê çitone. Lı gor
 ev gotinên te eslê me Tırke, Kurd û Tırk yek nijad û
 birane. Lê bı rasti ev derewek bı doçıke. Em ku birayên
 hevban, we ev bêtara nedıani serê me, we bı sed hezaran
 em nedıkuştın, serên mêr, jin û zarokên me jênedıkırım, bı
 sedan zarok nedıkırım çal û xaşıyan nedıavıtın gol û çeman
 lı wan gol û çeman de nedıxeniqandin. Bı kurtasi, em ku
 bı rasti Tırkbana, we evqas zılm, kuştın û barbari nedıani
 serê me Kurdan. Ha yek ji ev e; Fewzi Paşa dıbêje" gelek
 Newêrgerên kurd lı meclisa meda hene, lı artêşên mede bı
 sedan serbaz û general hene, lı sazgehên dewletê de kar-
 mendên kurd hene û dıxebıtın. Kurd ji dıbın, Sexmekar,
 Bijijk, Parêzger, Mamoste, Qaymeqam, Wali, hwd. Lı vir
 divê mırov lı ev xwınxwari pırs bıke, bibêje, raste lı mec-
 lisa weda gelek Newêrgerên Kurd hene, lı artêşên weda bı
 sedan serbaz û generalên nijad Kurd hene, lı sazgehên
 dewleta ewda bı hezaran karmendên esl Kurd hene, Kurd

dıbın Mihendis, Bijjk, Parêzger, Qaymeqam, Wali, Mamoste û karmendên dewletê û hwd; lê gelo ew kesana Serbaz, Generalên artêşa kijan dewletêne? Ew Mamoste, Sexmekar, Parêzger, Dadger, Dirokzan, Cıvakan, Mamoste, Bijjk, Parêzger, Dadger û Dirokzanê kijan dewletêne? Ew Newêrgerana lı meclisa kijan dewletê de Newêrgeriyê dıkin û Newêrgerên kijan dewletêne? Wali û Qaymeqam, lı bajarên kijan dewletê de Qaymeqamti û Walitiyê dıkin? Ew Wali û Qaymeqamên kijan dewletêne? Hemû dıbistan û zaningeh, dıbistan û zaningehên kijan dewletêne? Ew karmendana jı kijan dewletêra kar dıkin û dıxebıtın?" hwd. Gelo ki dıbêje ew karmendê Kurdistanın?

Jı bona gırtıyan zeman her gıran debaz dıbû, dawıya axaftına Fewzi Çakmak nedıhat, dırêj dıkir û ha dırêj dıkir. Hın kesan qet guh nedıdan ser Paşa ê bêbext, ketıbûn nav xem û xeyalan. Hın kes lı bın lêvan de dıkenıyan, çêrên xwaşık jı Fewzi Çakmak ra dıgotın. Lı ew demê de Xıdê naxırvan jı hevaleki xwera:

- Dewleta Romê wer têtê xuyakırın ku, vêca jı bıryarek dın standıye; ez bawerım lı iro şıva jı destpêka kareki dın bıke. Bıbe ku êdı pıştı sıbe lı hemû gundên Dêrsım de dıbıstanên xwe avabıke. Zarokên me bı zorê bıbe lı wan dıbıstanan de perwerde bıke û bıhelıne, bıke Tırk. Ango kareki "Asımılasıyonı" bı kar bıne. Bûrayê mın Alıekber jı mınra usa dıgot, naha ez ew gotınên Alıekber tınım bıra xwe. Bûrayê mın Alıekber xorteki xwenda û mamosteye. Gelek wexte ku çu nêçeeq mın jı lı derheqa wı û malbata xezûrê mın de tune. Ez hêvı dıkıım tışteq nehatiye serê Alıekber. Ez jı bona wı pırr dıtırsım. Lewra ew zûva ketıbû çavê dewleta Romê. Wali Fahri ê dınık jı çend caran gazi Alıekber kırıbû, jı wı gef xwarıbû, çêr û peyvên nebaş jı lıwık ra gotıbû, nızam" ez te bıkujım" felan-bêvan gotıbû. Lı ev demê de, gotınên vı bêbextı wan gotınên bûrayê mın Alıekber tıne bıra mın. Alıekber dıgot" ku hukma Romê bıkeve Dêrsım, wê lı Dêrsım de jı leşkergeh

û dibistanên xwe ava bîke". Welleh gotinên Aliekber naha va derdikevin. Hukma Roma Reş lî pişti evqas xwin û kuştin de, kete Dêrsim ji, mala me xîra, pergala me belav kîr, xort û mêr, jin û zarok lî Dêrsim de nehişt, hemû kuşt, jîyan lî Dêrsim de nehişt. Lê nîzam ez çî bibêjm, Xwedê axiriya meyên mayin xêr bine, got.

Lî pişti axaftinek her dirêj de, Fewzi Çakmak:

- Naha dagerin malên xwe, nav zar û zêçên xwe; lî ev hûrdemê şuva, hûn hemû serbestin, hûn azane; lê jî xwe qet birmekin ev gotinên min bîkî gahr lî guhên xwe de dardakîn û jî hemû kesan ra jî bibêjm, got û disa lî cîpa xwe sıwar bû çû, lî ber çavan de wenda bû.

Xîdê naxîrvan û hemû girtiyên Kurd geleki dîlşa bû-bûn. Lî ser ew fermana Fewzi Çakmak de leşker û serbazan ji" bîçin hûn azane" gotibûn, lê pîraniyan nedîkarîbûn ku bimeşin. Bî birçiyên çêqên pîraniyan dilerziyan, hêz lî jonyên wan de nema bû. Bî ew rewşê va Xîdê bî zar û zor xwe gîhand gundê Kûpîkê û nav zar, zêçên xwe. Çawa ku gundiyan Xîdê ditin, geleki dîlşa bûn, balam jî bona Seyid Heyder û Seyid Nesêmi ji digiriyan, berxwe dîketin. Bî taybetî lî mala Seyid Heyder û Seyid Nesêmi de şîni hebû. Seyid Heyder mezîne gundê Kûpîkê, xudan ocaxekî her mezîn dîhat hesabandin û naskîrîn. Jî bona ew jî, bî sedan kes hatîbûn şîniya Seyid Heyder û Seyid Nesêmi, balam lî çar aliya gund de pasawan hebûn, lî leşkerên Romê dîpiyan, lî bêbextiya Roma reş ditîrsiyan. Xîdê çîto ku xwe gîhand derê malê şahiyek kete hîndîrê xana Xîdê. Lî ew demê de Xecê qet zeman wenda nekîr, yekser çû lî axur de gîskê xwe ê şeş mehîni derxîst anî der, gazi Bayê Apê kîr, ku Bayê Apê were ew gîskî serjêbîke, jî Xîdê ra bîke qurban. Bayê Apê jî lî ser gazîkîrîna Xecê bî lez çû, gîsk anî lî ber lîngên Xîdê de serjêkîr, Xecê bî tîliya xwe va xwîna qurbanê lî eniya Xîdê ra kîr, xwin lî ser eniya Xîdê de mîna dîlopek av herîkiya daket nav biriyên Xîdê û berejêr bû xwe gîhand ser pozê Xîdê. Dûra Xîdê pozê xwe

paqj kır, dageriya hındır, Bayê Apê ji gisk gura, goşt perçe-perçe kır, kire ser siniyê û da Xecê, karê xwe qedand. Lı pey ew ji Xecê gazi Xidê piçûk kır, siniya goşt da dest Xidê piçûk, ku ew goştê qurbanê lı nav der û cinaran de belav bıke. Xidê piçûk ji siniya goşt girt û lı nav der û cinaran de belav kır û ew karê xwe qedand, disa dageriya mal.

Belê, bı ew rengi û bı ew barbariyên ne mirovi va, tevgera Dêrsım bınet, nêzıka heftê, heştê hezari kes cangori bûn, hukma Romê serket. Lı pişti bınetına tevgera Dêrsım, icar kar û berên sıgûnkırınê her zêde bûn. Dewleta Tırk bı hezaran malbatên kurd şand navçe a Tırkiyê û Rojava Tırkiyê. Lı nav wan malbatan de, malbata serokê eşıra Bamasûran a Seyid Sılêman û du bırayên wi Seyid Bektaş û Seyid İwık ji hebûn. Hukma Tırk ew sê malbatana şandıbûn bajarê Bûrsa ê, lı gund, qeza û liwan de lı hev belav kırıbûn. Mala Seyid Bektaş lı gundeki qeza Mûdanya'ê de, mala Seyid İwık lı taxek qeza Mûdanya'ê û mala Seyid Sılêmin ji lı liwa Tirilye'ê de dabûn ciwarkırın. Ango ew sê malbatana jı hev veqetandıbûn, peywendiyên wan jı hev qutkırıbûn, ew kırıbûn bı sehêtek bı taybeti. Hukma Tırk qet tıstek nedabû mala Seyid İwık û mala Seyid Bektaş, balam jı bona mala Seyid Sılêman û kurê wi Seyid Husên gelek tıst kırıbû. Lı Tirilye de xaniyeki du qat, pênc baxçe'ên darên Zeytûn, baxeki gewre ê Tiri, gelek erd û zevi dabû ew malbata Husên Doxan, ew malbata bı ew rengi va bûbû xudanê du erd û zevıyan.

Zeman êdi xwe gihandîbû destpêka meha Îlonê; lı Dêrsim de şer nemabû, bêdengi û firêqetiyek lı Dêrsim de hukum diajot. Qet tevgerek çekdari ji nemabû. Carna dengê tîfingan dîhatın, lê ew ji zû dîhatın temırandın. Hukma Romê lı her qeza, liwa û gundên Dêrsim de, leşkergeh û dîbistanên xwe ava dıkir. Generalê awerte Avdilah Alpdoxan, serbazên artêşa xwinxwar, Wali ê xarpitê her roj têlqıraf û pesendname lı Anqarê distandın. Lı wan têlqıraf û pesendnaman de, Serok Komar Mıstefa Kemal, Serok Wezir Celal Bayar pesna wan kesan û pesna şervani û mêrxwasiya leşkerên barbar dıkirın. Jı bona Rayber ê caş û bêbext, kesên mina Rayber ji fermanek bı taybeti ji Wali û general Avdilah Alpdoxan ra şandîbûn ku ew qet wext wenda nekin, wan bêbextan bı rojeki zû bıkujin, bedenên wan û ên zar û zêçên wan lı holê rakın ew mal, mılک, zêr û zivên ku beri dabûn wan, wana ji şuva bistinın. Lı pışti ew fermana Mıstefa Kemal û hukma Mıstefa Kemal, general Alpdoxan û Wali ketîbûn zikê tevger û xebatek bı taybeti, ku rojeki bı zû ew fermanê binın cih.

Lı pışti ew fermanê de du roj derbaz bûbûn. Rayber û kesên mina Rayber lı malên xwe de mina paşan ketîbûn nav nivinên xwe xew dıkirın. Qet nûçe'ek wan lı ser fermana hevalbendên wan de tunebûn. Hemû ketîbûn xewa kûr, xewnên rengin dıditın. Lı sibehina ew rojê de hewa piçeki hinık, ciyên hêşın xisk girtîbûn, rengê çıman hatîbûn guhartın, te dıgot lı ser çıman de berfa sıpi bariyaye. Hina roj ji lı aliya gundê Mıxiyê û lı ser kela Xarpit a kevn de derneketîbû. Hemû teyr û tûr lı tev refên xwe dıfırıkiyan, derketîbûn ser daran, lı ser guliyên daran dîhêwıriyan, dıkirın qire-qır dıxwendın, bı zımanên xwe va, jı hevûdu ra dıpeyivıyan, tışt-mışt dıgotın. Lı heyamek werge de derê Rayberê bêbext kire teqe-teq, hate kutan. Lı ser ew dengê deri kutandınê de Rayber vecemqıya serxwe, bazda paş dêri" lı ev berbanga sibê de ew kiye" got. Lı pey ew pırsa Rayber, dengeki bılınd û bı hêrs:

- Kuro dêri veke, em leşker û polêsın, got.

Lı pey ew dengi de icar Rayber:

- Lı ev seatê de xêre, hûn lı mın çı dıxwazın?

İcar bı hêrs:

- Kuro zû dêri jı mera veke, hina ku me deri perçe neki-riye, ağır nedaye ber ev xaniyê te, got.

Rayber ecêb ma, xofek mezın kete zikê Rayber. Wi qet neditibû, ku leşker jı wira werge bıaxıfın û bıpeyivın. Bı xwe bı xwera" evana usa nebûn; beri vana wexta ku gazi mın dıkırın, jı mınra" Rayber efendi, an jı Rayber beg" digotın. Gelo iro xêre, çı lı evana qewımiye, ku evana usa gazi mın dıkın û lı ev berbanga sıbê de mın bêkêf dıkın" got û deri jı leşker û polêsın ra vekır. Çawa ku deri vekır, dit ku çar-pênc leşker û serbazek, çend tene jı polês lı pêşiya dêri de sekıniyane. Lı ew demê de jına Rayber û kurê Rayber ê mezın Ali Heyder jı xwe gihandın pêş dêri, ditın ku gelek leşker û polês lı pêşiya dêri de kombûne, dıxwazın ku bıkevın hındır malê. Rayber ketibû nav tırsek mezın, nedızanıbû ku jı leşker û polêsın ra çı bıbêje. Dûra dageriya ser serbaz, xwast ku jı serbaz pırs bıke, bıbêje ev çı rewşe, çıra hûn mın bêkêf dıkın, lê serbaz qet destûr neda Rayber, ku Rayber bıaxıfe. Serbaz yekser dageriya ser Rayber, jı Rayber ra:

- İşev wezirê hındır welêt, lı Anqarê-bı têlqırafê-jı mera fermanek bı taybeti jı bona te şand, divê em ew fermana dewletê binın cih got.

- Gelo xêre, ew çı fermane we standiye, got Rayber?

- Divê tu beri her tışt, ew zêr, ziv û diravên ku dewletê daye te, tu wana hemû lı ev hürdemê de bini radeste me bıki, ev yek. A duwem jı ez jı tera dûra bıbêjum. Naha tu zûke wan dirav û zêr, zivan jı mera bine got serbaz û lı benda zêr, ziv û diravan de ma.

Lı ser ew fermana serbaz, Rayber çû zêr, ziv û dirav lı bın axê de derxist ani radeste serbaz kır" fermo jı wera " got û bı tırs lı şûna xwe de lı erdê va qemiti ma. Jına

Rayber û kurê Rayber ji qet manek nedan ew tevgera leşker û polêsan. Tırsek mezın kete dilê wan ji, ew ji lal bûn û lı şûna xwe de man. Lı pışti du-sê hûrdeman de serbaz bı dengeki bıınd va ferman da leşker û polêsan " ev segi, tev hemû zar û zêçên vi bı qenci gurêdın derxinın der, pıšta hemûyan bıdın ber diwarê xêni, lı benda fermana mın de bısekının, de mesekının lez bıkın" got û lı benda dawıya fermana xwe de ma. Lı pışti ew fermana serbaz de:

- Qumandar efendi mın lı we çıkır, ku hûn ev bêbextiyê tinın serê mın û serê zar û zêçên mın? Mın jı bona dewleta we ewqas kar kır. Jı bona maf û berjewendiya dewleta we ez bûm dijminê gel û xısmên xwe, balam ez bûm dost û yarê dewletê û werge ji mam. Naha ji hûn ev bêbextiyê tinın serê mın, gelo diyariya we jı bona mın ev bû? got û pırsiya Rayber.

Lı ser ew gotinên Rayber de, Serbaz:

- Divê te lı destpêkê de zanıbana seg. Ew kesê ku jı gel û malbata xwera nebe yar, çucaran jı geleki xerib û biyani ra nabe dost û yar. Te ev tıšta jı xwe birkırıbû, tu ketıbûy nav xem û xeyalê malê cihan. Te jı bona dırav, zêr û zıvan, lı ber çavên xwe de xwişka xwe, xarziyên xwe û hemû kur mamên xwe dan kuştın. Canên wan lı ber çavên teda perçe-perçe bûn. Lı destpêkê de te jı bona malê cihan serê Alişêr û Zarife xanımê jêkır jı mera ani. Disa jı bona malê cihan te hemû sırên tevgera gelê xwe jı mera diani, te jı gelê xwera bêbextiyên mezın kırın. Te û hevalên te derê hemû şikeftan lı me temaşe kırın. Bınhêre û bine bira xwe û ber çavên xwe, te çı aniye serê gelê xwe. Mıroveki mina te evqas bêbexti jı gelê xwera kırıye, gelo çı garantiyê tu bıdı me, ku tu jı mera jı bêbextiyên usa neki? Mırovê ku jı gelê xwera nebe yar, çucaran jı biyanıyan ra nabe yar. Ev gotinê jı xwe birmeke. Tu mıroveki bêbexti. Pisikolojiya te jı, jı bona bêbextıyan amadeye. Divê kesên mina te nejın. Ev şere, ki ku bıaqıl be, ki ku bı hêz be, ki ku

xudan fêl û fêlbaziyan be, ew serdikeve. Mêrani û mêrxwasiya şeran ji, li ev kar û faktorana va girêdayiye. Ev faktorana ji li dest meda hebûn, me ev faktorana bîkar anin û em serketin. Li bîli evana, dilsozi û mêraniya şeran ji hene. Carna mirov dilsozi û mêraniyên dijminên xwe ji dibine, li wan dilsozi û mêraniyan heyran dimine. Ev tîştana li dirokê de pîrr hatine ditin. Carna du dijmin ji li zikê roj û salên dirokê de dibin dost û yarên hev. Balam kesên mina te, qet ji kesekira nabînin dost û yar. Dostaniya te ji dewleta mera, li gel dijminatiya Alişer û Seyit Ali Rıza de qet tîştêk ji nîne. Dijminatiya kesên wer, li dostaniya te hezar cari çêtirîn. Hêja û nerxa te, qasa sifîrek gîlower ji tune, got û ferman da leşkeran, ku hemûyan li ber diwêr de ji bona gulekirinê amade bînin. Leşkeran ji li eyni hûrdemê de Rayber û hemû zar û zêçên Rayber mina gurên har girtin û piştê hemûyan dan diwêr, bi qenci rêzkirin ku hemûyan bîdînin ber qirşûnan bîkujin. Qet nedixwastin ku bêbextek, an ji nefereki malbata wan bêbextan sax bîmine. Lê ku li wan yek ji bîmine, wê ew kesa sibe rabe hemû raza dewleta xwinxwar ji hînin kesan ra bîbêje. Dewletê çî anîye serê gelê Kurd ji yekira deng bîke. Ji bona ev sedemê bû ku, dewleta Romê dîgot, çêtirê hemû bêbext û neferrên malên wan bêbextan werin kuştin û li holê de rabînin. Dewleta Romê werge dîfîkiriya û werge ji dîkîr. Li pey rêzkirina zar û zêçên Rayber û Rayber de, îcar serbaz ferman kir, ku leşker hemûyan bîdînin ber qirşûnan bîkujin. Leşkeran ji lûleyên tîfîngên xwe guhartin ser Rayber û zar û zêçên rayber, hemû dan ber qirşûnan, canên hemûyan qul-qul kirin û li ew derê de kuştin, dawîya kar û berên xwe anin. Li ew bûyerê de zarokên Rayber ji, bûn qurbana bêbextiya bavê xwe. Kurê Rayber ê mezin li ew rojê de şanzdeh salîni de bû. Ew ji tev bavê xwe, li ew rojê de hate kuştin mîr.

Rojeki malbata Xîdê naxîrwan bîhistin ku Aliekber ji wenda bûye, balam qet keseki nedîzanibû ku, çî hatiye serê Aliekber û Aliekber lî kuva çûye. Hîn kesan dîgot hukma Romê ew jî kuştîye û wenda kîriye, hîn kesan jî dîgotin Aliekber reviyaye. Lê a rasti ew bû ku Aliekber bî destê dewleta Romê va bî barbarî hatibû cangorî kîrin. Jî bona ew jî şîniyek disa ketibû mala Xîdê, hemû neferên mala Xîdê reş girêdabûn, jî bona Aliekber dîgiriyan. Bî taybetî Melek her berxwe dîket, şev roj dîgiriya û dîlorand. Ango bûbû weka pepûga ser kaş û çîyan dîlorand û ha dîlorand, roj û roj jî jar û sist dîbû.

Lî pey hemû ew gotin û qewmandinên tevkuştîna Dêrsım de, dîvê ez lî vîr de qal û behsa bîranin û serpêhatîyek kalemêreki Tirk bîkım. Ev kalemêrê Tirk'ê ku ez dîbêjım, ew kesa lî tevkuştîna Dêrsım de leşkerekî artêşa Roma xwınxwar bûye. Hukma Mıstefa Kemal ew jî şandıye nêçira Kurdan; wî jî bî sedan kes, zar û zêçên Kurd kuştîne, lê iro ew kesa lî ev cihana meda najî. Lî sala 1985'an de mîr çû gihişt heqîya xwe. Wî kalemêrê Tirk ew barbarîya dewleta xwe bî vekîrî, eşkere jî hîn kesan ra dîgot. Ew kesa lî sala 1980 de hatibû Awıstûralya bajarê Sydney, ba kurê xwe. Ew kesa nêzıka 75-80 salınî bû. Navê ew kalemêrê Tirk İskender ÇALIŞKAN bû. Ew lî bajarê Anqarê, qeza Haymana, lî gundê BASİTSEL'ê tê cihan. Apê İskender heya sala 1984'an lîgel kurê xwe Recep ÇALIŞKAN de ma, dûra dagerîya welatê xwe Tırkiyê, lî sala 1985'an de jî, çawa ku me lî jor de jî got, dımîre, dıçe dıgihêje rama Xwedê. Wî kalê Tirk, Apê İskender bîranînek xwe a tevkuştın Dêrsım, jî Kurdeki me ê Dêrsım, qeza Mêzgırê, gundê Dırban Reşit Xwınxas ra usa dîgot:

- Reşîtê mın, kurê mın hûn Kurd bî hêsayî nabın mırov
Hûn Kurd hevûdu heznakın, hûn dijımınên hevûdune, hûn

neyarên hevîn. Dubendiyên ku dijminên we kîrîne nav we, ew bî hêsayi lî nav weda ranabîn, dernakevîn. Aqilê min nagihêje ev rewşa we, mirov lî rewşa we dînhêre ecêb dîmine. Mirov nîzane ku dijminên we, hûn çîto perwerde kîrîne anîne gihandîne ev roja îroîn. Bibe ku ev gotinên min lî te xwaş neyên. Balam ev tîştên ku ez dibêjim, hemû rastîn. Jî ber ku min hûn bî ev çavên xwe va ditîne, we cî anîye serên hevûdu, ev çavên min govanîn -şahit- ez we Kurdan qenc dînasim. Naha tu guhên xwe qenc bîde ser min, ez biranînek xwe a tevkuştîna Dêrsim jî tera bîbêjim, dûra jî tu, jî minra raman û mabesta xwe bîbêje, gelo ev gotinên min rastîn, yan derewîn. Lî sala 1936'an de ez bûm leşker. Lê wexta mina leşkera zûva derbaz bûbû, min nedixwast ku ez biçim leşkeriyê. Lê lî ew salê de dewletê êdî mecal neda min, ez bûm leşker. Lî talimgehê de min hembajariyekî xwe dit. Ew xorta jî, gundiyeke Haymanê bû. Bî esl û nîjada xwe va jî Kurd bû. Wî Tîrki jî qenc nedîzanîbû. Pîrr caran ez jî wîra dibûm mamoste û wer-gêr. Min jî wîra arîkari dîkîr, fêre xwendî û nivîsandîna Tîrki dîkîr. Lî pîştî talîm-terbiye û dêlîndêz a-merasim-sondê de hênartîna -sevk- min û ew hevalê min ê Kurd derket Xarpîtê. Lî wê jî em çûn ser tevgera kurdên Dêrsim û me destpêka kuştîna we Kurdan kîr. Lê Reşîte min bîla Xwedê çûcaran bêtarek werge qet neyne serê xelkeke, neyne serê kafîran jî. Me leşkeran çîto ew Kurdên we, jîn, keç, bûk, mêr, xort, kal, pîr, zar û zêçên we dîkuştîn, ez naxwazim wan jî tera bîbêjim, bîla ewana lî dilê min de bîminîn. Ez çî bîkîm kurê min, jî tera çî bîbêjim, ez jî lî ew demê de xudan zar û zêç bûm, ez jî mina hemû kesan mirov bûn, lê lî bîn fermana qûlan de bûm. Hîm jî qûlên bêt hîş û har. Serbaz û serdarê me jî mera çî dîgot, me jî ew dîkîr. Fermana wan fermana dewletê bû, dîvîyabû ku me jî ew fermana bîanîna cih. Lê me çîqas ku Kurd dîkuştîn lî wan zêtîr jî leşker dîhatîn kuştîn. Camêran mina şêr û pîlîngan bûn, şervan û sekvan bûn; qet quşûnek bî

valayi nedıavıtın û qırşûnên wan bı valayi nedıçûn. Bawer ke lı nav du biri û navına eniya leşkeran de gule berdıdan. Wana wexta ku xwe dıavıt paş kevirêki, an ji dareki, êdı ji wanra ew bes bû. Yek keseki Dêrsımı, bêt derew, bedêle sed leşkerên me bû. Ku Reşîtê xwera bıbêjum, bı hezaran leşker hatın kuştın, avên çeman xwin dıherıkiyan, çem û newal tji cendeg bûbûn. Lê ez û hevalê mın ê Kurd, em nehatın kuştın. Me çı ani serê ew geli yek ez dızanım, yek ji Xwedê dızane. Lı dawıya meha Tirmeh'ê, sala 1938'an de tevgera Dêrsım şer wendakır, bınet. Lı pey ew şer wendakırına gelê Dêrsım de, icar em leşker ketın bajar û gundan. Bı taybeti me pıraniya gund, mezre û gomên Dêrsım hemû şewıtandın, şêlandın, talan kırın. Carna em dıketın gundan, me qet kesek lı ew gundan de nedıdı, gund vala bûn, jıyan nedıhat dıtın. Lı ber tırşa leşkeran kesên mayın ji lı gundan de nedısekıniyan, dırevıyan dıçûn xwe vedıřartın. Ji bona ew, icar dewletê çı kır, ma tu dızani Reşîtê mın? Bı rasti ew plana ku dewletê pêkani, bawer bıke ew plan nedıhat aqlê Ehrımanan ji. Ew plan çı bû, naha ez wê ji tera bıbêjum. Lewra ew plan û ferman a dewletê bû, me ji ew ferman û ew plan dıani cih. Plan ew bû: Me êrıř dıda ser gundeki, derdora gund dıgırt û me ew gunda dıkr hındırê çeperê. Dûra me bı zamaneki xwař û řirin va gazi hemû gundiyan dıkr, ku lı malên xwe de, ciyên ku xwe têda veřartıne lı ew ciyan de derkevın der, lı pêş derên xwe de bısekinın, ku em ji wanra bıaxıfın. Me lı ser Ol û İmanê, lı ser pêxamber û Quranê sond dıxwar, ku em qet tıřteki neynın serên wan. Me ev gotınana bı navgına leşkerên ku Kurdi dızaniyan, kesên Kurd va dıdan gotın. Gundiyan belengaz ji lı mal û ciyên xwe yên veřarti de derdıketın der, lı benda me de dıman. Lı pey derketına ew gundiyan belengaz de, icar serbazê me ferman dıda ew gundiyan, ku hemû lı ser bëndereki de, yan ji lı ciyeki pan û dûz de kombıbın. Gundi ji lı gor ew fermana serbaz lı ciyeki de kom dıbûn. İcar lı ew demê de

serbaz destpêdikır dıaxıft û dıgot " em hatine vıra, ku ji wera arikari bıkın, birinên we derman bıkın bîpêçın, dewleta me, dewletek bı rame, hûn hemû Tırkên bı xasın, balam hûn hatine xapandın. Guh medın ew kesên nijdevan, ew we dıxapının, xwına we dırjının" felan-bêvan. Dûra me destpêdikır, xwarın, vexwarın, kınc, kol û dırav dıda ew gundiyan, birina birindaran me dîpêçan, derman dıda kesên nexwaş û birindar, şeker, mewij û lewlewi dıdan zarokên hûr belev dıkır, dûra serbaz lı nav gundiyan de du kes dıbijart û ji wana ra dıgot " bıçın felan gundi, ji ew gundiyan ra ji bıbêjın bıla kesek lı derekiva nereve, xwe veneşêrine, lı pışti çend seat'an de, wê em bêne ew gundi ji, ji wanra ji bıaxıfın, ev arikariyên usa bıdın wan ji. Hûn bı çavên xwe va ji dıbinın, ku em lı we çı dıkın û çı dıdın we. Ev tıştana ji hemû kesan ra bıbêjın. Em nehatine ku we bıkujın, em hatine ku we lı ev rewşa hejari û xırb de felat bıkın, hûn û em yek nijadekın, birane. Dewleta me yarê hejar û belengazan, dijminê rêbırr û nijdevanane. Hûn hemû ji kesên hejar, bêt sûc û bêt webalın. Dewlet dıxwaze lı we xwedi derkeve. De mesekının bıçın ev gotinên me ji ew gundiyan dın ra bıbêjın, ev nûçe a bı xêr bıdine wan ji".

Belê, Reşîtê mın, serbazê me werge ferman dıda û werge ji ew gundiyan ra dıgot. Gundiyan ji bawer dıkırın. Ji ber ku gundiyan lı ew demê de her qenci bı çavên xwe va dıdıtın, zıkên xwe têr dıkırın, ser û pêyên wan nû dıbûn. Dûra ew "du kesên" ku serbaz ew bıjartıbûn, bı dılşahi rêdıketin dıçûn ew gundê dın, ku ew qenci û karên leşkeran ji ew gundiyan dın ra ji bıbêjın, bıla ew ji lı gundê xwe de dernekevın, xwe lı dereki de veneşêrinın lı benda leşkeran de bımının, ta ku leşker hatın. Erê Reşîtê mın, serbaz werge dıgot û gundiyan ji bawer dıkır, ew belengazana her dılşa dıbûn. Lê lı pey ew çûyına "du kesan" de serbaz çı dıkır û çı ferman dıda me leşkeran, ma tu dızani? Na ez bawer nakın tu dawiya ew gotınan û

kîretên leşkeran zanîbi. Belê, dûra ji serbaz ferman dîda me leşkeran, ku em wan hemûyan, tev zar û zêçan bîkujîn, serên wan jêkî, namûsa jînan qîrêj bîkî. Me werge ji dîkir û fermana serbaz bêt kêmasî dîani cih; ew gundiyan tev zar û zêçan va hemû dîkuştî, karên ne mîrovî dîanî serê wan gundiyan, zar û zêçan. Me kesekî ew gundi qet sax nedîhişt. Îcar piştî ew zîlma barbarî de em diçûn ew gundê dîn. Me lî ew gundi de jî hemû gundi lî ser benderê de komdîkirî û serbaz disa jî gundiyan ra dîaxîft û me jî her tîşt belav dîkir, dîda gundiyan. Wan gundiyan jî ew qenciya me dîdî. Lî piştî ew, vêca serbaz lî nav kesên ew gundi de jî du kes dîbijart û ew dişandî gundekî dîn, ew du balyozên gundê yekemî jî, lîgel me, lî ew gundi de dîman. Lî piştî çûyîna wan du kesan de, îcar me disa ew leyîztoke dîani cih. dubar dîkir, ew gundiyan jî hemû bî şîklekî barbarî lî tev ew du balyozan, zar û zêçan va dîkuştî û me berê xwe dîda gundê sêyem. Ango em diçûn kîjan gundi, serbaz ew leyîztoke xwe û plana xwe bîkar dîani. Me bî ew şîkî va bî hezaran kes kuştî. Rojekî em disa ketî gundekî. Disa me destpêka kuştîna ew gundiyan kir. Lî nav ew bêbextiya meda, jînekî pîr reviya çû xwe avî nav gurzên loda genim. Lewra wexta benderan bû, hî gundiyan hejar ceh û genimên xwe çîrandîbûn, anîbûn lî ser benderên xwe de lod kirîbûn, balam fersend nedîtibûn ku, gamê bîdî ser ew sapê ceh û genimên xwe bîgerî, tene û ka ê lî hev cûda bîkî. Belê, ew jînekî pîr lî pêş çavên mî û lî pêş çavên hevalê mî ê Kurd, ew Kurdê me ê Haymanê de kete nav loda gurzên genim û xwe veşart. Xêncî mî û ew hevalê mî ê Kurd, qet kesekî jî ew jînekî pîrekal nedî. Ango xêncî ew jînekî jî, lî ew gundi de kesek sax nema bû, me hemû kuştîbûn. Lî ew demê de jî, leşker lî hev belav bûbûn, ketîbûn malan, mal dişêlandî, pez û dewar serjêdîkirî. Hî leşker jî rûniştîbûn hêsa dîbûn, vêsa xwe dîgîrtî. Hî leşker jî bî xwîne ketîbûn, bûbûn mîna kesên dî û gêj. Ez û hevalê

xwe ê kurd ji, li nêzîka ew bênderê de, li ser kevîreki de rûniştibûn, me cixare dikişand. Lê çito ku ew jinika pir kete nav ew loda gurzên genim û xwe li nav gurzên genim de veşart, bedena xwe wenda kir, yekser ew hevalê minê Kurd rabû serxwe. Li ew demê de min ji ew hevalê xwe ê Kurd pirsîya, min got " kuro tu dixwazi çî biki?" Li ser ew pîrsa min, hevalê minê kurd " welleh ez wê jinikê bikujim, xaxê bavê wênim, bila Ola Îslam li kafîreki dîn felat bibe. Kuro evana kafîrîm, qetla van helale. Ki ku ji van kafîran deh kesan bikuje, diçe bihiştê li nav hûri û melekân de rûdine. Welleh hezar carî ji Xwedê şîkîr, min bî sedan ev kafîrana kuştin, lê divê ez ev qexpê û qexpe bavê ji bikujim; bila Xwedê tala li bihiştê de ciyê min bêtir fereh bike". Reşîtê min bawer bike, li ew demê de ez ecêb mam, şaş û metal bûm. Erê me ew kesana dikiştin, balam ferman ew bû. Em qûlê fermanê bûn. Pîrr kesan qet nedixwast ku pozê yekî xwin bike, balam bêt havil duman em. Lê li ew demê de, xêncî me herduyan ji, kesekî ew jinika ji neditibû. Min got " kuro meke, ew ku bûme çî dibe, bûme çî dibe? Ew jinîkek heftê heştê salîniye, li wêde ne keç dibin, ne ji kur, bîsekî ew pîreka canê xwe felat bike, guneye mekujê". Lê sed mîxabîm ku ew hevalê minê Kurd li min xeyidî, hêrs ket, yekser li şûna xwe de rabû, ji minra " tu bîsekî ez di.....nim, wê bî cûreki bikujim, tu ji bîbine " got û rabû çû agir berda ew loda gurzên genim. Li destpêkê de dûyekî reş rabû hewa, dûra xurriya agir li tev dûyê reş û xulav de rabû jor, ew jinika pir li hember çavên meda li nav ew agirê sapên genim de şewiti bû ax û xalî. Bawer bike Reşît, wexta ku xurri li pêşa ew jinikê ket, li derdora wê de xurri gurr bû û agir li canê wê ket, qet dengê li devê ew jinika kal de derneket. Ew jinika ne giriya, ne ji qiriya, li pêş çavên mede werge şewiti bû ax. Ew roje, ev roje, Reşîtê min, her tum bedena ew jinikê, ew xurriya agir, kuştina wan zar û zêçan, pir û kalan, keç û bûk û xortan li pêş çavên min de naçin. Ez

çucaran ew bêbextiya wi hevalê xwe ê Kurd ji birnakim. Jî bona ev e ku, ez dibêjim hûn neyarên hevîn, hûn dijminên hevûdune. Mîn hûn Kurd usa ditîn, usa naskirîn. Ez bawerim ev biranina mîn jî rewşa wera minakek piçûke, lewra rewşa we qenc dîde xuyakirîn. Gotinek we Kurdan heye, ew ketiye nav me Tîrkan jî. Hûn dibêjin "Kurmê darê jî darêye". Eva jî bona we Kurdan raste. Gotin ewe ku, bav û kalên we ev bêbextiyên usa li mêj de li nav xwe de ditîne û usa gotîne. Hûn bî rasti jî gelekî usa ne. Li bîli ev ez jî wera çî bibêjim, Reşîtê mîn. Ev e pence sal derbaz bûn, cara yekemine ku, ez van tiştan jî tera dibêjim. Bawer ke mîn qet nedixwast ku pozê kesekî jî xwin bikim. Jî ber ku malbata me jî gelek tede li Balkan ditibûn. Bavê mîn maacirekî Balkan bû. Li dewra Avdîlhamî de hatibû Haymanê li wê ciwar bûbû, gelek jî Kurd sîrgûne ew heyamê kiribûn. Ew hevalê mîn jî, kurê malbatek wan Kurdan bû.

Sal û mehe zû-zû derbaz dîbûn û dîçûn. Rewşa cihanê bûbû mina varileki barûtê agir pêketîbû dîşewîtiya, her gurr dîbû. Lî ew demê de Mîstefa Kemal jî êdî mirîbû, lî şûna wî de Îsmet Paşa ê kerr bûbû Serok komar û şefê Netewî. Şerê cihan ê duwem destpêkirîbû, bî milyonan kes dîhatin kuştin û cangorî dîbûn. Hitler cihan lî nav xwinê de hiştîbû. Wî jî gelek barbarî lî aliya mamoste ê xwe Mîstefa Kemal de hînkirîbû, bî taybetî ew barbarîyana lî ser gelê Yahûd û hîn gelên din de dîcerîband, barbarîyên ne mîrovî lî ser gelan de pêkdîani. Hukma Tirk jî lî ew demê de, lî dîrvevî şer de dîsekîniya, lî dawîya şer dînhêriya û şev û roj lî tevahiya Kurdîstana bakûr, xesma lî herêma Dêrsûm de dîbistan û leşkergehên xwe her zêde dîkîr. Lî alîkî ew karê xwe bî cih dîani, lî aliya dînde jî, bî zorê û barbarî xort, mêr û kalên Kurd berhev dîkîr, ew kesana dîbîr dîkîr leşker, jî bona şer ew kesana amade dîkîr, dîda sekînanî. Lî gundan de xortên pazdeh salnî bigîre, heya kalên şêst salnî jî kom dîkîrîn, dîbîrîn leşkerîyê, jî bona şer. Hukma Romê jî bona xwarîna leşkerên xwe îcar dîsa êriş dabû ser gundî û rêçberên Kurd. Hukma bêbext jî bona ew şêlandî û talankîrinê, sazgehek nû "Sazgeha Şanetîyê" dabû damezrandî. Lî gor zagona ew sazgeha nû, dewleta xwinxwar jî bona her gundekî Kurd. karmendekî xwe bîjartîbû şandîbû gundekî Kurd. Ku ew karmenda lî ser bênderên Kurdan de bîsekîne, zada Kurdan jî Kurdan bîstîne, jî dewletêra berhev bîke û bîşîne. Kurdan jî wan karmendan ra "Şaneyê Bênderan" dîgotîn. Lîgel wan şanan de cenderme jî hebûn. Wexta ku Kurdekî bigotana "na, ez naxwazim zada xwe û heqê zar û zêçên xwe bîdum yekî" vêca lî ew demê de cenderman ew kesa dîdan ber duxên tîfîngên xwe, bî qenci dukutan, dûra jî

destên ew kesana dîkırın kelepçan dîşandin Mêzgirê dî-
 avıtın girtixanê. Rewş lı her ciyan de nebaş bû. Birçitiyek
 gewre ketibû nav Kurdan. Bı sedan kes bı birçiyân û
 nexwaşiyân va dımırın. Karmendê gundê Kûpikê ji, kurê
 Hesên Axa ê gundê Germisîyê, Kamıl Axa bû. Ango kurê
 serokê eşira Xeraniyan. Lı gundê Germisîyê de du Hesên
 Axa hebûn. Hesên Axa ê jêrın, Hesên Axa ê jorin. Hesên
 Axa ê jêrın, ew serokê hemû eşirê bû, Hesên Axa ê jorin
 ji, xısmê Hesên Axa ê serok bû. Hesên Axa ê jêrın xudan
 du kuran bû. Navê kurê wi ê mezın Kamıl Axa, ê piçûk ji
 Cemal bû. Cemal lı ew heyamê de çar-pênc salını bû. Lê
 Kamıl Axa xorteki bist çar, bist pênc salını bû. Ew her roj
 û her şev lı tev cenderman diçû ser bêndera gundiyeke,
 malaxma ceh û genimê ew gundi sehêt dîkır. Wexta ku
 gundiyeke malaxma ceh, an ji genimê xwe amade dîkır,
 makine dıda ber malaxma ceh û genimê xwe, ku tene û ka
 ê lı hev cûda bıke, Kamıl Axa yekser diçû ser bêndera ew
 kesi de rûdinişt, lı dawiya safikırına ka û tene de, devê
 çalên dewleta Romê dıda ber ew zada Kurdê hejar, pıra-
 niya zada ew kesi bı zorê distand, peyven nebaş ji ew kesê
 hejar ra dıgot. Lı demên werge de pırr kesên xwe diavıt
 lıng û destên Kamıl Axa, lı ber Kamıl Axa û ser Kamıl
 Axa dıgeriyan, lê Kamıl Axa qet guh nedida wan kesên
 birçi û hejar, serda ji, ji wan kesên ra " bıqeşıtın bıçın
 kuro, hêrsa mın ramekın" dıgot, peyvên nebaş ji ew kesên
 ra dıgot. Kamıl Axa û bavê xwe hevalbendê dewleta Tırk
 bûn. Ji bona ew peywendiyên hevalbendiyê bû ku, dewleta
 xwınxwar Kamıl Axa bıjartibû şandibû gundê Kûpikê.
 Hindê lı hemû gunden de kesên Şane hemû kurd bûn, ba-
 lam dewleta xwınmij gelek kes bı dara zorê bıjartibû kı-
 ribû Şaneyê ser bênderan. Ji ber ku wan kesên piçeki
 xwendibûn, zımanê Tırki dızaniyan. Lê Kamıl Axa û kesên
 mina Kamıl Axa, bı taybeti hatibûn bıjartın.



Hesen Axa ê serokê eşira Xeraniyan, talbê Husên Doxan bû. Her çiqas ku Kûpikiyan ji eşira bamasûr û xismên Husên Doxan bûn ji, lê Kamil Axa qet li ew aliye va nedinhêriya. Ne digot, evana xismên pirê minin. Ew tiştana qet nedianin ber çavên xwe. Hukma Romê çi erk dabû wi, wi ew erka xwe bi rêk û pêki dani cih. Qet qisûrek li ew kar û vatiniyên xwe de nedihîşt, bi dilsozê ji dewleta Tirk ra kar dikir.

Kamil Axa ne tenê li gel cendermeyên dewleta Tirk de Şanetiya benderan dikir û zada gel bi dara zorê distand, wi her usa ji, bi çaveki gemarin va, ji namûsa gel dindhêriya. Bi taybeti wi çav berdabû hin bûkên gundiyan. Ji ber ku mêrên wan bûkên Kurd bûbûn leşker. Hukma Rome ew kesana bi dara zorê girtibûn şandibûn leşkeriyê. Ji bona ew ji, Kamil Axa dixwast ku dest bavêje namûsa wan bûkan, namûsa wan pêşkêşe cendermeyên Tirk ji bike. Lê gundiyan ew bênamûsiya wi zû ferq kirin, ew fersenda nedan ew bêbexti. Ji bona ew ji, ew bêtir har bûbû, qet nedixwast ku piçek zad ji gundiyan ra bihêline. Wi zada gundiyan li bin zora cenderman de, li kehr û qantirên gundiyan bardikir û mina kerwaneki dişand Mêzgirê, li Mêzgirê ji dişandin Xarpitê û rojava Tirkiyê, stok dikirin. Lê Kamil Axa li piştî ewqas bêbextiyan de pirr nejiya, saleki şuva nexwaşiyek bêt derman kete bedena wi, li zikê çend rojan de mir, canî dojah bû çû.

Dewleta zordest li aliki bi destê wan Şane û cenderman zada gel bi zorê distand, li aliya din de ji, ji bona dewar, pez û zeviyên kurdan Tahsildarên xwe ji li bin parastina cenderman de kiribû gundên Kurdan. Wan Tahsildaran ji gelê Kurd talan dikirin, malên Kurdan dişelandin, diketin nav erd û zeviyên Kurdan, erd û zeviyên Kurdan dipivan û dipêdandin. Ji bona bostek erd ji, ji Kurdên hejar û belengaz serebac distandin. Ango ji bona donimek erd, ji gel dirav dixwastin. Li ew kari ji têrnedibûn, icar diketin hevşe û axurên gundiyan Kurd, pez û dewarên gundiyan

dihêjmartin, hêjmara pez û dewarên gundiyan dîpêdandin
 û dînvîsandîn, qeyd dîkîrîn, ku jî bona her seriyek pez û
 dewar qamçûrê bîstînin. Dewleta xwinmîj jî bona serik pez
 jî, jî gundiyan bac distand. Jî wan Tahsildarên bac stan-
 dîna heywanan ra jî" Tahsildarên Sirqetê" dîgotîn. Ew
 Tahsildarên Sirqetê her sal bî taybetî lî destpêka meha
 Gulanê de, bî dîziyan, mîna segên dîrr êriş dîdan ser naxîr
 û keriyên pez û dewarên gundiyan Kurd; lî tev cenderman
 pez û dewarên gundiyan berhev dîkîrîn, defterên xwe lî
 terkiya hespên xwe de, lî zîkê heqîb û çenteyên xwe de
 derdîxîstîn, lî hejmara dewar û pezên gundiyan dihêriyan,
 gelo çîqas pez û dewarên gund hene. Çîqas ga, çêlek,
 kehr, qantîr û hespîn; çîqas jî, mî û bîzînin, hemû yek û
 yek sehêd dîkîrîn, ku zanîbîn lî destpêke de, gelo gundiyan
 çîqas pez, dewarên xwe nîvîsandîne û lî dewletê dane
 temaşekîrîn. Bî rasti jî gundiyan belengaz jî dewleta Romê
 ra rast nedîgotîn. Lewra wana ew dewleta xwinxwar û ta-
 lankar baş nasdîkîrîn. Jî bona ew jî, her malekî çend
 pezên xwe lî Tahsildarên dewleta şêlanker vedîşartîn,
 nedîxwastîn ku wan pez û dewarên xwe lî ew Tahsildarên
 Sirqetê bîdîn temaşekîrîn û bînvîsînin, dîravên zêde bîdîn
 dewleta xwinmîj. Jî ber ku hemû kes hevçê ê quruşek
 dîrav bûn, tazi û rût bûn, bêt kînc û bêt sol bûn. Pîrr
 caran nanê garîs û gîlgîl jî nedîdîtîn wan belengazên Xwe-
 dê. Gundiyan hejar qet nedîzanîbûn, ku dewleta Tîrk wan
 Tahsildarên xwe'yên Sirqetê çî wext, an jî kîjan rojê de
 dîşîne nav pez û dewarên wan. Hîn gundiyan jî bona tîrsa
 wan Tahsildarên şêlanker, lî çal û kortên newal û geliyan
 de kozîk çêdîkîrîn, ew pez û dewarên xwe'yên nenîvîsî lî
 wan ciyan de vedîşartîn, ku ew Tahsildarana wan pez û
 dewarên wan nebinîn. Lê carna gundiyan fersend nedî-
 dîtîn, ku wan pezên xwe veşêrînin, nîşka ve ew bêbextana
 lî tev cenderman derdîketîn û dora pêz û dêwêr dîgîrtîn,
 ew pez û dewar disa yek û yek dihêjmartîn, ew pezên zêde
 lî nav keriyê de derdîxîstîn, gazi Serbexo ê gund dîkîrîn û

dıgotın " bınhêre, tu berpırsiyarê ev gundi; gundiyan te ji mera derew kırine, divê em ev pezên zêde ji dewletê ra bıbın" felan-bêvan. Serbexo ji çi dıgot, lê wana qet guhdar nedikir û ew pezana didan pêşiya xwe dıbirin, gundiyan ji, bı tırsa kuştın û girtixanê qet dengên xwe dervedixıstın, ew dewar û pezên gundiyan ji, werge bı bêbexti dıçûn û dıçûn. Carna ji, lı piştı ew bûyer û geşbûnên werge de, icar Serbexo ê gund, lı ber Tahsildar û cenderman dıgeriya, ku ew werın ramê, ew pez û dewarên gundiyan nebın. Lı demên werge de, vêca Tahsildar û cenderman ji bona her pezeki bertil dıxwastın, dıgotın" divê hûn evqas dırav bıdın me, ji mera pezeki ji serjêkın, zıkên me ji têr bıkın" felan-bêvan. Lı demên werge de gundi êdı dıketın nav bazariya bertilê. Deyn dıkirın dıray dıdan wan bêbextan, pez ji wanra serjêdıkırın, xwerın û vexwarın dıdan wan û lêborandinên xwe ji wan dıxwastın û ew karên xwe werge çareser dıkirın, dıçûn lı dest Tahsildar û cendermeyên Romê de felat dıbûn. Lı ew kar û berên werge de, armanca dewleta Romê ew bû, ku gelê Kurd lı aliya aboride ji jar û sıst û pêrişan bıke. Ku Kurd lı ber xızaniya abori de lı ser erdê bav û kalên xwe dırkevın, bıçın bıkevên kûçeyên bajarên wan, lı wan deran de ji, ji wanra bı zıktêri bıxebıtın, barkêşiya wan bıkın, lı avayiyê wan de bıxebıtın û lı zıkê zeman de ji bıhelın, ew û zarokên xwe va bıbın Tırk. Lıgel hemû qewımandınên usa de, carna ji hın çaşan ji bona dubendiya ava bostanan, ji bona şer û pevçûnên lı ser mırişk û zarokan, dıçûn ew gundiyan ku pez û dewarê xwe'yên zêde dıbirin lı newal û geliyan de vedıřartın, ew kesana ixpar dıkirın, cenderme û Tahsildaran ji êriş dıdan ser wan ciyan û wan kesan; ew pez, dewara lı ew ciyên veřarti de dervedixıstın, tev xwediyê ew pez û dewari dıgirtın dıdan pêşiya xwe dıbirin Moxındiyê, lı wê ji dıřandın Mêzgirê dıavıtın girtixanê. Ew pez û dewar ji karmendên dewleta Romê lı nav xwe de parvedı-

kırın, dıbirin dıfırotın goştvanan dırav dıstandın, yan ji serjêdıkırın, ji xwera dıkırın Qarme.

Belê, bûyer lı ser bûyeran de dıqewumiyan. Hukma Tırk her cûre barbari û fêl lı ser gelê Kurd de dıcêriband. Lı gundan de hêjmara qereqolên leşkeri her zêde dıbûn. Dewleta Tırk êdi bı destên cenderman zarokên Kurdên Dêrsım ji bı zorê dıbirin dıbıstanan, ew zarokana fêre zıman, çand û diroka xwe a gemarin dıkırın. Lı destpêka avakırına dıbıstanan de zarokên pênc-şeş gundan dıçûn dıbıstaneki. Kesên ku nedıxwastın zarokên wan bıçın dıbıstanên Tırk, icar cenderme dıhatın zarokên wan kesan bı zorê, lı bınê siya tıfingan de dıbirin dıbıstanan. Yên ku rik dıkırın nedıxwastın zarokên xwe bışının, icar ji bona wan kesan 150 pangınot dırav ceza dıbıriyan. Ew nerx ji, ji bona hejareki Kurd her zêde bû. Lı pey ew şikli êdi bav û dayik bêt havıl dıman, zarokên xwe bêt lênûsk, bêt pênuş û bêt pırtûk dışandın dıbıstanên dewleta Romê. Pıraniya mamoste'yên dıbıstanan ji Kurd bûn. Dewleta Romê çı ferman dıda wan mamoste' yên Kurd, wana ji bêt qısûr û kêmasi ew fermanana yek û yek dianin cih. Jı ber ku ew ji lı dıbıstanên Tırk de hatıbûn perwerde kırın. Yên ku xwe wenda nekırıbûn, lı dilên wan de piçek Nıştıman-perweri hebû, ew ji nedıwêriyan ku tışteki bıkın, yan ji tışteki bıbêjin. Ew ji bı ew rengiva dıbûn hevparê dewleta Tırk. Lı dıbıstanên ewlin de, ne tenê zarokên heft, heşt salını lı pola yekemin de dıxwendın, her usa ji, xortên çardeh salını bıgırın, heya xortên bist salını ji, lı polên ewlin de hebûn. Cendermeyên dewleta Tırk dıketın gundan, fermana dewletê ji Serbexo ên gundan ra dıgotın û dûra hemû xortên gund komdıkırın, dıbirin lı dıbıstanan de qeyd dıkırın; lı destpêkê de ew xortana piçeki fêre zımanê Tırki dıkırın û dûra ji ew xortana dıgırtın dıbirin dışandın leşkeriyê. Lı ew demê de leşkeriya dewleta Romê ji çar sal bû. Dewleta xwinxwar çavên dayik û bavan, jin û zarokan lı riyan de dıhişt. Xortên xudan jin û zarok her

pêrişan dîbûn. Dewleta xwinmîj qet rewşa jin û zarokên wan xortan nedîpîrsiya. Pîraniya wan zarokên hejaran bî birçiyar dîmîrîn. Lî aliya dîn de lî her gundeki de dîbistan tunebûn zarokên pênc-şêş gundan dîçûn dîbistana gundeki. Jî bona ew jî zarokên gundiyan lî berbanga sibê de radîbûn lî riya dîbistanan dîketîn. Lewra dîbistan lî ew gundan gelekî dûr bûn. Şagirtan dîxwastîn ku lî wextê de xwe bîgihêjinîn dîbistana xwe. Pîraniya zarokan tenê bî kiras û derpeki cawê sipî, pine lî ser pine va dîçûn dîbistanan. Bî taybetî lî demên zîvistanan de rewşa şagirtên Kurdan her xîrab û dijwar bû. Lî lingên wan de çarixên çermê ga û çêlekan her tîm nedîhatîn dîtîn. Dayik û bavên meşk û hewanên kevn jî zarokên xwera dîkîrîn çarix; ew jî lî zîkê du rojan de dîhelîsiyan, qul-qul dîbûn dîçûn; îcar zarokan pine dîkîrîn binê wan çarixên xwe, ku lingên wan xasî nemînin. Lî polên dîbistanan de sobe jî tunebûn; yê ku hebûn jî, zarokan êzing nedîdîtîn, ku sobê vêxinî pîçeki zîkê pola dîbistanê jî xwera germ bîkîn. Hal bû ku dewleta Tirk hoy kîrîbû, ku bavê her şagîrteki, dîvê barek êzing jî bona dîbistanê bibe bîde mamoste ê dîbistanê. Gundiyanê Kurdistan jî ew fermîna dewleta Tirk dîanî cîh û her malekî barek êzing jî bona dîbistanê, dîbîrîn radeste mamoste dîkîrîn. Lê pîraniya mamostan ew êzingana lî odeyan xwe'ên şexsî de vêdîxîstîn, zarok lî nav serma ê de dîhîştîn. Zarokên belengaz jî lî ser rêz textan de dîrîcîfîyan, tîliyan dest û lingên wan bî serman dîtevîziyan hîşk dîbûn; nedîkarîbûn ku pê pênûsa xwe bîgîrîn û tîştêki bînivîsîn. Jî bona ew jî, hemû şagîrtan tîliyan destên xwe dîkîrîn devên xwe, dîxwastîn ku bî hêlma devên xwe va tîliyan xwe germ bîkîn.

Hemû şagîrt berî seat neh de lî hîndîrê polan de amade dîbûn lî şûnên xwe de rûdîxîstîn, lî benda hatîna mamostan de dîman. Seat nehê sibê de hemû mamostan derê polan vedîkîrîn û dîketîn hîndîr polên xwe. Lî ew demê de hemû şagîrt lî nav tîrs û xofê de, mîna refên kewan hîldî-

firiyan serxwe, lı ser piyan de amade dibûn û lı benda ferman û gotinên mamoste de dıman. Çıto ku mamoste diketın hındır, bı zumanê Tırki jı zarokan ra:

- Roj baş geli zarokan, dıgotın. Zarokan ji" sax be, her biji" va bersiva mamostan dıdan. Lı pey ew icar mamostan ev sonda dewleta xwinmij jı zarokan dıdan xwarın û gotın:

- Ez Tirkım
- Ez Tirkım
- Ez rast û dırıstım
- Ez rast û dırıstım
- Ez jırım
- Ez jırım
- Ez zana û jêhatım
- Ez zana û jêhatım
- Zagon û armanca mın, hezkırıya piçûkan, gırami dayına mezinane
- Zagon û armanca mın, hezkırıya piçûkan, gırami dayına mezinane
- İdeala mın hezkırıya welatê mın û pêşveçûyına welatê mına
- İdeala mın hezkırıya welatê mın û pêşveçûyına welatê mına
- Daxwazi û armanca mın, bılıdbûyına nav û şana gelê mına
- Daxwazi û armanca mın, bılındbûyına nav û şana gelê mına
- Ev hebûna bedena mın, her tım jı bona hebûna gelê mın û dewleta mın, bıbe diyari û qurban
- Ev hebûna bedena mın, her tım jı bona hebûna gelê mın û dewleta mın bıbe diyari û qurban, dıgotın û lı dû mamostan dıçûn. Ango ev sonda deleta Tirk her roj lı eyni demê de dubar dibû. Zarokên Kurdan ev sonda dıxwarın. Dıviya bû ku, zarokên Kurd jı bıbana Tirk, jı bona dewleta xwinxwar canê xwe fida bıkırana û jı ew dewleta dagırker ra bıbana qurban. Lê bı rasti jı gelê Kurd jı

bona dewleta xwinxwar bî sed hezaran cangori dabû, bûbû qurbana dewleta Tirk. Xêncî ew cangoriyên ku bî destê ew dewletê va hatibûn kuştin.

Belê, zarokên kurd her roj ew sonda dîxwarin. Mamostan ji ew zarokana werge dielmandin, şoviniya dewleta xwinmij lî nav mêjo ê zarokên Kurdan de lûl dîkîrin û dîkîrin nav xwina zarokan. Xêncî ew gotinên şovini û ew perwerde a nijadperesti, mamostan pîştî dersa yekemin de, icar zarok derdixistin helmîjinê-tenefûs-û lî derva zarok rêz dîkîrin û destpêka sehîkirina -kontrol- rîşk, nûtîk û sîpiyan dîkîrin. Lî kincên kêda sîpiyek, nûtîkek, an ji rîşkek dîditin, icar mamoste ew zarokana dîdan ber şîmaq û ço'an, jî wan zarokan ra çêr û peyvên nebaş dîgotin. Ne seg baviya wan zarokan dîma, ne jî qexpeh baviya wan. Dîgotin" tu şerm naki bî ev sîpi û nûtîkan va tê dibistanê? Jî ew diya xwe a gemarin ra bîbêje, bîla qenc lî te bînhêre, kinc û kolên te qenc bîşoy, her roj bîla avê lî serê te ke. Ez naxwazim carek dîn tu usa bî sîpi û rîşkan va weri dibistanê, te got erê, yan na?"

Lî pey ew gotinan de icar dîsa mamoste çend şîmaq lî ser gepên zarokan dîhêjmartin û gepên ew zarokana sor û mor dîkîrin. Lî pîştî ew karê nebaş, icar zarokên Kurdan berxwe dîketin, dîgiriyan, şermezar dîbûn. Dîhatin mal ew rewşa jî diya xwe û bavê xwera dîgotin, balam dayikên Kurd her çiqas ku hewl dîdan kinc û kol dîşoştin ji, pêşî lî ew sîpi, nûtîk û rîşkan nedîgirtin. Jî ber ku, dewleta xwinmij welat şêlandibû, kinc û kol bî xulava agir va dîhatin şoştin, sawûn û dermaneki bî zanîsti nedîhat dîtin. Mîrov û heywan lîgel hevda dîman, xani û mal hatibûn şewitandin. Jî bona ew çu sûceki dayik û bavên ji tunebû.

Mamosteyên dibistanan lî ew karê xwe jî têr nedîbûn icar destpêdîkîrin lî nav şagîrtan de, çasî û bêbextî jî lûl dîkîrin. Wana lî gor fermana dewleta Tirk, lî nav şagîrtên her gundeki de, jî xwera şagîrteki dozfiroş û ças dîditin. Hindê zarokên belengaz jî nedîzanibûn, ku çasî û dozfiroşî

ji çiyê. Ango wan bî dîlpakiya xwe va dîxwastîn ku gotîn û fermanên mamosteyên xwe binî şûnê, ku mamoste notên qenc bîde wan û ew bîkevin çavên mamostan. Ew zarokên bêt sûc, bî nezani dîbûn hacetê bêbextiyê, dîketîn destên mamostan. Mamostan jî wan zarokanra:

- Îro şuva hûn her yek serokê şagirtên gundê xwe ne. Dîvê hûn lî hemû hevalên xwe qenc mêze bîkî; gelo lî piştî kutabûna dersan û lî gund de ki jî hevalê xwera bî zimanê Kurdi dîpeyive, ki çî dîke, çî nake, van tîştana her roj wexta ku hûn hatî dîbistanê yekser werî nivisgeha me, hemû dîtî û bîhistî xwe jî mera bîbêjî, rapor bîkî, dîgotî û zarokên belengaz jî bî nezaniyên xwe va, kê ku lî gund de jî hevalê xwera bî zimanê dayika xwe axaftiye, giliyên ew hevalên xwe dîkîrî. Lî piştî ew jî, mamostan ew zarokana bî qenci dîkutan, ku carek dîn lî nav xwe de bî zimanê Kurdi neaxîfî. Ew şîkîl jî, jî zarokan ra dîbû tîrs û xof, êdî zarok nedîwêriyan ku lî nav xwe de zimanê dayika xwe bîaxîfî.

Carna wexta sehêkirîna paqîjiyê, sîpî û rîşkan de, mamostan ew karê sehêkirînê dîdan hî şagirtan. Şagirtan jî wexta ku lî kîncên hevalên xwe de sîpî û nûtîk dîdîtî, yekser gazi mamostan dîkîrî, mamostan jî, jî wan şagirtan ra dîgotî" ew sîpî, an jî nûtîkê bîgire û bîke devê wî bîla bîxwe". Lî ser ew fermana mamostan, îcar wan zarokan ew sîpî û nûtîkana bî zorê dîkîrî devên hevalên xwe, bî wan dîdan xwarî, dûra jî çend şîmaq lî ser gepên hevalên xwe dîhêjmartî û mamostan jî lî ew pêşdariyê dînhêriyan. Ku şagirtêki şîmaqek bêt hêz lî hevalê xwe bîxîstana, vêca mamoste ew şagirta dîda ber ço û şîmaqan" kuro seg bav tu çîra ewqas bî hêdîka lî ew mîrdari dîxîni" dîgot. Carna jî zarokan lî dîbîstana de xwe şaş dîkîrî, lî nav xwe de bî zimanê xwe dîpeyivîyan, mamostan ew dîbîhistî, hêrs dîketî dîxeyidîyan, gazi wan zarokan dîkîrî û ew zarokana bî qenci dîkutan, pêguhên wan dîgirtî, guhên wan dîgîvîştî û kaş dîkîrî, badîdan,

dıgotın" binhêrın pıncino em naxwazın hûn lı nav xwe de, lı dibistanê de ev zımanê kevnare bıpeyvın. Ev zımanê we bı zagoni hatiye qedexekırın. Jı ber ku ev zımanê we, bı rasti ne zımane, her kın û kurte, hemû bist, sıh peyvın. Pıraniya ew peyvın ji disa peyvên Tırk, Erebi û Faris'ın. Nıjadedek nav Kurd lı ev cıhanê de tune; hûn hemû kurên Tırkın. Xwına we, xwına Tırkên xase. Bınhêrın, beri ku em nebûbûn mamoste, beri ku em ji mina we zarok bûn, me ji xwe Kurd dıhesıband. Lê wexta ku me destpêka xwendınê kır û em bûn mamoste, me dırok xwend, lê me dit ku rasti ne usaye, em xelıtine, em ne Kurdın, em Tırkên xas û paqıjın. Sıbê hûn ji bıxwının û bıbın mamoste û bıjıjk, bıbın nasê dırokê. Lı ew demê de hûn ji werın guhartın. Hûn bı xwe ji lı rûpelên dırokê de bıbının, ku geleki nav kurd lı ev cıhana meda tune. Tırk bavê ev cıhanêye, ev gotınên me ji xwe bırmekın, bıkın gahr lı guhên xwe de dardakın.

Belê, lı pışti tevkuştına Dêrsım de, dewleta Tırk bı hezaran celeb leyıztok, dek û dolav lı nav gelê Kurd de dıcêrıband. Lı ew demê de şerê cıhanê ê duwemin ji bı alozi-şıddet-domdıkr. Hitler êrış dabû ser gelek welatan û hemû der dışewıtand, faşızme xwın dırıjand. Hukma Tırk ji bêt westan lı Kurdıstanê de cırıt dıavıt, xort û mêrên kurd komdıkr û dıbır leşkerıyê; zada gel talan dıkr û gelê Kurd bı bırçı dıhışt, bı ew şıklı va dıkuşt. Jın û bûkên Kurdan lı malên xwe de bêt mêr û bêt sı mabûn. Lı ber sıtemkariya dewleta Romê pıšta gelê Kurd şıkıyabû, xûz bûbû. Lı alıki ew zılm û zor, lı alıya dın de ji her cûre nexwaşı ketıbû nav gundên Dêrsım, bı hezaran kes dımırın. Ango yên ku bı destê leşkerên Romê va nehatıbûn kuştın, ıcar bı ew nexwaşıyan va dımırın. Bı taybetı nexwaşıya xurıyan mırın dıpjıqand û belav dıkr. Lı gundan

de her roj bı dehan zar, zêç, keç, bûk, jın û mêt, bı ew nexwaşiyê va dımırın. Bı taybeti ew nexwaşıya bûbû dıj-
mınê zarokên hûr. Lê ne bıjıkek hebû, ne hemşirek, ne
dermaneki bı zanısti, ne ji nexwaşxanek. Êdi her tışt lı
destê Xwedê de mabû. Lewra gel bı xwe ji werge dıgot.
Ango her tışt kırıbûn stuyê Xwedê. Dıgotın" em çı bıkın ev
bextê meye, karê Xwedê'ye, em nıkarıbın dıji karê Xwedê
derkevın". Lı gundan de her roj ewqas zarok û kes dımu-
rın ku, êdi kesên sax bı tırb kolandınan va bêzar bûbûn,
hêz lı mılên wan de nemabû. Lı gundê Qurqurıkê de,
xêncı mezınan nod zarok bı nexwaşıya xuriyan va mıribûn.
Lı Kûpıkê de ji ew hêjmar çıl zarok bûn. Kurê Memê
Hamli xortê hıjdeh salni Ali Heyder lı zıkê hefteki de, bı
ew nexwaşiyê va mıır çû. Pıraniya xort, mêt û jın ji, bı
çavan kor bûbûn, ketıbûn nav şevên reş û tariyê.

Ew nexwaşıya bêbext ketıbû mala Xıdê naxırvan ji.
Her sê zarokên Xıdê tev Xec a jına wi ji bı ew nexwaşiyê
va ketıbûn nav nivinan; Xıd tenê lı ser piyan de mabû,
tenê dıçû ber pêz ê dêwêr. Pıraniya gundiyan lı tev zar û
zêçên xwe va ketıbûn nav nivinan. Canê hemûyan lı nav
kul û birinan de mabûn. Ew kul û birinên wan kesan mina
kulên "kûnêr" nê m gırtıbûn, jan dıdan canê wan nexwa-
şan, dıxuriyan. Nexwaşên belengaz tewat nedıkırın, dıkırın
qırın û gazın, dınalıyan. Lı aliki ew jan û êş, lı aliya dın
de ji, canê nexwaşan mina nexwaşıya " Gırr" her dıxuri-
yan. İcar nexwaşan ew kul û birinên xwe dıxurandın, kul
û birinên nê m gırti derdıbûn, xwin û nê m dıket tevhev
dıbû rengineki mina rengê qewê, lı ser bedena wan kesan de
dıherıkiya belav dıbû, mırov nedıkarıbû ku lı ew pêşdariya
kambax û xırab bınhêre. Lı pıştı ew xurandınan de, vêca
ji ew nexwaşıya bêtır zêde dıbû, ew kesana bervı mırinê
dıçûn. Yê n ku nedımırın felat dıbûn ji, dev, rû û bedenên
wan lı nav dernan de dıman. Ango rû bedenên wan çopûr
û çınçınık dıbûn. Gelek kesan ji ronahiya çavên xwe wen-
da dıkırın, kor dıbûn.

Zarokên Xîdê naxîrvan ew nexwaşiya xuriyan sıvîk derbaz kîrîn, qet tîşteki bed nehat serê zarokên Xîdê û lî zîkê hefteki de hemû rabûn ser piyan. Balam Xeca belengaz nedîkarîbû ku, lî nav nivîna xwe de xwe rast bîke û rûne. Canê Xecê lî nav kul û birinan de mabû. Kul û birinên Xecê nêmgirtîbûn û der dîbûn, dîxuriyan û dîxuriyan. Ango jan, êş û ew xurandîna ketîbûn nav hev, Xec her dîşandî. Bî taybetî êş û xurandîna çavan Xec her bêçare dîkir. Xeca belengaz dîqirîya, dînalîya û bî kefa destên xwe va çavên xwe mîsdîda û dîxurand. Gazi Xwedê, Bamasûr, Xîzîr, Eli, Mîhamed, Hesên, Husên û ziyaretan dîkir, lê çu kêr lî tîşteki nedîdit, jan û êş her zêde dîbûn. Ew nexwaşîyê, jan û êşê lî zîkê du heftan de Xec gelekî jar û sîs kîr, balam Xec nemîr. Pîştî du heftan de Xec hêdî-hêdî lî xwe hesîya, jan û xurîna temîrîya, lê sed mîxabîna ku, vêca jî pûs kete ser ronahîya çavên Xecê, Xecê her tîşt bî qencî nedîdit; her tîşt lî ber çavên wê de bî mij dîhat xuyakîrîn. Xeca belengaz êdî bî rawêjî-tahmînî-dîmeşîya, pîranîya kesan bî dengên nasdîkir. Bîlî Xecê dîsa gelek kes werge bî çavan kor bûbûn. Her roj refek wan nexwaşan dîçûn gundê "Bîlan" ser kaniya "Çîxmê" ser û çavên xwe dîşoştî; dîçûn ser ziyaretan ku çavên wan xwaş bîbîna, lê ew ne keys bû. Lewra ew kar û berên ziyaretan nebû.

Bî ew şîklî va roj û hefte derbaz dîbûn û dîçûn. Rojeki Xecê jî mîrê xwe Xîdê ra:

- Ez dîxwazîm tu jî mîn bîbî ser kaniya "Çîxmê" hêvîya mîn ewe ku ava kaniya Çîxmê çavên mîn qenc bîke. Ez usa bî ev çavên kor va nîkarîbîm kar û sîxurekî malê bîkîm; jî wera nîkarîbîm bî qencî nanekî bîpêjîm, xwarînekî amade bîkîm. Çî dîbêjîm" Xwedê derd û kul jî daye qûlên xwe, derman û havîl jî daye û afîrandîye". Erê lî ev welatê me de bîjîjk û nexwaşxane tunîna, balam Xwedê şîkîr ziyaretên me gelekî pîrîna, Xwedê ewana bî taybetî

dane me Kurdan, ew ji mera besın, got û lı benda bersiva Xidê de ma.

Lı destpêkê de Xidê qet bersivek neda jına xwe, dûra" başe, xwe amade bıke em sibe bıçın û du sibe dagerın mal. Beri ku em bıçın, divê ez gazi İmamê zava bıkim, bıla sibe ew tev zarokan bıçe ber naxıra pêz û dêwêr, em ji bıçın ser kaniya "Çıxmê". Lê ez hêvi dıkım sibe kareki wi tunebe" got û derket der bervı Goma Karrê meşıya.

Lı ew şevê de, xecê bı ew çavên xwe va hınek Kilor û naneki Tawê pat û rojtıra dın lı berbanga sibe de tev Xidê mêrê xwe rêketın çûn gundê "Bılan" ser ava kaniya "Çıxmê" keleyên xwe lı kevırê kaniyê bıriyan, kevır maçkırın. Dûra Xidê lı bêrika xwe de pênc quruş ji derxist avit hındırê ava kaniyê û Xecê destpêkır dest, rû û çavên xwe şoşt û şoşt,ew kara dubar, dubar kır. Lı ew rojê de, Xecê heya êvari bı ava ew kaniyê va dest, rû û çavên xwe şoşt, heya muxurba êvarê. Lı pışti muxurba êvarê de ji rabûn çûn mala Kekê Espahi de bûn mivan û rojtıra dın lı berbanga sibe de ji rabûn serxwe rêketın û disa dageriyan hatın Kúpikê, gihiştın mala xwe. Lı pışti ew rojê de êdi Xec lı benda qencbûyına ronahiya çavên xwe de ma, balam çavên Xecê qenc nebûn, hêviya Xecê şikiya, Xeca belengaz lı nav tariyê de ma û ma.

Roj û mehe zû-zû derbaz dıbûn dıçûn. Disa dema payizê şuva mabû, roja sersala nû bû. Dêrsimiyan ji roja pirozkırına sersala xwe ra "Goxend" dıgotın. Lı navbera pirozkırına roja sala nû û Goxend'ê de sêzdeh roj hebûn. Ango Dêrsimiyan lı gor hesab û hêjmara kevn sersala xwe piroz dıkırın, lı ew rojê ra ji "Roja Goxendê" dıgotın. Hın kesan ji bona roja Goxendê rojeki ji roji dıgirtın. Lı heyamek werge de disa gundiyan parxaçên zerfetan avıtıbûn bınê sêlan, Zerfet dıpatın. Dûra ew parxaçên zerfetan lı

binê sêla agir de derdixistin, dadaniyan ser sifre û textan, bî kêran qalikê parxaçê, ê rûyê ser dibiriyan derdixistin û bî kevçiyar zikê ew Zerfetê dikolan û ew nana derdixistin der dıpişartın, bî dew ji kamara-kasnak-ew Zerfetê çilpav-sıva-dıkırın, dūra sê darikên bî taybeti dıkırın nav ew nanê pişarti û disa ew nana dıkırın zikê kamarên Zerfetê bî qenci lod dıkırın û lı pey ew ji icar dewsir lı dora Zerfetê de berdıdan ser ew nanê pişarti; dūra kewaniya malê tawek rûnê kelandi berdıda ser ew nanê Zerfetê û êdi her kes lı çar aliye Zefetê de kom dibûn, bî tiliyan va dıketın nav ew nanê Zerfetê û destpêka xwarinê dıkırın. Hemû kesên dora Zerfetê lı nav xwe de dıketın lecê digotın" gelo ki ew darikên bî taybeti lı nav nanê Zerfetê de dibine". Navê ew darikan ev bûn: Qismet, Dewlet, Cotkar. Her darıkek xudan işaretek xwe a taybeti bû. Bı xesma darikê Cotkar, bı mina "Hevcar" dıhat çêkırın, ên dın ji, disa her yeki işaretek xwe a bı taybeti hebû. Ji bona ew darikan ji, baweriya Dêrsımiyan ew bû: Ku ki darikê Cotkar bibine, wê lı ew salê de cotê wi û çandiniya wi qenc, zada wi ji her zêde bibe. Ki ku darikê Qismet bibine, wê qismetê wi her zêde bibe, bextê wi lı her aliki va vebe. Ki ku darikê dewlet bibine, kar û berên ew kesi ji dewletê ra baş bimeşe û teyrê dewletê lı ser serê wi bihêwire.

Belê, ew adet û torana lı nav Dêrsımiyan de dimeşiyar û wana ew adet, tore û baweriyana dıkırın ser Ola İslam. Dıgotın" evane adet û toreyên Ola İslamın". Lê bı rasti keseki zagonên Ola İslam û kevneşopiyên gelê Erebi nedizaniyan. Lı ew roja cejna Goxend'ê de bı taybeti zarok derdıketin der bı berfê "Kaleki Sipi" çêdıkırın, lı dorbera ew Kalê Sipi de kom dibûn. Hın kesan ji ji xwera ri çêdıkırın dıketın dılgê "Kalê Sipi" cûre-cûre leyiztok pêkdıanin, lê nedizanibûn ku, ew lı kijan dewrê de ji gelra mırat mane.

Lı ew sersalê de hemû gund û bajarên Kurdistan lı nav berfê de mabûn, bı taybeti xaniyên gundiyan lı nav berfê de nedihatın xuyakırın. Gundiye Dêrsım hım sersala xwe a nav "Goxend" piroz dıkırın, hım ji lıgel hev kom dibûn, lı nav xwe de çirok dıgotın, hevûdu guhdar dıkırın. Xıdê naxırvan ji lı mala Qemer de rûniştibû jı der û cinaran ra kılam dıstrand. Carna hım kesın ji qal û behsa nûçe'yên nû dıkırın. Dıgotın" Hitlet ketiye nav Êrız, qıra Koministan tıne". Hın kesın ji disa dıgotın" Hitler û Êrız jı mera çı, bıla kafır qıra hevûdu bınnın. Gawır bıla hevûdu bıxwın, ew çı dıkın bıla bıkın. Lê ew pê Îslaman nıkanın. Lewra Ola Îslam bı hêze, Xwedê lıgel Îslamana. Lı şeran de leşkerên Avdılmûsa dıkevın pêşiya kafıran, qıra wan tının. Top û tıfingên wan qet tışteki nakın. Jı ber ku leşkerên Avdılmûsa, ewên bı simbêl, gule'ên top û tankên kafıran lı hewa de distının û şuva davıjın ser kafıran, koka kafıran tının. Ev tıştana lı Qurânê de usa hatıne nivısin, Pir û Rayber usa dibêjın.

Lı pişti pirozkırına Goxendê de, ew gundiye ku jı bona cejan Xızır qurban nêt kırıbûn, wana qurbanên xwe girêdabûn, bı taybeti ew lı wan heywanên xwe qenc dınhêriyan, ew qurbanên xwe qelew û tawli dıkırın, ku goştê qurbanên wan zêde bıbın. Bı ew rengi va rojên zıvıstanê lı nav pûk û berfê de derbaz dibûn dıçûn û wexta rojiya cejna Xızır hatıbû. Pêwıst bû ku hemû kes sê rojan rojiyê bıgırın. Mêr û jınan, keç, bûk û xortan, heya zarokên şeşheft salını xwe jı bona sê roj rojiya ceja Xızır amade dıkırın. Nêçırvan disa derketıbûn Gara heber gund, bıne kevırê Belek, kevırê Huli, ser pozikê Karrê û pozikê Nêçırvanan, newala Qemlexan û Mêrga Besê kew dıpekan dın, kew dıfılıtandın" hat û hat" dıgotın, nêçır dıkırın. Keçên gundê Kûpıkê ji lı mala Seyid Heyder de kom bûbûn, lı nav xwe de ketıbûn zıkê galagota xortan. Kê gore, kê doxın, kê keji, kê ji tentene çêdıkırın. Lı hevûdu dıkeniyan henek dıkırın. Lı nav ew galagotan de, yekser

Şekıra keça Seyid Qemer, jî hemû keçan ra pêşneyarek ani û usa got:

- Bînhêrîn, sibê rojiya cejna Xızır destpêdike, divê em hemû sê rojan rojiyê bığırin. Lewra ev deynê meyê jî bo ev cejna evrar. Ez dibêjûm em hemû işev jî xwera kîlor û bêşiyên şorr, wek şorravîk bîpêjîn û bixwîn. Ew kîlor û bêşiyên şorr wê me ti dîkîn, lê divê em avê venexwîn, bî ti werge bîkevin xewê, bînhêrîn lî xewnên meda kijan xortê gund, yan jî xorteki biyani avê dîde me. Sîbe zû jî, disa em totîk û nanê niv patî bîpêjîn, bîkîn ser şiveki lî ser berfê de bîhêlinîn, bînhêrîn qırîka reş belek ew totîk û nanê niv patî dîgire jî kijan alî va dîfırîke. Ku kijan alî va fırîkiya, mana wê ewe ku, em lî ew alîva dîçîn mêr dîkîn. Kijan xortî jî lî xewnê de av da me yekî, mana wê ewe ku, em lî ew xortî ra dîzewicîn. Lî piştî ew pêşneyara Şekıra keça Seyid Qemer, hemû keçan bîryar standîn û lî ew şevê de, ew karên xwe pêkanîn, kîlor û bêşiyên şorrîk jî xwera patî xwarîn û bî ti ketî nîv nivînên xwe ketî xewa kûr. Rojtîra dîn disa lî destpêka sibê de, totîk û nanê niv patî kîrîn ser şivîkan û lî nav berfê de tik kîrîn, qırîkên reş belek xwe gîhandîn ew totîk û nanên niv patî kîrîn nav nîkîlên xwe û her yek lî alîki va fırîkiyan û çûn. Dûra disa hemû keçên gund lî mala Seyid Heyder de kombûn û xewnên xwe jî hevûdu ra gotîn û destpêka gengeşîya fırîkandînen qırêkên reş belek kîrîn. Qırîk lî kijan alîva fırîkiyabûn, îcar şîrovekîrîna ew alîyan kîrîn û lî benda dawîyê de man.

Belê, ew bawerîya keç û xortên Dêrsîm bû. Her sal bî taybetî lî dema pîrozkerîna cejna Xızır de, ew kar û adetên xwe dubar dîkîrîn, lî benda bextên xwe de duman û dîseki-nîyan.

Pîraniya gundîyan sê roj rojiya Xızır girtîbûn û ew deynên xwe dabûn. Yê nî ku qurbanên wan hebûn, wan he-

mûyan qurbanên xwe serjêkırıbûn û goşt belav kırıbûn. Disa hemû gundi çûbûn ser tırbên bav kalan, loqme belav-kırıbûn, Quran dabûn xwendın û ew vatiniyên xwe hemû anıbûn şûnê. Disa hemû keçên gund lı mala Seyid Heyder de kom bûbûn lı nav xwe de dipeyiviyan, henek dıkırın û dıkeniyan. Lı demek werge de Ali Rıza ê kurê Seyid Qemer kete hındır. Dıt ku hemû keçên gund lıgel hev kombûne, henekan dıkın û dıkenın. Ali Rıza ji xorteki çak û sıpehi bû. Pıraniya keçan dıl berdabûn Ali Rıza, balam Ali Rıza rû nedıda keçıkan. Çawa ku Ali Rıza hemû keç lıgel hev dıtın, ji xwişkên xwera û hemû keçan ra:

- Lê-lê hûn çıra lı vıra kombûne galagotan dıkın, rabın em bıçın axur de çavgirtık bıleyızın. Xıdê kurê Xıdê, İma-mê me, Husênê Alê İmê, Bırê ê Mıçê Hamê, Kekê mala Apê, ew hemû ewe lı axurê meda çavgirtık dıleyızın, hûn ji rabın em bıçın hemû bı hevra bıleyızın, got û lı benda bıryara keçan de ma. Lı pışti ew pêşneyara Ali Rıza de, hemû keç rabûn serxwe û lı tev Ali Rıza çûn ketın axur. Çıto ku keç ketın hındır axur, Xıdê pıçûk ji keçıkan ra:

- Hûn hemû xêr hatıne ev axur. Welleh axur lı malan germıte, werın hûn ji bıkevın nav refên me, em mina xwişk û bıran ji xwera çavgirtık bıleyızın, got û pêşneyar kır, ku bı nûva lı nav xwe de pındepireki bıbêjêrın. Ji bona ew ji, Husniye keça Seyid Qemer:

- De başe, hûn hemû kes werın tiliyên xwe bıdın ser jonyê mın, ez lı nav we de pındepireki bıbêjırım, got û lı şûna xwe de rûnişt. İcar hemû kes lı pêş Husniyê de kombûn, her kesi tiliya xwe a işaretê da ser jonyê Husniye yê û Husniye yê destpêka bıjartına pındepirê kır û bı ev gotınan va pındepir bıjart:

- Ê kelê / Dunê kelê / Çar çemberê / Mışk hemberê / Alê vıngo / Pê qulingo / Şemşıyo / Xılılıyo / Hesê kewê / Ber kewê / Kew fıriya / Çav diriya / got û Husênê Alê İmê kire pındepir. Lı pışti leyiztokeki de, icar hın kesan pêş-neyar kırın ku, pındepir nû va were bıjartın. Vêca Senema

newiya Seyid Heyder got, ez pîndepirê dîbijêrîm û wê destpêka pîndepir bijartinê kîr. Vêcarê ji hemû zarokan tiliyên xwe dan ser jonyê Senemê û Senemê usa pîndepir bijart: Înê-inê / Bervî Çînê / Ogan / Çogan / Îçîr / Viçîr / Kurt / got û Xîdê piçûk kîre pîndepir. Lî piştî du leyiz-tokan de, vêca Xîdê piçûk îtiraz kîr, got" hûn lî min bînekari-hile-dîkîn, dîvê pîndepir carek dîn were bijartin. Lî cara sêyem de, Kekê mala Apê destpêkîr ku ew pîndepirê bîbijêre. Îcar disa hemû kesên tiliyên xwe dan ser jonyê Kekê û Kekê usa destpêka pîndepir bijartinê kîr: Yek a kanê / Duxwaskanê / Çit û çember / Gundê hember / Tas û tûs / Tîngîr fîs /. Lî dawiyê de Kekê Apê Xîdê piçûk disa kîr pîndepir. Lê Xîdê ew hêjmartîna nepejîrand û carek dîn îtiraz kîr, ku nûva destpêbibe. Lî dawiyê de, Ali Rîza ê kurê Seyid Qemer xwast ku ew bibe dadger û ew pîndepirê bîbijêre. Hemûyan ji "başê" gotîna û Ali Rîza destpêkîr û usa pîndepir bijart: Akîlê / dîkulê / dû mazê / Şemş û qotîk rêpazê / Akçe-akçe, ar akçe / Qîr û qotîk / Dev lî zûtîk, got û Îmamê kurê Bavo ê Kekê kîre pîndepir û destpêka leyiztoka xwe kîrîn, heya ku muxurba êvarê destpêkîr. Dûra hemûyan xwastîrên xwe lî hev xwastîna, lî hev belav bûn û dagerîyan malên xwe. Lê hewa ji her sar, berf dîbarîya, ba û bahoz lî nav hev dîket, toza berfê radîkîr lî vîrde-wîrde dîpijîqand, pêş derî û çal û kort tîjî dîkîr. Hemû gundîyan deriyên xwe dada bûn, lî malên xwe de şîva xwe dîkîrîn, xwarînen xwe dîxwarîna. Lî piştî demek kurtte yekcar lî derva dengê qîrîna û gazîneki dengvedan da çîya û tatan, lî tev ba û bahozê lî pêşîya derîyan de dapaliya kete hindîrê malên gundîyan, deng da esrexên-tavan-malan, hemû gundî vecenîqîyan serxwe, tîrs û xofek mezîna kete zîkê gundîyan, hemûyan deriyên xwe vekîrîna derketîna der, ku bînhêrîna gelo ew çî dengê lî derva tê, çî lî derva qewîmî, bîbîna û serwest bîbîna. Lê gundî derketîna der ku çî bîbîna, ewe Xîdê kurê Xîdê naxîrîvan lî pêşîya du cendermeyên Tîrk daye, cenderman destên Xîdê

piçûk kırıne kelepçan dane pêşiya xwe tev Serbexo ê gund "Hesê Weli Hesê" dıxwazın ku lı ew şeva taride bıbın Mo-xındiyê, radeste leşkergeha Tırk bıkın. Xidê bav, tev Xeca çav melûl, Hesên û Ali va, lı dû cenderman û Serbexo ê gund de dumeşın, dıkın qırın, gazın û dıgırın, hawar dıkın, ku gundi jı ew bêbextiyê ra havilêki bıbinın. Hemû gundi ecêb mabûn, nedızanıbûn ku çı bıbêjın û çı bıkın. Gundiyan jı hevûdu pırs dıkırın, dıgotın" gelo ev çı hêkmeta Xwedê ye, lı ev şeva tari de, lı nav ev berf û pûkê de, çı karên cendermeyên Roma Reş lı ev gundi de heye? Ev bêbextana lı vi kurê Xidê ê çardeh salını çı dıxwazın? Çı sücê ev lawiki heye, ku cendermeyên Romê destên wi kırıne kelepçan dane pêşiya xwe û dıbın? Gelo ev cendermeyên dewleta xwinxwar, ev belengazi dıbın ku? Gelo kê ev lawika êxpar kırıye û daye destê ev dijminan?". Lê keseki lı ew demê de bersiva ew pırsan nedıda. Cenderman jı xwe gihandıbûn pêş derê mala Bayo ê Kekê. Lı ew demê de Alê Memê kete pêşiya cenderman û Serbexo ê gund Hesê Weli Hesê, jı Serbexo ra usa pırsiya :

- Kirivê Hesên gelo ev çı rewşe, ev cendermeyên Romê ev lawikê belengaz û çardeh salını dane pêşiya xwe, destên ev lawiki jı kırıne kelepçan, lı ev şeva tari de, lı nav ev berf û pûkê de dıbın ku? Bı rasti nêta van xwinxwaran çıye? Ez bawerım tu dızanı. Lewra tu Serbexo ê gundi. Hukma Romê lı ev pızêzi çı dıxwaze? Bı kerema xwe jı mera bıbêje, me serwext bıke.

Lı ser ew pırsên Alê Memê, Serbexo ê gund, Hesê Weli Hesê, berê xwe guhart ser Alê Memê, jı Alê Memê ra:

- Kirivê Ali, kurê Xidê revokê leşkeriyê ye. Lı wexta qeydkırınaa gundiyan de, Xidê jı mınra rojbûyına kurê xwe rast negotiye; salên kurên wi bılındın. Hûn lı laş û bedena ev kurê Xidê menhêrın, salên ev kuri lı bistan derbaz bûne. Lê lı destpêkê de, Xidê jı mınra got" kurê mın sêzdeh salını daye". Ango salek beri me malbata Xidê qeyd kır, lê dewlet dızane kurê Xidê çend salınıye. Bı kurtasi

kurê Xîdê lı ev rojê de çardeh salını de nine, salên vi lı bistan derbaz bûne. Ez Serbexo ê gundım, dıvê lı gor zagon û gotınên dewletê bumeşım. Lı gor raporên dewletê, bavê Xîdê mezın revokeki leşkeri bûye. Malbata wan lı Zera'yê bûye. Navê malbata Xîdê ji ketiye nav kesên tevgera Qoçkiriye. Bavê Xîdê û apên Xîdê ji, lı dıji dewletê derketine û lı dewletê ra şer kırine. Malbata bavê Xîdê ji bûye hevparê ew kesên sûcdar û hevparê kesên mina Alişêr. Bı kurtasi dewlet pê hesiyaye ku, ev malbat, malbatek sûcdare, kurê Xîdê ji revokê leşkeriye ye. Çaveki Xîdê ku kor nebana, wê dewletê Xîdê mezın ji, lı tev kurê wi bıbirana leşkeriye. Bıla Xîd dıwa bıke ku çaveki wi kore, salên wi ji çıl û pênc i derbaz bûne. Mın beri ji Xîd çend caran şiyar kır, lê wi guh neda mın, naha ji ez nıkarıbım tışteki bıkıım, got û derew û rûreşiya xwe eşkere kır, lê Xîdê naxırvan diyax nekır û teqiya, bı dengeki bılın va:

- Xwedê mala derewçınan bışewitine. Lı beri te ji, gelek kesan jı gelê xwera bêbexti kırın, gelek kes dan destê hukma Romê û dan kuştın. Tu ji kesê yekemin nini. Jı mınra bıbêje Heso, te çıra ev bêbextiya ani serê mın ? Jı bona bertilê wer nine? Tê bira te, te jı bona tênıvisina nû lı mın yazdeh pangınot xwast, mın ji, jı tera got" ez evqas dırav jı tera lı ku bıınım" lı nav û mın û teda raberzin çêbû, tu lı mın xeyidiyay û te got" Xıdo wê roj were ez lı te tışteki wer temaşe bıkıım ku, wê tu sed cari poşman bıbi". Jı bona ew bû, wer nine te ev bêbextiya ani serê mın. Lê Xwedê mezine Heso, ew rojeki ev axina dilê mın bıbihise û lı te pırs bıke, tola mın lı te bıstine, got û disa destpêka girinê kır. Lı ew demê de jına Bavo ê Kekê Ana Senem bû hevparê girina Xîdê naxırvan. Wê ji bı destê bêbextan bırayê xwe Hesenê Şekır wenda kırıbû. Dewleta Romê bırayê wê ji lı newala Sındamê de kuştıbû. Ew ji dılkeser û dılxemgin bû. Ana Senem bı kelegiri xwast ku Xîdê piçeki xemrevin bıke. Jı bona ew ji, jı Xîdê ra:

- Evqas berxwe mekeve Xıdo, Xwedê mezîne. Hukma Tırk, hukmek bêt rame, hukmek bêt şerefe, hukmek bêbexte. Dewleta Tırk çucaran lı histêrên çavên hejaran nanhêre. Bingehe dewleta Romê lı ser bêbextiyê, lı ser dek, dolav, kuştın û xwina mırovan hatiye danin. Hukma Romê axa reş bı xwina mırovan va sor kırıye, kırıye çamûr û heri, ew heriya bı xwin kırıye binê himê xwe. Ev dewlet, dewletek bêt Ol û bêt imane. Leşkerên Tırk zarokên me Kurdan mina berx û karan serjêkırine, goştên wan xwarine. Ev bêtara bav û kalan bı hezaran car ji mera gotine. Ji bona ev ez ji wera dibêjim" megirin, Xwedê mezîne, Xwedê bı rame, got û Ana Senem Xıd xemrevin kır. Lê Xıd qet xemrevin nedibû, her dıgiriya, dıkır qirin û hawar, dırıcıfiya û dılorand; bervı gorıstana gund dumeşiya, hemû gundiyan ji lı Xıdê dınhêriyan. Pişti hûrdemeki de Xıdê xwe gihand nav gorıstana gund, çû ser tırba Seyid Ali ê Seynûri, lı kevirê tırba wi keleyê xwe biri û maçkır. Lı pey ew çû ser tırba Seyid Mıstefa ê Axcê, enyi tevger lı wê ji pêkani, icar dageriya ser tırba Seyid Abasê Kose, kevirê tırba wi ji maçkır, xarbû bı destan berfa hındirê du keviran kola, tiliyên xwe gihand ax a nav herdu keviran, piçek ax a tırbê girt û disa dageriya ba gundiyan, cenderman û kurê xwe, bı giri ji kurê xwera:

- Kurê mın, ev tewerıka Seyid Abasê Koseye, piçeki bavêje devê xwe bıxwe, ê mayin ji ez ji tera bıkim nav paçeki girêbıdım, tu bıgire bıke bêrika xwe, bıla ev tewerıka her tım lı bêrika teda, lı ser bedena teda bimine û bisekine. Lı rojên tengasi de, wê Seyid Abasê Kose lı te bınhêre, wê ew were hawariya te, te lı her rojên bed û teng de bıparêze, got û ew axa kire nav paçeki girêda û da kurê xwe Xıdê piçûk. Xıdê piçûk ji ew paç û tewerıka girt, bı kelegiri çû destê bavê xwe maçkır, xwatırê xwe ji bavê xwe, ji bırayên xwe û dêmariya xwe xwast, çû destê mezınan û xwatırê xwe ji der û cinaran ji xwast û radeste cenderman bú. Lewra cendermeyên Romê lez dıkırın, lê

gundiyan ji dixwastin ku bîbin asteng, li ew şeva tari, li bînê ew pûk û berfê de ew lawîkê belengaz û çardeh salîni neşînin Moxîndiyê, bîla bihêlinin sibê. Her çiqas ku gundi li ber cenderman dîgeriyan, li cenderman tîka dîkîrîn, lê cendermeyên hukma xwinxwar dîgotin "na û na" her lez dîkîrîn. Xîdê bav ji dîgiriya û gazi Xwedê dîkîr, kurê xwe hembêz dîkîr, nedixwast ku kurê xwe li hembêza xwe derxîne radeste cenderman bîke. Li alîki Xîd dîgiriya, li aliya din de ji Xec, Hesen û Ali. Her çar li dorbera Xîdê piçûk de rêz bûbûn, nedîhiştin ku Xîdê piçûk li wan veqete biçê. Li dawiyê de cenderme û Serbexo ê gund Hesê Weli Hesê ji Xîdê bav ra hêrs ketin "êdi bese ev giri û şîni, divê em biçin, kuro ma tu çira evqas dîgiri û li xwe dixîni? Kurê te diçe deynê xwe ê welêt dîde. Ev ji kar û vatîniyek herî evrar û pîroze. Divê canê mîrov ji bona welêt her tûm bibe qurban, mîrov xwe ji bona welêt fîda bîke" got û cenderman Xîdê piçûk dan pêşîya xwe bervî Moxîndiyê meşîyan çûn li pêş çavan de wenda bûn.

Qirin û gazîna Xîdê naxîrvan, qirin û gazîna Xecê, Hesen û Ali dîghişt esman, dilê mîrov dişewitand, dax dîkîr. Hemû gundi li ber Xîdê, Xecê, Hesen û Ali dîgeriyan, ku ewqas negîrîn, xemgîn nebîn, êdi dagerîn biçin mal li derva nemînin, lê Xîdê û Xecê qet kesek nedîbihîstîn, dîgiriyan û dîlorandîn. Li nav ew dema dîramatîk te pey-xamek-ilham-ketîbû dilê Xîdê, Xîd hum dîgiriya, hum ji dîstîran û dîgot:

Lemîn, lemîn, lemîn, de gundîno hûn rabîn

Der û cinarîno, teyr û tûrên Xwedê'no li hêlinên xwe de rabîn

Bînhêrîn, bibînin cendermeyên Roma Reş, tev Serbexo ê gund Hesê Weli Hesê, kelepçe kîrîne destên kurê min, ew hesînana qet venabîn

Xwedê'no ewên ku bûne sedemê ev bêbextiyê, kurê minê çardeh salîni êxpar kîrîne, li ev cihanê de qet nebîn rûken, dilê wan şanebîn.

Wey lo, wey lo, ax lı serê mın, ax lı serê mın.

*

Xwedê'ο, tu mın bıbhıse, kurê mın pıçûke, zarokeki
çardeh salı

Ez gazi pêxamberê Ola İslam Mihamed dıkım,
tev Bamasûr, Kurêş Bawa û hezreti Eli

Malxırab û malşewıtino, ma çıra hûn bûne çav kor,
nabının ev zılm û bêbextiya Roma Reş, ev rewşa mın
û ev halı

Wey lo, wey lo, ax lı serê mın, ax lı serê mın.

Bınê Kûpıkê zinar û aseye

Serê Kûpıkê çiya û aseye

Mın doza xwe daye Şahê Merdan, Seyid Ali ê Seynûri,
Seyid Mıstefa ê Axcê, Seyid Abasê Kose ye

Bıla ew belakı bıdıne hukma Romê û Hesê Weli Hesê
ye

Wey lo, wey lo, ax lı serê mın, ax lı serê mın.

Zıvıstane, berf û pûke, şeve, şevək tari

Lı derva ba û bahoze, mina xezew berf dıbarı

Xwedê'ο, kurê mın sax bıbe, sılamet bine,

ez jı te û wıra bıkıım qurban mı a Elif û manga Zeri

Kurê mın bıla sax dagerı, ez tûrık bavêjım stuyê

xwe, jı bona wi pars bıkıım, bıgerım derı û derı

Xwedê'ο, tu bıbhıse ev dengê mın, nêta mın bıbe
serı

Wey lo, wey lo, ax lı serê mın, ax lı serê mın.

Qirin û gazına Xıdê her dıçû zêde dıbû. Kesên lı dor-
bera Xıdê jı, lı tev Xıdê û neferên mala Xıdê dıgırıyan.



Dûra Alê Memê pê milê Xidê girt tev jin û zarokên wi va bir mala xwe, ku Xidê û Xecê piçeki xemrevin bîke, lê Xid bêtir dıgiriya, berxwe dıket, lı xwe dıxıst, dıgot" Ali ez çı xaliyê lı serê xwe kım, dewleta Romê ew pızêzê mın lı leşkeriyê de bıkuje. Ew hina zarokeki çardeh salniye, wexta wi a leşkeriyê nine. Ev bêbextiya, bêbextiya Hesê Weli Hesê ye. Jı ber ku mın bertil nedabû Heso ê bejn bost. Lewma wina ev bêtara ani ser me, tola xwe usa bı bêbexti va girt. Hum ji bı destê dijminê xwinxwar va.

Gundiyên Kûpikê sedi nod kesên eşira Bamasûr bûn. Ew ji lı nav xwe de bûbûn sê ezbet. Ango her ezbetek, newiyên bıraki bûn. Tırbên wan sê bıran lı nav gorıstana gund de bûn û her tırbek jı gel ra bûbû ziyaretgehek giring û taybeti. Çawa ku me beri ji diyar kırıbû, navê wan her sê bıran ev bûn: Seyid Ali ê Seynûri, Seyid Abasê Kose û Seyid Mıstefa ê Axcê. Seyid Mıstefa ê Axcê dıbe bengiyê keçıkek nav" Axcihan " û evina wan lı nav gel de deng dıde û ew evina wan dıbe stranek wek strana Memê Alan û sıtiya Zin, dıkeve ser zara gel. Bı taybeti strana evina Seyid Mıstefê û Axcihanê, lı nav Kurdên Elewi de, stranek nav û denge, stranek xwaşık û dirêje. Seyid Abasê Kose ji, piçeki ri kose bûye, ri a wi werqas tiji û sıx ne-bûye, jı bona ew ji, jı wira gotine "Seyid Abasê Kose". Lı gor diroka wan sê navan û sê bıran, navê bavê wan Seyid Nûri bûye. Gor ku gel bawer dıkir û newiyên wan kesan dıgotın, ew her sê bıra, her yekek xudan kırameteki bûne û her yeki kırametek derxistiye. Jı bona bırayê mezın Seyid Ali ê Seynûri dıgotın" padişahê Osmanlı Sultan Mamût ê çarem, gazi Seyid Ali ê Seynûri kırıye, ku ew bıçe kırameteki xwe lı wi bıde temaşekırın û lı gor ew kırametê ji, padişah diyareki bıde Seyid Ali ê Seynûri.

Seyid Ali ê Seynûri ji radibe diçe İstembolê derdıkeve pêşberiya padişahê Romê, Sultan Mamût ê çarem û dibêje" padişahê mın te ez ferman kırime, ku tu mın bıbinı. Ez newiyê Bamasûr, Seyid Ali ê Seynûri me. Hatıme ku fermana te bınım şûnê dibêje". Lı pey ew gotın û rewşdem pırskırinê de, icar padişah dibêje" gor ku dibêjın tu miroveki xudan kırameti, gelo çı kıramet û hunerên te hene? Bı rasti kıramet û hunerên te ku hene, de fermo lı mın bıde temaşekırın, ez ji bıbinım, dūra bıryar bıstınım û diyariya te bıdime te". Lı pey ew gotınên padişahê Romê de, Seyid Ali ê Seynûri jı padişêh ra:

- Bı kerema xwe jı mınra kasek jehr bıın, ez kırameta xwe lı we bıdım temaşekırın, dibêje. Lı ew demê de padişah ferman dıke, ku wezir jı Seyid Ali ê Seynûri ra kasek jehr bıne. Wezir jı diçe kasek jehr amade dıke dıbe, dıde berdest, berdest jı kasa jehre dıgre tıne dırêje Seyid Ali ê Seynûri dıke "fermo" dibêje û şuva diçe. Seyid Ali ê Seynûri jı, ew kasa jehrê dıgre û mına avê, vedıxwe; lı pıştı du hürdeman de, dısa, ew kasa jehrê lı bıın neynûkên tılıyên destê xwe de dadıke û ew kasê tıji dıke û dısa kasa jehrê radeste wezir dıke. Lı wê demê de padişah ecêb dımıne û baweriya xwe lı ew kırameta Seyid Ali ê Seynûri tıne, dıxwaze ku zêr û zıvan û malê cıhan bıde Seyid Ali ê Seynûri, lê Seyid Ali ê Seynûri zêr, zıv û malê cıhan napejırıne, jı padişahê Romê ra:

- Sultanê mın, ez mal, zêr û zıvên ev cıhan lı te naxwazım. Xwasteka mın lı te ev e ku, lı iro şuva tu lı me seyidan, bı taybeti lı kesên eşıra mın bac û qamçûra dewletê nexwazi û negırı. Xortên me nebê leşkeriyê, lı eşırên seyidan leşkeran nexwazi. Diyariyên ku tu bıdı mın, hemû evın, ev gotınên mınım, jı mera ev tıştana pêwıstım, diyariyên te jı mera bıle ev tıştana bıın, dibêje. Lı ser ew daxwaziya Seyid Ali ê Seynûri, lı nav padişahê Romê û Seyid Ali ê Seynûri de peyman tete nıvisandın û padişah jı Seyid Ali ê Seynûri ra:

- Başê seyidê mın, divê tu ev peymanê bıgırı bıbi bist û çar bajarên Osmanli de destnıvis bıki. Ango divê hemû Wali'ên bist û çar bajarên Osmanli ji, ev peymanê destnıvis bıkın, destnıvisên wan ji lı bınê ev peymanê de pêwıste. Lı pışti ev kari, êdi bêdawi jı werı bac û qamçûr dayın tune. Jı zarokên werı leşkeri tune; kes jı we leşker naxwaze, te ez geleki dılşa kırım, dibêje û Seyid Ali ê Seynûri jı bona çend rojan jı dıke mivanê xwe û dûra wi oxır dıke dışine mal. Seyid Ali ê Seynûri jı dadıgere mal, dûra wê peymanê dıbe lı bist û sê bajarên Osmanli de dıgerine; bist û sê Wali destnıvisên xwe davêjin bınê ew peymanê, tenê Wali ê Erzurumê dımıne, lê sed mıxabın ku ecel dest nade, Seyid Ali ê Seynûri nexwaş dıkeve, lı zıkê hefteki de dımıre, dıçe rama Xwedê, ew peyman jı werge nivçe dımıne. Lı pey mırına Seyid Ali ê Seynûri de jı kesek ew peymanê nabe Erzurumê, destnıvisa Wali ê Erzurumê navêje bınê ew peymanê û ew peyman lı mala Seyid Ali ê Seynûri de dımıne. Dûra zeman tê xwe dıgihêjine qurna bistan. Lı destpêka qurna bistan de, newiyê Seyid Ali ê Seynûri, kurê Seyid Heyder, Şukri, lı gundê Şowagê, lı malbata Cewahiran de, jı keçek ew malbatê ra dızewıce, ew keçıka malbata Cewahiran tê dıbe bûka newiyê Seyid Ali ê Seynûri, jına kurê Seyid Heyder, Seyid Şukri. Lı zıkê zeman de, ew bûka Seyid Heyder, jına Seyid Şukri ew peymanê dıgire û dıbe dıde mala bavanê xwe. Ango dıbe dıde malbata Dızgûn Cewhair. Jı bona ew jı, lı navbera herdu gundan de gelek jı şer derdıkevın, lê mala Cewahiran ew peymanê şuva nadın û vedışêrının, dibêjin " lı mala meda tışteki usa tune".

Bı rasti jı seyidên gundê Kûpıkê dıgotın" ew Senet û Secade a bav û kalên me Bamasûrane. Dewleta Osmanli daye meye. Ew dıroka me dıde temaşekırın" lê çıqas raste sedı-sed kes nızane. Jı bona ew dubendiyê û hın sebebên dın, hemû kesên eşıra Bamasûr, gundiyeş Şowagê lı ser eşıra Bamasûr nedıhesıbandın. Dıgotın" ew ne seyidın, ne

ji kesên eşira Bamasûrın. Şowagiyan"Ecem" ın, felan-bêvan. Jı ber ku Şowagiyan dûra hatıbûn lı ew gundi de ciwar bûbûn. Ango lı hêla Îranê de hatıbûn. Ew ji dîbû sedema ew gotınan.

Jı bona Seyid Mıstefa ê Axcê ji, dıgotın" wi riya qonaxa sê rojan, lı zıkê niv seatê de gırıtiye. Lı meha Avrılê de, lı ava çemê Fırâtê de, bêt pırd û bêt kelek derbaz bûye, nexenıqiye. Hum ji qet avjên nezan bûye" felan û bêvan. Jı bona Seyid Abasê Kose ji, disa dıgotın" ew çûye herêma Têrcanê, lı gundê " Cancigê " de darek hışk ditiye û wi ew dara hışk şın kırıye, can û ruheki nû daye ew darê û lı ser ew dara kok hışk de guli û ajên şın vebûne; her guli û ajek lı aliki va bılınd bûne û ew dara bûye darek ziyaretgeh û wê ew dara êdı qet hışk ji nabe. Jı ber ku Seyid Abasê Kose gotiye" ev dara mîne, wê ev qet hışk ji nebe û bibe darek bêdawi usa her tum şın bumine".

Belê, eşira Bamasûran û hemû Kurdên ew herêma Dêrsım û derên dın, ji bona wan kesan usa dıgotın û qal û behsa gelek kıramet û efsaneyên wan kesan dıkırın. Bı taybeti axa tırba Seyid Abasê Kose, ji rûnıştvanên ew herêmê ra bûbû tewerık. Hın kesan ew axa tırbê dıavıtın devên xwe dıxwarın, hın kesan ji, ji xwera û zar, zêçên xwera dıkırın berbejn, lı stuyê xwe de dardadıkırın. Ango ew baweriyek bû lı nav gelda domdıkır, dıçû.

Roj û mehe zû-zû derbaz dıbûn û dıçûn. Balam qet nûçek lı aliya Xıdê piçûk de tunebû. Hukma Tırk Xıdê belengaz ê çardeh salını şandıbû Sêrtê. Lê bajarê Sêrtê, bajareki Kurdistanê bû. Jı ber ku Hitler êriş dabû ser Êrız. Lı navbera Êrız û Alman de şereki zor gewre destpêkırıbû. Hukma Romê ji bona tırşa Êrız hemû leşkerên xwe kırıbû Rojhilatê, anga Kurdistanê. Ku sedem ew şerê Êrız û Alman nebana hukma Tırk çucaran xortên

Kurd lı bajareki Kurdistan de nedihîşt, hemû xortên Kurd dışandın Rojavê. Jı bona ewlekariya xwe a Kurdistanê ji, bı taybeti xortên Tırk, ewên şovini û nijadperest dışandın Kurdistanê, ku ew lı gelê Kurd zılm û zordestiyê bıkın. Lê lı ew demê de werge nekırıbûn, Xıdê piçûk ji, jı bona ew sedemê şandıbûn Sêrtê.

Hewa havin wexta çandiniyê bû. Xıdê naxırvan lı tev kurê xwe Hesên dıçûn ber naxıra pez û dewarên gund. Kal û pirên gundiyan gam dıgerandın, mêr û xortan ceh û genim dıçınıyan. Tû û hêrmi ji êdi gihiştıbûn, wexta xwarına tû û hêrmiyan bû. Lê çûkreşan mecal nedıdan gundiyan, ku gundi tû'yan bıxwın. Bı hezaran çûkreş lı ser guliyên tû'yan de dihêwirıyan û radıbûn. Xwediyên tû'yan zarokên hûr dıkırın pasewanên tû'yan, ku ew zarokana lı tû'yan bınhêrın, wan çûkreşan nehêlinın, ku ew werın lı ser tû'yan bıhêwirın û tû'yan bıxwın, telef bıkın. Jı bona ew ji, tenike û zıngıl dabûn destên zarokan, ku zarok wan zıngılın bıhêjinın, ço lı tenikan xının bıkın teqe- teq û reqe-req, ku çûkreş bı wan dangan va bıtırsın û êriş nedın ser tû'yan. Lewra lı ew salan de tû û hêrmi ji bona Kurdistan her gıring û hêja bûn. Gel tû ji bona zıvıstanê hışk dıkırın, lı dema zıvıstanê de ji dıxwarın. Bı tû'yan bastıq çêdıkırın, qure û şerbet çêdıkırın û hwd.

Disa zarokên gund êvar-êvar bervı naxıra pêz û dêwêr dıçûn, kehran sıwar dibûn, kehr dıkırın lecê. Carna Ali ê kurê Xıdê ji dıxwast ku kehrê sıwar be; lê Xıdê ew destûr nedıda Ali, icar Ali dıkır qırin û gazin, lı ber bavê xwe dıgeriya, ku bavê wi destûrê bıde wi, ew ji lı kehreki sıwar bıbe. Jı bona ew Xıdê carna destûr dıda Ali û Ali lı kehrê sıwar dibû. Rojeki disa Ali kehrê sıwar bû û lı tev zarokên gund kehr kıre leca revê. Lê lı nêzıka kevırê "Çatman" de, Ali lı ser kehrê de ket, joni-moniyên wi lı nav xwinê de man, bı rojan Ali jana wan birinan kışand. Ali ê belengaz ji dıxwast, ku ew ji mina zarokên dın bıke, lê ew seqetiya wi, ew destûr nedıda Ali ê belengaz. Jı bona ew ji, bıjuya

Ali dıçû zarokên dın, carna ji lı hevalên xwe dexesi dıkır, berxwe dıket.

Artêşa hukma Tırk Xidê piçûk her pêrişan kırıbû. Zıvistan hewa sar, lı ser berfê, lı bın ba û bahozê de Xidê belengaz û reben fêre hindariya leşkeri dıbû. Lı ser newq a Xidê de rext û lı tev gelek fişengan girêdayi û lı ser milê Xidê de tıfing, Xidê reben nedıkarıbû ku, lı binê ew bari de bimeşe. Xid lı nav deste'ek -manga- leşker de, leşkereki heri kın, jar û sixım -çelimsız- bû. Lı bili ew rewşa wi, rebenê Xwedê qet peyvek zımanê Tırki ji nedızanıbû. Lı hindariya leşkeri de, çawiş û serdeste -onbaşı- an ji serbaz çı digotın, çı ferman dıdan, Xidê reben, Xid tenedıgihışt, fêm nedıkır. Sibê de heya êvari lı hevalên xwe dınhêriya; wan çito tevger dıkırın, Xidê ji dıxwast ku lı gor wan tevger bıke, balam ew ji bona Xidê her zor bû. Jı ber ku Xid zarok bû, nedıkarıbû ku hemû fermanan bine cih, bı tırsan şaş dıkır, lı meşan de şuva dıma, nedıkarıbû ku lı bın barê giran de bimeşe. Çawiş û serdeste digotın "rast" Xidê belengaz rast û çep çıye nedızanıbû. Lı fermana rast de, wi gava çep dıavit, a çep de ji rast. Lı fermana "raze" de ji, Xid disa dereng dıma. Jı ber ku fêm nedıkır, lı hevalên pêş xwe dınhêriya, dûra xwe dıavit ser erdê radi-ziya. Her roj lı berbanga sibê de, heya seat şeş-heftê êvarê, karê leşkeran hemû" rabe, rûne, bimeş, raze, tıfingê bavêje ser mil, tıfingê dayne, lı dara sılavê de bısekın, xwe amade bıke" û hwd bûn. Xêncı ewana disa nobet gırtın, lı aşpêjxanê de feroq şoştın û paqıjkırına der û dorên leşkergehan û avdestxanan û gelek karên dın. Lê Xidê belengaz çucaran nedıkarıbû ku, mina xorteki normal hemû fermanan bine cih, nedıkarıbû lı bın barê giran de rabe, raze, bıbeze, lez bıke. Jı bona ew çawiş, serdeste û serbazên har û hov Xidê çardeh salni dıdan ber şımaqan,

kulman, lı ser erdê de radıxıstın dıdan ber pinan, ser û çavên Xıdê reben lı nav xwına sor de dıhiştın. Jı diya Xıdê ra, bav û heft sed kalıkên Xıdê ra kıfri û çêr dıkırın. Ango çı dıhat bira wan xwinxwaran, jı Xıdê ra dıgotın û têra dilên xwe Xıdê zarok dıkutan û bı wi kêfa xwe dıanin. Werqas Xıdê kutan ku, lı zıkê du mehan de, perda guhên Xıdê reben teqandın û Xıdê şandın nexwaşxanê. Xıdê reben bı mehan lı nexwaşxanê de ma, dûra Xıdê disa şuva şandın zırpa wi. Balam Xıdê dıtepinax-duygu-xwe a guhan wendakırıbû, bûbû zarokeki guhê kerr. Lê disa jı hukma xwinxwar Xıdê lı leşkeriyê de berneda, Xıdê dıkır ber kar û berên qurêj û gıran, bı zorê zamanê Tırki lı Xıdê dıda fêrkırın.

Lı gundê de, navbera Xıdê naxırvan û gundiyan roj bı roj xırab dıbû. Seyid Weli êdî nedıxwast ku Xıdê lı xaniyê wi de bısekıne û ciwar be. Jı bona ew jı, Xıdê ketıbû nav tengasiyek mezın. Lı demek werge de, yekser nexwaşiyek kete nav neferên malbata Hemê Ali. Lı zıkê meheki de heft neferên malbata Hemê Ali û Hemê Ali hemû mırın û bûka Hemê Ali, Pırımı û du kurê wê'êm piçûk tenê man. Pırımı jı keçıkek eşıra Bamasûr bû. Malbatê wê lı gundê Kırzi'yê de ciwar dıbûn, leqeba ew malbatê Pırımı bû, jı bona ew jı, jı bûka Hemê Ali, jına Ali ra "Pırımı" dıgotın. Lê gundiyan navê ew jınıka jı nedızaniyan, her kesi jı wêra werge dıgotın, bang dıkırın. Ew bûka belengaz lı ciwantiya xwe de bı mabû. Kesek lı ba wê nemabû, ku jı wêra bıbe sıtar. Kurên wê Xıdır û Kek jı, sêwi û pêrişan mabûn. Lı demek werge de, Pırımı pêşneyar kırdı, ku Xıdê naxırvan bıçe lı çavıyek xaniyê wê de ciwar bıbe û lı wan sêwiyên wêra bıbe arıkar. Lı ser ew pêşneyara Pırımı Xıdê naxırvan dest lı naxırvaniya dewar û pêz berda, lı xaniyê Seyid Weli de derket û çû lı goma Hemê Ali de,

ligel bûka wi Pirimi de ciwar bû. Lı pey ew rojê de Xîdê edi karê xwe guhêrand, icar destpêka parsevaniyê kır. Xîdê edi her roj lı berbanga sibê de radîbû, çal û werisê xwe dıgirt û diket riya gundan û aşan. Bı taybeti dıçû gundê Şilkê, aşê mala Zayim û Cıwê Horê, lê wê ji dadıgeriya Dawaliyê û Çetê; dıçû aşê mala Bego, bervı gund dıhat dıçû aşê mala Bay Dunya û dadıgeriya Moxındi û Şowagê, lı tariya şevan de xwe dıgıhand mal. Wexta çandiniyê de ji, Xîd dıçû lı hın kesan ra das dıçınıya, gurzên genım û ceh dıgirt û dıani mal, Xeca belengaz ji bı ew çav koriya xwe va ew gurzana bı şûnik û têpûç va dıkutan, bı bêjıngê va ji ber ba dıkır û tene û ka lı hev cûda dıkır, karê xwe dıqedand. Lı dema çılo birinê de ji, disa Xîd dıçû lı hın kesan ra arikari dıkır, êvar-êvar pıştıyek çılo ê xwe dıani lı paş xêni de lod dıkır û alifê heywanên xwe, ên zıvıstanê amade dıkır.

Lı ew salê de lı gundê Şilkê de ji dıbıstana Tırk vebûbû, zarokên Kûpıkiyan ji dıçûn dıbıstana gundê Şilkê. Lê herdu kurên xîdê naxırvan, Hesen û Ali nedıçûn dıbıstanê. Seyidan nedıxwastın ku Xîd zarokên xwe bışıne dıbıstanê. Wexta ku cenderme dıhatın gund û zarokên Xîdê pırsdıkırın, Serbexo ê gund û hemû gundiyan dıgotın" zarokên Xîdê seqetın lewma naçın dıbıstanê" derew dıkırın. Armanca wan ew bû ku, Hesen û Ali her roj, jı bona zık têriyê bıçın ber kar û berxên wan. Her çıqas ku Serbexo ê gund hatıbû guhartın, Memed Ali ê Ezimê bûbû Serbexo ê gund ji, lê disa ji, jı bona Xîdê û zarokên Xîdê tışteq nehatıbû guhartın. Pırr caran Hesen û Ali ê seqet nedıxwastın ku bıçın ber kar û berxên seyidan, ber dewar û pezên wan. Lê wexta ku wan şık dıbırın ser ew rewşê, icar Hesen û Ali dıdan ber şımaqaqan bı qenci ew dıkutan. Bı taybeti zarokên seyidan teda'ên mezın dıanin serê zarokên Xîdê. Carna Xîdê tewat nedıkıır, pıšta zarokên xwe dıgirt, dıgot" jı Xwedê bıtırsın, hûn jı van rebenên mın çı dıxwazın? Çıra evqas van zarokên mın dıkutın?" İcar lı Xîdê

belengaz dıxıstın. Lı ew demê de Apê Seyid ji tunebû, ku piştgiriya Xidê bigire. Ew ji miriyabû, çûbû gihîştibû rama Xwedê, lı dest kurên wı de ji qet tıştekek tunebû. Ango lı du mirina Bay Seyid de, Xid û zarokên Xidê bûbûn xulam û berdestên gundiyeên Kûpikê. Sedem ji, êdi Xidê nedıxwast ku mina beri jı wanra bibe qûl û noker, nedıxwast ku biçe ber pez û dewaran, bibe naxırvan. Lê seyidan dıxwastın ku Xid heya roja mırinê bibe şıvanê pez û dewarên wan, balam êdi ew ne keys bû, lewra Xidê riya xwe guhartibû.

Lı nav çûyina Xidê piçûk de neh-deh mehe derbaz bûbûn, qet nûçek lı aliya Xidê piçûk de tunebû. Jı bona ew ji Xidê bav û Xeca belengaz bêtır bûbûn pepûg digiriyan, berxwe dıketın, hesreta Xidê piçûk dıkişandın, xem dıkirın, dıgotın" gelo hukma Tırk çı ani serê kurê me?". Rojên Xidê lı nav xem û kulan de derbaz dıbûn. Disa wext dema çılo birinê bû. Xid her roj jı maleki ra dıçû çılo birinê. Derdıket ser daran gazi Xwedê dıkir û jı bona kurê xwe dılorand. Hınêk gundi ji çûbûn Mêzgirê jı bona dayin standınê. Lı ew rojê de hisek bı taybeti ketıbû dilê Xidê, nedızanıbû ku çı bıke. Lı destpêka êvarê de karê çılo birinê berda, piştıyê çılo pişt kır û dageriya mal ku piçeki raweste vêsa xwe bigire, lı ew demê de Bayê Apê İsmêil lı pêş derê xwe de gazi Xidê kır û jı Xidê ra:

- Xıdo ez lı te mızginek bı taybeti dıxwazım, jı ber ku mın jı tera nûçe'ek bı xêr aniye got û dengê xwe bırand. Lı ser ew gotınên Bayê Apê İsmail de, icar Xidê:

- Xêre Sey Bayê? Gelo çı mızgine? Ez dıxwazım zanıbm, got.

- Nûçek mın a bı xêr jı tera heye, kuro tu jı mınra bıbêje, tu çı bıdı mın? Tu çı dıdı mın jı mınra bıbêje, ez jı, jı tera ev nûçe a bı xêr bıbêjım, got.

- Sey Bayê bı kerema xwe jı mınra bıbêje ew nûçe a xwe a bı xêr, mın lı nav xemê de mehêline, tu çı dıxwazi bıla canê te sax be, çikê mın ku heye, wê ez bıdım te; sonda mın Xızır û Bamasûr, got û Xıd lı benda bersiva Bayê de ma.

Lı pey ew vêca Bayê Apê:

- Kuro mın jı tera nama kurê te Xıdê piçûk ani. Ez iro çûbûm Mézgirê, ku çend metro pirtû-mirtû jı zarokan ra bıkirım. Çawa ku tu jı dızani, em hemû dayın û standına xwe her sal lı fırotgeha Şerif efendi de dıkın. İro jı disa ez çûm fırotgeha Şerif efendi, mın tışt- mışt kırıya, dûra Şerif efendi nama kurê te Xıdê piçûk da mın, ku ez jı, jı xwera bınim bıdıme te. Şerif efendi jı tera sılav dıkır, got û lı benda Xıdê de ma, ku Xıd bıçe nama kurê xwe lı wi bıstine.

Xıdê çawa ku ew nûça bıhist, bı rev û bez bazda û xwe gıhand pêş derê Bayê Apê İsmêil, çû destê Bayê Apê maçkır, name lı dest Bayê Apê de gırt, jı wıra spas kır, yekser berê xwe da aliya mala kirivê xwe Bay Seyid. Lewra kurê Bayê Seyid ê piçûk Bırê, destpêka dibistanê kırıbû, dıçû Moxındiyê dıxwend. Bırê, êdi Tırki jı fêr bûbû, dıxwend û dınıvisand. Lı zıkê çend hûrdeman de Xıdê xwe gıhand pêş derê mala Bayê Seyid, deri kuta û kete hındır, mızgin da hemû neferên mala kirivê xwe û name dirêje Bırê kır, ku ew jı Xıdê ra zû bıxwine. Bırê jı name gırt, vekır û hêdi-hêdi destpêka xwendınê kır û qasa zanina xwe name jı Xıdê ra wergerand Kurdi. Xıdê piçûk lı nama xwe de usa dıgot û rewşa xwe usa dıda xuyakırın:

- Bavo beri her tışt ez jı tera û xaltiya xwera, Hesen û Ali ra sılavê xwe'ên dilgermi rêdıkım, tême dest û lingên te û xaltiya xwe maçdıkım, çavên Hesen û Ali ra dıramısım. Jı hemû gundiyan ra sılavên mın bıbêje. Tême destên hemû gundiyan maçdıkım. Jı bona mın dıvê hûn xem nekın, rewşa mın başe, ne xırabe. Lı destpêkê de ez piçeki nexwaş ketım, nêzıka çar- pênc mehan lı nexwaşxanê de

mam, balam dûra qenc bûm. Nexwaşiya mın ji guhên mın bûn; guhên mın diêşyan, lê Xwedê şıkır naha ez başım. Mın êdi Tırki ji hinkiriye. İro şuva êdi ez te bêt name û nûçe nahêlinım. Lewra ez êdi bı zumanê Tırki dıxwinım û dıwısınım. Bı taybeti jı neferên mala kirivê mınra sılavên mın hene, destên wanra dıramısım. Lı gund de çı heye, çı tune ye bı kerema xwe jı mınra bıwısının. Navnişana mın ev e.... de bıminın nav xwaşiyê. Kurê te Xıdır.

Belê, Xidê piçûk qet qal û behsa kiretên çawiş, serdeste û serbazên Tirk nedikir. Ne dıgot ku wana çı anine serê wi. Lewra hemû nameyên leşkeran lı aliya serbazan de dıhatın xwendın. Qet keseki nedıkarıbû ku rexneyê dewleta Romê, çawiş, serdeste û serbazên artêşa Romê bıke, tışteki veşarti û dızı jı malbata xwera bıwısine. Lı ew şıkli va her du-sê mehan de carê Xidê piçûk jı bavê xwera name dıwısındın, bav, bıra û xaltiya xwe dılşa dıkir. Wi çucaran ew rewşa xwe a xırab jı bavê xwera nedıwısınd. Lê sed mıxabın ku, êdi ew bûbû Xıdeki guh kerr. Hemû leşkeran ji, jı vira" kerro" dıgotın, lı Xidê tınazên xwe dıkırdın. Bı ew rengi va Xidê belengaz jı dewleta xwinxwar ra çar sal leşkeri kır û dûra teskera xwe gırt û dageriya mal, gihişt bav, dayik û bırayên xwe, kete nav qom û qebilên xwe, lı dest artêşa Romê de felat bû, lê disa jı rewşa Xidê piçûk ne rewş bû. Erê bejn avıtıbû û geleki jı dirêj bûbû, balam reng lı rûyê Xidê de nemabû. Xıd bûbû xorteki jar, reng zer, te dıgot Xıd lı nexwaşiya "Sil" -verem- ketiye. Ew rewşa Xidê piçûk, jı Xidê bav ra û jı hemû neferên malê ra dıbû xem, hemû berxwe dıketın. Lı mal de gazi Xidê dıkırdın, lê Xidê belengaz bı qenci nedıbıhist. Ew rewşa jı Xidê bav û Xec, Hesen û Ali ra dıbû kul û derd. Gundi dıçûn xêr hatına Xidê piçûk, rewş û dema wi dıpirsiyan, lê Xidê bı qenci dengê ew gundiye xwe nedıbıhist. Jı bona ew jı zef berxwe dıket û bı dılda dıgiriya, şermezar dıbû. Carna jı dewleta Romê ra dıqeheriya, jı gundiyan ra serpehatiyên xwe dıaxıft. Romê çı anıbûn

serê Xîdê û serê kesên dîn, Xîdê ew hemû yek bî yek jî der û cinaran ra dıgot û dıpeyiviya. Xîdê piçûk tenê pesna serbazeki dıkir, dıgot" ew serbaza jî mina xalê mın Aliekber mamoste bû, balam ew mamoste ê dıbistana bılind bû. Ew jî hatıbû leşkeriya xwe dıkir. Ew bî xwe jî Kurdeki bajarê Toqatê bû. Wi kesi gelek qenci lı mın kır, ez qenciya wi mırovê qedır bılind birnakım".

Rewşa Xîdê a tendurusti roj bî roj bervı bediyê dıçû. Xîdê belengaz her roj nexwaş lı nav nivinê de bû. Lı aliki ew nexwaşiyê Xîd xemgin dıkir, berxwe dıxıst, lı aliya dın de jî, seyidan teda lı Hesên û Ali dıkirın, ku ew bıçın berkar û berxên wan. Ew zordari jî lı Xîdê zor dıhat û bêtır berxwe dıket. Carna jı bavê xwera dıgot" Apo divê êdi em lı ev gundi de derkevın, bıçın gund û bajareki dın. Ez naxwazım kesek êdi lı mın û bırayên mın zorê bıke. Karên usa mın dıxeyidine, bêtır mın nexwaş dıxine. Tu rewşa mın bı çavên xwe va dıbini, ez nexwaşım, tu jı êdi kal bûyi. Em nıkarıbın usa bıbın xulam û teda lı me bıbe. Em nıkarıbın jı gundeki ra şer bıkın. Lı destpêkê de ev gundiyan qedra me gırtın, lı me qenci kırın, balam iro jı ez dıbinım hemû hatine guhartın. Bı qenci têtê kıfşê ku, vana lı destpêkê de, jı bona berjewendiyên xwe, jı mera tışteki negotın. Lê wexta ku te dest lı şıvantiya van kışand, icar ew kesên qenc û xêrxwaz, weka "gula berbı roj" rûyê xwe lı te guhartın û bûn dıji te û neferên mala te. Eva êdi tışteki berbı çavê Apo. Na Xwedê neke, êdi ez naxwazım lı ev gundi de bısekinım".

Xîdê piçûk jı bona mal barkırınê her roj jı bavê xwera şer dıkir. Xîdê mezın jı lı ber kurê xwe dıgeriya, ku ew ewqas berxwe nekeve, xwe dılxemgin neke. Dıgot" başe layê mın, piçeki aram bıke, em bınhêrın dawı çawa dıbe; xem meke Xwedê mezine, ew jı mera jı deriyeki veke". Xîdê piçûk jı bavê xwe guhdar dıkir û bédeng dıma, balam lı dilê xwe de jı bavê ra dıqeheriya. Jı ber ku Xîdê bav her tım Xwedê dıkir nav şol û gelşan, dıgot" Xwedê

mezine û Xwedê mezine" qet tışteki dın nedıgot. Xıdê piçûk ji lı zıkê xwe de" ma kê ditiye ku Xwedê mezine, yan ji piçûke? Xwedê her tım ligel bêbextan û neheqan de cih gırtiye. ew qet rewşa hejar û belengazan napırse. Lı gor gotına bavê mın, bı rasti, ku ew ewqas mezin û xudan ram bana, wê ew bıhatana hawara mın û kesên mina mın. Ew bıbana arikarê hejar û belengazên ev cihan. Hukma Romê ez kırım kerr, ez kırım ev rewşê, ez lı mırınê fıltiyam, mın diltepina guhên xwe wenda kır, ez ketım ev rewşa heri xırab, lê disa ji mın ew mezıntiya Xwedê nedit. Mala ew Xwedê bışewite, hukma Romê lı Qoçkiri, lı tevkuştına Şêx Said, tevkuştına çiyayê Agır û tevkuştına Dêrsım de, bı sed hezaran zar û zêç, pır û kal, mêr û xort, keç, jin û bûk kuşt, xwin rijand, lê disa Xwedê qet ew mezıntiya xwe ji gelê Kurd ra temaşe nekır. Jı zalıman ra negot" êdi bese evana ji qûlên mının". Mala bavê mın ava be, ev qal û behsa çı mezıntiya Xwedê dıke. Ma Xwedê ji bûbû dijminê ew zarokên ku lı zıkên dayikên xwe de bûn? Ma wan zar û zêçan çı kırıbûn û çı guneyên wan hebû? Na êdi baweriya mın qet lı mezıntiya çu tışteki ji nay. Lê ez çı bıkın, bavê mine, usa bawer dıke; ez nıkarıbım ji bavê xwera bıbêjum" dev ji baweriyên usa berde, êdi bese". Ez naxwazım dilê bavê xwe ji bıêşınım".

Xıdê piçûk lı piştı dagerına leşkeri de bûbû xorteki her bıaqıl, maqûl û xwaşmêr. Bı çaveki erêni va lı bûyer û meselan dınhêriya, balam keseki ew fêm nedıkır. Nexwaşıya Xıdê ji, Xıd jar û sıst dıkır. Xıdê belengaz her roj lı nav nivinê de bû, nedıkarıbû ku, rabe lı ser lıngan bımeşe. Lı guhên Xıdê de her tım ava zer û nê m dıhat. - Wexta ku ew ava zer û nê m lı guhên Xıdê de derdiketım, bıhnek nebaş lı nav malê de belav dıbû, mırov nedıkarıbû ku ligel Xıdê de bısekıne, an ji piçeki rûne. Jı bona ew

rewşa Xidê piçûk, her roj gundiyeke aqilek dıda Xidê mezin, ango Xidê bav. Dıgotın" Xıdo kurê xwe bibe ser ziyaretan". İcar Xidê guhdare ew kesi dıkir, kurê xwe dibır ser ziyaretan. Dıgotın" Xıdo bıçe jı kurê xwera lı pirtûkê bınhêre, berbejn çêbıke" Xıd disa dıçû gundê Şowagê lı ba Keki Dede û Rıza ê Mamûd ê Beyteş, jı kurê xwera lı pirtûkê dınhêriya, berbejn didan çêkırın, lê qet maf û kêrek wan ziyaret û berbejn nedıgıhişt nexwaşıya Xidê piçûk û guhên wi. Rojeki Kekê kurê Rıza ê Kort Reşê, jı Xidê bav ra:

- Xıdo jı bona ev nexwaşıya kurê te goştê mışk pêwiste. Dıvê tu goştê mışk bıdi kurê xwe. Bı ceddê mın Bamasûr, wê kurê te zû qenc bibe. Nexwaşıyek mırrdar lı ser kurê tedaye. Lı bedena kurê teda, nexwaşıyek mırrdar heye. Bav û kalanên me çı gotine, ma tu dızani? Gotine ku " Mırrdariyê ra, mırrdari pêwiste". Çıto ku dibêjn" Hesın, hesın dibıre" Mırrdari jı mırrdariyê dibıre. Ev gotınana û ev tıştana rastın, ez bı xwe jı bawer dıkım. Tu ku guhdar mın dıki, rojeki zû ev gotınên mın bine cih û goştê mışk bıde kurê xwe, ku rojeki bı zû kurê te qenc bibe, ev nexwaşıya mırrdar lı kurê te dúrkeve, got û ew pêşneyara tınazi lı Xidê daxwaz kır.

Lı pey ew pêşneyara bı tınazi de, Xidê bav bı kúrahi hênjiya û baweriya xwe lı ew pêşneyarê ani. Lı gotınên Kekê Rıza bawer kır. Balam Xidê bı xwe bı xwera dıgot, gelo ez goştê mışk lı ku bınım? Çıto bıkim ku lı kurê xwe bıdım xwarın?. Lı pişti du rojan de,ıcar Xıd rabû çû mala Ana Senem û ew pêşneyara Kekê Rıza jı Ana Senem ra dengkır. Lı destpêkê de Ana Senem qet manek neda ew pêşneyara nebaş, balam lı dawiyê de jı Xidê ra:

- Lı ev de tışteki tune Xıdo, çêtire tu bıcêribını. Bibe ku Kekê Rıza jı tera tışteki rast gotiye. Lewra ew pırr dıgere. Kesên pırr gerok jı pırr tıştan dızanın. Mırov çıqas ku dırêj bıji jı, qasa kesên pırr gerok tıştan nızane. Jı ber ku kesên gerok pırr tıştan dibının. Lı her dereki de fêre tış-

teki dıbin, tışteki dıbinın. Kesên zana ra radıbin, rûdının, lı wan gelek tıştan dıstinın. Jı bona ev ji, tu guhdar Kekê bıke, goştê mişk bı dızika lı kurê xwe bıde xwarın, bı a Xwedê kurê te qenc dıbe, got.

Lı dû ew axaftına Ana Senem de, icar Xidê naxırvan lı Ana Senem pırs kır û got:

- Ana ez bı gori, ma ez mişk lı ku binım? Ew kambaxa werge bı hêsayi naye pêgirtın. Tenê pısık dıkarıbe pê mişk bıgire, balam pısık ji, dıgire û dıxwe. Çêtire tu ew dafıka mişkan bıdı mın, ez bı dafıkê bıçêrıbinım. Hatına mın a vır ji, jı bona dafıkê bû. Ez dafıkê bı dızıyê Xidê lı dereki de daynım, ku mişkek kete dafıkê, ez ew mişk serjêbıkım û goştê ew mırrdari bıpêjum, mina goştê pêz bıdım Xidê xwe, bınhêrım Rebê Alemê çı dıke û çı tıne serê kurê mın. Ez dıbêjum, ez mişk serjêbıkım, lê çawa? Lewra ikra mın tê; naha va fırsıka mın lı nav hev dıkeve. Dûra ez çıto destên xwe bıdım canê ew mırrdari?"

Lı pey ew pırs û gotınên Xidê de, icar Ana Senem:

- Tıştek nabe Xıdo-Xıdo, tıştek nabe. Lı ew demê de çavên xwe dade, mişk lı xwe bırbıke. Jı bona tendurustiya kurê xwe dıvê tu ev kari bıki. Ev jıyane Xıdo. Ku tışteki usa hat serê mırov, dıvê mırov hemû dijwariyan bıçşine. Xwedê tala derd ji daye, derman ji. Bıbe ku dermanê nexwaşıya kurê te ji goştê mişk be, got û rabû çû dafıka mişkan ani da Xidê û Xıd rabû serxwe. Lı ew demê de disa Xidê jı Ana Senem pırsiya, got:

- Ma Ana ez çıto destên xwe bıdım bedena ew mırrdari. Bı rasti ev tışta serê mın mıjûl dıke, ez nızanım ku çı bıkıım.

- Xıdo bı kerema xwe tıştên usa meyne bıra xwe. Beri her tışt dıvê tu ev kari bıni cih. Te ku hemû karê xwe ani şûnê, mişk serjêkır û goştê mişk ku te lı Xidê pıçûk da xwarın, lı pıştı ew tu were ba mın Lı ew demê de ez sawûnê bıdım te, tu destên xwe bı qenci bışoy; pışt ra ji, ez çıl kevçi av lı ser destên teda bıhêjmırım û tu bı ew çıl kevçi

av va destên xwe carek dın dubar bıki û bışoy, sılaweta xwe lı Xwedê bini, her tışt dıqede dıçe; ew gemari lı ser destên teda namine. Naha te ez fêm kırım? De mesekın dafıkê bıgıre û bıçe mal. Lê bala te, lı ser karê te û kurê te be. Xêncı te û Xecê ji, kesek nezane. Qet kesekira ji qal û behsa ev tışti meke, qet kesek hayji ev karê te nebe, te got erê, Xıdo? got Ana Senem û ew şıret û pêsneyarana ji Xıdê ra gotın.

Xıdê naxırvan dafıka mışkan gırt û bı lez derket der çû mal. Bı dızika pariyek nan û piçek toraq kırê ser singê dafıkê û dafık gırt bır lı paş pêtega ardan de vêşart. Roj-tıra dın lı berbanga sıbê de, lı nav nivına xwe de rabû çû lı paş pêtegê, lı dafıka mışkan mêzekır, dıt ku ewe mışkek ketıye dafıkê, xenıqiye. Xıdê bı zor bela çavên xwe gırt û mışk lı dafıkê de derxıst, bır lı axur de serjêkır, çermê mışk gura, lê kezew û pişıka Xıdê jan dıda, fırsıka Xıdê radıbû xwe dıda ber xırıka Xıdê, ikra Xıdê dıhat û Xıd verdışıya. Bı ew rewşê va, Xıdê lı zıkê çend hûrdeman de karê xwe qedand. Goştê mışk bır da ser tenikeki û ew tenika ji bır da ser ağır, ew goştê mışk bı qenci pat û lı şûna taşte a sıbê bır da ber kurê xwe û lı kurê xwe da xwarın. Dûra rabû çû mala Ana Senem; sawûn gırt û yekser çû ber çirtıka avê bı qenci destên xwe şoşt, dûra gazi Ana Senem kır, ku Ana Senem bıçe bı kevçi avê lı destê wi ke. Lı ser gazıkırına Xıdê Ana Senem ji kevçiyek gırt û çû ba Xıdê; çıl kevçi av lı ser destê Xıdê de hêjmart, dıwa kır; Xıdê ji sılaweta xwe lı Xwedê ani û karê xwe qedand û lı ew mırرداریê felat bû.

Belê, gel mışk heywaneki heri pis û heri gemarin dıhesıband û dıdıt. Jı bona ew ji qet keseki destên xwe nedıda mışk. Ew baweriyek bı taybeti bû lı nav Kurdên Dêrsım de. Lı gor ew baweriyê, destên kê ku lı mışk ket, dıviyabû ku ew kesa çıl kevçi av lı destên xwe ke, destên xwe bı qenci bışoy, ku lı ew mırرداریê felat bıbe, ew mırرداری lı ser bedana wi kesi de nemine.

Lı nav daxwarıniya goştê mişk de çendek derbaz bû, lê rewşa Xîdê piçûk qet nehat guhartın. Disa êş, disa jan, disa nê m û ew ava zer lı guhên Xîdê de dihat, rewşa nexwaşiyê berdewam bû. Xîdê bav disa dıgiriya û berxwe diket. Lı nav rewşek werge de, rojeki kurê Seyid Apikê, Seyid Abas pêşneyarek dın ani û jı Xîdê ra:

- Xîdo, tu ku guhdar mın diki, careki ji gûyê kûçik bicêribine, gûyê kûçik lı lawê xwe bide xwarın. Lewra dibêjin, ew ji mırرداریye, jı nexwaşiyên mırddar ra dermane, tu ku qenciya kurê xwe dixwazi, divê tu ev ji bicêribini, got û lı benda bersiva Xîdê de ma. Jı bona ew gotın û pêşneyarê, icar Xîdê pırsiya, got:

- Bayê Seyid Abas, gelo ez gûyê kûçik lı ku binum û bıdım kurê xwe? Ango ez çito bıkim? Havıla ev kari çıye gelo?

- Kuro lı her derê de gûyê kûçikan heye. Tu piçek gûyê kûçikan, ê hişk bıgire bıbe mal, bıka nav piçek toraq, lı nav hev xine, dûra ji bıke nav pariyek nan, bıke mina topa nanê toraqê bide kurê xwe bıla ew bıxwe, ev kar ewqas ji, jı tera dijwar nine, bese ku tu bıxwazi. Gor baweriya mın havıl ji ev e, got Seyid Abas.

Lı pişti ew pêşneyarê, icar Xîdê naxırvan çu piçek gûyê kûçik lı bin diwarê mala Alê Memê de girt, bır mal, disa bı dızıyan ew gûyê kûçik kire nav mistek toraq lı nav hev xıst, dûra kire nav perçek nanê germ û bı qenci gıvışt kire topek û bır da kurê xwe Xîdê piçûk û jı kurê xwera usa got:

- Kurê mın, ew tewerike mın kırıye nav toraqê, divê tu bıxwi û qenc bıbi. Ev tewerık Bayê Seyid Abas da mın, ku ez ji bıdume te. Ez hêvi dikım ev tewerık jı tera dıbe derman.

Xîdê naxırvan bı ew pêşneyarên nebaş va, goştê mişk û gûyê kûçikan ji lı kurê xwe da xwarın, lê disa ji tışteq nehat guhartın, dilpekina guhan şuva nehat. Guhên Xîdê piçûk roj bı roj bervı bediyê dıçûn. Xîdê reben deng pırr

giran dibîhistin. Jî bona ew ji, êdi jî Xîdê ra "Xîdê Kerr" dîgotin. Bî taybeti zarokên hûr bî nezaniyên xwe va, tînazên xwe lî Xîdê dîkîrîn" kerro-kerro" dîgotin, lî Xîdê dîkeniyan. Ew rewş jî lî Xîdê zor dîhat, Xîd ber xwe dîket.



Xîdê piçûk nêzîka du salan ew rewş û ew nexwaşiya kîşand. Dûra hêdi-hêdi qenc bû, reng hate rûyê Xîdê, Xîdê goşt girt, tawli bû, êdi diçû ber kar û beran, diçû êzîngan, jî mala Alê Memê ra diçû das diçîniya, jî wanra arikari dîkîr. Lê gundiyan êdi xêra mala Xîdê nedîxwastin. Zarokên seyidan tade lî Hesên û Ali ê seqet dîkîrîn. Ew ji lî Xîdê piçûk zor dîhat. Seyidan jî Xîdê naxîrwan û zarokên wîra kifri dîkîrîn, peyvên nebaş jî Xîdê û zarokên xîdê ra dîgotin. Lê Xîdê naxîrwan û zarokên wî bersîva kifri û çêran venedîgerandin seyidan û zarokên wan. Jî ber ku ew jî bona kesên ne Seyid qedexê bû, gunê bû. Navbera Seyid û Xwedê de ewqas ferq tune bû. Te ha Xwedê ra kifri kirîne, ha jî seyidan ra, eynî werge dîhat hesîbandîn. Erê Xîdê di lî xaniyê mala Hemê Ali de ciwar dibû, çu peywendiyên wî jî malbatên eşîra Bamasûran ra nema bû, balam disa jî wana Xîdê lî bîr fermanên xwe de dihesîbandîn. Xîdê jî xwera mîna nokereki dîdîtîn. Ew rewş jî lî Xîdê piçûk xwaş nedîhat " mîrov nabe nokerê mîrov " dîgot û jî bavê xwera şer dîkîr, ku rojeki zû lî gundê Kûpîkê de derkevîn û biçîn Mêzgirê, an jî Xarpitê. Lê Xîdê bav her tîm dîgot " kurê mîn sebr bike, bihna xwe teng meke, xwe meqehêrîne, Xwedê mezîne, wê ew jî mera jî rojeki were ramê, wê ew ev rewşa me jî rojeki bîbine, ew me jî, lî ev hejariyê de derxîne, me jî felat bike. Jî bona ew gotîna û bawerîya Xîdê mezîna, îcar Xîdê piçûk disa hêrs dîket, bihteng dibû, dîgot " Apo ez lî te tîka dîkîm, jî mînra usa meaxîfe. Ez jî tera çî dibêjîm, tu çî bersivê dîdî mîna. Bî kerema xwe

ev felsê berde, biterikine. Ev çiyê tu jî minra her tum dibêji " xem meke, berxwe mekeve, Xwedê mezine " nizam çiyê û çiyê. Ez tîka xwe dubar dikim Apo, ev gotinên te êdî besin, zîkê min li ev gotinan êdî tîjî û têr bûye. Naha ez li te pîrs dikim, bî kerema xwe bersiva min bide; te çî wext Xwedê dit, ku Xwedê mezine, yan jî piçûke? Lê ku, li gor gotinên te bana, dîvîyabû ku, Xwedê jî mera zûva arikari bikirana, ew mezintiya xwe li me bîdana temaşekirin û ew mêlag-ispas-bikirana. Na Apo na, ew Xwedê yê ku tu dibêji, ew yar û hevalê dewlemendane, yarê hejar û belengazên mina me nine. Wi her tum ligel zordest û xwinxwaran de cih girtiye; ligel zilmkar û sitemkaran de bîngêhê xwe daniye. Ew Xwedê ê ku tu minra dibêji, wi ew hemû xwinxwar û sitemkarên ev cihan afirandine. Wi ew li ser serê meda kirine şûrê Demokles. Ez bawer nakim Xwedê jî hebe. Dewlemendan jî bona hejaran Xwedê afirandine. Wana jî mera pirtûk nivisandine; wana ev bawerîya te kirinê mêjoên me. Bînhêre li diroka Olan. Tu qet kesekî wek xwe hejar nabini, ku ew bûye pêxamber. Bine ber çavên xwe, li Mûsa, li Dawûd, li Îsa, li Mihamed bînhêre, ewana kijan kurê hejarekî mina tene? Ew hemû jî kurê delemendan, serokên eşîr û qebilanin. Dewlemendan jî bona me Ol û pêxamber li nav xwe de derxistine, ku em baweriyê xwe'yên manewî li wan binin, jî wanra tîşteki nebêjin, jî wanra bîbîn qûl, bîbîn xulam û noker. Wana jî bona me ev seyidî û şêxî û hezar cûre dek û dolav afirandine. Wana çîra axîret, dojev û bîhişt afirandine? Jî bona maf û berjewendiyên xwe. Çî gotine? Gotine ku, heke ku tu li ev cihanê de bediyekî bîki, bêt guman tu li axretê de, ew cihana rast de, tu li sitîla qetranê de werî kelendî, li agirê dojev ê de jî werî şewitandî, felan û bêvan. Tu jî her kesê neheq ra dibêji" min ew sparte Xwedê kirîye, min doza xwe radeste Xwedê kirîye, Xwedê li axretê de li doza min xwedî derkeve, ceza wî, wan bide, wî, wan li agirê dojev ê de bîşewitîne, li sitîla

qetranê de bikeline". Na Apo êdi baweriya min qet li ev tîştan usa nay. Xwedê tenê yarê zilmkarên ev cihan, yarê dewleta Tirk, yarê axa, mir, şêx û seyidên kedxware, yarê ev kesan û ew çinêye. Heke ku dewlemendan bi rasti bîzaniyana cihanek din, dojeh û bihişt heye, sitila qetran û agir heye, li ew derê de gune û sewab tên pivandin, ceza û kuştin heye, wê wana ji ev zilmên xwe nekirana, mirov nedana kuştin, kesek ji xwe ra nekirana xulam û berdest, wana ji qenci bikirana, derew nekirana, heram nexwarina, li diji şer û pevçûnan derketana, felan û bêvan. Ango min dixwast pirr tîşt bigotina, balam evqas ji tera bese, gotinê minên dawî ji tera evin Apo, ez dibêjim rojeki bi zû em li ev gundi de derkevin biçin Mêzgirê, yan ji Xarpitê. Ez li ew deran de barkêşiyê bikim ji, li ev gundi çêtire. Ez bawerim em qet hevce ê keseki ji nebin, te got erê ?".

Xidê naxirvan nedixwast ku bêtir here ser kurê xwe, bersivên gotinên kurê xwe bide. Ji lewra dizaniya ku, Xidê piçûk nûva li xwe hesiyaye, piçeki qenc bûye. Ji bona ew qet dengê xwe dernexist, xwe kerr kir û bi hêdika rabû derket der, berê xwe da Goma Karrê, mala xwişka xwe Xecê. Xidê piçûk ji hêrsa xwe rakiribû, ji bavê xwera diqeheriya. Dûra diyax nekir li şûna xwe de rabû li zikê malê de hate, çû, bi xwe bi xwera destpêka axaftinê kir û li dawiyê de, bi xişm li hindir malê de derket û berê xwe da taxa Mala Wialî, ku biçê mala Ana Senem. Ji ber ku Xidê piçûk Ana Senem zef hezdikir û girami dida Ana Senem. Ana Senem mina dayika xort û zarokên gund bû. Hemû keç, xort û zarokên gundê Kûpikê ji Ana Senem ra " Amojin " digotin. Ji ber ku Ana Senem pîndepira gund bû. Li bîli ew, Ana Senem jinek maqûl û canîkek her hêja bû. Hemû kesan qedra Ana Senem digirt. Ji ber ku wê li hember bêbextiya mêrê xwe de, mêr nekiribû, li bist û çar salina xwe de bêt mêr mabû, ji çar zarokên xwera hum dêti dikir, hum ji bavti. Ji bona ew maqûliyê bû ku, her kesi girami dida Ana Senem, qedra wê digirtin. Xidê piçûk

ji mina hemû kesan Ana Senem zef hezdıkır. Lı şevên zıvıstanan de hemû zarokên gund lı dorbera Ana Senem de komdıbûn, Ana Senem jı wanra çirok dıgotın, dibû hevalê zar û zêçan, jınıkek her dılızım, jı cinaran ra ji her dılsoz û mivanhezek gewre bû. Ana Senem xwarınên bı tam dıpatın, mirov bı tama xwarınên wê têr nedıbû. Her tıliyek Ana Senem de hunerek hebû. Bı taybeti wê sêv dıkırın nav xaliyê jı bona zıvıstanê vedıřart. Ki ku nexwař dıket, Ana Senem sêv dıda wan kesên nexwař. Jınên gund dibûn ducan, newri dıkırın, icar lı Ana Senem sêv dıxwas-tın, Ana Senem ji bêpırs sêv dıda jınên ducan. Hın kesan jı mala Ana Senem ra "Dermanxane" dıgotın. Ango Ana Senem jınıkek werge maqûl û bı esl bû. Mırov çıqas ku pesna wê canıka Kurd bıke, disa ji kême.

Lı pıřti çend hürdeman de Xidê piçûk xwe gihand pêşiya derê mala Seyid Qemer, dıt ku ewe Ana Senem lı bın siya tû'ya Tawûrê de rûniřtiye, kincên zarokên xwe dıdüre. Lı destpêkê de jına Seyid Qemer Ana Xatûn deng lı Xidê kır, rewş û dema Xidê pırsiya û dûra Xidê xwe gihand bınê tû'ya Tawûrê, ba Ana Senem. Ana Senem çawa ku Xidê piçûk dıt geleki dılřa bû. Lewra Ana Senem Xidê piçûk zef hezdıkır. Xidê piçûk çıto ku xwe gihand nik Ana Senem, çü destê Ana Senem maçkır, Ana Senem ji, jı Xidê ra "berxudarbe" got û Xidê ligel xwe de, da rûniřtan-dın, dûra rewş û dema Xidê pırskır; got" kuro tu lı kuyi, qet kesek te nabine? Guhên te çawanın? felan-bêvan, lê Xidê qet dengê Ana Senem nedıbihist, tênedıgihiřt, ku Ana Senem jı wira çı dibêje û çı pırs dıke. Jı bona ew ji, Xidê jı Ana Senem ra:

- Amojın, tu mın bıborine, ez qet dengê te nabıhısım, bı kerema xwe piçeki dengê xwe bılıd rake, ku ez dengê te bıbihısım û bersivê bıdıme te, got. Lı ser ew gotın û dax-waziya Xidê piçûk, icar Ana Senem pırs û gotınan xwe bı dengeki bılınd va dubar kır, lı Xidê pırsiya; Xidê ji, jı Ana

Senem ra spas kîr" destên tera dîramisim" got û bî kûrahiya dîl de axinek kîşand û jî Ana Senem ra:

- Ahxx Amojîn, ahxx, dewleta Tîrk, çawiş, serdeste û serbazên mal xîrab, ez kîrîm ev rewşê, ez kîrîm xudan derd û kul, lî ev cîwantiya xwe de ez bûm xorteki guh kerr, dengê mirovan nabîhisim, mirov lî mîn çî dîpîrsîn, jî mînra çî dîbêjîn ez nabîhisim, têngihêjûm. Mala dijminan bişewite, welatê me jî xwera kîrîne mêtîngêh. Kedxwarên me Kurdan jî bûne hevparên wan. Wana bî hevra em bêt perwerde û bêt zanyari, bêt rê û dirb, bêt bijîjk û nexwaşxane, bêt derman û dîbistan hiştin. Mîn lî dijmin ra çar sal leşkerî kîr, dijmin xêncî şîmaq û lêdanê tîştêk neda mîn, serda jî ez kîrîm ev rewşa xîrab, ez lî mîrînê filîtiyam. Bawer bîke Amojîn, lê ku xwendin û nîvisandînek mîna qenc hebana, mîn serpêhatiyên xwe'ên leşkerî, ev derd û kulên hejari û belengaziya me Kurdan, jî cihanê ra bînîvisandana, bîkîrana pîrtûk, bîla hemû cihanê bîxwendana, lî ser barbarîya dewleta Tîrk, faşîzaniya artêşa Tîrk de agadar û serwest bîbana. Bîla cihan lî ser zîlma hukma Tîrk de serwest bîbana. Lê ez çî bîkîm, bîla Xwedê çavên felekê kor bîke, xwendin û nîsandîna mîn tune. Mîn hêvî dîkîr ku, ez hemû derd û kulên xwe jî xalê xwe Alîekber ra bîbêjûm, bîla ew jî mînra bînîvisîne bîke pîrtûk. Lê bextê mîn ew lî mîn temaşe nekîr; nehişt ku ev daxwaziya mîn jî were cîh. Hîn kes dîbêjîn dewleta Tîrk ew jî kuştîye wenda kîriye. Hîn kes jî dîbêjîn revîyaye çûye bînê xetê. Bî kurtasi Amojîn ez bûme xorteki xudan derd, ketîme ev rewşê. Dêmariya mîn jî, ev e çend sal derbaz bûn birayê xwe Alîekber birnekîr, her roj jî bona wî dîgire, berxwe dîkeve. Qet nûçek me lî derheqa xalanên mîn de tune. Ne ew lî me pîrs dîkîn, ne jî em lî wan. Ez dîxwazûm lî zemanekî herî nêzîk de bîçûm Xarpîtê û mala xalanê xwe, bînhêrûm çî bûne û lî wan çî qewûmîyaye. Lewra dêmariya mîn pîrr xem dîke, belengaza mîn ew jî ketîye nav tariyê qenc nabîne. Ez bûm guh kerr, wê ronahiya çavên xwe

wenda kır, Ali ê piçûk seqet bû, bavê mın bı yek çaveki ma. Ango bextê mala me ji usa bû. Ez dixwazim dêmariya xwe ji, jı xwera bıbım Xarpitê, balam rebena mın nıkarıbe bımeşe. Lê ez nızanım çawa bıkim, got. Ana Senem Xidê piçûk guhdar dıkir û berxwe dıket. Lê nedıxwast ku dilkeseriya xwe û xemginiya xwe lı Xidê piçûk bıde temaşekırın. Dûra wê ji ahxek kûr kışand û bı xemgini dageriya ser Xidê piçûk, jı Xidê ra:

- Kuro lı mın bınhêre, kip pêxwe bıgire, çiya te evqas xwe berdaye nav kul û derdan, xwe xemgin diki û dıkuji? Naha guhên xwe qenc bıde ser mın û gotınên mın, ez jı tera çı dibêjum. Kurê mın tu çıra evqas berxwe dıkevi? Çıra evqas gılı û gazincên jiyana xwe û rewşa xwe a malbati diki? Ma lı ev cihan de tu tenê kerri? Ma bêtarek usa tenê hatiye serê te? Ma tenê dêmari û bavê te çav kor bûne? Ma tenê bırayê te lı ev cihan de seqet bûye? Ma te tevkuştına Dêrsım jı xwe birkır? Ew deh hezarên cangori nayên bira te? Te girtixane û wargehên Mêzgirê, ew zılma bı çiyayê Aşıl Bawa jı xwe birkır? Ma hejarti û belengazi te tenê ditiye? Ma ev rewş tenê rewşa malbata teye? Ma lı ev cihan de hûn tenê bûne naxırvan? Ma par-sevanê ev cihan tenê bavê teye? Bawer bıke kurê mın, tıştên ku me ditiye, te ew neditine. Tu piçeki nêzike mın bıbe, ku tu mın bı qenci guhdar bıki, ez jı tera çı dibêjum. dûra tu şirovekırına gotınên mın bıke. Kurê mın me gelek-gelek tışt ditın û gelek seremceme kışandın. Dıvê tu bawer bıki, carna ez naxwazım, ku wan rojên bed bınim bira xwe. Tu nızani me çı ditine, çı derd kışandine û me çı bıhistine. Ewana yek Xwedê dızane, yek jı kesên ku ew derd û kul kışandine, zılm û zor ditine û bıhistine. Lê disa jı lı Xwedê û lı ev rojê şıkır, em nemırın, hatın gıhiştın ev rojê. Ez hêvi dıkım êdi em rojên werge nebinın. İro her tışt hatiye guhartın û tête guhartın jı. Baweriya mın ewe ku, gelê me jı rojeki lı bı destan de felat bıbe. Em Kurd jı azad bıbın, ev zılm, zor û sıtemkariya dewleta Romê lı

ser me rabe. Lê ku em nebinın, wê newiyên me, ew roja evrar û piroz bîbinın. Ev jiyane kurê mın, dimeşe û dîçe. Ma Xwedê çira her tîşt bî du ali va, paş û pêş, jêr û jor afirandiye? İro dewleta Tırk û xwınxwarın mina Tırk serdestın, wê sibe ji kesên dın. Ev cihan usa çêbûye, dor bî dore. Baweriya mın ewe ku, wê roj bê lı ev cihan de sıtemkari, barbari, zılm, zor, kuştın û lêdan nemine û hemû rabın. Lı nav gelan de şer rabın, sinor û tıxûb neminın. Şûna şer û pevçûnan de aşiti cih bıgire. Lı nav cihan û jiyaneke werge de zarokên me Kurdan ji bixwinın. Lı gund û bajarên meda dibistan û zanıngêhên Kurdî ava bîbin. Newiyên me lı ew dibistan û zanıngêhên xwe de bixwinın, pêşva bıçın, şareza bîbin, nûjen bıbin, bêt perwerde û bêt zanyari neminın. Lı hêviya wan rojen de em û zarokên me bîminın, naha ez dagerım ser dıtınên xwe, jı tera hın dıtınên xwe bıbêjım. Tu qenc guh bıde ser mın, bınhêre me çı ditiye, em lı kijan gıtan de felat bûne, lı kijan merhalê de hatıne gıhıştıne kijan merhalê.

Belê Xıde mın. Heyam dawıya meha Tebaxê bû. Şerê Balkan nû qedıya bû. Hukma Romê lı Rojavê de şer wenda kırıbû. Jı bona ew ji bêtır bûbû har û hov; kinê xwe kırıbû verşıyek geni, lı ser Kurdan û Ermenıyan de verdışıya. Bı taybeti hukma Romê arteşek nû a gewre demazrandıbû, jı ew artêşê ra nızam çıkên "Hemidi" dıgotın; Xıde mın tu mın bıborine, ez zımanê wan har û hovan nızanı, ku navê ew artêşê bı rêkûpêki jı tera bıbêjım. Ango leşkerên ew artêşê hemû xortên Kurd bûn. Hum ji bı taybeti xortên Kurdên Şafi. Gelek axa û mir'ên Kurd ji, kırıbûn paşa, lı ser milên wan de surmeyên zer û nişanên dewleta Romê hebûn. Ew bêbextana ji, jı bona ew surme, nişan û malê cihan, bûbûn dıjımınê gelê xwe. Ew xortana lı dibistanên taybeti de dıhatın elımandın. Serbazên dewleta Romê mêjoyê wan Kurdan bı zanyariya Oli va şoştıbûn û berdabûn ser gelê Ermeni û Kurdên Şeytanperest. Ez bawerım jı wan Kurdan ra, Kurdên "Yêzidi" dıbêjım. Mın

ew Kurdana neditine, balam wer dibêjin. Gor ku hin mezinan dıgotin, pirên wan ji hene, mina pirên me Elewîyan. Ango çî dıxwazım jî tera bîbêjum Xîdê mın, wan xeşîman jî bî sed hezaran Ermeni û ew Kurd bîrayê xwe' yên Yêzîdî dıkuştın. Lê gelê Ermeni jî vala nedîsekiya, camêran bî mêrani berxwe dıdan. Bî taybetî lî aliya Cızra Botan de, lî bajarê Wanê û wan hawirdoran de, lî nav Kurdan û Fılan de şereki gewre derketibû. Gor ku jî mera dıgotin, bî deh hezaran va Kurd hatibûn kuştın. Lî hêla bajarê Qersê û wan der-doran de jî, qal û behsa Cihangîr Axa ê serokê Kurdên Yêzîdî dıkirin. Dıgotin "Cihangîr Axa jî ketiye tev şervanên Ermenîyan, lî hember artêşa Romê şer dıke". Ango Kurdan jî Kurd dıkuştın. Hey Xwedê o tu nepejirini, Roma Reş Kurd û Ermeni, Kurd û Kurd anibûn hember hev, wan bîran û kurapan jî hevûdu dıkuştın. Lê Xwedê hezar cari şıkir, ku em Dêrsımîyan neketin nav ew şerê bîra kuştinê. Dêrsımîyan serda jî, gelek Ermeni felat kırın, ew nedan kuştın, ew revandin, dan pêşîya xwe bîrin radeste Êrızîstanê kırın. Ku Xîdê xwera bîbêjum, îcar şerê cihan a yekemin derket. Hukma Romê seferberlig êlan kır û disa destpêka leşker komkırinê kır. Disa sitemkariyek ne mîrovi ketibû Kurdîstanê. Destên kê ço dıgirt, Roma Reş ew xorta dıgirt û dıbir leşkeriyê. Serbaz û leşkerên Romê disa gund talan dıkirin, dışêlandın; zada gel bî dara zorê dıstandın, gel bîrçî û şerpeze dıhiştın. Bîrçitiyek tırsehêz-korku-nc-ketibû nav gel. Rêwan lî rîyan de, karker û pale jî, lî ser kar de dıgirtın, dıbirin, dıkirin leşker, dışandın hember Yewnan, Êrız û hin gelên dın. Tu mın bîborine Xîdê mın, ez navê hin gelen bî qenci nıkarıbım bîlêv-telefuz-bıkım. Ango ew kesana yekser dışandın nav şer. Jı bona das çınandınê çîl mêrên Kúpık, Lodek û Şowagê çübûn" Dasa Xarpitê" Roma reş ew kesana jî lî ber dasan de girtibûn yekser şandibûn Yêmenê, hember gelên Erebi. Jı ber ku gelên Erebi jî êdî seri hıldabûn, lî hember Roma Reş, şer dıkirin.

Lewra gelên Ereb ji dıxwastın ku li bin bandûra Romê de derkevin û felat bîbin. Li wan çil kesan de, tenê çar kes vegeyriyan malên xwe. Ew ji li rêda reviyabûn, canên xwe felat kiribûn. Li wan yek ji Ali ê Şavêrdi bû. Xêncı ewana, Ahmedê Şarivanê ji girtibûn, ew ji şandibûn hember Êrız, lê Ahmed dil hatibû girtin, li Êrızistanê de çar sal mabû. Li piştî şoreşa Koministan de, rojeki em fikiriyan ku, ewe Ahmedê Şarivanê derket hat. Hal bû ku, meta Şariwan teseliya xwe li kûrê xwe êxistibû, xêra wi dabû, hewla wi ji belav kiribû. Ji ber ku hemû kesan dıgotin " Ahmed mırıye". Li aliya dın de, Avdıhemıt disa fermana mefıkırına Kurdan derxistibû, bı sed hezaran Kurd dıhatın sırgûnkırın. Ango dewleta bêbext gelê Kurd li ser erdê bav û kalan de radıkır dışand rojava Tırkiyê û navçe a Tırkiyê. Pıraniya wan Kurdan li riyan de bı ti û bıçıyan va dımırın, bı êşkencan va dıhatın kuştın. Li ew demê de hınek leşkerên ew artêşa "Hamıdı" ketıbûn Dêrsım ji. Dıxwastın ku Ermeniyên Dêrsım ji bıkujin. Lê pıraniya Ermeniyın zûva reviyabûn çübûn Êrızistanê, balam hın Ermeniyın nedıxwastın ku war û ciyên xwe bıterıkının bıçın. Ji ber ku, bı sed salan ew ji li tev me Kurdan rûniştıbûn, ew ji, ji Kurdan ra búbûn kiriv û bırayên axıretê. Ango Kurd û Ermeni der û cinarên hev bûn. Ew leşkerên har û hov ketıbûn herêm û gundên Çarsancaqê, Ermeni dıgırtın dıkuştın, qıra Ermeniyın dianın, bervı gundê Dırban va dıhatın. Lewra hın Ermeni ji, li gundê Dırban de dijiyan. Mêrıkın hemû hunermend bûn, karê nalbendı, karê sıfır, angı bakır, qenc dızaniyan. Camêran li ser gelek karan de pıspor bûn. Wana ji mera Sêni, diwan sêniyên mezın, Semer, Kûz, Dızık çêdıkırın. Bı kurtasi em û Ermeniyın mina du bıran lıgel hev de bûn, em cinarên hev bûn, tenê Ola me li hev cûda bû. Ji bona ew ji, li navbera me û Ermeniyın de şer û pevçûn tune bû. Lê li ew dawiyê de Roma Reş, şer û pevçûn ji kiribû nav gelê Kurd û gelê Ermeni. Her waha Xıdê mın, beri ku ew leşkerên har û

hov xwe bigihêjînin gundê Dırban, Ermeniyek tîfinga xwe digire dîçe pêş derê mala Îwê Mirtê, gazi Îwê Mirtê dîke û ji Îwê Mirtê ra:

- Kirivê İbrahim, ku tu bî rasti baweriya xwe li Xwedê, li Ola İslam, Eli û Mihamed, Xızır û Bamasûr, erd û esman û hemû ziyaretan tini, divê tu bî navê Xwedê va, ev tîfinga min bigiri, gule berdi ser mêjo ê min, min bikuji. Ez naxwazim bî destên leşkerên Romê va werim kuştin. Em cinarên hevîn, me nan û xwê'ên hevûdu xwariye, ez û te bî hevra mezin bûn, em hevalê hev'ên axîretêne. Beri ku leşkerên Romê min bî barbarî bikujim, divê tu min bikuji. Ez dixwazim bî qırşûna tîfinga xwe û bî destê hevaleki xwe ê hezkîrî va werim kuştin, dibêje.

Belê kurê min eynî usa, lê Îwê Mirtê dibêje" na, ez nîkaribim cinar û hevaleki xwe ê hezkîrî bikujim, tu min bîborine, ez ev kari nakim, te nakujim" û ew pêşneyara hevalê xwe ê Ermenî napejirine. Li ser ew na-na a Îwê Mirtê, ew mênîkê Ermenî lûla tîfinga xwe dîke devê xwe, duxa tîfinga xwe ji dîde ser erdê, bî tîliya lîngê xwe va pêle nîg a tîfîngê dîke û li pêş çavên Îwê Mirtê û hemû neferên ew malê de xwe dîkuje, mêjo ê xwe belav-belav dîke dîpîjîqîne, ku bî destên leşkerên Romê va neye kuştin, zîlm û barbarîya wan bêbextan bî çavên xwe va nebîne. Belê, Xîdê min, me evana hemû ditin û bihistin.

Ez pîrr dirêj nekim û serê te neêşînim Xîdê min. Rojeki ji mera gotin leşkerên Êrîz ketîne bajarê Qorsê, Baybûrt, Erzurum, Erzingan û Çapaxûrê û bervî Gêxîyê û Dêrsîm va tên. Li ew demê de, Alê Memê û bîrayê wi Îwê Memê ji bûbûn milîsên Kurd, çûbûn hawariya tevgera Dêrsîm, ku Dêrsîm li leşkerên Êrîz bîparêzin. Ew ji ketibûn nav şereki gewre û giran. Gor ku wan herdu biran ji mera digotin, Li Mamaxatûnê wirde, milîsên Kurdên Dêrsîm çend zirp leşkerên Êrîz dîkin nav çeperê û hemûyan dîkujim, qet leşkerekî Êrîz sax bernadim. Şervanên Dêrsîmîyan li ew şeri de gelek ji çek dest xwe xîstibûn. Li ew demê de birçi-

tiyek heri gewre ji ketibû nav gelê me, gel bî birçiyar
 dımır. Heyam ji ne heyam bû; êdi ne Kereng, ne Xilok, ne
 Sıping, ne Gûlik û ne ji pıncarek dıhat dıtın. Tenê Hêrmi,
 Şekok, Gijok û Rixok hebûn, ew ji roj be roj kê m dibûn,
 dıqedıyan û nedıman. Ango rewşa gelê me her xırab bû.
 Bawer bıke Xidê mın, lı ew rojan de me şolıka mina ma-
 lâza kûçıkan ji nedıdit. Pırr caran mın mıstek ard dıavıt
 nav ava tencıkê, ew ava şuli dıkır, me bı ew şolıkê va xwe
 bı xwe dıxapand, zıkê xwe bı ew şolıkê va têr dıkır. Tu ji
 mınra bıbêje kurê mın mırov bı avê qet dıkarıbe zıkê xwe
 têr bıke? Tu qenc dızani, şûna avê cûdaye, şûna nan û
 xwarınê cûdaye. Em ketıbûn nav rewşek heri xırab, me
 nedızanıbû ku em çı bıkın. Lı aliki ew rewşa birçıtıyê, lı
 alıya dın de ji tırsa Êrız. Rojeki Bavo ê mêrê mın ji mınra
 got " Senem were em lı gund derkevın, bıçın wê alıya çemê
 Baxınê -mıleki çemê Fırat'ê- bervı gundê Kumetê bımeşın
 û lı wê ji em dagerın Teteran mala Alıko ê talıbê me. Lı
 ew herêma Palıyê de gelek nas û talıbên me hene. Jı bona
 heyamek kurt de, em lı wan deran bıbın mivan bısekınnın,
 zıkên xwe têr bıkın nemırın, bınhêrın Xwedê dawıya ev
 rewşê û axırıya me çıto dıke". Lê Xwedê şıkır, ku lı ew
 demê de zarokên me ji tunebûn, hın ez bûkek nû bûm.
 Mın ew pêşneyara Bavo pejırand û rojtıra dın me hın
 tıştên xwe amade kırın, em rêketın çûn gundê Teman,
 mala bavê mın Şekırê Gonçıkan bûn mivan. Me rewşa xwe
 ji bavê mınra ji dengkır û rojtıra dın pıştı nivrojê de, em
 rabûn çûn lı bıne gundê Golanê de lı ava çem derbaz bûn
 û em çûn me xwe gıhand gundê Qelesqelan. Rûnıştvanên
 gundê Qelesqelan ji hemû kesên eşıra İzolanın, xısmên
 mala Husên Axa ê kurê Mele Êsıvê ê Mezra Gazê ne; ew
 hemû ji talıbê mala bavanên mının. Em çıto ku ketın nav
 gund, haşa kûçıkan êrış dan ser me, ez geleki ji tırsıyam.
 Lı ew demê de hın kes derketın der, deng lı kûçıkan kırın,
 hatın xwe gıhandın me, kûçık lı me dûrxıstın. Jı bona ew
 ji, me ji wan kesanra spas kır, sılav da wan kesan û em

ketın navçe a gund. Me dit ku gelek mêr lı pêşiya diwarê meleki de rûniştine, piştên xwe ji dane diwêr, lı nav xwe de dixafın. Wan kesan çawa ku em ditın, hemû lı şûnên xwe de rabûn ser lingan, Bavo sılav da hemûyan, mêrkan sılava me ragirtın û dûra Bavo jı wan gundiyan Qelesqelan ra:

- Hevalino'ez seyideki gundê Kûpikê me. Kewaniya min ji keça pirê we Şekirê Goncike. Em dixwazın işev lı mala we yeki de bıbin mivanê Xwedê, sibe ji em dixwazın bervi Kumetê, Yalançıyan û Teteran va biçin. Gelo hûn ki me işev bıkin mivan? got û lı benda bersiva gundiyan de ma. Lı nav wan kesan de yeki usa bersiv da Babo, got" Bawa Sultan, şûna te û hemû mivanên Xwedê lı ser serê meda heya, lê tiştê ku Xwedê dızane, mirov çawa jı Xwedê û lı ceddê te betal bıke. Bawa Sultan diyê tu me bıborini, tiştêki me ê werê bı taybeti, angoyı bona xwarına mivanan tune, ku em lı mivanên mina te û hemû mivanên Xwedê bıdın xwarın. Bêd derew, em zıkın xwe bı Tawi, Berû û xozan va têr dıkın, ew jı bervi qedandinê dıçın. Em nızanın ev zıvıstana pêş xwe çawa derbaz bıkin. Dıbêjın, aliya Paliyê û Xarpietê gelek zad û zexire heye, lı em newirên ku lı malên xwe de derkevın, biçin çend olçeg zad jı xwera bıkirın. Jı ber ku, leşkerên Romê mirovan komıdıkın dışının leşkeriye. Em hêvi dıkın ev rewşa zû lı holê de rabe. Lê ku usa bımeşe, em hemû bı zıkê birçi va bımirın. Lê Xwedê şıkır pez û dewarên me hene, balam em nıkarıbın heywanên xwe bıbin bıfiroşın û jı xwera dolıwa xwe dest xinın. Zada hın kesan jı heye, ew mal şewıtiyana jı, lı hember çapek zad, zeviyeki jı mirov dixwazın. Gelek kedxwarın me Kurdan bı ev rêva her dewlemend bûn, bûn xudanê erdên mezin. Tu min bıborine seyidê min, min serê te êşand, lê ev rewş û realita meye".

Lı pey gotinên ew camêri de, icar Bavo jı hemûyan ra carek dın spas kır û got" xem nine bırayên delal, em hemû rewşa hovûdu qenc dızanın. Em jı dıkarıbın lı tev

we birçi buminin û lı tev we Berû, Xoz û tawiyan bixwın, lê ku hene. Lê ku ew ji tunenin, em ji mina we bı zık birçi radızın, sıbe ji Xwedê mezine. Ango êdi fırşıka me Kurdan hute her tışti ji bûye, ku kevır ji be, divê em kevır ji bîhêrinin bıkın nan û bixwın".

Ez ev çirok, ditın û serpêhatiya xwe dirêj nekım Xidê mın; wê şevê em bûn mivanê xısmeki Husên Axa. Tu mın bıborine Xidê mın, lı nav ew rojê û lı roja iroin de gelek zaman derbaz bû, mın navê ew camêri ji xwe birkiriye. Ew kes ji xudan gelek zar û zêç bû. Mala ew camêri çıl-pavkiri û her paqij bû. Oda wana mivanan bı text û raxıstını bû. Bı Kulav, Xaliçê û cacımên bı rengin va mêrik oda xwe xemılandıbû. Sê-çar kurên wi û ewqas ji bûkên wi hebûn. Ango malek xudan gewri û sılxet bû. Em çito ku ketın hındirê mala wi camêri, jına wi camêri ez girtım birım oda paşın nav bûkên xwe û jinên cinaran. Hemû mêr ji çún lı oda mivanan de rûniştın. Mêran lı nav xwe de çı dıgotın, qal û behsa çı dıkırın ez nızanım. Jı ber ku em ligel hev nebûn. Em jin ji lı oda paşın de rûniştıbûn, me lı nav xwe de dıpeyiviya, qal û behsa derd û kulên xwe dıkırın. Hın jinan tışt-mışt lı mın pırs dıkırın, mın ji bersıva wan dıda. Lê ez werqas birçi bûbûm ku, hêz lı joni-yên mın de nema bû, çav lı ser mın de tari bûbûn. Wext ji êdi muxurba êvarê bû. Bawer bıke şewq ji tunebû, ku em lı ber şewqê de rûnın, hındava hevûdu bıbinın. Jınıka malxwe ê malê çend kok êzing avıtıbû ser agirê zıkê pıxı-rigê, me rû û hındava hevûdu lı ber ew melûli û çûrıska agir de dıdit. Bı ew şıklı va em dıbûn nasên hevûdu. Lê pırr caran mın gotınên wan jinan ji nedıbıhistın. Ango ez werqas birçi bûbûm ku, guhên mın ji kerr bûbûn, zıkê mın û fırşıka mın lı nav hev dıket, te dıgot "Şıxab" -matkap- kırıne nav fırşıka mın û badıdın û dızıvirinın, heşên mın dıçûn, mın xwe zor zeft dıkır, ku ez lı nav ew jinan de, bı birçıyan birva neçım û nekevım ser erdê. Lı kêleka mına rastê de bûkek bedew û cıwan rûniştıbû, wê qet

dengê xwe dernedixist, jî keseki ra jî tişteki nedigot, bî bêdengi em guhdar dîkîrîn. Lê çîra ew jînekê tişteki nedigot, mîn nedîzanîbû. Yekcar mîn dit ku, ewe ew bûka bêdeng û bûka cîwan lî binê pêşa fiştanê xwe de tişteki derdixîne, bî dîzîka va davêje devê xwe û dîxwe, lî binê çîta wê de lêvên wê dîlîvîn. Mîn çawa ku ew rewşa wê bûkê dit, îcar av lî devê mîn ket, mîn bêtir xwe birçî his ani, mîn nezani ku, ez çî bîkîm û çî bîbêjîm. Lewra mîlç û mîlça devê ew jînekê aqîl lî serê mîn de nehişt. Lî dawîyê de êdî mîn diyax nekîr, jî ew bûkê ra:

- Xwişka delal ma ew çîye tu dîxwî? Bî kerema xwe parîyekî jî bîde mîn, lewra ez jî gelekî birçî bûme, nîkarîbîm ku lî şûna xwe de bîsekînim, got û lî benda bersîva ew bûkê û ew tiştî de mam.

Belê, Xîdê mîn, bîbe ku tu bawerîya xwe lî ev gotînên mîn neynî û tu bîbêjî" Amojîn evana hemû derewîn, tu evana lî zîkê xwe de dîafîrîni". Bawerke Xîdê mîn, ez jî tera lî ser serê bavê xwe sond dîxwîm, bî navê Xwedê û Bamasûr sond dîxwîm, ku evana hemû dîtinên mînîn, mîn ev tiştana bî ev çavên xwe va dîtin, ez lî zîkê rewşek werge de jîyîyam. Ma tu dîzani ew bûka bedew û cîwan çî lî binê pêşa fiştanê xwe de derdixist û dîxwar? Lê naye bawerîrîn, balam hezar mîxabîn ku, ew bûyerek rast bû, mîn bî van çavên xwe va dît. Wê jînekê "TEPIK" dîxwar Xîdo, TEPIK. Ango rîxa ga, mangan kurê mîn. Mîn xwast ku ez jî ew rîxa ga û mangan bîxwîm. Lê lî ew navberê de kewanîya malê jî mînra niv nanekî ceh, tev tasek toraq û mîstek Tawî ani da ber mîn, mîn ew tiştana xwarîn pişekî lî xwe hesîyam. Çavên mîn vebûn, hişên mîn hatîn serê mîn. Lî bîlî ew tişt û ew rewşê Xîdê mîn, disa lî ew gundî de mêrîkek bî birçîyan dîn bûbû, serên du kurên xwe jêkîrîbû, goştên ew du kurên xwe xwarîbû, Xîdê mîn. Hemû kesên ew gundî jî mera qal û beha ew kesî dîkîrîn, mîrov ecêb dîma, dîl û kezewa mîrov perçe dîbû. Ahxxx Xîdê mîn, me ev tiştana dîtin, lî nav rewşek werge de rojên xwe

derbaz kırım, hatın ghiştın ev rojê. Te qet lı diroka cihan de bihistiye ku, mirov zarokên xwe serjêbıke û goştên zarokên xwe bıxwe? Lê gelê me lı bın zılm û barbariya hukma Romê de kete rewşek werge, kete nav bêtarek nebûyi. Ango barbariyên nebûyi, derbederiyên nebûyi hatın serê me Kurdan. Hına ji ew zılm û barbari têne serê gelê me. Zılm û barbariya hukma Tırk her berdewame. Tıştên ku me ditine, te neditine Xıdê mın. Ma çıra tu evqas berxwe dıkevi? Çıra tu dibêji "xwendın û nıvisandınek mına qenc ku hebana, mın serpêhatiyên xwe bınvısandına". Ma kuro ki ew ditın û serpêhatiyên me û teva-hiya serpêhayiyên gelê Kurd bınvıisine?. Ez hêvi dıkım lı pêşerojan de ev serpêhatiyên te, serpêhatiyên me û teva-hiya serpêhatiyên gelê Kurd bıne nıvisandın, tu qet xem meke kurê mın. Bese ku tu ew serpêhatiyên xwe û çiroka gelê xwe, ji xwe birneki, ji neslê nûra bıbêji. Helbet Nıştımanperwerek derkeve û ev tıştana bınvıisine. Qet xem meke Xıdê mın, wê roj bê, gelê me ji serkeve, diroka xwe ji bınvıisine, serpêhatiyên mın û te ji bınvıisine û bıke pirtûk, ev cihanê lı ser zılma dijmanan, bı taybeti lı ser zılm û barbariya Romê pêbıhesine. Cihan lı ser ew barbariyên Romê agadar û serwext bıbe. Erê Xıdê mın, ma tu dızani pıştra ji çı bû? Tu ê hejar çawa bızani. Lı ew demê de, tu lı rama dayıka xwe de ji tunebûy. Dûra ji em çûn Kumetê; çend rojan lı Kumetê de man; dûra em dagerıyan çûn gundê Teteran mala Aliko ê talıbe me, çend heftan ji em lı Teteran de man, lı wê ji em dagerıyan disan hatın Kûpıkê mala xwe. Lewra êdi tırsa Êrız nema bû. Leşkerên Êrız dagerıyabûn çûbûn. Qet leşkereki Êrız lı ser erdê Kurdistan de nema bû. Jı mera dıgotın, şoreşa Koministan lı Êrızıstanê de çêbûye, sazûmana Koministi hatiye ser hukım. Şerê cihanê ji temrıya bû dawı ditıbû. Êdi rê û dırb ji vebûbûn, gel pez û dewarên xwe dıfırotın, dıçûn ji zar û zêçên xwera zad dıkıriyan, hêdihêdi dolıwa xwe dımeşandın.

Belê, Xîdê mîn, dûra ez bûm xudan sê kuran û keçeki. Beri Kekê mîn hat cihan. Dûra Kûbara mîn. Lı pey Kûbarê Ali û İmamê minê piçûk. Rojen me bed, qenc derbaz dibûn dıçûn. Lê rojeki jı bona ava bostanan lı navbera ezbeta me û ezbeta Seyid Abasan de şereki gewre derket. Em tenê sê mal bûn, ew jı bist mal. Hemûyan êriş dan ser Bavo, Muslim, Seyid Qemer û Seyid Weli. Hesê me ji-ango bavê Gulo ê me-lı mal de nebû. Seyid Weli jı lı ew demê de xorteki pazdeh salınî bû. Lı ew şeri de, bı taybeti Bavo û Muslim hemû mêrên Seyid Abasan xışır kırın, İmamê bıraziyê Bayê Seyid jı hate kuştın. Dûra Lodek û Qur-qurikiyan xwe gihandın şer, ketın navberê herdu aliyan lıhev cûda kırın, lê xwin hatıbû rijandın, mêrek bı destê Muslim va hatıbû kuştın. Bavo jı bûbû hevparê Muslim. Ango lı ew rojê de dijminatı kete nav ev kurapan. Bı tırsan xew lı me reviyabû, xew nediket çavên mın; ez lı zarokên xwe ditırsiyam. Dûra Pir, Rayber û Mirşûd ketın navberê, mislet û cıvin çêbûn, gıre-gırên eşiran ketın navbera herdu aliyan, herdu ali lıhev anin; iqrar kırın navbera herdu aliyan û ew mesele dadan. Lê dûra Muslim û Bavo baweri lı Seyid Abasan neanin. Lewra Seyid Abasiyan lı ser iqrara xwe de neman, xwastın ku tola xwe bıstın. Jı bona ew jı, Muslim û Bavo ê mêrê mın lı gund derketın, reviyan çûn. Muslim çû Baybûrtê, Bavo jı çû Têrcanê lı gundê Mixarê de, jı xwera jınek dın dit û lı ew gundi de zewıcıya, ez û çar zarokên xwe jı, jı xwe birakır û qet lı hawara me nepırsi. Ango wi bêbexti zarokên xwe jı birkır, hemû lı stuyê mın de hişt. Ez jı lı bist çar salına xwe de bêt mêr û bêt sitar mam. Tenê Alê Memê Şıvan jı mınra û zarokên mınra bû sitar. Ew jı mınra bû mina bırayeki mın, jı zarokên mınra bû sitar û bû bav. Ez çu caran lı bın qenci û deynê ew camêri de nıkarıbın derkevın. Wi ez mina xwişkek xwe xwedı kırım, jı zarokên mınra jı bû mina baveki heqiqi. Xwedê lı Ali hezar cari razibe.

Mın geleki serê te êşand Xidê mın, binhêre êdi ez kal bûme, çavên mın melûl bûne, dıran lı devên mın de nemanê, porê mın gewr bûye, gep û rûyê mın qurmiçiyane, ez êdi bêt hêz mame. Hemû hemsalên mın mina şêrın, hina cıwanın. Jı ber ku ewana mina mın derd kul nekışandın. Ango mın çı dit, çı nedit. Ew roj, ev roj. Lê disa ji Xwedê şikir Xidê mın. Tu ji lı Xwedê şikir bıke, ew mezine, wê ew tola te ji, lı neyaran bistine.

Ana Senen axinek kûr lı dilda kışand û carek dın vege-riya ser Xidê piçûk, ji Xidê piçûk ra:

- Ahxxx Xidê mın, ew zaman werge bû. İro ji rewş pırr başe nabêjim. Lê em çı bıkın lawê mın, berxwe mekeve, ev cihan lı Sultan Sılêman ra nema, ji Sultan Sılêman ra nebû yar, ma ji mın û tera dımine û dıbe yar? Ev cihan valaye, vala, Sultan Sılêman usa gotiye. Kesên zana û dirokzan dibêjin ku, Sultan Sılêman zımanê teyr û tûran, zımanê hemû jındewarên ev cihan, zımanê em û pêriyan zanıbûye. Wi lı ba û bahozan bac û serebac standiye. Werqas zana, bıaqıl, jir û jêhat bûye ku, haşa heft sed jin têr kıriye, ji heft sed jinan ra bûye mêr, lı tev wan razaye. Ew pêxambere ki werge bûye, lê disa ji ev cihan ji vira nemaye. Weyisê Nûri dıgot ku, Sultan Sılêman sê sed sal jiyaye, lê diya wi lı pey wi mırıye. Ango ew kurê jinek werge bûye. Diya Sultan Sılêman, jinek her esabi û bı hêrs bûye. Rojeki Sultan Sılêman lı tev leşkerên xwe derketiye seferê, lê lı rêva nexwaş ketiye û ketiye ber mırınê. Beri ku bı mire, ruhê xwe radeste Ezrail bıke, gazi hemû serleşker û serdarên artêşa xwe kıriye, ji wanra usa gotiye:

- Ez bawer nakım êdi ez carek dın rabım ser lıngan bıgerım; wê ez bımirım û bıçım heqiya xwe. Lê ez lı mırına xwe natırsım, balam lı we dıtırsım. Hûn ku meyi- tê mın ji diya mınra bıbın, wê ew ji wera bıbêje "we lawê mın kuşt". Lı ew demê de, diya mın ew hemûyan bıde kuştın. Naha hûn destpêbıkın ji mınra tawûtek bı taybeti çêbıkın. Lı aliya tawûtê, a rast de quleki vekın. mılê mın lı

ew qulê de derxinin der, meytê mın werge bıbın radeste diya mın bıkın. Wexta ku diya mın milê mın lı dervayî ê tawûtê de bıbine, wê ew lı ew demê de jı wera tışteki nebêje, wê ew mın çı xwastiye û qesta mın çı bûye, wê ew fêm bıke, têbigihêje, mesele çıye û çı nine, dıbêje û lı ew hürdemê de dımıre dıçe dıgihêje rama Xwedê. Dûra leşker lı ser hosiya Sultan Sılêman tawûtek werge çêdıkın, lı aliya milê rastê de jı quleki vedıkın, Sultan Sılêman dıkın ew tawûtê, milê wi lı ew qulê de derdixinin, seferê nivçe dıhêlinin û meytê Sultan Sılêman radıkın û şuva bervı mal tinin. Beri ku leşker şuva vedıgerin, serdarê artêşa Sultan Sılêman, balyozeki bı taybeti beri rêketinê de dışine mala Sultan Sılêman, ku ew kesa bıçe ew nûça reş bıdê diya Sultan Sılêman û gelê wi. Ku jı bona cınaze û gorkırinê her tışt amade bıbe. Ew kesa jı beri leşkeran xwe dıgihêjine qesra Sultan Sılêman, ew nûça reş dıde diya Sultan Sılêman û lı nav gel de belav dıke. İcar diya Sultan Sılêman berxwe dıkeve, dıgiri û dıkevi şıkê. Bı xwe bı xwera dıbêje "leşkeran kurê mın kuştın" hêrs dıkeve. Lê wexta ku meytê Sultan Sılêman dıgihêjinin pêş qesra wi, diya Sultan Sılêman ew tawût û milê kurê xwe dıbine, lı ew demê de têdıgihêje ku, na keseki kurê wê nekuştıye, Sultan Sılêman bı fermana Xwedê va mıriye, ew aqıl jı aqılê wi bı xwe bûye, xwastiye ku milê wi lı derva bıhêlin, ku diya wi guneyê keseki negire û tışteki neyne serê keseki. Gotıye " daye lı ev milê mın bınhêre, çawa radışe, lım vırde û wırde dıçe û tê, jıyana ev cihan jı usaye. Ev cihan û jıyan, cihan û jıyanek vala û derewçine, qet jı keseki ra namine ev cihan, dawıya jıyanê axe, gora kûre. Lı hember ev rastıyê qet berxwe mekeve û dilê xwe jı keseki ra teng meke". Belê Xıdê mın, rasti jı ev e, ev cihan û ev jıyan, cihan û jıyanek derewçine, cihan valaye, qet jı keseki ra namine. Jı bona ev e ku ez jı tera dıbêjum berxwe mekeve, bıhna xwe teng meke, helbet Xwedê jı tera jı derıyeki veke. Derıyên Xwedê pırın, bêt hejmarın kurê mın.

Xidê piçûk çirokên usa zef hezdikir. Jı bona ew ji xwe bêtir nêzika devê Ana Senem dikir, ku çirokê qenc bibîhise û têbigihêje naveroka ew çirokê. Lı pişti kutabûna çirokê û şîretên Ana Senem de, icar Xidê piçûk xwast ku jı Ana Senem pîrseki pîrs bike. Got " Amojın te lı testpêka axaftına xwe de, qal û behsa şoreşa Êrızistanê û Koministiyê kır, gelo Koministi çıye? Wexta ku ez leşker bûm, serbazên Tırk her roj jı mera dıgotın" serokê Alman Hitler êriş daye ser Koministan, Koministan dıkuje". Jı bona ew ji em dielımandın, tıştên ecêb jı mera dıgotın. Balam serbazeki mın hebû, wi jı mınra her tum bı dızıyan qal û behsa sazûmana Koministan dikir û ez agadar dıkırım. Naha ez dıxwazım tu jı mınra birûbaweriyên xwe lı ser sazûmana Koministan bibêji. Lı gor bawerıya te ew sazûmana, sazûmanek çıtone ? Bı kerema xwe tu bersıva ev pırsa mın bıde Amojın. Ana Senem lı rûyê Xidê nihêriya, dûra jı Xidê ra:

- Kuro te jı Rôma Reş ra çar sal leşkeri kırıye. Ez bawerım serbazên te jı tera gotıne Koministi çıye û çı nine. Tu bı xwe ji dibêji " her roj jı mera dıgotın". Mana ev gotına te ewe ku, wana jı tera gotıne, Koministi çıye, çı nine; ez a reben jı tera çı bibêjım.

- Na Amojın, ez dıxwazım lı ser ew sazûmanê tu jı mınra ramana xwe bibêji. Ango lı ser sazûmana Koministi hın kesan jı tera çı gotınê û jı gel ra çı dibêjım, tu jı mınra ew ê bibêje bese. Bı kurtasi tu jı mınra ramana xwe bibêje. Ango sazûmana Koministi çıye ? got Xidê piçûk, lê Ana Senem jı Xidê ra usa got:

- Kuro tu baş dızani ku, bı sed salan vırde, Kurdên me ji bûne mina Erebb û Tırkan. Em jın kırınê mina metaryaleki, jı cıvak û cıvatan dırxıstıne. Dıxwazım em jın, lı mal de û aşpêxanan de jı wanra nan û xwarınan bıpêjın, êvar-êvar ji bıkevın paşıla wan, kêfa wan binin, jı wanra zarokan binın cihan, felan û bêvan. Ango mêrên me Kurdan ji êdi nahêlinın jın bıkevın nav cıvat û refên mêran.

Naxwazın jin ji biçin dibistanan bixwinın. Lê gor ku bav û kalan ji mera dıgotın, li diroka gelê Kurd de qet ferqa jin û mêran tunebûye. Jin û mêr her tım lıgel hev bûne, li nav şertên wek hevi de jiyane. Çıra bav û kalên me gotine " Şêr şêre, çı jine, çı mêre". Ev meteloka baş dıde xuyakırın ku, li nav bav û kalikên me de, ew dubendiya cinsê jin û mêran tunebûye. Jin û mêrên me Kurdan ji hevra ketine nav şeran, li hember dijminan de şer kırine, mêrxwasiyên gewra dane temaşekırın. Jinên me Kurdan bûne serokên eşir û ezbetan, li mısletan de li koşeyên heri jorin de rûniştine, bûne dadger û dadmendi-adalet-belav kırine. Xwedê rama xwe li wê bıke, jına Seyid Bekteşê me, Ana Xanum, jinek werge bû. Ew keça Çarek Axa ê Pilemoriyê bû. Ew dıket nav mesele û mısletan, pırsgirekên gund û civatê çareser dıkir. Naha en dınhêrın, mêr nahêlinın ku, jin rûyê xwe ji vekın, mêr nahêlinın ku jin li hındır xaniyan de ji derkevın der, nahêlinın keç û jin ji bixwinın. Erê, beri ji dibistanên me Kurdan pırr tunebûne, balam disa ji, li nav civatê de ew dubendiya tunebûye, civat ji hevûdura bûye mamoste. Çı dıxwazım ji tera bibêjım Xıdê mın, ango hın kes ji mera dıbêjın sazûmana Koministiyê, sazûmanek ne başe. Li zıkê ew sazûmanê de, qet kesek ne diya xwe nasdıke, ne bavê xwe û ne ji xwişk û birayên xwe. Her kes ji hevra xerib û biyaniye. Her tışt li destê hukumatê-daye, mal û mılê keseki tuneye. Rûniştvanên welatên Koministan, hemû mina noker û dilanın, li bınê zılm û zorê de dıxebıtın. Dıbên jinên ew welatên Kominist, wexta ku li zarokan de ducan dıbın û dûra ji roj tê dıxwaskan dıbın, zarokên wan dıwelıdın û têne cihan, li ew demê de yekser dewlet wan zarokan li dest dê û bavan de distine û wan zarokan dıgire dıbe dıke şırxanan û zarokxanan; li ew ciyan de xwedı dıke; li wan zarokan dınhêre, ta ku ew zarokana mezın dıbın. Ango hemû xwişk û bıra lıgel hev, li ew şırxane û zarokxanan de mezın dıbın, balam qet kesek xwişk û birayên xwe nasnake, haya xwişk

û biran lı hev tune. Kes nızane xwişk û birati çıye. Jı bona ew ji, xwişk û bira bı hevra dızewıcın, dıbın mêr û jinên hevûdu. Naha te fêm kır û tu têghişti sazûmana Koministi çıye Xıdê mın ? Xêncı ev, disa dibêjın ku, jinên ew welatan, wexta ku canên wana mêr dıxwaze, derdıkevın der, kijan mêr ku jı wan xwaş tê, dilên wan kijan mêri dıxwaze, lı dû ew mêri dıkevın, wi mêri dıgırın, dıbın malên xwe, şevqe ê ew mêriki ji lı destikê koçê dêri de dardadıkın, ku wexta ku mêrên wan jınan lı kar, an ji lı derva dagerıyan mal, bıla ew şevqe bibının û nekevın hındır, jinên xwe bêt kêf nekın, zewqên jinên xwe nerevının. Bı kurtasi, gor ku jı mera dibêjın, jıyana wan welatan ne jıyane; jıyanek lı dûri aqıl û mirovatıyê'ye, jıyanek bêt namûsi û heywaniye. Ango hemû kes usa dibêjın, lê ez ji nızanım ku, derewe yan ji raste. Gotınek bav û kalan heye, dibêjın" Lê ağır ku lı pêxêriga malê de neşewite, dû lı pıxêrigê de dernakeve der". Ev meteloka ji dıde xuyakırın ku, ew tıştana bıbe ku rast bın, got û Ana Senem dawıya ew meselê ani.

Lı pışti ew gotınên Ana Senem de, Xıdê pıçúk carek dın pırsa xwe dubar kır jı Ana Senem ra:

- Amojın, tu werge dibêjınan bıterıkine, jı mınra birûbawerıyê xwe'ên şexsi, tenê lı ser ev tıştan bıbêje. Ango tu bı şexsi lı van tıştan û ew gotınên hın kesan bawer dıkı yan na? Tu jı mınra evana bıbêje.

- Belê Xıdê mın, ez bawer dıkım. Jı ber ku, kesên nezan û çav kor ev tıştana jı mera nabêjın. Axa, mir, şêx û seyidên me jı mera dibêjın. Kuro newıyê Seyid Bertal, Seyid Husên dibêje. Hesen Axa ê Germısıyê, Mele Úsiv gelek kesên dın dibêjın. Tu bı xwe ji qenc dızan ku, ev şexsana zanane, xwendıne, gerıyane û dıtıne. Mırov çıto lı ew kesan bawer nakê ? got Ana Senem, lê disa Xıdê:

- Na-na Amojın, ez bı xwe bawer nakım. Tu bı xwe ji qenc dızanı ku, Ahmedê Şarıwanê çar sal lı Úrıztanê de dil mabû. Seyid Ahmed ev e xwaşe, wi ew sazûmana bı

çavên xwe va ditiye. Ew qet tîştên usa nabêje. Serda ji dibêje " Koministan ez felat kırım, Koministan ez serbest berdâm". Mın bı xwe lı devê Seyid Ahmed de bihist, ku wi digot " qet tîşteki werge tune, hemû derewın, buhtanan -iftira- davêjın ser ew sazûmanê". Ez bı xwe sond dıxwım ku, axa, mir, şêx û hın seyid jı bona ev meselê derewan dıkın. Hım ji derewên mezın dıkın, lingên qantıran dışkı- nın. Ma ew mirovana heywanın? Keriya pez û dewaranın? Wana çito lı nav çend salan de, adet, tore û hemû kev- neşopiyên bav û kalên xwe, jı xwe birkırın? Ewana çawa lı zıkê heyamek heri kurt de ewqas bûn heywan? Na Amo- jın, diroka mirovatiyê, lı dewra sazûmaniya kevneyari de destpêkiriye, qonax, bı qonax, gav bı gav hatiye gihiştıye ev roja me. Tu bı xwe ji dibini ku, jiyana mirovatiyê gelekı pêşva çûye. Naha tu bı çavên xwe va dibini ku, her roj bafırên Romê lı ser ev gundê meda dıfırıkın, dıçın Erzurım, Qers û Erzinganê. Lı navbera bajarın û welatan de dıçın û tên, teşıyan dırêsın. Bı hezaran tîştên nûjen derketıne. Hemû ji mirovan, jı bona mirovatiyê çêkırıne. Ango nûjenizm evqas pêşva çûye. Tu dibıhisi, jı tera ji dibêjın, xeta trêne bervı bajarê Mûşê dıçe. Mırov lı ser derya û dengızın de, keştıyan dajoy. Duhu axa, mir û hemû serdestan, mirov mına heywanan lı sũkan de dıfıro- tın, iro ew tıştana tunenin. Jı bona ev meselê û tıştên usa ew serbazê minê leşkeri jı mınra gelek tışt dıgotın û ez bawriya xwe lı gotınên ew camêri tinım. Ango kevneyariya duhuni lı ev cihan de radıbe. İro lı şûna sazûmaniya kev- neyar de, sazûmanek mirovi û demoqrat destpêkiriye. Mırovati nûjen bûye. Mırov lı kevneyariyê de derketiye bûye şareza. Şarweri her pêşva çûye. Ew tıştên ku hın derewçın û kedxwaran jı tera û jı gelra gotıne û dibêjın ji, mirov iro wan tıştan napejırıne. Lı diji neheqi û tıştên bênamûsi derdıkeve. Tu qenc dızani Amojın, hemû kesên meseba sunni jı me Elewiyan ra çı dibêjın. Sunni jı me Elewiya ra dibêjın " Elewi kafırın, Elewi diya xwe û xwiş-

kên xwe nasnakın, weka heywananin, Qızılbaşın, felan-
 bêvan. Qet lı bira min de naçe, ez wexta ku lı Sêrtê de
 leşker bûm, leşkerekî Sunnî jî minra dıgot" hevalê Xıdır,
 gor ku şêx û imamên me jî mera dibêjin, şêx û imamên
 Elewiyan tunin. Yê wan Pir, Rayber û mırşûdên wan
 hene. Elewî jî Pir, Rayber û mırşûdên xwera " Seyid "
 dibêjin. Ew Pir, Rayber û Mırşûd her sal dıçin malên
 mırûdên xwe jî bona geşt û çiralixê. Hemû gundi lı dora
 ew Pir, Rayber û Mırşûd de komdibin. Dûra lı dema êvarê
 de Pir, Rayber, Mırşûd - ku kiye - gazi hemû gundiyan
 dıke, ki ku lı hev suketine, wana lı hev tine, şiretan lı wan
 dıke. Tıştên usa her başın kek Xıdır, ez jî ev tıştan zef
 hezdıkım. Lê şêx û imamên me dibêjin" dûra jî ew kesana
 fermana cem girêdayinê dıdın, qurban serjêdibin û hemû
 gundi tev jin, keç û bûkên xwe va dıçin qonaxa Pir. Çawa
 ku lı dêri de dıkevin hındır, lı hember Pir de rêz dıbin,
 Pir dıwa wan dıde, ew jî lı pıştı dıwa dayına Pir de xar
 dıbin, erdê maçdıkin û lı ser jonıyan de dimeşın dıçin ling
 û destên Pir maçdıkin û şuva dadıgerın lı ciyekide rûdının
 û guhdare Pir, Rayber, Mırşûd -ku ew kesa kiye-
 dıkin. Evani jî başın kek Xıdır, em jî Elewiyan bêtır giramiyê
 dıdın şêx û imamên xwe. Dûra Pir tembûrê dıke destên
 xwe û destpêka kutandına tembûrê dıke. İcar cemê girê-
 dıde û dıwanzan dıxwine, gel dıkeve nav zıkirê, kerkes
 gazi Xwedê dıke, hemû kes dıgırın, dengên xwe bılınd
 dıkin û her dıwa dıkin. Lı pıştı ew hın kes radıbin Sema
 dıreqısın, lı dora hevûdu de dızıvırın, dıçin û têt, heşên
 wan kesan dıçe, bêt hış dıminın. Lı demek werge de, kesek
 lı şûna xwe de radıbe dıçe şewqa çırê dıtemırine û gel
 dıkeve nav hevûdu. Êdı kê ku pê kujan, jınık, keçık, an jî
 bûkê girt, bı qenci karê ew jınık, keçık, an jî bûkê dıbine
 û kêfa xwe tine. Lı pey ew bêt namûsiyê de, vêca ew ke-
 sana derpeyên wan jınık, keçık û bûkan dıçırının, perçeki
 derpeyên wan belengazan dıgırın dıkin bêrikên xwe, ku lı
 kujan jınık, kujan keçık, lı kujan bûkê ra razıyane û ew

karê bêt namûsi kîrîne. Dûra şewq disa tête vêxistin, hındirê malê rohahi dibe û her kes li ew perçe ê derpê ê wan keç, bûk û jinîkan dînhêre û dibîne ku, ew kesa ji dayika xwera, an ji keç, bûk û xwişka xwera raziyaye. Lewra ew perçe ê derpe, parçe ê derpe ê diya wi, an ji xwişk û bûka wiye".

Belê Amojin, ew seg bavi ji mînra usa dîgot û li mîn pîrs dîkir, dîgot "gelo evana rastin, yan derewin". Lê ez bawerim guneyê ew leşkeri tune bû. Ji ber ku, şêx û imamên derewçin ji wira werge gotibûn. Çito ku seyid li derheqa Sunniyan de hezar tiştên nebûyi, dîrveyê yê aqilan ji talibên xwera dibêjin, şêx ji ji mîrûdên xwe ra eyni tiştan dibêjin. Naha ez li te bîpîrsim Amojin, evana rastin? Ma em heywanin, ku em diya xwe, xwişk û bûkên xwe nasnekî? Ez bawerim em Elewi ji tev hîndîk qasa Sunniyan xudan ar û namûsin, li namûsên xwe va girêdayîne. Disa em ji qasa wan diya xwe, xwişka xwe û bûkên xwe nasdikin, li wan xwedî derdikevin. Jinên me ji qasa jinên wan xudan ar û namûsin, bîaqiln, aza ne, nûjenin. Em li wan bêtir her tiştên xwe nasdikin. Rewş li ber çavane Amojin, mina ronahiya Roja Zeri. Lê ev tiştana û ev derewana kê li diji me derxistine Amojin? Helbet ku dijminên mafperest, helbet ku, şêx, mele û axayên ku mafên xwe li ev derewan de hene, wana evana hemû derxistine. Tu li diroka Olan dînhêri, Ol û meseb hemû li diji hevûdu derketine, tiştên nebûyi ji hevûdura gotine. Ji bona ev ji mirov kîrîne dijminên hevûdu, bî milyonan kes hatine kuştin ji bona ew derewan û birûbaweriyên bêt bîngehin û pûç. Bînhêre Amojin, tu qet nabîni ku, pêxamberek ji, li nav hejar û belangazan de derketiye. Hemû pêxamber ji, kurên dewlemendanin, kurên serdestan û kurên serokên eşîranin. Tenê Îsa pêxamber ketiye nav tevgera nokeran, hejar û belangazan, lê disa ji, koka wi dîgihêje koka yahûdên serdest. Ew ji li bîn destê keşişan de hatiye elmandin.

Amojin ew serbazê mîn ji mînra dîgot " li diroka cihan

û mirovatiyê de, her gavek nû û nûjen, bî dijberiyeki va hember hatiyê girtin; mirov her tum lî diji gav û tiştên nû derketiye. Dûra bî çaveki zanisti û xwaşditini va lî tiştên nû û nûjen mêzekirîye, hatiye ghiştiye ev heyama iroin. Sazûmanên çinan jî usa bûne. Wexta ku mirov lî sazûmana nokeri de derketiye, ketiye zîkê sazûmana Feodali, îcar ew kesên ku, maf û berjewendiyên xwe, lî sazûmana nokeri de hebûne, ew lî diji sazûmana Feodali derketine. Serdest û kedxwarin sazûmaniya nokeri, jî gel ra bî hezaran cûre derew kirine, gel berdane ser hevûdu, hejar û belengazên Xwedê bî sed hezaran hatine kuştin. Dûra sazûmana Kapitalizmê derketiye, kesên xudan noker, gund û cotgehan, vêca ew diji sazûmana Kapitalizmê derketine, disa gel berdane ser hevûdu. Gelên nezan disa bî derewên mir û axan qira hevûdu anîne. Lî piştî şoreşa Fransa rewş piçekî hate guhartin. Mir û axa lî ser erdê Ewrûpê de nemane, balam lî ser erdê kişwera Asya, Efrika û hin ciyên cihan de, ew rewşa Feodali hin lî ser hukûme". Disa wi serbazê min dîgot " heke ku ramana kesekî lî diji sazûmana dewlemendan be, îcar hemû dewlemend yekser radîbin dîkevin nav tevgeran. Yan ew kesî dikujin û yan jî bî dek û dolavan, bî Ehrîmanî va gotinên ew kesî pûç dikin, jî gel ra dibêjin " ev kesa diji Xwedê, Ol û Îmanê derdîkeve, ev keşa kafîre, qetla ev kesî helale " felan û bêvan. Ango her tum Ol û meseb lî destê serdestan de bûne şûr û mertal, bûne tîfing û çekên iroin. Erê Elewî jî Îslamî, balam seyidên Elewîyan jî bona şêx û imamên Sunnîyan her tum bûne xetere. Wana seyidên Elewîyan jî xwera dijminî ditîne. Jî bona ew jî, rûniştîne derew derxistinê, buhtanên ecêb avitîne ser Elewîyan. Jî ber ku maf û berjewendiyên şêx û imaman û yên seyidan lî diji hevî. Jî bona ev jî derewên pûç û derewên serdestan serketîne. Jî ber ku dewlet lî dest derewçinan-daya. Wana her hecet kirîne destên xwe didin şuxulandin. Jî bona sazûmana Kominîstî jî, disa ew çîna serdestan û derewçinan ev dere-

wana derxistine. Hebet li ev derewan de maf û berjewendiya seyidan ji geleke. Jî ber ku li ev sazûmana nû de kedxwari, pirtî û talibti tune, herkes mina heve. Qûlên Xwedê li ev sazûmana nû de nabin qûlên şêx, axa, mir û keşişan. Şêx û mirûdî, seyid û talibti, keşiş û aligirên keşişan, dewlemend û hejar tunenin, hemû mina hevîn. Lê ev jî, bî karên ev kesana nay. Dewlemed dixwazîn li ser piştî hejaran de bîjin û dewranên xwe bajon. Seyid, şêx û Îmam dixwazîn her tum mirûd û talibên wan hebîn, destên wan werim maçkîrîn. Ew jî dixwazîn li ser piştî gel de bîjin. Jî bona sazûmana Koministi hemû serdestên ev cihanê, hemû, keşiş, şêx, seyid û Îmam, jî bona ev meselê, bî yek deveki va dipeyivîn û hemû jî hevparên hevîn, dost û yarên hevîn".

Belê Amajîn, ez carek dîn jî tera bibêjûm, ez baweriya xwe li ev tiştana tinûm. Jî ber ku ew sazûmana nû derketiye. Sazûmana Kapitalizmê diji ew sazûmanêye. Jî bona ew jî, sazûmana Kapitalizmê hûm hemû hacetên destên xwe va, hûm jî, bî destê şêx, seyid, Îmam û keşişan va buhtanên usa davêje ser ew sazûmana nû. Ez gelek derewan li nav seyidên meda jî dibinûm. Ew jî li diji hevûdu derewan dîkîn, buhtanan davêjin ser hevûdu. Gelo çira seyid usa dîkîn? Helbet jî bona maf û berjewendiyên xwe. Tu jî mîn baştir dîzani Amojîn, li tevkuştina Şêx Said de, eşîra Xor-mekîyan û Lolan çî anin serê birayên xwe. Jî bona çî wana ew bêbextiya kîrîn? Jî bona dubendiya meseban, jî bona maf û berjewendiya serokên ew eşîran û seyidan. Me ew bêbextiyana li tevkuştina Dêrsim de jî dîtîn. Lî ew demê de ez zarok bûm, balam aqilê mîn dîgihîşt gelek tiştan. Mîn bî ev çavên xwe va gelek tişt dîtîn Amojîn. Kurdên Sunni çîto birayên xwe dîkuştîn, wê rojeki dirok bînvîsîne û Kurd jî bîxwînin, dersan li ew bêbextiyan de derxînin, şerm bîkî berxwe bîkevîn. Tu jî mînra pîrr tiştên qenc dibêji, şîretên qenc li mîn dîki Amajîn, balam ew tiştên ku jî te û mînra gotîne -jî bona sazûmana Koministiyê- hemû

derewin. Gelê cihan iro lı qurna bistan de dıji, ne ku lı dewra İbrahim pêxamber, Mûsa, Dawûd, Yaqûp û Lût de. Lı dewra wan pêxamberan de -gor ku ew serbazê mın, jı mınra dıgot- mirov bı xwişkê xwera zewıcıyaye, jı diya xwera zewıcıyaye, felan û bêvan. Balam mirovên iroin ev tıştana nakın, ev bêtarên eyibın, şermın, karê heywananın. Wi serbazê mın dıgot " İbrahim pêxamber jı xwişkek xwera, Yaqûp pêxamber jı du xwişkên xwera, Dawûd pêxamber jı, jı pênc xwişkên xwera zewıcıyaye. Lût pêxamber jı, jı du keçên xwera razaye, ku zarokên wan bıbın û eslê mirov zıde bıbe". Bawer bıke Amojın ew serbazê mın jı mınra usa dıgot û sond dıxwar ku, evana hemû rastın. Lê bıla xêr û güne lı stuyê wıda bı. Lewra xwendına mın tune, mın tıştên usa nexwendine. Wi dıgot " Tewrat, Zebûr û İncıl usa dıwısının"

Ana Senem jı bona ew axaftın û gotınên Xıdê piçûk, geleki hêrs ketıbû, berxwe dıket, balam nedıxwast ku dilê Xıdê bıêşine, çêr-mêran jı Xıdê piçûk ra bıbêje. Dûra bı rengeki mılayım va dageriya ser Xıdê piçûk, jı Xıdê piçûk ra:

- Kuro te lı destpêkê de qenc tışt gotın, lê lı dawiyê de, te lı hemû gotınên xwe de riya. Ez bawerım tu lı hayjı xwe nini. Tu dıxwazi pêle ranên mınên taybeti bıki. Ez naxwazım tu lı mın bıxeyidi. Lê ez dıbınım tu pırr tıştên nebûyi lı aqılê xwe de derdixini. Bawer bıke, bihistınên van gotınên te, jı bona keseki " Ehlibeyt " güne tê hesibandın. Te ev derewana lı ku bihistın kuro? Tu dibêji " serbazê mın, jı mınra got " lê ez bawer nakım. Tu beri usa nebûy; tu kureki bı itıqat, xudan baweri bûy. Tu çuy leşkeriya Tırkan hati, te ew itıqat û baweriya xwe wenda kır. Nızam lı te çı qewımıya, nızam te ev zanyariya lı aliya kê de stand. Kuro mal xırab, devê te çito usa dıgere, tu jı mınra dibêji nızam" İbrahim pêxamber, Dawûd pêxamber, Yaqûp pêxamber bı xwişkên xwera zewıcıyane; hezreti Lût jı, nızam -haşa haşa- jı keçên xwera rabûye, rûniştiye.

Weyyyy, tobe-tobe, ez qet naxwazım ku, tıştên usa bibihisım. Kuro ew pêxamber û balyozên Xwedê çito ew tıştana dıkın? Ma ew mina me qûlanın, ku ew gemariyê bıkın? Na-na haşa, Xidê mın, çêtire tu êdi ev deng û gotinên xwe bıbiri, rabi bıçi mala xwe. Tu ku ligel mın zêde bısekını, qet kesek nızane ku, tu lı bınê çend kevıran de, çıqas derewan derxini û belav bıki. Tu mın bıborine Xidê mın, êdi ez naxwazım te guhdar bıkı, te got erê ?".

Xidê piçûk dit ku Ana Senem bı rasti ji hêrs ketiye, naxwaze êdi tışteki bıbêje û bıbihise. Jı bona ew Xidê piçûk bı hêdika lı şûna xwe de rabû serxwe, berê xwe guhart ser Ana Senem, jı Ana Senem ra:

- Amojın tu mın bıborine. Tu qenc dızani ez çıqas lı te hezdıkım. Bawerke mın nedızanıbû ku, tu evqas dıxeyidi. Mın jı tera mina dayika xwe dilê xwe vekır. Tu baş dızani ku, ez gıramiyek gewre dıdime te, te mina dayika xwe hezdıkım. Lı destpêkê de te qal û behsa sazûmana Komınistı kır, ev gengeşiya te vekır, mın ji, jı tera raman û gotinên ew serbazê artêşa Tırk got. Lê ku mın bızaniyana tu usa dıxeyidi û hêrs dıkevi, bawerke mın jı tera dilê xwe venedıkır û jı tera nedıketım nav ev raberzınan. Jı bona mesela İbrahim pêxamber, Dawûd û Yaqûp pêxamber ji, wi serbazi jı mınra ew tıştana gotın. Lı gor gotına ew serbazi, nıviskareki Ewrûpi werge nıvisandıye. Xêncı ew nıviskari, pirtûka evrar "Tewrat" ji pırr tıştan dınvıvisise. Wi serbazi usa dıgot. Tu mın baş dızanı Amojın, xwendına mın ewqas tune. Mın piçek xwendım û nıvisandım hınkırıye, lê ew ji têra fêmkırına pirtûk xwendınan nake. Ez zımanê pirtûkan pırr fêm nakım. Mın ew pirtûka evrar ji qet nedıtiye ku, bı çı rengıye. Mın ji mina te, tenê navê Tewratê û çar pirtûkan bıhistiye. Jı bona sazûmana komınistı ji, disa ew serbazi jı mınra dıgot " ew sazûmana, sazûmanek wekheviye, sazûmana hejar û belengazane, sazûmana gundi û rêçberane, sazûmana zametkêşan û kesên bêt ax û bêt erdane. Ew sazûmana, sazûmanek ko-

meletiyê. Lı zikê ew sazûmanê de herkes xudan kar û male, xem û xeyalên pêşerojan tune. Tendurusti, zanyari, bijijk, nexwaşxane, derman, dibistan û xwendin hemû bêd diravîn. Bı zagoni herkes mina heve. Yek dewlemed, yek hejar tunenin. Yek bixwe, yek binhêre ew qedexeye. Axati, mirti, xulamti û berdesti tune. Dewlet jı bona zarokan lı gund û bajarên welêt de zarokxanan û dibistanan ava dıke. Lı ew zarokxanan de bijijk û hemşire lı zarokan dınhêrin, zarok lı binê sehêtê de mezın dıbın, tên zanandın. Jinên ku dıxwazın bıçın bıxebıtın û kar bıkın, sıbe-sıbe zarokên xwe dıgırın dıbın radeste wan zarokxanan, bijijk û hemşiran dıkın, êvar-êvar dadıgerın dıçın zarokên xwe dıgırın dıbın mal". Amojın, ew şırxane û zarokxaneyên ku tu dıbêji, ez bawerın ewın. Armanca tıştên usa jı baş tête kıvşê û tête fêmkırin. Ku jin û mêr bı hevra bıxebıtın, jiyana xwe û dolıwa xwe bêtır qenc bıkın, aboriya welêt jı rakın jor; kêra hemû kesan, bıgihêje hemû kesan. Welat şên, geş û nûjen bıbe, pêşva bıçe. Ez bawerım, ev jı, jı bona herkesi meselek jıyanêye û her pêwıste jı. Bı kurtasi ev tıştên usa wı serbazi jı mınra dıgot, Amojına delal. Ev gotınana, gotınên mın ninın, yên ew serbaze Tırkın.

Ana Senem bı bêdengi Xıdê piçûk guhdar dıkir, balam êdi nedıxwast ku, bıaxffe, nedıxwast ku, gotınên werge pırr guhdar bıke. Lê Xıdê piçûk qenc têgihıştıbû ku, Ana Senem zef xeyıdiyaye. Jı bona ew jı, jı dileki pak û hezkırı va jı Ana Senem ra:

- Amojın, ma tu lı mın xeyıdıyan? got û lı Ana Senem nihêriya. Lı pey ew pırsê de, icar Ana Senem:

- Kuro mın jı tera got êdi bese, ez naxwazım jı tera bıpeyivım. Çêtîre deng lı mın meke. Lewra hêrsa mın rabûye, ez naxwazım dilê te bıêşınım. Pêşneyara mın jı tera ewe ku, tu rabi bıçi mala xwe û carek dın jı, tıştên usa jı mınra û kesên dınra nebêji, jı keseki ra nekevi nav gengeşiyên usa. Jı ber ku, hın kes hene mina mın tebat-

tahamül- nakın. Bibe ku te bıkutun ji, got û rabû serxwe û dagriya mala xwe.

Xidê piçûk lı bın tû'ya Tawûr'ê de tenê mabû, nedizanibû ku lı kuva bıçe. Dûra rabû serxwe, çav lı goristana gund û çiyayê hember gund gerand, bı kûrahi hênjiya, dûra bı xwe bı xwera " çêtire ez bı rojeki zû lı ev gundi de derkevım. Ez bawerım êdi lı ev gundi de sekinandına mın hum jı mınra xetereye, hum ji ne keyse " got û berê xwe da aliya goma Hemê Ali, çû lı ber çavan de wenda bû.

-DAWÎ-

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris